



K.T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstîtuya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

DÎWANA HEYDERÎ
(ŞÊX MIHEMED EMÎNÊ HEYDERÎ)
-METN Ê VEKOLÎN-

Mehmet YILDIZ

16711003

Şêwirmend

Prof. Dr. Abdurrahman ADAK

Mêrdîn-2020

K.T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstîtuya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

DÎWANA HEYDERÎ
(ŞÊX MIHEMED EMÎNÊ HEYDERÎ)
-METN Û VEKOLÎN-

Mehmet YILDIZ

16711003

Şêwirmend

Prof. Dr. Abdurrahman ADAK

Mêrdîn-2020

Fv berhema ku bi hezkirin

ji dilê min ve niqutîye,

diyarî ye bo her du pîrikên min ên delal:

“Fmîna Pîranî” ya gorbihîşt

ku di zarokatîya min de bi dengê xwe bûbû mamosteya min a ewil,

bi dilê xwe jî medreseya qedîm...

û “H. Şemsa” ya dilbirehm

ku tim û tim çirûskên hêvî û xweşîyê li dorhêla xwe diçirîsîne...

TAAHHÜTNAME

TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “*Dîwana Heyderî (Şêx Mihemed Emînê Heyderî) -Metn û Vekolîn-*” adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

☐ Tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.

☐ Tezimin sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinde erişime açılabilir.

☐ Tezimin ... yıl süreyle erişime açılmasını istiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

.../.../202...

Mehmet YILDIZ

T.C.
MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

Dok. No: MAU-FRM-
04-ENSTİTÜ/07

İlk Düz.
Tar.:02/01/2020

Rev. No/Tar.:
00/...

Sayfa: 1/1



TEZ ONAY SAYFASI FORMU

TEZ ONAYI

Enstitümüz KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ Anabilim Dalı 16711003 numaralı tezli yüksek lisans programı öğrencisi Mehmet YILDIZ'ın hazırladığı “DÎWANA HEYDERÎ (ŞÊX MIHEMED EMÎNÊ HEYDERÎ) - METN Ê VEKOLÎN” başlıklı Yüksek Lisans tezi ile ilgili Tez Savunma Sınavı, Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliği uyarınca 11/12/2020 Cuma günü saat 15:30'da yapılmış, tezin onayına oy çokluğu/oybirliğiyle karar verilmiştir.

Danışman Prof. Dr. Abdurrahman Adak	İmza
Üye Doç. Dr. Hayrullah Acar	İmza
Üye Doç. Dr. Nesim Sönmez	İmza

ONAY:

Bu tezin kabulü, Enstitü Yönetim Kurulu'nun/...../20.... tarih ve/..... sayılı kararı ile onaylanmıştır.

...../...../20...

Enstitü Müdürü

Hazırlayan:
Birim Kalite Komisyonu

Kontrol Eden:
Üniversite Kalite Komisyonu

Onaylayan:
Üniversite Kalite Komisyon Başkanı

PÊŞGOTIN

Di edebiyata Îslamî de pexşan û nezm du cureyên berhemên nivîskî ne. Ji van cureyan nezm ji alîyê helbestvanên klasîk ve bêhtir hatiye tercîhkirin. Di nav berhemên ji nezmê pêk tên jî bêtir dîwan derketine pêş. Dîwan, ew berhem in ku ji komkirina helbestan pêk tên û di edebiyata Îslamî de cihekî girîng digirin. Di Edebiyata Kurdî ya klasîk de jî gelek dîwan hatine nivîsîn. Her çiqas nivîsîna dîwanan di serdema nûjen de lawaz bûbe jî hin helbestvan kevneşopîya nivîsîna dîwanan berdewam kirine. Ev kevneşopî bêtir di nava şêx û melayan de li derdora medrese û tekyayên terîqetan hatiye parastin. Mijara xebata me, helbestvanekî edebiyata Kurdî ya klasîk, Şêx Mihemed Emînê Heyderî û dîwana wî ye. Heyderî di sedsala XXan de jîyaye û dîwaneke dînî/tesewîfî ji edebiyata Kurdî ya klasîk re pêşkêş kiriye. Ji bo aso û cîhana edebiyata Kurdî ya klasîk baş bê fêmkirin, li ser dîwanên Kurdî vekolîn tên kirin û divê bîn kirin jî. Bi vê şîûr û fikrê me ev tez amade kir û ji bo pêşxistina zanista edebiyata Kurdî ya klasîk em ketin nav liv û tevgerê. Piştî me vekolînên dûr û dirêj li ser jîyan, berhem, û dîwana Heyderî kir, me wî û dîwana wî da nasîn di heman wextê de em kesayetîyekî edebî û berhemek edebî ya edebiyata Kurdî jî dinasînin. Bi vê sebebê jî hin alîyan ve rewşa serdema modern a edebiyata Kurdî ya klasîk û rewşa edebiyata Kurdî ya tekyayê jî zelal dibe. Bi vê xebatê dîwanek ji edebiyata Kurdî ya klasîk cara yekem e ku ji tîpên Erebi bi bal tîpên Latîni ve wê were wergerandin ku ev jî ji bo gelek xwendevanan re dê bibe çavkanî û xebatek sûdewer.

Gava me dest bi xebata xwe kir, du pirs derketin pêşberî me: pirs a yekem li ser tertîbkirina dîwanê bû û pirs a duyem jî li ser navlêkirina xebata me bû. pirs a yekem; wê dîwan çawa û bi çi awayî bê tertîbkirin? Ji ber ku dîwan bi awayekî rêkûpêk nehatibû tertîbkirin, em mecbûr man ku rêbazeke tertîbê ji bo dîwanê pêk bînin. Di encama şêwr û danûstendinên ku me bi şêwirmendê xwe Abdurrahman Adak re kir, derket holê ku dîwan li gorî tradîsyona dîwanên klasîk bê tertîbkirin wê baştir be. Me jî helbestên xwe li gorî qaîdeyên dîwanên kategorîk rêz kir. Li gorî vê tertîbê ku teşeyên nezmê derdikevin pêş, rêzkirina helbestan bi vî awayî çêbû; beşa

yekem: Qesîde, beşa duyem: Musemmet, beşa sêyem: Xezel û mustezad, beşa çarem: Helbestên Tirkî û Erebi. Her wekî tê zanîn helbestên bi teşeya qit‘eyê li dawîya dîwanan tên bicîkirin. Ji ber ku cureya vê qit‘eyê tewhîd bû û tekane tewhîda di dîwanê de bû, me ev qit‘e di serê dîwanê de bi cih kir.

Pirsa me ya duyem li ser navlêkirina xebatê bû. Wê navê xebata me çi be? Mihemed Emîn û bavê xwe Mela Ehmed, her du jî xwedî dîwan bûn û her duyan jî mexlesa hevpar ya “Heyderî” bi kar anîbûn. Ji bo dîwana Mihemed Emîn û bavê wî ji aliyê nav ve ji hev cuda bin, me xwest em mexleseke Mihemed Emîn ya derveyî “Heyderî” ji bo navê dîwanê bi kar bînin. Lê piştî lêhûrbûn û şewra bi şewirmendê xwe re, me biryar da ku navê xebata me “Dîwana Heyderî (Şêx Mihemed Emînê Heyderî)” be. Lewra helbestvan, di berhemên xwe yên derveyî dîwanê û di dîwanê de jî bi rêjeya 57% mexlesa “Heyderî” bi kar anîye. Ji xwe berhema wî ya “*Mewlûda Nebî*” jî di nav gel de bi navê mewlûda Heyderî belav bûye. Ji bo hevsengîyek di navbera dîwan û berhemên wî yên dîtir de çêbibe û ji ber ku mexlesa “Heyderî” ji aliyê helbestvan ve ji yên din bêtir hatiye bikaranîn ku ev jî wek nîşaneyekê tercîha helbestvan e, me ev biryar da.

Xebata me li ser jîyan, berhem û dîwana Şêx Mihemed Emînê Heyderî ye. Xebat ji destpêkekê, sê beşên sereke, encam û hin pêvekan pêk tê. Di derstpêkê de ji bo serdema helbestvan tê de jîyaye û tesîra bûyer û rewşên dîrokî, siyasî, çandî yên vê serdemê li ser helbestvan bi çî awayî ne bîr dîtin hatin nirxandin. Di beşa yekem de jîyan, berhem û kesayetîya helbestvan hat danasîn. Di beşa duyem de ji aliyê ziman, hunerên edebî, cureyên edebî, teşeyên nezmê, kêş, serwa, paşserwayê ve vekolîna dîwanê hat kirin. Di beşa sêyem de jî danasîna nusxeyên dîwanê hat dayîn û metna rexneyî ya dîwanê hat saz kirin. Di encamê de zanyarî û tesbîtên di xebatê de hatine bi destxistin hatin nivîsandin. 31 Pêvekên di xebatê de jî bi hin wêneyên helbestvan û derdora wî û bi hin fotokopîyên destxet ên nusxeyên dîwanê û berhemên dîtir ji bo xebatê bûn delîl.

Di vê xebatê de alîkarîya gelek kesên hêja gîhaşt me ku em deyndarê alîkarîya wan ya ji dilane ne. Di serî de sipasîyên xwe yên germ ji bo şewirmendê xwe Prof. Dr. Abdurrahman ADAK re pêşkêş dikim ku ji bo xebateke wisa derfet da me û di hemû merhaleyên xebatê de bi hemû hêz û qeweta xwe alîkarî û rêbertî ji me

re kir. Gava ji bo destpêkirina xebatê em bûn mêvanê malbata Heyderîyan malbatê dergehên xwe heta dawîn ji me re vekirin û ji bo alîkarîyê çî ji destên wan hat texsîr nekirin. Ji bo xebata me Mela Diyardîn çî rû bi rû, çî bi telefon û peyamên dijîtal ji me re şandin û agahîyên derbarê jîyan û berhemên bavê xwe bi me re par ve kirin. Ji bo van hemû alîkarîyan sipasîyên xwe ji malbata Heyderî û bi taybetî jî ji Mela Diyardîn ÇELİK re pêşkêş dikim. Ji bo dilgermî û pêşwazîkirina ji dilane û alîkarîyên di derbarê jîyana Heyderî û alîkarîyên di wergera helbestên Erebi de destekên xwe ji me kêr nekir, malavahîya Mela Sîrac TARHAN dixwazim û sipasîyên xwe ji wî re dikim. Ji bo parvekirina tecrubeyên xwe yê li ser tezê û alîkarîyên wî yê teknîkî di derbarê xebatê de li hevalê hêja M. Zana KARAK û li endamên jurîyê, mamosteyên hêja; Doç. Dr. Hayrullah ACAR û Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ re sipasîyên xwe dikim.

Mehmet YILDIZ

Mêrdîn 2020

KURTE

Şêx Mihemed Emînê Heyderî (1927-2003) helbestvanekî edebiyata Kurdî ya klasîk e ku di serdema nûjen de jîyaye û berhemên xwe ji her alî ve bi referansên edebiyata klasîk xemilandiye. Heyderî li gundê Kelehê yê bi ser Nisêbîna Mêrdînê hatiye dinyayê. Piştî pêvajoyek dûr û dirêj ya xwendin, ilm û tesewifê bûye muderîs, alim mutesewif û edîbek girîng ê serdema xwe. Her wekî di qada dînî û tesewifî de berhem nivîsîne di qada edebî de jî dîwanek pêşkêşî edebiyata Kurdî ya klasîk kiriye. Dîwana wî hem ji alîyê ruxsarî hem jî ji alîyê naverokî ve li ser esasên edebiyata klasîk kemilîye. Di hemû helbestên xwe de kêşa erûzê bi serkeftî tetbîq kiriye û di 39 helbestan de rîtm û mûsîqîya helbestên xwe bi serwaya navekî derxistiye lûtkeyê. Bi 12 teşeyên nezmê (qesîde, xezel, mustezad, qit'e û helbestên musemmet) û heşt cureyên edebî (tewhîd, munacat, ne'et, medhiye, mersiye, hîcwiye, pendname, xezela tekyayê) helbest nivîsîne ku ev jî dewlemendîya alîyê derekî û naverokî ya dîwana wî nîşan didin. Ziman, şewaz û vegotina dîwanê dewlemend û herîkbar e. Heyderîyê ku bi çar zimanan dizanîbû 82 helbest bi Kurdî, sisê bi Erebî, didu jî bi Tirkî bi tevahî 87 helbest nivîsîne. Her weha du mulemme'ên ku ji zimanên Erebî, Farisî, Kurdî û Tirkî pêk tên nivîsîne. Heyderî, di bin tesîra helbestvanên klasîk, Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Melayê Bateyî û Şêx Evdîrehmanê Aqtepî de mabe jî di dîwana xwe de resenîtîyek bi dest xistiye. Bi rêjeyeke zêde hunerên edebî bi kar anîne ku ji alîyê estetik û hunera edebî ve dîwaneke ku di asteke bilind de ye derxistiye holê.

Xebata me ji destpêk û sê beşên sereke pêk tê. Di destpêkê de em li ser serdema helbestvan, bûyer û rewşên dîrokî yên ku tesîr li ser jîyan û berhemên wî kirine û di beşa yekem de li ser jîyan, berhem û kesayetîya edebî ya helbestvan rawestîyan. Di beşa duyem de me ji gelek alîyan ve vekolîna dîwanê kir û di beşa sêyem de jî me metna rexneyî ya dîwanê saz kir.

Peyvên sereke: Dîwan, Edebiyata Kurdî ya klasîk, Heyderî, Şêx Mihemed Emînê Heyderî.

ÖZET

Modern dönemde yaşamış, klasik Kürt şairlerinden olan Şêx Mihemed Emînê Heyderî (1927-2003), klasik geleneği kendine şiar edinmiş ve eserlerinde pratiğe geçirmiş bir şairdir. Mardin'in Nusaybin ilçesine bağlı Kalecik Köyünde dünyaya gelen şair, uzunca bir eğitim, ilim ve tasavvuf sürecinden sonra müderris, âlim ve mutasavvıf kişiliğiyle kendi döneminin önemli şahsiyetlerinden biri haline gelmiştir. Dinî-tasavvufî eserleri yanında edebî alanda önemli bir yer tutan divanını da Klasik Kürt Edebiyatına sunmuştur. Divanını, içerik ve şekil bakımından her yönüyle klasik referanslarla şekillendirmiştir. Bütün şiirlerini aruz vezniyle yazmış, kafiye, redif ve diğer ahenk unsurlarıyla zenginleştirmiş, 39 şiirinde kullandığı iç kafiyeyle de ahenk ve ritimde şiirlerindeki zirveyi bulmuştur. Divanındaki 12 nâzım biçimi ve 8 nâzım türüyle divan geleneğinin bir başka önemli yansımasını ortaya koymuştur. Divanı, dil ve anlatım yönünden akıcı ve zengin bir üsluba sahiptir. Arapça, Farsça, Kürtçe ve Türkçe dillerini bilen şair, 82 Kürtçe, üç Arapça, iki tane de Türkçe, olmak üzere toplamda 87 şiir yazmıştır. Biri dört dilli diğeri üç dilli olmak üzere iki mülemması da bulunmaktadır. Edebî yönden Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Melayê Bateyî ve Şêx Evdirehmanê Aqtepî gibi klasik Kürt şairlerin etkisinde kalmışsa da, divanında özgünlüğü yakalamış ve kendi edebî yolunu çizmiştir. Edebî zevk ve estetik açısından başarılı olan divanında birçok edebî sanat kullanması, divanını edebî zenginlik açısından daha da ötelere taşımıştır.

Tez çalışmamız giriş ve üç ana bölümden oluşmaktadır. Giriş kısmında şairin edebî kişiliğini, eserlerini ve yaşadığı dönemi etkileyen önemli tarihî olaylar üzerinde, birinci bölümde ise şairin hayatı, eserleri ve edebî kişiliği üzerinde durduk. İkinci bölümde birçok açıdan divanın incelemesini yaptıktan sonra üçüncü bölümde divanın tenkitli metnini verdik.

Anahtar Kelimeler: Divan, Klasik Kürt Edebiyatı, Heyderî, Şêx Mihemed EmînêHeyderî.

ABSTRACT

Şêx Mihemed Emînê Heyderî (1927-2003), who lived in the modern period and one of the classical Kurdish poets, is a poet who has adopted the classical tradition and put it into practice in his works. Born in Kalecik Village of Nusaybin district of Mardin, the poet became one of the important figures of his time with is professor (mudaris), scholar (madrassa) and sufi personality after a long education, ilm (science) and tasawwuf process. In addition to his religious-sufi works, he presented his divan (ottoman poetry), which has an important place in the literary field, to classical Kurdish Literature. He shaped his divan with classical references in every aspect in terms of content and form. He wrote all his poems with aruz prosody, enriched them with rhyme, redif and other elements of harmony and he found the peak in his poems in harmony and rhythm with the inner rhyme he used in his 39 poems. It has revealed another important reflection of the divan tradition with 12 forms of poetry and 8 genre of poetry in his divan. His divan has a fluent and rich style in terms of language and expression. The poet, who speaks Arabic, Persian, Kurdish and Turkish, wrote a total of 87 poems including 82 Kurdish, three Arabic and two Turkish poems. Theree are also two mulammas, one in four languages and the other in three languages. Even though he was influenced by classical Kurdish poets such as Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Melayê Bateyî and Şêx Evdîrehmanê Aqtepe in literary terms, he caught the originality in his divan and make one's own literary way. His use of the many literary arts in his divan, which was successful in terms of literary taste and aesthetics, carried his divan further in terms of literary wealth. This thesis consists of introduction and three main parts. We focused on important historical events that affecting the period in which the poet lived, his literary personality and works in the introduction part, and one the life, works and literary personality of the poet in the first part. After examining the divan from many perspectives in the second part, we gave the criticized text of the divan in the third part.

Keywords: Divan, Classical Kurdish Literature, Heyderî, Şêx Mihemed Emînê Heyderî.

NAVEROK

PÊŞGOTIN	I

KURTE.....	IV

ABSTRACT	VI

NAVEROK	VII

LÎSTEYA TABLO, GRAFÎK Û PÊVEKAN.....	XIII

KURTEBÊJE.....	XVI

DESTPÊK

I. METODOLOJÎ	1
A. Mijar, Girîngî û Armanca Tezê	1
B. Çarçove û Rêbaza Tezê	2
C. Çavkanîyên Tezê	3
II. KURTENÊRÎNEK LI SERDEMA HEYDERÎ.....	5
A. Bi Awayekî Giştî Rewşa Kurdan a Berî Serdema Heyderî	6
B. Di Serdema Komara Tirkîyeyê de Rewşa Kurdan a Giştî	10
C. Di Sedsala 20an de li Sûrîyeyê Rewşa Kurdan	16
1. Rewşa Siyasî	16
2. Nêrîneke Giştî li Terîqeta Xeznewîyan	19

BEŞA YEKEM

JÎYAN, BERHEM Û KESAYETÎYA EDEBÎ YA HEYDERÎ.....	28

1.1. JÎYANA HEYDERÎ	28
1.1.1. Jidayikbûn û Zarokatîya Wî	28
1.1.2. Eşîreta Wî	29
1.1.3. Malbata Wî	30
1.1.3.1. Bavê Wî	30

1.1.3.2.	Zarokên Wî	33
1.1.4.	Navê Wî û Mexlesa Wî	34
1.1.5.	Xwendina Wî û Seydayên Wî	43
1.1.5.1.	Xwendin û Perwerdehiya Wî	43
1.1.5.2.	Seydayên Wî	44
1.1.6.	Melatî û Muderîstîya Wî	45
1.1.7.	Jîyana Wî ya Tesewifî û Terîqeta wî	47
1.1.8.	Wefata Wî	50
1.2.	BERHEMÊN HEYDERÎ	50
1.2.1.	Berhemên Wî yên Menzûm	50
1.2.1.1.	Dîwan	50
1.2.1.2.	Mewlûda Nebî	50
1.2.1.3.	Eqîdeya Îmanê	53
1.2.1.4.	Werdu`l-Etfal	55
1.2.2.	Berhemên Wî yên Pexşan	58
1.2.2.1.	Mewludu`n-Nebî (Mewlûda Erebi)	58
1.2.2.2.	Rîsaleya Exlaq û Tesewifê	58
1.3.	KESAYETÎYA WÎ YA EDEBÎ	58
1.3.1.	Helbestvanên ku Bandor li Heyderî Kirine	59
1.3.1.1.	Îbrahîm Edhem	60
1.3.1.2.	Melayê Cizîrî (Sedsala XVI-XVII)	62
1.3.1.3.	Ehmedê Xanî (1651-1709)	69
1.3.1.4.	Melayê Bateyî (XVII-XVIII)	74
1.3.1.5.	Şêx Evdirehmanê Aqtepî (1842-1910)	79
1.3.1.6.	Mela Ehmedê Heyderî (1887-1938)	82
1.3.1.7.	Şêx Eladînê Xeznewî (1919-1969)	88
1.3.2.	Kesayetîya Heyderî ya Poetîk	89
1.3.3.	Kesayetîya Heyderî ya Dînî / Tesewifî	91

BEŞA DUYEM

VEKOLÎNA DÎWANA HEYDERÎ	98
2.1. DANASÎNA GIŞTÎ YA DÎWANÊ	98
2.2. ZIMANÊ DÎWANÊ	105
2.2.1. Biwêjen di Dîwanê de	110
2.2.2. Cotepeyvên di Dîwanê de	112

2.2.3.	Bêje û Têgehên Taybet ên di Dîwanê de.....	114
2.2.4.	Di Dîwanê de Taybetîyên Devokên Kurdî	116
2.2.4.1.	Taybetîyên Devoka Serhedê	117
2.2.4.2.	Taybetîyên Devokên Mêrdînê.....	120
2.2.4.2.1.	Devoka Torê	121
2.2.4.2.2.	Devoka Berrîya Mêrdînê	124
2.2.4.3.	Taybetîyên Devoka Botan.....	126
2.2.4.4.	Taybetîyên Devoka Hekkarî	128
2.2.4.5.	Taybetîyên Devoka Binxetê (Rojava).....	130
2.2.5.	Di Dîwanê de Unsûrên Zimanên Biyanî.....	131
2.2.5.1.	Unsûrên Erebî	131
2.2.5.2.	Unsûrên Farisî.....	134
2.2.5.3.	Unsûrên Tirkî.....	136
2.3.	HUNERÊN EDEBÎ	137
2.3.1.	Hunerên Edebî yên bi Mecaz û Teşbîhê ve Girêdayî	138
2.3.1.1.	Teşbîh (Lêçiwandin)	138
2.3.1.2.	Îstî ‘are	139
2.3.1.3.	Mecaza Mursel.....	140
2.3.1.4.	Kînaye.....	140
2.3.2.	Hunerên Edebî yên Bi wateyê ve Girêdayî	141
2.3.2.1.	Husnê Te‘lîl	141
2.3.2.2.	Mubalexe	141
2.3.2.3.	Teşxîs	142
2.3.2.4.	Tecahula ‘Arif.....	142
2.3.2.5.	Îstîfham	143
2.3.2.6.	Îstîdrak	143
2.3.2.7.	Nîda.....	143
2.3.2.8.	Tekrîr	144
2.3.2.9.	Tedrîc.....	145
2.3.2.10.	Tezad.....	145
2.3.2.11.	Muqabele	145
2.3.2.12.	Tenasub.....	146
2.3.2.13.	Teşabuhu’l-Etraf	147
2.3.2.14.	Îham	147
2.3.2.15.	Teraduf (Hemwateyî).....	148
2.3.2.16.	Leff û Neşr	148
2.3.2.17.	Bera‘etê Istihlal	149
2.3.2.18.	Telmîh.....	149

2.3.2.19.	Îqtûbas	150
2.3.2.20.	Îrsala Mesel	150
2.3.3.	Hunerên Edebî yên bi Peyv Deng û Ahengê ve Girêdayî	151
2.3.3.1.	Cînas	151
2.3.3.2.	Îştîqaq	151
2.3.3.3.	Qelb.....	152
2.3.3.4.	Alîterasyon û Asonans	152
2.3.3.5.	Sedr û ‘Ecz (Reddu’l-‘Ecuz Ale’s-Sadr).....	153
2.3.3.6.	Îade	153
2.3.3.7.	Muwazene.....	154
2.3.3.8.	Tersî‘	154
2.3.3.9.	Tesmit	155
2.3.3.10.	Tewşîh (Akrostîş).....	155
2.3.3.11.	Tezmîn	158
2.3.3.12.	Telmî‘ (Mulemme‘)	159
2.4.	TEŞEYÊN NEZMÊ	160
2.4.1.	Teşeyên Nezmê yên ku ji Malikan Pêk Tên	161
2.4.1.1.	Qesîde	162
2.4.1.1.1.	Qesîdeya Musemmet	166
2.4.1.2.	Xezel	168
2.4.1.2.1.	Xezela Musemmet	169
2.4.1.3.	Mustezad.....	170
2.4.1.4.	Qit‘e	171
2.4.2.	Teşeyên Nezmê yên ku ji Bendan Pêk Tên	172
2.4.2.1.	Muselles	173
2.4.2.2.	Murebbe‘	174
2.4.2.2.1.	Murebbe‘a Mulemme‘	175
2.4.2.2.2.	Murebbe‘a Mu‘ad	176
2.4.2.3.	Muxemmes.....	177
2.4.2.4.	Texmîs	180
2.4.2.5.	Teştîr	181
2.4.2.6.	Museddes	182
2.4.2.7.	Terkîbbend.....	183
2.4.2.8.	Tercî‘bend.....	184
2.5.	CUREYÊN EDEBÎ	185
2.5.1.	Tewhîd.....	187
2.5.2.	Munacat.....	187

2.5.3. Ne't.....	189
2.5.4. Medhiye.....	189
2.5.5. Mersiye.....	191
2.5.6. Hîcwiye	193
2.5.7. Pendname	194
2.5.8. Xezela Tekyayê.....	195
2.6. KÊŞ, SERWA Û PAŞSERWA	196
2.6.1. Kêş	196
2.6.1.1. Îmale	201
2.6.1.2. Med (Îmaleya Dirêj)	202
2.6.1.3. Zîhaf.....	202
2.6.1.4. Texfîf (Qesr)	204
2.6.1.5. Wesl	204
2.6.2. Serwa.....	205
2.6.2.1. Cureyên Serwayê	206
2.6.2.1.1. Li Gorî Cih Cureyên Serwayê	206
2.6.2.1.1.1. Serwaya Bêpaşserwa	206
2.6.2.1.1.2. Serwaya Bîpaşserwa.....	207
2.6.2.1.2. Li Gorî Hevbeşîya Dengan Cureyên Serwayê.....	208
2.6.2.1.2.1. Serwaya Mucerrêd.....	208
2.6.2.1.2.2. Serwaya Murdef	209
2.6.2.1.2.3. Serwaya Muqeyyed	209
2.6.2.2. Serwaya Navekî (Tesmît).....	211
2.6.2.2.1. Şeweyên Tesmîtê di Malikan de	213
2.6.2.2.2. Şeweyên Tesmîtê di Bendan de	217
2.6.3. Paşserwa (Redîf)	221
2.6.3.1. Paşserwayên Qertafî.....	222
2.6.3.2. Paşserwayên Qertaf û Bêje/Kombêjeyî.....	223
2.6.3.3. Paşserwayên Bêje/Kombêjeyî.....	224

BEŞA SÊYEM

METNA REXNEYÎ YA DÎWANA HEYDERÎ..... 228

3.1. DANASÎNA DÎWANÊ Û NUSXEYÊN WÊ	228
3.1.1. Dîwana Heyderî.....	228
3.1.2. Nusxeyên Dîwanê	229
3.1.2.1. Helbestên Destxet ên Muellîf.....	229

3.1.2.2.	Nusxeya Mela Diyađînê Heyderî 1	230
3.1.2.3.	Nusxeya Mela Diyađînê Heyderî 2	233
3.1.2.4.	Nusxeya Mela Diyađînê Heyderî 3	236
3.1.2.5.	Nusxeya Mela Diyađînê Heyderî ya Matbû	238
3.1.3.	Bêrhevokên ku Helbestên Heyderî tê de Hene	239
3.1.3.1.	Mecmû'eya Mela Evdîlwehabê Cîbilgrawî	239
3.1.3.2.	Dîwana Camî' ya Seydayê Ehmed Hilmîyê Koxî	241
3.1.3.3.	Dîwana Camî'a ya Mihemed Şêxmûs el-Botî en-Neqşebendî	242
3.2.	RÊBAZA AMADEKIRINA METNA DÎWANÊ	243
3.3.	METNA REXNEYÎ YA DÎWANÊ	249
ENCAM.....		359
ÇAVKANÎ.....		362
PÊVEK		372

LÎSTEYA TABLO, GRAFÎK Û PÊVEKAN

LÎSTEYA TABLOYAN

Tablo 1: Helbestên Yekmexlesî yê Heyderî.....	36
Tablo 2: Helbestên Pirmexlesî yê Heyderî	37
Tablo 3: Rêz, Hejmar û Tertîbkirina Helbestên Dîwanê	103
Tablo 4: Rêz, Hejmar û Herfa Serwaya Xezel û Mustezadên Dîwanê.....	105
Tablo 5: Rêz, Hejmar û Qewareya Qesîdeyên di Dîwanê de.....	162
Tablo 6: Cureyên Nezmê yê Qesîdeyên di Dîwanê de	164
Tablo 7: Rêz û Hejmarên Xezelên di Dîwanê de	168
Tablo 8: Rêz û Hejmarên Mustezadên di Dîwanê de.....	171
Tablo 9: Rêz û Hejmarên Murebbe'ên di Dîwanê de	175
Tablo 10: Rêz û Hejmarên Muxemmesên di Dîwanê de	178
Tablo 11: Rêz û Hejmarên Museddesên di Dîwanê de	183
Tablo 12: Rêz û Teşeyên Nezmê yê Munacatên di Dîwanê de	188
Tablo 13: Rêz, Hejmar û Teşeyên Nezmê yê Medhiyeyên di Dîwanê de	190
Tablo 14: Rêz, Hejmar û Teşeya Nezmê ya Mersiyeyên di Dîwanê de.....	192
Tablo 15: Tabloya Giştî ya Behr û Qalibên Erûzê yê ku di Dîwanê de.....	197
Tablo 16: Şêweyên Serwaya Navekî di Teşeyên ji Malikan Pêk Tê.....	214
Tablo 17: Şêweyên Serwaya Navekî di Teşeyên ji Bendan Pêk Tê.....	217
Tablo 18: Cureyên Serwa û Paşserwayên Helbestan	225
Tablo 20: Helbestên Heyderî Yê Destxet Di Metnê De	230

LÎSTEYA GRAFÎKAN

Grafîk 1: <i>Rêjeya Bikaranîna Mexlesan</i>	38
Grafîk 2: <i>Hejmara Teşeyên Nezmê yê di Dîwanê de</i>	161
Grafîk 3: <i>Rêjeya Bikaranîna Behrên Erûzê di Qesîdeyan de</i>	164
Grafîk 4: <i>Rêjeya Bikaranîna Behrên Erûzê di Muxemmesên Dîwanê de</i>	179
Grafîk 5: <i>Rêjeyên Cureyên Edebî yê di Dîwanê de</i>	186
Grafîk 6: <i>Rêjeya Behrên Erûzê yê di Dîwanê de Hatine Bikaranîn</i>	200
Grafîk 7: <i>Bikaranîna Cureyên Serwayê di Teşeyên Helbestan de</i>	211
Grafîk 8: <i>Teşeyên Nezmê yê bi Tesmît</i>	213
Grafîk 9: <i>Bikaranîna Cureyên Paşserwayê di Teşeyên Helbestan de</i>	221

LÎSTEYA PÊVEKAN

Pêvek 1: <i>Wêneyê Şêx Mihemed Emîn</i>	373
Pêvek 2: <i>Şêx Mihemed Emîn û Feqeyên Xwe</i>	374
Pêvek 3: <i>Wêneyekî Şêx Mihemed Emîn ji Înşêeta Medreseyê.....</i>	374
Pêvek 4: <i>Wêneyekî Şêx Mihemed Emîn (Heyderî)</i>	375
Pêvek 5: <i>Heyderî û Alimên Neqşebendî.....</i>	376
Pêvek 6: <i>Heyderî û Seydayên Wî</i>	376
Pêvek 7: <i>Wêneyek ji Jiyana Şêx Mihemed Emîn ya Rojane.</i>	377
Pêvek 8: <i>Şêx Mihemed Emîn li Pêşîya Cemaetê Nimêjê Dike.</i>	378
Pêvek 9: <i>Kêlên Gora Şêx Mihemed Emînê Heyderî.....</i>	379
Pêvek 10: <i>Kêla Ber Serê Heyderî (Helbestên Wî yên Rêza 3 û 85em)</i>	380
Pêvek 11: <i>Destnivîsa Şêx Mihemed Emîn ya Helbesta Yekem.....</i>	381
Pêvek 12: <i>Rûpela Serî ya NMD1ê</i>	382
Pêvek 13: <i>Rûpela Dawî ya NDM1ê</i>	383
Pêvek 14: <i>Helbesta Rêza 27an ya Vê Xebatê, Ji Nusxeya NMD1ê.....</i>	384
Pêvek 15: <i>Rûpela Serî ya NMD2</i>	385
Pêvek 16: <i>Rûpela Dawî ya NDM2</i>	386
Pêvek 17: <i>Helbesta Rêza 48an ya Vê Xebatê, ji NMD2yê</i>	387
Pêvek 18: <i>Helbesta Rêza 68an ya Vê Xebatê, ji NMD2yê</i>	388
Pêvek 19: <i>Helbestên Rêza 70 û 79an ya Vê Xebatê, ji NMD2yê</i>	389
Pêvek 20: <i>Rûpela Serî ya NMD3</i>	390
Pêvek 21: <i>Rûpelên Dawî ya NMD3</i>	391
Pêvek 22: <i>Helbetsa Rêza 14an (Ji Mecmûeya Mela Ebdilwehabê Cibilgrawî).....</i>	392
Pêvek 23: <i>Helbesta Rêza 41ê (Ji Mecmûeya Mela Evdilwehabê Cibilgrawî)</i>	393
Pêvek 24: <i>Helbesta Rêza 76an ya Vê Xebatê (Helbesta ji Nusxeya Serbixwe).....</i>	394
Pêvek 25: <i>Rûpela Serî ya “Mewlûda Nebî” (Mewlûda bi Kurdî)</i>	396
Pêvek 26: <i>Rûpela Serî ya “Mewludu’n-Nebî” Bi Destnivîsa Heyderî (Erebî)</i>	397
Pêvek 27: <i>Rûpela Serî ya “Rîsaleya Exlaq û Tesewifê” ya Heyderî</i>	398
Pêvek 28: <i>Rûpelên ji Nav “Rîsaleya Exlaq û Tesewifê” ya Heyderî.....</i>	398
Pêvek 29: <i>Rûpelên Dawî ya “Rîsaleya Exlaq û Tesewifê” ya Heyderî</i>	399
Pêvek 30: <i>Munacata Îbrahîm Edhem</i>	400
Pêvek 31: <i>Cih û Rêza Helbestan di Nusxeyan de.....</i>	401

KURTEBÊJE

amd.	:amadekar
b.d.	:bêdîrok
bnr.	:binêrin
c.	:cild
ç.	:çêbûn
e.s.	:elehîsselam
h. b.	:heman berhem
hwd.	:her wekî din
Hz.	:Hezretî
j.	:jimar
k.d.	:koça dawî
n.r.	:navbera rûpelan
r.	: rûpel
r.e.	:radiyellahû enhum
s.e.w.	:selelahû eleyhî wesselem
wer.	: werger
weş:	:weşan

DESTPÊK

I. METODOLOJÎ

Ji bo xebatek zanistî pêk were hewcedarî bi rêbazekê û rêkûpêkbûnekê heye. Ji hemû rê û rêbazên ku di xebatek zanistî de tên şopandin re metodolojî tê gotin. Me jî di vê xebata xwe de hin rê û rêbaz şopandine ku bi vî awayî xebata me kemilî û encam da. Em ê li jêrê bi hûrgulî li ser rê û rêbazên ku me şopandine yanî em ê li ser metodolojîya xebata xwe rawestin.

A. Mijar, Girîngî û Armanca Tezê

Mijara xebata me Şêx Mihemed Emînê Heyderî û “*Dîwana*” wî ye. Edebiyata Îslamî piştî xwe daye edebiyata Erebi ya serdema cahilîyeyê. Lewra piştî ku Erebi Îslamîyet qebûl kirin di helbestê de ji aliyê mijar û naverokê ve guherîn pêk anîbin jî ji aliyê ruxsarê ve helbest û nezm an wek berê maye yan jî bi pêşvebirina hin taybetîyên berî Îslamê berdewam kiriye. Piştî ku Îslamîyet li derveyî civaka Ereban, li nav Kurd, Faris, Tirk, û hwd. belav bû, gelek taybetîyên edebiyata Erebi jî li nav wan belav bû ku jê re bi tevahî edebiyata klasîk ya Îslamî tê gotin. Edebiyata klasîk ya Erebi, Faris, Tirk û Kurdan piştî xwe dane vê edebiyata klasîk ya Îslamî û her yek ji wan li gorî îmkanên xwe şax daye.

Edebiyata Kurdî ya klasîk jî her wekî edebiyata klasîk ya Îslamî, bêtir li ser nezmê geş bûye. Cur bi cur teşeyên nezmê û cureyên edebî di dîwanan de cih girtine ku dîwan ji bo edebiyata Kurdî ya klasîk bûne çavkanîyên sereke û jêneveger. Girîngîya dîwanan di edebiyata Kurdî ya klasîk de ew e ku dîwan, hem naverokî û hem jî ruxsarî hemû taybetîyên edebiyata klasîk di nava xwe de dihevin. Her

xebateke li ser dîwanan tê kirin, tenê taybetîyên wê dîwanê û muelîfê wê dernaxin, di heman wextê de taybetîyên edebiyata Kurdî ya klasîk jî derdixin holê.

Heyderî, helbestvanekî di sedsala XXan de jîyaye û berdewamê bizava Neqşebendî/Xalidîtiyê ye. Ev helbestvanê ku di serdema modern de jîyaye, di jîyana xwe ya taybet de jî di nava xebatên dînî/tesewîfî, terîqet û tekyayê de bûye. Berhemên xwe bi taybetî jî dîwana xwe di çarçoveya edebiyata tekyayê ku şaxeke edebiyata Kurdî ya klasîk e nivîsiye. Ev xebata me ya ku li ser jîyan, berhem û dîwana Heyderî hatiye kirin, wê ji bo serdema piştî Xalidîtiyê û edebiyata Kurdî ya klasîk a ku di serdema nûjen de jî berdewam kiriye bibe ronahîyek.

Armanca me di vê xebatê de ew e ku em helbestvanekî ku di serdema xwe de girîng e û ji alîyê kesayetîya xwe ya edebî û berhemên xwe zêde nehatiye nasîn bi rê û rêbazên akademîk û zanistî bidin nasîn. Bi vî awayî dîwana ku heta niha bi tîpên Latînî nehatiye çapkirin jî em ê bi vê xizmeta ku ji edebiyata Kurdî ya klasîk re tê kirin, bigîhînin xwendevan û lêkolerên edebiyata klasîk.

B. Çarçove û Rêbaza Tezê

Her wekî xebata me li ser Heyderî û dîwana wî ye, ji bo xebatek zanistî û kemilî derkeve holê me pêşî ji xwe re planeke bi sînor saz kir. Sînor an çarçoveya me serdem, jîyan, bi giştî berhemên Heyderî û bi hûrgulî jî dîwana wî ye. Me di nava vî sînorî de hin rê û rêbaz şopandin. Xebata me bi giştî ji destpêkekê, sê beş, encam û pêvekan pêk tê. Di destpêkê de ewil em li ser metodolojî an disîplîna rê û rêbazên ku me di xebata xwe de şopandine anîn ziman. Piştî jî em bi giştî li ser serdema ya ku Heyderî tê de jîyaye rawestîyan. Lê ji bo serdema ku tê de jîyaye baş bê fêmkirin ji ber ku bûyerên dîrokî jî bi têkilîya sedem-encaman pev girêdayî ne, em li ser hin serdemên berî serdema wî ku ji serdema wî re bûne sedem rawestîyan. Di beşa yekem de em li ser jîyan û berhemên Heyderî rawestîyan. Ji bo alîyê wî yê edebî kifş bibe em li ser kesayetîya wî ya edebî jî sekinîn. Me beşa duyem ji bo dîwana Heyderî terxan kiriye ku ji gelek alîyan ve me vekolîna dîwana wî kir. Em bi hûrgulî û beş bi beş li ser tertîbkirina dîwanê, zimanê dîwanê, hunerên edebî, teşeyên nezmê, cureyên edebî, kêş, serwa û paşserwayên dîwanê rawestîyan. Di beşa sêyem de me di serî de danasîna nusxeyan kir, piştî jî rê û rêbazên ku me ji bo amadekirina metna dîwanê

şopandibûn dan û di dawîya beşê de jî me metna rexneyî ya dîwanê da. Di transkrîpsiyonê de di piranîya helbestan de me nusxeya “NMD2” û helbestên ku di vê nusxeyê de tunebûn jî me nusxeyên din ji xwe re esas girtin û hemû guherîn û cudahîyên di nusxeyan de me di jêrenotan de nîşan da. Me bi encam û pêvekan dawî li xebata xwe anî. Pêvekên me ji çend wêneyên Heyderî, derdora wî û ji destxetên berhem û nusxeyên dîwana wî pêk tên.

C. Çavkanîyên Tezê

Di xebatên zanistî de sûdwerigirtina ji çavkanîyan tiştekî zerûrî ye. Lewra lêkoler ji bo di qada zanistê de angaşên xwe piştrast û xurtir bikin mecbûr in ku ji tecrubeyên heyî sûdê werbigirin. Me jî di vê xebata xwe de ji gelek çavkanîyan sûd werigirt û jêderên wan di cihên pêwîst de nîşan da. Em ê çavkanîyên sereke yên ku di xebata xwe de me ji wan sûd werigirtine bidin.

Di beşa destpêkê de ji bo tarîxçeya serdema Heyderî, me ji gelek çavkanîyan sûd werigirt ku yên sereke weha ne: “*Şerefname*” ya Şerefîxanê Bidlîsî, “*Ağa Şeyh, Dewlet*” a Martin van Bruinessen, “*Kürt Sorunu*” ya Altan Tan, “*Kurdistan Tasavvuf Tarihi*” ya Muhammed Rauf Tavakkoli, “*Tarihsel Süreçte Kürt Coğrafyasında Tasavvuf ve Tarikatlar*” a Ali Tenik, pirtûkên Kadri Yıldırım a “*Rojava Kürt tarihi ve Coğrafyası*” û ya ji sê cildan pêk tê “*Kürt medreseleri ve Alimleri*” û ji gelek gotar û pirtûkên hwd.

Di beşa yekem de ji bo jîyan berhem û kesayetîya Heyderî, çavkanîyên sereke ew bûn ku yên me ji malbat û derdora Heyderî bi devkî werigirtine. Bi taybetî jî hevpeyvînên me yên digel lawê wî Mela Diyaadîn Çelik û Feqeyê wî Mela Sîrac Tarhan kiribûn, di derbarê jîyan û berhemên wî de bûn çavkanîyên sereke. Dîsa ji bo vê beşê hin xebat û gotar ji me re bûn çavkanî ku em ê li jêrê bidin;

-Agahîyên di derbarê jîyana Şêx Mihemed Emînê Heyderî ku me ji lawê wî; Mela Diyaadîn Heyderî werigirtin.

-“Pêşgotina dîwana heyderî” ya ku ji aliyê weşanên Nûbiharê bi amadekarîya Mela Diyaadîn Heyderî ve hatiye amadekirin.

-Xebata bi navê “*Tuhfet’ul-Heyderî*” ku ji weşanên Seyda derketiye, di serê xebatê de agahîyên ji aliyê lawê Şêx Mihemed Emin, Mela Mucahîd Heyderî ve di derbarê jîyan û berhemên wî de hatine dayîn.

-Xebata Önder Beyter ya ku bûye tezeke lîsansa bilind ku li ser dîwana mela Ehmedê Heyderî ye.

-Semînera lîsansa bilind ya Memet Yıldız ku li ser berhema Heyderî ya “*Mewlûda Nebî*” hatiye amadekirin.

-Gotara Halil Akçay, “*Son Dönem Tasavvuf Âlimlerinden Şeyh Muhammed Emin el-Hayderî Hayatı ve Eserleri*”.

-Gotara Ramazan Korkut, “*Halidi Tasavvuf Geleneğinde Fıkıh ve Tasavvuf İlişkisi (Seyda Muhammed Emin El-Hayderî medresesi Örneği)*”.

-Gotara Abdurrahman Adak ya ku di kovara Nûbiharê de çap bûye ku ew jî li ser bavê Heyderî, Mela Ehmedê Heyderî ye. “*Helbestvanê Muhbet û Xurbetê: Mela Ehmedê Heyderî*”.

Di beşa duyem de xebat û pirtûkên teorîk ên li ser edebiyata klasîk ji me re bûn çavkanî. Çavkanîya sereke ya ku di vê beşê de ji me re rêbertîyeke bêpayan kir, pirtûka Abdurrahman Adak ya “*Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*” û piştî jî ji bo alîyê ruxsarî yê dîwanê ev çavkanîyên li jêrê ji me re bûn alîkar;

-Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk, Abdurrahman Adak

-*Ansiklopedik Divan Edebiyatı Sözlüğü*, İskender Pala

-*Edebiyat Lügatı*, Tahirül Mevlî

-*Klasik Edebiyat Bilgisi Biçim, Ölçü, Kafiye*, M. Yekta Saraç

-*Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, Cem Dilçin

-*Eski Türk Edebiyatı Nazım Şekilleri ve Aruz*, Haluk İpekten

-Gotara Abdurrahman Adak ya bi navê “*Aheng û Mûsîqî di Helbestên Melayê Cizîrî de*”.

Ji bo hunerên edebî jî ev xebat ji me re bûn çavkanîyên sereke;

-*Klasik Edebiyat Bilgisi Belagat*, M. Yekta Saraç

-*Açıklamalar ve Örneklerle Edebi Sanatlar*, Numan Külekçi

-*Açıklamalı Edebi Sanatlar*, İsa Kocakaplan

Di beşa sêyem de ji bo metna rexneyî, nusxeyên dîwanê yên destxet, matbû û hin berhevokên destxet û matbû ji me re bûn çavkanî. Çavkanîyên destxetên Heyderî “HDM” û destxetên Mela Diyaîn ku “NMD1”, “NMD2”, “NMD3” sê heb in û ya matbû ku dîsa bi amadekarîya wî ji weşanên Nûbiharê derketiye ji me re bûn çavkanîyên sereke. Mecmûeya Mela Evdilwehabê Cibilgrawî “MMEC” ya destxet û berhevokên; Dîwana Camî‘ ya Ehmed Hilmîyê Koxî “DCEHK”, Diwana Camî‘a ya Mihemed Şêxmûsê Botî “DCMŞB” jî ji me re bûn çavkanîyên alîkar.

II. KURTENÊRÎNEK LI SERDEMA HEYDERÎ

Di tarîxa edebiyatê de, ji bo ku jîyan, kesayetîya edebî û berhemên nivîskar an helbestvanekî xweş bîn fêmkirin, pêwistî bi fîkr, raman, çand, siyaset, bûyer û rewşa serdema ku edîb tê de jîyaye heye. Lewra helbestvan jî mirovên ji nava civakê ne û biqasî bandora wan li ser civakê heye, ewqas jî bandorê ji civaka ku tê de ne werdigirin. Heyderî helbestvanek di Sedsala XXan de jîyaye. Her çiqas serdema ku tê de jîyaye, serdemek modern be jî helbestvanîya xwe bi şêweza Edebiyata Klasîk domandiye. Heyderî helbestvanekî bizava Xalidîtiyê ye. Ev bizav piştî avabûna Komara Tirkîyeyê kêmbandor mabe jî bandora wê li ser hin helbestvanan berdewam kiriye. Ji ber ku Heyderî helbestvanekî ekola Xalidîtiyê ye, em pêşî li ser serdema Xalidîyan, rewşa Kurdan bi giştî ya wê demê û ji bo sebebên bihêzbûna Xalidîyan jî bîn fêmkirin, em li ser serdema berî wan û rewşa wê demê rawestîyan. Heyderî, ji ber ku di serdema Komara Tirkîyeyê de hatiye dinyayê em li ser rewşa Kurdan a di wê serdemê de jî rawestîyan. Heyderî demekê li Sûrîyeyê jî maye û perwerdehî li medreseya Xeznewîyan dîtiye û bûye endamê terîqeta Xeznewîyan ku terîqeteke

Neqşebendî/Xalidî ne. Ji bo serdema Heyderî ya li Sûrîyeyê, li medreseya Xeznewîyan û têkiliyên wî yên bi terîqeta Xeznewîyan re bî fêmkirin em li ser, Sedsala XXan rewşa Kurdan a li Sûrîyeyê û li ser terîqeta Xeznewîyan rawestîyan.

A. Bi Awayekî Giştî Rewşa Kurdan a Berî Serdema Heyderî

Di Dawîya Serdema Mirnîşînîyan de Rewşa Kurdan

Di sedsala XIIan de, anko piştî rûxandina dewleta Ebasîyan, ji alîyê rewşa Kurdan a siyasî ve serdemeke nû dest pê kir ku ev serdem wek serdema mîrektîyan tê binavkirin. Di destpêka vê serdemê de cara ewil li cihên wekî Hekkarî, Cizîr, Amêdîyê û Erdelanê û piştî wan jî li cihên wekî Bedlîsê, Bazîdê, Miksê, Hîzanê, Şêrwanê û Gêlê mîrektîyên Kurdan avabûn. Ev mîrektî heta bi nîvê sedsala XIXan desthilatdarîya wan berdewam kiriye.¹

Kurd, di serdema Osmanîyan de hê di serî de wan û dewleta Osmanî li ser hin esasan li hev kiribûn û herêma Kurdan careke din ji dagirkirina dewleta Sefewîyan rizgar kiribûn. Lewra di şerê navbera siltanê Osmanî, Yawuz Selîm û Şah Îsmailê serekê Sefewîyan de bi alîkarîya Kurdan, dewleta Osmanî bi ser ket û bi serperîştîya Îdrîsê Bidlîsî di navbera mîrê Kurdan û dewleta Osmanî de lihevkirinek hat kirin. Li gorî lihevkerinê, wê Kurd di nav xwe de xweser bin lê di polîtîkayên derve (navdewletî), çî siyasî çî leşkerî, wê bi Dewleta Osmanî re bin. Piştî mirina Siltan Selîm têkilîya Kurdan û Osmanîyan dewam kiriye. Gava Siltan Silêman ji bo fetihkirina Îranê di Kurdistanê re derbas bûye ji bo şêwrê û tecrubeyên wan ên di derbarê sefawîyan de sûdê werbigire ji mîrên Kurdistanê bi taybetî jî ji Cemşîd Beg agahî wergirtiye.² Di serdema mîrên Kurdan de her çiqas herem ji alîyê siyasî ve aram bûbû, ji alîyê medenî ve jî bi pêş ketibû. Mîrekên Kurdistanê ji bona ku burakrat, teknokrat, serdar, dîplomat, dîroknas, stêrnas, bînasaz, mihendîz, bizîşk, qazî, hunermend, ‘alîm, mela, xetîb, wezîr û ronakbîran bigihîne li navendên bajaran,

¹ Abdurrahman Adak, **Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk**, Çapa 2. weş. Nûbihar, Stenbol 2014, r. 191.

² Şerefhan Bitlisi, **Şerefname Kürt Tarihi**, Cild. 1, wer. Abdullah Yeğin, weş. Nûbihar, Stenbol 2016, r. 231.

bi hemû ilmên hemdemê welatîyên xwe perwerde dikirin.³ Di vê serdemê de ji bo geşbûna edebiyata Kurdî faktora herî girîng hebûna medreseyan bû. Medreseyên li seranserê Kurdistanê, cihên sereke yên perwerdehî û zanistê bûn. Li her navendek mîrnişîn, medreseyek mezin, navendî hebû. Di van medreseyan de zimanê perwerdehîyê Kurdî bû. Medreseyên navdar ên wê demê li Cizîrê Medreseya Sor li Amêdiyê Medreseya Amêdiyê, li Mîksê Medreseya Mîr Hesenê Welî, li Licê Medreseya Wefîq Ehmed Beg, li Bazîdê Medreseya Sînaniyê û hwd.⁴

Ev aramî û pêşketina herêma Kurdan heta ku mîrên Kurdan ji holê rabûn berdewam kir. Kurdistan, berî dewleta Osmanî û piştî tifaqa bi Osmanîyan re hat kirin jî ji alîyê xanedanên Kurdan ve dihat birêvebirin û di gelek alîyan de jî xweser bûn. Lê di Sedsala 18 û 19an de qontrola merkezî ya Osmanîyan lawaz bûbû. Siltan Mehmûdê II. (1808-1839) ji tîrsa Ewropîyan, mecbûr ma ji bo xurtkirina navendê hin reformên eskerî, îdarî bide destpêkirin. Di vê çarçoveyê de li şûna mîrên Kurdan ji navendê walî hatin tayînkirin.⁵ Piştî ku Siltan Mehmûdê II. Mîrekên Kurdan ji holê rakir li herêma Kurdan tevlihevî, bêaramî zêde bû. Li gelek cihan, mîran li gorî hêza xwe li hemberî vê fermanê serî hildan. Li mîrektîya Baban Evdîrehman Paşa, li mîrektîya Rewanduz-Soran Mihemed Paşa, li Amêdiyê Smeil Paşa, li Mîksê Mehmûd Xan li Xerzan û Şengalê jî Êzîdî Serî hildan. Lê hemû serhildan ji alîyê dewleta Osmanî ve hatin şikandin. Di salên 1843-1847an de serhildanek mezin ji alîyê mîrê Botan Mîr Bedîrxan ve li hember dewleta Osmanî hat lidarxistin û heta sala 1847an şer di navbera dewleta Osmanî û hêzên mîr de berdewam kir.⁶ Piştî Mîr Bedîrxan, her çiqas hin tevgerên bîçûk çêbûbûn jî êdî bi tevahî dema mîran bi dawî bû. Di encamê de li herêma Kurdan ji alîyê rêveberîyê ve valahîyek derket holê.

Di serdema Xalidîyan de Rewşa Kurdan

Bizava Xalidîyê bizavek e dînî/tesewîfî ye û şaxeke terîqeta Neqşebendîyê ye. Her çiqas hebûna Neqşebendîyan li herêma Kurdan ji kevin de hebe jî piştî Mewlana Xalidê Şarezorî, zêdetir belav bûye. “Her çiqas Osmanîyan di vê serdemê

³ Şakir Epözdemir, **Medreseyên Kurdistanê di Dewra Mîran û Neqşebendîyan de**, weş. Nûbihar, Stenbol 2015, r. 29.

⁴ Adak, **Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk**, r. 197-198.

⁵ Martin van Bruinessen, **Ağa Şeyh Devlet**, wer. Banu Yalkut, İletişim Yayınları, İstanbul 2015, r. 340.

de li hemberî Kurdan siyaseta merkezîbûnê meşandibin û di vê Çarçoveyê de eyaleta Kurdistanê ava kiribin jî ev sîstema nû ya siyasî bi ser neket û li Kurdistanê ji alîyê desthilatdarîya siyasî ve valahîyeke mezin rû da. Lê belê di vê qonaxê de di nav civaka Kurdan de bizaveke dînî/tesewîfî belav dibû ku ev bizav vê valahiyê bi tevahî dadigire. Ev bizav jî ‘Neqşebendîya Xalidî’ ye ku di dawîya mîrektîyan de ji alîyê Mewlana Xalidê Şarezorî ve li Silêmanîyê hatiye damezirandin. Xalidîfî bi taybetî bi rîya tekyayên Tewîle/Beyare, Basret, Nehrî û Palo wek tevnekê li seranserê Kurdistanê belav dibe û li her devereke Kurdistanê nûnerên (xelîfeyên) ku bi van şaxan ve girêdayî derketin meydana. Dema ku dawî li mîrektîyên Kurdan hat, ev bizav ji xwe li Kurdistanê belav bûbû, lêbelê dawîlêhatina mîrektîyan û alozîyên civakî pêşîya wê bêtir vekir û ji bo belavbûneke zêdetir bidestxistina hêzeke mezintir şert û mercên guncaw çêbûn. Xalidîfîyê, bi rîya van tekyayan ji nêveka sedsala XIXem heta bi dawîlêhatina Dewleta Osmanî (1826-1923) li Kurdistanê desthilatdarîyeke dînî, perwerdeyî, civakî û siyasî bi dest xistiye.”⁷

Her çiqas Xalidîfî bizaveke dînî/tesewîfî be jî di serdema ku endam û şêxên wan tê de jiyane di navbera çardîwarên mekanên dînî de nemane. Di nava civakê de bûne rêvebirên dînî, siyasî û di heman wextê de li hember tevgerên emperyalîst û polîtîk ên Ewropî jî bûne muceddîd û têkoşer. Bo mînak, xelîfeyê Mewlana Xalidê Şarezorî, Osman Sîracedîn Tawilî (k.d.1866) yek ji wan kesan e ku li hember van polîtîkayan mucadele kiriye.⁸ Di Şerê Cihanê yê Yekem de (1914-1919) serekê terîqeta Neqşebendîyan Şêx Necmedîn, li hember leşkerên Rûsan ên ku êrîşî erda Kurdistanê kiribûn, cîhad îlan kiriye û li hember wan şer kiriye.⁹ Xalidîfîyên Neqşebendî, xwedî taybetmendîyek şoreşvanî ne. Şêx Ubeydullahê Nehrî, Şêx Evdilselam Berzanî, Şêx Seîdê Pîranî û gelek şêx û rêberên din jî ku ji serhildanên Kurdan re serokatî kirine Xalidî ne.¹⁰

⁶ Altan Tan, **Kürt Sorunu**, Timaş Yayınları, İstanbul 2010, r. 92, 93.

⁷ Abdurrahman Adak, “Serdema Xalidîfîyê di Tarîxa Edebiyata Kurdî Ya Klasîk de”, **Kürt Tarihi**, j. 30, r. 59.

⁸ Ali Tenik, **Tarihsel Süreçte Kürt Coğrafyasında Tasavvuf ve Tarikatlar**, weş. Nûbihar, Stenbol 2015, r. 89.

⁹ Muhammed Rauf Tavakkoli, **Kurdistan Tasavvuf Tarihi**, wer. Mehmet Polat, weş. Hîvda, Stenbol 2010, r. 16.

¹⁰ Kadri Yıldırım, **Kürt Medreseleri Ve Âlimleri (Tekellere Bağlı Medreseler Cilt 2)**, weş. Avesta, Stenbol 2018, r. 215.

Xalidî li herêma Kurdan, her wekî di warê siyasî û dînî, xwedî bandor bûn di warê hiqûqê de jî bûbûn tekane navend. Di nav civakê de çi pirsgerêkên hiqûqî çêbibûna diçûn ba şêx û melayên Xalidî yên ku li herêmê bi nav û deng. Xalidîyan, Pîştî mîrekan, erka perwerdehîya herêmê jî wergirtibûn ser xwe. Her çiqas Xalidî bizaveke terîqetî be jî endamên wê girîngî dane ilm û tadrîsatê jî. Di medreseyên wan de pergala perwerdehîyeke ilmî û tesewîfî bi hev re heye. Mûcidê vê pergalê Mewlana Xalid e. Loma jê re “zulcenaheyn” tê gotin. Şêx û xelîfeyên Xalidî çûbin kîjan deverê li wê deverê medreseyek jî ava kirine û carinan jî li mescîd û camîyên gundan hem ilmên dînî û hem jî ilmên tesewîfî dane.

Pîştî mîrekên Kurdan edebiyata Kurdî ya klasîk li nav medreseyên Xalidîyan şax da. “Di vê pêvajoyê de wêjeya klasîk bêtî hamî û patron ma, ji serayan vekîşîya, di ocaxên şêxan û medreseyan de bi şêweyeke din hat honandin.”¹¹ Bandora Xalidîtiyê li ser zimanê Kurdî jî merhaleyeke girîng e. Medreseyên Xalidî zimanê Kurdî jî di demekê de parastine. Lewra di medreseyên Xalidîyan ên Kurdistanê zimanê perwerdehîyê her dem Kurdî bûye. Bi dehan pirtûkên dersan hatine amadekirin. Bi dehan Seyda û melayan bi Kurdî helbest nivîsîne. Xaleke din jî ew e ku bi dehan klasîkên Kurdî (destnivîsên Kurdî) ji ber eslên wan zêde kirine.¹² Di vê qonaxê de, bereksê qonaxên berî wê helbestvanên pêgirtîyên terîqetên tesewîfî zêde bûne. Şêx Nûredînê Birîfkanî, Şêx Ehmedê Feqîr û Mela Xelîlê Sêrtî endamên terîqeta Qadîrî bûn. Siyahpoş, Pertew Beg û Weda’î jî endamên terîqeta Neqşebendî/Xalidî bûn.¹³

Pîştî mîrekên Kurdan ji holê rabûn, her ku çû Xalidîyên Neqşebendî li herêma Kurdan bi hêztir bûn. Ewqas bi hêz bûbûn ku Şêx Ubeydullahê Nehrî yê ku şêxekî Xalidî bû, siltan Evdilhemîd ew vexwendîye serayê û wî bi xelat kiriye. Dîsa di şerê 1877-1878an yê Osmanî û Rûsan de, şerkirina Şêx Ubeydullah li hember Rûsan û serhildana ku di 1880yê de li hember rêvebirîya Osmanîyan dabû destpêkirin jî mirov dikare di vê çarçoveyê de binirxîne.¹⁴ Geşedanên di vê serdemê (1926-1932) di warê

¹¹ Mela Beşîrê Bedewî, **Dîwana Dahî**, amd. Tehsîn Îbrahîm Doskî, weş. Nûbihar, Stenbol 2012, r. 16.

¹² Sedat Ulugana, “Kurteçîroka Xelîfeyên Neqşebendîyên Xalidî Sedsala 19 û 20an”, **Nûbihar**, c. 17, r.14. ; Zeynelabidîn Zinar, “Di Medreseya Kurdî de Şaxên Zanistiyê”, **Nûbihar**, c. 14, r. 58.

¹³ Adak, **Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk**, r. 311.

¹⁴ V. Minorsky, Th. Bois, D.N. Mac Kenzie, **Kürtler & Kürdistan**, 2. Baskı, weş. Doz, Stenbol 2014, r. 100.

siyasî, civakî û çandî ku li dewleta Osmanî çêdibûn, wek; “Fermana Tanzîmatê”, Meşrûtiyetên I.em û II.em û modernîteya Ewropî bandor li Kurdan jî kir. Bi taybetî piştî Meşrûtiyetê û pê ve li nav xwendekar û rewşenbîrên Kurdan ên li Stenbolê fikra netewî xurt bûbû. Di vê çarçoveyê de ji aliyê Kurdan ve komeleyên wek; “Cemîyeta Kurd Teawûn û Tereqqî”, “Cemîyeta Telebeyên Kurd-Hêvî”, “Cemîyeta Tealî Kurd” hatin avakirin. Di vê serdemê de serhildana Bedlîsê (1913) û serhildana Berzanî (1914) jî nîşan didin ku êdî di nav şêxên Xalidîyan de jî pêlên Kurdayetîyê dest pê kiriye.

Piştî 1923yan Komara Tirkîyeyê hat avakirin û pê ve her ku çû bandora Xalidîyan li herêmê kêmtir bû. Bi dawîlêanîna serhildana Şêx Seîd û dardekirina wî û 46 hevalên wî bandora Xalidîyan ya siyasî li herêmê bi dawî bû.

B. Di Serdema Komara Tirkîyeyê de Rewşa Kurdan a Giştî

Piştî şerê Cihanê yê Yekem rewşa dewleta Osmanî gelekî xirab bûbû. Tenê herêma Enedolê û herêma Kurdan di dest wan de mabûn ku ew jî gelek cih ji aliyê dewletên Koma Îxtîlafê ve hatibûn dagirgirin. Piştî Mistefa Kemal di Gulana 1919an de hat bajarê Semsûnê, konseptek nû da destpêkirin. Di çarçoveya vê konseptê de gelek Kurd jî hebûn. Di vê çarçoveya de Kurd ji bo kongreyên ku li Erzirom û Sêwasê hatine lidarxistin hatin vexwendin.¹⁵

Di sala 23yê Nîsana sala 1920an de li Enqereyê meclîs hat vekirin û dîsa vê meclîsê Qanûna Bingehîn a 1921ê pesend kir. Di Qanûna Bingehîn a 1921ê de, di xala 21ê de ji bo herêma Kurdan xweserî (otonomî) dihat nîşandayîn.¹⁶ Piştî ku Kurd û Tirk bi hev re şerê li Enedolê hat kirin bi serkeftî encam dan, Îsmet İnönü ji bo Kurd û Tirkan xwe tekane nûner da pesendkirin û beşdarî konferansa Lozanê bû. Di konferansê de piştî nîqaşên dûr û dirêj li ser gelek xalan lihevkerin derket holê û di 24ê Tîrmeha 1923yan de Peymana Lozanê hat îmzekirin.¹⁷ Piştî peymanê di demeke kurt de 29ê Cotmeha 1923yan de Komara Tirkîyeyê bi fermî hat îlankirin. Piştî

¹⁵ Tan, **Kürt Sorunu**, r. 168.

¹⁶ Uğur Mumcu, **Kürt İslam Ayaklanması 1919-1925**, 11.baskı, Tekin Yayınları, İstanbul 1993, r. 48.

îlankirina komarê di 3yê Adara 1924an de xîlafetî ji holê hat rakirin û xelîfe Evdilmecîd ji welêt hat bidûrxistin. Di 20ê Nîsana 1924an de “Qanûna Bingehîn a 1924”an li meclîsê hat pesendkirin.¹⁸ Di meclîsê de roja rakirina xîlafetê (3 Adar 1924) “Qanûna Tewhîdê Tedrîsatê” û “Wekaleta Şer‘îye û Ewqafê” jî hatin pejirandin.¹⁹

Serdema Serhildanên Kurdan

Piştî ku Peymana Lozanê hat îmzekirin, xelîfetî û Qanûna Bingehîn a 1921ê ji holê hat rakirin Kurd bi siyaset û polîtîkayên nû rû bi rû man. Piştî van guherînan di sala 1924an de ji alîyê hin sûbay û siyasetmedarên Kurd, Komeleya Azadî hat avakirin. Di demeke kurt de di 24ê Çileyê Pêşîn a 1924an de bi emrê desthilata Enqereyê, Xalid Begê Cibrî û (1882-1925) Yusif Zîya Beg (1882-1925) hatin girtin û di demeke kurt de hatin dardekirin.²⁰

Şêx Seîd (1865-1925), piştî ku kurê wî Elî Riza (1894-1970) ji hevdişîna li Stenbolê bi Seyîd Evdilqadir (1851-1925) re kiribû li Şavşarê hatin ba hev û di 13yê Sibata 1925an de bi qafîleyek girseyî hatin mala birayê xwe Evdirrehîm (k.d. 1938) ya li Pîranê. Cendermeyên ku heta gund qafîle dişopandin îdda dikirin ku di nav qafîleya wan de du kesên firarî yên mehkûm hene û divê bîn teslîmkirin. Hişyarîyên Şêx Seîd çare nekirin, gengeşî di navbera gelê gund û leşkeran de derket. Di encamê de du leşker birîndar bûn. Di raporên sererkantîyê de tîndarîyên ku piştî van bûyeran xetên telgraf û telefonan jî hatine birrîn û serhildan pêşwext dest pê bûye.²¹ Piştî bi vî bûyera li Pîranê, serhildan dest pê kir û êdî ji vir û pê ve Şêx Seîd li gund û eşîran gerîya, ji hinekan re jî name şand da ku tevî serhildanê bibin. Her diçû serhildan berfirehtir dibû. Di 26-27ê Sibata serhildêrên Kurd Erxenî, Palo, Pîran û Elezîzê wergirtin. Di heman wextê de li herêmên Diyarbekir, Bîngol, Mêrdîn, Wêranşar, Licê, Siwereg, Sîlwan, Mûş û Serhedê jî şer dest pê kir û her ku çû berfirehtir bû. Piştî 10ê Adarê leşkerên Şêx Seîd, Sîlwan, Hezro, Erxenî wergirtin û

¹⁷ Sina Akşin, Cemil Koçak, Hikmet Özdemir, Korkut Boratav, Selahattin Hilav, Murat Katoğlu, Ayla Ödekan, **Türkiye Tarihi 4 Çağdaş Türkiye Tarihi 1908-1980**, Cem Yayınları, İstanbul 2000, r. 113.

¹⁸ Akşin, Koçak, Özdemir, Boratav, Hilav, Katoğlu, Ödekan, h.b., r.137.

¹⁹ Şaban İba, **Kürt İsyanı ve Kemalist İktidar**, Weş. Aram, Stenbol 2013, r. 17.

²⁰ Tan, **Kürt Sorunu**, r. 207.

²¹ İba, h.b., r. 32.

berê xwe dan Sêwregê. Piştî Bîngol û Gêxiyê jî wergirtin berê xwe dan Bulanix û Melazgîrê. Bi serokatîya Şêx Seîd Diyarbekir jî hatibû dorpêçkirin û du caran êrîşî ser sûran kiribûn. Di êrîşa duyem ku di 11yê Adarê de bi ser neketin hêzên Şêx Seîd bi paş de vekîşîyan. Ji vê bûyerê û pê ve her ku çû bajar û bajarokên ku hêzên Şêx Seîd bi dest xistibûn ji alîyê leşkerên desthilatê ve dîsa hatin wergirtin. Şêx Seîd û yê pê re biryar dan ku derbasî Îranê bibin. Li Mûşê gava dixwazin Çemê Mûradê derbas bikin di 15ê Nîsana 1925an de wan desteser dikin û di 5ê Gulana 1925an de wan tûnîn Diyarbekirê.²²

Piştî serhildan hat şikandin li herêmê bêhna mirinê kêmbû. Ên ku beşdarî serhildanê bûbûn, nebûbûn herkesî ji kirinên piştî serhildanê para xwe girt. Hê wexta serhildan berdewam bû di meclîsê de di 4ê Adara 1925an de qanûna awarte, “Teqrîrî Sukûn” hat pesendkirin ku heya 4ê Adara 1929an berdewam kir. Di çarçoveya vê qanûnê de Partîya Komarî ya Teraqî Perwer jî hat girtin.²³ Di çarçoveya Teqrîrî Sukûn de Dadgehên Îstîqlalê hatin damezirandin û di 29ê Hezîrana 1925an de bi biryara Dadgeha Îstîqlalê Şêx Seîd û 46 hevalên wî hatin dardekirin. Di biryara 28ê Hezîranê ya Dadgeha Îstîqlalê, girtina tekya û dergahên li herêmê jî hebû ku di 30ê Kasima heman salê de qanûna giştî ya ji bo tekya û zawîyeyan jî hat pesendkirin.²⁴ Dîsa bi qanûna “Îskana Mecbûrî” gelek malbat û eşîrên herêmê ber bi bajarên Rojavayê Tirkîyeyê hatin muhacirkirin. Ji xwe gelek rewşenbîr û kesên ku keys pê xistibûn çûbûn Sûrîyeyê di bin rêveberîya Frensîyan de.²⁵

Di 24ê Îlona 1925an de ji alîyê encumena hatibû erdarkirin ku ji wezîrê karên derve, wezîrê dadê, serokê sererkanê giştî yê duyem û parlementerekî pêk dihat,²⁶ “Plana Îslehkirina Şerqê” hat amadekirin. Di vê bernameya islehkirinê de ev xalên berbiçav hebûn; muhacirkirina malbatên beşdarî serhildanê bûne, qedexekirina zimanê Kurdî, Tirk û Ernavutên ku ji Yugoslavyayê hatine, bicihkirin wan li

²² Tan, **Kürt Sorunu**, r. 211. ; Yunus Demir, “**Diwana Nami (Fehmî Begê Pêçarî, Mexmuru’ d-dewawîn**” (Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Artûkluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê, Mêrdîn, 2019), r. 13-14.

²³ Tan, **Kürt Sorunu**, r. 243-244.

²⁴ İba, h.b., r. 138.

²⁵ Bekir Biçer, **Kürt Tarihinin Kaynakları ve Kürdoloji Çalışmaları**, Çizgi Kitabevi, İstanbul 2017, r. 223.

²⁶ Wezîrê karên derve; Cemîl Uyabdin (1880-1957), wezîrê dadê; Mehmûd Esat Bozkurt (1892-1943), serokê sererkanê giştî yê duyem; Kazim Orbay (1886-1964), parlementer; Abdulhalik Renda (1881-1957).

herêmên wek; Diyarbekir, Elezîz, Mûş Wan û Xerzanê, Tirkkirina Kurdan, vekirina “Ocaxên Tirkan” û dibistanan û hwd.²⁷

Serhildanên Kurdan yên ji sala 1925an heta 1938an wek berdewamîya Serhildana Şêx Seîd in. Lewra piştî zor û zehmetiyên piştî serhildanê endamên komele, partî, rewşenbîr û welatperwerên Kurd derbasî Sûrîyeyê û Lubnanê bûbûn. Ji organîsasyon, hevdîtin û bernameyên van rewşenbîran di 3yê Cotmeha 1927an de Rêxistina Xoybûnê derket holê û Celadet Bedirxan (1893-1951) bû serokê rêxistinê.²⁸ Rêxistina Xoybûnê, bi organîzasyonek rêk û pêk hatibû avakirin. Serhildana Agirîyê ku wê çar salan berdewam bike ji alîyê vê rêxistinê ve dihat birêvebirin. Her çiqas serhildêrên di bin rêbertîya Îhsan Nûrî Paşa (1893-1976) de ber xwe didan, di demekê de Çiyayê Agirî xistibin bin qontrola xwe jî piştî ku ji alîyê artêşê ve bi girseyeke mezin çiya hat dorpêçkirin û bi balafiran çiya hat bomberankirin serhildan ber bi şikestinê ve çû. Ku serhildan li herêma Gelîyê Zîlan berbelav bû bîlançoya kuştîyan jî giran bû. Li gor daneyên rojnameya nîv-resmî ya dewletê, Rojnameya Cumhuriyetê hejmara 16ê Tîrmeha 1930î, hejmara kuştîyan ji 15 hezarî zêdetir bûn.²⁹ Piştî şikestina Serhildana Agirîyê ji bo polîtîkayên dewletê di derbarê Kurdan de bêne kirin bi daxwaza Mistefa Kemal (1881-1938), ji alîyê serokwezîr Îsmet İnönü (1884-1973) ve geşte li herêma Kurdan hat lidarxistin û piştî vê geşte raporek bi navê “Raporta Seyaheta Şerqê” hat amadekirin. Ev rapor di civîna wezîran de ji Mistefa Kemal re hatiye pêşkêşkirin. Di vê çarçoveyê de hin biryar hatine wergirtin ku yek ji wan Îşkankirina Kurdan e.³⁰ Di salên 1930î de serdema Partîya Gel a Cumhuriyetê ku heta piştî Şerê Cîhanê yê Duyem jî wê dewam bike, dest pê kir. Di vê serdema yekpartîyî de zimanê Kurdî her qedexa bûye. Gelek Kurd ji cihê xwe hatin derxistin û ji alîyê rêvebirîyê ve hatine înkarkirin.³¹

Di sala 1937an de guhertin di qanûna bingehîn de hat kirin û 6 rêgezên Partîya Gel a Cumhûriyetê jî ketin nav qanûnê. Bi vî awayî bîrdozîya partîyê bû

²⁷ Mehmet Bayrak, “Kürdlere Vurulan Kelepçe Şark Islahat Planı” **Kürt Tarihi**, j. 10, r. 32-34.

²⁸ İba, h.b., r. 299-311. ; Tan, **Kürt Sorunu**, r. 292-293.

²⁹ Sedat Ulugana, **Ağrı Kürt Direnişi ve Zilan Katliamı**, Pêri Yayınları, İstanbul 2012, r. 161.

³⁰ Bayrak, h.b., r. 37.

³¹ Ercan Çağlayan, “1923-1950 CHP ve Kürtler”, **Kürt Tarihi**, j. 6, r.38.

bîrdozîya fermî ya dewletê.³² Di salên 1937-1938an de li Dersimê bi rêbertîya Seyîd Riza (1863-1937) serhildanek pêk hat. Piştî serhildan hat şikandin, Seyîd Riza û hin kesên pê re hatin dardekirin. Piştî wî ji bo tolhildanê hin eşîrên din jî serî hildan, lê di demekê de ev serhildanên eşîran jî hatin şikandin.³³ Lê piştî van bûyeran li herêma Dersimê bi hezaran însan hatin kuştin û bi hezaran jî hatin muhacirkirin.³⁴

Piştî Serhildanan Rewşa Kurdistan

Bi mirina Mistefa Kemal 11ê Mijdara 1938an Ismet İnönü bû serokkomar. Di 26ê Çileyê Pêşîn ya heman salê de di civîna Partîya Gel a Cumhûriyetê de guhertinek hat kirin û ev guhertin di meclîsê de jî hat pesendkirin. Li gorî vê Ismet İnönü herdem tekane serokê partîyê ye. Bi vî awayî serdema Şefê Millî dest pê kir û hetanî sala 1950yê berdewam kir. Di vê serdemê de Şerê Cîhanê yê Duyem rû da û Tirkîye heta dawîya şer bi polîtîkayên otorîter hat birêvebirin.³⁵

Piştî Şerê Cîhanê yê Duyem, siyaseta dinyayê bandor li siyaseta Tirkîyeyê kir ku derbasî konaxa pirpartîtîyê bibe. Bandora siyaseta derve û hin pêwistîyên ekonomîk, bi rêbertîya Celal Bayarê ku di demek nêz de ji Partîya Gel a Cumhuriyetê veqetiyabû, di sala 1946an de Partîya Demokratê hat vekirin. Partîya Demokratê di hilbijartinên 1946an de ji 456 parlementeran 64, di hilbijartina 1950yê de jî ji 487 parlementeran 396 parlementer bi dest xistin û bûn partîya desthilatdar.³⁶ Desthilata nû ku ji Partîya Demokratê pêk dihat îcreetên ewil û yên girîng yek jê ew bû ku di 6ê Pûşperê de ji bo hêzên artêşê biryara tewsiyeyê kirin û ya duyem jî di 16ê heman mehê de qedexekirina xwendina banga bi Erebbî rakirin.³⁷

Di Gulana 1960î de ji alîyê grûbek artêşê ve li desthilata Ednan Menderes (1899-1961) darbe hat kirin.³⁸ Di encama darbeyê de serokwezîr Ednan Menderes, wezîrê karên derve Fatin Rüştü û wezîrê malîyeyê Hasan Polatkan hatin dardekirin.

³² Ahmet Kamal, **Türkiyede Çok Partili Dönemde Çalışma İlişkileri: 1920-1946**, İmge Kitabevi Yayınları, İstanbul 1999, r. 173.

³³ İba, h.b., r.156.

³⁴ Sait Özbey, **Kürtler ve İslamî kurtuluş**, Dua Yayıncılık, İstanbul 2009, r. 156-160.

³⁵ Şerafettin Pektaş, **Millî Şef Döneminde Cumhuriyet Gazetesi**, Fırat Yayınları, İstanbul 2003, r. 13-16.

³⁶ Makal, h.b., r. 456.

³⁷ Pektaş, h. b., r. 258.

Piştî îhtîlalê li herêma Kurdan jî 485 axa, şêx û rewşenbîrên ji Partîya Demokratê, yan jî nêzîkî wê, hatin desteserkirin û li Sêwazê di qampekê de hatin komkirin û piştî ji wan 55 kes hatin muhacirkirin. Piştî darbeya 60î di her çend salan de desttêwerdanek ji aliyê artêşê bûne ku hemû desttêwerdanên leşkerî xwe dispêrin darbeya 60î.³⁹ Di 1971ê de hêzên artêşê muxtirayek dan rêvebirên siyasî û di 12yê Îlona 1980yê de dîsa darbeyeke ji aliyê artêşa Tirk ve hate kirin. Piştî darbeyan li herêma Kurdan, bûyerên dijwar rû dane. Ji xwe ji avabûna komarê 1923an û hetanî darbeya 12 Îlonê her tim qedexa li ser Kurdan û zimanê wan bûye. Di hemû serdemên komarê de li ser Kurdî zext û zordarî çêbûne û gelek berhemên klasîk hatine şewitandin yan jî texrîbkirin. Wek mînak, Şêx Hesîbê Axtepî (k.d.1947) sê pirtûkên Kurdî nivîsîne. Yek jê ew dîwana wî ya ku niha li ber destan heye lê dîwaneke wî û pirtûka wî ya bi navê “*Simbil*” di sala 1971ê (îdara leşkerî) de bi destên leşkeran hatine şewitandin.⁴⁰

Helbestvanê me Mihemed Emîn Heyderî çavên xwe di serdemeke bi gengeşî li dinyayê vekiriye (1927). Li herêmê bi gelek guherînên girîng çêbûne. Piştî rûxandina dewleta Osmanî dewleta Komara Tirkîyeyê ava bûye, xelîfetî hatiye rakirin, medrese û tekya hatine qedexekirin. Heyderî, piştî serhildana Şêx Seîd şikestibû û serhildana Agirîyê dest pê kiribû hatiye dinyayê. Di serdema zarokatîya wî de çand û zimanê Kurdî jî hatibû qedexekirin. Heta 10 salî li ba bavê xwe perwerde bûbû. Piştî wefata bavê wî tekane çare ew bû ku derbasî Rojava bibe da ku perwerdehiya medreseyê bibîne. Heyderî heta sala 1951ê li Rojava maye. Piştî ku li Tirkîyeyê desthilat guherî, banga bi Erebî serbest bû û di siyasetê de jî hin nermayî çêbûn. Heyderî piştî van guherînên siyasî berê xwe daye welatê xwe û heta dawîya temenê xwe li cihên cur bi cur bi ilm û tadrîsê re mijûl bûye.

³⁸ İlber Ortaylı, İsmail Küçükkaya, **1923 Cumhuriyetin ilk yüz yılı 2023**, Timaş Yayınları, İstanbul 2012, r. 192

³⁹ Abdurrahman Dilipak, **İhtilaller Dönemi**, Beyan Yayınları, İstanbul 1991, r. 64.

⁴⁰ Şêx Hesîb Axtepî, **Dîwana Şêx Hesbî**, wer. Zeynelabidîn Zinar, Weşanên Doz, Stenbol 2009, r. 13.

C. Di Sedsala 20an de li Sûrîyeyê Rewşa Kurdan

1. Rewşa Siyasî

Kurd, ji dîroka kevin de li Sûrîyeyê dijîn û bêhtir li herêma bakurê Sûrî niştecih in ku ev herêm wek herêma Kurdan tê naskirin. Kurd, li Sûrîyeyê ji xeynî herêma Kurdan li bajarên wek, Şam û Helebê jî bi hejmareke zêde niştecih in.⁴¹ Suriye heta Şerê Cîhanê yê Yekem di bin rêveberîya Osmanîyan de bû lê piştî Şerê Cîhanê yê Yekem Frensîyan erda Sûrîyeyê bi fîlî dagir kirin. Îngîlîzan, li alîyekî bi eşîrên Erebe re hevdîtin pêk dianîn û wehdên serxwebûnê ku bi şertê li hember Osmanîyan serî hildin didan. Li alîyekî din jî wan û Frensîyan di 16ê Gulana 1916an de Peymana Sykes-Picot îmze kirin ku di vê lihevkerinê de Lubnan û Sûrîye bû kolonyala Frensîyan.⁴²

Frensîyan, piştî dagirkirina Sûrîyeyê, şerê cîhanê û Peymana Sykes-Picotê di sala 1920an de rêveberîya xwe li Sûrîyeyê îlan kirin. Piştê di sala 1921ê de ji bo sînorê Sûrîye-Tirkîyeyê di navbera Komara Tirkîyeyê û Frensîyan de Peymana Enqereyê (1921) hat îmzekirin.⁴³ Ji sala 1920an heta sala 1946an hêzên Frensîyan li Sûrîyeyê mane û Sûrîye ji alîyê wan ve hatiye birêvebirin. Di vê serdemê de piranîya Kurdan, bi eşîrên Ereban re li hember Frensîyan tevgerîyane. Di vê serdemê de rewşa Kurdan kêmtir zêde wek ên cîranên derdorê bû. Lê dîsa jî ji şert û mercên li Tirkîye, Îran û Iraqê çêtir bûn. Lewra ji bo çanda Kurdî bi pêş bikeve şert û mercên nermtir hebûn.⁴⁴ Piştî têkçûna serhildana Şêx Seîd, zext û zorên li herêma Kurdan ya Bakur zêde bûbûn û Sûrîyeyê di bin desthilatîya Frensîyan de cazîbedar bûbû. Bi vê sedemê gelek Kurd, Ermenî û Suryanîyên derdora Mêrdîn, Nisêbîn, Midyad, Diyarbakir, Batman û Şirnexê derbasî Bakurê Sûrîyeyê dibûn û li herêma Cizîrê bi cih dibûn.⁴⁵

⁴¹ Mihemed Emîn Zekî Beg, **Dîroka Kurd û Kurdistanê**, weş. Avesta, Stenbol 2012, r. 41.

⁴² Ali Demirel, "Ortadoğu'da Fransız Emperyalizmi: Fransız Manda Yönetimi Döneminde Suriye (1920-1946)", **Hatay Mustafa Kemal Üniversitesi Fen-Edebiyat Fakültesi Tarih Bölümü Dergisi**, 2019, r. 72,73.

⁴³ A. Vahap Uluç, "Suriye Kürtleri, Türkiye Kürtlerinin Devamı", **Sosyoloji Araştırmaları Dergisi**, 2016, r. 195.

⁴⁴ Kadri Yıldırım, **Rojava Kürt Tarihi ve Coğrafyası-1**, weş. Şemal, Stenbol 2015, r. 95.

⁴⁵ Seda Altuğ, "Suriye Arap Milliyetçiliğinde Vatan ve Suriyelilik (1919-1939)", **İstanbul Üniversitesi Sosyal Bilimler Fakültesi Dergisi**, 2008, r. 84.

Piştî tîkçûna serhildana Şêx Seîd, rewşenbîrên Kurd ên ku ji kuştinê filitîn berê xwe dan Sûrîyeyê. Her çiqas li Sûrîyeyê ji alîyê siyasî ve mafê wan nedihat pejirandin jî êdî nema dikaribûn vegerîyana jî û li vir bi cih dibûn. Ev rewşenbîrana di sala 1927an de li Lubnanê civîyan û rêxistina Xoybûnê ava kirin.⁴⁶ Ev rewşenbîr di warê çand û edebiyatê de jî gelek kar dikirin. Bi pêşengîya Celadet Elî Bedirxan (1893-1951), Kovara Hewarê (1932-1943) û piştî wê jî Kovara Ronahîyê hat derxistin. Di salên 1940î de li Lubnanê ji alîyê Kamûran Elî Bedirxan (1895-1978) ve Kovara Roja Nû (1943-1946) hat derxistin. Ev kovar ji bo Tarîxa Edebiyata Kurdî gelekî girîng in. Kovara Hewarê di edebiyata Kurdî de bû ekolek ku di vê ekolê de gelek nivîskar û helbestvanên wek; Celadet Alî Bedirxan, Kamûran Alî Bedirxan, Osman Sebrî, Qedrî Can, Nûreddîn Zaza, Cigerxwîn, Ehmed Namî, Qedrî Cemîl Paşa û hwd. civîyan ser hev. Dîsa bi saya Ekola Hewarê zanyarên Frensî gihan û Kurdolojîya Frensîyan ku avakarên wê Peder Thomas Boîs, Loger Lescot û Pierre Randot in di nava vê ekolê de kemilîn.⁴⁷ Ji alîyêkî din ve jî rola hicreyên feqeyan ku ciwanên Kurd lê dixwendin jî li ser ziman û edebiyata Kurdî çêbûye.⁴⁸ Ev hicreyên dînî yên medrese û tekyayên Rojava, bûne sebeb ku edebiyata Kurdî ya klasîk jî li herêma Rojava pêşbikeve. Gelek kesên ku ji van medreseyan perwerde bûbûn wek seydayê Tîrêj, Yusif Berazî, Omerê Lalê, Seydayê Palo, Seydayê Keleş û Mela Nûrîyê Hesarî dan pê şopa Cegerxwîn û Osman Sebrî. Kesên wek Salihê Heydo, Ehmedê Şêx Salih û Mehmûdê Sebrî jî dan pê şopa yên berî xwe. Bi vî awayî edebiyata Kurdî li Rojava jî bi pêş ket. Lê qedexeyên li ser ziman û çanda Kurdî nehişt ku bêtîr fireh bibe.⁴⁹ Di sala 1945an de li Şam û Helebê li hember rêveberîya Frensîyan xwenîşandan hatin lidarxistin. Di navbera hêzên Fensî û xwenîşandanan bûyerên dijwar rû didan. Bi hişyarîya Îngîtere, rêvebirîya Frensî biryara agirbestê dan û heta Nîsana 1946an hêzên xwe bi tevahî ji nav erdê Sûrîyeyê derxistin.⁵⁰ Di serîrakerîna li hember Frensîyan de hemû pêkhatyên Sûrîyeyê bûbûn yek dest. Li

⁴⁶ Feqî Huseyin Sağnıç, **Dîroka Wêjeya Kurdî**, weş. Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2002, r. 552.

⁴⁷ Mehmed Uzun, **Kürt Edebiyatına Giriş**, 5. Basım, İthaki Yayınları, İstanbul 2007, r. 79, 80, 81.

⁴⁸ Helîm Yusif, “Wêjeya Kurdî Li Rojavayê Kurdistanê (I) –Çanda Kurdên Sûriyê–” **Nivîs**, Kovara Malpera Amûdê, j. 7. 21.08.2001.

⁴⁹ Hayrullah Acar, “Jiyan û Berhemên Mele Nûrîyê Hesarî”, **Dil Bilimleri Klasik Sorunlar–Güncel Tartışmalar**, Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları, Mardin 2018, r. 316.

Hemîd, Kiliçaslan, “Devoka Berrîya Mêrdînê”, **Kurmancî, Rojnameya Taybetî ya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê**, Bihar 2003, j. 33, r. 1.

⁵⁰ Demirel, h.b., r. 86,87.

nav Kurdan jî şêx û ‘alim tevî alîgirên xwe, ku yek ji wan ê berbiçav Şêx Ehmedê Xeznewî (1887-1950) ye, mucadele kirine.⁵¹

Li Sûrîyeyê di navbera salên 1956-1958an de gelek darbe çêbûne. Di sala 1956an de yekîtiya Îngîlîz, Îsraîl û Frensîyan, şoreşa li Iraqê, darbeya li Misrê û pêlên netewperestîya Ereban ya li herêmê, tev bûn sebeb ku di sala 1958an de “Komara Ereban ya Hevgirtî” ku ji hevgirtina Misir û Sûrîyeyê pêk dihat derkeve holê. Ji ber ku ev “Komara Ereban ya Hevgirtî” li ser esasên netewperestîya Ereban ava bûbû gelek zext û zordarî li ser Kurdan meşandin. Di vê çarçoveyê de efserên Kurd ji nav artêşê hatin avêtin, axaftin û muzîka Kurdî hat qedexekirin, rêxistin, partî û weşanên Kurdî yên siyasî, çandî tev hatin girtin.⁵² Di salên 1960 û 1961ê de desthilata Sûrîyeyê endamên partiyên Kurdan û rewşenbîrên Kurd digirtin. Nimûne yek ji wan girtîyan Mela Beşîrê Bedewî ye ku di vê serdemê de ji bo yekîtiya Kurdan ev rêzik anîne ziman:

Xortê Kurda li Sûrî

Qe hiş nayê serê we

Hemî tişta ku bûrî

Giş nayê raberê we

Çi nêzîk û çî dûrî

Nas in tev berberê we

Beroş kelî û fûrî

Cîhan tev tê şerê we⁵³

28ê Îlona 1961ê de bi darbeya Evdîlkerîm Nehlawî, Komara Hevgirtî (Misir-Sûrîye) ya Ereban ji holê rabû û “Komara Ereban ya Sûrîyeyê” ava bû. Ev desthilat jî li ser esasê netewperestîya Ereban ava bûbû. Wan jî li ser Kurdan polîtîkayên dijwar meşandin. Di sala 1962an de li Heseka ku 150.000 Kurd lê jîyan dikirin hin reform derxistin û di vê çarçoveyê de erdên Kurdan dan Ereban û li cihwarên Kurdan Ereban

⁵¹ Yıldırım, **Rojava Kürt Tarihi ve Coğrafyası-1**, r. 98.

⁵² Yıldırım, **Rojava Kürt Tarihi ve Coğrafyası-1**, r. 112.

⁵³ Mela Beşîrê Bedewî, **Gaziya belengazan Dîwana Bêxew**, amd. Tehsîn Îbrahîm Doskî, weş. Nûbihar, Stenbol 2013, r. 18, 19.

bi cih kirin.⁵⁴ Di sala 1963an de Elbay Herîrî darbeyek pêk anî û Partîya Be'es kir desthilat. Partîya Be'es, rêgeza wê ya sereke ew e ku ne bi awayê Marksîstî, lê bi netewperestîya Pan-Erebî, sosyalîzm û reformên civakî, pergaleke laîkî ava bike.⁵⁵

Di serdema Partîya Be'es de ji salên 1960î hetanî sala 1976an ku serdema Hafîz Esad jî di nav de ye li herêma Kurdan polîtîkayên Erebkirinê hatin meşandin. Di vê çarçoveyê de li ser sînora 40 "gundên model" ku ji malbatên Ereban pêk dihatin bi cih kirin. Di navbera Qamişlo û Dirbêsiyê de jî di çarçoveya "Kembera Erebî (al-hîzam al Arabî)" 7 gund hatin avakirin. Di çarçoveya vê projeyê de desthilata Sûrîyeyê erd û malên Kurdan ji dest wan derxistiye û Erebên ku ji herêma Reqayê anîne, li vir bi cih kirine mal û milkên Kurdan jî li wan par ve kirine.⁵⁶

Ji ber sedemên me li jor behs kirin û gelek sedemên din heta niha jî edebiyata Kurdî li Rojava weke bizaveke edebî pêş neketiye. Lê dîsa jî hin helbestvanên wek Ehmedê Huseynî, Tengezarê Marînî di helbestê de, hin nivîskarên wek Helîm Yusif, Fewaz Husên, Jan Dost di romanê de hin zimanzan û lêkolînerên wek Deham Ebdulfettah, Berzo Mehmûd û Dewrêşê Xalib di warê ziman de û hin lêkolînerên wek Mehmûd Sebrî, Dr. Ebdulmecîd Şêxo, Heyder Omer û Konê Reş jî di warê lêkolînvaniyê de nivîs û berhemên cur bi cur dane.⁵⁷

2. Nêrîneke Giştî li Terîqeta Xeznewîyan

Paşxaneyê Terîqeta Xeznewîyan

Terîqet, di zimanê erebî de rê ye. Di tesewifê de terîqet: riya ku digihêje Xweda ye.⁵⁸ Di terîqetê de ji bo mirovek xwe bigihîne Xweda şert e bi rêbertîya şêxekî ve di hin rîyan re derbas bibe.

Tesewif di serî de wek kirinên ferdî bûye lê piştî bûye ekol, bi derketina terîqetan hê bêtir hatiye rêxistinîkirin. Terîqeta Neqşebendî ji alîyê Şêx Mihemed Behaeddîn Neqşebendî (1317-1389) ve hatiye avakirin. Ev terîqet yek ji wan

⁵⁴ Yıldırım, *Rojava Kürt Tarihi ve Coğrafyası-1*, r. 115.

⁵⁵ Milton J. Esman, Hamar Rabînovîch, *Orta Doğu'da Etnisite, Çoğulculuk ve Devlet*, weş. Avesta, Stenbol 2004, r. 223.

⁵⁶ Uluç, h.b., r. 213,214.

⁵⁷ Acar, "Jîyan û Berhemên Mele Nûrîyê Hêsarî", r. 316.

terîqetan e ku li ser hîmê tesewifê ava bûye.⁵⁹ Piştî Mewlana Xalidê Bexdadî (k.d.1827) diçe Hindistanê ji Ebdullah Dehlewî (k.d.1824) perwerdehîya tesewifê werdigire û vedigere welatê xwe li cîhana Îslamê xelîfeyan wezîfedar dike.⁶⁰ Mewlana Xalid di sala 1811an ji Hindistanê vedigere Silêmanîyê û ji bo ilm û irşadê li her camî û tekkeyê medreseyekê jî vedike. Ji ber vî hawî şêx û xelîfeyên ku Xalidî ne li her devera ku xebitîne mescîd, camî û gund kirine cihê tadrîsatê. Loma medreseyên Norşîn, Tillo û Taxê di heman demê de gund in jî.⁶¹ Şêx Evdirehmanê Taxî (k.d.1886) yek ji xelîfeyên Neqşebendî/Xalidî ye ku îcazeta xwe ji xelîfeyê silsileta terîqeta Neqşebendî/Xalidî Seyyîd Sibxetullahê Erwasî (k.d.1870) wergirtiye û di sala 1875an de medreseya Norşînê ava kiriye.⁶² Medreseya Norşînê yek ji medreseyên li ser ekola Xalidî ava bûye û tê de ilmê tesewif/terîqetê û medreseyê bi hev re tê meşandin.⁶³ Piştî wefata Şêx Evdirehmanê Taxî demekê li Norşînê xelîfeyê wî Şêx Fethullah Werqanîsî (k.d. 1889) postnişînîyê dike. Lê piştî demekê Şêx Fethullah îcazetê dide lawê Şêx Evdirehman, Şêx Mihemed Diyaeddîn (k.d. 1924) û ji vir û pê ve Şêx Mihemed Diyaeddîn medreseya Norşînê bi rê ve dibe.⁶⁴

Damezrînerê terîqeta Xeznewî, Şêx Ehmed Xeznewî jî ji Şêx Mihemed Diyaeddîn xelîfetîyê distîne ku şairê me jî muntisibê wan e. Em ê jî li jêrê li ser terîqeta Xeznewîyan û şêxên vê terîqetê rawestin.

Terîqeta Xeznewîyan û Şêxên Wê

Şêx Ehmedê Xeznewî, wexta ji bo feqetîyê li ba Şêx Evdilqadirê Hezanî dixwend seydayê wî Şêx Evdilqadir rehmet dike, bi rênîşana Melayê Mezin (Mela Mihemed Emîn) ku xelîfeyê Şêx Mihemed Diyaeddîn e diçe medreseya Norşînê ba

⁵⁸ Selçuk Eraydın, **Tasavvuf ve Tarikatler**, Weş. IFAW, Stenbol 2014, r. 311.

⁵⁹ Ünal Yapıcı, **“Cumhuriyet Döneminde Nakşibendilik ve Siyaset”**, (Yüksek Lisans Tezi, Hitit Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Çorum, 2019), r. 6.

⁶⁰ Necdet Tosun, “Osmanlı’dan Cumhuriyet’e Nakşibendilik ve Siyaset”, **Derin Tarih**, Hejmara Taybet j. 7, r.60.

⁶¹ Kadri Yıldırım, **Kürt Medreseleri Ve Alimleri (Beylik ve Medreseleri Cilt 1)**, weş. Avesta, Stenbol 2018, r. 51.

⁶² Metin Ermiş, **“Halidi Medrese Geleneği ve Norşin Medresesi”**, (Yüksek Lisans Tezi, Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Van, 2019), r. 24.

⁶³ Mehmet Çelik, **“Tasawwuf ve Ilmi Birleştiren Bir Kurum Olarak Medreseler (19. ve 20. Yüzyıllarda Norşin Medresesi Örneği)”**, (Yüksek Lisans Tezi, Mardin Artuklu Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Tarih Anabilim Dalı, Mardin 2017), r. 34.

⁶⁴ Mehmet Saki Çakır, “Şeyh Abdurrahman-ı Tağî Ve Norşin Tekkesi’nden Yayılan Kollar”, **İhya Uluslar arası İslam Araştırmaları Dergisi**, 2017, r. 27.

Şêx Mihemed Diyaeddîn (Hezret). Piştî pênc salan di sala 1912an de xelîfetîyê ji Şêx Diyaeddîn werdigire û tê gundê xwe yî Xeznayê dest bi avakirina xebatên terîqetê dike.⁶⁵

Ev terîqeta ku li herêma Qamişlo ji alîyê Şêx Ehmedê Xeznewî li gundê Xeznayê ava bûye, şaxeke Neqşebendî/Xalidîyê ye. Piştî ku di sala 1949an de Şêx Ehmed wefat kiriye bi rêzê zarokên wî Şêx Mesûmê Xeznewî (k.d.1959), Şêx Eladînê Xeznewî (k.d.1969) û Şêx Izeddînê Xeznewî (k.d.1992) karê terîqê meşandine. Di pey re jî Şêx Mihemedê Xeznewî (k.d. 2005) bûye postnişînê terîqetê. Piştî wefata Şêx Mihemed, Şêx Muta û Şêx Evdîlxenê bûne postnişînê terîqetê.⁶⁶

Piştî wefata Şêx Ehmed lawê wî Şêx Mesûm ji gundê Xezna çûye li Tilme'rûfê bi cih bûye û xebatên dergahê li wir bi rê ve birîye. Ji sala 1949an heta sala 2005an dergah li Tilme'rûfê berdewam kiriye, lê di sala 2005an ji alîyê Şêx Mihemed Muta ve dergah neqlî Tilîrfanê bûye.

Medreseya Xeznewîyan di salên ewil de nefermî bûye, lê di pê re li gorî taybetmendîyên xwe vegeyîyaye şiklê akademîyê û mezûnên wê bi fermî ji alîyê Zanîngeha Ezherê ve hatine qebûlîkirin. Di serî de navê wê "Akademîya Ilmên Îslamî ya Xeznewî"yê bû. Piştî Şêx Muta' hat ser terîqetê, ev akademî neqlî Tilîrfanê kir û navê akademîyê bû "Akademîya Ilmên Îslamî û Erebî ya Xeznewî". Di serî de telebeyên medreseya Xeznewîyan biqasî 100 kesî bûn. Lê her ku çû zêde bûn. Di serdema Şêx Izeddîn de hejmara wan bû 150 û di serdema Şêx Mihemed de jî giha 2.500 kesî.⁶⁷

Li gorî tesbîtên me di medreseya Xeznewîyan de gelek mela, alim û ehlê tesewîfê gihane. Bi taybetî jî di serdema Komara Tirkîyeyê di navbera salên 1920-1950yî de qedexekirina medrese û tekyayan, bûye sebeb ku medreseya Xeznewîyan ya li bin xetê ji zarok û alimên ser xetê re bibe wargeh. Sûrîye di salên 1920-1946an

⁶⁵ M. Şefîk Korkusuz, **Nehri'den Hazne'ye Meşayîhi Nakşibendi**, Çapxaneyê Kilim, Stenbol 2010, r. 317, 318, 323.

⁶⁶ Kudbeddin Akyüz, "**Ahmed El-Haznevî (ö.1949) ve Haznevîye Tarikatı**", (Yüksek Lisans Tezi, Yalova Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Yalova 2015), r. 80.

⁶⁷ Yıldırım, **Kürt Medreseleri ve alimleri (c.2)**, r. 215.

de di bin serdestîya hêzên Frensî de bû. Li wir jî kesên dîxwestin xwe ji pêlên sekulerîzmê biparêzin berê xwe didan medreseya Şêx Ehmedê Xeznewî.⁶⁸

Li Rojava gelek helbestvanên edebiyata Kurdî ya klasîk wek Seydayê Tîrêj, Yûsif Berazî, Omerê Lalê, Seydayê Palo, Seydayê Keleş û Mela Nûrîyê Hêsarî hin ji wan helbestvanan in ku li derdora medreseya Xeznewîyan perwerde bûne.⁶⁹

Ji sala ku Şêx Ehmed, terîqeta Xeznewî ava kiriye heta bi wefata Şêx Mihemedê Xeznewî (2005an) terîqet bê nîqaş berdewam kiriye. Lê piştî wefata Şêx Mihemed, di navbera Şêx Evdîlxenî (lawê Şêx Ehmedê Xeznewî yê biçûk) û birazîyê wî Şêx M. Muta (kurê Şêx Mihemed Xeznewî) de fikrên cuda derketine holê. Her yek li cihên cuda şêxîtiya xwe îlan kirine û di navbera murîdên wan de jî pevçûn derketin. Di encama pevçûnan de her du alîyan gelek zerar dane hev.⁷⁰ Helbestvanê me Heyderî jî li alîyê Şêx Evdîlxenî cih digirt.

Ji ber ku helbestvanê me Mihemed Emîn demeke dirêj di medreseya Xeznewîyan de perwerdehî dîtiye û ji alîyê tekyayê ve jî pêgirê terîqeta Xeznewîyan bûye hetanî dawîya temenê xwe bi şêxên Xeznewîyan re di têkilîyê de bûye. Ji bo têkilîyên wî yên digel şêxên Xeznewîyan re baş bûn fêmkirin em ê li jêrê bi hûrgulî li ser şêxên vê malbatê rawestin. Heyderî di dîwana xwe de di 11 helbestan de pesnê terîqeta Xeznewî daye.

Şêx Ehmedê Xeznewî (1886-1949)

Avakarê dergaha Xeznewîyan Şêx Ehmed, di sala 1886an li gundê Qamişlo Xeznayê hatiye dinyayê. Navê bavê wî Mela Mûrad e ku bi eslê xwe ji Hezexa Şîrnexê (di wê demê de Hezex bi ser Mêrdînê girêdayî bû) ji gundê Baniheyê ye.⁷¹ Bi eslê xwe ji eşîreta Eliyê Reşîk in, ku ew jî digihêje silsileta Seyîd Evdîlqadirê Geylanî.⁷²

⁶⁸ Sadreddin Öztoprak, *Şark Medreselerinde Bir Ömür*, Weşanên Beyan, Stenbol, 2003, r.56.

⁶⁹ Acar, "Jiyan û Berhemên Mele Nûrîyê Hêsarî", r. 316, 323.

⁷⁰ Nurettin Aydın, "Nakışbendiliğ'in Halidiye Kolu Hazneviler üzerine Sosyolojik Bir Araştırma **Mardin İli Örneği**" (Yüksek Lisans Tezi, Süleyman Demirel Üniversitesi, Sosyal bilimler Enstitüsü, Isparta 2016), r. 35.

⁷¹ Aydın, h.b., r. 48.

⁷² Akyüz, h.b., r. 12.

Şêx Ehmed, piştî mirina bavê xwe li cem gelek alimên wek; Şêx Evdilhadi, Miftiyê Nisêbînê Mela Ehmed, Mela Mihemed Seîdê Hemîdî û Mela Ehmedê Tizyanî ders wergirtiye. Piştî demekê çûye Farqînê (Sîlwan) li ba Mela Hisênê Kîçikî perwerdehî dîtiye û îcazeta ilmê li cem wî wergirtiye.⁷³ Şêx Ehmed bi daxwaza Mela Hisênê Kîçikî întisabî Şêx Evdilqadirê Hezanî jî kiriye. Li ba Şêx Evdilqadir dest bi tesewifê kiriye. Piştî wefata Şêx Evdilqadir, Şêx Ehmed bi xelîfeyê Şêx Mihemed Diyaeddînê Nûrşînî yê bi navê Melayê Mezin (Mela Mihemed Emîn tê naskirin) re dişewire û bi vê şewrê biryara çûna cem Şêx Mihemed Diyaeddînê Norşînî daye. Li cem Şêx Mihemed Diyaeddîn seyr û sulûkê dike û piştî demekê îcazeta tesewifê jê werdigire.⁷⁴

Şêx Ehmed piştî îcazeta tesewifê werdigire tê li gundê Xeznayê dest bi avakirina terîqetê dike. Şêx Ehmed diçe kîjan deverê li derdora wî mirov kom dibûn û tewecuheke mezin didanê. Di serdema serdestîya Frensîyan de li Sûrîyeyê rêvebirên Frensî ji Şêx Ehmed daxwaz dikin ku li hember muxalîfên Sûrîyeyê destekdayîna wan bike. Ji ber ku Şêx Ehmed vê yekê qebûl nake ewil wî dişînin Başûrê Til Me'rûfê. Xelkê herêmê li derdora wî dicivin. Rayedarên Frensî ji vê rewşê aciz dibin û vê carê wî dişînin Dêrezorê. Piştî dibînin ku li wir jî xelkên herêmê tewecuhî wî dikin, mecbûr dibin ku îzna wî ya ji bo vegara li Xeznayê bidin.⁷⁵

Şêx Ehmed, di jîyana xwe ya tadrîsê de gelek feqe perwerde kirine û alimên mezin gihandine. 13 xelîfeyên ku Şêx Ehmed îcazet daye wan ev in: Şêx Birahîm Gresuver, Şêx Ehmed el Huseynî b. Ebdurrehman (Muftî), Şêx Cuneydê Motkî, Şêx Mihemed Mela Reşîd, Şêx Salih Kermî, Seyîd Mûsayê Bêcirmanî, Şêx Mihemed Evdiletîfê Eynkafî, Şêx Hiseynê Kinikî, Seyîd Evdilhekîmê Huseynî (Bilwanisî), Şêx Evdirezaqê Helêlî, Şêx Mihemed Maşûqê Norşînî, Şêx Mihemed Mesûmê Xeznewî, Şêx Sîdîqê Subaşî (Tetwanî).⁷⁶

⁷³ Mehmet Çiçek, "Seyda Molla Hüseyin Küçük'ün Hayatı ve İlmi Kişiliği", **Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi**, j. 2, r. 131.

⁷⁴ Akyüz, h.b., r. 18, 19.

⁷⁵ Yıldırım, **Rojava Kürt Tarihi Ve Coğrafyası-1**, r. 398. ; Farûq Şemrexî, **Ji Gulzarê Neqşebend Şahê Neqşebend**, weş. Lorya, Wan 2020, r. 239-255.

⁷⁶ Korkusuz, h.b., r. 337.

Berhemên ku Şêx Ehmed nivîsîne tune ne. Lê nameyên ku ji derdorê re şandine ji aliyê lawê wî Şêx Izeddîn ve hatine komkirin û bi navê “*Mektûbat*”ê berhemek derketiye holê.⁷⁷ Şêx Ehmed, li gor qenaeta pir kesan di sala 1949an de li gor hin kesan jî di sala 1950yê de wefat kiriye. Li Til Me‘rûfê medfûn e.⁷⁸

Helbestvanê me Heyderî li gel Şêx Ehmedê Xeznewî perwerdehî dîtiye û demekê jî katiptîya wî kiriye. Beşek helbestên dîwana xwe li ser Şêx Ehmed nivîsiye ku ev helbest 15 jê medhiye ne û yek jê jî mersiye ye.

Şêx Me‘sûmê Xeznewî (1913-1958)

Şêx Mesûmê, lawê Şêx Ehmedê Xeznewî yê mezin e. Di sala 1915yan de li gundê Xeznayê hatiye dinyayê. Di bîst û çar salîya xwe de destûra xilafetîyê ji bavê xwe wergirtiye. Piştî wefata bavê xwe bûye postnişînê terîqê û navenda terîqeta Xeznewîyan ji gundê Xezna neqlî Tilme‘rûfê kiriye. Çel û sê salî, di sala 1958an de wefat kiriye. Di temenê xwe yê kin de xelîfetî daye van kesan: Şêx Ehmed Mela Remezanê Êrfî, Seyîd Şêx Evdîlcelîl b. Mela Evdîlmecîd, Şêx Mihemedê Erebkendî, Mela Mihemedê Hesên, Mela Yûsîfê Seytî, Şêx Eladînê Xeznewî (birayê wî).⁷⁹ Piştî wefata Şêx Ehmed helbestvanê me li gel Şêx Mesûm perwerdehîya xwe ya tesewîfê berdewam kiriye. Di dîwana xwe de 19 helbest bi cureya medhiyeyê û didu jê jî bi mersiyyeyê bi tevahî 21 helbest li ser Şêx Mesûm nivîsiye.

Şêx Eladînê Xeznewî (1919-1969)

Şêx Eladîn, di sala 1919an de hatiye dinyayê. Li cem bavê xwe dest bi xwendinê kiriye û îcazeta ilmê ji cem wî wergirtiye. Lê îcazeta terîqetê ji cem birayê xwe Şêx Mesûm wergirtiye. Têkilîyên Şêx Eladîn di nav gel de gelekî xurt bûn. Gelek pirsgerêk û dozên civakî yên gel çareser dikir. Bi zimanê Erebbî, Farisî û Kurdî qesîde û bi navê “*Tuhfet-ul ‘Elaiyye*” jî pirtûkek bi zimanê Kurdî nivîsiye. Naveroka pirtûkê li ser şerîet, eqîde û tesewîfê ye. di sala 1969an de li Şamê wefat kiriye û niha li Tilme‘rûfê medfûn e.⁸⁰

⁷⁷ Yıldırım, *Kürt Medreseleri ve alimleri (c.2)*, h.b., r. 219.

⁷⁸ Akyüz, h.b., r. 32.

⁷⁹ Yıldırım, *Kürt Medreseleri ve alimleri (c.2)*, h.b., r. 220.

⁸⁰ Necatî Zivingî, *Stêrkên Edebiyata Kurdî*, Weşanên Banga Heq, Stenbol 2014, r. 309,310.

Şêx Eladîn, îcazeta xelîfetîyê daye van kesan: Şêx Izeddînê Xeznewî (birayê wî), Mela Xalîlê Palo Serhedî, Mela Evdillahê Mela Evdirrehman, Mela Evdillahê Bizgûrî, Mela Evdillahê Kertmînî, Mela Mihemed Emînê Heyderî, Mela Yehya (Melayê Tilme'rûf), Mela Izeddîn Aksan Urfa (Nebilî), Mela Xelîl (zavayê Şêx Huseynê Kertwînî), Seyîd Îbrahim (melayê Tilhesen), Mela Evdillahê Bîngolî Mela Evdirezaqê Reşkotî.⁸¹

Şêx Mihemed Emînê Heyderî (Heyderî) û Mela Husnî (Hezîn) gelekî ji Şêx Eladîn hez kirine û di bin bandora wî ya edebî, ilmî û tesewîfî de mane.⁸² Heyderî piştî wefata Şêx Mesûm perwerdehîya seyr û silûkê li ba Şêx Eladîn berdewam kiriye û destûra xelîfetîyê ji ba wî girtiye. Wefata Şêx Eladîn wî pir hestiyar kiriye. Di dîwana xwe de 15 jê medhiye pênc jê jî mersiye 20 helbest li ser Şêx Eladîn nivîsîye.

Şêx Izeddînê Xeznewî (1922-1992)

Şêx Izeddîn, di sala 1925an de li gundê Xezna hatiye dinyayê. Perwerdehîya ewil li ba bavê xwe wergirtiye. Îcazeta ilmî ji bavê xwe û îcazeta tesewîfî jî ji birayê xwe Şêx Eladîn wergirtiye. Piştî wefata Şêx Eladîn di sala 1969an de bûye postnişînê terîqetê. Di serdema Şêx Izeddîn de medreseya Xeznewîyan berfireh bûye û hejmara telebeyên medresêyê gihaştîye 150 kesî. Di sala 1992yan de li Şamê wefat kiriye.⁸³

Di sala 1962yan de dema Mela Mistefa Berzanî li hember Partîya Be'esê ya Iraqê raperîn dabû destpêkirin, rejîma Sûrîyeyê jî alîgirê Be'esên Iraqê bûn û di vê çarçoveyê de ji Şêx Izeddîn daxwaz kirine ku li hember Mustefa Berzanî fetwayekê derxîne. Lê Şêx Izeddîn ev teklîf qebûl nekiriye û ji bo vê yekê ew birine Şamê û çel rojî di girtîgehê de hiştine.⁸⁴

Şêx Mihemedê Xeznewî (1949-2005)

Şêx Mihemed lawê Şêx Izeddîn e. Bavê wî gelekî jê hez kiriye û pesnê wî daye. Hê di jîyana xwe de xwestiye ku piştî wî ew bibe postnişînê terîqetê û li gorî

⁸¹ Aydın, h.b., r. 41.

⁸² Yakup Aykaç, "Dîwana Hezîn (Metn, Lêkolîn û Ferheng)", (Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Bîngolê, Enstîtuya Zimanên Jîndar, çewlîg 2015), r. 16.

⁸³ Aydın, h.b., r. 42, 43.

⁸⁴ Yıldırım, **Kürt Medreseleri ve alimleri (c.2)**, r. 21.

wê ew perwerde kiriye.⁸⁵ Piştî wefata bavê xwe ew li şûna wî bûye postnişîn. Medrese di dema wî de berfirehtir bûye û hetanî 2500 telebe li mederesê çêbûne. Li Sûrîye, Tirkîye, Lubnan, Misir, Kuweyt, Sûdanê û gelek cihên din mirîdên wî çêbûne. Şêx Mihemed û malbata xwe di sala 2005an de dema ku dixwazin biçin Medîneyê li ser rîya Medîneyê di bûyereke trafîqê de ew, malbat û şoforê wan jî tê de hemû wefat dikin. Li Tilme'rûfê li cem bavê xwe tê definkirin.⁸⁶

Şêx Me'sûqê Xeznewî (1957-2005)

Şêx Me'sûq, lawê Şêx Izeddîn e. Di sala 1957an de li gundê Tilme'rûfê xwedê daye. Perwerdehiya ewil li medreseya Xezna piştî ji bo perwerdehiya fermî, di sala 1974an de îdadîye, di 1977an de lîse di 1978an de jî li Şamê "Akademîya Ilmên Şer'ê û Emînîyê" û di 1984an de jî li Medîneyê Fakulteya Şerîetê qedandiye. Şêx Me'sûq li gelek cihan wek muderîs û xetîb kar kiriye. Wek pisporê fiqhê, kesayetîyeke welatparêz û parêzvanekî mafê Kurdan tê zanîn.⁸⁷

Di sala 2003an de ketina Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê li Iraqê û rewşa Kûrdên Iraqê tê de derbas dibûn, bandor li ser Kurdên Sûrîyeyê jî kiribû. Di sala 2003an de li bajarê Heseke di lîstina du tîmên futbolê de di nava du komên Kurd û Erebb de pevçûn derket. Ev bûyer li bajarê Heseke piştî li tevahiya herêmên Kurdan belav bû. Di van bûyeran de Şêx Me'sûq di we'z û daxuyanîyan de rexne li dewleta Sûrîyeyê dikir û mafê gelê Kurd diparast. Ji ber ev tevgerên wî rêvebirên rejîma Sûrîyeyê jê aciz dibûn û gef lê dixwarin. Di sala 2005an de di seyhateke wî ya li Şamê de gav bi gav dihate şopandin û ji alîyê Muxaberata Sûrîyeyê ve hat revandin, piştî jî bi şiklekî tarî hat qetilkirin.⁸⁸

⁸⁵ Aydın, h.b., r. 44.

⁸⁶ Yıldırım, **Kürt Medreseleri ve alimleri (c.2)**, r. 223.

⁸⁷ Yıldırım, **Kürt Medreseleri ve alimleri (c.2)**, r. 222.

Şêx Evdilxenîyê Xeznewî (ç.1950)

Şêx Evdilxenî, lawê Şêx Ehmedê Xeznewî yê biçûk e. Piştî wefata bavê xwe şeş mehan hatiye dinyayê. Li cihê ku bavê wî dest bi ilm û terîqê kiribû, medrese û tekaya li Xeznayê restore kiriye û li vir ilm û irşada xwe berdewam dike.⁸⁹

Heyderî di salên dawî de têkilîyên wî digel Şêx Evdilxenî xurt bûne. Ji bo îcazeta xelîfetiye lawê xwe Mela Ehmed biriye ba wî, ew û Şêx Evdilxenî bi hev re îcazeta xelîfetiye dane Şêx Ehmedê kurê xwe. Di dîwana xwe de jî 5 helbestên medhiye li ser Şêx Evdilxenî nivîsiye. Mewlûda bi zimanê Erebî “Mewlidu’n-Nebî” jî bi daxwaza Şêx Evdilxenî nivîsiye.

Şêx Mihemed Muta‘ Xeznewî

Şêx M. Muta‘ lawê Şêx Mihemedê Xeznewî ye. Îcazeta medresê û terîqetê her du jî ji bavê xwe wergirtiye. Di sala 2007an de li Tilîrfanê ku bi ser bajarê Hesekê ve girêdayî ye, “Akademîya Ilmên Îslamî û Erebî ya Tilîrfanê” damezirand û li vê akademîyê bi sedan telebe ilm û tehsîlê dibînin.⁹⁰

⁸⁸ Mohamad Saîd, Kanbar, “XX. Yüzyılda Suriye’de Kürt Ulemanın Fikirleri: Bûtî ve Haznevî Karşılaştırması”, (Yüksek Lisans Tezi, Marmara Üniversitesi, Ortadoğu ve İslam Ülkeleri Araştırmaları Enstitüsü, İstanbul 2019), r. 66, 67.

⁸⁹ Yıldırım, **Kürt Medreseleri ve alimleri (c.2)**, r. 224.

⁹⁰ Yıldırım, **Kürt Medreseleri ve alimleri (c.2)**, r. 224.

BEŞA YEKEM

JÎYAN, BERHEM Û KESAYETÎYA EDEBÎ YA HEYDERÎ

1.1. JÎYANA HEYDERÎ

1.1.1. Jidayikbûn û Zarokatîya Wî

Şêx Mihemed Emînê Heyderî, di sala 1927an de li gundê Kelehê hatiye dinyayê. Kelehê gundek li herêma Mêrdînê bi ser navçeya Nisêbînê ve girêdayî ye.⁹¹ Gund, ji ber ku di newala Bûnîsra de ye û li serê girekî hatiye avakirin, xelkê herêmê jê re Keleha Bûnîsra dibêjin. Navê gund bi fermî (Tirkî) Kalecik e. Bi dîroka xwe gelekî kevnar û cihekî dîrokî ye. Heta salên 1900î mesîhî jî lê niştecih bûne, lê piştî ku Suryanîyên herêmê koçî Ewropayê kirine tenê Kurdên misliman lê niştecih mane.⁹² Her wekî ku tê zanîn bavê Mihemed Emîn, Mela Ehmedê Heyderî li herêma Nisêbînê li gundên, Bawernê, Kelehê, Gurînê û Baqisyan melatî kiriye.⁹³ Ji ber ku Mihemed Emîn, lawê Mela Ehmed ê mezin e, zarokatîya wî jî li van deveran derbas bûye.

⁹¹ Şêx Mihemed Emînê heyderî, Mela Ehmedê Heyderî, **Dîwana Heyderî**, amd. M. Diyaeddîn Heyderî, Weşanên Nûbihar, Stenbol, 2012, r.23.

⁹² Kalecik, Nusaybin Wikipedia, tarîhçe, https://tr.m.wikipedia.org/wiki/Kalecik,_Nusaybin, 10.06.2020.

⁹³ **Hevpeyvîna bi Mela Diyaddîn Heyderî re**, Diyarbekir, 22.07.2019.

1.1.2. Eşîreta Wî

Her wekî tê zanîn di nav Kurdan de eşîrtî aîdîyeteke berbiçav e. Li hemû herêman Kurd, xwe bi eşîra xwe ve dinasînin. Heta navê eşîra xwe ji xwe re wek paşnav jî bi kar tînin. Çawa ku helbestvan mirovên ji nava civakê ne, ji alîyê jîyana xwe ya edebî jî ji milletê xwe re dibin eyne. Gelek helbestvanên Kurd, navê herêma xwe yan jî navê eşîra xwe ji xwe re kirine mexles.

Gava em li Mihemed Emîn û bavê wî Mela Ehmed jî dinêrin, em dibînin ku her du yan jî navê eşîra xwe ji xwe re wek mexles û paşnav bi kar anîne. Her wekî ji nav û nasnavên bav û kur diyar e ji eşîra Heyderan in. Eşîra Heyderan bêhtir li herêma Serhedê niştecih in, lê sînorên wan digihê heta Dersimê. Di salên 1909an de ji bo eşîra Heyderan ên li Dersimê ji alîyê dewleta Osmanî ve bi serleşkerîya Birahîm paşa herekatek hatiye kirin û hemû mintîqeya Heyderan a Dersimê ketiye bin hêza leşkerên Osmanî.⁹⁴ Li gorî ku Önder Beyter di xebata xwe de ya ku li ser Mela Ehmed çêkiriye, dibêje ku Mela Ehmed ji Asîyan e û Asî jî perçeyek ji konfederasyona eşîrî ya Ademî ne. Lê ji ber hin sedemên mal û mulkî di navbera Mela Ehmed û apanên wî de gengeşî derketine û Mela Ehmed bar kiriye bi bal eşîra Heyderan ya malxalanên xwe. Piştî ku çûye nav Heyderan xwe bi wan nasandiye û navê eşîra wan li xwe kiriye û ji xwe re kiriye mexles jî.⁹⁵

Ji van agahîyên li jor em digihên encameke wisa ku helbestvan Mihemed Emîn ji alîyê kalikê xwe ve digihêje eşîra Asî/Ademîyan û ji alîyê pîrika xwe ve jî digihêje eşîra Heyderan. Lê Mihemed Emîn Heyderî jî wek bavê xwe aîdîyeta xwe bi eşîra Heyderan re dîtiye û xwe bi vî navî daye naskirin. Her wekî Şêx Mihemed Emîn bêtir xwe bi eşîra Heyderî ve dabe naskirin jî Asîtiya xwe jî anîye ziman. Bo nimûne:

⁹⁴ Serhat Bozkurt, “Haydaranlı Aşireti tedibi (1909)”, **Kürt Tarihi**, j. 31, 2018, r. 12.

⁹⁵ Önder, Beyter, **Dîwana Mela Ehmedê Heyderî (Metn û Lêkolîn)**, (Teza Lîsanasa Bilind, Zanîngeha Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê), Mêrdîn, 2013, r. 19-20.

Nûrşînê çî xweş bû merkeza şehr û cîha ye
 Ev 'ilm û edeb zîkr û huzûr tê de gihaye
 'İlmê Serhêda pê bûye meşhûr ne neha ye
 Feyza dirijê **Heyderî Asî** bavê Beha ye
 Zanim bi yeqînî tev ji yumna Hezret û Seyda
 (43/4)

1.1.3. Malbata Wî

Bavê Mihemed Emîn, Mela Ehmedê Heyderî û dîya wî jî qîza Mela 'Elîyê Koçer, Sedîqe Xanim e. Silsila malbatê, ji Mihemed Emîn ve ber bi bav û kalan wiha ye: Mihemed Emîn kurê mela Ehmed, ew jî kurê Salih, ew jî kurê Reşîd, ew jî kurê Hemze, ew jî kurê Elî, ew jî kurê Îmadeddîn e. Ev malbat ji eşîra Heyderîyan, ji bavikê Asîyan e.⁹⁶

1.1.3.1. Bavê Wî

Bavê Mihemed Emînê Heyderî, helbestvanê Kurd, Mela Ehmedê Heyderî ye. Mela Ehmedê Heyderî di sala 1887an de li Dedelîyê ji dayika xwe bûye. Dedelî bajarokek di navbera Erdîşa Wanê û Panosa Agirîyê de ye, lê bi fermî bi ser Panosê ve girêdayî ye. Mela Ehmed, Perwerdehîya xwe ya ewil, di zarokatîya xwe de li medreseyan derdorê dîtiye. Piştî, li Hîzanê li ba Şêx Şehabeddîn perwerdehîya xwe dewam kiriye. Mela Ehmedê Heyderî, perwerdehîyeke baş wergirtiye. Hem perwerdehîya dînî li medreseyan û hem jî ya hunerî dîtiye. Mela Ehmed ji alîyê hunerên destan ve jî gelekî şareza bûye û di vê çarçoveyê de perwerdehîyeke sistematîk jî wergirtiye. Li gor malûmatên devkî yên malbata wî didin Mela Ehmed ji bo perwerdehîya hunerî çûye Tebrîzê û li wir di dibistana hunerê ya Tebrîzê de perwerdehî dîtiye.⁹⁷

Gava şerê Cîhanê yê Yekem dest pê kiriye Mela Ehmed jî çûye şer û gava di şer de birîndar bûye ji leşkerîyê terhîs bûye, hatiye mala xwe. Lê ji ber şerê di navbera dewleta Osmanî û Rûsan de gelên herêmê belawela bûne û malbata Mela

⁹⁶ Heyderî, **Dîwana heyderî**, r. 6

⁹⁷ Beyter, h.b., r. 16, 21, 22.

Ehmed jî berê xwe dane bajarên wek; Riha û Edeneyê. Mela Ehmedê xazî, ku li welat nas û merivên xwe nabîne, ew jî berê xwe dide xerîbîyê, tê li Nisêbînê bi cih dibe. Piştî li çend gundên Nisêbînê melatîyê dike bi qîza Mela ‘Eliyê Koçer Sedîqe Xanimê re dizewice û li gundê Kelehê yê Nisêbînê bi cih dibe. Piştî vê zewacê, keçek bi navê Hamîde û sê kurên bi navên; Mihemed Emîn, Mihemed Salih û Mihemed Seîd çêdibin.⁹⁸

Mela Ehmed, çend salan jîyaneke bi feqîr û dijwarî di xurbetê de kişandiye ku reng daye kesayetîya wî ya edebî jî. Lewra di dîwana xwe de gelek helbestên li ser temaya xurbetê nivîsîye.⁹⁹ Piştî ku birînên wî yê ji şer de mabûn ji nû ve kulbûne ji bo zarokên xwe tewsîyeya ilmê li jina xwe kiriye û di sala 1937an de li gundê Bawernê yê bi ser Nisêbînê, jina xwe, çar zarok û çar berhem li dû xwe hiştine û ber bi rehma Xwedê ve çûye.

Berhemên Mela Ehmedê Heyderî ev in: *Dîwan, Eqîdeya Îmanê, Munacata Heyderî, Teqwîmname*.¹⁰⁰

Ji berhemên wî tên dîtin ku Heyderî, di warê ilmê dînî, ilmê edebî û ilmê esmannasîyê de jî mahîr bûye. Lewra berhemên wî yê bi navê “*Eqîdeya Îmanê*” û “*Munacat*”ê alîyê wî yê ilmê dînî, “*Dîwan*”a wî alîyê wî yê edebî û “*Teqwîmname*”ya wî jî alîyê wî yê esmannasîyê nîşan dide ku ew di van qadan de xwedî zanyarî ye ku dikare berhemên serkeftî derxîne holê. Cihê wî yê di qada edebiyatê de xusûsen berbiçav bûye. Bi qasî agahîyên ku malbata Mela Evdilahê Sergelya dane, gava Mela Ehmed li medreseya Şêx Şehabeddîn, li Hîzanê perwerdehî didît Mela Evdillahê Sergelya û Bedîûzzeman Seîdê Kurdî jî perwerde dibûn. Her wekî Mela Evdillahê Sergelya di ilmê tesewîfê de, Bedîûzzeman Seîdê Kurdî di ilmê tefsîrê de jêhatî bûne Mela Ehmed jî di warê erûz û însayê de jêhatî bû ye.¹⁰¹

Li ser Mela Ehmedê Heyderî, ji alîyê Selîm Hisênî di Kovara Hawarê de nivîsarek hatiye weşandin. Ev di hejama kovara Hawarê ya 54an de derketiye. Ev

⁹⁸ Halil, Akçay, Son Dönem Tasavvuf Alimlerinden Şeyh Muhammed Emin el-Hayderi Hayatı ve Eserleri, **Kimlik, Kültür ve Değişim Sürecinde Osmanlı’dan Günümüze Kürtler Uluslararası Zempozyumu**, Bingöl, Bingöl Üniversitesi Yayınları, 6-8 Eylül 2012, r. 392.

⁹⁹ Ji bo agahîyên berfirehtir bnr: Abdurrahman Adak, “Helbestvanê Muhbet û Xurbetê: Mela Ehmedê Heyderî”, **Nubihar**, c.15, j.116, 2011.

¹⁰⁰ Beyter, h.b., r. 28.

¹⁰¹ Adak, “Helbestvanê Muhbet û Xurbetê: Mela Ehmedê Heyderî”, r. 17.

nivîs bi kurtî li ser jîyan û dîwana Mela Ehmed e. Em ê li jêrê perçeyek ji vê nivîsê bidin:

“Şairek ji Heyderan e. Di mihacirîya xwe de hatibû qeza Nisêbînê. Ji ber ku evîna welat û millet di dilê wî de şax dabû û di vê nesaxîya xwe de dîwanek ji şî‘ran û qesîdeyan çêkiriye; heye qederê 300-400 rûpelî. Niha jî ew dîwan bi xetê wî yên destan li cem kurê wî M. Emîn e. Ew jî niha li nahîya Amûdê li gundê Xelîl dersên şerîetê dixwîne. Ji ber ku di stûna klasîkan û ya şairan de navê wî min nedît, û mîr jî dibêje van veşartiyên wiha divê hon ji min re bidin naskirin; lewra me îro dest pê kir û wan peşkêşî mîrê mezin dikim ezbenî.”¹⁰²

Du helbestên Mela Ehmed, di dîwana lawê wî Mihemed Emîn de hene. Ev her du helbest di dîwana Mela Ehmed de tunene. Yek jê ya ku bi “*Ellah Nîgehdarê Te Bî Ey Tacidarê Xeznewî*” dest pê dîke ku me xist nava dîwana Heyderî. Ev helbest teşeya wê qesîde ye û ji 17 malikan pêk tê. 13 malik jê ayîdî Mela Ehmed in û 4 malikên li dawîyê lê hatine zêdekirin jî ayîdî helbestvanê me Mihemed Emîn in. Helbesta din jî dîsa di dîwana Mela Ehmed de tune ye. Lê ji ber ku di helbestê de tişteki ayîdî Mihemed Emîn tune ye me di metna dîwana wî de neda. Ev helbest di dîwana Mela Ehmedê Heyderî ya ku wek tez hatiye amadekirin de jî tune ye. Loma em ê li vê derê biweşînin.

mefa‘îlun / mefa‘îlun / mefa‘îlun / mefa‘îlun
Hezec + - - - / + - - - / + - - - / + - - -

- 1 Ilahî şahê Xezna’ê hemîşe şah û serwer bit
Li dunya’ê li ‘uqba’ê dilawîz û dilawer bit
- 2 Zemînê çerx û gerdûna cin û emlak benî adem
Vewestim dest li ser desta Xudan kursî yû rehber bit
- 3 Ji ferqa ser heta pîya gerîqê behra Yezdan bê
Di uxra’ê Ebû Me’sûm mekaneş ‘edn û kewşer bit
- 4 Welî bit der şefa Şiddîq wefayel ‘ehdi çûn Farûq
Bi hîlmê zî Ziya ‘Usman sexî manendê Heyder bit

¹⁰² Selîm, Ş. M. Hisênî, Mela Ehmed, **Hawar**, j. 54, 15 Gulan 1943, r. 4. Weşanên Belkî, Stenbol, Gulan 2012, r. 833.

- 5 Wezîfa Neqşebendî rutbeya şehbazê Geylanî
Meqamê Zulcenaheynî peyapey lê mukerrer bit
- 6 Niyaza **Heyderî Eḥmed** Ilahî her ez im bende
Ji bêkamî û me'yûsî heta kengî welê zer bit
- 7 Di roja intiqamê çaxê tirs û bêm û lertzînê
Penahim Şeyx Dîya'eddîn şehê Xezna beramber bit
- 8 'Ezîzê min şerînê min emîrê kohê Seḥrayê
Delal û meh cebînê min celîsê textê Xeznayê
- 9 Celîsê textê nûranî cemala Yûsufê mażî
Exiz kir şewtê Dawudî hezar Mûsa kirin tayê
- 10 Cemala Yûsufê mażî exiz kir şewtê Dawudî
Tecella da Tûrê Sîna hezar Mûsa ketin tayê
- 11 Umîda min ji te ya Reb cemala şahê Xeznayê
Niyaza **Heyderî Eḥmed** muzeffer bit di 'uqbayê
- 12 Bi feḍla Heq Te'ala hem bi Eḥmed Hezret û Seyda
Niyaza **Heyderî Eḥmed** muzeffer bit di 'uqbayê¹⁰³

1.1.3.2. Zarokên Wî

Şêx Mihemed Emîn du zewac kirine. Zewaca wî ya ewil di sala 1947an de bûye. Xanima wî jî ji gundê ku lê xwedê daye, ji Keleha Bunisra ye. Ji vê xanima wî bi navên; Sibxetullah, Mubarek du kur û heft keç çêbûne. Piştî ku xanima wî rehmet kiriye xweha wê, dişa xwe mehr kiriye. Ji vê xanima wî jî bi navên; Eḥmed, Diyaḍîn, Wehaḍîn, Mucahîd, Wefadîn û Eladîn şeş kur û keçek çêbûne.

Şêx Mihemed Emîn, zêde giringî daye xwendin û ilmê. Lewra ji gava îcazeta xwe ya ilmê bi dest xistiye hetanî wefata xwe tim di nava xebatên tedrîsatê de mijûl bûye. Çûye kîjan deverê li wê derê medrese vekirîye û feqe perwerde kirine. Hemû zarokên xwe, çi kur çi keç bin, di rîya ilm û zanînê de meşandîye û ders daye wan. Zaroyên wî hemû, çi ilmên dînî û medreseyê; çi ilmên zanistî û modern be perwerdehî wergirtine. Ji nav heşt lawên wî çar jê di Diyanetê de ku hinek ji wan teqawîd jî bûne hene û çar jê jî di wezareta perwerdehîyê de wek mamoste dixebitin.

¹⁰³ Heyderî, **Dîwana Heyderî**, r. 280-281.

Hemû lawên wî îcazeta îlmê li cem bavê xwe wegirtine. Lê îcazeta tesewifê lawê wî Şêx Ehmed ku niha li şûna bavê xwe wezîfa terîqetê dimeşîne û Seydayê Mubarek wergirtine.¹⁰⁴

1.1.4. Navê Wî û Mexlesa Wî

Mexles, navê helbestvan yê edebî û çêkirî ye ku di helbest û berhemên xwe de bi kar tîne. Ji malika mexles tê de ye “malika mexlesê”, “malika tac” an jî “mexlesxane” hatiye gotin.¹⁰⁵

Her çiqas mexles di edebiyata Îslamî de ji serdema edebiyata Erebi ya Cahilîyeyê (Sedsala VIem) hetanî Sedsala XIIan ji alîyê hin helbestvanan carinan hatibe bikaranîn jî wek leqeb e û cihê wê nedîyar e. Her çiqas cara ewil di edebiyata Farisî de ji alîyê Rûdekî (k.d. 941) ve hatibe bikaranîn jî wek tradîsyoneke edebî di dawîya helbestan de bikaranîna mexlesê di Sedsala XIIan de li nav edebiyata Farisî belav bûye. Di vê tradîsyonê de helbestvanên Erebi ên Faris şopandine û di edebiyata Tirkî de jî cara ewil ji alîyê Şeyxî (k.d. 1431) ve di Sedsala XVyan de hatiye bikaranîn. Mexles di tarîxa edebiyata Kurdî ya klasîk de cara ewil di sedsala XIem de ji alîyê Baba Tahir ve di edebiyata Lorî de hatiye bikaranîn. Paşê di Sedsala XVyan de di edebiyata Kurdîya Goranî, di Sedsala XVIyan de di Kurdîya Kurmancî, di Sedsala XIXyan de di Kurdîya Soranî û di Sedsala XXan de jî di edebiyata Kurdîya Zazakî de hatiye bikaranîn.¹⁰⁶

Navê helbestvanê me yê rastîn Mihemed Emîn e. Paşnavê wî yê fermî Çelik e. Lê ji paşnava fermî bêtir bi paşnava gelêrî, herêmî (Heyderî) hatiye naskirin. Di nava civaka Kurdan de kes û malbat, an bi navê bav û bavikan an jî bi navê eşîra xwe tên naskirin. Navê Heyderî, ji eşîra Heyderan tê ku bavê wî Mela Ehmedê Heyderî ji vê eşîrê ye. Piştî ku helbestvanê me îcazeta ilmê melatî û piştî ya terîqetê jî şêxîti lê hatiye zêdekirin. Bi vî awayî navê wî yê ji Mihemed Emîn û eşîra wî Heyderî pêk dihat unwana Şêxîtiyê jî lê hatiye zêdekirin û bûye Şêx Mihemed Emînê Heyderî.

¹⁰⁴ Hevpeyvîna bi Mela Diyaddîn Heyderî re, Diyarbekir, 22.07.2019.

¹⁰⁵ Tahir-ül Mevlevî, *Edebiyat Lügati*, Enderun Kitabevi, İstanbul 1994, r.94.

¹⁰⁶ Abdurrahman Adak, “Mexles di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de” *Nûbihar Akademî*, J. 10, r. 13, 14, 16.

Helbestvanê me Şêx Mihemed Emîn di dîwan û berhemên xwe yên din de heft mexlesên cuda bi kar anîne. Yek jê bi ya bavî wî re hevpar e ku ev jî mexlesa “Heyderî” ye. Hevparîya mexlesekê ew e ku di dem û serdemeke cuda de ji alîyê du helbestvanên cuda ve bikaranîna heman mexlesê ye. Di vê çarçoveyê de em dikarin wek mînak helbesta heştan bidin ku ev helbest ji 17 malikan pêk tê û 13 malikên pêşî yên bavê wî Mela Ehmedê Heyderî ne û çar malikên li dawîya helbestê hatine zêdekirin jî yên Şêx Mihemed Emîn Heyderî ne. Her duyan jî di vê helbestê de mexlesa heyderî bi kar anîne. Bo nimûne em ê malikên mexlesê yê vê helbestê bidin.

Ez qenc dizanim serwerî / meqbûl û meqşûd dilberî

Kemter gulam e **Heyderî** / dil tar û marê Xeznewî

(8/13)

Zanim tu şeyxek rehberî / kibar û şêrîn esmerî

Ey rûh û canê **Heyderî** / ma dil di narê Xeznewî

(8/17)

Mexles di edebiyata klasîk de hem di helbestên wek, xezel, qesîde û musemmetan (murebbe‘, muxemmes, Tekîbbend, tercî‘bend û hwd.) de û hem jî di berhemên serbixwe yên bi teşeya mesnewîyê hatine nivîsandin û hem jî di berhemên din de hatiye bikaranîn. Lê di helbestên pir biçûk wek; rûbaî dubeytî, qit‘eyên biçûk û ferdan de mexles ji bilî hin rewşên awarte nahatiye bikaranîn.¹⁰⁷ Gava em li berhemên wî yên serbixwe dinêrin, em dibînin ku helbestvan di dawîya van berheman de mexlesa “Heyderî” bikar anîye ku li jêrê hin malikên mexlesê yên van berheman hatine dayîn:

Ji “Mewlûda Nebî”:

Ê go te’lîf kirye mewlûd ey bira

Bo feqîrê **Heyderî** hem hâzira¹⁰⁸

¹⁰⁷ Adak “Mexles di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de”, r. 16, 38.

¹⁰⁸ Şêx Mihemed Emîn Heyderî, **Tûhfetul Heyderî**, weş Seyda, Enqere 2015 r. 27.

Ji “Eqîda Îmanê”:

‘Elîl im dizar im sek im ber derî

Bi rehîma xwe ‘efwê bide **Heyderî**¹⁰⁹

Ji “Werdu’l-Etfal”:

Li etba’ û li wanê go ‘emeldar in bi şer’a wî

Dikim hemdê Xwedê go **Heyderî** da dûv terîqa wî¹¹⁰

Heft mexlesên ku helbestvanê me bi kar anîne ev in; Heyderî, Heyderîzade, Emînê Heyderî, Heyderîzade Emîn, Emînê Heyder, Emîn, Heyder. Ev heft mexles carinan di helbestê de bi carekê, carinan heman mexles du car û berjortir û carinan jî mexlesên ji hev cuda du caran an jî ji du caran berjortir hatine bikaranîn. Berî ku em yek bi yek mexlesan binirxînin em ê tabloya mexlesên ku di helbestê de tenê carek hatine bikaranîn û mexlesên di helbestê de bi hev re pircarî hatine bikaranîn bidin.

Tablo 1: Helbestên Yekmexlesî yên Heyderî

J.	Mexles	Cihê Mexlesê di Dîwanê de	Hejmara Helbestan
1	Heyderî	2, 4, 5, 8, 11, 12, 14, 17, 18, 21, 22, 25, 26, 27, 28, 29, 30, 31, 38, 39, 41, 43, 44, 45, 47, 49, 55, 57, 58, 60, 61, 63, 64, 67, 68, 70, 76, 78, 79, 86, 87	42
2	Heyderîzade	1, 9, 16, 19, 20, 48, 52, 53, 54, 56, 59, 81, 82	13
3	Emînê Heyderî	7, 23, 24, 32, 51, 69, 72	7

¹⁰⁹ Heyderî, **Tûhfetul Heyderî**, r. 42.

¹¹⁰ Heyderî, **Tûhfetul Heyderî**, r. 68.


4	Heyderîzade Emîn	10, 74	2
5	Emînê Heyder	15	1

Tablo 2: Helbestên Pirmexlesî yên Heyderî

J.	Mexles	Cihê Mexlesê di Dîwanê de	Hejmara Helbestan
1	Heyderî	13 (du car), 34 (şeş car), 73 (du car)	3
2	Heyderî + Emîn	33, 36, 40, 46, 62, 66, 71, 83, 84	9
3	Heyderîzade + Emîn	37, 42, 75, 77	4
4	Heyderî + Heyderîzade	35, 65	2
5	Heyderî + Heyderîzade Emîn	50	1
6	Emîn + Heyder	80	1

Encama ku em ji tabloyên li jor derdixin; mexles di 65 helbestan de tenê bi carekê û di 26 helbestan de jî bi awayê du mexles û berjortir hatiye bikaranîn. Ji nava heft mexlesan a herî pir 64 caran “Heyderî”, li dû wê 22 caran “Heyderîzade”, 14 caran “Emîn”, heft caran “Emînê Heyderî”, sê caran “Heyderîzade Emîn” û tenê

carekê mexlesên “Heyder” û “Emîn” hatine bikaranîn. Mexlesên “Heyder” û “Emîn” bi tena serê xwe di helbestan de nehatine bikaranîn.



Grafîk 1: Rêjeya Bikaranîna Mexlesan

Piştî ku mexles bi wateya navê edebî û bikaranîna di dawîya helbestan de di edebiyata Farisî de rûnişt, bû tradîsyoneke edebî û derbasî edebiyata Erebî, Tirkî Kurdî û hwd. bû.¹¹¹ Aşkera ye Heyderî ji tradîsyona mexlesê haydar e û di pratîkê de jî bi kar anîye. Lewra di 85 helbestên wî de mexles hene û ilehî li dawîya helbestê (malika dawîn an benda dawîn) de bi kar aniye. Tenê di helbesta rêza 76an de mexles ne di malika herî dawî de ye, ji dawîyê ve di malika duyem de ye.

Her çiqas gelek mexles bi kar anîbin jî pirên wan bi eşîra wî ve girêdayî ne. Piştî eşîrê navê xwe refere kiriye. Di esasê xwe de rola kêşê di pîrbûna mexlesan de heye.¹¹² Piştî van agahîyên giştî em ê bi hûngulî li ser mexlesên Mihemed Emîn rawestin:

-Heyderî

Helbestvan, mexlesa herî pir tercîh kiriye “Heyderî” ye. Mihemed Emîn ev mexles bi rîya bavê xwe ji alîyê aîdiyeta xwe ve girtiye. Lewra bavê wî Mela Ehmed (1887-1937) ji eşîra Heyderan e. Mela Ehmed ji bo aîdiyeta xwe ya bi eşîra Heyderan bide nîşan xwe bi navê Ehmedê Heyderî daye naskirin û ji malbata wî re jî bûye wek paşnav. Ji bo edebiyatê jî ev nav ji xwe re wek mexles hilbijartiye.¹¹³

Tengezar im dîlkirî me / çav li rehîma ber derî me

Rûsiyah im **Heyderî** me / ya Resûlallah meded

(4/12)

Bi bêhna wî ez im dilgeş

Ez im ‘aşîq û dil pir geş

Dimînî **Heyderî** serxweş

Ji ‘îşqê ruh û can tev da

(39/8)

Mexlesa “Heyderî” di helbestên 13, û 73yan de du caran hatiye bikaranîn. Helbesta 34an ya teşeya wê tercî‘bend e bi rîya neqeratê pênc û di benda dawî de carek bi tevahî şeş caran hatiye bikaranîn. Ev mexles di helbestên 33, 36, 66, 71, 83, û 84an de bi mexlesa “Emîn” re, di helbestên 35 û 65an de bi mexlesa “Heyderîzade Emîn” re hatiye bikaranîn.

-Heyderîzade

Mexlesa “Heyderîzade” ji peyva Heyderî û peyva zade pêk tê. Peyva zade jî tê wateya kur, law. Heyderîzade jî tê wateya law an jî kurê Heyderî. Mihemed Emîn piştî mexlesa “Heyderî” herî zêde ev mexles bi kar aniye. Di 13 helbestan de tenê yek car û di 19 helbestan de jî bi mexlesên din re bi kar aniye.

¹¹¹ Adak “Mexles di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de”, r. 13, 14.

¹¹² Adak “Mexles di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de”, r. 39, 40.

¹¹³ Beyter, h.b., r. 4.

Bi wê husna xwe yî şade / li eţrafa vebû şu‘le
Fida bû **Heyderîzade** / çiqas bêjim tu hêja ye

(9/9)

Bûne dewran ew li piştê qeţ nema fikr û xeyal
Bû re‘îsê vê terîqê şahibê ‘ilm û kemal
Her çi bey‘et kir bi teşdîq wî birî feyż û cemal
Tû bi heqqê merqedê kî me nekî mehrûmê hal
Heyderîzade feqîr e bê mecal û hal xerab

(56/4)

Ev mexles di helbestên 37, 42, 75, û 77an de bi mexlesa “Emîn” û di
helbestên 35 û 65an de jî bi mexlesa “Heyderî” re hatiye bikaranîn.

Rehberê dunya û dîn ya raĥeta rûhê **Emîn**
Hem çunîn şod **Heyderîzade** dikî şed ah û zar

(75/12)

-Emînê Heyderî

Helbestvan di vir de navê xwe yê rastîn “Emîn” û paşnava xwe “Heyderî” bi
hev re kiriye yek mexles. Ev mexles di heft helbestan de (helbestên 7, 23, 24, 32, 51,
69, 72) hatiye bikaranîn.

Feqîr û kemter û ğemgîn / refîqê ĥesret û derda
Emînê Heyderî miskîn / dikêşe ezyetê Me‘şûm

(24/9)

Di piştî wan tebîbê dil / şêrîn û wan ĥebîbê dil
Emînê Heyderî bê dil / wekî dîna bi çolê da

(32/11)

-Heyderîzade Emîn

Helbestvan di vir de jî peyva “Heyderîzade” û ji navê xwe yê rastîn “Emîn” mexleseke du bêjeyî çêkiriye. Ev mexles di helbestên 10 û 74an de yek carî û di helbesta 50yê de jî bi mexlesa “Heyderî” re bi kar anîye.

Ğem li canê min dibarin wê li Xezna ğemrevîn

Pir elem çêbûn li canê min bi jan û av û xwîn

Yek ‘ilet çêbû li qelbê **Heyderîzade Emîn**

Nîne derman ger ji qebran rabe Luqman *bi`l-yeqîn*

Ğeyri Eħmed qutbi Eħmed min bes e jê yek nezer

(50/9)

Ey **Heyderîzade Emîn** / ev derd û ah û ħuzn û şîn

Jê ra heye derman yeqîn / va ye li Xezna Eħmeda

(74/9)

-Emînê Heyder

Ev mexles tenê di helbesta 15an de heye. Ev mexles dibe ku ji bo serwa û kêşeyê jî hatibe kurtkirin lê ji ber ku helbestvan bi vî awayî bi kar anîye em nikarin vê biryarê li gorî xwe bidin. Me jî wek mexlesek xweser qebûl kir.

Bihnek ji enfasê tahir nadim bi milkê ‘alem

Şed car bibê fidakar canê **Emînê Heyder**

(15/14)

-Emîn

Helbestvan ev mexles ji navê xwe yê rastîn çêkiriye. Ev mexles, di 14 helbestan de heye. Lê ev mexles di tu helbestan de bi tena xwe nehatiye bi karanîn. Di helbestên 33, 36, 40, 46, 62, 66, 71, 83 û 84an bi mexlesa “Heyderî” re û di helbesta 80yê de jî bi mexlesa “Heyder” re hatiye bikaranîn.

Vê terîqa Serheda xweş kir diyarê Xeznewî
Pir gunehkar çûne tewbê bûne barê Xeznewî
Pir gehane meqşedê xwe dost û yarê Xeznewî
Bes **Emîn** maye perîşan bendewarê Xeznewî
Heyderî dîn maye gemgîn ustuxwarê Xeznewî

(46/7)

Heyderînin çaresî sizde olûr
El-meded Me'şûm **Emîn**in xanesin

(84/11)

-Heyder

Ev mexles tenê di helbesta 80yê de heye. Di vê helbestê de jî mexlesên
“Emîn” û “Heyder” bi hev re hatine bikar anîn.

Ey şêrê dîn / husna zemîn / qelbê **Emîn** / tev bû birîn
Ez bedter im / can kemter im / her **Heyder** im / ba Xeznewî

(80/9)

Di Dîwana Mihemed Emîn de ji xeynî helbestên rêza 3 û 85an, ku li ser
munacata Îbrahîm Edhem nivîsîne, di hemû helbestên xwe de li gorî tradîsyonê
mexles bi kar anîye. Di her du helbestên Erebî de mexlesa “Heyderî” di her du
helbestên Tirkî de jî mexlesên “Heyderî” û “Emîn” bi hev re bi kar anîye.

Mihemed Emîn di tevahîya Dîwanê de ji nav her heft mexlesan herî pir
mexlesa “Heyderî” bi kar anîye. Di xebata xwe de ji bo em bi kurtasî ‘etfî
helbestvanê xwe bikin me xwest em mexleseke Mihemed Emîn ya derveyî Heyderî
hilibijêrin. Da ku navê dîwana wî û dîwana bavê wî ji hev cuda bin. Lê ji ber tercîha
helbestvan ku di helbestên xwe de herî pir mexlesa “Heyderî” bi kar anîye û ji bo di
navbera hemû berhemên wî de hevsengîyek çêbibe me mexlesa “Heyderî” hilibijart.
Lê ji bo ku tevlihevî çênebe me di navê tezê de cih da navê wî yê tam jî. Di xebata
xwe de li gelek cihan li şûna navê helbestvan em ê navê Heyderî bi kar bînin.

1.1.5. Xwendina Wî û Seydayên Wî

Piştî wefata Mela Ehmedê Heyderî, hevsera wî Sedîqe Xanim û zarokên xwe gelek zor û zehmetîyan dibînin. Sedîqe Xanim dixwaze zarokên xwe bide xwendinê. Lê hem ji aliyê aborî û hem jî ji aliyê siyasî ve îmkânên wî zemanî zehmet û kêmbûn. Lawê Şêx Mihemed Emîn Heyderî, Şêx Ehmedê Heyderî serpehatîyeke pîrika xwe Sedîqe Xanim ku di bîwara wan rojên zehmet de ye wiha neqil dike:

“Gava kalkê min rehmet dike pîrka min û çar zarokên xwe bê mal dimînin. Axê gund dibêje: ‘zarokên te guh bidin oda min û mêvanên min. Gava mêvanên min bên û bixwazin destên xwe bişon pêşgîrkî, xewlîkê li ser destên wan bigerîne, ya jî hespên wan êm bike. Bes yan na tê ji gundê me derkeve’ pîrka min jî hem keça alimekî û hem jî jina alimekî bû ku wê bi cewaba ku daye bê naskirin. Dibêje: eger ez keça Eliyê Koçer bim û pîreka Mela Ehmedê Heyder bim ne zarên min avê li destên te û mêvanên te bike, wê zemanek bê tu û mêvanên xwe hûnê avê li destên wan bikin’.”¹¹⁴

1.1.5.1. Xwendin û Perwerdehiya Wî

Mihemed Emîn, perwerdehiya ewil li cem bavê xwe girtiye û di heft salîya xwe de Qur’ana pîroz xitim kiriye. Sedîqe Xanim, piştî wefata mîrê xwe, ji bo wesîyeta mîrê xwe bi cih bîne û zarokên xwe bi ilmên Îslamî mezin bike dikeve nav liv û tevgerê. Çawa ku me di beşa destpêkê de bi berfîrehî behs kiribû piştî qanûna “Tewhîdê Tedrîsat” û hin guherînên siyasî, xwendina ilmên Îslamî qedexa bûbûn û gelek medrese hatibûn girtin. Di deh salîya xwe de piştî wefata bavê xwe, di sala 1937an bi hewldanên diya xwe derbasî gundê Girbawî yê bi ser Qamişloyê ve dibe. Li vê derê pêşî li cem Ebdulletîfê Dalînî dersê werdigre. Çawa ku Sadreddîn Öztoprak jî dibêje, ji xwe di vê heyamê de ji ber li Tirkîyeyê perwerdehiya ilmên dînî êdî ne pêkan bû, gelek feqe ji serxetê berê xwe didan binxetê.¹¹⁵

Mihemed Emîn ji bo perwerdehiyeke têkûz çûye gundê Xezna li ba Şêx Ehmedê Xeznewî (k.d. 1950) dest bi dersan kiriye. Mihemed Emîn li medresa

¹¹⁴ Ev agahîyên devkî ji hevpeyvîna ku di trt 6ê de di bernameya “Medreseyên Berê” de bi Şêx Ehmedê Heyderî hatiye kirin hatine wergirtin. **Youtube**, Medreseyên Berê- Heyderî. wmv, 10.06.2020.

¹¹⁵ Öztoprak, h.b., r.62.

Xeznewîyan li ba şêx Ehmedê Xeznewî gelekî kemilîye. Qederê 12 salan li medreseya Xeznayê di bin mahiyeta Şêx Ehmedê Xeznewî de bi adab û terbiyeya tesewîfî feqetî kiriye. Li vê medreseyê ji xeynî ilmên dînî eleqeyeke mezin daye ilmên wekî; astronomî, erdnîgarî, civaknasî (sosyolojî), derunnasî (psîkolojî), dîroka Îslamê, dîroka cîhanê û hwd.¹¹⁶ Di heman wextê de ji alîyê ilmê edebî ve jî pêş ketiye.

Li gor agahîyên feqeyê wî Mela Sîrac Tarhan dane me; “Heyderî li medreseya Xezna bi qabîliyeta jiberkirinê derketiye pêş û demekê katibtîya Şêx Ehmedê Xeznewî jî kiriye.”¹¹⁷ Mihemed Emîn, di perwerdehiya xwe ya li medreseya Xeznewîyan bi alimên wekî; Şêx Ebdulhekîmê Huseynî yê Bilwanisî, Şêx Maşûqê Nûrşînî, Şêx Huseynê Kîçikî, Mela Mihemedê Erebkendî, Mela Ebdulcelîlê Omerî û hwd. ders wergirtiye.¹¹⁸ Piştî ku li medreseya Xezna ilmên wekî hedîs, serf, nehîw, fiqih, tefsîr, tecwîd, ‘eqaîd, kalam û mentiqê werdigire, di sala 1947an de ji cem xelîfeyê Şêx Ehmedê Xeznewî, Seydayê Mela Evdirezaqê Helêlî îcazeta îlmê wergirtiye.¹¹⁹

1.1.5.2. Seydayên Wî

Di serdema zarokatîya Mihemed Emîn li Bakur, îmkanên xwendina îlmên dînî tune bû. Lewra Dewleta Tirkîyeyê, Qanûna “Tewhîdê Tedrîsatê” derxistibû û tekke, zawîye û medrese girtibûn. Ji bo zarokên Bakur, ilmên dînî werbigirin tenê rêyek mabû ku ew jî derbasî Rojava bibin. Li Rojava wê demê Frensî hukimdarî dikirin û gelek alimên ku ji Tirkîyeyê revîyabûn, hatibûn li Rojava bi cih bibûn. Ev alimên ku zarokên Bakur xwe li wan digirtin yên navdar yek ji wan Seyda Evdiletîfê ku li Amûdê medreseya wî hebû û gelek zarokên Bakur û Rojava xwe lê digirtin. Xelîfeyê Şêx Ehmedê Xeznewî, Seydayê Mela Evdirezaq jî yek ji wan aliman bû ku firarîyê Tirkîyeyê bû û li gundê bi navê Xalid ku bi ser Amûdê ve girêdayî ye

¹¹⁶ Heyderî, **Dîwana Heyderî**, r. 24,25.

¹¹⁷ Agahîyên devkî yên ku ji feqeyê Şêx Mihemed Emînê Heyderî, Mela Sîrac Tarhan hatine wergirtin, **Hevpeyvîna Bi Mela Sîrac Tarhan**, Qoser, 22. 09. 2019.

¹¹⁸ Akçay, h.b.,r. 393.

¹¹⁹ Heyderî, **Dîwana Heyderî**, r. 25. ; Mehmet Tıraşçı, “Güneydoğu ve Doğu Anadolu Çevresinde Arapça, Kürtçe, Zazaca Mevlidler ve Müzikal Olarak İcra Ediliş Tarzları”, **Cumhuriyet Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi**, j. 2, r. 209-236.

medrese vekiribû, ji gelek zarokên Bakur re bûbû wargeh.¹²⁰ Mihemed Emîn, piştî wefata bavê xwe derbasî binxetê bûye û li medreseya Şêx Evdiletîfê Dalinî dest bi perwerdehiyê kiriye, piştî çûye medreseya Xeznewîyan. Di deh salên feqetîya xwe de li cem van aliman perwerdehi dîtiye:

- Şêx Evdiletîfê Dalinî
- Seydayê Mela Mehdî (kurê Ebduletîfê Dalinî)
- Şêx Ehmedê Xeznewî
- Şêx Eladînê Xeznewî
- Seyda Şêx Evdirezaqê Helêlî¹²¹
- Seyda Evdilmecîdê Topizî
- Mela Yûsifê Bizgûrî
- Mela Evdisselamê Delxî

1.1.6. Melatî û Muderîstîya Wî

Heyderî, piştî ku îcazeta xwe di sala 1947an de ji Seydayê Şêx Evdirezaq¹²² wergirtiye, zewicîye û li gundê Xezna bi cih bûye. Demekê li medreseya vî gundî seydatî jî kiriye. Piştî çend salên melatîyê, di salên 1950yî de li Tirkîyeyê ji alîyê siyasî ve hinek rehetî çêbûne. Piştî 27 salan ku desthilat hat guhertin, xwendina Quranê serbest bû û banga ku demeke bi Tirkî dihat xwendin dîsa bi Erebi hate xwendin. Mihemed Emîn di sala 1950yî de ji gundê Xezna derbasî Tikîyeyê bûye û li gundê ku lê xwedê dabû, li Kelehê bi cih bûye. Di serî de li gundê Kelehê piştî li gundê Bawernê (Bahçebaşı) dersan dide û melatîyê dike. Di sala 1955'an de derbasî gundê Tinatê (Kutlubey) yê Midyadê dibe û heft salan li vir melatî û seydatîyê dike.

¹²⁰ Kadri Yıldırım, **Kürt Medreseleri ve Alimleri (Cami ve Hücreler)**, Weşanên Avesta, Stenbol, 2018, c. 3, r. 233-234.

¹²¹ Seydayê Şêx Ebdurrezaq, di sala 1895an de li gundê Helêla yê bi ser Şemrexa Mêrdînê hatiye dinyayê. Perwerdehiya xwe ya ewil li gundê Helêla li ba Mela Mehmûdê Xerzî û piştî jî ji gelek alimên wek Mela Evdilmecîdê Xîzanî, Mela Evdilhemîdê Botî, Mela Huseynê Kuçuk dersan werdigire. Paşê li Sûriye û Iraqê perwerdehiya xwe berdewam dike. Li Sûriyeyê demeke dirêj li ba Şêx Ehmedê Xeznewî dersên ilmê û paşê jî perwerdehiya tesewîfê werdigire. Hem îcazeta ilmê hem jî ya tesewîfê ji ba Şêx Ehmedê Xeznewî werdigire. Piştî li gelek herêman melatî û seydatîyê dike di salên 1969-1970yî de li Qosera Mêrdînê bi cih dibe û heta dawîya temenê xwe li qoserê jîyana xwe berdewam dike. di sala 1980yî de lo Qoserê wefat dike. Gora wî di hewşa dergaha ku ew avakiriyê û niha jî kurê wî Şêx Selaheddîn bi rivê dibe de ye. Farûq Şemrexî, **Ji Gulzarê Neqşebend Şahê Neqşebend**, weş. Lorya, Wan 2020, r. 239-255.

¹²² Ji bo agahîyên berfirehtir bnr. : Li teza lîsansa bilind a ku ji alîyê Sadullah Taşci ve li Zanîngeha Herranê li ser Şêx Evdirezaq bi navê **“Halidiliğin Haznevî Kolu Abdurrezzak Halîlî ve Halifeleri”** hatiye çêkirin.

Piştire di sala 1962an de diçe gundê Midyadê yê bi navê Qestelûnê (Ovabaşı) bi cih dibe. Li heman gundî mizgeft û medrese jî ava kiriye. Mihemed Emîn di van salên li vî gundî de ji bo ilmê tesewîfê gelek caran diçe Sûrîyeyê, medreseya Xeznewîyan û li bal Şêx Mesûmê Xeznewî dest bi seyr û sulûkê kiriye.

Mela Mihemed Emîn ji sala 1947an ku îcazeta xwe ya ilmê wergirtiye hetanî wefata xwe di nava ilmê de bûye. Li kîjan herêmê bi cih bûbe her daîm feqe li dora wî kom bûne û ders daye wan. Mela Mihemed Emîn di jîyana xwe de li gelek deveran melatî û seydatî kiriye. Em ê li jêrê gundên ku bi rêzê li wan melatî û seydatî kirine bidin:

- Gundê Xezna (Sûrîye) 1947-1950
- Gundê Kelehê / Nisêbîn / Mêrdîn 1950
- Gundê Bawernê / Nisêbîn / Mêrdîn
- Gundê Tinatê / Midyad / Mêrdîn 1955-1962
- Gundê Qestelûnê / Midyad / Mêrdîn 1962-1967
- Gundê Salika / Farkîn / Amed 1967-1979
- Gundê Girbeşkê / Qoser / Mêrdîn 1979-1982
- Gundê Bereketê / Farqîn / Amed 1982-heya salên 2000î.

Heyderî li gelek deveran ilmê tedrîsatê kiriye û gelek feqe perwerde kiriye. Em ê li jêrê hin Feqeyên Şêx Mihemed Emînê Heyderî bidin:

- Şêx Izedînê Nebilî (Riha)
- Mela Diyadînê Sitî
- Mela Îsmetê Sitî
- Mela Ehmedê Tinatî
- Mela Hesenê Ilozî
- Mela Mehmûdê Dêrizbinî
- Mela Mihemed Eliyê Cibilgawî
- Mela Remezanê Be'dê
- Mela Şewqîyê Hellexî
- Mela Elî yê Hellexî
- Mela Mihemed Sîracê Şêx Evdilcelîl
- Mela Nezîrê Kersivanî

- Mela Hesenê Tinatî
- Mela Munîrê Êstilî
- Mela Mehmûdê Nebilî
- Mela Hesenê Sitî
- Mela Hesenê Kefirhiwarî
- Mela Evdilhekîmê Midyadî
- Mela Mihemedê Qestelûnî
- Mela Lutfîyê Koza
- Mela Evdilwehîdê Mela Mistefayê Bendermemî
- Mela Evdiletîfê Kefsennorî
- Mela Evdilqadirê Ziyaretî
- Mela Izedînê Qestelûnî û hwd.¹²³

1.1.7. Jîyana Wî ya Tesewifî û Terîqeta wî

Di tesewifê de mijarên sereke terbîye û perwerdehî ye. Ev perwerdehî heyamek e û di vê heyamê de murîd/salik, bi rêbertîya murşîd/pîrekî digihêje dereceya naskirina Xweda.¹²⁴

Heyderî jî wexta li cem Şêx Ehmedê Xeznewî perwerdehî didît di heman wextê de adab, usûl û terbîyeya tesewifê jî dijîya. Em dikarin bêjin ku di ilmê tesewifê de rêber û seydayê wî yê ewil Şêx Ehmedê Xeznewî ye. Piştî ku Heyderî, îcazeta xwe ya ilmê wergirtiye û di sala 1950yî de vegerîyaye, li herêma Mêrdînê bi cih bûye û li gelek gundan melatî û seydatî kiriye. Di salên 1950yî de dema ku muderîstî kiriye, di heman wextê de çûn û hatinê li medreseya Xeznewîyan kiriye û li bal kurê Şêx Ehmedê Xeznewî Şêx Mesûmê Xeznewî dest bi seyr û sulûkê kiriye. Piştî ku Şêx Mesûm di sala 1958an de wefat dike, li bal Şêx Eladînê Xeznewî perwerdehîya tesewifê berdewam dike û di sala 1967an de ji bal Şêx Eladînê Xeznewî îcazeta tesewifê werdigire. Piştî îcazeta tesewifê wergirtiye bi daxwaz û israra heyetek ji gundê Salika (Eşme) ya Farqînê, li vî gundî bi cih bûye.¹²⁵

¹²³ Agahîyên devkî: Hevpeyvîna bi Mela Diyaddîn re.

¹²⁴ Ali Tenik, h.b., r. 256.

¹²⁵ Heyderî, Dîwana Heyderî, r. 25-27.

Heyderî, endamê Terîqeta Xeznewîyan e ku ev terîqet alîyekî terîqeta Neqşebendî/Xalidî ye. Çawa ku me di beşa destpêkê de bi berfirehî behs kiribû terîqeta Xeznewî di sala 1912an de piştî ku Şêx Ehmedê Xeznewî li Medreseya Norşînê ji ba Şêx Mihemed Diyaîn ku bi navê xwe yê Hezret nav daye hîlafet wergirtiye ava kiriye.¹²⁶ Heyderî jî xelîfeyekî vê terîqetê ye. Li jêrê em ê cih bidin silsileya wî ya terîqetê.¹²⁷

Silsileya Şêx Mihemed Emînê Heyderî ya Terîqetê:

- Mewlana Xalidê Şehrezorî (k.d. 1827)
- Şêx Seyîd Ebdullah Şemdînî / Nehrî (k.d.1813)
- Şêx Seyîd Tahayê Hekkarî (k.d.1852), -
- Şêx Seyîd Sibxetullahê Erwasî / Xewsê Hîzanê (k.d. 1870),
- Şêx Ebdurrehmanê Taxî / Seydayê Taxî (k.d.1886),
- Şêx Fethullahê Werqanîsî (k.d.1899),
- Şêx Mihemed Diyaînê Norşînî / Hezret (k.d.1923),
- Şêx Ehmedê Xeznewî (1886-1949),
- Şêx Mesûmê Xeznewî (1913-1958),
- Şêx Eladînê Xeznewî (1919-1969),
- Şêx Mihemed Emînê Heyderî (1927-2003).

Heyderî, piştî tê li gundê Salika bi cih dibe mudetekê li wir dimîne û ji xelkên der û dorê eleqeyeke mezin dibîne. Alîyê xwe yê ilm û tesewîfê dike yek û hem suhbetên îmanî û tesewîfî dike hem jî li medreseyan muderîstîyê dike.

Ji xeynî medreseya ku li gundê Salika vekirîye li Mûş, Mêrdîn, Çewlik û gundên derdorê jî digere û tevgerên îrşadî pêk anîye. Di vê demê de xelkên ji derdorê ji bo feyzê ji Heyderî bigirin ref bi ref tînin gundê Salika. Carinan ji bo xebatên dînî û îrşadî çûye bajarên wek; Îzmîr, Mêrsîn û Edeneyê jî. Ji bo xebatên bi vî rengî carinan bi Şêx Eladîn re jî gerîyaye. Gundîyên derdorê ji bo çandinîya dar û beran û lêkirina tuwalet û kanîyan teşwîq kirîye û gelek caran ew bi xwe ketîye nava xebata van

¹²⁶ Kadri Yıldırım, **Kürt Medreseleri Ve Alimleri (Tekellere Bağlı Medreseler Cilt 2)**, weş. Avesta, Stenbol 2018, r. 215.

¹²⁷ Ramazan Korkut, “Halidî Tasavvuf Geleneğinde Fıkıh ve Tasavvuf İlişkisi (Seyda Muhammed Emin El-Hayderî Medresesi Örneği)”, **The Journal of Akademik Sosyal Araştırmalar Dergisi**, j. 53, r. 385.

karan. Di serdema ku li farqînê ye, wefata Şêx Eladîn bandoreke mezin li cîhana wî ya derûnî/rûhî dike. Ji vê xemgînîyê gelek helbestên dîwanê derketine holê. Dîsa di vê heyamê de nezmên wek; “*Eqîda Îmanê*” û “*Melûda Nebî*” jî nivîsiye.¹²⁸ Di Dîwana Heyderî jî rengvedana terîqeta Xeznewîyan û Şêxên wê zêde ne.

Di sala 1979an ji gundê Salika tê, li gundekî Qosera Mêrdînê bi navê Girbeşkê (Altıntoprak) bi cih dibe. Sê salan li vir dimîne. Di sala 1982an de ji vî gundî diçe gundekî dî yê Farqînê bi navê gundê Bereketê bi cih dibe û hetanî salên 2000î li vî gundî niştecih dimîne.

Heyderî çî li Tirkîyeyê, çî li Sûrîyeyê ketibe kîjan civata tesewifî sohbetên ku kiriye raxbet dîtine. Giranîya sohbetên wî li ser exlaqê Îslamê, suneta Pêxember, teqwa, qaîdeyên îmanê, tobe, qezenca helal, hezkirina ji însan û muhebeta Ilahî ye. Bawerîya xwe ya tesewifî û ilmê tadrîsatê bi hev re kiriye.¹²⁹

Çawa me gotibû Heyderî îcazeta gelek xelîfeyan jî daye. Em ê li jêrê hin Xelîfeyên Şêx Mihemed Emînê Heyderî bidin:

- Şêx Ehmedê Heyderî (Lawê wî)
- Mela Mubarek Heyderî (Lawê wî)
- Mela Ehmedê Qizlawî
- Mela Mihemedê Bîngolî
- Mela Mihemedê Qestelûnî
- Mela Sîracê Kanîspîyê (Tarhan)
- Mela Sidîqê Qerika (Qozlûq)
- Mela Zekîyê Bîngolî (k.d.2006)
- Mela Şewket (ji gundê Farqînê Remdanka)
- Mela Mihemed (Sofî Mihemed Emîn)
- Mela Hadî (k.d. 1990)¹³⁰

¹²⁸ Heyderî, Dîwana Heyderî, r. 28.

¹²⁹ Korkut, h.b., r. 384.

¹³⁰ Agahîyên devkî: Hevpeyvîna bi Mela Diyaddîn re.

1.1.8. Wefata Wî

Heyderî, di demên xwe yê dawî de dixwaze navendeke ilmî ya mezin veke. Bi vê armancê di salên 2000'î de li ser rîya Amed-Farqînê ku ji Amedê bi 15 km.yan dûr, ji bo medrese û mizgeftê xebatên însaetê dide destpêkirin.¹³¹ Wexta xebat berdewam bûn di 76 salîya xwe de di 22ê Gulana sala 2003yan wefat dike. Qebra wî di nav kulîyeya ku mizgeft û medrese tê de hatiye avakirin de cih digire.¹³²

1.2. BERHEMÊN HEYDERÎ

Bi tevahî şeş berhemên Heyderî hene. Berhemên wî ev in; Dîwan, Eqîdeya Îmanê, Mewlûda nebî, Mewludu`n-Nebî, Werdu`l-Etfal, Rîsaleya Exlaq û Tesewifê.

Gava em li gorî naveroka berheman dabeşkirinekê bikin encameke wiha derdikeve holê; berhemên edebî “Dîwan” û berhemên dînî-tesewifî “Mewlûda nebî”, “Mewludu`n-Nebî”, “Werdu`l-Etfal”, “Rîsaleya Exlaq û Tesewifê”. Ji alîyê cureyê nivîsînê Dîwan, Eqîdeya Îmanê, Mewlûda nebî û Werdu`l-Etfal nezm in. Mewlûdun-Nebî û Rîsaleya Exlaq û Tesewifê jî pexşan in. Em ê li gorî dabeşkirina cureyên nivîsînê berhemên wî dabeş bikin û bidin nasîn.

1.2.1. Berhemên Wî yê Menzûm

1.2.1.1. Dîwan

Ji bo ku xebata me bêhtir li ser dîwanê ye û agahîyên li ser dîwanê me di beşên din de dane em ê li vir li ser vê berhemê ranewestin.

1.2.1.2. Mewlûda Nebî

Mewlûd, ew cureyeke dînî-edebî ye ku li ser Pêxember û jîyana wî hatine nivîsandin. Mewlûd tê wateyê xwedêdan, zayîn, cihê xwdêdanê yan jî dema xwedêdanê. Lê vê têgehê wateyeke taybet ji bo xwedêdana Pêxember wergirtiye. Bi demê re li ser xwedêdana wî (Hz. Mihemed) berhemeke menzûm û ji xwendin û

¹³¹ Bnr. (Pêvek 3: Wêneyekî Şêx Mihemed Emîn ji Înşeta Medreseyê).

¹³² Bnr. (Pêvek 9: Kêlên Gora Şêx Mihemed Emîn Heyderî).

îcrakirina vê nezmê jî merasimek derketiye holê. Di nava gel de bêjeya “mewlûdê” hem ji bo cureya nezmê û hem jî ji bo pîrozbahîya xwedêdana Pêxember tê bikaranîn.

Mewlûd piranî bi teşeya mesnewîyê tîn nivîsîn. Ev Mewlûda Heyderî ya navborî jî bi teşeya mesnewîyê ye. Ji ber ku mewlûda Heyderî bi teşeya mesnewîyê ye şemaya serwaya wê jî li gorî rêbaza serwaya teşeya mesnewîyê ye. Weke hemû mesnewîyan, mewlûda Heyderî jî her beyt di nava xwe de bi serwaye; “aa, bb, cc, dd, ee...” Ev mewlûd ewil ji 321 malikan pêk dihat. Piştî ku muelîf cara duduyan mewlûda xwe sererast kiriye hin malik jê derxistiye bi qewareya 200 malikî şiklê dawî daye berhemê.¹³³ Berhem, bi van malikan dest pê dike,¹³⁴

Em bidin hemdê xwedê ey musliman

Daye me pêxemberê axir zeman

Ew Xwedayê go hidayet daye me

Nî‘meta xweş dînê Islam daye me

Nî‘meta j’ her ni‘metê xweştir ev e

Minnetê j’ her minnetê mestir ev e

Go me îman aniye bi Rebbê ‘Ezîm

Em muşerref bûn bi Qur’ana Kerîm¹³⁵

Mewlûda Heyderî bi zaravayê Kurmancî bi navê “*Mewlûda Nebî*” hatiye nivîsîn. Li gorî Halil Akçağ, Heyderî ev mewlûd di sala 1975an de di şeva qendîla mewlûdê dest pê kiriye û di heman şevê de qedandiye.¹³⁶

¹³³ Mustafa Ertaş, “**Mewlûda Heyderî (Şêx Mihemed Emînê Heyderî) û Berawirdkirina Wê Bi Mewlûda Bateyî Re**”, (Tez Lîsansa Bilind, Zanîngeha Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî Li Tirkîyeyê), Mêrdîn 2020, r. 72.

¹³⁴ bnr. (Pêvek 25: Rûpela Serî ya “*Mewlûda Nebî*”).

¹³⁵ Mehmet Yıldız, “Mewlûda Şêx Mihemed Emînê Heyderî”, **Çend Nîrxandinên Edebî Li Ser Mewlûda Şêx Mihemed Emînê Heyderî**, (Semînera Lîsansa Bilind, Zanîngeha Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî Li Tirkîyeyê), Mêrdîn 2018, r. 13, 16, 18.

Kêşa ku di mewlûda, Şêx Mihemed Emînê Heyderî de wek gelek mewlûdên din bi qaliba “Fa ‘ilatun Fa ‘ilatun Fa ‘ilun” e ku ev qalib ji behra remelê û qalibeke ku nesalim e pêk tê.¹³⁷

Wek her cureya mewlûdê, mewlûda Heyderî jî li ser xwedêdan û hin bûyînên di jîyana pêxember de ye. Mewlûd ji 9 beşan pêk tê. Beşên Mewlûda Heyderî wekî ya Bateyî û Çelebî ne bi sernav e. Beşên wê hene; lê her beşek bi malika dubarekirinê (neqerat) diqede. Di mewlûda Heyderî de pesnê pêxember, gazîya ji xwedê, întîqala nûra Muhemmedî, çêbûna Adem, afirandina dinyê û dua heye. Ev mijar naveroka mewlûdê pêk tînin. Mijar xwedêdan û mu‘cizatên pexember e yanî mijar dînî ye.¹³⁸ Di mewlûdê de beşa “Merhebayê” heye lê tenê di malika yekem de merheba heye. Di malikên din de li şûna merhebayê “hat” hatiye bikaranîn.¹³⁹

Gava em ji alîyê ziman, mewlûda Bateyî û ya Heyderî didin ber hev, em dibînin ku zimanê mewlûda Heyderî gelek hêsan û zimanekî rojane ye. Lê zimanê mewlûda Bateyî ji mewlûda Heyderî kevintir û girantir e. Mewlûda Heyderî li derdora herêmên; Şirnex, Sêrtê û Mêrdînê ji ya Bateyî bêtir hatiye tercîhkirin. Sedem; ji ber zimanê mewlûda Heyderî hêsanîr û rojanetir e.¹⁴⁰ Bandora zimanê Erebî û Farisî li ser mewlûda Bateyî ji ya Heyderî bêhtir e. Berhem, bi van malikan diqede;

Bo Muhammed al û hem eshabê wî

Bo ruhê etba‘ û hem ehbabê wî

Ê go te’lîf kirye mewlûd ey bira

Bo Feqîrê Heyderî hem hadira

¹³⁶ Akçay, h.b., r. 398.

¹³⁷ Ertaş, h.b., r.72

¹³⁸ Yıldız, h.b., r. 41.

¹³⁹ Hayreddin Kızıl, “Diyarbakır Ve Çevresinde Yazılmış Mevlitlerin Konularına Göre Tasnifi Denemesi”, **e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi**, j. 7, r. 122.

¹⁴⁰ Mehmet Tıraşçı, “Güneydoğu ve Doğu Anadolu Çevresinde Arapça, Kürtçe, Zazaca Mevlidler ve Müzikal Olarak İcra Ediliş Tarzları”, **Cumhuriyet Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi**, j. 2, r. 215-216.

Hûn bixwînin fatîhe ser wan temam

Ser Muhemmed esselat û wesselam¹⁴¹

1.2.1.3. Eqîdeya Îmanê

Eqîdenameyên Kurdî hemû bi teşeya mesnewîyê hatine nivîsîn ku ew dikevin kategorîya mesnewîyên dîdaktîk. Mesnewîyên dîdaktîk jî di nava xwe de dibin du beş: mesnewîyên exlaqî û mesnewîyên zanistên Îslamî. Eger mijara mesnewîyekê zanista ‘eqîde/‘eqaîdê be ew mesnewî dibe “eqîdename/eqaîdname”.¹⁴²

Di edebiyata Kurdî ya klasîk de ji alîyê gelek helbestvanan ve bi vê cureyê berhem hatine nivîsîn. Wek tê zanîn cara pêşî Ehmedê Xanî berhemeke wisa nivîsiye. Bavê Heyderî Mela Ehmedê Heyderî jî xwedî berhemeke wisa ye.¹⁴³

Helbestvanê me Mihemed Emînê Heyderî, “Eqîdeya Îmanê” di derbarê şertên Îslamê û qaîdeyên îmanê de nivîsiye. Berhem bi teşeya mesnewîyê hatiye nivîsîn. Mûsîqîya nezmê bi wezna erûzê hatiye sazîkirin. Qaliba weznê “ fe‘ûlun / fe‘ûlun / fe‘ûlun / fe‘ûl” e. Ji qaliba behra muteqarib a ne salim e. Yekeya helbestê malik e û ji 210 malikan pêk tê. Helbestvan di dawîya berhemê de mexlesa “Heyderî” bi kar anîye.

Berhem ji destpêkê û neh beşan pêk tê. Her beşek derheqê mijareke dînî yan îmanî de ye. Berhem bi besmeleyê dest pê dike. Piştî bi 12 malikan destpêka/dîbace berhemê hatiye nivîsîn. Li ser her beşekê sernavek li gorî mijara beşê heye. Sernavên beşan wiha ne;

- Behsa bawerîya bi Xwedê ye
- Behsa bawerîya bi melaîketê Xwedê ye
- Behsa bawerîya bi kîtaba Xwedê ye
- Behsa bawerîya bi pêxemberê Xwedê ye
- Behsa wesfê Muhemmed Eleyhîsselat û wesselam

¹⁴¹ Yıldız, h.b., r. 73.

¹⁴² Abdurrahman Adak, **Teşeyên Nezmê Di edebiyata kurdî ya klasîk de**, weşanên Nûbihar, Stenbol, 2019, r. 400.

¹⁴³ Ayhan Yıldız, “Cîyê ‘Eqîdenameyan Di Edebiyata Kurdî û Perwerdehiya Medreseyan de” **Nûbihar Akademî**, j. 9, 2018, r. 77, 80.

- Behsa mu‘cîzatê Muhemmed Eleyhîsselat û wesselam
- Behsa ‘elametê qiyametê
- Behsa bawerîya bi qiyametê ye
- Îstîxase û hewar

Berhem bi van malikan dest pê dike;

Bi hemdê Xwedayê go tewfîq bi wî

Bi şukrê Xwedayê hîdayet ji wî

Selat ser Muhemmed nebîyê di wî

Digel al û eshab û etba‘ê wî

Birayê musulman ji dil guh bide

Ew î ferz û ‘eyn in di dînê te de

‘Eqîdê beyan kim tu guh lê bikî

Ji bo ê nezan dînê xwe fêm bikî¹⁴⁴

Berhem di navbera salên 1975-1980yê de hatiye nivîsîn. Zimanê wê Kurmancîyeke sade ye. Bi navê “*Tuhfetu’l-Heyderî*” ev berhem (*Eqîda Îmanê*), “*Mewlûda Nebî*”, “*Mewlûdu’n-Nebî*” û “*Werdu’l-Etfal*” her çar heb bi hev re di nav weşanên Seyda de hatine çapkirin. Berhem bi van malikan bi dawî dibe;

Nehêlî ku dijmin bi me geş bibî

Ji me razî be ew go rûreş bibî

Dizanim ku kêmi ‘ebîdê te me

Bi husnu’l-yeqînê dexîlê te me

¹⁴⁴ Heyderî, **Tuhfetu-l-Heyderî**, r. 31.

‘Elîl im dizarim sek im ber derî
Bi rehma xwe ‘efwê bide Heyderî

Selatê mukemmel didim berdewam
Li rûhê Muhemmed ‘eleyhîssalam

Li al û li eshab û ‘etbaê’ê wan
Xitamu`l-kelamê bide me îman

1.2.1.4. Werdu`l-Etfal

Ev berhema ku navê wê tê wateye “*Gula Zarokan*” di sala 1987’an hatiye nivîsîn. Berhem pirtûkek îlmîhalê ye. Ji bo zarok û ciwanan hatiye nivîsîn. Bi nezmê ye û ji 204 malikan pêk tê. Behrem ewil bi besmeleyê û piştê bi muqadîmeyek ji 3 malikan pêk tê dest pê dike. Her sê beytên muqadîmeyê wiha ne;

Bi hemdillah me dî himmet ji kirna medh û zîkrê wî
Gelek zêde dibin ni‘met ji dana wesf û şukrê wî

Selat bîn ser Muhemmed hem li ser wan alê beyta wî
Digel eshab û etba‘ê ‘emeldar in bi şer‘a wî

Di piştî wan birayê min musulman wer tu guhdar be
Bizane ‘ilmê dîn xwe bi şer‘a wî ‘emeldar be¹⁴⁵

Ev berhem, ji bo zarok û ciwanên ku nû dest bi medreseyê kirine di darsa fiqhê de wek destpêkekê tê dayîn. Berhem ji muqadîme, 19 beş û di dawîyê de beşa uzrxwestinê û teqrîza feqeyekî Heyderî pêk tê. Bi giştî sernavên beşên “*Werdu`l-Etfal*”ê ev in;

¹⁴⁵ Heyderî, *Tuhfetu`l-Heyderî*, r.45.

- Muqedîme
- Behsa Tehareta Bi Avê
- Behsa Necaseta Biçûk û Mezin û Navê
- Behsa Zêr û Zîv û Hevrîşim
- Behsa Xêra Sîwakê
- Behsa Cildê Mirara Helal Dibî Bi Debaxê
- Behsa Tahirbûn û Paqijkirina Ji Mîz û Gû
- Behsa Şurûtê Desmêjê
- Behsa Sunnet û Adabê Desmêjê
- Behsa Xuslê Wacib
- Behsa Xusla Wacib û Ekmelê wê
- Behsa Xuslê Sunnet
- Behsa Şikestina Desmêjê
- Behsa Teyemmumê
- Behsa Mesha Xuffa
- Behsa Kirina Limêja Ferz
- Behsa Sunnet û Musteheb û Mendûb û Hey'etê Limêja Ferz
- Behsa Teqsîla Betalbûna Limêjê
- Behsa Limêja Herdu Îda û Xutbê Wan
- Behsa Mewtê
- Uzrxwestina ji bo temamkirina rîsalê.

Heyderî di dawîya beşan de bi pênc malikan uzra xwe ji xwendevanan xwestiye. Ev jî mutewazîbûna alîyê wî yê ilmê nîşan dide. Em ê vê helbestê bi temamî li jêrê bidin:

- 1 Birayê min xeta'ê min pir in der van meqalê min
Nekin lewmê bikin 'efwê li vê wezna zimanê min

- 2 Me ev çêkir ji bo zarwê nezan ê bûn hevalê min
Ez û wezna xwe pir kêr in bikin rehmê li halê min

- 3 Biqasî nuqtê baranê dewama erd û esmana
 Biqasî me‘na Quranê dewama cinn û însana
- 5 Selat bîn ser Muhemmed hem li al û eshab û ezhar
 Li ezvac û li ewlad û li ehbab û li ensara
- 6 Li etba‘ û li wanê go ‘emeldar in bi şer‘a wî
 Dikim hemdê Xwedê go **Heyderî** da dûv terîqa wî¹⁴⁶

Li ser “*Werdu`l-Etfal*”ê feqeyekî Heyderî yê bi navê Mihemed, teqrîzek bi çar malikan nivîsiye. Ecibandina xwe anîye ziman û medhê berhemê daye. Teqrîza Feqe Mihemed bi sernava “*Heza Teqrîz û Telmîdî`l-Ustad Muhemmedi`l-Feqîr*” e û li dawîya berhemê hatiye bicîkirin. Teqrîz bi temamî wiha ye;

1. Di behsa av û desmêj û limêjê da çi ‘irfancî
 Go seyda’ê Emînê Heyderî çêkir bi Kurmancî
2. Dikim şukrê Xwedê Seyda bi suhbet ‘alimê dîndar
 Bi ‘ilmê dîn û dunya’ê ji ya heq ra dibû guhdar
3. Bi îhsan û bi teqwa û bi adaba ‘emeldar bû
 Ji etba‘ û hevala ra çi zana û wefadar bû
4. Xwedê ‘Efwê bidî Seyda ewî jê ra du’axwîne
 Me û cumle musulmana digel ê go bê amîn e¹⁴⁷

¹⁴⁶ Heyderî, **Tuhfetu’l-Heyderî**, r. 67.

¹⁴⁷ Heyderî, **Tuhfetu’l-Heyderî**, r. 68.

1.2.2. Berhemên Wî yên Pexşan

1.2.2.1. Mewludu`n-Nebî (Mewlûda Erebi)

Heyderî, berî wefat bike demeke kin, di salên 2000î de ev berhem nivîsîye. Ji xeynî ne`ta ku di nav berhemê de ku ji heşt malikan pêk tê berhem bi pexşankî ye û bi zimanê Erebi hatiye nivîsîn.<sup>148</sup> Berhem li ser xwesteka Şêx Evdîlxenîyê Xeznewî hatiye nivîsîn. Muelîf ji pirtûkên hedîsan ku bi navê “*Kîtabu`ş-Şîfa*” ya Qadî Îyad û “*Ebqerîyetu`l-Îslam*” ya Mehmûd Eqqad sûd wergirtiye.¹⁴⁹

1.2.2.2. Rîsaleya Exlaq û Tesewifê

Agahîyên li ser vê berhemê zêde tunene. Gava em çûn medreseya Heyderîyan û me hevdîtîn bi Mela Diyadîn re pêk anî em ji vê berhemê haydar bûn. Me ji Mela Diyadîn di derheqê berhemê de ev agahî wergirtin; “Ev esera ku Seyda nivîsîye deftereke bi destxetên wî ne û berhema ewiltirîn e ku nivîsîye. Navê wê me nedît, li ser defterê nenivîsandiye. Defter zêdeyî 100 rûpelî ye, bi Erebi ye û di derheqê exlaq û tesewifê de ye. Li ser exlaqê baş û nebaş tefsîlat, teqşîm û îzaheta wan hatiye kirin.” Ev berhem wek destxet di pirtûkxaneya lawê Muelîf Mela Diyadîn de parastî ye. Bo nimûne me rûpelên ji serî, dawî û rûpelek ji nava berhemê di pêvekan de nîşan da.¹⁵⁰

1.3. KESAYETÎYA WÎ YA EDEBÎ

Kesayetîya edîban ya edebî ji berhemên wan tên tespîtkirin. Kesayetîya edîb, ji teşe, naverok, ziman, şêwaz û hizra wî ya di berheman de hatiye bikaranîn derdikeve holê. Di navbera şair û tradîsyona edebiyata klasîk de her çiqas mijar û unsûrên hevpar pir bin û li ser hin qaîdeyên rûniştî û jêneveger saz bûbin jî xweserîyên her şair û berhemekê jî hene. Loma ji bo kesayetîya edîbekî ya edebî xweş bê fêmkirin, divê xweserîyên şair û unsûr, têgeh, qaîdeyên rûniştî yên edebiyata klasîk bi hev re bîr xandin.

¹⁴⁸ bnr. (Pêvek 26: *Rûpela Serî* ya “*Mewludu`n-Nebî*” Bi destnivîsên Heyderî).

¹⁴⁹ Akçay, h.b., r. 398.

¹⁵⁰ Bo nimûne Bnr. (Pêvekên 27, 28, 29).

Her çiqas Heyderî di serdemeke modern de jîya be jî helbestvanekî edebiyata klasîk e. Lewra hemû berhemên wî ji alîyê teşe, cure, wezn û serwayê ve di nava regezên edebiyata klasîk de hatine nivîsandin. Hemû helbestên wî bi kêşa erûzê ne û ji alîyê teşeyî ve jî bi teşeyên cur bi cur yên klasîk in. Helbestvan bi çar zimanan dizane û her çar ziman jî di berhemên xwe de bi kar anîye.

1.3.1. Helbestvanên ku Bandor li Heyderî Kirine

Di edebiyatê de tesîrkirina şair û edîban li hev û din tiştekî ji rêzê ye. Lewra nivîsîna berheman piştî perwerdehî û xwendinekê çêdibe. Carinan helbestvan û nivîskar, perwerdehîyekê li ber destên hoste-şairekî yan nivîskarekî hoste digirin. Carinan jî ji alîyê edîbekî yan çend edîban ve bi rêk û pêk an jî bi şiklekî xwezayî, danûstendin çêdibin û wek ekoleke edebî, komek ji edîban derdikeve holê. Ji xwe karê teorîsyen û dîrokvanên edebiyatê jî ew e ku bi awayekî nîzamî û bi disîplîneke rêk û pêk jîyan, berhem û kesayetîyên edebî yên edîban, pêwendîyên wan yên bi hev re derxîne holê. Her wekî ji dîwan û berhemên Heyderî tên xuyakirin ku di warê edebiyatê de perwerdehîyeke baş wergirtiye û ev perwerdehî bi qabîlîyeta xwe ya edebî re kiriye yek û berhemên ku ji alîyê hunerî ve di asteke bilind de ne nivîsîne. Bi qasî agahîyên me ji malbata helbestvan wegirtine, qabîlîyeteke wî ya xurt a edebî hebûye. Hê di biçûkatîya xwe de dest bi nivîsîna helbestan kiriye û di medreseya Xeznewîyan de bi vê qabîlîyeta xwe derketiye pêş ku mudetekê ji bo Şêx Ehmedê Xeznewî katibî jî kiriye.¹⁵¹ Dîsa agahîyên ku me ji malbatê wegirtine yek jê ew e ku Heyderî ehemîyet daye edebiyatê û xwendina pirtûkên menzûm ên şairên wek Melayê Cizîrî, Feqîyê Teyran, Ehmedê Xanî, Melayê Bateyî, Şêx Evdirehmanê Aqtepi, Mela Ehmedê Heyderî û hwd. Ji xeynî edebiyata Kurdî hayê wî ji edebiyata Erebî, Farisî û Tirkî jî hebûye û berhem ji van zimanan jî xwendîye. Carinan di nava dersan de ji edebiyata Kurdî helbestên Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî û ji edebiyata Farisî jî yên Sadîyê Şîrazî ji feqeyên xwe re xwendine û şîrove kirine.¹⁵²

¹⁵¹ **Hevpeyvîna bi Mela Diyaddîn Heyderî**, Diyarbekir, 22.07.2019.

¹⁵² Agahiyên di derbarê jiyana Şêx Mihemmed Emîn Heyderî de yên ku ji feqeyê Şêx Mihemed Emîn; Mela Sîrac Tarhan hatine wergirtin, **Hevpeyvîna Bi Mela Sîrac Tarhan**, Qoser, 2019.

Heyderî gelek berhem û helbestên şairên edebiyata klasîk xwendîye di bin tesîra wan de maye û li ser helbestên wan nezîre nivîsîne, întîqab kiriye (adaptasyon) yan jî di çarçoveya tradîsyona wan a edebî de berhem daye. Nezîre ew helbest e ku bi heman kêş û serwayê li ser helbesta şairekî din hatiye nivîsîn.¹⁵³ Çawa tê zanîn di edebiyata klasîk de nezîrekerin wek tradîsyonekê ye. Heyderî jî di bin tesîra edîb û zanayên wek Îbrahîm Edhem, Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Şêx Evdîrehmanê Axtepî, Mela Ehmedê Heyderî (bavê wî) û Şêx Eladînê Xeznewî de maye û li ser helbestên wan nezîre nivîsîne, întîqab kirine yan jî tradîsyona berhemên wan şopandiye.

1.3.1.1. Îbrahîm Edhem

Îbrahîm Edhemê zahid, sofî û muheddîs li bajarê Xorosanê Belxê hatiye dinyayê.¹⁵⁴ Rîwayetên li ser jîyana wî bi guman in. Li gor tê behskirin lawê fermandarê Xorosanê ye. Ji malbateke dewlemend û esl e. Hê di xortanîya xwe de dev ji hemû mal û milkên dinyayê berdaye û ketiye rîya zuhdê/zahidîyê. Sebeba vê guhertina di jîyana wî de jî bi rîwayetekê ve tê girêdan. Li gorî vê rîwayetê, Îbrahîm Edhem di ciwanîya xwe de rojekê derdikeve nêçîrê. Du caran ji xeybê dengêkî wiha tê wî: *"Ma tu ji bo vî karî hatiye xuliqandin. Tu ji bo vî karî bikî hatiye emirkirin."* Piştî vê bûyerê, dev ji hemû mal û milkên xwe berdaye û ketiye rîya zuhdê.¹⁵⁵

Piştî ji Xorosanê derketiye li cihên wek, Iraq, Şam, Hîcaz û Rûmê (Enedolê) gerîyaye. Li gorî hin çavkanîyan li Şamê, li gorî hin çavkanîyan jî beşdarî şerekî li hember Bîzansîyan bûye û di şer de li giravekê wefat kiriye.¹⁵⁶ Berhemên wî yên tînan zanîn ev in: *'En 'Edemî İstîcabeti'd-Du'a* (li pirtûkxaneya Silêmaniyeyê nr. 1014/8) û *Munacat* (Gelibolulu Tahir, Pirtûkxaneya Silêmaniyê nr.28/16).¹⁵⁷ Îbrahîm Edhem,

¹⁵³ İskender Pala, **Ansiklopedik Divan Edebiyatı Sözlüğü**, Leyla Ve Mecnûn Yayınları, İstanbul 2002, r. 367.

¹⁵⁴ Halime Gül, **İbrahim Bin Edhem ve Tasawwuf Tarihindeki Yeri**, (Yüksek Lisan Tezi, Selçuk Üniversitesi, sosyal Bilimler Enstitüsü, Konya 2008), r. 15.

¹⁵⁵ Kaplan Üstüner, **Divan Şiirinde Tasavvuf**, Birleşik Yayınları, Ankara 2007, r. 366.

¹⁵⁶ Gül, h.b., r. 20.

¹⁵⁷ Selcuk Eryaydın, **Tasvuf ve Tarikatlar**, Marmara Üniversitesi İFAV Yayınları, İstanbul 2014, r. 65; her wiha ji bo destxeta munacata Îbrahîm Edhem bnr. (Pêvek 30: Munacata Îbrahîm Edhem)

wexta ku li Mekkeyê diçe tewafa Beytullahê û derdikeve pêş hizûra Xwedê vê munacatê tîne ziman. Munacat bi zimanê Erebi ye.¹⁵⁸

Heyderî di bin bandora munacata Îbrahîm Edhem de maye, îlham jê girtiye û li ser benda dawî ya munacata wî du helbestên ku ji sê malikan pêk tên nivîsîye. Ev helbest yek jê bi Erebi, yek jê jî bi Kurmancî ye. Ji bo nimûne em ê benda dawî ya munacata Îbrahîm Edhem û ji her du helbestên Heyderî yê li ser munacata Îbrahîm Edhem întîqabkirî (adaptekirî) jî du malikan bidin.¹⁵⁹

Îbrahîm Edhem:

Îlahî ‘ebduke’l-‘aşî etaka

Muqîrren bi’z-zunûbi feqed de‘aka

We in tegfîr fe ente fe ente ehlunl lîzaka

We in tetrud fe men yerhem sîwaka¹⁶⁰

Heyderî:

‘Ebdekî zelîl bê heya me pir le‘îm im ey Xuda

Ez dexîlê deryê Rebbê xwe yê Kerîm im ey Xuda

(3/1)

Ateynake îlahena bîl mufîsî’l-selîmî

‘Ariyan ‘enil’l-hesenatî wel qelbi’s-selîmî

(85/1)

¹⁵⁸ Ji bo metnê munacatê bnr.: Gül, h.b., r. 91.

¹⁵⁹ Ji bo agahiyên berfirehtir li ser her du helbestên Heyderî yê întîqabkirî bnr. Helbestên rêza 84 û 85an.

¹⁶⁰ Gül, h.b., r. 91. Wergera wê ya bi Kurdî: ”Ey Xwedayê min ev evdê asî hat ba te/Li gunahên xwe poşman im ji bo efwê bi dua hatim ba te”.

1.3.1.2. Melayê Cizîrî (Sedsala XVI-XVII)

Melayê Cizîrî, di Sedsala XVIem û destpêka Sedsala XVIIem de jîyaye. Melayê Cizîrî helbestvanekî Kurd e ku bi terzê edebiyata rojhilatî dîwaneke bi Kurdî anîye holê. Navê wî yê rastîn Ehmed e û di helbestên xwe de jî mexlesên, Mela, Ehmed, Nîşanî bi kar anîne û bi navê Melayê Cizîrî hatiye naskirin. Dîwana Mela di edebiyata Kurdî de pir hatiye xwendin, gelek lêkolîn û şerh li ser hatine kirin. Dîwana Mela di bin eşq û evînê de hatiye nivîsîn ku ew jî eşqa Ilahî ye.¹⁶¹ Di edebiyata Kurdî ya klasîk de bandora Melayê Cizîrî zêde cih girtiye. Pirê helbestvanan dîwana wî xwendine û dibin tesîra wî de mane ku bi dehan helbestvan texmîs, teşîr û nezîre li ser helbestên wî nivîsîne.

Gava em li dîwana Heyderî dinêrin bandora Melayê Cizîrî li ser kesayetîya wî û helbestên wî gelekî xuya dike. Ev bandor bi şiklê texmîs û teşîrekê û 7 helbestên ku bi heman kêş û serwayê li ser helbestên Mela hatine nezîrekirin xuya dike.

Di dîwanê de tenê texmîsek heye. Ew jî li ser qesîdeyê Mela hatiye nivîsîn. Misrayên di nava kevanekê de yên Mela ne û yên din jî ji alîyê Heyderî ve lê hatine zêdekirin. Em ê li jêrê benda ewil û ya dawî ya texmîsa Heyderî bidin.

Benda ewil;

Dilo canê me ji tîrê te gihane 'elemê

Dem û dewranê me çûne têk bi nalîn û gemê

Kul û derdê me civane ji firaqa te hemê

(Hêvî û tewqe dikin em ji Xudana heşemê)

(Wê nigar û şenemê padişehê muhteşemê)

(35/1)

Benda dawî;

Dilkulê jar û 'elîl e ketye ber êş û bela'ê

Heyderîzade dikêşe elem û cewr û cefa'ê

¹⁶¹ Abdalbaki Turan, **Melayê Cizîrî Divanî ve Şerhi**, ç. Duyem, weş. Nûbihar, Stenbol 2012, r. 22.

Me bi keyfê bibuhêre bigerîn zewq û şefa'ê

(Me ji dîwana se'adet seh kirî şubhê **Mela'ê**)

(Tu bi navê me geda'ê bikişîne qelemê)

(35/16)

Teştîra di dîwanê de jî li ser xezeleke Mela hatiye nivîsîn. Em ê li jêrê bo nimûne benda ewil û ya dawî ya teştîra Heyderî bidin.

Benda ewil;

(Xeşmê li feqîran meke zû padişehê min)

Curmê meke wacib li geda'ê şubehê min

Rehmê li yesîrê xwe ke ey naz û mehê min

Qesda te hebî keşfê bikit rah û rehê min

(Pirsê bike carek li xeta û gunehê min)

(36/1)

Benda dawî;

(Yek 'îşqê **Mela yî** bê buha bête ji le'lan)

Nûşîn bikitin wê qedeşa şubhetê lalan

Zewqek li heyata me werîtin mehê salan

Şu'lek ji wê husnê ku **Emîn** bid ya ji dalan

(Şed can me hebin hîşek û meqşer di behê min)

(36/9)

Helbesta Heyderî ya di rêza 10an de li ser helbesteke Mela nezîre ye. Kêş û serwaya her du helbestan eynî ye. Ji xeynî kêş û serwayê peyvên wek; “seherê, lebşekerê, qemerê, berê, derê, nezerê, seqerê” di her du helbestan de jî di dawîya malikan de cih digirin. Bo nimûne em ê li jêrê ji helbestên her du helbestvanan çend malikan bidin.

Melayê Cizîrî;

fe ‘ilatun / fe ‘ilatun / fe ‘ilatun / fe ‘ilun

Ey nesîmê sibehê ma di mecala **seherê**

Sed selaman bigehînî j ime wê **lebşekerê**

Dêmi bedr û aniyê zulfê li ser bûne helek

Erqemam helqe û gerdan e li dewra **qemerê**

Ji ber ahê mi di nêv agir û dûd bitne ‘eceb

Me di dilda heye narek ku disojit **seqerê**¹⁶²

Heyderî;

fe ‘ilatun / fe ‘ilatun / fe ‘ilatun / fe ‘ilun

Ĥemdulillah ebedî her me ji wê xweş **beşerê**

Lazim e secde bibin xweş bikin derd û **keserê**

(10/1)

Gerçi em ne la’îq in bose bikin dest û piya

Keremkarê Rebê me dûr bin ji nar û **seqerê**

(10/3)

Lew me ji remz û nezer qeṭ em ji xu bê xeber in

Ku cemala eniyê zêde ji ḥusna **qemerê**

(10/8)

¹⁶² Cizîrî, Mela, **Dîwan**, amd. Selman Dilovan, ç. Duyem, weş. Nûbihar Stenbol 2012 r. 237.

Helbesta di rêza 13an de, bi helbesteke Mela hemkêş û hemserwa ye. Peyvên “me ye, te ye, heye, ‘umre ye, çeşme ye, zêde ye” di dawîya her du helbestan de hevpar in. Em ê li jêrê ji her du helbestan çend malikan pêşkêş bikin.

Melayê cizîrî;

fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilun

Dilberê serdarê xûban ez nizam ageh heye

‘Arif e b’ halê qulûban ‘alim e b’ halê **me ye**

Secdeya ber nûn û dalan min tewafa zulf û xalan

Ev bese j’ sahibcemalan da biçîn lê **‘umre ye**

Ê ji vê zerfê vexwarî xwendî ew xetê xubarî

Mestiya çehvên xumarî qenc dibê ew **zêde ye**

Rohniya çehvên Mela yî xaliqê husna te dayî

Hub tîne da min gedayî husn û hub yek **çeşme ye**¹⁶³

Heyderî;

fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilun

El meded quṭbê zemanî / rewşena bagê me ye

Rûzeqa ruwê cihanî / mesneda pişta me ye

(13/6)

Şa’ nê wî pir kûr û dûr e / luṭf û nisbet feyż û nûr e

Qedd û qamet bê quşûr e / her ji weşfan **zêde ye**

(13/6)

¹⁶³ Cizîrî, h.b., r. 191, 192, 196.

Rû ji husna mişlê bedrê / afitab e ew di 'eşrê
Mahitab e roja heşrê / nûr û çeşmeynê me ye

(13/8)

Muħbeta wî merhema dil / şuħbeta wî rehîmê nazil
Dîtina wî quṭbê kamil / bo me hecc û 'umre ye

(13/10)

Di dîwanê de helbestên di rêza 31 û 32yan de bi du helbestên Mela re hemkêş
e û paşserwaya wan ji yek e. Em ê ji bo her du helbestan jî li jêrê nimûne bidin.

fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilun
Ey şehinşahê mu'ezzem Heq nîgehdarê **te bî**
Sûreê "İnna Fetehna" dor û madarê **te bî**

Lami'ê fetha ezel berqê ji ber tacê te dît
Kewkeba se'da ebed necmek ji seyyarê **te bî**¹⁶⁴
Heyderî;

fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilun
Ey Xuda erḍa mubarek / her dibin ḥifza **te bî**
Ḥukmê Xezna'ê bi carek / daxilê rehîma **te bî**

(31/1)

Lami'a feyza Xuda bî / nisbet û feyza Žiya bî
Çar teref mişlê çema bî / mecme'a beħra **te bî**

(31/6)

¹⁶⁴ Cizîrî, h.b., r. 221.

Melayê Cizîrî;

Mefa'îlun / mefa'îlun / mefa'îlun / mefa'îlun

Bi narê firqetê sohtim ji ferqê ser heta pê da

Xedenga xefletê nohtim ji berqa lami'a pê da

Ji Wadyê Eymenê dilber nizam enguştekir îzhar kir

Ku xweş enwar û berqên ew tecella bûn di **Tûrê da**

Tu narê firqetê zanî dikarim ez tehemmul kim

Diyarê kohê Qendîl im meger fîl im di **'îşqê da**¹⁶⁵

Heyderî;

Mefa'îlun / mefa'îlun / mefa'îlun / mefa'îlun

Mela îro 'Ela'eddîn / çi Luqman bû di dewrê da

Fidakar bû ji bon adîn / çi ni'man bû di 'ilmê da

(32/1)

Bi wê 'îşqê bi wê şîdqê / bi wê şewtê bi wê nutqê

Ewî hey kir dilê xelqê / mela ew bû di **'îşqê da**

(32/5)

Di piştî wan tebîbê dil / şêrîn û wan hebîbê dil

Emînê Heyderî bê dil / wekî dîna bi **çolê Da**

(32/11)

¹⁶⁵ Cizîrî, h.b., r. 24, 26, 28.

Dîsa helbesta Heyderî ya di rêza 76an de û helbesteke Melayê Cizîrî bi heman kêş û heman serwayê ne.

Melayê cizîrî;

fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilun

Îro ji remza dêmdurê minnet kum in mesrûr e dil

Dilber bi fincana surê mey da me û mexmûr e dil

Dil lê bidit nûra meyê weqtê suwaş û heyheyê

Fehme er bikit wehya neyê jê dit xeber me‘mûr **e dil**

Nûra ji qudret lê du nûn jê ra dinalim erxenûn

Wer ayeta ‘îşqê bixûn xweşnusxeyek mestûr **e dil**

Dil ke‘be ye Mewla mel ê ye lê narê Kelîm Îsayê lê

Bangê “enellah” daye lê hem Ke‘be û hem Tûr **e dil**¹⁶⁶

Heyderî;

fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilun

Ey gelî dostan ‘Eladîn gulşena bostanê dil

Quretu’l-‘eyn ya tēbīb û kaşif û luqmanê dil

(76/1)

Nûriya ‘eynu’l-*heyatê* ya Zemzem ya selsebîl

Neyşeker barî ji dev ya şorgula rewdanê **dil**

(76/4)

¹⁶⁶ Cizîrî, h.b., r. 147,148.

Badeya husna hebîbê melhema derd û birîn

Xemriya noşîn helal ya şerbet û dermanê **dil**

(76/6)

Qible'ê Ke'ba dila yî yan Şefa Merwa feqîr

Bi'l-xuşûş zîkrê lisan meclûb şeker şêranê **dil**

(76/13)

1.3.1.3. Ehmedê Xanî (1651-1709)

Ehmedê Xanî, di sala 1651ê de li Bazîdê hatiye dinyayê. Ji ber ku ji eşîreke herêma Hekkarî ye ku bi navê eşîra Xanê derbas dibe, jê re Ehmedê Xanî hatiye gotin. Xanî her wekî muderîs e, kesayetîyeke mutesewif e jî. Di sala 1709an de li Bazîdê wefat kiriye.¹⁶⁷ Xanî di edebiyata Kurdî ya klasîk de cihekî girîng digire. Bi kesayetîya xwe ya edebî û berhemên xwe li ser şair û edîbên piştî xwe, bi taybetî jî şairên di warê mesnewînûsîyê de bandoreke mezin kiriye. Ji xeynî mesnewîya li ser eşqa “*Mem û Zîn*”ê di gelek qadan de berhem nivîsîne ku di edebiyata Kurdî de bûne tradîsyon û gelek helbestvanan ew şopandine. Yek jê, tradîsyona nivîsîna eqîdeya îmanê ye ku ji alîyê gelek helbestvanan ve hatiye nivîsîn lê cara ewil Ehmedê Xanî nivîsîye.¹⁶⁸ Heyderî jî yek ji şopînerê vê tradîsyona eqîdê ye ku wî jî berhemeke bi navê “*Eqîda Îmanê*” nivîsîye.

Heyderî jî wek Ehmedê Xanî berhema xwe “*Eqîda Îmanê*” bi yekeya malikê û bi kêşa erûzê, behra muteqaribê nivîsîye. Em ê li jêrê ji hin beşên eqîdenamêyên Xanî û Heyderî nimûne bidin;

-Tewhîd;

Xwudê yîk e bê hevrê û bê heval

Ne me'zûlî ye ne mirin ne zewal (**Xanî**)¹⁶⁹

¹⁶⁷ Adak, **Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk**, r. 250-252.

¹⁶⁸ Kadri Yıldırım, **Ehmedê Xanî Mem û Zîn**, weş. Avesta, Stenbol 2010, r. 27.

¹⁶⁹ Yıldırım, **Ehmedê Xanî 'Eqîdeya Îmanê**, weş. Avesta, Stenbol 2008, r. 337.

Bi hemdê Xwedayê go tewfîk bi wî

Bi şukrê Xudayê hîdayet ji wî **(Heyderî)**¹⁷⁰

-Qiyama ji qebrê;

Dê eczaê cismê fenabîn ji bin

Ji bil 'es'esê paşê mehşûrî bin **(Xanî)**¹⁷¹

Qiyamet heq e wê l ime rabîbî

Çi rûhî heye wê ji nû sax bibî **(Heyderî)**¹⁷²

-Hesabdayîna di roja Heşrê;

Yeşîn dê bibîtin di yewma qiyam

Hisaba helalê 'ezabê heram **(Xanî)**¹⁷³

Bi ber erda heşrê diçin top dibin

Li ber mehkema heq tamam kom dibin **(Heyderî)**¹⁷⁴

-Mêzên (kifşbûna xêr û gunehan);

Di heşrê terazî û mîzan heye

Xerabî û qencî û kêşan heye **(Xanî)**¹⁷⁵

Li wê qenc û pîs wê ji hev bin xuya

Li heşrê kê ye qenc kê ye asiya **(Heyderî)**¹⁷⁶

¹⁷⁰ Heyderî, *Tuhfetu'l-Heyderî*, r. 39.

¹⁷¹ Yıldırım, *Ehmedê Xanî 'Eqîdeya Îmanê*, r. 355.

¹⁷² Heyderî, *Tuhfetu'l-Heyderî*, r. 31.

¹⁷³ Yıldırım, *Ehmedê Xanî 'Eqîdeya Îmanê*, r. 357.

¹⁷⁴ Heyderî, *Tuhfetu'l-Heyderî*, r. 39.

¹⁷⁵ Yıldırım, *Ehmedê Xanî 'Eqîdeya Îmanê*, r. 358.

¹⁷⁶ Heyderî, *Tuhfetu'l-Heyderî*, r. 39.

Li medreseyan ji bo perwerdehiya zarokan di warê pedagojîyê de jî berhem hatine nivîsîn ku di edebiyata Kurdî de ev tradîsyon jî bi Ehmedê Xanî dest pê kiriye. Berhema wî ya “*Nûbihara Biçûkan*” ji bo perwerdehiya zarokan berhema yekem a bi Kurdî ye.¹⁷⁷ Berhema Heyderî ya bi navê “*Werdu’l-Etfal*” ku tê wateya “*Gula Zarokan*” jî berhemeke pedagojîk e û ji bo zarok û ciwanên ku nû dest bi xwendina medreseyê kirine hatiye nivîsîn. Her çiqas ji aliyê naverokê ve “*Nûbihara Biçûkan*” û “*Werdu’l-Etfal*” du berhemên ji hev û din cuda bin jî ji aliyê armanc û şiklê ve taybetîyên hevpar di navbera wan de hene. Heyderî jî wek Xanî ev berhema xwe bi şiklê nezmê û bi kêşa erûzê nivîsiye. Armanca Heyderî jî wek a Xanî perwerdehiya zarokan e. Heyderî jî wek Xanî di serê berhemê de sebebê nivîsandina berhema xwe vegotiye;

Ne ji bo sahibrewacan

Belkî ji bo biçûkêd Kurmancan **(Xanî)**¹⁷⁸

Me ev çêkir ji bo zarwê nezan ê bûn hevalê min

Ez û wezna xwe pir kêr in bikin rehmê li halê min **(Heyderî)**¹⁷⁹

Di edebiyata Kurdî de gelek helbestvan mulemme‘ nivîsîne. Lê bi taybetî Ehmedê Xanî di warê mulemme‘ê de nav daye. Sedemê vê jî ew e ku çî di edebiyatên Erebi, Farisî û Tirkî, çî di edebiyata Kurdî de mulemme‘ên berîya Xanî bêtir di zimanê ne. Lê mulemme‘a Ehmedê Xanî çar zimanî (Erebî, Farisî, Tirkî, Kurdî) ye. Ev şewaz di edebiyata Kurdî de li xweşa gelek helbestvanan çûye.¹⁸⁰ Her wekî Ehmedê Xanî û Şewqîyê Xanî Heyderî jî murebbe‘ên mulemme‘ ên çarzimanî û sêzimanî nivîsîne.¹⁸¹ Di dîwana Heyderî de du mulemme‘ hene ku em ê wan û mulemme‘a Ehmedê Xanî bi kurtasî berawird bikin.

¹⁷⁷ Yıldırım, **Ehmedê Xanî Mem û Zîn**, r. 22. Bo agahiye berfietir bnr: Kadri Yıldırım, **Ehmedê Xanî Nûbehera Biçûkan**, weş. Avesta, Stenbol 2008.

¹⁷⁷ Heyderî, **Tuhfetü’l-Heyderî**, r. 39.

¹⁷⁸ Kadri Yıldırım, **Ehmedê Xanî Nûbehera Biçûkan**, weş. Avesta, Stenbol 2008, r. 159.

¹⁷⁹ Heyderî, **Tuhfetü’l-Heyderî**, r. 27.

¹⁸⁰ Abdurrahman Adak, “Şewqîyê Xanî li Pey Şopa Ehmedê Xanî: Berawirdkirinek li Ser Mulemme‘ên Wan ên Çarzimanî” **Nûbihar Akademî**, 2016, j. 5, r.37.

¹⁸¹ Abdurrahman Adak, **Teşeyên Nezmê Di edebiyata kurdî ya klasîk de**, weşanên Nûbihar, Stenbol, 2019, r. 400.

Mulemme‘a Xanî ji alîyê teşeyê ve murebbe‘ e û dikeve nava teşeyên nezmê yên ku ji bendan pêk tên. Ev murebbe‘ ji pênc bendan pêk tê. Benda ewil di nava xwe de û bendên din jî misrayên çarem bi benda ewil re hemserwa ne. Yanî teşeya mulemme‘ê murebbe‘a muzdewîc e. Mulemme‘a Xanî, kêşa erûzê ji behra remelê bi qaliba “fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilun” hatiye nivîsîn û hunera telmî‘ê hatiye bikaranîn. Lewra helbesteke pirzimanî ye (Erebî, Farisî, Tirkî, Kurdî).¹⁸²

Gava em ji alîyê ruxsarê ve li her du mulemme‘ên Heyderî dinêrin, em dibînin ku wek mulemme‘a Xanî her du jî bi teşeya murebbe‘ê ne û benda ewil di nava xwe de, bendên din jî misrayên çarem bi benda ewil re hemserwa ne. Teşeya her duyan jî murebbe‘a muzdewîc e. Dîsa her du jî wek mulemme‘a Xanî bi kêşa erûzê, ji behra remelê bi qaliba “fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilun”ê ne. Lê cudahîyên di navbera mulemme‘a Xanî û yên Heyderî de yek jê ew e ku deng û cureya serwaya wan cuda ne û cudahîyeke din jî ew e ku mulemme‘a Xanî ji 5 bendan yên Heyderî ji 6 bendan pêk tên.

Ji alîyê telmî‘ê ve mulemme‘ên Heyderî ya di rêza 40î wek a Xanî ye lewra mulemme‘eke çarzimanî ye. Misraya yekem bi Erebî, misraya duyem bi Farisî, a sêyem bi Tirkî û ya çarem jî bi Kurdî ye. Lê mulemme‘a di rêza 41ê de sê zimanî ye. Misraya yekem bi Erebî, misraya duyem bi Kurdî, a sêyem bi Tirkî û ya çarem jî dîsa bi Kurdî ye. Ji alîyê naverokê ve jî mulemme‘a Xanî mersiyyeyeke li ser şehîdên bûyera Kerbelayê¹⁸³ ye. Mulemme‘ên Heyderî jî ya rêza 40î medhiyyeyeke li ser Şêx Me‘sumê Xeznewî ye û ya 41ê jî mersiyyeyeke li ser şîna Şêx Eladînê Xeznewî ye. Bo nimûne em ê li jêrê bendeke ji mulemme‘a Xanî û ji her du mulemme‘ên Heyderî jî ji her yekê bendeke bidin.

¹⁸² Adak Şewqîyê Xanî li Pey Şopa Ehmedê Xanî: Berawirdkirinek li Ser Mulemme‘ên Wan ên Çarzimanî”, r. 50.

¹⁸³ Kurê Hz. Elî û Nevîyê Hz. Mûhemed, Hz. Husên piştî wefata bavê xwe li Medîne bi cih bû. Piştî muawîye mir kurê wî Yezîd xelîfetiya xwe îlan kir, lê Hz. Husên biatê wî nekir. Xelkên Kûfeyê bangewazî li Hz. Husên kirin da ku wî xelîfê xwe qebûl bikin. Hz. Husên, malbat û hevalên xwe ketin rê bo çûna Iraqê. Lê Yezîd û leşkerên xwe nehiştin ew û alîgirên wî têkevîn Iraqê û li herêma Kerbelayê muddetekê wan tî hiştin û paşê Hz. Husên û 72 kes li meydana Kerbelayê şehîd kirin. Ev bûyera ku di sala 683yan a hicrî de qewimî di dîrok û edebiyata gelên misilman de bi navê “bûyera Kerbelayê” hat bi navkirin. Bo agahîyên berfirehtir Bnr: Pala, h.b., r. 50 (Aşûre), r. 230 (Huseyîn), r. 279 (Kerbeka).

Ehmedê Xanî;

Leyse fî qelbî sîwake ya hebîbî kule hal

Her demem xem hem demen sudder fîraqet mah û sal

Ger benim kanım dilersen çoktan olmuştur helal

*Mest û serxwoşem ji işqê min nema ‘eql û kemal*¹⁸⁴

Heyderî;

Mulemme‘a Yekem

El- fîraqû halenî min be‘di hubbin qed weced

Kemterîn dilxwahê in şod ber muradeş ne resed

Ger bu yolda ben ölürsem çare yoq sizden sened

Merhema derd û birîna wê li cem Me‘şûm weced

(40/1)

Mulemme‘a Duyem

El-fîraqû i ‘teranî hakeza kane`l-qeder

El-meded Ğewşê zemanî dil li min bûye diger

Eyledim ettim fîğani ey felek yağtî ciger

Ey şehê min nav gelê min da dilê min şed keser

(41/1)

Ji bo tesîra Ehmedê Xanî ya li ser Heyderî, em dikarin behsa berhema Xanî “*Mem û Zîn*”ê jî bikin ku vê berhemê li ser gelek helbestvanên Kurd bandor kiriye. Di dîwana Heyderî de em 12 caran, rastî navên Mem, Zîn û Sitû ku qehremanên mesnewîya “*Mem û Zîn*”ê ne tên.

¹⁸⁴ Abdurrahman Durre, *Şerha Dîwana Ehmedê Xanî Felsefe û Jiyana Wî*, weş. Avesta, Stenbol 2002, r. 252.

Ne wek wî Rustem û ‘Enter / ne Kisra Xatem û Qeyşer

Ne şed **Zîn** û hezar dilber / nebû wek wî di husnê da

(32/7)

Dilo rabe ji zindanê biderkev tû bibîn keysê

Xwe bighîn ber derê yarê bibêje wê perî lubsê

Çira îro li halê vî birîndarê xwe napirsê

Ji ber ça ‘va xwe wunda kir li min dunya wekî hebsê

Nema tê û diçî îro **Sit û Zînê** birîndar

(65/3)

1.3.1.4. Melayê Bateyî (XVII-XVIII)

Melayê Bateyî helbestvanekî klasîk e ku di sedsala hivdehem de hatiye dinyayê û heta bi nîvê serdema duyem ji sedsala hijdehem jîyaye.¹⁸⁵ Navê wî yê rastîn Huseyn e lê ji ber ku ji herêma Hekkarî ji gundê Batê ye û mela bûye bi navê Melayê Bateyî hatiye naskirin. Di helbestên xwe de mexlesa Bateyî bi kar anîye. Di edebiyata Kurdî de mewlûda wî girîng e ku di nava mewlûdên Kurdî de mewlûda yekem tê qebûlkirin. Dîsa berhemeke bi navê “*Zembîlfiroş*”, berhemeke bi Erebi-Farisî bi navê “*Hemaîl*” û hin helbest nivîsîne. Helbestên wî yên dînî di derheqê yekîtî û mezinahîya Xweda û medhê Cenabê Pêxember de ne.¹⁸⁶

Helbesta Heyderî ya di rêza yekê de tewhîd e û ji alîyê awaz, serwa, peyvên tê de hatine bikaranîn û mesaja helbestê ya bi giştî, wek helbesteke melayê Bateyî ye. herdu helbest jî li ser yekîtîya Xwedê hatine nivîsîn. Bo nimûne em ê li jêrê ji her helbestekê malikekê bidin.

¹⁸⁵ Adak, **Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk**, r. 272.

¹⁸⁶ Adak, **Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk**, r. 278, 281, 283.

Melayê Bateyî;

Ya Ilahî tu Kerîm î / tu xefûr î tu ‘Ezîm î

Ji ezel da tu qedîm î / melîkê seqfê sema yî¹⁸⁷

Heyderî;

Ya Ilahî tu Hesîb î / Şemed û Heyy û Reqîb î

Tu Mu‘în î û Mucîb î / ji te hêvî û rica ma

(1/1)

Her wekî me li jor got, mewlûdname di edebiyata Kurdî de cara yekem ji alîyê Melayê Bateyî ve hatiye nivîsîn. Heyderî jî du mewlûd nivîsîne ku ya bi navê “*Mewludu’n-Nebî*” bi Erebi û pexşankî ye. Ya bi navê “*Mewlûda Nebî*” jî bi Kurdî û menzûm e. Mewlûda Heyderî ya bi navê “*Mewlûda Nebî*” çî ji alîyê ruxsarî, çî ji alîyê naverokî xalên hevpar di navbera wê û mewlûda Bateyî de hene.

Ji alîyê ruxsarê ve mewlûda Bateyî bi teşeya mesnewîyê ye û bi kêşa erûzê ji behra remelê bi qaliba “fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilun”ê hatiye nivîsîn.¹⁸⁸ Mewlûda Heyderî jî wek a Bateyî bi teşeya mesnewîyê ye, bi kêşa erûzê û bi heman qalibê “fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilun”ê ye. Bo nimûne em ê malikên neqerat (dubare) li jêrê bidin;

Bateyî;

Ger divêtin hûn ji narî bin necat

Bi ‘eşq û şewqek hûn bibêjin esselat¹⁸⁹

Heyderî;

Hûn ji ‘işqa dil bibêjin berdewam

Ser muhemmed es-selat û we’s-Selam¹⁹⁰

¹⁸⁷ Xalid Sadinî, **Mela Huseynê Bateyî Jiyan Berhem û Helbestên Wî**, çapa 2., weş. Nûbihar, Stenbol, 2011, r. 51.

¹⁸⁸ Ziver Ilhan, h.b., r. 17.

¹⁸⁹ Sadinî, h.b., r.176.

¹⁹⁰ Yıldız, h.b., r. 45.

Ji alîyê naverokê ve mewlûda Heyderî nêzî ya Bateyî ye. Carinan bi peyvên û terkîban, carinan jî bi ravek û hunerên edebî ku di malikan de hatine bikaranîn wek hev in. Em ê niha jî heft nimûneyan ji mewlûda Bateyî û Heyderî, ku ji alîyê peyv, huner û naverokê ve wek hev in, bidin. Em ê malikên mewlûda Bateyî ji xebata Zîwer Ilhan ya teza lîsansa bilind û yê Heyderî jî ji xebata Mehmet Yıldız a ku semînera lîsansa bilind e werbigirin.

Nimûne 1:

Bû wekî dura sipî wê sa'etê

Çewtê da der cuyibarê Cennetê **(Bateyî)**¹⁹¹

Bû wekî durra sipê pir şu'le da

Çû sucûdê hem girî hemdê Xweda **(Heyderî)**¹⁹²

Nimûne 2:

Şerfê mewlûda min yek dîrhem fer e

Hemberê yek kohê zêrê ehmêr e **(Bateyî)**¹⁹³

Hin pere mesrûf kirin ber mewlûdê

Wek çiyakî zêr di xeyrê da didê **(Heyderî)**¹⁹⁴

Nimûne 3:

Reftê gurgê hate berxê nûciwan

Lê belê hişyar e lê zîba şivan **(Bateyî)**¹⁹⁵

¹⁹¹ Ilhan, h.b., r. 69.

¹⁹² Yıldız, h.b., r. 51.

¹⁹³ Ilhan, h.b., r. 62.

¹⁹⁴ Yıldız, h.b., r. 44.

¹⁹⁵ Ilhan, h.b., r. 81.

Nageha fikrê Weheb dî j' asîman

Hate xwarê leşkerê rûhanîyan **(Bateyî)**¹⁹⁶

Rokê 'Ebdullah çû seydê ew tenê

Wan hucûm kir wek gura tev hatinê **(Heyderî)**¹⁹⁷

Ew hucûma wek gurê go têne pez

Wî bi çava dî belê dîtî bi lez **(Heyderî)**¹⁹⁸

'Eskerê xeybê ji jor de hate xwar

Ew cuhû kirne hilakê tar û mar **(Heyderî)**¹⁹⁹

Nimûne 4:

Her çi dara hişk e ez biçme binî

Dû heşîn û kate ez pelgan xenî **(Bateyî)**²⁰⁰

Dara hişk rûnim li bin ew şîn dibî

Go ji bin çûm wek berê dar hişk dibî **(Heyderî)**²⁰¹

Nimûne 5:

Mahê ewwel hate Adem teyyîba

Kir selam û gote helme:”Merheba” **(Bateyî)**²⁰²

¹⁹⁶ Ilhan, h.b., r. 81.

¹⁹⁷ Yıldız, h.b., r. 63.

¹⁹⁸ Yıldız, h.b., r. 63.

¹⁹⁹ Yıldız, h.b., r. 63.

²⁰⁰ Ilhan, h.b., r. 76.

²⁰¹ Yıldız, h.b., r. 62.

²⁰² Ilhan, h.b., r. 88.

Mahê ewwel hatî Adem kir kelam

Ey Mûhemed merheba hem kir selam **(Heyderî)**²⁰³

Nîmûne 6:

“Ya qelem binvîse em vê padişah

Ez çi binvîsim bi ferman ya Îlah **(Bateyî)**²⁰⁴

Heq Xwedê gotî qelem binvîs heme

Go çi binvîsim li ber emrê te me **(Heyderî)**²⁰⁵

Nîmûne 7:

Ne ji me sûc û xeta tên û sîtem

Lê ji te îhsan û xufran û kerem **(Bateyî)**²⁰⁶

Em gunehkar çav li xufrana te ne

Hêvîdarê rehm û îhsana te ne **(Heyderî)**²⁰⁷

Mewlûda Bateyî di beşa xwedêdana Pêxember de hunera tekrîrê bi
“merheba”yê ye, lê Heyderî li şûna merhebeyê “hat” bi kar anîye.

Merheba ey ‘alî sultan **merheba**

Merheba ey kanê ‘îrfan **merheba (Bateyî)**²⁰⁸

Merheba ey îftîharê enbîya

Merheba ey semî‘ cem‘ê ewlîya **(Bateyî)**²⁰⁹

²⁰³ Yıldız, h.b., r. 74.

²⁰⁴ İlhan, h.b., r. 67.

²⁰⁵ Yıldız, h.b., r. 51.

²⁰⁶ İlhan, h.b., r. 60.

²⁰⁷ Yıldız, h.b., r. 43.

²⁰⁸ İlhan, h.b., r. 93.

²⁰⁹ İlhan, h.b., r. 96.

Hat Mûhemed ser ser û çava re **hat**

Hat Mûhemed roja îmanê hilat (**Heyderî**)²¹⁰

Hatî sultanê cemî‘ê enbîya

Hatî nûra her du çavê ewlîya (**Heyderî**)²¹¹

1.3.1.5. Şêx Evdirehmanê Aqtepî (1842-1910)

Şêx Evdirehman li gorî arşîvên Osmanîyan di sala 1854an de li gundê Aqtepê yê bi ser navçeya Diyarbekirê Çinarê hatiye dinyayê.²¹² Di malbateke malmezin û ehlê terîqetê de mezin bûye. Perwerdehiyeke bi rêkûpêk wergirtiye û bûye şêxekî Neşebendî-Xalidî. Di warê edebiyatê de gelek berhem nivîsîne. Ji berhemên wî gelek negihaştine roja me, winda bûne. Lê 13 berhemên wî gihaştine roja me ya îroyîn.²¹³ Her wekî şêxê terîqetê bû, di heman demê de muderîs, lêkoler û helbestvan jî bû. Berhemên wî du heb jê bi Kurdî yên din bi Erebî ne. Berhemên wî yên Kurdî; “*Rewdne ‘îm*” û “*Dîwan*” e.²¹⁴ Di dîwanê de mexlesa “*Rûhî*” bi kar anîye. Dîwana wî ji alîyê tesewifê ve nimûneyeke girîng e.²¹⁵ Şêx Evdirehman ji alîyê bawerî, neteweperwerî û helbestvanîyê di bin bandora Ehmedê Xanî de maye. Di edebiyata Kurdî de bi ekola xwe hewl daye ku dîsa ruhê Xanî vejîne, Aqtepî û ekola Aqtepê²¹⁶tevgerike “*neoxanî/nûxanî*” ye.²¹⁷ Şêx Evdirehmanê Aqtepî di sala 1910an de li Diyarbekirê wefat kiriye û li gundê Aqtepê li cem qebra bavê xwe hatiye definkirin.²¹⁸ Ji çend helbestên Heyderî xuya dike ku di bin bandora Şêx Evdirehmanê Aqtepî de maye. Ev helbest hem ji alîyê kêş û serwayê hem ji alîyê

²¹⁰ Yıldız, h.b., r. 82.

²¹¹ Yıldız, h.b., r. 83.

²¹² Murat Özaydın, “*Şeyh Abdurrahman Aktepe Hayatı Eserleri ve Tasavvufi Görüşleri*”, (Doktora Tezi, Ankara Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Ankara 2008), r. 47.

²¹³ Özaydın, h.b., r. 46.

²¹⁴ Osman Aslanoglu, “*Gîya Dîwana Şêx Ebdurrehmanê Aqtepî Da*”, The Journal of Mesopotamian Studies, c. 5, j. 1, r. 22.

²¹⁵ Abdurrahman Adak, “*Rûhî: Helbestvanekî Dahêner Ê Serdema Piştî Mîrektiyan û Bandora Wî*”, *Sûryani Arap ve Kürt Klasikleri (Uluslararası Klasikler Çalıştayı Bildirileri)*, Mardin, Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları, Aralık 2017, r. 491.

²¹⁶ Di derheqê Ekola Aqtepeyîyan de bo agahîyên berfirehtir, bnr. Abdurrahman Adak, “*Ekola Aqtepeyê ya Edebiyatê û Hizra Kurdî-Elewî-Neşebendîyê*”, *Nubihar*, j. 131, n.r. 10-15.

²¹⁷ Rênas Jiyan, *Şêx Evdirehmanê Aqtepî Dîwana Rûhî*, weş. Belkî, Stenbol 2013, r. 10.

²¹⁸ Özaydın, h.b., r. 68.

peyv û terkîban ve û hem jî bi mesaja ku di helbestan de xuya dike ku nezîre ne li ser helbestên Aqtepî.

Heydererî nezîreyek li ser helbesteke Aqtepî ku zimanê wê Farisî ye nivîsîye. Ev helbesta Aqtepî ji heft bendan pêk tê. Benda ewil di nava xwe de hemserwa ye bendên din jî misrayên pêncem bi benda ewil re hemserwa ne. Bi vî awayî helbest ji aliyê teşeyê ve muxemmesek e muzdewîc e. Helbest bi paşserwaya “Neqşebend”ê û bi kêşa erûzê ji behra remelê, bi qaliba “fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilatun”ê hatiye nivîsîn. Helbesta Heyderî ya di rêza 64an de wek helbesta Aqtepî ji heft bendan pêk tê û muxemmeseke muzdewîc e. Paşserwaya wê jî “Neqşebend”e û bi kêşa erûzê ji behra remelê, bi qaliba “fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilatun”ê hatiye nivîsîn. Ji aliyê naverokê ve muxemmesa Aqtepî û Heyderî, her du jî medhiye ne û tê de pesnê terîqeta Neqşebendîyan tê kirin. E mê li jêrê bo nimûne ji her du helbestan bendên yekem bidin.

Aqtepî;

Peyrewê dermandeem rû ber-hudayê Neqşîbend

Dest(i) der-damanê pakê bê riyayê Neqşîbend

Şehriyar im zankî ustad em gedayê Neqşîbend

Tûtîyayê dîdesaz im xakêpayê Neqşîbend

Tabiya bim sirrê Heqq ez-feyzê şahê Neqşîbend²¹⁹

Heyderî;

Çû zemanê ‘eks û cuhlê hatî dewra Neqşebend

Şîn bû dara piştî hişk bû wa li Xezna Neqşebend

Ê divê Eḥmed bibînî herne Xezna Neqşebend

²¹⁹ Adak, “Ekola Aqtepeyê ya Edebiyatê û Hizra Kurdîti-Elewîti-Neqşebendîtiyê”, h.b., r. 15.

Ev helbesta Şêx Evdîrehmanê Aqtepî bi zimanê Farisî ye. Kurdîya wê wiha ye:

Ez ew bêçareyê çav li dîdariyên Neqşîbend im

Wek paqîjek bêriya dest li damena Neqşîbend

Ji ber ku wek bende li ber Neqşîbend rawestiyame şah im

Xaka li ber piyê Neqşîbend wek tûtîya li çavan dikişînim

Heta ku ez sirra rasteqînê dabîn dikim ji Feyza Neqşîbend

Bo Kurdîya Bnr.: Aqtepî, **Dîwan**, h.b., r.59

Herne ‘alim herne şofî herne Xezna Neqşebend

Şed xwezî b’ wî muslimanê bighê Xezna Neqşebend

(64/1)

Dîsa helbesta di rêza 70yî de jî wek nezîre li ser helbesteke Aqtepî hatiye nivîsîn. Ji alîyê ruxsarê ve bi heman kêş, serwayê ne. Ji alîyê naverokê (pesnê terîqeta Neqşebedîtîyê dide û biçûkatîya xwe li hember terîqetê dide nîşandan) jî peyv û mecazên (me‘den, cûd û sexa, feqîrê hewce, şermende, geda el-eman) hatine bikaranîn û mesaja giştî ya her du helbestan jî yek e. Em ê li jêrê cih bidin bendên her du helbestvanan.

Aqtepî;

Kelbê şahê Neqşebend im ta li dunya zinde me

Me‘dena cûd û sexa yî ez feqîr im hewce me

Der sulûkê rahê heq ez murxekî per-beste me

Bêhişê xemra gunah im ‘asiyê şermende me

El-eman şahê mezin yexsîrê zencîra te me²²⁰

Heyderî;

Nêrgiza bagê cinana gewşê ‘alem e ‘zem e

Ez ji ber le‘lê şeker taca teber sermeste me

Me‘dena ‘ilm û terîqê ez feqîr im hewce me

Pir gunehkar im zelîl im ez geda şermende me

Ez dexîl im bavê Me‘şûm sa’il im bê çare me

Şed meded şeyxê terîqê kelbê dergahê te me

(70/1)

²²⁰ Aqtepî, Dîwan, h.b., r. 142.

Der sulûka Neqşebendî tu re'îsê ewliya
 Kaniya cûd û sexa'ê ke'begahê şofiya
 Muşfiyê qelbê xerab e lûtfekarê 'aşiya
 Şehsiwarê dîn û dewlet lew li Xezna bû xuya
 Ez dexîl im bavê Me'sûm sa'il im bê çare me
 Şed meded pîrê terîqê kelbê dergahê te me

(70/2)

1.3.1.6. Mela Ehmedê Heyderî (1887-1938)

Mela Ehmedê Heyderî bavê Şêx Mihemed Emînê Heyderî ye. Gava em li dîwana Mela Ehmedê Heyderî û Şêx Mihemed Emînê Heyderî dinêrin, em dibînin ku di gelek xalan de alîyên wan ên hevpar hene. Ev jî nîşane ye ku Heyderî daye pê şopa bavê xwe. Berî her tiştî Mihemed Emîn Heyderî wek bavê xwe mexlesa “Heyderî” bi kar anîye. Her wekî tê zanîn Mela Ehmed berhemeke bi navê “*Eqîda Îmanê*” nivîsiye ku lawê wî jî di vî warî de berhemek nivîsiye. Dîsa Mela Ehmed bi teşeya murebbe'ê mulemm'eke çarzimanî (Erebî, Farisî, Tirkî, Kurdî) nivîsiye ku Heyderî jî bi heman terzê du mulemm'e nivîsiye.

Di metna dîwanê de di rêza 8an de Mihemed Emîn Heyderî li ser qesîdeyeke bavê xwe ku ji 13 malikan pêk tê bi heman kêş û serwayê çar malik zêde kiriye û xistiye nav dîwana xwe. Ev jî tesîra Mela Ehmed li ser Mihemed Emîn nîşan dide.²²¹

Di dîwana Mihemed Emîn de di rêza 34an de tercî'bendek heye ku li ser tercî'benda bavê xwe nezîre kiriye. Lewra ji alîyê şikl û naverokê ve di navbera wan de gelek xalên hevpar hene. Tercî'benda Mela Ehmed ji heft bendan pêk tê. Di bend û wasiteyan de behrên erûzê yên cuda hatine bikaranîn. Di bendan de behra recezê ya bi qaliba “mustefîlun mustefîlun mustefîlun mustefîlun” û di wasiteyan (ku sê misrayî ne û li dawîya her bendekê dubare dibin) de jî behra remelê qaliba “fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun fa'îlatun” hatiye bikaranîn. Her bendek ji pênc misrayan pêk tê û her

²²¹ Bo nimûne bnr. li helbesta di rêza 8an ya di beşa çarem de.

bendek di nava xwe de bi serwa ne lê misrayên çaran bi benda ewil re hemserwa ye. Di her bendekê de serwaya navekî jî hatiye bikaranîn.²²²

Ev xalên li jor me ji bo tercî‘benda Mela Ehmed dan ji xeynî cudahiyeke hemû taybetîyên din ji bo tercî‘benda Mihemed Emîn jî derbasdar in. Tenê cudahîyeke heye ku tercî‘benda Mela Ehmed hemû bend pênc misrayî ne lê ya Mihemed Emîn, benda yekem ji çar misrayan û bendên din jî ji çar û nîv misrayan pêk tên. Lê ji xeynî vê xalê hemû xalên din hevpar in ku ev jî tesîra Mela Ehmed li ser Mihemed Emîn misoger dike. Li jêrê em ê cih bidin bendên yekem ên tercî‘bendên her du helbestvanan.

Mela Ehmedê Heyderî;

Ey dilberê şox û şepal lebkewserê awirgezal
Sîmgebgêbê serwa feşal her dem ji wan mijganê al
Agir didî nêv cerg û bal lê hildikî badê şimal
Pê werdikî gaza zelal yek car te ez xistim ji hal
Tenha gerrîb û bêheval şostim li ‘erdê gurbetê

Ger di heşrê Heyderî Ehmed bibîn Firdewsê ‘al
Bê te ey dêmsorgula bêçare bilbil rûh li bal
Terkê firdewsê didem nar xweştir e bêqîl û qal²²³

Şêx Mihemed Emînê Heyderî;

Ey nazikê qenc û delal / wech û enî tev şewqe xal
Meş-ḥakim û şêrîn-feşal / lew menbe‘a ḥusn û cemal
Çav-qemerî awir-gezal / yek car helandî qelb û bal
Me‘şûm tebî‘et pir kemal / nefes merhem ebrû-hilal
Taze gul û reyḥane‘ê

²²² Beyter, h.b., r. 64.

²²³ Beyter, h.b., r. 186.

Ger dipirsî ez hezîn im dilkesîr û nale nal
Bulbulê dilpare xwîn im şorgula min rûh li bal
Pirs bike carek li halê **Heyderî** goyîn mişal

(34/2)

Mihemed Emîn, qesîdeyek nivîsîye ku ev qesîde li ser xezeleke Mela Ehmed nezîre ye. Lewra peyv û îfadeyên hevpar di wan de hene, kêş û serwaya her du helbestan yek e. Di her du helbestan de jî serwaya navekî heye û cureya musemmeta tercî'ê ne. Em ê li jêrê bo nimûne ji her du qesîdeyan çend malikan bidin.

Mela Ehmedê Heyderî;

Menbe'a **husn** û cemalê **canfida me canfida**

Esmerê şêrîneşalê canfida me canfida

'Eksê **husna** dêmê enwer zîsena kir necmê exter

Qameta manendê 'er'ê **canfida me canfida**²²⁴

Şêx Mihemed Emînê Heyderî;

Şeyxê kamil mîrê 'adil / **canfida me canfida**

Murşidê şêrîn û faḍil / **canfida me canfida**

(16/1)

Ba cemala roj mişal e / navşirîn Me'şûm delal e

Esmerê awir-gezal e / canfida me canfida

(16/2)

²²⁴ Beyter, h.b., r. 86.

Mihemed Emîn, 6 helbestên din li ser helbestên bavê xwe bi heman kêş û serwayê wek nezîre nivîsîne. Di van helbestan de ji xeynî kêş û serwayê gelek peyv, ravek û hevokên hevpar jî hene. Bo nimûne em ê li jêr ji her helbestekê perçeyekê wek mînak bidin.

Mela Ehmedê Heyderî;

Dil jimin bir qametê ruh û rewanê min divêt

Tîr û qewseynê hilalê ku li burca **qemerê**²²⁵

Şêx Mihemed Emînê Heyderî;

Lew me ji remz û nezer qet em ji xu bê xeber in

Ku cemala eniyê zêde ji husna **qemerê**

(10/8)

Mela Ehmedê Heyderî;

Cenetu`l-Firdewsê baqê xuld û me`wa`ê heq

Ew li ser min dojah in bê ru`yeta yarê **Helîm**²²⁶

Şêx Mihemed Emînê Heyderî;

Sorgula bustan û bağan / reng û nîşan û wesîm

Melce`ê şah û feqîran / padişahê pir **helîm**

(14/1)

Mela Ehmedê Heyderî;

Heyderî ey mahîsîma mest û sukranê **te bit**

‘Aşîqê dil bû du nîma canfida canê **te bit**²²⁷

²²⁵ Beyter, h.b., r. 225.

²²⁶ Beyter, h.b., r. 197.

²²⁷ Beyter, h.b., r. 102.

Şêx Mihemed Emînê Heyderî;

Ey Xuda erda mubarek / her dibin hîfza **te bî**

Hukmê Xezna'ê bi carek / daxilê rehma **te bî**

(31/1)

Mela Ehmedê Heyderî;

Dê rûh fida kim ez niha husn û cemala bêbiha

Îcadi bûn jê nûriha şewqê li **dunya'ê veda**²²⁸

Şêx Mihemed Emînê Heyderî;

Îro şemala Xeznewî / eţrafê 'alem şu'le da

Berq û burûska Xeznewî / **dunya** li ber **pêta veda**

(74/1)

Mela Ehmedê Heyderî;

Ez rûzê firaqê ta bi în rûzê 'eyan **im**

Mecnûnê zeman im

'Eqlê me belav elêki der 'eynê yeqîn **im**

Her lehze û her an²²⁹

Şêx Mihemed Emînê Heyderî;

Şahê me çi teb'et melek e qend û şeker-leb

Zîb û zuqen û ğebğeb

Pişta me feqîra ye çi bê şebr ûa qerar **im**

Mecnûnê zeman im

(77/6)

²²⁸ Beyter, h.b., r. 85.

²²⁹ Beyter, h.b., r. 205.

Mela Ehmedê Heyderî;

Ey şehîṣahê mu‘ezzem Heyderî bewwab **î tû**

Bêkes û pabeste pir gem ma di nêv girdab **î tû**²³⁰

Şêx Mihemed Emînê Heyderî;

Ke‘beya ḥusn û cemalê zîneta xopan **î tû**

Dilberê gerden gezalê murşidê insan **î tû**

(78/1)

Carinan jî tesîra Heyderî bi peyv û ravekan xuya dibe.

Mela Ehmedê Heyderî;

Ya Heyderî ehmed tu di ‘îşqê da **şehîr î**

Der saye‘ê wan zulfê perîşan û herîr î

Teşbîhê Suleymanê bi kursî yû serîr î

Wek bilbilê rezbanê di gulşen da **biqêr î**

Bağê te seraser hate ser heddê kemal î

Wirda dihebînî ew e dermanê birîn î²³¹

Şêx Mihemed Emînê Heyderî;

Ey şahê m’ tu hebîbî we di ḥusnê de **şehîr î**

Der eşl û neşeb ḥakim û sultân û emîr î

Ṭeb‘et esed î şêrê li meydanê **biqîr î**

Xweş beṭlê di Islamê muğîş î we neşîr î

Îrhem bi kuleybin leke yanûre beşîrî

(62/1)

²³⁰ Beyter, h.b., r. 216.

²³¹ Beyter, h.b., r. 224.

1.3.1.7. Şêx Eladînê Xeznewî (1919-1969)

Şêx Eladîn bi zimanê Kurdî, Erebi û Farisî pir helbest û qesîde nivîsîne.²³² Şêx Eladîn di ilm û tesewifê de muderîs û rêberê Heyderî bû. Heyderî di warê tesewifê de gelekî di bin bandora wî de maye û xelîfetîya tesewifê jî ji cem wî wergirtiye. Her wekî li cem wî xwendîye û bûye xelîfeyê wî ji alîyê rûhî û edebî ve jî di bin bandora wî de maye. Ne'ta Heyderî ya li ser Cenabê Pêxember li ser qesîdeya Şêx Eladîn hatiye nezîrekirin. Em ê li jêrê bo nimûne du malikên serî yên her du qesîdeyan bidin.

Şêx Eladîn;

Em zelîl in em feqîr in **ya Resûlellah meded**

Em esîr in pir heqîr in **ya Hebîbellah meded**

Derdê me derdek 'ecîb e sed hewar nîne mûcîb e

Ne dewa û ne tebîb e **ya Resûlellah meded**²³³

Heyderî;

Ya Ilahî her dibêjim / **ya Resûlellah meded**

Bêkes û 'ebdal û gêj im / **ya Resûlellah meded**

(4/1)

Bêkes im ser wechê 'erdê / hatime ber deryê rewqê

Ez dexîl im min neberdê / **ya Resûlellah meded**

(4/2)

²³² Zivingî, h.b., r. 110.

²³³ Zivingî, h.b., r. 110.

Heyderî di benda pêncem ya helbesta 64an de atîfî Şêx Eladîn û Helbesta wî kiriye û di çarçoveya hunera tezmînê de qismek ji helbesteke Xeznewî îqtûbas kiriye.

Şêx Eladîn;

Ger hûn birîndar in werin ger hûn gunehkar in werin

Ger hûn sulûkvan in **wer in werin werin pir zû werin**

Werin li cem şêxê delal dizgîn û adab pur kemal

Yeqîn dewa'ê bê misal **werin werin pir zû werin**²³⁴

Heyderî;

Neqşebendî pir dixwazin em li dûv rêzê herin

Ger dixwazin hûn nebin mehrûm ji feyza wan herin

Şêx 'Eladdîn go werin **ger hûn birîndar in werin**

Ger hûn gunehkar in werin werin werin pir zû werin

Me' dena feyz û terîqê hatî Xezna Neqşebend

(64/5)

1.3.2. Kesayetîya Heyderî ya Poetîk

Heyderî helbestvanekî edebiyata Kurdî ya klasîk e. Her çiqas di serdemek modern de jîya be jî dustûrên edebiyata klasîk ji hunera xwe re kiriye bingeh, hêz û qeweta hibra pênuşa xwe di cihokên edebiyata Kurdî ya klasîk de herikandiye.

Helbestvanên klasîk ji bo xweserîya xwe ya hunerî, edebî bi dest bixin di hin rê û merhaleyan de derbas bûne. Ji bo vê jî helbestvaneke di hunerê de serkeftî yê berîya xwe ji xwe re kirine rêber. Ev tiştekî ji rêzê ye. Lewra armanc ew e ku bi tecrûbeyên berîya xwe di riya hunerê de bi zanîn û serkeftîyane pêş bikevin û ber bi armanca xwe ve bimeşin. Heyderî jî di rêya hunerî de bi taybetî Melayê Cizîrî û bavê xwe (Mela Ehmedê Heyderî) şopandine û wan ji xwe re kirine rêber.

Heyderî îlhama xwe ji çanda tesewif û tekyayê girtiye. Helbestên xwe hemû di vê çarçoveyê de nivîsîne. Naveroka helbestên wî, hezkirina Xweda, evîna Cenabê Pêxember û muhebeta tekya û şêxên wî ne. Cureyên edebî yên di dîwana wî de ji 82% medhiye û ji 9% jî mersiye ne. Piştî bi rêzê munacat, ne‘t, hîcwiye û pendname nivîsîye. Naveroka helbestên wî reng daye zimanê wî jî. Ji ber ku di edebiyata tekyayê de armanc fêmkirina hizrî ya tekyayê ye, zimanên helbestvanên edebiyata tekyayê jî sade ne.²³⁵ Zimanê Heyderî jî di vê çarçoveyê de zimanekî sade û fêambar e.

Heyderî ji aliyê teşeyên nezmê jî serkeftî ye. Bi 12 teşeyên nezmê helbest ristiye. Ji nav teşeyên nezmê jî herî pir qesîde (36 heb) û piştî muxemmes (26 heb) nivîsîye. Pîrbûna qesîdeyan ji rêzê ye. Lewra di gelek dîwanan de rêjeya qesîdeyan zêde ne. Lê pîrbûna muxemmesan di dîwanê de xweserîya wî ya bi karanîna vê teşeyê nîşan dide.

Heyderî hemû helbestên dîwana xwe bi kêşa erûzê ristiye. Ev jî sadiqbûna wî ya bi tradîsyona kêşa edebiyata klasîk re nîşan dide. Ji aliyê ritm û mûsîqîyê xweserîyek wî jê jî ew e ku di 39 helbestan de digel serwaya bingeîn, serwaya navekî (tesmît) jî bi kar anîye. Heyderî di warê tasmîtê de jî Melayê Cizîrî şopandiye. Lewra di dîwana melayê Cizîrî de 31 helbestên bi tasmît hene.²³⁶ Gava em li parçeyên paşserwayên dîwanê yên bêje û kombêjeyî dinêrin, em dibînin ku di bêje û kombêjeyên ku Heyderî bi kar anîne, derheqê cihê xwe yê di edebiyata tekyayê de fikrekê dide. Her weha ev paşserwayên bêje û kombêjeyî di derheqê naveroka helbestan de jî agahî didin me. Hin paşserwayên bêje û kombêjeyî weha ne: Munacat: “li min rehmê bike ya Reb” (helbesta 2), ne‘t: “ya Resûlellah meded” (helbesta 4), medhiyeyên li ser tekya û şêxên Xeznewî: “Xeznewî” (helbestên 6, 7, 8, 46, 68, 80), “bi qurbana te bim Ehmed”(11), “merqed” (13), “Me‘sûm” (24), “Elaeddîn” (26, 66, 67), “Hezret û Seyda” (43), “Seyda” (44), “Xezna Neqşebend” (64) “dergah” (70).

²³⁴ Bo agahiyên berfirehtir, bnr. “**Dîwana Camî‘a**” diwana berhevkirî ya Mihemed Şêxmûsê Botî El-Neqşebendî, r. 123.

1.3.3. Kesayetîya Heyderî ya Dînî / Tesewîfî

Di hemû berhemên Heyderî de kesayetîyeke dînî/tesewîfî derdikeve pêş. Mijarên sereke yê di berhemên wî de ev in; tesewîf, hezkirina Xweda, evîna Cenabê Pêxember, muhebet û wefadarîya wî ya li ser şêxên wî, terîqet, tekya, rexneya civakê û mirovên zemanê talî ye. Di hin helbestên xwe de li ser rewşa mirovên îroyîn disekine û xerabîya ku ketiye nav alemê bi şêwazeke rexneyî vedibêje û xelasîyê di lêvegerîna dîn de dibîne û di vê çarçoveyê de rêçeteyekê jî nîşan dide.

Di helbesta 44an de di serî de bangî civakê dike;

Ey cîran û ehlê dunê / 'ê kû li dîn guhdar bizan

Hûn guh bidin vê gotinê / dîn bû gerîb û bê guman

(5/1)

Sedemên xerabîya nav civakê bi rêz dike;

Dîn bû gerîb tergîb nema / şerm û fedî bûn qet nema

Tîrsa ji Rebbê Heq nema / em ketne destê ê nezan

(5/2)

Em gafilê qebra reş in / li ser riya heq nameşin

Dil 'aşiqê dunya geş in / dunya qebîh talî *yelan*

(5/3)

Meyla li vê dunya xeyal / ev şeytan û nefs bûn heval

Me j' destê wan nîne mecal / qet em xelaş nabin ji wan

(5/4)

Guh nadin we 'zê 'alima / pîrsa ji 'ilm û dîn nema

Her yek li dûv keyfa xwe ma / hem fitneya *axir-zeman*

(5/8)

²³⁵ Erman Artun, **Dînî-Tasavvufî Halk Edebiyatı**, 4. Baskı, Karahan Kitabevi, Adana 2011., r. 151.

²³⁶ Adak, "Aheng û Musîqî di Helbestên Melayê Cizîrî de", r. 54.

Fitna me insana geş e / serbestiya nefsa reş e

Tem‘a dunê pir pê xweş e / em man ji qismê gafilan

(5/9)

Çareserîya vê rewşa xerab di dûrketina ji daxwazên nefsê dibîne, da ku bi vî awayî bigîhêje ser rîya pêxemberî ya heqîyê.

Xwe j’ destê nefsê dûr bikin / tem‘a dunê em bes bikin

Tedbîr ew e em seh bikin / bigrin riya van kamilan

(5/7)

Lê em ji dest vê şatirê / bê murwetê dil kafirê

Me daye dûv şûglê ne rê / heq ya Resûlellah eman

(5/10)

Helbestvan ji ber berpirsariya xwe ya civakî van xerabî û nexweşîyên di nava civakê de ji xwe re wek bar dibîne.

Şer‘ û heqî j’ nav me hilat / bê fayde çû ‘umr û xebat

Li **Heyderî** nîne tebat / ma halxirab ê bargiran

(5/11)

Alîyekî helbestvan jî tesewif e ku dîwana xwe di bin hizra tesewifê de nivîsîye. Di helbesta 38an de li ser fanîbûna dinyayê radiweste û dinyayê bi gelek têgehên tesewifî teswîr dike.

Dilo dunya beçal e

Tev de xewn û xeyal e

Jê ra nebin heval e

Pir dujmin û neyar e

(38/1)

Dilo dunya derwîn e
Çiqas ji me r' bimîne
Tû guh nedê xa'în e
Jina pîs e bi yar e

(38/6)

Dunya otêl e xan e
Tû çend roja mêvan e
Tû b' 'aqilî bizane
Dunya ne mal e bar e

(38/7)

Helbestvan bi dilê xwe re dikeve gotûbêjê, zerar û nebaşîyên li ser bi girêdana nefsê û dinyayê re bi rêz dike. Lewra li gorî fikra tesewifê xelasî encax bi paqijkirina dilî ji hemû tiştên dunyawî pêkan e.

Helbestvan, kesayetên hestiyar in. Gelek caran bûyerên di jîyana wan de diqewimin, carinan evîndarî, xurbetî û koçberî, carinan coş û heyecana ku bûyereke millî çêkiriye û carinan jî mirina kesekî nêzî wan, yanî şewata fîraqê li ser jîyana wan a manewî bandor çêkiriye. Hestên wan fûrandine û ji wê fûrandinê jî berhemên ku ji alîyê edebî, di asteke bilind de ne derketine holê. Wek nimûne gava em li dîwana Mela Ehmedê Heyderî (k.d.1938) dinêrin ji mijarên sereke yên ku derdikevin pêş, yek jê xurbet û xerîbî ye. Lewra Mela Ehmed ji war û welatê xwe dûr ketiye û hesreta welatê wî helbestên xurbetîyê pê dane nivîsîn.²³⁷ Dîsa helbestvanekî berbiçav ji edebiyata Kurdî ya klasîk Şêx Mihemed Kerbelayî (k.d.1939) ye ku bûyerên di jîyana wî de qewimîne bandor li ser kesayetîya wî ya edebî kirine, lê ev bandor bandoreke neyînî ye. Piştî têkçûna serhildana Şêx Seîd wek gelek şêx û ronakbîrên Kurd, Şêx Mihemed Kerbelayî jî ji welatê xwe hatiye bidûrxistin. Her çiqas piştî vegeriya be welatê xwe jî ji ber hêvîyên şikestî, derd, azar û bûyerên qewimîbûn tev bûne sebeb ku Şêx, têkeve jîyaneke înzîwayî. Tê gotin ku di dawîya jîyana xwe de

²³⁷ Bo agahîyên berfirehtir bnr.: Abdurrahman Adak, "Helbestvanê Muhbet û Xurbetê: Mela Ehmedê Heyderî", **Nûbihar**, c.15, j. 116, n. r. 17-20.

dibêje: “Ez sendoqeke devgirtî hatim û devgirtî çûm.” Lewra Kerbelayî derd û elemên xwe direşand ser kaxezê, lê tenê bi carekê dixwend û dişewitand.²³⁸

Heyderî endamê terîqeta Xeznewîyan bû û piranîya helbestên xwe li ser şêxên Xeznewîyan nivîsîne. Mersiyeyên ku li ser mirin û şîna şêxên xwe Şêx Ehmedê Xeznewî (k.d.1949), Şêx Me’sûm (k.d.1958) û Şêx Eladînê Xeznewî (k.d.1969) nivîsîne ji aliyê hest û xemgînîyê ve di asteke bilind de ne. Bi taybetî jî wefata Şêx Eladînê Xeznewî di derûnîya wî û alema wî ya manewî de bandoreke mezin çêkiriye.²³⁹ Wefata Şêx Eladîn li ser wî ewqasî bandor kirîye ku taqeta hişyarbûnê di xwe de nabîne û gazîya xwe davêje saqî;

Eya saqî dikim hêvî şeraba ‘eşqê zû bînê
Ku hişyar bî dilê gemgîn bike rehmê xwe bighînê
Bi behşa dilbera şêrîn dilê min zû bike şînê
Bi dengê **Heyderî** bakim eya dilber tu Şêrînê
Te pir ‘aşiq kirin Mecnûn şev û roja dinalînê
Belê mûkî ji te nadim bi şed Leyla û şed Zînê

(73/1)

Ji mersiyeyên ku li ser Şêx Me’sûmê Xeznewî nivîsîne jî tê xuyakirin ku firaqa şêx çiqasî di derûnîya wî de birîn vekirine;

Dilo rabe te xew na’ê ji kalînê me yek car
Ji derdê firqeta Me’sûm xwe datînê di nav nar
Keser kûr im belê hêstir ji axînê me tîn xwar
Ji kerbê wî ku nabînim melûl bûye dilê sar
Melûl im ez ji kerbê wî dinalînê dilê sar
Firaqa taca sultana kirim dînê birîndar

(65/1)

²³⁸ Şêx Mihemed Kerbelayî, **Dîwana Kerbelayî**, amd. Osman Akdağ-Kerem Soylu, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2002, r. 9

²³⁹ Akçay, h.b., r.395.

Ger dipirsî ez hezîn im dilkesîr û nale nal
Bulbulê dilpare xwîn im şorgula min rûh li bal
Pirs bike carek li halê **Heyderî** goyîn mişal

(34/1)

Heyderî ji xwedêdanê heta wefata xwe di nava atmosfereke dînî de jîyaye. Bavê wî melayê gund bû û perwerdehiya xwe ya ewil ji bavê xwe wergirtiye. Piştî wefata bavê xwe ji bo perwerdehiyê çûye medreseya Xeznewîyan û daxilî nava terîqetê jî bûye. Piştî qedandina medreseyê perwerdehiya seyr û sulûkê berdewam kiriye û heta wefata xwe çûbe kîjan deverê, melatî, muderîstî kiriye û bi ilm û tesewîfê re têkildar bûye. Ev jîyana wî ya dînî li ser kesayetîya wî ya edebî jî bi hemû awayên xwe reng vedaye. Gava em li berhemên wî dinêrin, sê alîyên wî yên evînî derdikevine pêş. Yek jê eşqa Ilahî/Xwedayî ye, yek jê eşqa Cenabê Pêxember e ya din jî eşq û hezkirina wî ya terîqetê ye. Eşqa wî ya Ilahî/Xwedayî esas di tewhîd û munacatên wî de hatibe xuyakirin jî di helbestên din de jî bi rêya şêx û terîqetê eşqa xwe ya Ilahî terennum kiriye. Em ê li jêrê ji tewhîd û munacateke wî du malikan pêşkêş bikin:

Ji tewhîdê:

Dilxweşê rehîma Rehîm e / padişahkî her qedîm e
Rehîm û 'efwa wî 'Ezîm e / ji me ra qeşd û merama

(1/10)

Ji munacatê:

Ji vê nefsê birîndar im / çi 'aşîyê gunehkar im
Eman ez pir ricakar im / li min rehîmê bike ya Reb

(2/9)

Evîna Pêxember jî li bal wî di gelek helbestan de xwe daye der û her wekî di malikên jêr de jî xuya ye hêvî dike ku Hz. Muhemmed ji wî û alemê re şafaetê bike.

Ey Xuda tû b' Muştefa kî / bi rîza xwe tû me şa kî

Heyderîzade dewa kî / hêviya rehîma temama

(1/11)

Ez ji te pir hêvîdar im / pir gunehkar im dizarim

Her şev û roja hewar im / ya Resûlallah meded

(4/8)

Tengezar im dîlkirî me / çav li rehîma ber derî me

Rûsiyah im **Heyderî** me / ya Resûlallah meded

(4/12)

Eşq û muhebetêke mezin di dilê xwe de ji şêx û terîqetê re hemandiye ku ev jî îfadekirina alîyê wî yê tesewîfî ye. Li ser hemû şêxên xwe helbest nivîsîne ku hem alîyê wî yê girêdana bi terîqet û tekyayê û hem jî alîyê wî yê wefadarîyê nîşan dide.²⁴⁰ Muhebbeta wî ya li ser terîqet û şêxên wî, em dikarin bi çend nimûneyan li jêrê bidin;

Şuhûbeta nav ins û cana / deng û firqa **Xeznewî**

Bû heyata qelb û cana / ' eşq û zewqa **Xeznewî**

(6/1)

Bi roj û şev di fikra min di zîkrê da dibêr **Ehmed**

Tu wî wens û hedana min bi qurbana te bim **Ehmed**

(11/1)

Ba cemala roj mişal e / navşirîn **Me'şûm** delal e

Esmerê awir-gezal e / canfida me canfida

(16/2)

²⁴⁰ Ev agahîyên devkî ji hevpeyvîna ku di TRT Kurdî de di bernameya "Keşkûl" ya bi Mela Sîrac Tarhan (feqîyê Heyderî) hatiye kirin, hatine wergirtin. **Youtube**, Keşkûl- Heyderî. wmv, 10.06.2020.

Li **Tilme' rûf** xuya bû ew / wekîlê **Hezret û Seyda**
Ji **Ehmed** hem zîya bû ew / diwarê dewletê **Me'sûm**
(24/2)

Ez im Xezna kul û derda / min winda kir hiş û sewda
Ji dest xwe Heyderî berda / dil û can a '**Ela'eddîn**
(26/11)

Ellah ji wê lûfta qedîm / nûr da derê '**Ebdulgenî**
Nuqtek ji wê feqla 'emîm / berda derê '**Ebdulgenî**
(30/1)

Eya **Seyda'ê Şêx 'Ebdurrezaq** îro li ser erda
Cemala te xuya nakî te can û dil temam keyda
Dilê gemgîn berê kul bû te yek car agirek pê da
Te axaftin birînê dil hiş û 'eqle me bûn sewda
Ji fikra min tu derna'ê heta sağ bim eya **Seyda**
(44/1)

Hemd ji Xudê ra ketne dewra **şahê Nûrşîn Şêx Ziya**
Bûn mirîdê **Şahê Xezna** serbilindê ewliya
Yek ji sultanê ewel bû lê Xudê da taliya
Nefs û şeytanê me bimrin terkê nadin bê riya
Şahê Xezna na'ê weşfa tacidarê **Xeznewî**
(46/2)

Dexîl im ah / **Me'sûm** e şah / se'îd û mah / ey qiblegah
'**Ela'edîn** / bi '**Izedîn** / bi **Genyê dîn** / ba **Xeznewî**
(80/8)

BEŞA DUYEM

VEKOLÎNA DÎWANA HEYDERÎ

2.1. DANASÎNA GIŞTÎ YA DÎWANÊ

Dîwan, ew berhem in ku helbestên helbestvanekî tê de kom dibin. Di dîwanan de li gorî hin qaîde û distûran, teşeyên nezmê yên ku li gorî rêbaza edebiyata klasîk hatine nivîsîn têne ba hev. Dîwan di edebiyata klasîk ya rojhilatê de cureyeke gelekî berbelav e. Dîwan, pêşî di edebiyatên Erebi û Farisî piştî di edebiyatên gelên rojhilatê yên wek Tirk, Kurd, Peştûn, Pakistani, Hindî û Belûcî de hatine nivîsîn. Hin helbestvanan bi xwe helbestên xwe civandine û dîwana xwe tertîb kirine. Lê hin helbestvan di jîyana xwe de, ya îmkana wan çenebûye yan jî umrê wan têrê nekiriye ku helbestên xwe bînin ser hev û dîwanekê tertîb bikin. Çi ji alîyê helbestvan bi xwe, çi jî di saxî, yan jî piştî mirina wî de ji alîyê kesên din ve bê tertîbkirin, ferq nake, ew berhem dibe dîwan. Di tertîbkirina dîwanan de hin usûl û qaîde hene. Di edebiyata klasîk de ji ew dîwanên li gorî van usûl û qaîdeyên tertîbkirina dîwanan hatine tertîbkirin re dîwanên mureteb tê gotin. Ji bo dîwanek mureteb be divê gelek teşe û cureyên nezmê tê de hebin û ev teşe û cure li gorî rêzekê hatibin rêzkin.²⁴¹ Bi piranî di dîwanên mureteb de rêzkirina teşe û cureyên nezmê wiha ne:

-Beşa1: Qesaîd / Qesîde (bi rêzê tewhîd, munacaat, ne't, pesnê mezinên dewlet, terîqet û tekyeyan).

-Beşa 2: Tewarîx / Tarîx

²⁴¹ Ji bo derheqê tertîbkirina dîwanan agahîyên berfirehtir bnr: Adak, **Teşeyên Nezmê Di edebiyata kurdî ya klasîk de**, n.r.75-88.

-Beşa 3: Musemmet (terkîbêbend, tercî' bend, murebbe', texmîs, muxemmes, museddes û hwd.).

-Beşa 4: Xezaliyat / Xezel (ku li gorî elîfbaya serwayê têne rêzkerin)

-Beşa 5: Teşeyên biçûk (qit'e, ferd azade û hwd.). Carinan helbestvan mesnewîyeke xwe jî dixine dawîya dîwanê.

Gava em li dîwanên edebiyata Kurdî ya klasîk dinêrin bi hin cudahîyên biçûk ew jî di çarçoveya rêbaza edebiyata Rojhilat a klasîk de hatine nivîsîn û tertîbkirin. Bereksê edebiyatên din, ji ber ku edebiyata Kurdî ya klasîk di serdemên modern de dewam kiriye, helbet di vê serdemê de dîwan jî hatine nivîsîn. Dîwana Şêx Mihemed Emînê Heyderî jî di serdema modern de hatiye nivîsîn. Lê hem ji alîyê naverokê û hem jî ji alîyê ruxsarê ve bi rêbaza edebiyata klasîk hatiye nivîsîn.

Dîwana Şêx Mihemed Emînê Heyderî, heta salên 90î jî nehatiye tertîbkirin. Bi daxwaza wî di salên 90î de ji alîyê lawê wî, Mela Diyadîn ve hatiye tertîbkirin. Mela Diyadîn di hevpeyvîna me de, di derheqê tertîbkirina dîwanê û sebebê teşwîqkirina berhevkirina helbestan de ev agahîyanan dan me. "Bavê min di suhbetên xwe de digot: 'Şêxê min, Şêx Eladînê Xeznewî gotiye; Mihemed Emîn, qesîdeyên ku te li ser mala şêx, li ser terîqê, û li ser eşqa Xwedayî nivîsîne gelekî xweş in. Xwezî we cemi' kiribana. Gelekî belawela ne, hemû civandî û nusxeyek wê heba wê xweş ba.' Lê hîç subhanallah di jîyana bavê min de ev çênebû. Bavê min fucûten, carinan tişteke xweşa wî diçû li kaxezekê dinivîsî û dida mela û feqeyan. Wan jî yan ji ber dinivîsîn û digotin yan jî tenê bi deng digotin. Şi'rên bavê min bi vî şeklî belav bûne." Di vê çarçoveyê agahîyên ku me ji Mela Diyadîn wergirtin bavê wî bi xwe di defterekê de helbestên xwe cemi' nekirine. Ji ber ku bavê wî çend caran li ba wî behs kiribû, ew jî xwestiye ev hesret û daxwaza bavê xwe bi cî bîne. Gava Mela Diyadîn ketiye liv û tevgera berhevkirina helbestan ev rêbaz şopandiye. Helbestên ku ji alîyê bavê wî ve li ser kaxez û defteran hatibûn nivîsîn û yên li cem mela û feqeyan ku di defter û kaxezan de hatibûn nivîsîn an jî di qasetên teyban de bi deng hatibûn qeydkirin, yek bi yek wan derbasî nivîsê kiriye. Helbestên ku bavê wî di wê heyamê de nivîsîbûn jî hebûne. Hemû helbest gihandine ser hev, li defterekê nivîsîye û bi bavê xwe re jî teshîh kiriye. Mela Diyadîn di derheqê sererastkirina

helbestan ya bavê xwe van agahîyanan da me “Min li balê dixwend, wî jî digot: ‘Vê derê wiha ye wê derê newiha ye’ bi min dida rastkirin. Carinan jî min defter dida destên wî ew ji xwe ra lê dinêrî, her ku vala ba, zewqa wî lê bihata, dinêrî, dixwend û cihên rastkirinê îcab bikira pê dilîst. Ji xwe di wextê wî de me şiklê dawî dayê.” Lê piştî berhevkirin û tertîbkirinê, dîwan nehatiye çapkirin. Piştî wefata Şêx Mihemed Emîn dîwana wî û bavê wî bi hev re di yek bergê de hatiye çapkirin.²⁴²

Ji agahîyên me li jor da, tê fêmkirin ku dîwana Heyderî bi daxawaza wî ji alîyê lawê wî Mela Diyadîn ve helbestên belavbûyî hatine berhevkirin. Piştî wan civandîye ser hev û kiriye dîwan. Lê helbest ji nû ve bi guhertin û sererastkirinan di bin qonrtorala Heyderî de kemilîne. Dîwan ji alîyê Mela Diyadîn ve bi sê nusxeyên destxet hatine nivîsîn û nusxeyeke ku bi awayê matbû bi tûpên Erebi-Kurdî jî hatiye çapkirin. Lê rêzkirina helbestan û tertîbkirina dîwanê ne li gorî qaîdeya dîwanên klasîk e. Ji ber van sedeman û hin sedemên ku em ê li jêrê behs bikin, me hemû nusxe dan ber hev û ji bo rêzkirina helbestan û tertîbkirina dîwanê, me rêbazek nû tercîh kir.

Gava em li şeweyên tertîbkirina dîwanên kurdî dinêrin ev rêbaz derdikevin pêşberî me: Yek jê; dîwanên alfabetîk in ku hemû helbestên di dîwanê de ji serî heta binî li gorî herfa serwayê ya dawîn û li gorî sîstema elîfbêya Erebi tên bi rêzkirin. Bêtirê helbestvanên edebiyata Kurdî ya klasîk bi vê rêbazê dîwanên xwe tertîb kirine. Li gorî vê sîstemê rêzkirina teşeyên nezmê ne girîng e. Ya girîng divê rêzkirina helbestan li gorî alfabeyê be. Di edebiyata Kurdî de helbestvanên wek: Melayê Cizîrî, Şêx Ehmedê Feqîr, Şêx Nûredînê Birîfkanî, Wedaî, Rûhî, Kerbelayî, Mela Ehmedê Heyderî û hwd. bi vê rêbazê dîwanên xwe tertîb kirine. Rêbaza duyem; dîwanên kategorîk in ku di vê sîstemê de helbestvan, helbestên xwe li gorî teşeyên nezmê bi rêz dikin û tenê xezelan li gorî alfabeyê bi rêz dikin. Di edebiyata Kurdî de dîwana Pertew Beg û Seydayê Licî di vê kategoriyê de ne. Rêbazek din heye ku ew jî rêbaza dîwanên bêsîstem e. Dîwanên bi vî rengî her çiqas derveyî usûla dîwanên klasîk bin jî hin helbestvanên klasîk ev rêbaz ji xwe re pejirandine. Ji bo dîwanên

²⁴² Agahîyên devkî yên derheqê tertîbkirina dîwana Şêx Mihemed Emînê Heyderî (Lawê Heyderî, Mela Diyaddînê Heyderî) hatine wergirtin, **Hevpeyvîna bi Mela Diyaddînê Heyderî**, 22.07. 2019, Diyarbekir.

bêstîstem, Dîwana Feqîyê Teyran²⁴³ û piştî wî jî dîwanên Mela Mensûrê Girgaşî û Bekir Begê Erizî wek nimûne dikarin bîn dayîn.²⁴⁴ Mela Ehmedê Zinarexî jî derveyî rêbazên standartê, helbestên di dîwana xwe de bi awayekî kronolojîk li gorî tarîxa nivîsîna wan rêz kiriye.²⁴⁵

Dîwana Heyderî di çarçoveya edebiyata tesewîf/tekyayê de derketiye holê. Gava bi giştî li helbestan bê nêrîn, tê dîtin ku mijara hemû helbestên di dîwanê de dînî, tesewîfî ye. Helbestên di dîwanê de bi rêjeyek zêde medhê terîqeta Neqşebendî ne, bi taybetî jî medh û pesnê şêxên malbata Xeznewîyan. Helbestvan, helbestên xwe di dîwanekê de tertîb nekiriye. Piştî ku lawê wî helbest berhev kirine jî li derveyî standarda tertîbkirina diwanan çûye û helbest bi rêzê; tewhîd, munacat, ne‘t, hin helbestên li ser fanîbûna dinyê û yên li ser medhê şêxan jî bi rêzê li gorî mertebeya şêxan rêz kiriye.

Gava ji bo tertîbkirina diwanê me hewl da, me dît ku rêbaza dîwanên kategorîk ji bo dîwana Heyderî meqbûltir e. Lewra çî edebiyata Kurdî ya klasîk be, çî yên Erebi, Farisî, Tirkî yên klasîk bin ji bo tertîbkirina diwanan tradîsyonek saz bûye ku jê re rêbaza tertîba diwanan tê gotin. Me xwest hem di nava vê tradîsyonê de tevbigerin-lewra ji bo edebiyata klasîk rêbazên şiklî girîng in- hem jî ji bo ku di dîwanên Kurdî de rêbazek sîstematîk û standart bi cih bibe me rêbaza dîwanên kategorîk hilbijart. Li gorî tertîbkirina me ya dîwanê beşên dîwanê û rêzkirina teşeyên nezmê wiha çêbûn:

-Beş 1 Qesîde: Ev beş jî di nava xwe de; tewhîd, munacat, ne‘t, hîcwiye (helbestên li ser fanîbûn û rexneya dinyê), medhiye (helbestên li ser terîqeta Neqşebendîyan û hin şêxên terîqetê, helbestên li ser terîqeta Xeznewîyan û postnişînên vê terîqetê ku bi rêzê ev in: Şahê Xezna / Şêx Ehmedê Xeznewî, Şêx Me‘sumê Xeznewî, Şêx Eladînê Xeznewî û Şêx Evdîlxenîyê Xeznewî) û di dawîyê de jî mersiye hatin rêzandin. Helbesta yekem di vê beşê de bi teşeya qit‘eyê ye. Di dîwananên kategorîk de helbestên ku bi teşeya qit‘eyê hatine nivîsîn, yan li dû xezelan yan jî li dawîya dîwanê tên bicîkirin. Lê qit‘eya di dîwanê de bi cureya

²⁴³ Bo dîwana Feqîyê Teyran agahîyên berfirehtir bnr.: Seîd Dêreşî, **Dîwana Fiqîyê Teyran**, Weş. Lîs, Amed 2011.

²⁴⁴ Adak, **Teşeyên Nezmê Di edebiyata kurdî ya klasîk de**, r. 82, 83, 84.

tewhîdê hatiye nivîsîn û serwaya wê jî herfa elîfê ye. Ji ber ku di tradîsyona dîwanan de bi giştî tewhîd bi teşeya qesîdeyê û serwaya elîfê ne li serê dîwanê tên bicîkirin. Her çiqas teşeya vê helbestê ne qesîde be jî (lewra malika ewil ne muserre‘ e) bi hêsanî tê dîtin ku helbestvan xwestiye vê helbestê wek ya yekem qebûl bike. Lewra di destxeta helbestvan bi xwe jî ev helbest, bi yekeya malikê ye û li serê helbestê hejmara yekê û besmele hatiye nivîsîn.²⁴⁶ Dîsa ev helbest ji ber ku bi cureya tewhîdê ye û li gorî tradîsyona dîwanan, tewhîd di serê dîwanan de tên bicîkirin, me ew kir helbesta yekem a dîwanê.

-Beş 2: Musemmet: Di vê beşê de me bi rêzê terkîbbend, tercî‘bend, musemmetên tezmîn (texmîs, teşîr) û musemmetên bingehîn (muselles, murebbe‘, muxemmes, museddes) bi rêz kirin.

-Beş 3: Xezel: Di vê beşê de me xezel û mustezad li gorî sîstema elfabeya Erebi bi rêz kirin.

-Beş 4: Di vê beşê de jî me du helbestên Tirkî û sê helbestên Erebi bi cih kirin.

Di dîwana Heyderî de du helbestên bavê wî Mela Ehmedê Heyderî jî hene ku ev her du helbest di dîwana Mela Ehmedê Heyderî de tunene. Yek jê bi “*Ellah nîgehdarê te bî ey tacidarê Xeznewî*” dest pê dike û ji 13 malikan pêk tê. Heyderî jî çar malik li ser zêde kirine. Me ev helbest di rêza helbesta heştan xist nava metna dîwanê. Lê ya din me nexist nava metna dîwanê. Me di beşa yekem de di bin sernava bavê wî de nivîsî.²⁴⁷

Du helbestên Heyderî ku heta niha ne di destxetan û ne jî di çapa matbû de nehatibûn destnîşankirin me tespît kirin û di rêzên 41ê²⁴⁸ û 76²⁴⁹ an de xist nava metna bi rexneyî ya dîwanê. Helbestvanê me, du helbest bi zimanê Tirkî û sê helbest jî bi Erebi nivîsîne ku me her du helbestên Tirkî bi tîpên Latîni û her sê helbestên Erebi jî bi tîpên Erebi di dawîya metna dîwanê de ew bi cih kirin. Her weha me

²⁴⁵ Zinarexî, Mela Ehmed, **Dîwan**, weîşanên Nûbihar, Stenbol, 2018, r. 24.

²⁴⁶ Bo nimûne, bnr. (Pêvek 11: Destnivîsa Şêx Mihemed Emîn ya Helbesta Yekem).

²⁴⁷ Bo nimûne, bnr. (helbesta di bin sernava “Bavê Wî” ya vê xebatê û helbesta di metna rexneyî de ya rêza 7an).

²⁴⁸ Ji nusxeya MMEC (Mecmûeya Mela Evdilwehabê Cibilgrawî), Bnr. (**Pêvek 23: Helbesat Rêza 47an**).

²⁴⁹ Nusxeyeke serbixwe, ji du rûpelan pêk tê. Bnr. (**Pêvek 24: Helbesta Rêza 36an ya vê Xebatê**).

wergera Kurdî yê helbestên Tirkî û Erebî jî di jêrenotan de nîşan da. Heyderî, bi awayê qesîdeyê du helbestên kurt li ser munacata (dua) Îbrahîm Edhem'ê mutesewif întîqab (adaptasyon) kiriye. Ev her du helbest her yek ji sê malikan pêk tên. Yek jê bi Erebî û yek jê jî bi Kurdî ye. Me ev her du helbest ya bi Kurdî di beşa qesîdeyên kurdî di rêza 3yan û ya Erebî jî di nav helbestên Erebî di rêza 85an de bi cih kir. Ev her du helbest di nusxeya “NMD1”ê de bi sernava “Te‘şîr”ê hatine tomarkirin. Her du helbest jî ji alîyê malbatê ve li ser kevirê gora Heyderî hatine neqîşkirin.²⁵⁰ Me jî ev her du helbest di nava dîwanê de bi cih kirin.

Em ê li jêr li gorî van xusûsiyetên me behs kir, tabloyên rêzkirin û tertîbkirina helbestên di dîwanê de bidin.

Tablo 3: Rêz, Hejmar û Tertîbkirina Helbestên Dîwanê

J.	Beşên Dîwanê	Teşeyên Helbestan	Cureyên Helbestan	Rêza Helbestan a di Dîwanê de	Hejmara Giştî ya Helbestan
Beş: 1	Qesîde	Qit‘e	Tewhîd	1	32
		Qesîde	Munacat	2, 3	
			Ne‘t	4	
			Hîcwiye	5	
			Medhiye	6...31	
			Mersiye	32	
		Terkîbbend	Medhiye	33	
		Tercî‘bend	Mersiye	34	
		Texmîs	Munacat	35	
		Teşîr	Munacat	36	

²⁵⁰ Ji nusxeya NMD1 (Nusxeya Mela Diyaîn heyderî 1), bnr. (**Pêvek 10:** Kêla Ber Serê Heyderî).

Beş: 2	Musemmet	Muselles	Medhiye	37	41
		Murebbe‘	Pendname	38	
			Medhiye	39	
			Mulemme ‘	40, 41	
		Muxemmes	Medhiye	42...64	
			Mersiye	65, 66, 67	
		Museddes	Medhiye	68, 69, 70, 71	
			Mersiye	72, 73	
		Xezel Muztezad	Xezela Tekyayê	74, 75, 76, 78, 79, 80	
			Medhiye	77, 81, 82	
Beş: 3	Xezel û Muztezad	Xezel	Xezela Tekyayê	74, 75, 76, 78, 79, 80	9
		Mustezad	Medhiye	77, 81, 82	
Beş: 4	Helbestên Tirkî û Erebî	Qesîde	Munacat	85	5
			Medhiye	83, 84, 86, 87	
Encam	4 Beş	12 Teşe	8 Cure	-	87 Helbest

Me xezelên di dîwanê de jî li gorî alfabeya Erebî bi rêz kirin. Rêzkirina xezelên di dîwanê de bi awayê tabloya li jêr hatine çêkirin.

Tablo 4: Rêz, Hejmar û Herfa Serwaya Xezel û Mustezadên Dîwanê

Hejmar	Herfa Serwayê	Rêza Helbestan a di Dîwanê de	Hejmara Helbestan
1	ا – a	74	1
2	ر – r	75	1
3	ل – l	76	1
4	م – m	77	1
5	و – u	78, 79	2
6	ی – î	80, 81, 82	3
Hejmara Giştî ya Xezel û Mustezadan			9

2.2. ZIMANÊ DÎWANÊ

Ziman, di metnên edebî de hêmaneke girîng e. Lewra, hemû metnên edebî li ser ziman ava dibin û edebiyata her neteweyî jî bi navê zimanê wan tê naskirin. Her wekî ji edebiyata ku bi zimanê Erebî tê kirin edebiyata Erebî, edebiyata bi Farisî tê kirin edebiyata Farisî, edebiyata Tirkî, edebiyata Kurdî, edebiyata Rûsî, edebiyata Îngilîzî û hwd. tê gotin. Di nava metnên edebî de bikaranîna şêwaz û şiklê ziman girîng e û gelek caran zimanên berhemekê di derheqê wê berhemê de gelek xalên girîng radixe ber çavan. Di edebiyatê de ji bo berhemeke edebî, ziman li gorî edîb, berhema ku tê nivîsîn, civak û xwîneran tê hilbijartin.

Her wekî me li jorê jî got zimanê berhemekê li gorî hêza zimanê edîb, cureya berhemê, civak û girseya ku xwîner tê qebûlkirin dirûv digire. Em dikarin zimanê Heyderî jî di vê çarçoveyê de binirxînin. Heyderî ji bavekî ilimdar û edîb hatiye

dinyayê. Ji zarokatîya xwe heta wefatê, jîyana xwe di nava ilm û tadrîsatê de berdewam kiriye. Ji xeynê alîyê wî yê ilmê alîyekî wî yî dînî/tesewîfî jî heye ku di heman wextê de di tekyaya Neqşebendîyan (tekyaya Xeznewîyan) de kemilîye, bûye endamekî terîqetê û di gelek astên terîqet û tesewîfê de derbas bûye. Dîsa ji bo perwerdehî, tadrîsat û ilim jî li gelek cîyan gerîyaye. Heyderî li Nisêbînê hatiye dinyayê û zarokatîya xwe li gundên herêma Nisêbînê bûrandiye. Ji ber zimanê herêma Nisêbînê û zimanê wî yê zikmakî Kurdîya Kurmancî ye, berê ewil Kurdî hîn bûye. Piştî çûye medreseyê zimanên Erebi û Farisî û piştî jî zimanê fermî, Tirkî hîn bûye. Heyderî bi çar zimanan xweş dizane û her çar ziman di berhemên xwe de bi kar anîne. Di berhemên wî de bi taybetî jî di dîwana wî de unsûrên zimanên; Erebi, Farisî, Tirkî û bandora gelek devokên Kurdîya Kurmancî hene ku em ê piştî bi hûngulî li ser wan rawestin.

Her çiqas Heyderî perwerdehîya xwe li medreseyê dîtibe, ilmê dînî/tesewîfî wegirtibe, berhemên xwe di çarçoveya berhemên klasîk de nivîsîbe û bi çar zimanan zanibe jî dîwana xwe bi Kurdîyeke sade û fêambar nivîsîye. Digel ku di gelek bend û malikan de peyv û terkîbên Erebi, farisî, Tirkî û Kurdî bi hev re bi kar anîbe jî dîsa zimanê helbestê giran nebûye.

Bo nimûne;

Badeya husna hebîbê melhema derd û birîn

Xemriya noşîn helal ya şerbet û dermanê dîl

(76/6)

Ey şêrê dîn / husna zemîn / qelbê Emîn / tev bû birîn

Ez bedter im / can kemter im / her Heyder im / ba Xeznewî

(80/9)

Sedemekî hêsanî û sadebûna zimanê dîwanê jî ew e ku helbestvan helbestên xwe di çarçoveya edebiyata tekyayê de nivîsîne û xwestiye mesejê dînî/tesewîfî bigîhîne xwîneran. Ji bo bê fêmkirin jî bi zimanê civakê; sade û sivik nivîsîye. Bo nimûne em ê çend bend û malik li jêrê bidin.

Em ğafilê qebra reş in / li ser riya heq nameşin
Dil 'aşiqê dunya geş in / dunya qebîh talî yelan

(5/3)

Vê birîna dil dewa kî ez dexîlê merqedê
Xweş tîbîbê me 'dena tû werdê zimana tu wî

(20/8)

Dilo dunya beçal e
Tev de xewn û xeyal e
Jê ra nebin heval e
Pir dujmin û neyar e

(38/1)

Ji 'îşqa wî gelek cara
Dibûm serxweş gelî yara
Werin halê birîndara
Ji bêhna şorgul û werda

(39/7)

Murşidê kamil xuya bû şu'le da erd û sema
Nefs û Şeytan te' sîra wan qet nemaye van dema
Kes nema karî bibêjî rehberê me qet nema
Ey gelî ehlê îmanê hûn nexwun derd û ğema
Şêrê dîn Ehmedê Sanî tîr kirin şeyx û şebab

(48/4)

Di edebiyata klasîk de gelek helbestvan ji bo zimanekî edebî derxin holê ravek û terkîbên dirêj çêdikin û di encamê de zimanekî girîft û giran ku herkes jê fêm nake derdikeve holê. Di dîwanê de ravekên dirêj zêde nehatine bikaranîn bêtir ravekên dubêjeyî hatine tercîhkirin. Çawa di jêr de jî tê dîtin, carinan di hin malikan de ravek hîç nehatine bikaranîn.

Leb-şeker û awir-esed / şuhtî li min cerg û cesed

Sed ah û nalîn bê 'eded / ev rûh ji min ta bê cuda

(74/7)

Rû dêm gula / pir qabila / xweş kamila / dağ da dila

Şêrê xedeng / ev şewt û deng / hem herb û ceng / lem'an î tû

(79/7)

Şox û şepal / quţbê delal / cama zelal / gerdên-gezal

'Eynê piling / awir-xedeng / şêrê bi deng / ev Xeznewî

(80/3)

Her çiqas kêr be jî di hin cihan de ravekên dirêj ku ji sisê an çar bêjeyan pêk
tên jî hatine bikar anîn. Li jêrê em ê hin ravekan bo nimûne bidin.

-Ravekên du bêjeyî;

Lê dema Me'şûm dibînim / hesret û derda vejînim

Ayeta 'îşqê dixwînim / dil siparê merqedê

(19/11)

Wî li Tilme'rûf vegirtî / **payitextê nisbetê**

Merqeda nûrîn digirtî / çar kenarê sor û zer

(27/3)

Bû **şahiya 'ewamê** / nûr kir dewsa zulamê

Emîrê Mişr û Şamê / hem wali yû hûkimdar

(28/2)

Hişkedar im çol beyar im bê sih û sîwa me ez

Taze reng û **bağê gulzar** cennet û bustan î tû

(78/3)

-Ravekên sê bêjeyî;

Sêfilê nefsa neyar im / dilkulê tîrê gedar im

Dilbirîndar û neçar im / **dilxweşê 'efwa Xuda** ma

(1/9)

Mehdiyê îhsan tamam e / **esmerê şorgul gulam** e

Hem 'efîf 'alî meqam e / **efdelê weqta me** ye

(13/4)

Himetek 'alî meqam e / **qa'idê Textê Hemîd**

Merhema qelbê zulam e / pehlewane mu'teber

(27/4)

Ey **rewşena bağê gula** / hem **ruhniya çavê dila**

Wensa mirîd û fazîla / da'im bi te şebra me tê

(29/4)

Wek murşidê zana me dî / **neclê kubarê Ehmedî**

Rahê terîqa Serhedî / bû rehberê 'Ebdulgenî

(30/4)

-Ravekên çar bêjeyî;

Ey Şehê Xezna meded qelbê me tev bûne birîn

Ka tebîbê mişlê te **dêm şorgula leb-şekerê**

(10/4)

Ey **gula der bağê Xezna** / nêrgiza nazik û re'na

Em feqîr der ah û huzna / can bi qurbana te bî

(31/11)

2.2.1. Biwêjên di Dîwanê de

Biwêj, ew awayên vegotinê ne ku bi piranî mecazî ne û rewşê dîyar dîkin ku di wan de daraz tunene, ji bo ku vegotin xurtir û bi derbtir bibe hatine çêkirin.²⁵¹ Di dîwanê de gelek biwêj hene. Ev jî tê wateya ku vegotina helbestvan xurt e. Em ê li jêrê biwêjên ku di dîwanê de hatine bikaranîn bidin.

Sekê dil tar û mar (2/4)

Tolê li der (12/7)

Mirin di bîra te na'ê (2/4)

Ax û xwelî li min wer (15/4)

Ecel şubhetê ba tê (2/4)

Ê nedîtî nizanî (16/9)

Zarîn û nalenalîn (2/5)

Xwînrijîn (16/12)

Dil tijî derd û keser bûn (4/4)

Dil bi birîn (16/12)

Roj bi roj derdê zêde (4/5)

Nûra du çeşman (18/10)

Dil tijî derd û birîn (4/7)

Kelbê li dergahê (18/14)

Çav li rehma ber derî (4/12)

Hêstirên ji xwînê (19/10)

Li dû kêfa xwe mayîn (5/8)

Heybet pê girtîn (21/3)

Tebatî nîne (5/11)

Tîr avêjtina li dilan (21/10)

Keşf û teftîşa dila kir (6/6)

Bi carekê dil helandin (22/10)

Bê dil kirin (8/8)

Rûniştina li ser textê dil (26/3)

Şermisar bûn (8/12)

Xizneya kul û derdan (26/11)

Dil tar û mar (8/13)

Hal lê nemayîn (27/10)

Sekê axa der (10/13)

Biraştina cerg û dilan (28/11)

²⁵¹ Bahoz Baran, Rêzimana Kurmancî, weş. Belkî, Stenbol 2012, r. 41.

Şev û rojan dibêjim (28/11)

Dilê sar (28/12)

Dil bi birîn (31/12)

Di huznê de hiştin (32/3)

Suhbet kirina bilbilan (32/4)

Dil kul kirin (32/4)

Di kerbê de hiştin (32/10)

Wekî dîna bi çolê ketin (32/11)

Ji şerqê heta gerbê (37/3)

Şuştina qelbê reş (37/6)

Kuştina nefsê (37/6)

Qitmîrê li dergahê (37/9)

Xakê pa (37/9)

Dilê bi bihar (38/13)

Ketina cezbê (39/3)

Birîndarê ji derbê (39/3)

Dîlkirî (41/6)

Qameta selwî (42/1)

Teb‘et melekî (43/2)

Ketina tayê (44/2)

Dil bi birîn (44/3)

Dil şîş kirin (44/4)

Dil xwîn (44/7)

Suhbet girêdan (45/4)

Kuleybê ber derî (45/7)

Nerîna bi ‘eyna dil (46/4)

Dil kebîb (46/6)

Dilxwaz (47/7)

Ġem û derd xwarin (48/4)

Tevlî hev bûn (48/5)

Hîva çardehan (50/4)

Serî da ber pîyan (52/4)

Dil kebab (52/4)

Li dil ‘iyan bûyîn (53/2)

Dil ketin (58/3)

Axa li ber pa (59/6)

Nefsê serî berda (59/7)

Dil reş û dil pare xwîn (61/4)

Wek şîma zer bûyîn (67/3)

Rûhim fida xakê pîya (69/3)

Ġemxwarin (72/4)

Reng zer kirin (74/2)

Dil xweş kirin (74/2)	Bi çolê ketin (79/9)
Can û ciger bûn kebab (74/3)	Sed ah û zar (79/10)
Rûh fidayê xakê pa (74/4)	Xem pê revîn (80/5)
Sotandina cerg û cesed (74/7)	Xweşkirina birînan (80/5)
Deryê tewba gunehkaran (75/4)	Sed car hewar (80/5)
Heyva li çardehan (75/6)	Can kemter (80/9)
Ruhnîya çavan (75/7)	Qelbê bi birîn (80/9)
Merhema derd û birînan (75/9)	Sed nalîn û feryad (81/1)
Mecnûnê zemanî (77/16)	Ji dil teslîm bûyîn (82/11)
Kuştiyê le'lan (78/11)	Pişt û serî bûn (80/2)

2.2.2. Cotepeyvên di Dîwanê de

Cotepeyv, ew komika du peyvî ne ku ji bo wateya peyvê xurttir bibe bi alîkarîya du peyvên; hem ji alîyê wateyê û hem jî ji alîyê denganîyê ve têkildarî hev in tên neqandin û tesîreke gelemperî tê bi destxistin.²⁵² Di dîwanê de gelek cotepeyv hene ku hinek ji wan ji du peyvên Kurdî, hinek ji wan ji du peyvên Erebî yan Farisî û hinek ji wan jî ji peyveke Kurdî, peyveke Erebî, peyvek Kurdî peyvek Farisî yan jî peyvek Erebî peyvek Farisî pêk hatine. Em ê li jêrê cotepeyvên di dîwanê de hatine bikaranîn bidin.

Jar û feqîr (1/6)	Qîr û hewar (4/9)
‘Ebd û geda (1/7)	Sebr û sikûn (4/12)
Cewr û cefa (1/8)	Şeytan û nefs (5/4)
Şev û roj (4/8)	‘Eqî û ilm (6/4)

²⁵² Bahoz Baran, Rêzimana Kurmancî, weş. Belkî, Stenbol 2012, r. 41.

Ins û cin (6/7)

Berr û behr (9/7)

Ruh û can (10/6)

Dax û keser (10/11)

Keşf û ehwal (11/9)

Mîr û feqîr (12/1)

Fisq û ficûr (12/4)

Derd û birîn (13/3)

Medhûş û dîn (13/3)

Kûr û dûr (13/6)

Qedd û qamet (13/6)

Hecc û umre (13/10)

Subh û êvar (13/11)

Şerq û ğerb (14/6)

Qedr û qîmet (17/1)

Hemd û sena (17/5)

Bejn û bal (18/6)

Tac û text (18/11)

Medh û ewsaf (18/12)

Xas û ‘am(18/13)

Cah û zar (19/4)

Dost û yar (19/6)

Dost û heval (19/7)

Husn û cemal (19/12)

Tac û serîr (19/13)

Pak û temîz (21/3)

Qeyd û dav (22/8)

Feyz û nisbet (24/6)

Berq û brûsk (25/5)

Esl û neseb (28/3)

Luks û çira (29/10)

Erd û sema (31/7)

Qîl û qal (33/6)

Şekk û qîyal (33/6)

Ah û fiğan (36/4)

Qaf û qaf (37/2)

Nale nal (40/3)

Ah û ah (42/2)

Cerg û hunav (42/3)

Can û dil (46/4)

Qedd û qam (47/3)

Yek bi yek (48/6)

Husn û cemal (49/2)

Şam û seher (49/1)

Nav û deng (49/2)

Birc û dîwan (50/7)

Bir bi bir (50/8)

Mewc bi mewc (50/8)

Nale nal (51/3)

Sûk û bazar (52/2)

Subh û şam (53/5)

Xan û mal (55/5)

Kul û derd (57/1)

Yeka yek (58/4)

Cewr û cefa (58/6)

Şah û mîr (60/4)

Roj û şeb (60/7)

Sal bi sal (71/2)

Ker û lal (71/2)

Deng û qîr (71/3)

Milk û mal (71/3)

Qesr û eywan (71/3)

Heşr û neşr (72/4)

Can û ciger (74/3)

Cerg û cesed (74/7)

Milk û mal (78/12)

Ehl û ehbab (78/12)

Bav û ecdad (78/12)

Sewt û deng (79/7)

Herb û ceng (79/7)

Xas û xulas (79/9)

Şems û qemer (80/2)

Zêr û zeber (80/2)

Şox û şepal (80/3)

Sef sef (81/6)

2.2.3. Bêje û Têgehên Taybet ên di Dîwanê de

Ji bo berhemek ji alîyê ziman ve serkeftî be, divê edîb şêwazeke xweser û ne ji rêzê be bi kar bîne. Her çi qas di edebiyata klasîk de remz û mezmûn cihekî xweser digirin û ji alîyê gelek helbestvanên klasîk ve tên bikaranîn jî helbestvanên serkeftî peyvên resen û orjînal jî bi kar tînin an jî çêdikin ku ew jî şêwazeke wan a taybet û

xweserîya wan derdixe pêş. Di dîwanê de hin bêje û têgehên taybet hene ku hinek ji wan ên Erebi ne, lê ji berê de di nav gel de - bi taybetî jî ji hêla kesên xwende ve - tên bikaranîn. Hinek ji wan peyv û têgehên hevpar ên edebiyatên Farisî û Kurdî ne. Hinek ji wan jî bêje û têgehên xwerû yan jî yên nûjen/hevçax ên Kurdî ne.

Hin bêje û têgehên Erebi yên ku di Kurdî de ji berê de tên bikaranîn di dîwanê de;

Herîr (18/10)

Qirn (22/9)

Serîr (18/11)

Qewî (25/4)

Tac û serîr (19/13)

Keslan (38/17)

Werd (20/8)

Hin bêje û têgehên hevpar ên ku di edebiyatên Farisî û Kurdî de tên bikaranîn di dîwanê de;

Perwerdîger (8/1)

Sertac (35/11)

Tacdar (8/1)

Şahbazî (52/1)

Şehper (16/3)

Dilnewaz (60/2)

Yekta (18/9)

Penc (61/4)

Pezîr (18/10)

Renc (61/4)

Dilsipar (19/11)

Cîwar (63/1)

Mêrxan (26/8)

Şermende (70/1)

Sergeştê gerdan (35/6)

Pîştewar (72/3)

Hin bêje, têgehên xwerû û yên nûjen ên Kurdî ku di dîwanê de hatine bikaranîn wiha ne;

Bingeh (7/4)	Dilxwaz (47/7)
Pêgeh (7/5)	Rêçenas (52/4)
Dîlkirî (16/11)	Pêşewar (52/4)
Şaxedar (19/7)	Berze (52/6)
Vejîn (19/11)	Halan (57/5)
Kewîn (26/10)	Dijwarî (65/2)
Xap û hîle (27/7)	Keys (65/3)
Şaneşîn (33/5)	Temirandin (66/7)
Dilkesîr (34/1)	Gerî (69/6)
Toq û benî (35/8)	Zîb/zuqen/xebxeb (77/6)
Dixwîrim (35/14)	Xopan (78/1)
Herişandin (35/15)	Xaç û rê (78/7)
Dilgeş (37/5)	Dûger (79/8)
Şekerbengîn (45/2)	
Bendewar (46/7)	

2.2.4. Di Dîwanê de Taybetîyên Devokên Kurdî

Zimanê berhemekê ji bo naskirina zimanê edîbê wê berhemê jî girîng e. Lewra nivîskar, zimanê ku di berhema xwe de bi kar tîne yan zimanê wî yê zikmakî ye, yan ji derdora ku tê de jîyaye hîn bûye, yan jî bi xwendin û perwerdehiyê hîn bûye. Ji ber vî hawî helbestvanek an nivîskarek gava berhemekê dinivîse dibin

bandora ziman û devokên wê derdorê û zimanên ku bi perwerdehiyê hîn bûye jî dimîne.

Şêx Mihemed Emîn, li gundekî Nisêbînê hatiye dinyayê û zarokatîya xwe li çend gundên derdora Nisêbînê derbas kiriye. Piştî perwerdehiya xwe ya li Binxetê/Rojava qedandiye, hatiye li deverên wek; Nisêbîn, Midyad û Qoserê melatî kiriye. Piştî li herêma Diyarbekirê û Farqînê jîyaye. Gava em bi giştî li zimanê dîwan û berhemên wî yên dîtir dinêrin, em dibînin ku zimanê wan bêtir Kurdîya Kurmancî ne. Di Kurmancîya wî ya nivîskî de jî taybetîyên gelek devokên Kurmancîyê hene. Bi qasî me tespît kir di dîwanê de bandora devoka Berrîya Mêrdînê, devoka Torê, devoka Serhedê, devoka Botan, devoka Hekkarî û devoka Binxetê hene. Em ê li jêr bi hûrgulî li ser rengvedana taybetîyên van devokan ku li ser dîwanê çêbûne rawestin.

2.2.4.1. Taybetîyên Devoka Serhedê

Serhed, herêmeke Bakurê Kurdistanê ye ku Bajarên; Çewlik, Erzirom, Mûş, Agirî û herêma ser sînorê parêzgeha Azerbaycana Rojava dikevin nava sînorê vê herêmê. Navê xwe jî “ser xetê” digire.²⁵³ Kurdên Ermenistan û Nahcîwanê jî Serhedî tên hesibandin.²⁵⁴

Heyderî, ji alîyê dê û bavê xwe ve ji Serhedê ye. Çawa ku bandora devoka Serhedê li ser dîwana bavê wî heye,²⁵⁵ hin xusûsiyetên vê devokê di dîwana wî de jî xuya dibin.

-Xusûsiyeteke devoka Serhedê ew e ku hin bêjeyên wek; “fêm, çewa, çima, zarok, şiyar, peyivîn/axivîn” bi vî awayî tên bikaranîn; “fehm, ciger, çira, çera, zar, hişyar, xebirdan”. Em ê li jêrê bo nimûne çend mînakên ji van bêjeyan bidin.

²⁵³ Ibrahim S. Işık, *A’dan Z’ye Kürtler Kişiler/ Kavramlar/ Kuramlar/ Kurumlar*(çapa 5.), weş. Nûbihar, Stenbol 2017, r. 400.

²⁵⁴ Cihan Turan, *Dîwana Fethî (Edîsyon, Metn, Krîtîk)*, (Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Bîngolê, Enstîtuya Zimanên Zindî, Bîngol 2017), r. 91.

²⁵⁵ Beyter, h.b., r. 35.

Me j' destê her sê dijmina / can û **ciger** dil şohtin a

Ev şin'et û karê min a / keslan û gafil her zeman

(5/5)

Ji xelwê hat çi xweş meş kir / li me çav ruhni yû geş kir

Kul û derdê me pê xweş kir / **xeberdana** 'Ela'edddîn

(26/7)

Eya saqî dikim hêvî şeraba 'eşqê zû bînê

Ku **hişyar** bî dilê gemgîn bike rehîmê xwe bighînê

Bi behşa dilbera şêrîn dilê min zû bike şînê

Bi dengê Heyderîbakim eya dilber tu Şêrînê

Te pir 'aşîq kirin Mecnûn şev û roja dinalînê

Belê mûkî ji te nadim bi şed Leyla û şed Zînê

(73/1)

-Dengdarên wek; “d, h, k, n, s, t” gava tên dawîya bêjeyan pirê caran dikevin.²⁵⁶ Em ê li jêrê bo mînak peyvên qe (qet), çîqa (çiqas) bidin.

Lewma nekin **qe** yek car / leb kaniya heyatê

Şubh û mesa şekerbar / le' lê wî şehd û kewşer

(15/5)

Dilo dunya fena ye

Cihê kul û derda ye

Çîqa hebe bela ye

Bê fayde ye zerar e

(38/3)

²⁵⁶ Zafer Açar, **Devoka Devera Filistanê**, (Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Bîngolê, Enstîtuya Zimanên Jîndar, Bîngol 2015), r. 35.

-Di devoka Serhedê de daçek û pêşdaçek pir kêr tîn bi karanîn. Pirî caran paşdaçek bê pêşdaçek tîn bikaranîn. Paşdeçekên “re”, “de” û “ve” wekî “ra”, “da” û “va” tîn bilêvkin.²⁵⁷

Ketme erda gurbetê **da** / mişlê hebsê mame tê **da**

Roj bi roj derdê me zêda / ya Resûlellah meded

(4/5)

Ey Heyderîzade Emîn / ev derd û ah û huzn û şîn

Jê **ra** heye derman yeqîn / va ye li Xezna Ehmeda

(74/9)

Di hin cihên din ê dîwanê de hin daçek jî wiha ne; da (23/2), pê ra (37/2), bona (48/3), ra (66/8).

-Di lêkera “kirin”ê (forma emr û daxwazê) de gelek caran pêşgira “bi”yê dikeve “ke” dimîne. Di dîwanê de di hin cihan de wiha ye; “derman ke” (17/9), “hêvî kin” (24/8), “ferman ke” (79/10).

Ez mubtela ‘elîl im / **derman ke** dil dexîl im

Bê çare û zelîl im / ez mam bi êş û ‘illet

(17/9)

Ji ‘îşqê hûn nebin mehrûm / eger hûn ‘eqîl û zana bin

Hêvî kin kû bibin me‘lûm / ji nûra cibhetê Me‘şûm

(24/8)

-Di hin bêjeyan de ku bi “a”yê dest pê dikin, dengdara “y”yê lê zêde dibe; yan (an).²⁵⁸ Bêjeya “an”ê dikeve awayê “yan”ê.

²⁵⁷ Çetin Taş, **Dengsaziya Devoka Çaldiranê**, (Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardîn Artûkluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê, Mêrdîn 2015), r. 51.

²⁵⁸ Murad Celalî, “Kurmanciya Serhedê û Devoka Gundê Taxilka”, **Nûbihar**, c. 22, j. 145, r. 43.

Yan ji gulzarê cemalê hat li Tilme‘rûf me dî

Ba cemalek bê buha ji hikmetê heq hate xwar

(75/2)

2.2.4.2. Taybetîyên Devokên Mêrdînê

Li herêma Mêrdînê di nava gel de du devokên sereke hene ku bi hin cudahîyên xwe derdikevin pêş. Yek jê li devera Torê û ya din jî li devera Omerîyan û Berrîya Mêrdînê tên axaftin. Mikaîl Bûlbûl li ser vê mijarê wiha dibêje: Li herêma Mêrdînê du devokên sereke hene, yek jê devoka Tûr Abidîn e ku hin herêmên navçeyên Nisêbîn, Midyat û Stewrê dikevin ber vê devokê. Ya din jî devoka Omerîyan e ku Qoser, Dêrik, Şemrex, Mahsertê, Navenda Mêrdîn û hemû berrîya Mêrdînê û navçeya Serêkanîyê ya Rihayê nêzî vê devokê diaxivin.²⁵⁹ Ev her du devokên li Mêrdînê tên axaftin, di gelek xalan de wek hev bin jî di hin xusûsiyetan de ji hev vediqetin. Lewra me jî xwest bandora xusûsiyeta van her du devokan li ser dîwanê bi sernavên; devoka Torê û devoka Berrîya Mêrdînê bidin. Berî ku em taybetîyên devokên Torê û Berrîya Mêrdînê bidin, hin taybetîyên hevpar ên her du devokan hene ku em ê pêşî li jêrê minakên wan bidin.

-Peyva “talî”yê li herêma Mêrdînê bi wateya dawî tê bikaranîn.

Rewşa zemanê **talî** / şahê bi qedr û qîmet

Xwedîyê meqamê ‘alî / Me‘şûmê pir bi heybet

(17/1)

-Peyva “çav” li Mêrdînê bi awayê “çe‘v” an jî “ça‘v” tê bikaranîn.

Ça‘vê gezal û nûrîn / bejna delal û şêrîn

Têhqîqe murşidê dîn / çi naşîh û wefadar

(28/4)

²⁵⁹ Mikail, Bûlbûl, “Peyvrêzî Di Firazên Navdêrî De (Devoka Mêrdînê)”, **The Journal Of Mesopotamian Studies**, c. 2, j. 1, r. 90.

- “n”ya cînavka kesane ya yekem a “min” ê li her du herêmên Mêrdînê (Torê û Berrîyê) jî dikeve û diguhere “mi”yê. Carinan jî cînavka kesane ya pirjimar a duyem “hûn” tê guhertin, şiklê “win”ê digire.

Mecnûnê husna şah im lewma mekin ji ‘îşqê

Dil peritî **mi** can da nalîn hezar û yekser

(15/3)

Qîmetê wî **win** bizanin ev hedîya Xeznewî

Xan û malê xwe telef kin ber vê mala Xeznewî

Hûn du‘a kin ya Ilahî dîn û dunya Xeznewî

Hem Muhemmed çariyar bî tim di hana Xeznewî

Pişt seneda dînê Islam padişahê nuşretê

(55/5)

-“n”ya qertafa pirjimarîyê ya “an”ê hem di devoka Torê û hem jî di devoka Berrîyê de dikeve.

Muferrehdarê **miskîna** / re’îsê cinn û **insana**

Tebîbê qelbê **gemgîna** / hekîmek mişlê Luqma ye

(9/4)

Şafiyê derd û **birîna** / ‘afiyê medhûş û **dîna**

Melce’ê cumle **hezîna** / mehdiyê dewra me ye

(13/3)

2.2.4.2.1. Devoka Torê

Herêma Tûrabidîn a dîrokî, ji navenda Mêrdînê, Bihurka Hopê dest pê dike, başûrê riya Mêrdîn û Midyadê bi temamî, herêma Omerîyan û qismek Stewrê dixê nava xwe û hetanî Newala Hespistê / Fîlê (Çemê Cehennemê) ku di nava Midyat û Hezexê de ye berdewam dike. Navçeyên Hesenkêf, Kercewsê, Kerboran, Mahsertê û

Midyatê dikevin sînore Tûrabidînê.²⁶⁰ Devoka Torê li rojhilat bi devoka Botan, li rojava bi devoka Omerîyan û li bakur jî bi devoka Bişêrîyê re cîran e.²⁶¹

Zarokatîya Heyderî li herêma Torê derbas bûye û li gelek gundên dikeve herêma Torê, karê tadrîsat û melatîyê kiriye. Ji ber vî hawî tesîra devoka Torê²⁶² li ser zimanê dîwanê gelekî heye. Em ê li jêrê taybetîyên herêma Torê li ser dîwanê bi çî awayî çêbûne bi mînakan bidin.

-Di devoka Torê de peyva “heyran” bi awayê “heyra” tê bi karanîn.

Tu gelkî gafil î **heyra** / tu mehrûmê ji nav xeyra

Ne pir maye ji qebrê ra / li min rehmê bike ya Reb

(2/3)

-Li herêmê di lêkerên dariştî de morfema neyînîyê û ya “di”yê tê pêşîya pêşgirê.²⁶³ Di mînakên jêr de peyva bernede bi awayê “neberde” û ya badikir jî bi awayê “dibakir” hatiye bikaranîn.

Bêkes im ser wechê ‘erdê / hatime ber deryê rewde

Ez dexîl im min **neberdê** / ya Resûlellah meded

(4/2)

Dibakir ya Resûlellah / digo *la teħzenû wellah*

Fida kim rûh û can billah / ewî ser da di vê rê da

(32/8)

-Di Kurdîya Kurmancî de tîpên kelijandinê pirî caran “y”, “h” ne. Di devoka Torê de ji bo tîpa kelijandinê li şûna “y”yê pirî caran “w” tê bikaranîn.²⁶⁴

²⁶⁰ Altan Tan, **Turabidin'den Berriyê'ye Aşiretler, Dinler, Diller Kùltürler**, çapa 5., weş. Nûbihar, Stenbol 2015, r.17.

²⁶¹ Lokman Kalan, **Dem Di Devoka Torê De (Bi Mînaka Gundê Xerabê Bena)**, (Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardîn Artûkluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî Li Tirkîyeyê, Mêrdîn 2019), r. 9.

²⁶² Derheqê Devoka Torê bo agahîyên berfirehtir bnr.: Gülbeddîn Gülmez, **Dengên Devoka Torê (Gundê Xerabê Bena Wekî Nimûne)**, (Lîsansa Bilind, Zanîngeha Bîngolê, Enstîtuya Zimanên Zindî, Bîngol 2019).

²⁶³ Kalan, h.b., r. 9.

²⁶⁴ Nezîr Gümüş, **“DîwanaMela Sîraceddînê Xelîlî-Gulcivîn (Metn û Lêkolîn)”**, (Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardîn Artûkluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî Li Tirkîyeyê, Mêrdîn 2019), r. 18.

Şerbeta ehlê widada kenzê 'îrfana **tu wî**

Xaşedergahê murada şedrê dîwana **tu wî**

(32/1)

Textê irşadê li Xezna zâtê efxem wê li ser

Rutbeya 'alî mubarek wê li bejna rû qemer

Şewqê daye **rûwê** dunya her wekî roj têtê der

Wek Suleymanê hukumdar şed wekî aşef li ber

Nuşretullahi`t-te`aley j' bo te ra şam û seher

(50/1)

-Carinan dengdara alîkar/kelijandinê ya "y"yê nayê bikaranîn.

Heyat tev çû di **dunya'ê** / di bîra te mirin na'ê

Ecel tê şubhetê **ba'ê** / li min rehmê bike ya Reb

(2/4)

-Dengdêra "e"yê ku di Kurmancîya giştî de bi "e"yê ye di devoka Torê de diguhere "a"yê.²⁶⁵

Ez li dunya'ê kesîr im / rûsiyah jar û feqîr im

Pir ze'îf im û heqîr im / xeste'ê dunya fena **ma**

(1/6)

Me j' destê her sê dijmina / can û ciger dil şohtin **a**

Ev şin'et û karê min **a** / keslan û gafil her zeman

(5/5)

Pur bi gayet hukmê rebban / î li ser Me'sûm bida

Nûr û feyza ehlê 'îrfan / î li bejnê şu'le da

'Erşê bi saţê Suleyman / î li Tilme'rûf veda

Ev hedîya Ehmedê Şan / î qebûl kir min geda

²⁶⁵ Lokman Kalan, "Rêjeya Dengan Di Devoka Torê/Tûrabdîn De", *Nûbihar*, C. 23, j. 147, r. 58.

Sûk û bazar nûr û israr bûye îzhar bê hesab

(52/2)

-Di devoka Torê de dema ku lêker di dema niha de tê kişandin qertafên kesên duyem û sêyem ên yekjimar ku di eslê xwe de “e” ye dibe “ê”.²⁶⁶

Ez û yarê m’ li vê dunyê ji hev em têr nebûn ya Reb

Neşîbê me bi dîna wî bikî der Cennetê ya Reb

Ji nûra bejn û bala wî bibînin lezzetê ya Reb

Bi feqla xwe xelaş kî me ji derdê firqetê ya Reb

Felek xa’îr û bêbext e hema ku fursetê tîne

Ji hev wînda dikî dosta li wan zahir dikê kîne

(73/6)

-Di dema niha de li şûna lêkera “kirin”ê lêkera “dan”ê hatiye bikaranîn.

Derdê min derdek gedar e / kerbê dil bûne hezar e

Ez **didim** qîr û hewar e / ya Resûlallah meded

(4/9)

2.2.4.2.2. Devoka Berrîya Mêrdînê

Bêjeya “berrî”yê di Erebi de ji erdên rast, fireh û bejî re tê gotin. Di nava gel de ji bêjeya berrîyê deşta Mêrdînê tê fêmkirin. Berrîya Mêrdînê ji sînoren Serêkanîyê û Wêranşarê dest pê dike, ji Nêşibînê wê de heta nêzîkî Cizîrê berdewam dike.²⁶⁷

Heyderî sê salan li berrîya Mêrdînê li gundê Girbeşkê melatî kiriye. Di tevahîya jîyana xwe de têkilîyên wî yê xurt digel xelkên herêma Mêrdînê çêbûne.

-Peyva “axaftin/axibîn/axivîn” ku li berrîya Mêrdînê bi wateya “ji nû ve kulbûna” birînekê tê bikaranîn²⁶⁸ di diwanê de bi vî awayî derbas dibe;

²⁶⁶ Bo agahîyên berfirehtir bnr.: Sinan Gültekin, “**Hevokên Temamker ên Berkarî yê Kurmancî yê Devoka Torê**”, (Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardîn Artûkluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî Li Tirkîyeyê, Mêrdîn 2019).

²⁶⁷ Tan, **Turabidîn’den Berriyê’ye Aşiretler, Dinler, Diller Kùltürler**, r. 17.

Eya Seyda'ê Şêx 'Ebdurrezaq îro li ser erda
 Cemala te xuya nakî te can û dil temam keyda
 Dilê gemgîn berê kul bû te yek car agirek pê da
 Te **axaftin** birînê dil hiş û 'eqlê me bûn sewda
 Ji fikra min tu derna'ê heta sağ bim eya Seyda

(44/1)

-Li berrîya Mêrdînê gelek caran di daçekên “ji”, “di”, “re”, û “de” de dengdêrên wan dikeve û bi peyva berî xwe re tên telafûzkirin. Pevr’ (bi hev re/pevre), têtj’ malê (tê ji malê)

Tabi'ê şer'a Muḥemmed canfida canê te bî
 Weqtê tengî 'ê **d'** hewar û gaziya hana tu wî

(20/6)

Dilo dunya derwîn e
 Çiqas ji **me r'** bimîne
 Tû guh nedê xa'în e
 Jina pîs e bi yar e

(38/6)

-Lêkera “gotin”ê ku di kurmancîya nivîskî, di dema niha de bi şiklê “dibêjim, dibêjî, dibêje” tê kişandin, li Mêrdînê bi awayê “dibêm, dibê, divê” tê kişandin.

Bi roj û şev di fikra min di zîkrê da **dibêm** Eḥmed
 Tu wî wens û hedana min bi qurbana te bim Eḥmed

(11/1)

²⁶⁸ Hemîd, Kiliçaslan, “Devoka Berrîya Mêrdînê”, **Kurmancî, Rojnameya Taybetî ya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê**, Bihar 2003, j. 33, r. 1.

2.2.4.3. Taybetîyên Devoka Botan

Botan, herêmeke ku ji Hekkarî hetanî Cizîrê dewam dike tê gotin. Li başûrê Botan Behdînan û li rojhilatê wê jî Hekkarî heye. Ji xelkên li herêmê dijîn re Botî yan jî Bohtî / Buhtî tê gotin. Navenda herêma Botan, bajarê Cizîrê ye.²⁶⁹ Dema behsa Cizîra Botan a dîrokî tê kirin, tenê behsa bajarekî nayê kirin. Lewra bajarê Cizîrê bi herêma derdora xwe wek bajar-dewletekê ye.²⁷⁰ Dîsa Şerefxanê Bidlîsî jî di berhema xwe ya li ser dîroka kurdan “*Şerefname*”yê de bi hûrgulî behsa girîngîya bajarê Cizîrê û herêma Botan dike.²⁷¹ Cizîr di dîrokê de bajarekî navendî û di çand û edebiyata Kurdî de bi taybetî jî ji bo edebiyata Kurdî ya klasîk bûye navend.²⁷²

Di kesayetîya Melayê Cizîrî ya edebî û berhema Ehmedê Xanî (Mem û Zîn) de herêma Cizîrê gelekî hatiye naskirin û hin taybetmendîyên devoka Botan ji bo helbestvanên edebiyata klasîk jî bûne mînak. Heyderî zarokatîya xwe li herêma Torê derbas kiriye ku ev herêm cîranê herêma Botan e û ji alîyê ziman ve gelek xusûsiyetên wan ên hevpar hene. Di heman wextê de Heyderî gelekî ji Melayê Cizîrî hez kiriye û di nivîsandina helbestande ew şopandiye. Ji ber van sedeman tesîra devoka Botan li ser Dîwanê pir çêbûye.

-Di devoka Botan de ji peyva “ceger”ê re “cerg” tê gotin. Di dîwanê de di gelek cihan de ceger bi awayê cergê hatiye bikaranîn; (28/11), (74/7), (42/3), (50/8) û hwd.

Ez pir kula dikêşim / **cerg** û dila dibrêjim

Roj û şeva dibêjim / mame gerîb û gemdar

(28/11)

Leb-şeker û awir-esed / şuhtî li min **cerg** û cesed

Şed ah û nalîn bê ‘eded / ev rûh ji min ta bê cuda

(74/7)

²⁶⁹ Işık, h.b., r. 109.

²⁷⁰ Zülküf Ergün, **Bajar-Edebiyat û Cizîra Botan**, weş. Nûbihar, Stenbol 2014, r. 110.

²⁷¹ Bitlisî Şerefxan, **Şerefname (cilt 1)**, wer: Abdullah Yeğin, weş. Nûbihar, Stenbol 2013, r. 160-194.

²⁷² Ayhan Tek, “Cizîr Wek Merkezeke Kanona Edeba Kurdî û Rengvedana Wê ên di Şîra Kurdî de”, **Uluslararası Sosyal Bilimler Kongresi**, Diyarbakır, Veysel Gürhan, 14-17 Eylûl 2017, r. 359.

-Lêkera, “diwerêtin” ku bi wateya “diherikîne” ye û lêkera “biderêtin” jî ku tê wateya “kirin”ê di devoka Botan de tên bikaranîn.

(Cewra te behêt in û cefaya te perêtin)

Tîrê te reşandin li me tev agir û pêt in

Dilpare’ê ھusna te me her xwîn **diwerêtin**

Pirseke qe nekir em ji xwe mehcûr **biderêtin**

(Qurbana te bim goh bide carek gilehê min)

(36/3)

-Lêkerên, “dixwirim (dixwim)”, “weritin” û “nûşîn bikitin” jî peyvên devoka Botan in.

Dixwirim ez bi du zulfê te xelek şond û yemînan

Bi du çeşmên te belek şifa ji bo derd û birînan

Bi du lêvê şekerîni gemrevînê me ھezînan

(Mûyekî ez ji te nadim bi du şed Zîn û Şîrînan)

(Çi dibit ger tu ھesêb kî me bi Firhad û Memê)

(35/14)

(Yek ‘îşqê **Mela yî** bi buha bête ji le‘lan)

Nuşîn bikitin wê qedeھا şubhetê lalan

Zewqeq li ھeyata me **werîtin** meh û salan

Şu‘lek ji wê ھusnê ku Emînbid ya ji dalan

(Şed can me hebin hîşek û meqşer di behê min)

(36/9)

-“Me‘zûr bidêrin” li herêma Botan tê wateya “bike”.

Xwezuya m’ bidîta ey emîr / nûra te ya bedra munîr

Me‘zûr bidêrin min feqîr / min bê qerarê Xeznewî

(8/16)

-Di cihên din ê dîwanê de jî xusûsiyetên hin peyv û qertafên devoka Botan wiha ne; bête xwarê (31/2), bête (77/10, (38/10), bibitin (54/4), hebitin (36/8), dibitin (56/3, 56/5), bideri bibitin (54/4), da xweş bibitin (75/4), weqtê te bivêtin (59/5), têk (47/3) û hwd. Bo nimûne em ê li jêrê çend mînakên bidin.

Derman ke dilê reş bi wê îhsana Xudê

Himmet ke ku nisbet were zêde ji Xudê

Da xweş bibitin derd û kulê vê kebedê

Me şûm di vî weqtî tu wî hana mededê

Qelb xeste ye dunya qe nema ji **biderî**

(54/4)

Dîsa ji nû rakir hicab / nisbet reşandî bê hisab

Can û ciger **têk bûn** kebab / rûh û cesed cumle feda

(74/3)

2.2.4.4. Taybetîyên Devoka Hekkarî

Herêma Hekkarî di dîrokê de herêmeke berfireh e. Berî serdema Mîrên Hekkarî sînorên herêmê li rojhilat sînorê niha yê navbera Tirkîye-Îranê derbas dikir. Li bakur digîha heta başûrê Gola Wanê. Li başûr qismekî mezin ji herêma Behdînan jî di nava xwe de dicivand û li rojava jî digîha heta çiyayên Tanînê ku sînorê Bêşebab û Qilebanê ye. Di serdema mîrektîyan de sînorên herêmê, Gola Wanê derbas kiriye û demekê gîhaye heta Bazîdê jî. Di sala 1400î de herêma Amêdîyê ji herêma Hekkarî veqetîyaye û bûye herêmeke xweser. Piştî Komara Tirkîyeyê jî bakurê herêmê (Elbak, Şax, Payîzava, Westan, Miks) bi ser wîlayeta Wanê ve hatiye girêdan û piştî jî Bêşebab bi ser wîlayeta Şîrnexê ve hatiye girêdan. Her çiqas navenda bajêr jî dîrokê ve Colemanêrg be û niha navê navenda bajêr weke Hekkarî tê naskirin jî Hekkarî navê herêmê bi giştî ye û Colemanêrg jî perçeyeke ji vê herêmê ye.²⁷³

²⁷³ Çölemerikli, İhsan, **Hakkari Sûretleri**, weş. Lîs, Amed 2006, r. 12-15.

Herêma Hekkarî ji sedsala 14an hetanî sedsala 19an ji alîyê mîrên Hekkarî ve hatiye birêvebirin.²⁷⁴ Mîrên Hekkarî li helbestvanên Kurd xwedî derketine û destek dane wan. Pertew Beg ku hem mîrê Hekkarî bû di heman wextê de helbestvan bû û dîwanek jî nivîsiye.²⁷⁵ Di “*Şerefname*”ya Şerefxanê Bidlîsî de li ser tarîx û hukimdarên herêma Hekkarî agahîyên berfireh hene.²⁷⁶ Mihemed Emîn Zekî beg jî li ser mîrekên herêma Hekkarî agahî dane.²⁷⁷

Di edebiyata Kurdî gelek berhem bi vê devokê hatine nivîsîn. Bi taybetî helbestvanên klasîk ên wek; Feqîyê Teyran, Ehmedê Xanî, Mela Huseynê Bateyî, Pertew Begê Hekkarî, û hwd. berhemên xwe bi devoka Colemêrgê nivîsîne.²⁷⁸ Em ê li jêrê li ser taybetîyên devoka Hekkarî yên ku li ser dîwanê çêbûne rawestin.

-Bela ku dîftonga “xw” li devera Şemzînanê, ku ew jî perçeyeke ji herêma Hekkarî ye, tune ye tenê “x” û li balê tîpên bideng (wekî “a, e, u, î, ê) tên bikaranîn.²⁷⁹ Li jêrê cînavka vegerok “xwe” jî bê dîftong hatiye nivîsîn.

Lew me ji remz û nezer qet em ji **xo** bê xeber in

Ku cemala eniyê zêde ji husna qemerê

(10/8)

Me ‘ehd e kû nekin terka hebîb û çav-gezalê **xo**

Li dergahê te bim tûle bi qurbana te bim Ehed

(11/5)

Li herêma Colemêrgê li şûna lêkera “karîn”ê “şîyan” jî tê bikaranîn.

Ez **neşem** weşfan bibêjim sed hezar ‘alim geha

Cinn û emlak perî tev ‘aciz in ji weşfa cesîm

(14/6)

²⁷⁴ Işık, h.b., r. 197.

²⁷⁵ Perto, **Dîwan**, Amadekar: Tehsîn Îbrahîm Doskî, weş. Nûbihar, Stenbol 2011, r. 22.

²⁷⁶ Bitlîsî, h.b., n.r. 138-150.

²⁷⁷ Mihemed Emîn Zekî Beg, h.b., r. 522-532

²⁷⁸ Miradexan Şemzînî, “Devoka Devera Şemzînan di Nav Zaravayên Kurmancî de”, **Nûbihar**, c. 21, j. 144, r. 86.

²⁷⁹ Şemzînî, h.b., r. 90.

-Di dîwanê de peyvên wek, “digel bit (19/1), fida bit (24/1), bivêtin (59/5), (74/7), bit (19/1, 81/10, 36/8), nebit (35/9), hebitit (36/8), bibitin (54/4), têt (42/3, 50/1)” her wekî di devoka Botan de hene di devoka Hekkarî de jî hene.

Her bi roj û her bi şev **bit** / nazîrê Me‘şûm Xudê

Himmeta quţba digel **bit** / yadigarê merqedê

(19/1)

Weke encam em dikarin bibêjin ku taybetîyên devoka Hekkarî di çarçoveya bandora Bateyî û de di dîwana Heyderî de hene.

2.2.4.5. Taybetîyên Devoka Binxetê (Rojava)

Geşedanên piştî Şerê Cîhanê yê Yekem dagirkirina Frensîyan a erda Sûrîyeyê û avabûna Komara Tirkîyeyê bûn sedem ku axa Kurd lê dijîn bibe du perçe. Bi vê bûyerê alîyekî Kurdan bi ser dewleta Sûrîyeyê û alîyekî Kurdan jî bi ser dewleta Tirkîyeyê ve man. Ji xwe di navbera her du herêman de xeta tirênê jî hebû. Bi vî awayî xelkên herêmê ji alîyê axa Kurdan ya Tirkîyeyê re “Serxet” û ji alîyê axa Kurdan ya Sûrîyeyê re jî “Binxet” gotin.²⁸⁰

-Heyderî hê di dehsalîya xwe de ji bo perwerdehîya ilmî û dînî çûye Binxetê û mudetekê li Amûdê, Tilmerûf, gundê Xeznayê maye. Di dîwanê unsûra ‘îlam hilda (37/1) xusûsîyeta devoka Binxetê nîşan dide.

Şukir lillah me dî zahir / terîqa Xeznewî şewq da

Ji nesla kamil û tahir / ‘Ela’eddîn dibû peyda

Di vî qirnê me ‘ê axir / di Islamê **’îlam hilda**

(37/1)

Ji bo rengvedana taybetîyên devokên Kurdî bi giştî weke encam em dikarin bêjin ku taybetîyên devokên Hekkarî û Binxetê pir kêr in. Di dîwanê de du devokên esasî hene: Devoka Merdîn (Tor û Berrîyê) û Botan. Sedemeke bikaranîna unsûrên

²⁸⁰ Yıldırım, **Rojava Kürt Tarihi ve Coğrafyası**-1, r. 27.

devokên Botan û Hekkarî ew e ku ji ber sîstema kişandina lêkeran ve alternatîf û derfeteke baş ji bo kêşa helbestê dide helbestvanan.²⁸¹

2.2.5. Di Dîwanê de Unsûrên Zimanên Biyanî

Mîrov, yan di derdora tê de mezin dibe, yan jî bi perwerdehiyê dibe xwedî pirziman. Di medreseyan Kurdî yên klasîk de herî kêrhatî ziman hebûne û tenê bi Kurdî perwerdehiyê dihat dayîn. Lê perwerdeya bi Erebî û Farisî jî dihat kirin. Heyderî, ji ber ku li herêmeke pirzimanî (li herêma Mêrdînê çar ziman; Kurdî, Erebî, Suryankî û zimanê fermî Tirkî tenê axaftin) jîyaye, perwerdehiya dînî, ilmî, edebî dîtiye û bi edebiyata klasîk re jî têkildar bûye. Ji xeynî zimanê zikmakî (Kurdî), Erebî, Farisî, Tirkî jî hîn bûye û bi van her çar zimanan berhem nivîsîye.

2.2.5.1. Unsûrên Erebî

Di hemû medreseyan Kurdaan ên klasîk de zimanên Erebî hebûne û bêtirê perwerdehiya ilmî bi zimanê Kurdî lê ji pirtûkên Erebî dihat dayîn. Her wekî tesîra zimanê Erebî li ser edebiyata Farisan, Tirkan û milletên din ên rojhilatî heye, li ser edebiyata Kurdî ya klasîk jî heye. Di hemû dîwanên edebiyata Kurdî de kêrhatî zêde bandora zimanê Erebî çêbûye.

Heyderî, bi zimanê Erebî baş dizane û berhem pê nivîsîye. Berhemên wî yên bi navê “*Mewludu’n-Nebî*” û “*Rîsaleya Exlaq û Tesewîfê*” bi Erebî ne. Lê di berhemên wî yên Kurdî jî tesîra Erebî xuya dike. Di Dîwanê de jî gelek bêje, terkîb, ravek, biwêj û hevokên bi Erebî hene. Di dîwanê de Erebî carinan wek peyv, terkîb û kombêje derdikevin pêş me, carinan wek misrayekê, carinan wek malik an bendekê û carinan jî wek qismekî helbestê yan jî tevahiya helbestê derdikeve pêşberî me.

Hin peyvên Erebî yên di dîwanê de ev in: le‘l (lêv), ‘alî (mezin), zelîl, illet, muyesser, mesrûr, tebeddul, munewwer, keşşaf, teheyur, muhtela, mehzûn, necm, tesseruf, ewsaf, tecella, muhbet, heqîr, xedar û hwd.

²⁸¹M. Zana Karak, “*Dîwançeya Şêx Îsmetullahê Karazî (Metn û Lêkolîn)*”, (Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardîn Artûkluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî Li Tirkîyeyê, Mêrdîn 2020), r. 96.

Terkîb, qalib û ravekên edebî yê ku di dîwanê de bi zimanê Erebi derbas dibin ev in.

Yewmu`l-qiyama (1/2)

Daru`l-qerar (75/11)

Axir-zeman (5/8)

Quretu`l-`eyn (76/1)

Ehsenillahî tebarek (27/5)

`Enu`l-heyat (76/4)

Be`delwefat (30/6)

Fî hubuke ragîb (77/9)

Nusretullahi`t-Te`aley (50/1)

Seyahu`d-dîn (79/1)

Bi`l-yeqîn (50/9)

Nuru`l-Huda (79/4)

Fi`l-heqîqet (50/2)

Durru`l-buhûr (80/1)

Ĥemdullilahi (51/1)

Nûru`l-beşer (80/2)

Îmamu`l-mu`mînûn (51/2)

Qulhûwellahû Ehed (51/4)

`Eyni`l-Ĥeyat (51/4)

El kerîm axu`l-kiram (60/2)

El kerîm îbnu`l-kerîm (60/3)

Wesselam (60/7)

Cenetu`l-e`la (65/10)

Kenzu`l-hîdayet(70/4)

Ehlen wessehlen (74/4)

Bi`l-yeqîn (75/5)

`Eynu`l-heyat (75/8)

-Di dîwanê de di hin helbestan de hin misra bi tevahî bi Erebi ne. Jimareyên van helbestan û misrayên wan di nava kevanekê de hatine nîşandan: (15/7), (18/12), (44/6), (51/2), (51/3), (53/7), (62/1, 2, 3, 4, 5), (79/5).

Ger te heye xilafek / qeşdê bike bibîne

Kerren fekeren carek / yerci' ileyke e'wer

(15/7)

Keşfî`l-kurûb / setri`l-`uyûb / meḥwi`z-zunûb / fetḥi`l-qulûb

Hem daye te / pir hummet e / mizgîn li te /xaqan î tu

(79/5)

-Di van helbestên ku li jêrê jimareya helbest û bendên wan di nava kevanekê de hatine nîşandan jî bend bi tevahî Erebi ne (35/13), (53/6), (64/7), (65/5).

Ente liddînî mu`înun / we leke şe'nun `ecîb

Ente fîl `eqî rezînun / fike esrarun gerîb

Welena keḥfun emînun / ni`metellahi`l-mucîb

Inenî şexşun ḥezînun / hel lena minke`n-neşîb

Lî enîsun we qerînun / ḥubbuke fî şedrî şeb

(53/6)

-Di dîwanê de sê helbestên Erebi hene (helbestên 85, 86 û 87). Dîsa du helbest hene ku nivê wan bi Erebi ne: (23/4, 5, 6, 7, 8).

Fe Lillahî durûhû min şulbi Eḥmed

Ku rêza wî ṭerîqa wî deranî

(23/6)

Fe eḡnahû bihî `emma siwahû

Ḥemahû min dewahîyi`z-zemanî

(23/7)

Di dîwanê de di nava helbestên Kurdî de hin misra malik an bendên bi Erebî hene ku carinan ev perçeyên Erebî ji alîyê nezm û rîtmê ve li yên Kurdî nayên. Wekî di mînaka jêr de jî xuya ye kîteyên misraya sêyem ji yên din zêdetir e.

We qelbî rûh ilel Me 'şûm bi şidqin wetruki 'l-gille

We bellig kamilen minnî selamen wezheri 'z-zille

Bi ennel Heyderî kane xeşayahû tecela sicille

We qul inne 'l-kerîme men yeqûlu e 'fuwe 'l-kulle

We haza sa 'ilun bi 'l-bab yûnadînî birîndar

(65/5)

2.2.5.2. Unsûrên Farisî

Di medreseyên Kurdan de her wekî zimanê Erebî, zimanê Farisî jî hebûye. Jixwe bingeha edebiyata Kurdî ya klasîk ji alîyê ehlê medreseyan ve hatiye avêtin. Helbestvanên klasîk wek, Melayê Cizîrî, Feqîyê Teyran, Ehmedê Xanî, Mela Huseynê Bateyî û Şêx Ehmedê Feqîr, tev ji medreseyên Kurdan derketine û ev helbestvan hemû ji edebiyata Farisî agahdar bûne û bi Farisî helbest nivîsîne.²⁸²

Heyderî bi zimanê Farisî dizanîbû. Her çiqas xusûsen bi Farisî helbest nenivîsîbe jî mulemmê'eke çarzimanî (Erebî, Farisî, Tirkî, Kurdîya Kurmancî) nivîsîye ku ji her bendeke misrayek jê bi Farisî ye. Helbestvan di hin cihan de peyv û terkîbên Farisî bi kar anîne. Carinan jî hevokên farisî bi kar anîne. Herçiqas helbestvan bi Farisî dizanibe jî Farisîya wî wek Erebîya wî ne xurt e. Şaşıyên îstînsaxê jî têgihiştina risteyên wî yên Farisî zehmettir kirine. Em ê li jêrê hevokên Farisî yên di dîwanê de û çend nimûneyan ji wan bidin;

Hem çu nîz (21/3)

Her can resîde rehmeteş (21/5)

Der în derûnem şed keser (21/11)

²⁸² Hayrullah Acar, "Di Edebiyata Kurdî Ya Klasîk De Farisînûsî: Nimûneya Weda'î", **e-şarkiyat İlmî araştırmalar dergisi**, c. 8, j. 1, r. 297.

Hem cunîn şod (75/12)

Bû sêfilê qelbê nexweş / **her can resîde rehmeteş**

Rûh im fida çeşmê di reş / wî murşidê cewher-xeber

(21/5)

Ê nas nekir ew cahil e / lewra ji 'îşqê gafil e

Ev can û dil pêk ve kul e / **der în derûnem sed keser**

(21/11)

Rehberê dunya û dîn ya raşeta rûhê **Emîn**

Hem çunîn şod Heyderîzade dikî şed ah û zar

(75/12)

Nimûne ji hin peyvên Farisî yên ku di dîwanê de;

Awaz	Payibend	Gulzar
Ebrû	Serdar	Çehre (rû)
Mehweş	Guzîn	Goh/Koh (çîya)
Rûsiyah	Çeşm	Bûter
Şermende	Penah	Zeban
Tîr	Cah	Eşk
Peyxam	Zar	Sayegîr
Sefîd	Lalezar	Mujde
Bed	Derdiyar	Şeb
Bose/Bûse	Erzehl	Cayegîr
Kemter	Pehlewan	Destegîr
Derdimend	Serdefter	Leb

Şermisar

2.2.5.3. Unsûrên Tirkî

Cihê xwedêdana Heyderî û qismê jîyana xwe ya ku bi piranî lê buhurtîye herêmên wek; Nisêbîn, Midyat, Qoser, Farqîn û Diyarbekirê ne. Ev herêm tev ji alîyê îdarî ya fermî ve bi ser Komara Tirkîyeyê ve girêdayî ne û zimanê fermî yên van herêman jî Tirkî ye. Her çiqas Heyderî zarokatîya xwe li herêmek Kurmancîaxêf û perwerdehiya xwe jî li Binxetê berdewam kiribe jî zimanê Tirkî jî baş hîn bûye. Bi Tirkî du qesîde (helbestên di rêza 83 û 84) nivîsîne. Unsûrên zimanê Tirkî yên di dîwanê de bi qasî Erebî û Farisî nebin jî hin hevok û peyvên bi Tirkî tê de derbas dibin. Bêje û kombêjeyên Tirkî di dîwanê de ev in; yelan (5/7), begler (11/6), saxlem (25/9), inan nebe (38/9), qazme (38/11), sax (49/5), çewr û qesra (55/3), hezar begler (57/4), inan bikin (59/2).

Em gafilê qebra reş in / li ser riya heq nameşin

Dil ‘aşiqê dunya geş in / dunya qebîl talî **yelan**

(5/3)

Li dergahê te **şed begler** emîr û ‘alim û zahid

Bi meqşûdî telebdar im bi qurbana te bim Eḥmed

(11/6)

Billah ji lûḡa sermedî / da mîr ‘Eladîn seyyedî

Me b’ ça‘va kes wek wî nedî / ku ev terîḡ **saglem** ḥemand

(25/9)

Çiqa ku bête dest e

Înan nebe bêbext e

Karê wê tev de sext e

Bê fayde ye xesar e

(38/9)

Dilo tu xwe nespêrê

Kes jê nabînê xêrê

Talî bi **qazm** û bêrê

Te dikşînê mezar e

(38/11)

Ji bo unsûrên zimanên biyanî weke encam em dikarin bêjin ku unsûrên herî pir bi rêzê ev in; unsûrên Erebi, piştî unsûrên Farisî û Piştî jî unsûrên Tirkî hatine bikaranîn.

2.3. HUNERÊN EDEBÎ

Hunerên edebî her wekî tê dîtin ji du peyvên, huner û edebê pêk tê. Ji hemû tiştên mensûbê edebiyatê re edebî tê gotin. Huner jî ji xwe tê wateya xemilandin, xweşikkirin û berbiçavkirina tiştêkî ji rêzê ye.²⁸³ Hunerên edebî li ser xweşikkirin û xemilandina peyv û wateya gotinê radiweste. Hemû kesên bi edebiyatê re têkildar û di vî warî de berhemên dinivîsîn, dixwazin mane û xemlekê bidin gotinê.²⁸⁴ Ji xwe bi saya vê endîşeyê zimanekî ji yê rojane û ji rêzê cudatir, ku jê re zimanê edebî tê gotin derdikeve holê.

Di edebiyata klasîk de ji xemilandin û ciwankirina gotinê re bi giştî belaxet tê gotin ku ev têgeh di serdema Edebîyata Ereban a Cahilîyeyê de derketiye holê. Lê bi bandora ilmê Qur'an û dînê Îslamê bûye têgeheke ilmî.²⁸⁵ Belaxet, ji alîyê mane û derbirînê ve îfadekirina hest û ramenekî yê ku bi gotineke vekirî û bi xweştirîn awayî bê bikaranîn. Bi kurtasî ji gotina herî xweş û rast re belaxet tê gotin. Îlmê belaxetê sê qism e: me'anî, beyan û bedî'.²⁸⁶ Belaxet di edebiyatê de cihekî girîng digire û wek zanistêke binbeş a edebiyata klasîk tê dîtin.²⁸⁷

Çawa ku hat gotin beşên belaxetê sê heb in; me'anî, beyan û bedî'. Me'anî (watenasî), li gorî rewşê bikaranîna peyvên e. Di belaxetê de li ser mijarên ku bi

²⁸³ Îskender Pala, **Ansiklopedîk Divan şîirî sözlüğü**, 9. Baskı, L&M Yayıncılık İstanbul 2002, r. 130.

²⁸⁴ Adak, **Destpêka Edebîyata Kurdî ya Klasîk**, r. 28.

²⁸⁵ Pala, h.b., r. 75.

²⁸⁶ M. A. Yekta Saraç, **Klasik Edebiyat Bilgisi Belâgat**, 2. Baskı, Bilimevi Yayınları İstanbul 2005, r. 35.

gotinê re têkildar in radiweste.²⁸⁸ Beyan (ronbêjî), ilmek e ku li ser usûl û qaîdeyên îfadekirina wateya rastîn û mecazî ya gotinê radiweste. Di belaxetê de erka beyanê, têkilîya di navbera lefz û maneyê derdixe holê.²⁸⁹ Bedî' (ciwankarî) jî ilmekî belaxetê ye û li ser usûl û qaîdeyên xemilandina gotinê ji alîyê lefz û wateyê ve radiweste.²⁹⁰

Di pirtûkên wêjeyî de hunerên edebî bi piranî li ser du beşan; beyan û bedî' tên senifandin. Lê hinek kes beşa me'anîyê jî lê zêde dikin û dikin sê beşan.²⁹¹ Hunerên edebî jî li gorî têkilîya huneran bi mecaz, wate, peyv û herfan re jî tên binbeşkirin/sernavkirin.²⁹² Em ê jî hunerên edebî yên di dîwanê de di bin sê beşan de binirxînin.

- 1). Hunerên edebî yên bi mecaz û teşbîhê ve girêdayî (beyan / ronbêjî)
- 2). Hunerên edebî yên bi wateyê ve girêdayî (bedî' / ciwankarî)
- 3). Hunerên edebî yên bi peyv, deng û ahengê ve girêdayî (bedî' / ciwankarî)

2.3.1. Hunerên Edebî yên bi Mecaz û Teşbîhê ve Girêdayî

2.3.1.1. Teşbîh (Lêkçiwandin)

Teşbîh, peyvek ji zimanê Erebî ye û wateya wê ya ferhengê, şibandina tiştekî bi tiştekî din e. Di belaxetê de, ji bo taybetîya tiştekî an bûyerekê bi awayekî xurttir bê vegotin ji du tiştan yek bi ya din ve tê şibandin.²⁹³ Di teşbîhê de çar unsûrên sereke hene.

-Ê ku dişibe (muşebbeh)

-Ê ku tê şibandin (muşebbehun bîh)

²⁸⁷ Adak, **Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk**, r. 43.

²⁸⁸ Saraç, **Klasik Edebiyat Bilgisi Belâgat**, r. 53.

²⁸⁹ Saraç, **Klasik Edebiyat Bilgisi Belâgat**, r. 90.

²⁹⁰ Saraç, **Klasik Edebiyat Bilgisi Belâgat**, r. 141.

²⁹¹ Osman Aslanoğlu, "Di Mem û Zînê De Hunerên Mecazî", **e-şarkiyat İlmi ve Araştırmalar Dergisi**, c. 11, j. 1(23). 2019, r. 139.

-Alîyê şibandinê (wechê şebêh)

-Daçeka Şibandinê (edatê şebêh)

Ji bo hunera teşbîhê bê sazîkirin divê muşebbeh û muşebbehun bîh her du muheqqeq bîn bikaranîn.²⁹⁴ Di dîwana Heyderî de hunera teşbîhê bi rêjeyeke zêde hatiye bikaranîn. Em ê bo nimûne li jêrê du mînak ji dîwanê bidin.

Burhê wekî du heyva / dêmê ji rengê sêva

Mîn dî ji her du lêva / ya Reb çî şehd û şerbet

(17/7)

Dunya otêl e xan e

Tû çend roja mêvan e

Tû b' 'aqilî bizane

Dunya ne mal e bar e

(38/7)

Di malika jorîn de “burh” bi “heyv”ê, “dêm” bi “sêv”ê û “lêv” jî bi “şerbet”ê hatine şibandin. Di bendê de jî “dunya” bi “otêl” û “xan”ê re hatiye teşbîhkirin.

2.3.1.2. Îstî‘are

Îstî‘are hunereke mecazî û şibandinê ye. Ev hunera teşbîhê ye ku tenê “ê ku dişibe” yan “ê ku tê şibandin” tê bikaranîn derdikeve holê. Bi îfadeyeke din ji îstî‘areyê re teşbîha kurt tê gotin.²⁹⁵

Necm e ya xurşîd e ya heyva li çarda bû xuya

Şu‘le ya yaqût e ya elmas e ya durru`l-bîhar

(75/6)

²⁹² Derheqê hunerên edebî de bo agahîyên berfirehtir bnr: Mehdi Zana Karak, “**Di Wêjeya Kurdî de Danasîna Ciwankariyê**”, (Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artûkluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yê Li Tirkiyeyê Mêrdîn 2013).

²⁹³ Saraç, **Klasik Edebiyat Bilgisi Belâgat**, r. 118.

²⁹⁴ Saraç, **Klasik Edebiyat Bilgisi Belâgat**, r. 118.

²⁹⁵ Saraç, **Klasik Edebiyat Bilgisi Belâgat**, r. 109.

Beyreqa dîn ya ‘ilimdarê terîqa musteqîm
Ya huner şêr quţbê ferd ya murşidê zozanê dil

(76/9)

Di malika ewil de peyvên “necm (stêrk)”, “xurşîd (tav)” û “heyv”, di malika duyem de jî peyva “şêr” ji bo dilbera helbestvan ya mecazî (şêxê wî) hatiye bi karanîn.

2.3.1.3. Mecaza Mursel

Bikaranîna gotineke bêyî ku bê teşbîhkirin ji derveyî wateya rastî di wateya mecazî de ye. Ji bo mecaza mursel pêk were divê gotin derveyî wateya rastîn be û qarînea manewî tê de hebe.²⁹⁶

Şed qesem şond û yemîn e / derbê Me‘şûm pir me dîne
Şek û şubhe tê de nîne / lalezarê merqedê

(19/8)

Di malika jorîn de peyva “merqedê” bêyî ku bê şibandin li şûna kesên ku rehmetî ne û di qebrê de medfûn in hatiye gotin. Dost û yarê yên di merqedê ne, ne merqed bi xwe ye, mirovên tê de ne.

2.3.1.4. Kînaye

Di ferhengê de tê wateya sergirtina tiştekî bi tiştekî din. Di belaxetê de, ji gotineke ku wateya rastîn û mecazî bi hev re ye lê qestkirina esas ya mecazî ye tê gotin.²⁹⁷ Gava pêşî li gotinê tê nêrîn hem wateya rast hem jî wateya mecazî xuya dibe. Lê di esasê xwe de qestkirina wateya mecazî ye.

Ez pir kula dikêşim / cerg û dila dibrêjim
Roj û şeva dibêjim / mame gerîb û gemdar

(28/11)

²⁹⁶ Cem Dilçin, *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, 8. Baskı, TDK Yayınları, Ankara 2003, r. 215.

²⁹⁷ Saraç, *Klasik Edebiyat Bilgisi Belâgat*, r. 129.

Helbestvan, her çiqas ji bo Şewata dil û cegerê xwe “biraştin”, ku ji bo pijandina goşt tê gotin, bi kar anî be jî armanca wî ew e ku dertkêşî û elema dilê xwe vebêje.

2.3.2. Hunerên Edebî yên Bi wateyê ve Girêdayî

2.3.2.1. Husnê Te‘lîl

Husnê Te‘lîl, gava ji bo vegotîneke xweştir çêbibe sedema rewş an bûyerekê bi sedemeke derveyî ya rastîn bê nîşandayîn derdikeve holê.²⁹⁸ Her wekî li jêr tê xuyakirin hilatin û avabûna rojê bûyerên xwezayî ne lê helbestvan sedemê rojhilatîna rojê bi hatina Eladîn (Şêx Eladînê Xeznewî) ve girêdaye.

Roj bû di ‘ewran da hilat / mizgîn j’ we ra ehlê welat

Îro ‘Ela’eddîn dihat zûlmet / ji qelban wî derand

(25/2)

2.3.2.2. Mubalexe

Mubalexe ew e ku ji bo vegotin xurttir bibe tiştek di tarîf û teswîrkirinê de ji rastîyê gelekî zêdetir an kêmtir bê nîşandan.²⁹⁹

Ev leb û le‘lê şeker wechê bi heybet û şêrîn

Qamet û şiklê me dî zêde ji şewqa fenerê

(10/5)

Meş-nazik û şêrîn-kelam / kuştin gelek mîr û gulam

Wî şorgula bagê himam / berda dila tîrê beşer

(21/10)

Di malika yekem de rewşek (şewqa wê bêtirê ji ya fenerê) û di malika din de jî bûyerek (bi tîr û mijangan kuştina mîr û xulaman) ji rastîya xwe gelekî zêdetir hatine vegotin.

²⁹⁸ Dilçin, h.b., r. 209.

²⁹⁹ Tahir-ül Mevlevî, h.b., r. 105.

2.3.2.3. Teşxîs

Ev huner tê wateya “kesanekirin” an jî “şibandina mirovan”. Yanî heyînên derveyî mirovan (heywan, gîha, xweza û hwd.) wek mirovekî ku difikire, dibihîse û tevgerê dike nişan dide.³⁰⁰ Di dîwanê de li gelek cihan hunera teşxîsê hatiye kirin. Di benda jêrîn de “dunya”yê wekî mirovekî rahiştiye qazme û bêrê, mezel dikole nîşan daye.

Dilo tu xwe nespêrê

Kes jê nabînê xêrê

Talî bi qazm û bêrê

Te dikşînî mezar e

(38/11)

2.3.2.4. Tecahula ‘Arif

Tecahula ‘arif, di metnê de gava helbestvan ji nukteyekê tiştê ku dizane û bi zanebûn, her wekî kesekî arif xwe li cahiltîyê dîne, xwe li nezanîyê dîne, hunera tecahula ‘arif derdikeve holê.³⁰¹

Mest û serxweş tême reqşê / ma gelo fetwe heye

Lew ji bê ‘eql û ji neqşê / min vekir ev de‘weye

Mam di nava heys û beysê / dilketin bê lewme ye

Heyderîzade bi şexşê / can bi qurbana te ye

Lew Emîn bû dilbirîn carek bibîn der gurbetê

(42/7)

Mest û reqsa helbestvan ji eşqa wî tê. Lê xwe li nezanîyê datîne û pirs dike ka ji bo çi ye û gelo fetwe ji vê reqşê re heye?

³⁰⁰ Aslanoğlu, “Di Mem û Zînê De Hunerên Mecazî”, r. 146.

³⁰¹ Saraç, **Klasik Edebiyat Bilgisi Belâgat**, r. 205.

2.3.2.5. Îstîfham

Wateya îstîfhamê pîrskirin e. Lê di belaxetê de wateya hunerî, ji bo mirov balê bikişîne ser xalekê yan fikrekê tişta ku bersiva wê dizane pîrs bike dibe îstîfham.³⁰²

Gelî yar û mirîda **ev çi ni‘met**

Xudê îhsan kirî kes pê nizanî

(23/9)

2.3.2.6. Îstîdrak

Di vê hunerê de, di şiklê pesindayînê de rexnekirin (te‘kîdu‘z-zem bîma yuşbîhu‘l-medh) û di şiklê rexnekirinê de jî pesindayîna (te‘kîdu‘l-medh bîma yuşbîhu‘z-zem) kesekî tê kirin.

Mest û serxweş tême reqşê / ma gelo fetwe heyê

Lew ji bê ‘eql û ji neqşê / min vekir ev de‘weye

Mam di nava heys û beysê / dilketin bê lewme ye

Heyderîzade bi şexşê / can bi qurbana te ye

Lew Emîn bû dilbirîn carek bibîn der ğurbetê

(42/7)

Helbestvan di serî de wek rexneyê dike ji ber ‘eql û neqşê serxweş ketiye û ketiye reqşê, lê di berdewama bendê de tê xuyakirin ku ev ji işqê ye û cihê îftîxariyê ye.

2.3.2.7. Nîda

Di ferhengê de tê wateya bangkirin/gazîkirinê. Ev huner bi baneşanan çêdibe. Helbestvan bi gotineke biçoş bi awayê banglêkirinê dest bi nivîsîna helbesta xwe dike.³⁰³ Di dîwanê de hunera nîdayê di gelek cihan de hatiye kirin.

³⁰² Yıldırım, **Ehmedê Xanî Mem û Zîn**, r. 55.

Ey cîran û ehlê dunê / 'ê kû li dîn guhdar bizan
Hûn guh bidin vê gotinê / dîn bû gerîb û bê guman

(5/1)

Eya saqî dikim hêvî şeraba 'eşqê zû bînê
Ku hişyar bî dilê gemgîn bike rehmê xwe bighînê
Bi behşa dilbera şêrîn dilê min zû bike şînê
Bi dengê Heyderîbakim **eya dilber** tu Şêrînê
Te pir 'aşîq kirin mecnûn şev û roja dinalînê
Belê mûkî ji te nadim bi şed Leyla û şed Zînê

(73/1)

2.3.2.8. **Tekrîr**

Tekrîr tê wateya tekrar û dubareyê. Ji bo vegotin xurttir bibe hin peyv û kombêjeyên hilbijartî tên dubarekirin.³⁰⁴ Gava di nava metneke edebî de peyv an kombêje çend caran li pey hev bi awayekî sîmetrîk bîna dubarekirin hunera tekrîrê çêdibe.³⁰⁵ Di nimûneyên jêrê de peyv û kombêjeyên reşkirî hatine dubarekirin.

Bi qurban im bi qurban im bi heyran

Bi heyrana te bim qutbê zemanî

(23/12)

Neqşebendî pir dixwazin em li dûv rêzê **herin**
Ger dixwazin hûn nebin mehrûm ji feyza wan **herin**
Şêx 'Eladdîn go **werin** ger hûn birîndar in **werin**
Ger hûn gunehkar in **werin werin werin** pir zû **werin**

³⁰³ Yıldırım, **Ehmedê Xanî Mem û Zîn**, r. 55.

³⁰⁴ Dilçin, h.b., r. 452.

³⁰⁵ Abdurrahman Adak, "Mûsîqî û Aheng di Helbestên Melayê Cizîrî De", **Mukaddime**, 2017, j. 8 (3), r. 71.

Me‘dena feyz û terîqê hatî Xezna Neqşebend

(64/5)

2.3.2.9. Tedrîc

Di ferhengê de derece derece, pêl bi pêl, bi pêş ve hêdî hêdî hereketkirina tişteki ye. Di edebiyatê derece derece derbirîna vegotinê ye.³⁰⁶

Ketme erda gurbetê da / mişlê hebsê mame tê da

Roj bi roj derdê me zêda / ya Resûlellah meded

(4/5)

El eman Me‘şûm bû derdim **gün be gün qat qat olur**

Sen buyûr qûrtar benî ya sendedir çaresinî

(83/5)

2.3.2.10. Tezad

Peyvên ji alîyê wateyê ve dijberî hev in û di heman cihê de tên bikaranîn. Di navbera du rewş, du bûyer an du fikrên dijberî hev de jî tezad çêdibe.³⁰⁷ Di dîwanê de hunera tezadê di gelek cihan de hatiye bikaranîn.

Ez pir kula dikêşim / cerg û dila dibrêjim

Roj û şeva dibêjim / mame gerîb û gemdar

(28/11)

2.3.2.11. Muqabele

Tiştên di navbera wan de tezad û teqabul heye di heman cihê de bî bikaranîn hunera muqabeleyê derdikeve holê.³⁰⁸

³⁰⁶ Ferîd Develioğlu, **Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Lûgat**, 24. Baskı, Aydın Kitabevi, Ankara 2007, r. 1054.

³⁰⁷ Saraç, **Klasik Edebiyat Bilgisi Belâgat**, r. 150.

³⁰⁸ Mevlevî, h.b., r. 102.

Min dî ji rengê şorgul / **dağdane** qelbê bulbul

Derman dikî qelbê **kul** / **melhem** ji nûr û nisbet

(17/8)

Di navbera daxkirina dil û dermankirina qelb de û dîsa di navbera kul (derd) û derman de jî muqabele heye.

2.3.2.12. Tenasub

Di tenasubê de ji xeynî yên bi tezaad (dijber) di bêjeyên ji alîyê wateyê ve bi hev re pêwendîdar herî kêr du heb tên ba hev û rêz dibin. Ji bo hunera tenasubê serkeftî be divê bêjeyên tekilîya wan bi hev re ne bîn ba hev. Pêwendîya di navbera wan peyvên de çiqas xurt be hunera tenasubê jî ewqasî serkeftî dibe.³⁰⁹ Di dîwana Heyderî de hunera tenasubê pir hatiye bikaranîn. Bo nimûne em ê li jêrê du mînakên ji dîwanê bidin.

‘**Alim** û **şofi** yû **zahid** tên **sulûk** û **xizmetê**

Têne ber **dergahê** ‘alî **murşidê** wana tu wî

(20/2)

Ez **tî** û **birçî** **zuwa** me lew ji we dûr mame ez

Şerbet û **şehd** û **heyat** û **kewşer** û **fincan** î tû

(78/8)

Di malika yekem de peyvên; alim, sofî, zahid, sulûk, xizmet, dergah û murşid di warê tesewîfê de bi hev re pêwendîdar in. Di malika duyem de jî peyvên; birçî, zuwa, şerbet, şehd, heyat, kewşer û fincan di navbera wan de têkilîyeke li ser xwarin û vexwarinê heye.

³⁰⁹ İsa Kocakaplan, **Açıklamalı Edebi Sanatlar**, 7. Baskı, Türk Edebiyatı Vakfı Yayınları, İstanbul 2011, r. 152.

2.3.2.13. Teşabuhu'l-Etraf

Gava helbestvan perçeyek helbestê (malik an bend) bi bêjeya ku dest pê kiriye bi dawî bike yan jî bi bêjeyeke bi wê re pêwendîdar biqedîne ev huner derdikeve holê.³¹⁰

Weşfê te çi bêjim ser tēbîbê şubhetê Luqman

Sertextê Suleyman

Der emrê te insan û melek û cinn û beha'im

Medhê te çi zanim

(77/8)

Di malika jorîn de ku ji teşeya mustezadê hatiye girtin, malik bi “wesfê te çi bêjim” dest pê kiriye û bi “medhê te çi zanim” diqede. Lewra teşabuhu'l-etraf çêbûye.

2.3.2.14. Îham

Di ferhengê de tê wateya xistina şubheyê ye. Di misra yan malikekê de bikaranîna peyveke pir wateyî û qestkirina wateya wê ya dûr e.³¹¹ Di vê hunerê de pêşî wateya peyvê ji aliyê xwîner ve şaş tê fêmkirin, lê piştî fikirînê wateya wê ya rast tê fêmkirin. Ji bo îham çêbibe divê hem wateya wê ya nêzîk û hem jî ya dûr bi malikê an bendê re pêwendîdar be.

Eya saqî dikim hêvî şeraba 'eşqê zû bînê

Ku hişyar bî dilê gēmgîn bike rehmê xwe bighînê

Bi behşa dilbera şêrîn dilê min zû bike şînê

Bi dengê Heyderî bakim eya dilber tu Şêrînê

Te pir 'aşîq kirin **mecnûn** şev û roja dinalînê

³¹⁰ Saraç, **Klasik Edebiyat Bilgisi Belâgat**, r. 148.

³¹¹ Pala, h.b., r. 240.

Belê mûkî ji te nadim bi şed Leyla û şed Zînê

(73/1)

Ji ber ku di benda jor de peyvên Leyla, Şêrîn û Zîn derbas dibin, di xwendina pêşî de xwîner dikeve wê zennê ku peyva “mecnûn” bi wateya navê Qeys e (evîndarê Leylayê). Lê piştî hizirkirinê tê dîtîn ku peyva mecnûn di Erebi de tê wateya hişberdan, dînbûnê û di vê bendê de jî bi vê wateyê hatiye bikaranîn.

2.3.2.15. Teraduf (Hemwateyî)

Di edebiyatê de hunera teradufê ew e ku di perçeyeke helbestê de, bêjeyek bi du yan bêtir wateyên wek hev bê bikaranîn. Hunereke li ser bêjeyên hemwate ava dibe.³¹² Ji ber ku di dîwana Heyderî de bêjeyên Erebi û farisî pir hatine bikaranîn, gelek caran wekî di mînakên jêr de jî xuya dibe peyvên hemwateyî bi hev re hatine bikaranîn.

Şerbeta nûra zelal **behra** te ye

Nuqteyek derket ji **derya**’ê meded

(18/7)

Roj bû hilat / **hedyexelat** / Eşmed dihat / merwanî tû

Nûr hatî ser / dil kir dûger / le’lê şeker / dehan î tû

(79/8)

2.3.2.16. Leff û Neşr

Leff û neşr ew huner e ku piştî du yan zêdetir gotin hatin rêzkirin piştî wan gotinên têkildar an bi munasebetekê nêzî wan dîsa bîn rêzkirin derdikeve holê. Ji gotinên ewil “leff” û yên piştî tîn rêzkirin jî “neşir” tê gotin. Gava gotinên leffê pêk tînin di neşrê de jî bi heman tertîbê bîn rêzkirin leff û neşra mureteb lê gava tertîba leff û neşran ne yek be leff û neşra nemureteb derdikeve holê.³¹³

Nûr e ya 'eynu`l-heyat ya selsebîla Cennetê

Kewşer e ya şerbeta le'la ye ya nûrîn 'izar

(75/8)

Malika jor di misraya yekem de peyvên nûr, 'eynu`l-heyat, selsebîla Cennetê rêzbûne. Di misraya duyem de peyva Kewşerê bi selsebîla Cennetê, şerbeta le'la bi 'eynu`l-heyatê û peyva nûrîn jî bi peyva nûrê têkildar e. Ji ber ku rêzkirina peyvên leffê û neşirê pêk tînin ne di heman tertîbê de ne mînaka me leff û neşra nemureteb e.

2.3.2.17. Bera'etê Istihlal

Ji bo mijara ku wê di berhema menzûm an mensûrê de bê bikaranîn, di destpêkê de gotineke guncawî mijarê tê bikaranîn ku jê re bera'eta istihlal tê gotin.³¹⁴

Ismê te mubarek Muḥemed Me'sûmê Sanî

Renk taze riḥan î

Her herfekî şed me'ne jî navê te tê zanî

Ey rewşa cihan î

(81/1)

Malika jor, malika yekem a helbesta akrostîşa ku li ser Şêx Mesûmê Sanî hatiye nivîsandin. Helbestvan di malika ewil de nîşan daye ku wê mijara helbestê li ser navê Şêx Mesûm be.

2.3.2.18. Telmîh

Telmîh ew e ku bêtî ku di gotinê de behsa çîrok, serpêhatî, bûyereke dîrokî, efsaneyek, qehremanekî dîrokî, bawerîyek, ayet an jî hedîsekê bike, îşaretî wê bûyer, çîrok an wî qehremanî bike.³¹⁵ Di vê hunerê de xwîner helbestê bi bûyera ku pê

³¹² Develioğlu, h.b., r. 1082.

³¹³ Saraç, **Klasik Edebiyat Bilgisi Belâgat**, r. 164.

³¹⁴ Mevlevî, h.b., r. 26.

³¹⁵ Numan Külekçi, **Açıklamalar ve Örneklerle Edebi Sanatlar**, 6. Baskı, Akçağ Yayınları 2013, r. 170.

hatiye telmîh kirin re difikire û ji bo şîroveyê îmkaneke berfirehtir bi dest dixe.³¹⁶ Di dîwana Heyderî de hunera telmîhê di gelek cihan de hatiye bikaranîn.

Himmeta ‘alî giran e / qa‘idê **Textê Hemîd**

Leb şeker pir ‘eql û zane / pehlewane mu‘teber

(22/5)

Pir ze‘îf im tengezar im ‘Enqêşê ‘ebda me ez

Qeyser û **Rustem** gulam in **Kisre** yû xaqan î tû

(78/5)

Di malikên jor de telmîh bi textê Hemîd ku sembola hukumranîya wî bû û bi Qeyser, Rustemê Zal, û Kisreyî jî hatiye telmîhkirin ku ev şexsiyet hemû qehremanên dîrokî ne.

2.3.2.19. Îqtûbas

Di metneke edebî de çi nezm çi mensûr bikaranîna ayeteke Qur’ana pîroz an hedîseke Cenabê Pêxember, îqtûbasê derdixe holê.³¹⁷ Her wekî ku di malika jêr de ayetek ji Qur’ana pîroz hatiye îqtûbaskirin.

Derya heyva mudewer ya şefeqa **Şemsu`d-duha**

‘Eynî selwa ya elîf ya qameta reyhanê dil

(76/7)

2.3.2.20. Îrsala Mesel

Îrsala mesel di metneke edebî de bikaranîna gotineke pêşîyan, wecîzeyek an biwêjekê ye. Di malika jêrîn de bikaranîna biwêja “ax û xwelî bi ser wer bûn” îrsala mesel derxistiye holê.

³¹⁶ Kocakaplan, h.b., r. 149.

³¹⁷ Saraç, **Klasik Edebiyat Bilgisi Belâgat**, r. 246.

Min dil firût ji ‘işqa / me nîne şebr û taqet

Ez dûr ketim ji Xezna / **ax û xwelî li min wer**

(15/4)

2.3.3. Hunerên Edebî yên bi Peyv Deng û Ahengê ve Girêdayî

2.3.3.1. Cînas

Ew huner e ku bi peyvên xwendin û nivîsîna wan yek, lê di wateyê de ji hev cuda ne tîrîkirin cînas tê gotin. Jê re tecnîs jî tê gotin. Gava di perçeyê helbestekê de peyvek di nava peyveke din de bê bikaranîn cureyeke cînasê derdikeve holê ku jê re cînasa merfû‘ tê gotin.³¹⁸ Di benda jêr de peyva “leb” bûye perçeyek ji peyva “Heleb”ê. Lewra cînasa merfû‘ heye.

Textê irşadê cihanî / her kesî lê kir teleb

Wî li ser Me‘şûmê Şanî / hukmê qelba daye Reb

Mehdiyê ehlê zemanî / murşidê şêrîn e **leb**

Beyreqa nûrê hîlanî / şu‘le da Şam û **Heleb**

Hem bi xêra wî me zanî / rêz û te‘lîm û edeb

(53/1)

2.3.3.2. Îştîqaq

Îştîqaq di ferhengê de tê wateya dariştin. Dariştina peyvekê ji rayeka peyveke din çêdibe ku ji peyvên wisa re “muşteq” tê gotin. Di perçeyeke nezm an nesrê de ji bo xemla vegotinê çêbibe peyvên muşteq li ba hev tîrîkirin bikaranîn ku ji vê hunerê re îştîqaq tê gotin.³¹⁹

Înşaf **bikin** ku vana / ‘ilm û terîq didana

Te‘lîm didan nezana / herkes **kirin** xebardar

(28/9)

³¹⁸ Dilçin, h.b., r. 467, 472.

³¹⁹ Kûlekçi, h.b., r. 269.

Werne mela xortê delal / teslîm bibin bê **qîl û qal**

Ger we di vê dergahê ‘al / bavê ji wê fikra beçal

Qet hûn nekin şek û **qiyal** / bid‘ û riya nîne li bal

(33/6)

Di malikên jor de lêkerên “bikin û kirin”ji heman rayekê, bêjeyên “‘ilm û te‘lîm” heman rayekê û bêjeyên “qîl, qal qîyal” jî ji heman rayekê hatine dariştin.

2.3.3.3. Qelb

Qelb hunerek e ku di du peyvên ku cihê herfên wan hatine guhertin de derdikeve holê.³²⁰

Ev şin‘et û karê **me** ye / **em** ketne dest nefsa xwe ye

‘Umrê **me** çû bê fayde ye / dê **em** çikin tedbîr ji wan

(5/6)

Di malika jor di her du misrayan de jî peyvên “em” û “me” ji ber ku cihê herfên wan guherîne hunera qelbê derketiye holê.

2.3.3.4. Alîterasyon û Asonans

Ev her du huner jî ji dubarekirina dengan pêk tên³²¹, lê ferqa di navbera wan de alîterasyon, bi dubarekirina herfên bêdeng û asonans jî bi dubarekirina herfên dengdêr çêdibe.³²²

Ĥê ĥamid û ĥakim Ĥesenu`l-xulqê ĥelîm

Ĥazîq tu ĥekîm

Ĥukmê te ĥeqîqet heçî zulmet bû hilanî

Ĥeqî ji nû danî

(81/3)

³²⁰ Külekçi, h.b., r. 217.

³²¹ Pala, h.b., r.30.

³²² Adak, “Mûsîqî û Aheng di Helbestên Melayê Cizîrî de”, r. 73.

Şad şadiqê şafî şedefa şefa şefîya

Sêfilê şemediya

Şed şofi yû mela hatine şef şef bose danî

Şadiq şemedan î

(81/6)

Di malikên jor de herfên bêdeng “h” û “s” hatine dubarekirin hunera alîterasyonê; herfên dengdêr “a” û “e” jî hatine dubarekirin û hunera asonansê derxistine holê.

2.3.3.5. Sedr û ‘Ecz (Reddu’l-‘Ecuz Ale’s-Sadr)

Peyvek yan kombêjeyek gava di ser û binê malikê de bînan bikaranîn hunera sedr û ‘eczê derdikeve holê. Sedr tê wateya peyva yekem û ‘ecz jî tê wateya peyva dawî.³²³ Di malika jêr de kombêjeya canfida hem di serê malikê hem jî di dawîya malikê de heye.

Canfida me nûr ‘ulam e / mîr û ağa bûn gulam e

Ez tenê jê dûr dimame / **canfida me canfida**

(16/6)

2.3.3.6. Îade

Di helbestekê de bêje yan kombêjeyên di dawîya malikê de tên bi karanîn di serê malika piştî xwe de dîsa bînan dubarekirin ev huner derdikeve holê.³²⁴ Îade, piranî di ser û binê malikan de tê bikaranîn lê ji ber ku helbesta jêr nezîre (qesîdeya Şêx Eladînê Xeznewî) ye û helbesta ku hatiye tenzîrkirin bi neqeratê (ya Resûlullah meded) ye helbestvan xwestiye ji helbesta bîngeh re sadiq bimîne. Ji ber vî hawî peyvên ku bînan dawîya misraya duyem helbestvan xistiye serê misrayê.

Bêkes im ser wechê ‘erdê / hatime ber deryê rewde

Ez dexîl im min neberdê / ya Resûlellah meded

(4/2)

Ez dexîl im bê mefer mam / nîne sewda lal û ker mam

Dil tijî derd û keser mam / ya Resûlellah meded

(4/4)

Dil tijî derdê giran im / gafil im dûr im nezan im

Lê di zahir musliman im / ya Resûlellah meded

(4/3)

2.3.3.7. Muwazene

Hunereke wekhevîya dengan e. Di helbestê de bête yan kombêjeyên ku ji alîyê weznê (kêşe) ve yek in lê ji alîyê serwayê ve ne yek in muwazeneyê saz dikin.³²⁵

Tengezar im dîlkirî me / çav li rehîma ber derî me

Rûsiyah im Heyderîme / ya Resûlellah meded

(4/12)

Munewwer kir bi ixlaşê / xelaş bûn pê gelek ‘aşî

Muzeyyen kir dilê qaşê / bi nûra bingehê Xezna

(7/4)

2.3.3.8. Tersî‘

Di helbestê de ji alîyê peyv, hejmar, kêş û serwayê ve beramberkirina peyvên di misrayan de hunera tersî‘ê derdixe holê. Jê re tewazun jî tê gotin. Helbestên bi vî awayî hatine nivîsîn bi navê murassa‘ tên binavkirin.³²⁶

³²³ Saraç, **Klasik Edebiyat Bilgisi Belâgat**, r. 237.

³²⁴ Külekçi, h.b., r. 249.

³²⁵ Saraç, **Klasik Edebiyat Bilgisi Belâgat**, r. 223.

³²⁶ Dilçin, h.b., r. 488.

Dilbera nazik-nihalê / gul di bagê lezzetê
 Qameta selwî-fişalê / şikl û şun'a qudretê
 Ser Şîrîna ba cemalê / têr ji feyz û nisbetê
 Sox û şengê pir delalê / can fidayê qametê
 Mey ji destê te me xwestê / bûme mestê şerbetê

(42/1)

2.3.3.9. Tesmit

Hunera tesmîte di serwaya navekî de ku xezel û qesîdeyên musemmet çêdike derdikeve holê. Di vê hunerê de malik dibe çar beş. Sê beşên pêşî di nava xwe de hemserwa ne beşa dawîn jî bi serwaya bingeîn a helbestê re hemserwa ye.³²⁷ Heyderî di 39 helbestan de hunera tesmîte bi kar anîye.

Berq û burûskanê **hebîb** / hiştîm di nav kerbek 'ecîb
 Rengzer kirim dil kir **nehîb** / xweş kir dilê şah û **geda**

(74/2)

Dîsa ji nû rakir **hicab** / nisbet reşandî bê **hisab**
 Can û ciger têk bûn **kebab** / rûh û cesed cumle **feda**

(74/3)

2.3.3.10. Tewşîh (Akrostîş)

Tîpa yekem a her misrayê ku ji jor de ber bi jêr ve bê xwendin eger peyvek an jî navekî bi wate derkeve holê jê re akrostîş tê gotin.³²⁸ Di helbesta Dîwanê de jê re muweşşeh an jî îstîhrac hatiye gotin. Her wekî bi tîpa yekem a serê misrayan tê kirin dibe ku her tîpek bê serê malikekê jî.³²⁹ Heyderî di helbesta ku em ê li jêr bidin bi tîpên “mîm, hê, dal, ‘eyn, sad, waw û dîsa mîm”ê navê Şêx Mihemed Me’sûmê Xeznewî bi hunera akrostîşê saz kiriye. Akrostîşa di dîwana Heyderî de bi teşeya mustezadê ye û bi awayê ku her tîpek bê serê malikê navê “Me’sûm” hatiye sazkirin.

³²⁷ Adak, “Mûsîqî û Aheng di Helbestên Melayê Cizîrî de”, r. 53.

³²⁸ Hayrullah Acar, **Dîwana Şêx Ehmedê Feqîr (Metn û Lêkolîn)**, weş. Nûbihar, Stenbol 2016, r. 74.

³²⁹ Dilçin, h.b., r. 488

Dîsa di her malikê de tîpa ku bûye perçeyeke akrostîşê di tevahiya malikê de dubare kiriye ku ew jî dubareya heman dengî ritmek daye helbestê. Em ê li jêr helbestê bi tevahî bidin.

Ismê te mubarek Muḥemed Me'şûmêSanî

Renk taze riḥan î

Her herfekî şed me'ne ji navê te tê zanî

Ey rewşa cihan î

Mîm mani'ê bid'ê te meḥû kir kederê me

Hem derd û ğemê me

Meşhûrtir î hem ji Rustem hem Nûşîrewan î

Mehbûbê zeman î

Ḥê ḥamid û ḥakim Ḥesenu'l-xulqê ḥelîm

Ḥazîq tu ḥekîm

Ḥukmê te ḥeqîqet heçî zulmet bû hîlanî

Ḥeqî ji nû danî

Dal daye te destûr te dewa kir dilê mehcûr

Dunya bi te meşhûr

Dîndara te şêrîn e tu wî dilber di zemanî

Dermanê dilan î

'**Eyn** 'ilm û 'edalet ji te ra rukn û 'esas e

Bê ḥedd û qiyas e

'Alem bi te ḥeyy bû tu wî fexra 'aliman î

Behrekî 'umman î

Şad şadiqê şafî şedefa şefa şefîya

Sêfilê şemediya

Şed şofi yû mela hatine şef şef bose danî

Şadiq şemedan î

Waw warişê 'ilmê me nedî wek te wefadar

Walî û hûkimdar

Walî tu wî weqtê we ye ey werdê zemanî

Wek weşfê me zanî

Mîm maye tam mecdê meqamê te mu'ella

Me'lûm û mucella

Medhê te çi zanin em feqîr bikne beyanî

Meqşûd û me'anî

Ya Reb tu meqama bidê Me'sûm bo me 'alî

Di nûrê cemalî

Ya Reb tu bikî wî ji me ra pîrê zemanî

Xortê nûciwanî

Miskîn ji xeṭa'ê xwe nema karî tu fehwa

Qeṭ bikî de'wa

Ḥusna te li dil daye fida bit rûḥ û canî

Mulk û der û xanî

Halê me xerab e ji me hêvî ji te imdad

Şed nalîn û feryad

Qet na'ê tebatê **Heyderîzade** ji fiğanî

Ey Me'sûmê Şanî

(81/1, 2, 3, 4, 5, 6, 7, 8, 9, 10, 11)

2.3.3.11. Tezmîn

Tezmîn di ferhengê de tê wateya veşartina tiştekî di hundirê tiştekî de. Wateya wê ya edebî ew e ku helbestvanek perçeyek ji helbesta helbestvanek din têxe nava helbesta xwe.³³⁰

Di benda jêr de jî Heyderî misrayek “ger hûn gunehkarin werin werin werin pir zû werin” ji helbesteke Şêx Eladînê Xeznewî tezmîn kiriye.

Şêx Eladîn;

Ger hûn birîndar in werin ger hûn gunehkar in werin

Ger hûn sulûkvan in **wer in werin werin pir zû werin**

Werin li cem şêxê delal dizgîn û adab pur kemal

Yeqîn dewa'ê bê misal **werin werin pir zû werin**³³¹

Heyderî;

Neqşebendî pir dixwazin em li dûv rêzê herin

Ger dixwazin hûn nebin mehrûm ji feyza wan herin

Şêx 'Eladdîn go werin ger hûn birîndar in werin

Ger hûn gunehkar in werin werin werin pir zû werin

Me' dena feyz û terîqê hatî Xezna Neqşebend

(64/5)

³³⁰ Saraç, **Klasik Edebiyat Bilgisi Belâgat**, r. 251.

³³¹ Bo agahîyên berfirehtir, bnr. “**Dîwana Camî'a**” diwana berhevkişî ya Mihemed Şêxmûsê Botî El-Neqşebendî, r. 123.

2.3.3.12. Telmî‘ (Mulemme‘)

Di misrayên helbestekê yan di beşeke misrayekê de bikaranîna zimanên cuda telmî‘ e.³³²

Keşfi`l-kurûb / setri`l-‘uyûb / meħwi`z-zunûb / fetħi`l-qulûb

Hem daye te / pir hummet e / mizgîn li te / xaqan î tû

(79/5)

Di edebiyata kalsîk de “mulemme” weke têgeheke ji helbesta ku bi pirzimanî hatiye nivîsîn re tê gotin. Yanî di mulemme‘ê de şert e ku herî kêr bi du zimanan hatibe nivîsîn.³³³ Di her muleme‘ê de herî kêr du ziman hene. Lewra di her muleme‘ê de hunera telmî‘ê jî heye. Heyderî jî di dîwana xwe de du mulemme‘ nivîsîne. Helbestên di rêza 40 û 41ê de mulemme‘ in.

El-firaqu halenî min be‘di ħubbin qed weced (Erebî)

Kemterîn dilxwahê in şod ber muradeş ne resed (Farisî)

Ger bu yolda ben ölürsem çare yoq sizden sened (Tirkî)

Merhema derd û birîna wê li cem Me‘şûm weced (Kurdî)

(40/1)

El-fîraqû i‘teranî hakeza kane`l-qeder (Erebî)

El-meded Ġewşê zemanî dil li min bûye digêr (Kurdî)

Eyledim ettim fiğanî ey felek yağtî ciger (Tirkî)

Ey şehê min nav gelê min da dilê min şed keser (Kurdî)

(41/1)

³³² Kocakaplan, h.b., r. 147.

³³³ Nesîm Sönmez, *Dîwana Şêx Muşerrefê Xinûkî (Metn û Lêkolîn)*, Seyda yayınları, Diyarbakır 2018, r. 47.


2.4. TEŞEYÊN NEZMÊ

Nezm, tê wateya rêzkirin an rêzkirina morîkan li tayî ve. Di edebiyatê de jî ji wan peyv û gotinên ku bi kêş û serwa ne û bi komikên misrayan tên saz kirin re tê gotin. Ji berhemên bi awayê nezmê derdikevin holê re menzûm/menzûme û ji yên mezin re jî berhemên menzûm tê gotin. Di edebiyata klasîk a Îslamî de nezm ku helbestê jî di nava xwe de vedigire, di nav teşeyên taybet û cuda de hatine vehandin û her yek ji wan teşeyên bi navên cuda ên wek xezel, qesîde, murebbe‘, muxemmes û hwd. hatine binavkirin. Teşe iskeleta helbestê ava dike. Bi tevahî ruxsarîyên helbestê re têkildar e û alîyê helbestê yê derekî îfade dike.³³⁴ Hêmanên ku teşeya helbestê ava dikin evin: Yekeya nezmê, serwaya menzûmê, qewareya helbestê, kêşa menzûmeyê, naveroka menzûmeyê. Teşeya nezmê pêşî bi yekeya nezmê ji hev cuda dibin. Piştî jî bi kêş, serwa û hêmanên din tene cudakirin. Ji alîyê yekeya nezmê teşe dibin sê kom: Teşeyên nezmê yên ji misrayan pêk tên, teşeyên nezmê yên ji malikan pêk tên, teşeyên nezmê yên ji bendan pêk tên.³³⁵

Di dîwana Heyderî de gelek teşeyên nezmê hene ku me ew li gorî usûla dîwanên kategorîk saz kirine bi hejmara xwe wiha ne: Qit‘eyek, 36 qesîde, şeş xezel, sê mustezad, musellesek, çar murebbe‘, 26 muxemmes, texmîsek, teşîrek, şeş museddes, terkîbbendek, tercî‘bendek. Gava ji alîyê teşeyên nezmê ve em li dîwanê dinêrin, em dibînin ku dîwan ji alîyê teşeyên nezmê ve dewlemend e. Tê de 12 teşeyên nezmê hene.

³³⁴ Adak, *Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*, r. 96,57 ; Pala, h.b., r. 364, 365.

³³⁵ Adak, *Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*, r. 97, 98.



Grafîk 2: Hejmara Teşeyên Nezmê yên di Dîwanê de

Ji nav teşeyên nezmê yên di dîwanê de qesîde û muxemmes bi hejmareke pir derdikevin pêş. Em ê li jêrê yek bi yek li ser van teşeyan rawestin. Ji ber ku teşeyên bi yekeya misrayê tîr sazîkirin di dîwanê de tunene em ê teşeyên nezmê di bin du koman de binirxînin; teşeyên nezmê yên ji malikan pêk tîr û teşeyên nezmê yên ji bendan pêk tîr.

2.4.1. Teşeyên Nezmê yên ku ji Malikan Pêk Tîr

Teşeyên nezmê yên ji malikan pêk tîr çar heb in: Qesîde, xezel, qit'e û mesnewî. Ev her çar teşeyên nezmê li ser du beşan tîr dabeşîkirin. Yên yekserwa û ya cotserwa. Xezel, qesîde û qit'e yekserwa ne, mesnewî jî cotserwa ye.³³⁶ Em ê li jêrê li ser teşeyên yekserwa ku di dîwana me de hene rawestin. Mustezad jî teşeyeke ji yekeya malikan hatiye dariştin. Loma em ê mustezadê jî di bin vê beşê de bidin.

³³⁶ Adak, *Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*, r. 111.

2.4.1.1. Qesîde

Qesîde teşeyê nezmê ye ku bi yekeya malikê, yekîtiya serwa û kêşê li ser mijarên wek; pesn, daşorîn, pîrozbahî tîn nivîsîn. Qesîde, di edebiyata Erebi de ji berî Îslamîyetê, ji Serdema Cahilîyeyê heye. Ji edebiyata Erebi derbasî nav edebiyatên Farisî, Tirkî, Kurdî û hwd. bûye.³³⁷

Di edebiyata Kurdî de teşeya qesîdeyê bereksê edebiyata Îslamî ji kevin de pêş neketiye. Ji ber ku helbesta Kurdî di bin giraniya xezelê de dest pê kiriye û desthilatiya Kurdan ne zêde bi hêz bûye teşeya qesîdeyê dereng şax daye. Di serdema mîrektîyan de helbestvanên edebiyata Kurdîya Kurmancî wek Hemîdî Melayê Cizîrî, Feqîyê Teyran, Ehmedê Xanî, Melayê Bateyî, Axaokê Bêdarî, Evdîlqadirê Hekkarî, Şêx Ehmedê Feqîr, Pertew Beg, Weda'î Şêx Nûredînê Birîfkanî û Mela Xelîlê Sêrtî qesîde nivîsîne. Di serdema piştî mîrektîyan de jî helbestvanên wek Evdîlqadirê Hezanî, Seydayê Licî, Şêx Evdîrehmanê Aqtepî, Kerbelayî, Şêx Hemzeyê kurê Sultan Memdûhê Tilohî, Mela Xelîlê Zoqeydî, Mela Mihemed Nûrîyê Ewhedî, Mela Reşîdê Comanî, Seyîd Elîyê Findikî, Nalbend, Mela Ehmedê Heyderî, Cegerxwîn û Mela Ehmedê Xelatî bi teşeya qesîdeyê helbest nivîsîne.³³⁸

Di dîwanê de teşeya herî pir hatiye bikaranîn qesîde ye.

Tablo 5: Rêz, Hejmar û Qewareya Qesîdeyên di Dîwanê de

Rêza Qesîdeyê di Dîwanê de	Hejmara Malikan
3, 85 (Erebî)	3
12	7
14, 30	8
7, 9	9
17, 27	10


³³⁷ Adak, *Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*, r. 113.

³³⁸ Adak, *Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*, r. 117, 118.

2, 5, 6, 20, 25, 26, 29, 32, 83 (Tirkî), 84 (Tirkî), 87 (Erebî)	11
4, 13, 16, 28, 31	12
10, 11, 19, 21	13
15, 18	14
23	15
8	17
86 (Erebî)	19

Her wekî ji tabloya jor jî tê xuyakirin sisê bi Erebî, didu bi Tirkî, 31 bi Kurdîya Kurmancî, bi tevahî 36 qesîde di dîwanê de hene. Qewareya qesîdeyên di dîwanê de di navbera sisê û 19 malikan de tê guhertin. Lê 11 qesîde bi 11 malikan hatine nivîsîn ku ev jî ji alîyê qewareya qesîdeyan de qesîdeyên herî dirêj ên di dîwanê de ne. Qesîdeyên di rêza sisê û 85an de du qesîdeyên nîvçe ne.

Di nav 36 qesîdeyan de herî pir, behra erûzê ya “remel”ê hatiye bikaranîn.



Grafîk 3: Rêjeya Bikaranîna Behrên Erûzê di Qesîdeyan de

Naveroka qesîdeyên di dîwanê de em dikarin di çarçoveya cureyên edebî de binirxînin. Sê qesîde li ser bangewazî û daxwazîya ji bo Xweda ne ku ev jî munacat in. Qesîdeyek li ser cenabê Pêxember bi cureya ne‘tê ye û qesîdeyek hîcwiye ye ku rexneya li ser dinyê û zemanê talî û mirovên wextê ye. Qesîdeyek jî li ser mirina Şêx Eladînê Xeznewî ye ku ew jî bi cureya mersiyyê ye. 30 qesîde jî li ser pesnê medrese, terîqet û şêxên Xeznewîyan e.

Tablo 6: Cureyên Nezmê yên Qesîdeyên di Dîwanê de

Cureyên Edebî yên Qesîdeyan	Rêza Qesîdeyê ya di Dîwanê de	Yekûn
Munacat	2, 3, 85	3
Ne‘t	4	1
Hîcwiye	5	1

Medhiye	6, 7, 8, 9, 10, 11, 12,... 31, 83, 84, 86, 87	30
Mersiye	32	1

Carinan du helbestvan bi hev re yan her yek misrayek an jî her yek malikekê dinivîsin ku ji vê helbestê re helbesta muşterek tê gotin. Bi piranî di teşeya xezelê de tê kirin.³³⁹ Di edebiyata Kurdî ya Soranî de Narî û Tahir Beg xezeleke muşterek nivîsîne. Salim jî di xezeleke Hafîzê Şîrazî de malikeke wî rakirîye û ya xwe xistiye şûna wê. Di edebiyata Kurdîya Kurmancî de jî Kerbelayî û Eskerî li ser malika metle'a xezeleke Şêx Evdîrehman Aqtepî xezeleke muşterek nivîsîne.³⁴⁰

Helbesta di rêza heştan de qesîdeyek Heyderî û bavê wî Mela Ehmedê Heyderî ya hevpar heye. Heyderî li ser helbesta bavê xwe ya ji 13 malikan pêk tê çar malik lê zêde kirine. Her çiqas bi hev re nenivîsîbin û em nikaribin bêjin misoger helbesteke muştereke jî helbest qesîdeyeke hevpar e. Em ê li jêrê bo nimûne çend malikên dawîn bidin.

Ellah nîgehdarê te bî / ey tacîdarê Xeznewî

Perwerdiger yarê te bî / ey şehriyarê Xeznewî

(8/1)

Ez qenc dizanim serwerî / meqbûl û meqşûd dilberî

Kemter gulam e **Heyderî** / dil tar û marê Xeznewî

(8/13)

Zanim tu şeyxek rehberî / kubar û şêrîn esmerî

Ey rûh û canê **Heyderî** / ma dil di narê Xeznewî

(8/17)

³³⁹ Adak, *Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*, r. 544; Saraç, *Klasik Edebiyat Bilgisi Belâgat*, r. 49.

³⁴⁰ Adak, *Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*, r. 233-235.

Helbestvanê me 36 qesîde nivîsîne. Bi van qesîdeyan di edebiyat Kurdî ya klasîk de cihê xwe li nav helbestvanên piştî mîrektîyan digire. Ji ber ku qesîdeyên xwe di qada edebiyata tekyayê de daye. Qesîdeyên wî helbestên edebiyata tekyayê ne.

2.4.1.1.1. Qesîdeya Musemmet

Di qesîdeyan de ji xwe serwayeke bingeîn heye ku malika metle'ê û misrayên duyem ên malikên din hemserwa ne. Lê carinan helbestvan qîma xwe pê nayînin û dixwazin aheng û rîtm dengê helbestê bilindtir bikin. Bi vî awayî serî li tesmîte didin û di nava helbestê de serwayeke din, ku serwaya navekî tê gotin, saz dikin. Bi sazkirina serwaya navekî di helbestê de qesîdeya musemmet derdikeve holê. Tesmît di malikên piştî metle'ê de di nava malikê û misraya yekem de serwa tê sazkirin û helbest li ser kêşên ku dibin çar perçeyî tê nivîsandin.³⁴¹

Di dîwanê de 26 qesîdeyên musemmet hene. Ji van qesîdeyan 20 jê jî cureya qesîdeya musemmet a tam in ku di hemû malikan de tesmît heye. Sisê jê jî cureya qesîdeya musemmet a nîvçe ne ku di van qesîdeyan de di hin malikan de tesmît heye û di hinekan de jî tune ye. Sê qesîde jî jî cureya qesîdeya musemmet a tercî'ê nin ku nîveka misraya duyem a her malikê dubare dibe.³⁴² Ji bo her cureya qesîdeyekê em ê li jêrê nimûneyekê bidin.

Nimûneya qesîdeya musemmeta tam;

Hebîbulah emîrê me / celîsê textê Xezna ye

Şêrîn û gemrevînê me / xelîfê neclê seyda ye

(9/1)

Ğewaş û qulzena şidqê / emîr û şahê Xezna'ê

Ji destê muhbet û 'îşqê / me ne 'eql û ne sewda ye

(9/2)

³⁴¹ Haluk İpekten, **Eski Türk Edebiyatı Nazım Şekilleri ve Aruz**, Dergah Yayınları (15.Baskı), İstanbul 2012, r. 41.

³⁴² Ji bo der heqê qesîdeyên musemmet de agahiyên berfirehtir bnr: Adak, **Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de**, r. 552.

Bi wê husna xwe yî şade / li eţrafa vebû şu‘le
Fida bû **Heyderîzade** / çiqas bêjim tu hêja ye

(9/9)

Nimûneya qesîdeya musemmeta nîvçe;

Rewşena çeşmê emîra / la‘iqê rutba ‘ezîm
Melce‘ê mîr û feqîra / padişahê pir helîm

(12/1)

Zînetê her dû zemana / şahibê feyzê Buxar
Ruhnî da qelbê nezana / heykîrî qelbê remîm

(12/2)

Kes nizanî qîmetê vî murşidê axir zeman

Heyderî tûlê li derê Xeznewî şêxê ‘ezîm
(12/7)

Nimûneya qesîdeya musemmeta tercî‘;

Ya Ilahî her dibêjim / ya Resûlellah meded
Bêkes û ‘ebdal û gêj im / ya Resûlellah meded

(4/1)

Bêkes im ser wechê ‘erdê / hatime ber deryê rewde
Ez dexîl im min neberdê / ya Resûlellah meded

(4/2)

Tengezar im dîlîrî me / çav li rehîma ber derî me
Rûsiyah im **Heyderî** me / ya Resûlellah meded

(4/12)

Ji hejmara 26 qesîdeyên musemmet ên di dîwanê de xuya dibe ku Heyderî di warê kêşê erûzê û serwa qesîdeyan de hosta ye.

2.4.1.2. Xezel

Wek tēgeheke edebî xezel, ew teşeya nezmê ye ku malika serî di nava xwe de û misraya duyem ên malikên din jî bi malika serî re serwadar in û bi giştî di navbera pênc û neh malikan de tēn nivîsîn. Lê xezelên hetanî 15 malikan hatine nivîsîn jî hene.³⁴³

Di edebiyata Kurdî de xezelên herî kevin di qada edebiyata Kurdîya Lorî de ji alîyê Baba Tahirê Hemedanî (k.d. 1010) hatine nivîsîn. Di qada Kurdîya Kurmancî de jî xezelên Elîyê Herîrî yēn herî kevn tēn qebûlkin. Xezel di serdema mîrektîyan de ji alîyê helbestvanên wek Melayê Cizîrî, Sebûrî (Mîr Îmadeddînê Hekkarî), Xelwetî, Remezanê Cizîrî, Laxer, Mela Remezanê Ebbasî, Xewsî, Miradxan, Mîna Sadiq, Macin, Durefşan, Mun'imî, Ze'îfî û Teyyar Paşa ve hatine nivîsîn. Di dawîya mîrektîyan de Pertew Beg, Şêx Ehmedê Feqîr, Şêx Nûreddînê Birîfkanî, Siyahpoş û Weda'î di xezelê de bûne nûnerên girîng. Piştî mîrektîyan di serdema bizava Xalidîyê de jî helbestvanên wek Şêx Seîdê Meczûb, Mela Ehmedê Heyderî, Seydayê Licî, Şêx Evdîlqadirê Hezanî, Rûhî, Kerbelayî, Hesbî, Eskerî, Fehmî Begê Pêçarî, Mela Umerê Aşiq, Mela Ehmedê Nalbend û Seyîd Qadirê Haşimî xezel nivîsîne.³⁴⁴

Di dîwanê de şeş xezel hene ku em ê li jêr, rêz û hejmarên wan bidin.

Tablo 7: Rêz û Hejmarên Xezelên di Dîwanê de

Rêza Xezelê ya di Dîwanê de	Hejmara Malikan
74, 80	9
79	11
75	12

³⁴³ M.Yekta Saraç, **Klasik Edebiyat Bilgisi Biçim-Ölçü-Kafiye**, 6. Baskı, Gökkube Yayınları, İstanbul 2012, r. 47.

³⁴⁴ Adak, **Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de**, r. 171-174.

76, 78	13

Qewareya xezelên di dîwanê de di navbera neh û 13 malikan de ne. Her şeş xezel sisê ji wan bi behra recezê û sisê ji wan jî bi behra remelê hatine nivîsîn. Her şeş xezelên di dîwanê de jî li ser terîqeta Xeznewîyan û şêxên wan in ku em dikarin van xezelan di çarçoveya xezelên tekyayê de binirxînin. Ev jî cihê wî yê di nav edebiyata tekyayê de xurttir dike. heyderî di warê Xezelê de lawaz e. Em dikarin bêjin ku ne helbestvanê xezelê ye.

2.4.1.2.1. Xezela Musemmet

Di edebiyata Kurdî de Melayê Cizîrî ji bo xezelên musemmet bingehek xurt avêtiye ku piştî wî jî helbestvanên wek Xelwetî, Pertew, Şêx Ehmedê Feqîr, Mela Ehmedê Heyderî berdewam kirine.³⁴⁵

Di dîwanê de sê xezelên di rêza 74, 79 û 80yî de xezelên musemmet in. Her sê xezel jî ji cureya musemmeta tam in yanî di hemû malikan de tesmît heye. Lê helbestên di rêza 79 û 80yî de di misrayekê de li çar cihan serwaya navekî hatiye saz kirin. Ev her du helbest ji alîyê ahengê ve di asteke bilind de ne. Heyderî di vê cureya xezelên musemmet de xezelên Melayê Cizîrî yên musemmet ji xwe re bingehek girtine.

Em ê li jêrê ji her sê xezelên musemmet nimûneyan bidin.

Îro şemala Xeznewî / eṭrafê ‘alem şu‘le da

Berq û burûska Xeznewî / dunya li ber pêta veda

(74/1)

Ey Heyderîzade Emîn / ev derd û ah û huzn û şîn

Jê ra heye derman yeqîn / va ye li Xezna Ehmeda

(74/9)

³⁴⁵ Adak, *Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*, r. 545.

Şahê zemîn / şeyyahu`d-dîn / şuhbet şêrîn / durcanî tû
Ey şêx û şeng / `enqaye deng / şed neqş û reng / reyhanî tû
(79/1)

Rehm bê `eded / qelb û cesed / nalîn dû şed / Ehmmed meded
Ey muşterî / dil bû gerî / ey Heyderî / pir canî tû
(79/11)

Şahê geyûr / durru`l-buḥûr / taca bi nûr / ev Xeznewî
Ê kû me dî / keskî nedî / bav û xwedî / wek Xeznewî
(80/1)

Ey şêrê dîn / ḥusna zemîn / qelbê Emîn / tev bû birîn
Ez bedter im / can kemter im / her Heyder im / ba Xeznewî
(80/9)

2.4.1.3. Mustezad

Mustezad di Erebî de tê wateya zêdekirina tiştekî ye. Wek têgehek edebî jî; ew teşeya nezmê ye ku bi hin kêşeyên taybet, misrayek kin û yek dirêj, li ser xezelekê an qesîdeyekê tê çêkirin. Bi giştî ji xezelên ku bi kêşa “Mef’ûlu mefa’îlu mefa’îlu fe’ûlun” tê bidestxistin. Ji misrayên ku li misrayên dirêj tîr zêdekirin re “ziyade” tê gotin.³⁴⁶

Di edebiyata Kurdî de bi qasî tê zanîn Ehmedê Xanî yekem car teşeya mustezadê bi kar anîye. Di serdema mîrektîyan de Xanî û Pertew du nûnerê girîng ên vê teşeyê ne. Di serdema piştî mîrektîyan de gelek mustezadnûs derketine holê. Helbestvanên wek Rûhî, Seydayê Licî, Mela Sîracê Xelîlî, Şêx M. Nûrullah Seyda û Seyda Îrşad bi teşeya mustezadê helbest nivîsîne.³⁴⁷

³⁴⁶ Saraç, **Klasik Edebiyat Bilgisi Biçim-Ölçü-Kafiye**, r. 68.

³⁴⁷ Adak, **Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasik de**, r. 585.

Di dîwanê de sê mustezad hene. Her sê mustezad jî bi qaliba erûzê ya standart a mustezadê ya hezecê “Mef’ûlu mefa’îlu mefa’îlu fe’ûlun Mef’ûlu fe’ûlun”ê hatine nivîsîn.

Tablo 8: Rêz û Hejmarên Mustezadên di Dîwanê de

Rêza Mustezadê ya di Dîwanê de	Hejmara Malikan
81	11
82	12
77	13

Her sê mustezad jî bi cureya medhiyeyê ne. Mustezada di rêza 81ê de li ser medhê Şêx Mesûmê Xeznewî ye û yên 77 û 82yan jî li ser Şêx Eladînê Xeznewî ne.

2.4.1.4. Qit’e

Qit’e, wek têgeheke edebî bi du awayan tê ravekirin. Yek jê; ew perçeyên biçûk in ku ji qesîdeyê veqetîyane, ya duyem jî; qit’e, ew helbestên hemkêş in ku yekeya wan malik e, misrayên wan duyem hemserwa ne, malika yekem ne musere‘ e û jimara beytên wan di navbera didu û şeş malikan de diguherin. Di edebiyata Erebi de heta 7-9 malikan jî qit’e hatine qebûl kirin. Carinan qit’eyên ji 9 malikan berjortir jî hatine nivîsîn û ji wan re “qit’eyên kebîre” hatine gotin.³⁴⁸

Di dîwanê de tenê qit’eyek heye. Ev helbest bi 11 malikan e û bi cureya tewhîdê hatiye nivîsîn. Li gorî tradîsyona edebiyata klasîk dîwan bi cureya tewhîdê dest pê dîkin û piranîya teşeya tewhîdê jî qesîde ye. Ji ber ku qit’eya di dîwanê de tekane cureya tewhîdê ye û helbestvan jî ew wek helbesta yekem qebûl kiriye³⁴⁹, me jî xist serê dîwanê.

³⁴⁸ Adak, *Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*, r. 240, 241.

³⁴⁹ Bnr.: (Pêvek 11: Destnivîsa Şêx Mihemed Emîn ya Helbesta Ye

Ev qit'e bi 11 malikan hatiye nivîsîn lewra em dikarin bibêjin ji cureya qit'eya kebîreyê ye. Di dîwanê de tenê ev helbest bi qaliba "Fa'iltun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun" ya behra remelê hatiye nivîsîn. Di helbestê de 16 caran nav û sîfetên Xwedê derbas dibin. Helbest ji alîyê teşeyî ve qit'eyek musemmet a tam e. Lewra di hemû malikan de serwaya navekî hatiye sazîkirin.

2.4.2. Teşeyên Nezmê yên ku ji Bendan Pêk Tê

Teşeyên nezmê yên ji bendan pêk tên, ew teşe ne ku yekeya wan bend e. Teşeyên ji bendan pêk tên wiha ne: Muselles, murebbe', muxemmes, museddes, musebbe', musemmen, mutesse, mu'eşşer, terbî, texmîs, tesdîs, tesmîn, tesbî, te'sîr, terdîye, teşîr, terkîb-bend û tercî'-bend. Di edebiyata Kurdî de pirê van teşeyan hatine bi kar anîn.³⁵⁰

Di edebiyata klasîk a Rojhilatê de teşeyên nezmê yên ji bendan pêk tên bi navê musemmet hatine pênasîkirin. Musemmet jî ew teşe ne ku ji bendan pêk tên û li gorî jimara misrayên xwe tên binavîkirin. Musemmet li ser du beşan tên dabeşîkirin. Musemmetên ji alîyê helbestvanekî tên nivîsîn bi navê musemmetên bîngehîn û musemmetên ji alîyê du helbestvanan ve tên nivîsandin jî bi navê musemmetên tezmîn tên binavîkirin.³⁵¹

Di dîwanê de şeş cureyên musemmetên bîngehîn û du cureyên musemmetên tezmîn hene ku ev in: Muselles, murebbe', muxemmes, museddes, terkîb-bend û tercî'-bend musemmetên bîngehîn in, texmîs û teşîr jî musemmetên tezmîn in. Ji ber ku di dîwanên kategorîk de teşeyên tezmîn berî musemmetên bîngehîn tên bicîhîkirin me jî her du teşeyên tezmîn di serê beşa musemmetan de bi cih kir.

³⁵⁰ Adak, *Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*, r. 351.

³⁵¹ Adak, *Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*, r. 351-359.

2.4.2.1. Muselles

Menzûmeyên ku yekeya wan bend e, hemû bendên wan ji sê misrayan pêk tên û ji alîyê helbestvanekî ve bi heman kêşê û bi awayekî serwayê hatine nivîsîn muselles tê gotin.³⁵²

Di edebiyata Kurdî de helbestvanên destpêkê bi vê teşeyê helbest nenivîsîne. Cara yekem ji alîyê Xalidê Zêbarî ve hatiye nivîsîn. Piştî helbestvanên wek Mela Mensûrê Girgaşî, Şêx Nureddînê Birîfkanî, Şêx Ehmedê Feqîr, Mela Ehmedê Nalbend û Şêx Mihemed Emînê Heyderî nivîsîne.³⁵³

Musellesên di edebiyata Kurdî de bi du şêwazan in. Şêweyek jê bi awayê xwemalî ne ku musellesên Şêx Xalidê Zêbarî, Mela Mensûrê Girgaşî, Şêx Nureddînê Birîfkanî dikevin vê komê. Şêweya duyem a musellesan jî ew e ku bi awayê klasîk hatine nivîsîn. Musellesên Mela Ehmedê Nalbend û Şêx Mihemed Emîn jî dikevin vê komê.³⁵⁴

Di dîwanê de musellesek heye. Ev muselles di rêza 37an de ye û ji neh bendan pêk tê. Hemû bendên wê di nava xwe de bi serwa ne. Di helbestê de di hemû bendan, di misrayên yekem, duyem û sêyem de di tefîleyên duyem de serwaya navekî jî hene. Ev cureya musellesa musemmeta tam e.

Her wekî musellesa Şêx Mihemed Emînê Heyderî di dîwançeya Şêx Îsmetullahê Karazî de jî musellesek bi vî rengî heye ku her bend di nav xwe de bi serê xwe serwa ne.³⁵⁵

Qebûl kir em çî bê xêr in / hezar wek min gulamê te

Yesîrê qeyd û zencîr in / dibos im dest û dawê te

Li dergahê te qîtmîr in / Emîn bû xakê payê te

(37/9)

³⁵² Adak, *Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*, r. 359.

³⁵³ Adak, *Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*, r. 360.

³⁵⁴ Adak, *Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*, r. 365-367.

³⁵⁵ Karak, “*Dîwançeya Şêx Îsmetullahê Karazî (Metn û Lêkolîn)*” r. 135.

Em ê ji vê musellesê du bendan bo nimûne bidin.

Şukurlillah me dî zahir / ʔerîqa Xeznewî şewq da

Ji nesla kamil û ʔahir / ‘Ela’eddîn dibû peyda

Di vî qirnê me ê axir / di Islamê ’ilam hilda

(37/1)

2.4.2.2. Murebbe‘

Murebbe‘, ew teşeyê ku ji helbestên bi heman kêşê û bi çar misrayan hatine nivîsîn tê gotin. Bi giştî benda ewil hemserwa ye bendên din jî sê misrayên ewil di nav xwe de û misraya çarem jî bi benda ewil re hemserwa ne. Ji murebbe‘ên, misrayên bendan ên dawîn tê dubarekirin re murebbe‘ên mutekerrîr û ji yên nayên dubarekirin re jî murebbe‘ên muzdewîc tê gotin.³⁵⁶

Teşeya murebbe‘ê ji kevin ve di edebiyata Kurdî de hatiye bi kar anîn. Di serdema mîrektîyan de Melayê Cizîrî, Feqîyê Teyran, Ehmedê Xanî û Pertew Beg murebbe‘ nivîsîne. Piştî serdema mîrektîyan jî helbestvanên wek Rûhî (Şêx Evdirehmanê Aqtepî), Xakî (Şêx M. Can Aqtepxî), Hesbî (Şêx Hesîbê Aqtepî), Hadî (Seydayê Licî), Şewqîyê Xanî, Mela Ehmedê Heyderî, Mela Zahirê Tendûrekî, Fehmî Begê Pêçarî bi teşeya murebbe‘ê helbest nivîsîne.³⁵⁷

Di dîwanê de çar murebbe‘ hene. Her çar murebbe‘ jî murebbe‘ên muzdewîc in û bendên ewil hemserwa ne û bendên li dû jî misrayên çarem bi benda ewil re hemserwa ne. Ji şeweyê ev cure murebbe‘an re murebbe‘a muzdewîca tam tê gotin.³⁵⁸

³⁵⁶ Saraç, *Klasik Edebiyat Bilgisi Biçim-Ölçü-Kafiye*, r. 111.

³⁵⁷ Adak, *Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*, r. 372.

³⁵⁸ Adak, *Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*, r. 372.

Tablo 9: Rêz û Hejmarên Murebbe'ên di Dîwanê de

Rêza Murebbe'ê ya di Dîwanê de	Hejmara Bendan
41	6
40	7
39	8
38	17

Murebbe'ên edebiyata Kurdî ya klasîk di serdema piştî mîrektîyan de ji alîyê helbestvanên Xalidîtiyê ve wek teşeyeke tekyayê derketiye pêş. Li ser rêber û şêxên terîqeta Neqşebendîtiyê gelek medhiye û mersiye hatine nivîsîn.³⁵⁹ Gava em li murebbe'ên di dîwanê de dinêrin, ew jî di vê çarçoveyê de ne. Murebbe'a di rêza 38an de pendname ye. Bi fikra tesewîfî, dinyewîti (meyla dinyayê) hatiye rexnekirin û şîret li xwendevanan hatiye kirin. Murebbe'ên 39 û 40î li ser medhê şêxên Xeznewîyan in û murebbe'a 41ê jî mersiye ye li ser Şêx Eladînê Xeznewî.

Murebbe' li gorî hunerên edebî dibin du beş: Murebbe'a mulemme', murebbe'a mu'ad.³⁶⁰

2.4.2.2.1. Murebbe'a Mulemme'

Murebbe'ên mulemme' ew helbest in ku herî kêr bi du zimanên cuda hatine nivîsîn. Di edebiyata Kurdî de cara yekem murebbe'a çarzimanî ji alîyê Ehmedê Xanî ve hatiye nivîsîn. Şewqîyê Xanî jî li ser mulemme'a Ehmedê Xanî wek nezîreyekê murebbe'ê mulemme' ya çarziymanî nivîsiye.³⁶¹

³⁵⁹ Adak, *Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*, r. 372.

³⁶⁰ Adak, *Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*, r. 399.

³⁶¹ Adak, "Şewqîyê Xanî li Pey Şopa Ehmedê Xanî: Berawirdkirinek li Ser Mulemme'ên Wan ên Çarzimanî", r. 36.

Di dîwanê de du murebbe‘ên mulemme‘ hene. Ev her du mulemme‘ di rêza 40 û 41ê de ne. Murebbe‘a 40î mulemme‘eke çarzmanî ye ku misraya yekem Erebî, misraya duyem Farisî, misraya sêyem Tirkî û misraya çarem jî bi Kurdîya Kurmancî ye. Murebbe‘a di rêza 41ê de jî mulemme‘eke sêzmanî ye ku misraya yekem bi Erebî, misraya duyem bi Kurdiya Kurmancî, misraya sêyem bi Tirkî û misraya çarem jî dîsa bi Kurdiya Kurmancî ye.

Em ê bo nimûne ji her du murebbe‘ên mulemme‘ her yekê bendekê bidin.

El-firaqu halenî min be‘di hubbin qed weced (Erebî)

Kemterîn dilxwahê în şod ber muradeş ne resed (Farisî)

Ger bu yolda ben ölürsem çare yoq sizden sened (Tirkî)

Merhema derd û birîna wê li cem Me‘şûm weced (Kurdî)

(40/1)

El-firaqu i‘teranî hakeza kane`l-qeder (Erebî)

El-meded Ğewşê zamanî dil li min bûye diger (Kurdî)

Eyledim ettim fiğanî ey felek yağtî ciger (Tirkî)

Ey şehê min nav gelê min da dilê min şed keşer (Kurdî)

(41/1)

2.4.2.2.2. Murebbe‘a Mu‘ad

Hunera î‘adeyê ew huner e ku di dawîya malikê û di serê malika di pey re bê bi heman bêjeyan/kombêjeyan bîn nivîsîn.³⁶² Her wekî di xezelan de heye di murebbe‘an de jî ev huner heye. Di murebbe‘ên bi vî awayî de bêje/kombêjeyên dawîya bendê û serê benda di pey re tê wek hev in.

Di edebiyata Kurdî de murebbe‘ên bi vî rengî helbestvanên wek Elîyê Herîrî, Feqîyê Teyran, Melayê Bateyî, Seyfîyê Şoşî, Mela Reşîdê Comanî û Şêx Ehmedê Feqîr nimûne dane.³⁶³

³⁶² Kûlekçi, h.b., r. 249.

³⁶³ Adak, *Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*, r. 401, 402.

Di dîwanê de murebbe‘a di rêza 39an de murebbe‘ek mu‘ad e. Lê hunera î‘adeyê di vê murebbe‘ê de şikestiya. Lewra di hinek bendên vê murebbe‘ê de hunera î‘adeyê heye di hin bendan de jî tune ye.

Em ê li jêrê bo nimûne sê bendan ji vê helbestê bidin.

Şehê şêrîn hebîb Ehmed

Ji alî dil tebîb Ehmed

Çi zana û lebîb Ehmed

Ev e karê hunermerda

(39/4)

Ev e karê şêrîna min

Delal û nazenîna min

Delal û gemrevîna min

Dema tê der ji bin perda

(39/5)

Ji bin perdê ku ew tê der

Bi husna xalê şor û zer

Dilê ‘aşiq kirî şed ker

Bi ah û hesret û derda

(39/6)

2.4.2.3. Muxemmes

Muxemmes teşeyê nezmê ye ku ji pênc misrayan pêk tê. Misrayên ewil hemserwa ne, bendên din jî her sê misrayên pêşîn di nava xwe de misrayên çarem jî bi benda ewil re hemserwa ne. Misrayên dawî yên bendan dubare bikin dibe muxemmesa mutekerrîr, dubare nekin dibe muxemmesa muzdewîc.³⁶⁴

³⁶⁴ Saraç, **Klasik Edebiyat Bilgisi Biçim-Ölçü-Kafiye**, r. 125.

Muxemmes di destpêka edebiyata Kurdî de nehatiye bikaranîn. Muxemmes di sedsala XVIIIem de di edebiyata Kurdîya Kurmacî de dest pê kiriye. Di serdema mîrektîyan de helbestvanên wek Macin, Melayê Bateyî, Weda'î û Pertew Beg helbestên muxemmes nivîsîne. Di heman serdemê de li Xorosanê Ce'fer Qulî Zengelî jî nûnerek girîng ê muxemmesê ye. Di serdema piştî mîrektîyan de muxemes di nav helbestvanên Xalidîyan de gelekî belav bûye. Di vê serdemê de jî helbestvanên wek Rûhî (Şêx Evdirehmanê Aqtepi), Şêx Mihemed Kerbelayî, Şêx Eskerî, Sa'î (Şêx Muhyedînê Hênî), Hadî (Seydayê Licî), Mela Ehmedê Heyderî, Mela Zahirê Tendûrekî, Fehmî Begê Pêçarî, Mela Sîracê Xelîlî, Mela Nûrullahê Godişkî, Mela Ehmedê Zinarexî nunerên girîng ên bi teşeya muxemmesê helbest nivîsîne.³⁶⁵

Di dîwana Heyderî de 26 muxemmes hene. Li jêrê me cî daye tabloaya muxemmesên di dîwanê de.

Tablo 10: Rêz û Hejmarên Muxemmesên di Dîwanê de

Rêza Muxemmesê ya di Dîwanê de	Hejmara Bendan
43, 51, 56	4
62, 63	5
49, 54, 55	6
42, 44, 45, 46, 47, 48, 52, 53, 58, 60, 61, 64, 67	7
57, 59	8
50, 66	9
65	11


³⁶⁵ Adak, *Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*, r. 407.

Her wekî em di tabloya jor de jî dibînin 26 muxemmes di dîwanê de hene ku piştî qesîdeyê, teşeya herî pir ev e ku di dîwanê de cih digire. Qewareya wan jî di navbera 4-11 bendan diguhere.

Ji muxemmesên di dîwanê de muxemmesa di rêza 48an de muxemmesa muzdewîc a asayî ye. Muxemmesên di rêza 43, 45, 46, 48, 49, 50, 51, 52, 53, 54, 55, 56, 57, 58, 59, 60, 61, 63, 64, 65, 66, û 67an de jî muxemmesên muzdewîca kit a asayî ne. Muxemmesên di rêza 47 û 52an de jî muxemmesa muzdewîc û mutekerrîr in.

Muxemmesên di rêza 42, 45, 53 û 63yan de muxemmesên musemmet in. Ev muxemmes bi du şeweyan hatine tesmîtkirin ku em ê bi berfirehî di sernava serwaya navekî de li ser rawestin.

Di kêşa muxemmesên dîwanê de sê behrên erûzê; behra remel, hezec û recezê hatine bikaranîn. Em ê li jêrê hejmara behrên erûzê yên di muxemmesan de hatine bikaranîn bidin.



Grafîk 4: Rêjeya Bikaranîna Behrên Erûzê di Muxemmesên Dîwanê de

Muxemmesên di rêza 65, 66, 67an de bi cureya mersiyeyê ne. Ji rêza 42yan heta rêza 64an bi tevahî 23 muxemmes bi cureya medhiyeyê hatine nivîsîn ku

muxemmesa 42yan ne tê de hemû muxemmesên din di çarçoveya edebiyata tekyayê de ne.

2.4.2.4. Texmîs

Wateya texmîsê ya eslî pênckirin yan jî pêncgoşekirin e. Lê wek têgeheke edebî texmîs; teşeyê nezmê ye ku ji alîyê helbestvanekî ve li ser her malîkek xezel an qesîdeya helbestvanekî din bi heman kêş û serwayê sê misrayên din bîn nivîsîn. Her wekî bi giştî texmîs li ser helbesta kesekî din tên çêkirin, helbestvanek dikare li ser helbesteke xwe jî texmîsekê çêbike.³⁶⁶

Di edebiyata Kurdî ya klasîk helbestvanên wek; Mîr Îmadeddîn Hekkarî, Mela Remezanê Cizîrî, Laxer, Şêx Ehmedê Feqîr, Mela Beşîrê Xelîlî, Nûrî, Kerbelayî, Yusrî û hwd. Qesîde û xezelên Melayê Cizîrî texmîs kirine. Texmîsa Heyderî jî li ser a Melayê Cizîrî ye.³⁶⁷ Ev texmîs di rêza 35an de ye. Li ser her 16 malikên qesîdeya Mela jî misra hatine zêdekirin û bûye helbestek 16 bend. Ev texmîs bi cureya munacatê hatiye nivîsîn.

Texmîs jî teşeyê ji koma tezmînê ye. Di benda dawî de mexlesa her du helbestvanan cih digire.³⁶⁸ Em ê jî li jêrê bendên ewil û dawî ya texmîsa Heyderî bidin.

Dilo canê me ji tîrê te gihane 'elemê

Dem û dewranê me çûne tîk bi nalîn û gemê

Kul û derdê me civane ji firaqa te hemê

(Hêvî û tewqe dîkin em ji Xudana heşemê)

(Wê nîgar û şenemê padişehê muhteşemê)

(35/1)

Dilkulê jar û 'elîl e ketye ber êş û bela'ê

H eyderîzade dikêşe elem û cewr û cefa'ê

³⁶⁶ Saraç, **Klasik Edebiyat Bilgisi Biçim-Ölçü-Kafiye**, r. 130.

³⁶⁷ Adak, **Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de**, r. 475.

³⁶⁸ Adak, **Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de**, r. 465.

Me bi keyfê bibuhhêre bigerîn zewq û sefa'ê

(Me ji dîwana se'adet seh kirî şubhê **Mela**'ê)

(Tu bi navê me geda'ê bikişîne qelemê)

(35/16)

Her wekî di nimûneya benda dawî ji mexlesan jî dîyar e her du misrayên dawî yên Melayê Cizîrî û her sê pêşîn jî yên Heyderî ne.

2.4.2.5. Teştîr

Wateya teştîrê ya eslî ji hev veqetandina tişteki ye. Lê wek têgeheke edebî teştîr; didu, sisê an bêtir misrayên bi heman kêş û serwayê ne ku di navbera du misrayên malikekê de bîn bicihkirin. Bi vî awayî teşeyê bendên wê ji çar an jî pênc misrayan pêk tê derdikeve holê. Ji vê teşeyê re teştîr tê gotin.³⁶⁹

Di edebiyata Kurdî de bi qasî tê zanîn, teştîr yekem car ji alîyê Mela Evdilselamê Nacî (k.d. 1952) hatiye nivîsîn. Mela Beşîrê Xelîlî û Mela Sîracê Xelîlî (k.d. 1983) jî di teştîrê de Mela Evdilselamê Nacî şopandine. Ji xeynî van kesan Mela Yasîn Yusrî û helbestvanê me Mihemed Emîn Heyderî jî teştîr nivîsîne.³⁷⁰

Li gorî dabeşkirina Abdurrahman Adak di derbarê teştîrê de kiriye, du cureyên teştîrê hene. Teştîrên terbi û teştîrên texmîs. Li gorî vê dabeşkirinê teştîra Heyderî dikeve çarçoveya teştîra texmîsê.³⁷¹

Di dîwanê de tenê teştîrek heye ku ew jî li ser xezelek Melayê Cizîrî hatiye çêkirin. Heyderî di navbera her malikekek helbesta Mela de sê misra bi cih kiriye.³⁷² Bi vî awayî helbesta ku ji neh malikan pêk tê bûye helbestek neh bendî. Ev helbest bi cureya munacatê ye. Em ê jî li jêrê bendên ewil û dawî ya texmîsa Heyderî bidin.

(Xeşmê li feqîran meke zû padişehê min)

Curmê meke wacib li geda'ê şubehê min

³⁶⁹ Saraç, **Klasik Edebiyat Bilgisi Biçim-Ölçü-Kafiye**, r. 172.

³⁷⁰ Adak, **Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de**, r. 469.

³⁷¹ Adak, **Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de**, r. 502.

³⁷² Bo nimûneya teştîra Heyderîzade (Şêx Mihemed Emîn) bnr: Abdurrahman Adak, **Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de**, r. 502.

Rehmê li yesîrê xwe ke ey naz û mehê min

Qesda te hebî keşfê bikit rah û rehê min

(Pirsê bike carek li xetê û gunehê min)

(36/1)

(Yek 'îşqê **Melayî** bê buha bête ji le'lan)

Nuşîn bikitin wê qedeşa şubhetê lalan

Zewqeq li heyata me werîtin mehê salan

Şu'lek ji wê husnê ku **Emîn** bid ya ji dalan

(Şed can me hebin hîşek û meqşer di behê min)

(36/9)

Her wekî di nimûneya benda dawî ji mexlesan jî dîyar e, her du misrayên pêşî û dawî yên Melayê Cizîrî û her sê misrayên di navberê jî yên Heyderî ne.

2.4.2.6. Museddes

Wateya bêjeya eslî ya museddesê şeşkirin an şeşgoşeyî ye. Lê wek têgeheke edebî museddes, ew teşeya nezmê ye ku her bendeke wê ji şeş misrayan pêk tê. Ji museddesên misrayek an du misrayên dawîya bendan bîr dubarekirin re museddesa mutekerrîr, yên neyên dubarekirin re jî museddesa muzdewîc tê gotin.³⁷³

Museddesên pêşî yên edebiyata Kurdî di sedsala XVIem de ji alîyê sê helbestvanên destpêkê yên Kurdîya Kurmancî; Melayê Cizîrî, Feqîyê Teyran û Mîr Îmadeddînê Hekkarî ve hatine nivîsîn. Lê ev şêweyên museddesan muşa'ereyên di navbera van helbestvanan de ne. Piştî wan Mela Mensûrê Girgaşî û Melayê Bateyî jî ev şêwe bi kar anîne. Şêweyên museddesên standart ên klasîk cara ewil Ehmedê Xanî nivîsiye. Ev şêwe jî ji alîyê Melayê Bateyî ve hatiye bikaranîn. Piştî mîrektîyan şêweyên museddesên standart ên klasîk bi pêş ketine. Helbestvanên wek Rûhî (Şêx Evdirehmanê Aqtepî), Mela Ehmedê Heyderî, Mela Zahirê Tendûrekî, Fehmî Begê

³⁷³ Saraç, **Klasik Edebiyat Bilgisi Biçim-Ölçü-Kafiye**, r. 135.

Pêçarî, Mela Sîracê Xelîlî û Şêx Mihemed Emînê Heyderî museddes nivîsîne.³⁷⁴ Di dîwanê de şeş museddes hene. Rêz û hejmarên malikên wan li gorî tabloya li jêr e;

Tablo 11: Rêz û Hejmarên Museddesên di Dîwanê de

Rêza Museddesê ya di Dîwanê de	Hejmara Bendan
70	4
68, 69	6
71, 73	7
72	10

Li gorî dabeşkirina Abdurrahman Adak ya li ser museddesan, em dikarin museddesên di dîwanê de wiha binirxînin; museddesa di rêza 69an de museddesa muzdewîca cot asayî û bi tesmît e. Museddesên di rêza 68 û 70yê de museddesa mutekerrîr cot a asayî ne. Museddesên di rêza 71 û 73yan de cureya museddesa muzdewîca kit a asayî ne. Museddesa di rêza 72yan de jî museddesa muzdewîc û mutekerrîra kit a asayî ye.

Museddesên di rêza 69, 73yan bi behra recezê û yên di rêza 68, 70, 71, 72yan de jî bi behra remelê ya kêşa erûzê hatine nivîsîn.

Her şeş museddes jî di çarçoveya edebiyata tekyayê de ne. Didu (helbestên 72, 73) ji wan bi cureya mersiyeyê çar (helbestên) 68, 69, 70, 71) jê jî bi cureya medhiyeyê ne.

2.4.2.7. Terkîbbend

Ew teşeya nezmê ye ku ji çend bendên hemkêş pêk tê ku bend an wek serwaya xezelê yekserwa ne yan jî hemû misrayên wê di nav xwe de hemserwa ne û di dawîya her bendeke de ji bo pevgirêdana bendan bi piranî malikeke ku di kêşê de

³⁷⁴ Adak, *Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*, r. 426.

hevpar, lê di serwayê de cuda cih digire. Ji malika ku bendan bi hev girê didin “wasite (navbend)” û ji bendan re jî “xane” an “terkîbxane” tê gotin.³⁷⁵

Di dîwanê de terkîbbendek bi tenê heye. Ev terkîbbend di rêza 33yan de cih girtiye û ji şeş bendan pêk tê. Bendên wê jî ji sê misrayan pêk tên. Hem di bendan de hem jî di wasiteyan de serwaya navekî jî heye. Serwaya wê her wekî tekîb-bendên standart di nav xwe de û hemû wasite jî di nav xwe de hemserwa ne. Di vê çarçoveyê de em dikarin weha bi nav bikin; “terkîbbenda muselles digel tasmî û navbenda du misra”.³⁷⁶

2.4.2.8. Tercî‘bend

Ew teşeya nezmê ye ku ji çend bendên hemkêş pêk tê ku bend an wek serwaya xezelê yekserwa ne yan jî hemû misrayên wê di nav xwe de hemserwa ne û di dawîya her bendekê de ji bo pevgirêdana bendan, malik an bendek ku di kêşê de hevpar, lê di serwayê de cuda ye cih digire. Ji malik an benda ku bendan pevgirêdidin re “wasite” û ji bendan re jî “xane” an jî tercî‘xane tê gotin.³⁷⁷

Di dîwanê tenê tercî‘bendek heye ku bi cureya mersiyeyê hatiye nivîsîn. Ev tercî‘a ku di rêza 34an de ye derveyî tercî‘bendên standart ên edebiyata klasîk e. Lewra di tercî‘an de tercî‘xane û wasite hemkêş in, lê tercî‘a di dîwanê de tercî‘xane û wasite li ser du qalibên ji behrên cuda hatine saz kirin. Bend bi qaliba recezê “Mustefîlun mustefîlun mustefîlun mustefîlun”ê û wasite jî li ser qaliba behra remelê ya “Fa‘îlatun fa‘îlatun fa‘îlatun fa‘îlun”ê saz bûye. Wasite jî ne li gor standardê ye. Tercî‘bendeke bavê Heyderî Mela Ehmed heye ku ji alîyê kêş û teşeya derekî ev tercî‘bend dişibe ya bavê wî.³⁷⁸

³⁷⁵ Adak, *Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*, r. 108.

³⁷⁶ Ji bo nimûneya tekîb-benda Heyderîzade bnr.: Adak, *Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*, r. 513.

³⁷⁷ Adak, *Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*, h.b., r. 514. ; ji bo agahîyên berfirehtir di derbarê tercî‘-benda Mela Ehmedê Heyderî bnr. : Beyter, h.b., r. 64, 227.

Ji bo nimûne em ê bendekê ji tercî'-benda Mihemed Emîn li jêrê bidin.

Şorgul di bağan da tu wî / şewqa di qelban da tu wî

Xêra di wechan da tu wî / min rûh bi heyran da tu wî

Serdarê ustada tu wî / perçek ji nûr peyda tu wî

'Ê ez kirim sewda tu wî / nisbet bi derman da tu wî

Tu ji me ra Luqmane'î

Ger dipirsî ez hezîn im dilkesîr û nale nal

Bulbulê dilpare xwîn im şorgula min rûh li bal

Pirs bike carek li halê Heyderî goyîn mişal

(34/4)


2.5. CUREYÊN EDEBÎ

Cureyên edebî têgeheke edebî ye ku di esasê xwe de bi naverokê re têkildar e. Lewra cureyên edebî tema û mijara helbestê di xwe de dihevin. Gava em li cureyeke edebî ya helbestê dinêrin em dibînin ku naverok û temaya helbestê li gorî wê cureyê hatiye vegotin.

Her çiqas cureyên edebî bi naverok û temaya helbestê re têkildar be jî pêwendîya cureyên edebî bi teşeyên nezmê re xurt e. Di vê mijarê de Abdurrahman Adak van agahîyan dide: “Divê teşe digel cureya xwe û cure jî digel teşeya xwe bên nirxandin û ji hev neyên cudakirin. Di edebiyata klasîk de dema metnên edebî bên kategorîzekirin, dê bê dîtin ku her teşeyek cureyên xwe û her cureyek jî teşeyên xwe hene. Mirov li kîjan teşeyê binêre, dê bê dîtin ku metn teşe ye û di heman demê de di nav cureyeke edebî de cih digire. Dîsa mirov kîjan cureya edebî bigire dest, dê bê

dîtin ku metnê wê cureya edebî di heman demê de xwedî teşe ne jî, loma teşe û cure nikarin ji hev bên cudakirin.³⁷⁹

Çawa tê dîtin ku pêwendiyêke xurt di navbera cureyên edebî û teşeyên nezmê de heye. Me jî di çarçoveya vê têkiliyê de cureyên edebî li dû teşeyên nezmê nîrxandin. Di dîwana Heydrî de heşt cureyên nezmê hatine bikaranîn ku iskeleta dîwanê saz dîkin. Cureyên edebî ên dîwanê ev in: tewhîd, munacat, ne't, hîcwiye, medhiye, mersiye, pendname û xezela tekyayê Heyderî, endamê terîqeta Neqşebendîyan e û helbestên xwe jî di çarçoveya edebiyata dînî, tesewîfî û edebiyata tekyayê de nivîsîye.



Grafîk 5: Rêjeyên Cureyên Edebî yên di Dîwanê de

Her wekî li jor jî tê dîtin, Heyderî herî pir cureya medhiyeyê tercîh kiriye û di pey re bi rêzê mersiye, munacat, hîcwiye, tewhîd, ne't û pendnameyê helbest nivîsîne.

³⁷⁹ Adak, *Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*, r. 108, 109.

2.5.1. Tewhîd

Di edebiyata klasîk de ji helbestên ku yekîti û mezinahiya Xwedê vedibêjin re tewhîd tê gotin. Her çiqas tewhîd bi qesîdeyê tîn nivîsîn bi teşeyên din jî tîne nivîsandin.³⁸⁰ Cureya tewhîdê bi piranî di serê dîwanan de cih digirin. Bi vî awayî helbestvan dîwana xwe bi navê Xwedê dide destpêkirin û erka “besmele”yê bi tewhîdê tîne cih.³⁸¹

Di dîwana Heyderî de helbestek tenê bi cureya tewhîdê heye. Her çiqas cureyên tewhîdê bi teşeya qesîdeyê be jî tewhîda di dîwanê de bi teşeya qit‘eyê ye. Gava me dîwan saz kir me xwest em teşeya qit‘eyê jî li gorî tradîsyonê bi cih bikin, lê ji ber ku cureya qit‘eyê bi tewhîdê bû û ev jî tekane tewhîda dîwanê bû me ew xist serê dîwanê. Helbestvan bi xwe jî ev helbest wek helbesta yekem qebûl kiriye. Di vê tewhîdê de 16 caran nav û sifetên Xweda derbas dibin: Xuda (sê car), Îlah (du car), ‘Ezîm (du car), Hesîb, Semed, Heyy, Reqîb, Mû‘în, Mûcîb, Settar, Xeffar, Rehîm.

Emê li jêrê ji helbesta yekem du malikan bidin.

Ya Ilahî tu Hesîb î / Semed û Heyy û Reqîb î

Tû Mu‘în î û Mucîb î / ji te hêvî û rica ma

(1/1)

Ji te hêvî û umîd im / ‘aşî yû keslan belîd im

La’îqê betşek şedîd im / rûreşê yewmî`l- qiyama

(1/2)

2.5.2. Munacat

Munacat ew helbest in ku li ser daxwaz, dua û lavakirina ji Xwedê tîn kirin re tîn gotin. Her çiqas bêtirê munacatan bi qesîdeyan bin jî bi teşeyên din jî dikare bîn nivîsandin.³⁸²

³⁸⁰ Dilçin, h.b., r. 251.

³⁸¹ Adak, *Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*, r. 149.

³⁸² Dilçin, h.b., r. 251.

Tablo 12: Rêz û Teşeyên Nezmê yên Munacatên di Dîwanê de

Rêza Munacatê ya di Dîwanê de	Teşeya Nezmê ya Cureya Munacatê
2	Qesîde
3	Qesîde
35	Texmîs
36	Teştîr
85	Qesîde

Di dîwanê de pênc helbestên bi cureya munacatê hene ku ya di rêza didu, sisê û 85an de bi qesîdeyê ne, helbestên 35 û 36an jî li ser helbestên Melayê Cizîrî wek texmîs (helbesta 35) û teştîr (helbesta 36) hatine nivîsîn. Her du helbestên ku li ser duaya Îbrahîm Edhem hatine nivîsîn jî bi cureya munacatê ne (helbestên 3 û 85).

Em ê li jêrê ji munacatan çend mînakên pêşkêş bikin.

‘Umîr hat û bi lez bûrî / bi nefsa xwe tu megrûr î

Ji îxlaşê gelek dûrî / li min rehmê bike ya Reb

(2/2)

Pir gunahê min wekî behr û çiya ne ey Xuda

Poşîman im ez li ber ‘efwa Rehmîm im ey Xuda

(3/2)

Min ji geyrî te nebîr secde j’ kesî ra ey Xuda

Hê j’ ewwel da çav li îhsana qedîm im ey Xuda

(3/3)

2.5.3. Ne‘t

Ne‘t, ew cure helbest in ku li ser pesn, wesf û mucîzeyên Cenabê Pêxember hatine nivîsîn tê gotin.³⁸³

Di dîwanê de tenê helbesta di rêza çaran de bi cureya ne‘tê ye. Ev cure bi teşeya qesîdeyeke musemmet a tercî‘ê hatiye nivîsîn. Tercî‘ bi paşserwaya “ya Resûlellah meded” hatiye kirin.

Emê li jêrê ji vê helbesta ne‘tê du malikan bidin.

Ya Ilahî her dibêjim / ya Resûlellah meded

Bêkes û ‘ebdal û gêj im / ya Resûlellah meded

(4/1)

Bêkes im ser wechê ‘erqê / hatime ber deryê rewqê

Ez dexîl im min neberdê / ya Resûlellah meded

(4/2)

2.5.4. Medhiye

Medhiye ew helbest in ku ji bo pesn û medhê kesekî bên kirin tên nivîsîn. Bi du awayan tên nivîsîn; yek jê li ser padişah, wezîr, şeyhul îslam û hwd. serekên dewletê tên nivîsîn, ya duyem jî li ser çar xelîfeyan, şexsiyetên dînî û mezinên terîqetan tên nivîsîn. Di edebiyata Kurdî ya klasîk de medhiyeyên şah û emîran, an jî medhiyeyên desthilatdarîyê gelekî kêr in. Lê di serdema piştî mîrektîyan ku li herêma Kurdan Neqşebendîtiya Xalidîyan belav bûye helbestvanên ku endamên tekya û medreseyan Xalidîyan bûn li ser şex û terîqeta xwe qesîdeyan medhê nivîsîne.³⁸⁴

³⁸³ Adak, *Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*, r. 154.

³⁸⁴ Adak, *Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*, r. 135-137.

Tablo 13: Rêz, Hejmar û Teşeyên Nezmê yên Medhiyeyên di Dîwanê de

Rêza Medhiyeyê ya di Dîwanê de	Teşeya Nezmê ya Cureya Medhiyeyê	Hejmara Helbestan	Yekûn
6, 7, ... 30, 31, 83, 84, 86, 87	Qesîde	30	64
77, 81, 82	Mustezad	3	
37	Muselles	1	
39, 40	Murebbe‘	2	
42, 43, ... 63, 64	Muxemmes	23	
68, 69, 70, 71	Museddes	4	
33	Terkîbbend	1	

Her wekî ji tabloya jor û grafîka rêjeya cureyên nezmê ku me di serê mijarê de dabû tê xuyakirin ku cureya herî pir (76 %) di dîwanê de hatiye bikaranîn cureya medhiyeyê ye. Medhiyeyên dîwanê herî pir bi teşeya qesîde û muxemmesê hatine nivîsîn. Herweha mustezad, muselles, terkîbbendên di dîwanê de hemû bi cureya medhiyeyê ne.

Di dîwanê de bi tevahî 64 helbest bi cureya medhiyeyê ne ku medhiyeya di rêza 48an ne tê de hemû di çarçoveya edebiyata tekyayê de hatine nivîsîn. Heyderî di medhiyeyan de li ser terîqeta Neqşebendî/Xalidî bi taybetî jî li ser şaxa Xalidîtîyê ya Xeznewîyan û şêxên wan nivîsiye.

Terîqet û şêxên ku Heyderî li ser wan medhiye nivîsiye ev in;

-li ser terîqeta Neqşebendîtîyê

- li ser terîqet û medreseya Nûrşînê
- li ser terîqet û medreseya Xeznewîyan
- li ser Şêx Mihemed Diyaînê Nûrşînî (Hezret)
- li ser Seydayê Şêx Evdirezaqê Helêlî (Seyda)
- li ser Şêx Ehmedê Xeznewî (Şahê Xezna)
- li ser Şêx Me'sûmê Xeznewî (Me'sûmê Sanî)
- li ser Şêx Eladînê Xeznewî
- li ser Şêx Izedînê Xeznewî
- li ser Şêx Evdilxenîyê Xeznewî

Em ê li jêrê du malikan bo nimûne bidin.

Şerbeta ehlê widada kenzê 'îrfana tu wî

Xaşedergahê murada şedrê dîwana tu wî

(20/1)

Ellah ji wê lûfta qedîm / nûr da derê 'Ebdulgenî

Nuqtek ji wê feqla 'emîm / berda derê 'Ebdulgenî

(30/1)

2.5.5. Mersiye

Mersiye, ew helbest in ku li ser xemgînî û êşa li dû mirina kesekî/ê tîn nivîsîn re hatine gotin. Mersiye li ser mirina desthilatdarên siyasî, kesayetên dînî, li ser mirina endamên malbatê û hemû hezkirîyan tîn nivîsîn.³⁸⁵ Di dîwanê de heşt helbest bi cureya mersiyyê hene ku em ê li jêr tabloya rêz û hejmara wan bidin.

Tablo 14: Rêz, Hejmar û Teşeya Nezmê ya Mersiyeyên di Dîwanê de

Rêza Mersiyeyê ya di Dîwanê de	Teşeya Nezmê ya Cureya Mersiyeyê	Hejmara Helbestan	Yekûn
32	Qesîde	1	8
41	Murebbe‘a Mulemme‘	1	
65, 66, 67	Muxemmes	3	
72, 73	Museddes	2	
34	Tercî‘bend	1	

Her wekî ji tabloya jor jî xuya dike cureyên mersiyeyê di dîwanê de bi 5 pênc teşeyên cuda hatine nivîsîn. Heyderî, hemû mersiyeyên di dîwanê de li ser şêxên xwe nivîsîne. Êş û xemgînîya ku dûrmayîna xwe ya ji wan, bi hestên kûr û dilşewat anîye ziman.

Helbesta 72yan li ser mirina Şêx Ehmedê Xeznewî hatiye nivîsîn. Helbestên 34 û 79an li ser mirina Şêx Mesûmê Xeznewî hatine nivîsîn. Helbestên 32, 41, 67, 73yan li ser mirina Şêx Eladînê Xeznewî hatine nivîsîn.

Em ê li jêrê ji mersiyeyên Heyderî çend nimûneyan pêşkêş bikin.

Ger dipirsî ez hezîn im dilkesîr û nale nal

Bulbulê dilpare xwîn im şorgula min rûh li bal

Pirs bike carek li halê Heyderî goyîn mişal

(34/1)

³⁸⁵ Adak, *Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*, r. 143. , Dilçin, h.b., r. 220.

Dilo rabe te xew na'ê ji kalînê me yek car
Ji derdê firqeta Me'şûm xwe datînê di nav nar
Keserkûr im belê hêstir ji axînê me tîn xwar
Ji kerbê wî ku nabînim melûl bûye dilê sar
Melûl im ez ji kerbê wî dinalînê dilê sar
Firaqa taca sulţana kirim dînê birîndar

(65/1)

Ey dilê bê çare rabe bes ke eşa kebedê
Çû wefatê qutbê kamil hate ser emrê Xwedê
Firqeta wî dil biraştî can gulamê wê qedê
Deng û qîrîn ah û nalîn çûne Şam û Serhedê
Ya Ilahî ba selamê hem cemala wuşletê
Rehmet û nûr û kerem her dem bibarê merqedê

(72/1)

Eya saqî dikim hêvî şeraba 'eşqê zû bînê
Ku hişyar bî dilê gemgîn bike rehîmê xwe bighînê
Bi behşa dilbera şêrîn dilê min zû bike şînê
Bi dengê Heyderî bakim eya dilber tu Şêrînê
Te pir 'aşîq kirin mecnûn şev û roja dinalînê
Belê mûkî ji te nadim bi şed Leyla û şed Zînê

(73/1)

2.5.6. Hîcwiye

Hîcwiye, helbestên li ser rexne û daşorîna kesekî/kesekê tîn nivîsîn re tê gotin.³⁸⁶ Her wekî hîcwiye li ser kesan tîne nivîsîn, li ser civak û saziyekê jî tîn

³⁸⁶ Dilçin, h.b., r. 264.

nivîsîn ku di van cureyan de rexneya civakê an sazîyekê tê kirin.³⁸⁷ Di edebiyata tekyayê de ji alîyê hin helbestvanan ve bi nêrîneke tesewifî rexneya dunyayê, zemanê talî û mirovên wextê tê kirin.³⁸⁸ Heyderî jî bi nêrîneke tesewifî di helbesta di rêza pêncan de rexneya dinyaya derewîn û mirovên wextê kiriye. Em ê li jêrê bo nimûne ji vê helbesta hîcwiye sê malikan bidin.

Ey cîran û ehlê dunê / 'ê kû li dîn guhdar bizan

Hûn guh bidin vê gotinê / dîn bû gerîb û bê guman

(5/1)

Xwe j' destê nefsê dûr bikin / tem'a dunê em bes bikin

Tedbîr ew e em seh bikin / bigrin riya van kamilan

(5/7)

Guh nadin we' zê 'alima / pirs ji 'ilm û dîn nema

Her yek li dûv keyfa xwe ma / hem fitneya axir-zeman

(5/8)

2.5.7. Pendname

Pendname yan jî nesîhetname, ji metnên ku gotinên bi hikmet, pend û nesîhet, rêz û qeîdeyên exlaqê, rê û rêçikên dînî di xwe de dihevin re tê gotin.³⁸⁹ Pendname wek cureyeke edebî, di edebiyata Kurdî ya klasîk de piştî mîrektîyan hatine nivîsîn. Di vî warî de Seyîd Elîyê Findikî (k.d. 1968), Mela Sîracedînê Xelîlî û Mela Ehmedê Zinarexî qesîdeyên pendê nivîsîne.³⁹⁰

Heyderî bi nerîn û felsefeya tesewifî helbestek bi vî şiklî nivîsiye. Ev helbest li ser fanîbûna dinyayê ye û nesîhet li xwîneran dike ku bala xwe ji ser dinyaya fanî wergerînin ser heyata ebedî. Ev helbesta ji cureya pendnameyê ye di rêza 38an de ye û bi teşeya murebbe'ê hatiye nivîsîn ku em dikarin di çarçoveya murebbe'ên tekyayê

³⁸⁷ Pala, h.b., r. 219.

³⁸⁸ Üstüner, h.b., r. 214.

³⁸⁹ Nimet Yıldırım, *İran Kültürü*, Pinhan Yayıncılık, İstanbul 2016, r. 259.

³⁹⁰ Adak, *Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*, h.b., r. 147.

de binirxînin. Em dixwazin li jêrê çend bendên vê pendnameyê wek nimûne pêşkêş bikin.

Dilo dunya derwîn e
Çiqas ji me r' bimîne
Tû guh nedê xa'în e
Jina pîs e bi yar e

(38/6)

Dilo tu xwe nespêrê
Kes jê nabînî xêrê
Talî bi qazm û bêrê
Te dikşînî mezar e

(38/11)

Tû axretê ava ke
Derdê xwe pê dewa ke
Ew ê xeyrê eda ke
Ew e ji bo te kar e

(38/15)

2.5.8. Xezela Tekyayê

Xezelên ku mijara wan pîr û şêxên terîqetê ne û di wan de medh û pesnê şêxan tên kirin re xezela tekyayê tê gotin. Ev cureya xezelê piştî serdema mîrektîyan, bi belevbûna terîqetên Qadîrîti û Neqşebendîtiya Xalidîtiyê ketiye nav edebiyata Kurdî ya klasîk.³⁹¹

Di dîwanê de şeş xezel hene ku her şeş xezel jî li ser pesn û medhê terîqet û şêxên Xeznewîyan hatine nivîsîn. Loma her şeş xezel jî cureya xezela tekyayê ne.

³⁹¹ Adak, *Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*, r. 227, 228.

Em ê li jêrê ji xezelên tekyayê çend nimûneyan pêşkêş bikin.

Ya Reb an gul ez gulistanê Irem bû yadigar
Zatê pak Me‘şûm hebîbê min ‘ezîzê şehriyar
(75/1)

Badeya husna hebîbê melhema derd û birîn
Xemriya noşîn helal ya şerbet û dermanê dil
(76/6)

Ke‘beya husn û cemalê zînetê xopan î tû
Dilberê gerden gezalê murşidê insan î tû
(78/1)

Rû dêm gula / pir qabila / xweş kamila / dağ da dila
Şêrê xedeng / ev şewt û deng / hem herb û ceng / lem‘anî tû
(79/7)

2.6. KÊŞ, SERWA Û PAŞSERWA

2.6.1. Kêş

Kêş (wezn); ew pîvan e ku helbest yan jî nezmek ji serî heta dawîyê li gorî wê tê nivîsîn. Kêşa erûzê; ji kêşa ku ahenga helbesta dîwanê sererast dike tê gotin. Erûz; wek sitûnê ku di nava kon de tê rakirin ku çawa sitûn kon li ser pîyan disekinîne, ew hêmaya herî mezin ku helbesta dîwanê li ser pîyan disekinîne jî erûz e.³⁹²

Kêşa erûzê, cara ewil di edebiyata Ereban, “serdema Cahilîyeyê” de hatiye bikaranîn û piştî Ereb, bûne misliman jî bi vê kêşê nivîsîna helbestan berdewam kirine. Piştî ku bi rîya Ereban, Kurd û Faris jî bûne misliman kêşa erûzê derbasî edebiyata Kurdî û Farisî jî bûye. Ji vê gavê û pê ve ji edebiyata Farisî derbasî gelek edebiyatên gelên din jî bûye. Di edebiyata Kurdî de, di sedsala Xan de Baba Tahir ji

³⁹² Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, r. 365., Pala, r. 38.

bo dubeytîyên xwe ev kêş bi kar anîye. Dîsa di sala 1682an de Ehmedê Xanî cara ewil bi awayekî pedagojîk li ser kêşa erûzê rawestiyaye û di vê çarçoveyê de berhema “Nûbihara Biçûkan” nivîsîye.³⁹³

Heyderî helbestên xwe di çarçoveya edebiyata klasîk de nivîsîye. Ji ber ku erûz jî kêşa helbestên klasîk e, helbestvan ji alîyê kêşê ve di nava vê regezê de tevgerîyaye û hemû helbestên di dîwana xwe de bi kêşa erûzê nivîsîye. Ji bo baş bê fêmkirin em ê li jêr tabloya qalib û behrên erûzê yên ku di dîwanê de hatine bikaranîn bidin;

Tablo 15: *Tabloya Giştî ya Behr û Qalibên Erûzê yên ku di Dîwanê de*

BEHR		QALIB		KOJIM		
J.		J.		Qalib	Behr	Giştî
1	Remel	1	Fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilun	37	42	
		2	Fe‘ilatun fe‘ilatun fe‘ilatun fe‘ilun	2		
		3	Fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilun	2		
		4	Fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilatun	1		
2		1	Mefa‘îlun mefa‘îlun mefa‘îlun mefa‘îlun	13		
		2	Mef‘ûlu mefa‘îlu mefa‘îlu fe‘ûlun	6		

³⁹³ Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, r. 367.


	Hezec	3	Mef'ûlu mefa'îlu mefa'îlu fe'ûlun+ mef'ûlu fe'ûlun	3	27	88
		4	Mef'ûlu mefa'îlu mefa'îlu felûn	2		
		5	Mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun fe'ûlun	1		
		6	Mefa'îlun mefa'îlun fe'ûlun	1		
		7	Mefa'îlun mefa'îlun	1		
3	Recez	1	Mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun	14	14	
4	Munserîh	1	Mustef'îlun fe'ûlun mustef'îlun fe'ûlun	2	3	
		2	Mustef'îlun fe'ûlun	1		
5	Muzarî	1	Mef'ûlu fa'îlatun mef'ûlu fa'îlatun	1	1	
6	Muteqarib	1	Fe'ûlun fe'ûlun fe'ûlun fe'ûl	1	1	

Her wekî di tabloya jor de jî xuya dike di seranserê dîwanê de şeş behr û 17 qalibên van behran hatine bikaranîn. Behra remelê bi çar qaliban, behra hezecê bi heft qaliban, munserîh sisê recez, muzarî û muteqarib jî her yek bi yek qalibê li ser helbestên dîwanê hatine tetbîqkirin.

Helbestvan, di seranserê dîwanê de bi qalibên cur bi cur ku ji behrên cuda pêk tên bi kar anîye. Her sê qalibên herî pir hatine bikaranîn wiha ne; di 37 helbestan de qaliba “Fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilun”ê ji behra remelê, di 13 helbestan qaliba “Mefa‘ilun mefa‘ilun mefa‘ilun mefa‘ilun”ê behra hezecê û di 14 helbestan de jî qaliba “Mustef‘ilun mustef‘ilun mustef‘ilun mustef‘ilun”ê ya behra recezê bi kar anîye.

Dema em li bikaranîna behr û qalibên helbestên Heyderî dinêrin, em dibînin ku 42 helbest bi behra remelê, 27 helbest bi behra hezecê, 14 helbest bi behra recezê, sê helbest bi behra munserihê yek jê bi behra muzarîyê, yek jê jî bi behra muteqaribê hatine nivîsîn. Ev jî tê wateya ku ji rêjeya sedî ve herî pir bi behra remel (48%), hezec (31%) û recezê (16%) helbest hatine nivîsîn. Ev di dîwana Melayê cizîrî de jî wisaye. Melayê cizîrî jî bi rêjeya herî pir behra remelê (47%) piştî jî bi behrên hezec (24%) û recezê (22%) helbest nivîsîne. Di edebiyata Kurdî ya giştî de jî behrên ku herî pir hatine bi karanîn bi rêzê ev in; hezec, remel û recez.³⁹⁴

³⁹⁴ Adak, “Aheng û Mûsîqî di Helbestên Melayê Cizîrî de”, r. 46-50.



Grafîk 6: Rêjeya Behrên Erûzê yên di Dîwanê de Hatine Bikaranîn

Heyderî di helbestên xwe de kêşa erûzê bi awayekî serkeftî tetbîq kiriye. Sedemekî tercîhkirina wî ya behrên hezec û recezê ew e ku hunera tesmîte (serwaya navekî) di van qaliban de tê cîbicîkirin. Heyderî 39 helbestên musemmet nivîsîne ku di van helbestan de divê qalibên çar perçeyî bîn bikaranîn ku ew jî bi piranî ev in: “Fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilatun”, “Mustefîlin mustefîlun mustefîlun mustefîlun” û “Mefa‘ilun mefa‘ilun mefa‘ilun mefa‘ilun”. Helbestên bi hejmara 4, 6, 13, 16, 19, 31an de ku bi tesmît in ji malika duyem û pê ve di misrayên yekem de tefîleya dawîn a misrayê de diguhere.

Bo nimûne;

fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilun (fa‘ilatun)

Şêxê kamil mîrê ‘adil / canfida me canfida

Murşidê şêrîn û faḍil / canfida me canfida

Ba cemala roj mişal e / nav-şîrîn Me‘şûm delal e

Esmerê awir-gezal e / canfida me canfida

Esmerê min dilberê min / qutbê 'alem rehberê min

Mal û mulk û şehperê min³⁹⁵ / canfida me canfida

(16/1, 2 3)

fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilun (fa'ilatun)

Ey Xuda erda mubarek / her dibin hifza te bî

Hukmê Xezna'ê³⁹⁶ bi carek / daxilê rehma te bî

Behra rehme bête xwarê / çar teref şubh û êvarê

Her li Xezna'ê³⁹⁷ bibarê / menbe'a feyza te bî

Erda Xezna'ê³⁹⁸ 'ula bî / dîr ji afat û bela bî

Melce'ê şex û mela bî / merkeza nûra te bî

(31/1, 2 3)

Em ê niha jî li ser çend hêmayên erûzê ku ji aliyê teorîsyenên edebiyatê ve wek qusûrên erûzê tên dîtin rawestin.

2.6.1.1. Îmale

Îmale, ew têgeh e ku dengdêreke kurt di bêjeyê de wek dengdêreke dirêj be bê xwendin. Bi kurtasî kîteyêke vekirî merev têxe şûna kîteyêke girtî îmale derdikeve holê.³⁹⁹ Di dîwana Heyderî de pir kêr îmale hene ku em ê li jêrê çend nimûneyan bidin.

Bi **te** fexrê dikim her dem di weşfê da muheyyer mam

Ne kû carek her û şed car bi qurbana te bim Ehemmed

(11/3)

³⁹⁵ şehperê min] şahperê min MMEC.

³⁹⁶ Hukmê Xizna'ê] Hukmê Tilme'rûf NMD1.

³⁹⁷ Her li Xizna'ê] Her li Tilme'rûf NMD1.

³⁹⁸ Erda Xizna'ê] Erda Tilme'rûf NMD1.

³⁹⁹ Saraç, **Klasik Edebiyat Bilgisi Biçim-Ölçü-Kafiye**, r. 210.

Kemterî **me** dilkirî **me** / ez li Me'şûm muşterî me

Kelbê dergahê derî **me** / canfida **me** canfida

(16/11)

Ji ewwel **ve** dibêjim bê xilaf **e**

Tu wî serdefterê ehlê zemanî

(23/2)

Wî nezer daye cihanî / qaymeqamê neqşebend

Payitextê nûrê danî / mîr 'Ela'eddîn li ser

(27/2)

2.6.1.2. Med (Îmaleya Dirêj)

Di Erebi de wateya wê ya rastîn dirêjkirin an jî kişandin e. Di erûzê de dirêjkirina kîteyên hevedudanî ye. Di Erebi, Farisî û Kurdî de kirina medê ne qusûra erûzê ye, bereksê wê ji bo ahenga helbestê hêmanek e.⁴⁰⁰ Di dîwana Heyderî de pir kêrîmaleya dirêj hene ku em ê li jêrê bendekê bo nimûne ji dîwana wî bidin.

Bê şek tu di **husn** û cemalê da şêrîn î

Mehbûbê dila ehlê Xudanî bi yeqînî

Bilxaş tu ser û ça'v û dil û rûhê Emînî

L' ber dergahê te Heyderî maye bi feqîrî

Îrhem bi kuleybin leke ya nûre beşîrî

(62/5)

2.6.1.3. Zîhaf

Wateya rastîn ya zîhafê, dûrxistina ji eslê xwe ye. Lê wek hêmayeke erûzê kurtkirin an jî kurt xwendina kîteyan e ku kîteyên dirêj kurt tên xwendin.⁴⁰¹

⁴⁰⁰ Saraç, **Klasik Edebiyat Bilgisi Biçim-Ölçü-Kafiye**, r. 211.

⁴⁰¹ Saraç, **Klasik Edebiyat Bilgisi Biçim-Ölçü-Kafiye**, r. 215.

Di van malikên jêrê de dengdêra “û”yê dirêj e lê li şûna dengdêrên kurt hatiye bikaranîn.

Paxir û zengar **û** xwar im hem çurûk berda me ez

Cewher û yaqût **û** elmas Xeznewî hêjayî tû

(78/9)

-Di malikên jêr de “ê” li cihên dengdêrên kurt bi cih bûye.

Bi roj û şev heta sağ bim di ‘îşqê keyfê dersê da

Ev e dursa me bê çara bi qurbana te bim Ehemmed

(11/10)

Nav û dengê vê terîqa bê riya çû her teref

Silsila Neqşê te girtî tacê sultana tu wî

(20/5)

Lê dema dilber xuya bû / nazikê merd û şêrîn

Şahiya deşt û çiya bû / da dila ‘îşq û nezer

(22/2)

-Di malika jêr de “î” li şûna dengdêreke kurt hatiye bikaranîn.

Meyla **wî** her Xuda ye / şadiq emîn û murşid

Wellahi ev ne meyl e / lew me qebûl e rehber

(15/8)

-Di malikên jêr de li şûna kêteyên vekirî kêteyên girtî hatine bikaranîn.

Gerçi em ne **la**’iqin bose bikin dest **û** piya

Keremkarê **Rebê** me dûr**bin** ji nar û seqerê

(10/3)

Di dîwanê de zîhaf hene lê peyvên wek “tû” û “kû” di helbestan de rêjeya zîhafan zêdetir kirine. Gava ji aliyê telafûz û rengê dangan ve li peyvên “tû û kû” yê bê nêrîn tê dîtin ku şêwazeke wan a bê kumîk yanî kurt jî heye. Helbestvan zîhafên di

van peyvân de çêbûne wek qusûr nedîtiye. Lewra ev bêje di dîwanê de li gelek cihan bûne sebebê hebûna zîhafê. Ev rewş tenê ne di dîwana Heyderî de di berhemên Kurdî yê klasîk hemûyan de heye.

2.6.1.4. Texfîf (Qesr)

Xefîf ew têgeh e ku bêjeyên bi şedde (dubareya dengdaran) ji bo malik an bend li qaliba kêşê rûnê gava şedde nayên bikarnîn derdikeve holê.⁴⁰²

Di malika jêrê de ji bo bêje li qaliba kêşê rûnê şeddeya di bêjeya “himmet”ê de nehatiye bikaranîn. Loma texfîf/qesr derketiye holê.

Di behsa keşf û esrara / ‘eca’ib û **himet** heybet

Gerîb e ey gelî yara / neşîbê me Xwedê daye

(9/6)

Heyderî ji bo misrayên xwe li kêşê rûnê gelek caran şedeyên peyvên Erebi bi kar neanîye. Bi vî awayî di gelek cihan de texfîf derketiye holê.

2.6.1.5. Wesl

Di kêşa erûzê de dema ku bêjeyek bi tîpa dengdar biqede û peyva piştî wê bi tîpek dengdêr dest pê bike, li vir li gorî pêdivîya weznê her du bêje bi hev re têne xwendin.⁴⁰³ Wesl, di pratîka erûzê de gelekî hatiye bikaranîn û ji bo ahenga helbestê hêmayeke pêwîst hatiye dîtin. Bereksê wê cihê ku pêdivîya weslê hebe û neyê kirin qutbûnek dikeve rîtm û ahenga helbestê.⁴⁰⁴

Ev leb_û le‘lê şeker wechê bi heybet û şêrîn

Qamet_û şiklê me dî zêde ji şewqa fenerê

(10/5)

⁴⁰² Saraç, **Klasik Edebiyat Bilgisi Biçim-Ölçü-Kafiye**, r. 217.

⁴⁰³ Saraç, **Klasik Edebiyat Bilgisi Biçim-Ölçü-Kafiye**, r. 208.

⁴⁰⁴ İpekten, r. 143.

Bi bêhna wî ez_im dilgeş

Ez_im ‘aşiq û dil pir geş

Dimînî **Heyderî** serxweş

Ji ‘îşqê rûh_û can tev da

(39/8)

Henzel_û tehlîy_û dara sihr û bê meywa me ez

Çîçek_û nesrîn_û ‘enber şorgul_û reyhanî tu

(78/4)

Ez tî û birçî zuwa me lew ji we dûr mame ez

Şerbet_û şehd û heyat û kewşer_û fincan î tû

(78/8)

Heyderî kêşa erûzê di helbestên xwe de bi serkeftî bi kar anîye. Her çiqas di dîwanê de îmale û zîhaf ne di asteke bilind de bin jî li cihinan hatine bikaranîn. Zîhaf jî ji îmaleyan bêtir hatine bikaranîn.

2.6.2. Serwa

Serwa, herî kêr li dawîya du misrayan dubarekirina dengên e. Ev dengên ku dubare dibin çî qertaf be, çî bêje be, wateya wan cuda ye û li dawîya misrayan bi cî dibin. Di edebiyata klasîk ya Îslamî de di helbestê de kêş û serwa du şertên esasî ne. Ji xwe serwa ji bo teşeyên nezmê jî hêmaneke diyarker e. Serwa ji bo ahenga deng û mûsîqîya helbestê ew û kêşê du hêmanên sereke ne.⁴⁰⁵ Ji ber vê girîngîyê di edebiyata klasîk ya Îslamî, bi taybetî jî di ya Erebi de serwa bi navê ilmê serwayê (îlmü’l-qewafî) tê senifandin.

⁴⁰⁵ Saraç, **Klasik Edebiyat Bilgisi Biçim-Ölçü-Kafiye**, r. 257.

2.6.2.1. Cureyên Serwayê

Serwa li gorî cihên di risteyê de û li gorî hevbeşîya di navbera dengên di dawîya misrayan de bi du awayan tên senifandin.⁴⁰⁶

2.6.2.1.1. Li Gorî Cih Cureyên Serwayê

2.6.2.1.1.1. Serwaya Bêpaşserwa

Di serwaya bêpaşserwa de dubarekirina dengên di dawîya risteyê de ye. di Kurdîya Soranî de jê re “serwaya kutayî” tê gotin.⁴⁰⁷

Di dîwana Heyderî de serwaya 27 helbestan bi vê cureyê ye. Helbestên bi vê cureya serwayê ne ev in; 1, 5, 12, 14, 15, 17, 21, 22, 27, 28, 39, 40, 41, 48, 49, 50, 51, 52, 53, 56, 57, 58, 60, 61, 71, 74, 75.

Bo nimûne:

Rewşena çeşmê emîra / la'îqê rutba 'ezîm

Melce'ê mîr û feqîra / padişahê pir helîm

(12/1)

Şorgula bustan û bağan / reng û nîşan û wesîm

Melce'ê şah û feqîran / padişahê pir helîm

(14/1)

'Aşîqê bê dil tu rabe / ber bi Tilme'rûf tu her

Ser ji xew rake şiyar be / der cihan roj hate der

(22/1)

⁴⁰⁶ Ji bo agahiyên berfirehtir bnr. : Adak, **Destpêka Eedbiyata Kurdî ya Klasîk**, r. 395,396.

⁴⁰⁷ Adak, **Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk**, r. 393.

Ey ‘ezîza şox û şengê / mey şêrîna leb şerab
 Şahebazê naze-rengê / melce û kehf û meab
 Tu di nav ’alem bi dengê / şuhbet û qewl û cewab
 Hem di weqtê halê tengê / murşidê qadir cewab
 Neclê tahir deryê faxir behrê zaxir mahê tab

(52/1)

2.6.2.1.1.2. Serwaya Bipaşserwa

Di serwaya bipaşserwa de di dawîya risteyan de paşserwa û berî wê jî serwa heye.⁴⁰⁸ Di dîwana Heyderî de 39 helbest bi vê cureyê hatine serwakirin. Helbestên bi vê cureyê ne ev in; 6, 7, 8, 9, 10, 18, 19, 20, 23, 24, 26, 29, 30, 33, 35, 36, 38, 42, 43, 46, 47, 54, 55, 59, 63, 65, 66, 67, 68, 69, 72, 73, 76, 77, 78, 79, 81, 82, 84.

Bo nimûne;

Ey tecellaya li Sîna’ê meded
 Xil’eta merhûmê Xezna’ê meded

(18/1)

Şerbeta ehlê widada kenzê ‘irfana tu wî
 Xaşedergahê murada şedrê dîwana tu wî

(20/1)

‘Ebdulğenî dewra te hat / ey xwedyê karê Xeznewî
 Da qeşd bikin ehlê welat / werne diyarê Xeznewî
 Ew nisbeta çû dîsa hat / hatye diyarê Xeznewî
 Wek rojekî nû lê hilat / xêr hat ciwarê Xeznewî
 Ê kû divê war û heyat / Xezna bû warê Xeznewî

(63/1)

⁴⁰⁸ Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, r. 396.

Çawa ku ji daneyên ku me li jor dan tê xuyakirin ku Heyderî ji serwaya bi paşserwa bêtir hez kiriye.

2.6.2.1.2. Li Gorî Hevbeşîya Dengan Cureyên Serwayê

2.6.2.1.2.1. Serwaya Mucerrred

Ev serwa tenê ji dubarekirina herfa rewîyê pêk tê. Di vê serwayê de herfa rewîyê bê hereke ye û berî wê herfeke bi hereke heye. Wekî; kef, ser, seher û hwd.⁴⁰⁹

Di dîwana Heyderî de 13 qesîde, 9 muxemmes, du murebbe'; mustezad, texmîs, teşîr û terkîbbendek bi tevahî di 30 helbestan de cureya serwaya mucerrred hene. Em ê li jêrê çend nimûneyan ji serwaya mucerrred bidin;

Şuhbeta nav ins û cana / deng û firqa Xeznewî

Bû heyata qelb û cana / 'eşq û zewqa Xeznewî

(6/1)

Ey qiblegahê 'amê / nazik leîf û enwer

Bûn em ji dest gîramê / dîlpare û mukedder

(15/1)

Rewşa zemanê talî / şahê bi qedr û qîmet

Xwedyê meqamê 'alî / Me'sûmê pir bi heybet

(17/1)

Elhemd ji Xudê ra li me zêde dibû ni'met

Yek murşidê qelba wekî hêvî li me derket

Pir şewq û ziya husna Îlah bi ser ket

Herkes ji wa dîtin adab û 'ilm û neşîhet

Ellah bi vî şiklî xemiland edeb û himmet

(58/1)

⁴⁰⁹ Adak, **Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk**, r. 397.

2.6.2.1.2.2. Serwaya Murdef

Di serwayê de herfên “elîf”, “waw” û “yê” herfên rîdfê tên qebûlkin. Eger ji van herfan yek bêyî ku herekeyekê bistîne, berî herfa rewîyê di serwayê de bê dubarekirin ev dibe serwaya murdef. Wek; bihar, şîkar, û hwd.⁴¹⁰

Di dîwanê de 11 jê muxemmes, 9 qesîde, çar xezel, sê museddes, du mustezad, murebbe‘ û tercî‘bendek bi tevahî di 31 helbestan de serwaya murdef hatiye bikaranîn. Li jêrê em ê çend nimûne ji bo serwaya murdefê bidin.

Şorgula bustan û bağan / reng û nîşan û wesî**m**

Melce‘ê şah û feqîran / padişahê pir helî**m**

(14/1)

Taca serê mulûka / bagê cinan û gul**zar**

Bû şahiya sulûka / ‘Ela‘edîn ‘ilim**dar**

(28/1)

Ey ‘ezîza şox û şengê / mey şêrîna leb şer**ab**

Şahebazê naze rengê / melce‘ û kehf û me**ab**

Tu di nav ‘alem bi dengê / şuhbet û qewl û cew**ab**

Hem di weqtê halê tengê / murşidê qadir cew**ab**

Neclê tahir deryê faxir behrê zaxir mahê **tab**

(52/1)

Ke‘beya husn û cemalê zîneta xopanî tû

Dilberê gerden gezalê murşidê insanî tû

(78/1)

2.6.2.1.2.3. Serwaya Muqeyyed

Berî herfa rewîyê dubarekirina herfên hemcins ên bê hereke bîn dawîya risteyê serwaya muqeyyed derdikeve holê. Wekî; derd, merd, reng û hwd.⁴¹¹

Di dîwanê de du muxemmes, xezel, qit'e û murebbe'ek bi tevahî di pênc helbestan de ev cure serwa heye.

Bo nimûne;

Dilo rabe binêre ev çi îhsan e Xudê **pir da**

Wekî berq û îşildaqa dibû şu'le li her '**erda**

Li eţrafa bela bû ev xeber çû şehr û her gunda

Li Tilme'rûf meqamê dilber û mehbûb û dil **merda**

Bikin qeşdê gelî yara çi dermanê kul û **derda**

(57/1)

Îro şemala Xeznewî / eţrafê 'alem şu'le **da**

Berq û burûska Xeznewî / dunya li ber pêta **veda**

(74/1)

Wek encam, di dîwanê de 31 helbest li ser serwaya murdefê 30 helbest li ser serwaya mucerredê û pênc helbest jî li ser serwaya muqeyyedê hatine sazkirin.

⁴¹⁰ Adak, **Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk**, r. 397.

⁴¹¹ Adak, **Destpêka Edebiyata Kurdî ya klasîk**, r. 398.



Grafîk 7: Bikaranîna Cureyên Serwayê di Teşeyên Helbestan de

2.6.2.2. Serwaya Navekî (Tesmît)

Carinan di hin teşeyên helbestan de ji bilî serwaya standart a helbestê di nava malikan de jî serwayeke navekî tê sazîkirin ku jê re “tesmît” û ji xezel û qesîdeyên bi vî awayî re jî “xezela musemmet” û “qesîdeya musemmet” tê gotin. Tesmît li ser bîngeha tefîleyên kêşê erûzê ava dibe. Pêwîst e di musemmetan de qalibên çar tefîleyî bîn bikaranîn û di dawîya her tefîleyê de serwa bê bicîkirin. Helbestên klasîk ji xwe bi serwa ne, di dawîya misrayan de serwaya bîngehîn heye û bi vî awayî ahengeke di dawîya helbestê de saz dibe. Lê gava helbestvan serwaya navekî di helbestê de bi kar bîne ahenga helbestê bilindtir dibe, mûsîqî û rîtmî malikan digihêje asteke bilindtir.⁴¹² Helbestên ku di wan de du serwa hebe “zu-qafiyeteyn” (du serwayî) tê gotin. Eger hejmara serwayan ji diduyan zêdetir be ji wê re jî “zu’l-qewafî” tê gotin. Di helbestên bi vî rengî de ji serwaya dawîya misrayan re serwaya bîngehîn (qafiyeyên esliye), ji serwayên din re jî serwaya muheqqa (qafiyeyî muheqqa) tê gotin.⁴¹³

⁴¹² Adak, “Aheng û Mûsîqî di Helbestên Melayê Cizîrî de”, r. 53.

⁴¹³ Saraç, **Klasik Edebiyat Bilgisi Biçim-Ölçü-Kafiye**, r. 268, 269.

Heyderî di dîwana xwe de bi gelek şêwazên cur bi cur ên tesmîtê helbest nivîsîne. Di dîwanê de bi giştî 39 helbest bi tesmît in yanî bi serwaya navekî hatine nivîsîn.

Di van helbestan de qalibên ku hatine bikaranîn digel hejmarên wan ev in;

Mustefîlun mustefîlun mustefîlun mustefîlun → 13 helbest

Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun (fa'ilatun) → 13 helbest

Mefa'ilun mefa'ilun mefa'ilun mefa'ilun → 9 helbest

Mustefîlun fe'ûlun mustefîlun fe'ûlun → 2 helbest


Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun → helbestek

Mef'ûlu fa'ilatun mef'ûlu fa'ilatun → helbestek

Dema em li van tesbîtên jor dinêrin, em dibînin ku Heyderî herî pir bi hejmarên wek hev; di 13 helbestan de, behra recezê qaliba “mustefîlun mustefîlun mustefîlun mustefîlun” û behra remelê, qaliba “fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilun (fa'ilatun)” bi kar anîye. Bi behra hezecê qaliba “mefa'ilun mefa'ilun mefa'ilun mefa'ilun”ê jî 9 helbest nivîsîye.

Ev şêwaz herî zêde di sahaya Îran û Azerîyan de hatiye bikaranîn. Di edebiyata Farisî de Se'dî, Mewlana û di edebiyata Azerî de jî Nesîmî û Fuzûlî serî li vê şêwazê dane.⁴¹⁴ Ew şêwaz di edebiyata Kurdî de helbestvanên wek; Eliyê Herîrî, Melayê Cizîrî, Pertew Beg, Ehmedê Xanî, Wedaî, Şêx Ehmedê Feqîr, Xelwetî, Siyahpoş, Mela Nurullahê Godîşkî û hwd. bi kar anîne.⁴¹⁵ Heyderî jî şêwaza tesmîtê gelekî bi kar anîye.

Wek encam, Heyderî di warê tesmîtê de gelek cureyên cuda nivîsîye. 26 qesîde, pênc muxemmes, sê xezel û ji teşeyên qit'e, muselles, museddes, terkîbbend, tercî'bendê jî nimûneyek nivîsîne. Ev jî tê xuyakirin ku Heyderî ne tenê di malikan de di bendan de jî serwaya navekî bi kar anîye.



Grafîk 8: *Teşeyên Nezmê yên bi Tesmî*

Piştî van daneyan em ê li ser şêweyên serwaya navekî ku Heyderî di helbestên xwe de bi kar anîye rawestin.

2.6.2.2.1. Şêweyên Tesmî de

Heyderî, ji teşeyên nezmê yên ku ji malikan pêk tên di 26 qesîde, sê xezel û qît'eyekê de şewazine cuda yên serwaya navekî bi kar anîye. Li jêrê em ê tabloya şêweyên serwaya navekî ya di malikan de bidin.

⁴¹⁴ Adak, "Aheng û Mûsîqî di Helbestên Melayê Cizîrî de", r. 54.

⁴¹⁵ Adak, *Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*, r. 546, 559, 575, 581.

Tablo 16: Şêweyên Serwaya Navekî di Teşeyên ji Malikan Pêk Tên

Şêweyên Serwaya Navekî yên di Dîwanê de	Cihê Wan di Dîwanê de	Hejmara Helbestan	Yekûn
Şêwe 1.	1, 5, 6, 7, 8, 13, 17, 19, 21, 25, 26, 28, 29, 30, 31, 32, 74	17	30
Şêwe 2.	2, 4, 16	3	
Şêwe 3.	9, 22, 23, 24, 27	5	
Şêwe 4.	79, 80	2	
Şêwe 5.	12, 14, 15	3	

Ji tabloya jor jî tê xuyakirin ku Heyderî di 30 helbestî de bi 5 şêweyan serwaya navekî bi kar aniye.

Şêwe 1:

Tefîleya duyem a misraya yekem + tefîleya çarem a misraya yekem + tefîleya duyem a misraya duyem

Heyderî di nav teşeyên ji malikan pêk tên herî zêde ev şêwe (şêwe 1) bi kar anîye. Di 17 helbestan de ku yek jê qit'e, sisê jê xezel û 13 jê jî qesîde ne ev şêwaz (şêwe 1) bi kar anîye.

Bo nimûne;

Wek dengê re'dê qîr **dida** / berq û burûska jê **veda**

'Aşîq kirin mîr û **geda** / perde ji ber qelba heland

(25/5)

Leb-şeker û awir-esed / şuhtî li min cerg û cesed

Şed ah û nalîn bê 'eded / ev rûh ji min ta bê cuda

(74/7)

Şêwe 2:

Tefîleya duyem a misraya yekem + tefîleya çarem a misraya yekem +
tefîleya duyem a misraya duyem + neqerat

Di helbestên rêza didu çar û 16an de ku her sê jî qesîde ne ev şêwe hatiye bikaranîn. Di vê şêweya tesmîtê de malika ewil muserre' e, di malikên din de di her du parçeyên misraya yekem û di parçeya yekem a misraya duyem de serwa heye lê di parçeya duyem a misraya duyem de neqerat li gorî serwaya muserre'ê ye.

Bo nimûne;

Dilo rabe meke teqşîr / **li min rehmê bike ya Reb**

Li vî 'umrî bike tedbîr / **li min rehmê bike ya Reb**

(2/1)

'Umir hat û bi lez bûrî/ bi nefsa xwe tû megrûr î

Ji ixlaşê gelek dûr î/ **li min rehmê bike ya Reb**

(2/2)

Ya Ilahî her dibêjim / **ya Resûlellah meded**

Bêkes û 'ebdal û gêj im / **ya Resûlellah meded**

(4/1)

Bêkes im ser wechê 'erqê / hatime ber deryê rewqê

Ez dexlî im min neberdê / **ya Resûlellah meded**

(4/2)

Şêwe 3:

Tefîleya duyem a misraya yekem + tefîleya duyem a misraya duyem

Ev şêweya tesmîtê di pênc qesîdeyan de hatiye bikaranîn.

Bo nimûne;

Hebîbulah emîrê **me** / celîsê textê Xezna ye

Şêrîn û gemrevînê **me** / xelîfê neclê seyda ye

(9/1)

Himetek ‘alî meqam **e** / qa‘idê textê Hemîd

Merhema qelbê zulam **e** / pehlewânê mu‘teber

(27/4)

Şêwe 4:

Misraya yekem: tefîleya yekem + tefîleya duyem + tefîleya sêyem + tefîleya çarem

Misraya duyem: tefîleya yekem + tefîleya duyem + tefîleya sêyem + tefîleya çarem

Ev şêweya (şêwe 4) tesmîtê di du xezelan de hatiye bikaranîn. Di vê şêwazê (şêwe 4) de ahenga helbestê bi serwaya navekî gihaştîye asteke bilindtir.

Şêx û şepal / naz û delal / ebrû-hilal / awir-gezal

Ey serwerî / ser-defterî / reng-esmerî / insanî tû

(79/2)

Her dem şêrîn / wek hingivîn / xweş kir birîn / gem pê revîn

Nefsa neyar / pê bûme har / şed car hewar / ya Xeznewî

(80/5)

Şêwe 5:

Di qesîdeyên rêza 12, 14, û 15an de şêwaza tesmîta nîvçe hatiye bikaranîn. Di vê şêwazê de di hin malikan de serwaya navekî heye û di hinekan de jî tune ye.

Helbesta 12em ji heft malikan pêk tê di sê malikên serî de tesmît heye lê di çar malikên dawî de tune ye.

Zîneta her dû zema**na** / şahibê feyzê Buxar

Ruhnî da qelbê nez**ana** / heykirî qelbê remîm

(12/2)

Murşidê me pir bi heybet kaşifê esrarê dil

Dafî'ê fîsq û fucûrê za'ilê bid'a zemîm

(12/4)

2.6.2.2.2. Şêweyên Tesmîtê di Bendan de

Heyderî, ji teşeyên nezmê yê ku ji bendan pêk tên de di pênc muxemmes; muselles, museddes, terkîbbend û tercî'bendeke de bi giştî di neh helbestan de tesmît bi kar anîye.

Tablo 17: Şêweyên Serwaya Navekî di Teşeyên ji Bendan Pêk Tê

Şêweyên Serwaya Navekî yê di Dîwanê de	Cihê Wan di Dîwanê de	Hejmara Helbestan	Yekûn
Di musellesê de	37	1	9
Di Muxemmesê de Şêwe 1.	42, 45, 52	3	
Di Muxemmesê de Şêwe 2.	53, 63	2	

Di Museddesê de	69	1	
Di Terkîbbendê de	33	1	
Di Tercî'endê de	34	1	

Heyderî di pênc teşeyan de bi şeş şêwazan serwaya navekî di musemmetan de bi kar anîye.

Di Musellesê de

Di dîwanê de muselleseke ji neh bendan pêk tê heye ku ji bilî serwaya bingehîn di tefîleya duyem a her misrayê de jî serwaya navekî heye.

Şukir lillah me dî **zahir** / terîqa Xeznewî şewq **da**

Ji nesla kamil û **ṭahir** / 'Ela'eddîn dibû pey**da**

Di vî qirnê me 'ê **axir** / di Islamê 'îlam hil**da**

(37/1)

Di Muxemmesê de

Şêwe 1:

Di dîwanê de di sê muxemmesan de benda ewil muserre' e, lê di bendên din de di her misraya pêncan de serwaya bingehîn heye. Di çar misrayên serî de di tefîleyên duyem de serwaya navekî heye.

'Eksê ḥusna te li dil **da** / ez dilê dîwane **me**

Ew cemalek mûm û finda / ez li ber perwane **me**

Şerbeta lêva ji qenda / tûṭiyê wîrane **me**

Wê cefa'ê bes bi min de / serxweş û sukrane **me**

Mest û gêj im xwîn dirêjim ez çî bêjim qîşsetê

(42/6)

Şêwe 2:

Di dîwanê de du muxemmesên bi tesmît hene ku ji muxemmesên din cuda ne. Ev muxemmesên ku di rêza 53 û 63yan de ne di her bendekê de serwaya bingehîn û di tefîleyên duyem ê hemû misrayan di çarçoveya serwaya navekî de hemserwa ne.

Şafiyê êşa qulûban / zulf û xalê 'enberî

Melce'ê nas û gerîban / wech û taca enwerî

Şerbeta cama hebîban / 'aşiqan lê muşterî

Cism û canê me reqîban / her li ber te bê serî

Serwerê cumle tebîban / ya tu Luqmanî 'eceb

(53/3)

Di Museddesê de

Di dîwanê de museddeseke bi tesmît heye ku di bendan de ji xeynî serwaya bingehîn di tefîleyên duyem ên hemû misrayan di çarçoveya serwaya navekî de hemserwa ne.

Serwerê feşal le'l şekir / nisbet li Xezna pir dikir

Nûra zulam perwane kir / bêhn li miskê zêde kir

Qelb diqasî yeğme kir / perda li ser dil pare kir

E'rab û şerh û me'ne kir / teftîş li qelba sar nekir

Şewtek ji berqê peydekir / erd û sema nalîn ketê

Meydan li xelqê zêde kir / Şed ah ji destê muhbetê

(69/5)

Di Terkîbbendê de

Di dîwanê de şewazek serwaya navekî di terkîbbendekê de heye. Di vê şewazê de, di her bendekê de tefîleyên duyem û çarem ê hemû misrayan û di tefîleyên duyem ên misrayên yekem û duyem ên wasiteyê de serwaya nevekî heye.

Lê tefîleyên çarem ên misrayên yekem û duyem ên wasiteyê di nava xwe de bi serwa ne ku serwaya bingehîn a helbestê saz dikin.

Xelqno bikin hemd û **şukir** / lewra Xudê dana xwe **kir**

Ku Xeznewî dergah **vekir** / hukmê 'Eladdîn taze **kir**

Hingî ku hat û zêde **kir** / l' halê feqîra mêze **kir**

Kî imtişal kir fayde **kir** / mehrûm nema ji nisbetê

Dînê mubîn eşkere **kir** / yek neqş û bid'e neketê

(33/1)

Di Tercî' bendê de

Di dîwanê de tercî' bendek heye ku bend û wasite ji du behrên erûzê yê cuda hatine çêkirin. Di hemû bendên helbestê de tefîleyên duyem û çarem ên hemû misrayan di nava xwe de hemserwa ne. Yanî di her bendekê de serwaya bingehîn û serwaya navekî yek in. Lê dîsa di dawîya her bendekê de nîvmisrayek heye ku bi benda ewil re hemserwa ye.

Şorgul di bağan **da tu wî** / şewqa di qelban **da tu wî**

Xêra di wechan **da tu wî** / min rûh bi heyran **da tu wî**

Serdarê usta **da tu wî** / perçek ji nûr pey **da tu wî**

'Ê ez kirim sew **da tu wî** / nisbet bi derman **da tu wî**

Tu ji me ra Luqmane'î

Ger dipirsî ez hezîn im dil-kesîr û nale **nal**

Bulbulê dilpare xwîn im şorgula min rûh li **bal**


Pirs bike carek li halê Heyderî goyîn miş **al**

(34/4)

2.6.3. Paşserwa (Redîf)

Paşserwa, ew dubarekirinên ji qertaf, bêje an kombêjeyan pêk tên û bi heman erk û wateyê piştî herfa rewîyê tên bikaranîn. Paşserwayên bêje yan kombêjeyî wateyekê didin helbestê û carinan jî aheng û yekîtiya mane û fikrê di helbestê de saz dikin.⁴¹⁶ Ji helbestên bi paşserwa re mureddef jî tê gotin.⁴¹⁷

Di dîwana Heyderî de her sê helbestên Erebi û helbesta 37an ne tê de ji 83 helbestan 56 jê bi paşserwa ne, yanî mureddef in û 27 jê jî bêpaşserwa ne ku tenê di wan de serwa hene.



Grafîk 9: *Bikaranîna Cureyên Paşserwayê di Teşeyên Helbestan de*

Her wekî di grafîkê de jî tê dîtin ji 56 helbestên mureddef hinek bi awayê qertafî ne, hinek bi awayê qertafî û bêje/kombêjeyî ne û hinek jê jî bi awayê bêjeyî an kombêjeyî ne. Paşserwa bi sê awayan li dawîya misrayan tên dubarekirin.

⁴¹⁶ Saraç, *Klasik Edebiyat Bilgisi Biçim-Ölçü-Kafiye*, r. 260.

⁴¹⁷ Dilçin, r. 70.

Em ê li jêrê listeya van her sê awayên paşserwayê bidin.

2.6.3.1. Paşserwayên Qertafî

Di dîwanê de heft qesîde, çar muxemmes, sê mustezad, du museddes; murebbe‘, texmîs, terkîbbend û tercî‘bendek bi tevahî 20 helbest paşserwayên wan di halê qertafî de ne.

Bo nimûne;

Ellah ji rehma bê hesab / yek piştemîrê dîn şiy**and**

Teşbîhê hîva bê hicab / şewqê li qelban da hel**and**

(25/1)

Di listeya jêrîn de paşserwayên di halê qertafî hatine rêzkirin:

-ye: 9	-ê: 55
-ê: 10	-ê: 59
-î: 23	-ê: 69
-and: 25	-ê: 72
-ê: 29	-ê: 73
-ê: 33	-im: 77
-ê: 35	-î: 81
-e: 38	-bî: 82
-ê: 42	-inî: 83
-î: 54	-(e)sin: 84

2.6.3.2. Paşserwayên Qertaf û Bêje/Kombêjeyî

Di dîwanê de paşserwayên 13 qesîde, şeş muxemmes, sê xezel, du museddes; teşîrek bi tevahî 25 helbest bi awayê qertaf û bêje an kombêjeyî bi paşserwa ne.

Bo nimûne;

Ke‘beya ھusn û cemalê der kenarê **Xeznewî**

Hem buhuşta îremê berqa beharê **Xeznewî**

Feđl û iھsana Xudê her dem bibarê **Xeznewî**

ھesreta xelqê bibînin mêrg û warê **Xeznewî**

ھemd ji Xudê ra textê şêra derdiyarê **Xeznewî**

(46/1)

Di lîsteya jêrîn de paşserwayên di halê qertaf û bêje/kombêjeyî hatine rêzkirin:

-im ey Xweda: 3

-a te bî: 31

-a Xeznewî: 6

-ê da: 32

-ê Xeznewî: 7

-ê min: 36

-ê Xeznewî: 8

-ê Xeznewî: 46

-ê/a me ye: 13

-ê weqtê: 47

-ê meded: 18

-ê Xeznewî: 63

-ê merqedê: 19

-ê birîndar: 65

-a tu wî: 20

-ê me ‘Ela’eddîn: 66

-ê Me‘sûm: 24

-im ya ‘Ela’eddîn: 67

-a ‘Ela’eddîn: 26

-ê Xeznewî: 68

-ê ‘Ebdulgenî: 30

-ê terîqê kelbêdergahê teme: 70

-ê dil: 76

-î tu: 79

-î tu: 78

2.6.3.3. Paşserwayên Bêje/Kombêjeyî

Di dîwanê de paşserwayên çar qesîde, pênc muxemmes û xezelek, bi giştî paşserwayên 10 helbestan bi awayê paşserwayên bêje an kombêjeyî ne.

Bo nimûne;

Şahê geyûr / *durru'l-buḥûr* / taca bi nûr / ev **Xeznewî**

Ê kû me dî / keskî nedî / bav û xwedî / wek **Xeznewî**

(80/1)

Di lîsteya jêrîn de paşserwayên di halê bêje/kombêjeyî hatine rêzkirin:

li min rehmê bike ya reb: 2

ya Resûlallah meded: 4

bi qurbana te bim Ehmed: 11

can fida me can fida: 16

Hezret û Seyda: 43

Seyda: 44

bi rûh yar in: 45

îrhem bi kuleybin leke ya nûre besîrî: 62

Xezna Neqşebend: 64

Xeznewî: 80

Wek encam, ji xeynî her sê helbestên Erebi û helbesta 37an (ji ber ku hemû bendên vê helbestê di nava xwe de hemserwa bûn û serwayeke bingehîn û hevpar

tune bû) ji 83 helbestên di dîwanê de di 56 helbestan de paşserwa heye. Di 27 helbestan de paşserwa tune ye. Ji van paşserwayan 53 bi Kurdî, didu bi Tirkî û yek jê jî bi Erebi ye. Dîsa ji wan 20 di halê qertafî, 25 di halê qertaf û bêje/kombêjeyî û 10 heb jî di halê bêje an kombêjeyî de ne.

Em ê li jêrê tabloya giştî li ser serwa û paşserwayan bidin. Tabloya 18em serwa û paşserwayên helbestan nîşan dide. Me di paşserwayên helbestên ji bandan pêk tên de misrayên wan ên hatine dubarekirin ku li ser serwaya bingehîn a helbestê saz bûne esas girtin. Me di tabloyê de cureyên serwayên mucerred, murdef û muqeyyed û paşserwa jî bi peyva muredefê nîşan da.

Tablo 18: *Cureyên Serwa û Paşserwayên Helbestan*

SERWA Û PAŞSERWAYÊN HELBESTAN			
Jimareya Helbestê	Cureya Serwa û Paşserwayê	Jimareya Helbestê	Cureya Serwa û Paşserwayê
1	Muqeyyed	43	Mucerreda bi Muredder
2	Muredder	44	Muredder
3	Murdefa bi Muredder	45	Muredder
4	Muredder	46	Murdefa bi Muredder
5	Murdef	47	Mucerreda bi Muredder
6	Mucerreda bi Muredder	48	Murdef
7	Mucerreda bi Muredder	49	Muqeyyed
8	Murdefa bi Muredder	50	Mucerred

9	Mucerreda bi Mureddef	51	Mucerred
10	Mucerreda bi Mureddef	52	Murdef
11	Mureddef	53	Mucerred
12	Murdef	54	Mucerreda bi Mureddef
13	Mureddef	55	Mucerreda bi Mureddef
14	Murdef	56	Murdef
15	Mucerred	57	Muqeyyed
16	Mureddef	58	Mucerred
17	Mucerred	59	Mucerreda bi Mureddef
18	Mucerreda bi Mureddef	60	Murdef
19	Murdefa bi Mureddef	61	Murdef
20	Murdefa bi Mureddef	62	Mureddef
21	Mucerred	63	Murdefa bi Mureddef
22	Mucerred	64	Mureddef
23	Murdefa bi Mureddef	65	Murdefa bi Mureddef
24	Mucerreda bi Mureddef	66	Murdefa bi Mureddef
25	Mureddef	67	Murdefa bi Mureddef
26	Murdefa bi Mureddef	68	Murdefa bi Mureddef

27	Mucerrred	69	Mucerrreda bi Mureddef
28	Murdef	70	Mureddef
29	Mucerrreda bi Mureddef	71	Murdef
30	Mucerrreda bi Mureddef	72	Mucerrreda bi Mureddef
31	Mureddef	73	Murdefa bi Mureddef
32	Mureddef	74	Muqeyyed
33	Mucerrreda bi Mureddef	75	Murdef
34	Murdef	76	Murdefa bi Mureddef
35	Mucerrreda bi Mureddef	77	Murdefa bi Mureddef
36	Mucerrreda bi Mureddef	78	Murdefa bi Mureddef
37	Hemû bend di nava xwe de serwa ne	79	Murdefa bi Mureddef
38	Murdefa bi Mureddef	80	Mureddef
39	Muqeyyed	81	Murdefa bi Mureddef
40	Mucerrred	82	Mucerrreda bi Mureddef
41	Mucerrred	83	Mureddef
42	Mucerrreda bi Mureddef	84	Murdefa bi Mureddef

Çawa ku ji tabloya jor jî tê xuyakirin ku di 16 helbestan de tenê paşserwa (mureddef) heye û di 27 helbestan de jî paşserwa tune. Ji cureyên serwayê jî di 31 helbestan de serwaya mucerrred, di 33 helbestan de serwaya murdef û di pênc helbestan de jî serwaya muqeyyed heye.

BEŞA SÊYEM

METNA REXNEYÎ YA DÎWANA HEYDERÎ

3.1. DANASÎNA DÎWANÊ Û NUSXEYÊN WÊ

3.1.1. Dîwana Heyderî

Edebiyata Kurdî ya klasîk bereksê edebiyata klasîk ya cîhanê û milletên rojhilatê yê dîtir di serdema modern de jî berdawam kiriye û di vê serdemê de gelek dîwanên ku bi şikl û usûla edebiyata klasîk in, derketine holê. Dîwana Heyderî jî yek ji wan dîwanan e ku di serdema modern de lê bi şiklê edebiyata klasîk hatiye nivîsîn. Helbestên Heyderî, di dema wî de belavbûyî bûne û dîwana wî nehatibû tertîbkirin lê di salên wî yê dawî de bi daxwaza wî, ji aliyê lawê wî Mela Diyardîn ve helbestên wî hatine berhevkirin. Piştî berhevkirinê, gelek ji wan di bin qontrola Heyderî jî derbas bûne. Helbestên wî, her çiqas di saxîya wî de hatibin berhevkirin û sererastkirin jî bi şiklê destxet mane. Li hin medreseyan li cem murîd û feqeyan an di qasetên teyban de bi deng, an di jibera wan de bi devkî, an jî wek nivîstekên belawela mane. Lê di sala 2012yan de bi amadekarîya lawê wî Mela Diyardîn, bi tîpên Kurdî-Erebî û bi şiklê matbû wek dîwan hatiye çapkirin. Lê tu helbestên wî bi tîpên Kurdî-Latînî nehatine çapkirin. Di vî warî de xebata me wê bibe yekem car ku dîwana Heyderî bi tîpên Kurdî-Latînî bê amadekirin.

3.1.2. Nusxeyên Dîwanê

Dîwana Heyderî, ji ber ku berî bê tertîbkirin helbestên wî li nava medrese, terîqet û murîdan belav bûne, gelek nusxeyên helbestan derketine holê. Ji van nusxeyan hinek jê destxet û hinek jê jî çapkirî ne. Hinek jê bi taybetî wek dîwanê hatine civandin, hinek jê jî wek çend helbestan di nava mecmû'e, kovar û hin pirtûkên li ser komkirina helbestên klasîk de cihê xwe girtine. Em ê jî di vê xebata xwe de li ser nusxeyên ku bi neyta dîwanek derkeve holê hatine kirin û hin pitûk û xebatên ku berbiçav in û helbestên Heyderî tê de hatine bicîkirin rawestin. Dîwana Heyderî, ji xeynî nusxeyên destxet û hin helbestên di nava hin xebatan de hatine weşandin, carekê weke dîwan jî bi tîpên Erebi bi şiklê matbû hatiye weşandin. Lê bi tîpên Latîni li tu cihan hê neweşîyaye. Me heta niha bi awayê dîwan sê nusxeyên destxet û nusxeyeke matbû dîtîn. Dîsa mecmûeyeke destxet ku gelek helbestên Heyderî tê de hene û du xebatên weşîyayî ku ji komkirina hin helbestên klasîk pêk tên û helbestên Heyderî jî tê de hene me tespît kirin. Me cih û rêza helbestên dîwanê di nusxeyan de jî bi tabloyekê nîşan da.⁴¹⁸ Em ê di danasîna nusxeyan de, nusxeyan bikin du alî: yek jê xebatên ku rasterast li ser dîwana Heyderî hatine amadekirin yan jî nivîsîn; ya duyem jî nusxeyên ku li ser helbestên klasîk wek mecmû'e, berhevok hatine amadekirin û di wan de cih dane hin helbestên Heyderî jî. Di danasîna nusxeyên destxet de me xebata gotara Abdurrahman Adak ji xwe re bingeş girt. Ji bo agahiyên berfireh bnr.⁴¹⁹

3.1.2.1. Helbestên Destxet ên Muellîf

Me ji ba Mela Diyadîn çar helbestên ku ji destxetên Heyderî bi xwe ne peyde kir. Me helbestên destxet bi şiklê fotoqopî li ser kaxeza A4ê bi dest xistin. Me ev çar perçeyên destxet bi navê “Helbestên destxet ên Muellîf” bi nav kir û ji bo di metna rexneyî de karê me hêsan be, me bi şiklê “HDM” kurt kir. Ev helbest cihê wan di metna me ya rexneyî de wiha ne;

⁴¹⁸ Bnr. (Pêvek 31: Cih û Rêza Helbestan di Nusxeyan de).

Tablo 19: Helbestên Heyderî Yên Destxet Di Metnê De

Hejmar	Cihê Wan di Metnê de	Risteya Helbestê ya Ewîl
1	1	Ya Ilahî tu Hêşîb î Şemed û Hêyy û Reqîb î
2	6	Şuḥbeta nav ins û cana
3	38	Dilo dunya beṭal e
4	46	Keʿbeya ḥusn û cemalê der kenarê Xeznewî

Me ji bo metna rexneyî helbestên di rêza 6 û 38an de destxeta Heyderî ji xwe re bingeh girt û me nusxeyên din da ber wê.

3.1.2.2. Nusxeya Mela Diyaînê Heyderî 1

Navê berhemê: Diwana Şêx Mihemed Emînê Heyderî.

Navê helbestvan: Mihemed Emînê Heyderî (Heyderî).

Teʿlîf, tercume, şerh: Teʿlîf.

Mustensîx: Mela Diyaîn Heyderî.

Diroka îstînsaxê: 1994.

Cihê îstînsaxê: Amed/Farqîn.

Awayê nusxeyê: Destxet.

Orjînal, fotoqotî: Fotoqopî.

⁴¹⁹ Abdurrahman, Adak “Analîzeke Kodîkolojîk Li Ser Leyla û Mecnûnên Sewadî, Bazîdî û Fûzûlî Di Koleksiyona A. Jaba Ya Destnivîsên Kurdî de”, **e-Şarkîyat Ilmî Araştırmalar Dergisi**, c.10, j. 3, r.1197-1222.

Zimanê nusxeyê: Kurdî (kurmancî).

Serbixwe - mecmû'e: Serbixwe.

Menzûm - mensûr: Menzûm.

Cureya xetê: Nesîh û rîka.

Hereke: Tuneye.

Besmele: Heye (di Serê berhemê de ye).

Sernavên helbestan: Tunene.

Hejmara helbestan: Hemû helbest bi hejmar in (bi hejmarên Erebî / Latînî ne).

Hejmara rûpelan: Hejmara rûpelan heye (bi hejmarên Latînî).

Pîvana rûpelan: Kaxeza A4.

Destpêka berhemê:

Ya Ilahî tu Hêşîb î / Şemed û Hêyy û Reqîb î

Tû Mu'înî û Mucîbî / ji te hêvî û rica ma

Dawîya berhemê:

Bûne dewran ew li piştê qeṭ nema fikr û xeyal

Bû re'îsê vê terîqê şahîbê 'ilm û kemal

Her çi bey'et kir bi teşdîq wî birî feyz û cemal

Tu bi heqqê merqedê kî me nekî mehrûmê ḥal

Heyderîzade feqîr e bê mecal û ḥal-xerab

Mustensîxê vê nusxeyê Mela Diyadîn lawê Şêx Mihemed Emîn e. Me ji cem Mela Sîrac Tarhan bi dest xist ku ew jî feqeyê Heyderî ye û niha jî li medreseya Heyderî ya li Qosera Mêrdînê muderîs e. Ev nusxe ji ber a orjînal hatiye qopîkirin. Nusxe piştîre bi qapaxek reş hatiye cildkirin. Rûpelên nusxeyê kaxeza A4 in, bi agahîya ku me ji Mela Diyadîn wergirtiye ya orjînal jî li ser kaxeza A4ê ye. Di destpêka nusxeyê de rûpela ewil bi Tîrkî navê dîwanê, navê amadekar û yê çap kiriye heye. Bi vî awayî ye: “Bereketli Şeyhi Seyda Eşşeyh Muhammed Emin El Heyderi (Kuddise Sirruh) Efendinin Divanı” piştîre “el yazma, tertip ve derleme Muhammed Diyaeddîn Çelik” û li alîyê rastê, jêra rûpelê jî “Hamit Bodakçı Silvan Diyarbakır” dinivîse. Piştîre Muhammed Diyadîn Çelîk, bi Tîrkî û bi nivîsa daktîloyê du rûpel kurtejiyana helbestvan û di rûpela piştî wê de jî rêbaza berhevkirina helbestan û daxwazkirina ji feqe û murîdan ku helbestên wekî din li derdora wan hebe bigihînin wan, heye.

Berhem, ji xeynî van agahîyên li jor me behs kirin pê ve nusxe bi besmeleyê dest pê dike û rûpelên wê ji vir û pê ve hatine hejmarkirin. Ji bo nusxeyê em dikarin li jêr van taybetmendîyan bidin.

- Li serê helbesta yekemîn, besmele heye.

- Ev nusxe bi giştî ji 75 helbestan pêk tê.

- Nusxe ji 106 rûpelan pêk tê. Hejmarên rûpelan li milê çepê yê jor û bi hejmarên Latînî hatine nivîsîn.

- Ji ber rûpelên 76 û 77an ji destxetê ketine helbestên ku di vê nusxeyê de di rêza 56an (helbesta 54) sê bendên serî hene lê yên dawî tunene. Dîsa helbesta di vê nusxeyê de bi rêza 57an (helbesta 20) bi temamî tune ye û ya di rêza 58an (helbesta 19) jî sê malikên serî tê de tunene.

- Helbesta 35an, di vê nusxeyê de 8 bendên serî, di rêza helbesta 67an de û 8 bendên dawî jî di rêza helbesta 29an de ne. Ev yek helbest e.

- Helbesta 13an, di vê nusxeyê de di du rêzan; 39 û 40ê de heye. Ev yek helbest e.

- Helbesta 27an ku di vê nusxeyê de di rêza 77an de ye tenê di vê nusxeyê de heye.

- Hejmarên helbestan; ji yekê heta 36an bi Erebi, ji 36an heta 55an bi Latîni, ji 56an heta dawîyê jî bi hejmarên Erebi hatine hejmarkirin.

- Li dawîya helbesta di rêza 51ê de “temet”; lê di dawîya hemû helbestên din “temem” hatiye nivîsîn.

- Du helbestên bi sernavê te‘şîr di navbera helbestên bi rêza 74 û 75an de hene ku tenê di vê nusxeyê de hene. Ev helbest her yek ji sê malikan pêk tên û wek qesîdeyên nîvçe ne. Helbesta ewil sê malik û bi Erebi ye. Helbesta duyem jî bi heman qeware (sê malik) naverok û mijarê ye lê zimanê wê Kurdî ye. Her du (helbestên rêza 3, 85an) helbest jî li ser kevîrê gora Heyderî hatine nivîsîn. Li gor agahîyên me ji malbatê wergirtin; ev her du helbest, li ser munacata (dua) Îbrahîm Ethemê mutesewif hatine nivîsîn.⁴²⁰

- Helbestên 38, 41, 43, 63, 76, 82 û helbestek a Erebi (helbesta 87an) di vê nusxeyê de tunene.

- Nusxe, di dawîya helbesta herî dawî de di nava kevanekê de bi nivîsa “Xetê Mela Mihemed Diyaeddîn” diqede.

Me ev nusxe bi navê “Nusxeya Mela Diyaeddîn Heyderî 1” bi nav kir û ji bo di metna rexneyê de karê me hêsan be, me bi şiklê “NMD1” kurt kir.

3.1.2.3. Nusxeya Mela Diyaeddîn Heyderî 2

Navê berhemê: Diwana Şêx Mihemed Emînê Heyderî.

Navê helbestvan: Şêx Mihemed Emînê Heyderî (Heyderî).

Te’lîf, tercume, şerh: Te’lîf.

Mustensîx: Mela Diyaeddîn Heyderî.

⁴²⁰ Bnr. (pêvek 30: *Munacata Îbrahîm Edhem*).

Diroka îstînsaxê: 1994 (lê piştî guherînê de hatine kirin).

Cihê îstînsaxê: Amed (Diyarbakir).

Awayê nusxeyê: Destxet.

Orjînal, fotoqotî: Fotoqopî.

Zimanê Nusxeyê: Kurdî (kurmancî).

Serbixwe - mecmû'e: Serbixwe.

Menzûm - mensûr: Menzûm.

Cureya xetê: Nesîh û rîka.

Hereke: Tuneye.

Besmele: Heye (di serê berhemê de ye).

Sernavên Helbestan: Tunene.

Hejmara helbestan: Hemû helbest bi hejmar in (bi hejmarên Erebî/Latînî ne).

Hejmara rûpelan: Hejmara rûpelan heye (bi hejmarên Latînî ne).

Pîvana rûpelan: Kaxeza A4.

Destpêka berhemê:

Ya Ilahî tu Hesîb î / Şemed û Heyy û Reqîb î

Tû Mu'înî û Mucîbî / ji te hêvî û rica ma

Dawîya berhemê:

Qebûl kir em çî bê xeyr in / hezar wek min gulamê te

Yesîrê qeyd û zencîr in / dibosim dest û dawê te

Li dergahê te qîtmîr in / Emîn bû xakê payê te

Ev nusxe me ji cem Mela Diyaînê Heyderî bi dest xist ku lawê Heyderî ye û niha jî li medreseya Heyderîyan a li Amedê muderîs e. Ev nusxe ji ber a orjînal hatiye qopîkirin. Çavkanîya vê qopîyê û NMD1ê yek e. Lê du cudahîyên berbiçav di navbera wan de hene: Yek jê ev nusxe heta rûpela 87an e û dewama helbestan tunene. Cudahîya duyem jî helbestên di vê nusxeyê de di gelek cihan de sererastkirin li ser wan çêbûne. Hin cih hatine derxistin ku bi awayê ser wan hatibin xêzkirin an jî xetkîrin. Di cihinan de jî bêje û hevokên ku hatine guhertin li derdora helbestan û cihên vala de peyv û hevokên nû hatine nivîsîn.⁴²¹ Me bi mustensîx Mela Diyaîn re piştrast kir ku ev guhertin û mudaxele ji alîyê bavê wî (helbestvan bi xwe) ve hatine kirin. Ji ber ku ev nusxe nusxeke destxet e û ya ji alîyê muellîf ve şiklê dawî lê hatiye dayîn, me jî di metna rexneyî de ev nusxe ji xwe re bingeş qebûl kir. Me ev nusxe dan ber hemû nusxeyan û cudahîyên wan di jêrenotan de nîşan da. Ji bo helbestên ku di vê nusxeyê de tunebûn jî me berê xwe da nusxeyên din.

Berhem, bi besmeleyê dest pê dike û rûpel ji vir û pê ve hatine hejmarkirin. Ji xwe qopîya li cem me bê kapax e. Ji bo nusxeyê em dikarin li jêr van taybetmendîyan bidin.

- Li serê helbesta yekemîn, besmele heye.

- Ev nusxe bi giştî ji 65 helbestan pêk tê.

- Nusxe ji 87 rûpelan pêk tê. Hejmarê rûpelan li milê çepê yê jor bi hejmarên Latînî hatine hejmarkirin.

- Di vê nusxeyê de helbestên di rêza 56 (helbesta 54), 57 (helbesta 20) û 58an (helbesta 19) ku di nusxeya “NMD1”ê de bi kêmanî ne di vê nusxeyê de bi awayê tam in.

- Helbesta 35an, di vê nusxeyê de di rêza helbesta 29an de 8 bendên dawî tenê hene.

⁴²¹ Bnr. (**Pêvek 17: Helbesta Rêza 54an ya Vê Xebatê ji NMD2yê**).

- Helbesta 13yan, di vê nusxeyê de di du rêzan; 39 û 40î de hene. Ev yek helbest e.

- Hejmarên helbestan; ji yekê heta 42yan bi Erebî, ji 43yan heta 53yan bi Latînî, ji 54an heta dawîyê jî bi hejmarên Erebî hatine hejmarkirin.

- Li dawîya helbestên di rêza 1, 3, 4, 5, 6 û 57an de “temet” lê li dawîya helbestên din de “temem” hatiye nivîsîn.

- Helbestên 38, 41, 43, 63, 76, 82 û helbestek a erebî (helbesta 87an) û helbestên NMD1ê yên ji rêza 65an pê ve di vê nusxeyê de tunene.

Me ev nusxe bi navê “Nusxeya Mela Diyadînê Heyderî 2” bi nav kir û ji bo di metna rexneyê de karê me hêsan be, me bi şiklê “NMD2” kurt kir.

3.1.2.4. Nusxeya Mela Diyadînê Heyderî 3

Navê berhemê: Diwana Şêx Mihemed Emînê Heyderî.

Navê helbestvan: Şêx Mihemed Emînê Heyderî (Heyderî).

Te’lîf, tercume, şerh: Te’lîf.

Mustensîx: Mela Diyadîn Heyderî.

Diroka îstînsaxê: Salên 90î.

Cihê îstînsaxê: Amed (Diyarbakir).

Awayê nusxeyê: Destxet.

Orjînal, fotoqotî: Fotoqopî.

Zimanê Nusxeyê: Kurdî (Kurmancî).

Serbixwe - mecmû’e: Serbixwe.

Menzûm - mensûr: Menzûm

Cureya xetê: Nesîh û rîka.

Hereke: Heye.

Besmele: Heye (Di Serê berhemê de).

Sernavên Helbestan: Tunene.

Hejmara helbestan: Hemû helbest bi hejmar in (bi hejmarên Erebi ne).

Hejmara rûpelan: Hejmara rûpelan heye (bi hejmarên Latîni û Erebi ne).

Pîvana rûpelan: Kaxeza A4.

Destpêka berhemê:

Ya Ilahî tu Hesenî / Şemed û Heyy û Reqîbî

Tû Mu'înî û Mucîbî / ji te hêvî û rica ma

Dawîya berhemê:

Nûrşînê çî xweş bû merkeza şehr û ciha ye

Ev 'ilm û edeb zîkr û huzûr tê de gihaye

'Ilmê Serhedapê bûye meşhûr ne 'ê neha ye

Feyza tê dirijê Heyderî Asî bavê Beha ye

Zanim bi yeqînî tu ji yumna Hezret û Seyda

Ev nusxe, me ji cem Mela Diyaîn Heyderî bi dest xist. Nivîsîn û rêzkirina vê nusxeyê ji nusxeyên; NMD1 û NMD2yê cuda ye. Nusxe, bi nivîseke gelekî xweş û bi hereke hatiye nivîsîn.

Ji bo nusxeyê em dikarin li jêr van taybetmendîyan bidin.

- Li serê helbesta yekemîn, besmele heye.

- Ev nusxe bi giştî ji 27 helbestan pêk tê. Lê helbasta di rêza 11an de ya Seydayê Mela Ehmedê Heyderî (bavê wî) ye. Me ev helbest nexist nava metna dîwanê.

- Nusxe bi nivîsek xweşik û hereke hatiye nivîsîn.

- Nusxe, ji 53 rûpelan pêk tê. Hejmarê rûpelan li milê çepê yê jor bi hejmarên Latînî û li jêrê jî di navbera rûpelê de bi hejmarên Erebî hatine hejmarkirin.

- Hemû helbest bi Erebî hatine hejmarkirin.

- Li dawîya hemû helbestan “temet” hatiye nivîsîn.

Me ev nusxe bi navê “Nusxeya Mela Diyaînê Heyderî 3” bi nav kir û ji bo di metna rexneyê de karê me hêsan be, me bi şiklê “NMD3” kurt kir.

3.1.2.5. Nusxeya Mela Diyaînê Heyderî ya Matbû

Destpêka berhemê:

Ya Ilahî tu Hesîb î / Şemed û Heyy û Reqîb î

Tû Mu‘înî û Mucîbî / ji te hêvî û rica ma

Dawîya berhemê:

Nûrşînê çi xweş bû merkeza şehr û ciha ye

Ev ‘ilm û edeb zîkr û huzûr tê de gihaye

‘Ilmê Serhedapê bûye meşhûr ne ‘ê neha ye

Feyza tê dirijê Heyderî Asî bavê Beha ye

Zanim bi yeqînî tu ji yumna Hezret û Seyda

Ev nusxe bi amadekarîya Mela Diyaînê Heyderî di sala 2012an di Weşanên Nûbiharê de çap bûye. Bi xetên matbû û Kurdî-Erebî hatiye çapkirin. Pirtûk bi navê “Dîwana Heyderî” çap bûye. Di pirtûkê de dîwan û munacata Seydayê Mela Ehmedê

Heyderî û Dîwana Şêx Mihemed Emînê Heyderî hene. Di serê pirtûkê de di derheqê jîyan û berhemên her du helbestvanan (bav û kur), bi tîpên Latînî û bi Kurdî Prof. Dr. Abdurrahman Adak û bi tirkî jî ya Mela Diyadîn Heyderî du nivîs hene. Lê dîwan bi tîpên matbû-Erebî û bi hereke hatiye nivîsîn. Di dîwana Heyderî ya vê nusxeya çapkirî de 83 helbest hene. Lê helbesta di rêza 14an de ya Seydayê Mela Ehmedê Heyderî (bavê wî) ye. Me ev nusxe, bi navê “Nusxeya Mela Diyadîn Heyderî ya Matbû” bi nav kir û ji bo di metna rexneyî de karê me hêsan be, me bi şîklê “NMDM” kurt kir.

3.1.3. Bêrhevokên ku Helbestên Heyderî tê de Hene

Ev nusxeyên ku em ê dibin vê sernavê de binasînin sê heb in ku helbestên Heyderî tê de cih girtine. Yek jê destxet e û yên din jî wek pitûk hatine çapkirin.

3.1.3.1. Mecmû‘eya Mela Evdilwehabê Cibilgrawî

Berhevkar: Mela Evdilwehabê Cibilgrawî.

Dîroka bidawîkirinê: 24ê Temmûza 1971.

Awayê nusxeyê: Destxet.

Orjînal, fotoqotî: Orjînal.

Zimanê Nusxeyê: Kurdî (kurmancî).

Serbixwe - mecmû‘e: Mecmû‘e.

Menzûm - mensûr: Menzûm.

Pîvana rûpelan: Dirêjahî 16 cm, frehî 10,5 cm.

Ev nusxe, me ji cem muderrîsê medresa Heyderîyan a Qosera Mêrdînê, Mela Sîrac Tarhan bi dest xist. Ev berhem, Mecmû‘e ye û ji alîyê Mela Evdilwehabê Cibilgrawî hatiye nivîsîn. Mela Evdilwehab, lawê Mela Birahîm e. Ji gundekî Omerîyan e ku bi ser Nisêbîna Mêrdînê ve ye. Li Nisêbînê jîyaye û niha rehmet kiriye. Mecmû‘eya wî deftereke biçuk e. Ji 101 rûpelî pêk tê. Rengê rûpelên wê zer

e, bergê wê sor e û pişta wê bi paçîkek reş hatiye dirûtin. Di rûpelên dawîn de hin duayên Erebi, fihrista helbestan û dîroka nivîsîna mecmû'eyê heye. Dîrok bi Latînî hatiye nivîsîn. Di her helbestê de di sernavê de navê helbestvan hatiye nivîsîn. Di mecmû'eyê de 45 helbestên, helbestvanên klasîk hene ku ji van helbestan 24 heb ên Heyderî ne. Du helbestên Hafîzê Şîrazî ku bi Farisî ne û helbesta Ebû Bekrê Sidîq (r.e.) ku li ser Hz. Muhammed nivîsîye û bi Erebi ye bi Kurdî di mecmûeyê de heye.

Helbestên di mecmû'eyê de wiha ne:

Mela Huseyn Engeç: 1

Mela Huseynê Hafîz: 2

Melayê Senceqî: 1

Muhyeddînê Hezanî: 1

Şêx Eladînê Xeznewî: 2

Şêx Evdîrehmanê Aqtepi: 1

Feqîyê Teyran: 2

Melayê Cizîrî: 2

Seydayê Mela Ehmedê Heyderî: 1

Şêx Mihemed Emînê Heyderî: 24

Hafîzê Şîrazî : 2

Ebû Bekrê Sidîq: 1

Mudîr: 1

Helbestên Helbestvanên wan nedîyar: 4

Me ev nusxe bi navê “Mecmû'eya Mela Evdilwehabê Cîbilgrawî” bi nav kir û ji bo di metna rexneyî de karê me hêsan be, me bi şîklê “MMEC” kurt kir. Girîngîya

vê nusxeyê ji bo me ew e ku me helbestek Heyderî ku di tu nusxeyan de tunebû û agahîya malbata Heyderîyan jî jê tunebû tesbît kir. Ev helbest mulemmê'êke bi sêzimanî ye (Erebî, Tirkî, Kurdî). Me ev helbest di metna rexneyî de di rêza 41ê de bi cih kir. ⁴²²

3.1.3.2. Dîwana Camî' ya Seydayê Ehmed Hilmîyê Koxî

Berhevkar: Seyda Ehmed Hilmîyê Koxîyê Diyarbekirî.

Navê berhevkirinê: Dîwana Camî'.

Diroka berhevkirinê: 1980-1990.

Diroka çapkirinê: 2004.

Awayê nusxeyê: Matbû.

Zimanê Nusxeyê: Kurdî (Kurmancî).

Menzûm - mensûr: Menzûm.

Dîwana camî' ji komkirina hin dîwan û gelek helbestên kalasîk yê helbestvanên cur bi cur pêk tê. Nivîskarê vê dîwanê, Seyda Ehmed Hilmîyê Koxîyê Diyarbekirî ye. Seyda Ehmed Hilmîyê Koxî di sala 1942yan li gundê Koxê yê bi ser Bismila Diyarbekirê ji dayik bûye. Navê bavê wî Mela Yusif e. Di zarokatî de xwendina xwe ya ewil li cem bavê xwe û piştê jî li gelek medreseyan ji bo perwerdehiya xwe geriyaye. Piştî qedandina perwerdehiyê, ewil li gundê xwe yê Koxê piştê jî li gelek cihan wezîfeya melatîyê kiriye. Di sala 1992yan teqawîd bûye û di sala 1996an jî rehmet kiriye. Seydayê Koxî, pêgirîyê terîqeta Neqşebendîyan bû.

Dîwana Seydayê Koxî dîwaneke ji sê dîwanan û zêdetirî sed helbestên klasîk ku civandiye ser hev pêk tê. Em dikarin bêjin berhevkarina dîwan û helbestan e. Di berhevokê de Dîwana Şêx Evdirrehmanê Aqtepî, Dîwana lawê wî Şêx Mihemed Kerbelayî, Dîwana Seyîd Eliyê Findikî û gelek helbestên helbestvanên wek; Şemseddînê Tebrîzî, Mewlana Camî, Hafîzê Şîrazî, Elîyê Herîrî, Melayê Cîzîrî,

⁴²² Bnr. (Pêvek 23: Helbesta Rêza 47an).

Feqîyê Teyran, Ehmedê Xanî, û gelek helbestvanên din hene. Seydayê Koxî, ev berhevkirin di navbera salên 1980-1990î de kiriye. Dîwana camî‘ bi xetên Seydayê Koxî çar sed û şêst rûpel in. Lê di jîyana xwe de ew çap nekiriye. Li dû wefata wî ji alîyê lawê wî Ebdulqudûs ve di sala 2004an li Amedê di Weşanên Îhsan de hatiye çapkirin. Navê “Dîwana Camî” ji alîyê lawê Seydayê Koxî hatiye lêkirin. Di sala 2017an li Makezanista Çand û Zimanê Kurdî ya Zanîngeha Muşê Alparslanê de ji alîyê Cewdet Karaman ve li ser Seydayê Ehmed Hilmîyê Koxî tezeke lîsansa bilind hatiye çêkirin.⁴²³

Di vê dîwanê de 4 helbestên Heyderî hene. Ev jî helbestên di rêza 8, 46, 47 û 70yî de ne. Me ev nusxe bi navê “Dîwana Camî‘ ya Seyda Ehmed Hilmîyê Koxî” bi nav kir û ji bo di metna rexneyî de karê me hêsan be, me bi şîklê “DCEHK” kurt kir.

3.1.3.3. Dîwana Camî‘a ya Mihemed Şêxmûs el-Botî en-Neqşebendî

Berhevkar: Mihemed Şêxmûs El-Bohtî El-Neqşebendî.

Navê Berhevkirinê: Dîwana Camî‘a (Lî be‘dî Qesaîdî Ehli‘l-Muhebbet).

Diroka çapê: 04.01.2014.

Awayê nusxeyê: Matbû.

Zimanê Nusxeyê: Kurdî (Kurmancî).

Menzûm - mensûr: Menzûm.

Ev pirtûk, bi navê “Dîwana Camî‘a” bi tîpên Kurdî-Erebî û bi awayê matbû di sala 2014yan bi awayekî cildkirî hatiye çapkirin. Derheqê çapxane û weşanxaneyê de tu agahî di pirtûkê de tune ne. Li ser bergê pêşî li jor bi tîpên Erebî û nivîsek girs “Dîwana Camî‘a Lî be‘dî Qesaîdî Ehli‘l-muhebbet” û li alîyê jêr jî “Cem‘eha Mihemed Şêxmûs El-Bohtî El-Neqşebendî” hatiye nivîsîn. Di berga paşîn jî helbesta Mola Camî hatiye dayîn. Di rûpela ewil de navê berhevkar bi vî awayî hatiye nivîsîn:

⁴²³ Cevdet Karaman, “Ehmed Hilmî El Koxî Ve Rehberê Sanî Şerha Eqîda Ehmedê Xanî Isimli Eseri”, (Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Muş Alparslan, Enstîtuya Zanistên Civakî, Mûş 2017).

Mihemed Şêxmûs bîn Mela Îbrahîm bîn Mela Mihemed Bohtî el-Zivingî en-Neqşebendî. Di rûpelên din de berhevkar, bi Erebî û Kurdî sebebê berhevkirinê bi kurtasî daye. Di vê dîwana komkirina helbestan de gelek helbestên helbestvanên klasîk hene ku hin ji wan ev in: Feqîyê Teyran, Ehmedê Xanî, Şêx Evdîrehman Aqtepî, Seyîd Elîyê Findikî û gelek helbestvanên din.

Di dîwanê de, 6 helbestên Heyderî jî tê de hene. Helbestên di metna me de yên bi rêza 6, 13, 47, 66, 70 û 73yan di vê pirtûkê de hene. Me ev nusxe bi navê “Dîwana Camî‘a ya Mihemed Şêxmûsê Bohtî yê Neqşebendî” bi nav kir û ji bo di metna rexneyî de karê me hêsan be, me bi şiklê “DCMŞB” kurt kir

3.2. RÊBAZA AMADEKIRINA METNA DÎWANÊ

Me di vê beşê de dîwana Şêx Mihemed Emînê Heyderî, bi hûrgulî û baldarî li gorî standartên navneteweyî yên edîsyon krîtîkê (metna rexneyî) amade kir. Em ê li jêrê di amadekirina metna dîwanê ya bi rexneyî de rêbaza ku hatiye şopandin xal bi xal li jêr bidin.

1) Di hemû nusxeyên dîwanê de kêmasî hebûn. Ji bo damezirandina metna dîwanê, nusxeke destxet a Mela Diyadînê Heyderî ku me bi navê “Nusxeya Mela Diyadîn 2” bi nav kiriye û helbestên wê dibin kontrola helbestvan de derbas bûne û hatine sererastkirin, ji bo metna rexneyî me ji xwe re bingeh qebûl kir. Ji bo helbestên ku di vê nusxeyê de tunebûn jî me ji nusxeyên din sûd wergirtin.

2) Piştî ku me metna dîwanê saz kir, me metna xwe bi hemû nusxeyan re muqayese kir û cudahîyên di navbera wan de di jêrenotan de nîşan da. Li gorî pêwistîyê me carinan peyvek an terkîbek, carinan jî misra yan jî tevahîya malik/bêndê nîşan da. Me her nusxeyekê li gorî şert û mercên wê bi nav kir û ji bo di muqayesekirinê de karê me hêsan be, me hemû nusxe bi hin tîpan kurt kirin. Kurtkirina nusxeyên me bi vî awayî ne:

- Helbestên Destxet ên Muellîf “HDM”

- Nusxeya Mela Diyadîn1 “NMD1”

- Nusxeya Mela Diyardîn 2 “NMD2”
- Nusxeya Mela Diyardîn 3 “NMD3”
- Nusxeya Mela Diyardîn ya Matbû “NMDM”
- Mecmû‘eya Evdîlwehabê Cibilgrawî “MMEC”
- Dîwana Camî‘ ya Mela Ehmed Hilmîyê Koxî “DCEHK”
- Dîwana Camî‘a ya Mihemed Şêxmûs El-Bohtî El-Neqşebendî “DCMŞB”

3) Du helbestên ku heta niha li tu deveran nehatine weşandin û qopîkirin me xist dîwanê. Yek jê helbesta ku di metna me de di rêza 76an de ye ku me ji ba Mela Diyardîn bi dest xistiye.⁴²⁴ Ya din jî helbesta di rêza 41ê de ye ku bi lêxebitîna nusxeya “MMEC”yê me tesbît kir û xiste dîwanê.

4) Di Latînîzekerina metna dîwanê de ji bo tîpên ku di elîfbêya Kurdî de cî nagirin, me li gorî elîfbêya transkrîpsîyona navneteweyî ya ku di metnên bi rexneyî yên zanistî de tê bikaranîn bi kar anî. Tîpên elfabeya transkrîpsiyonê ku me di metna xwe de bi kar anîye em ê li jêrê bidin.

Alfabeya Transkrîpsiyonê:

ء : ’

ث : S s

ح : H h

ذ : Z z

ص : Ş ş

ض : Ḍ ḍ, Ż ż

ط : Ṭ ṭ

⁴²⁴ Bnr. (Pêvek 24: Helbesta Rêza 36an ya Vê Xebatê).

ظ : Z z

ع : ‘

غ : Ğ ğ

5) Tu peyv û îzafeyên di dîwanê de li gorî zimanê îroyîn nehatine standartkirin. Peyv û îzafeyên di dîwanê de çawa hatibin bikaranîn, em wisa pê sadiq mane.

6) Ji ber ku çavkanîya hemû helbestan ne nusxeyeke, me hejmarên rûpelên di nusxeyan de nenivîsî.

7) Me hemû helbest li gorî tertîbkirina metna xwe bi hejmar kirin. Dîsa Me li pêşîya hemû malik û bendên helbestan hejmar danî da ku di analîzkirina helbestan de gengeşî dernekevin holê.

Bo nimûne di beyta jêrîn de reqema pêşî (74) ya helbestê, ya duduyan jî (7) ya malikê îşaret dike.

Leb-şeker û awir esed şuhtî li min cerg û cesed

Şed ah û nalîn bê ‘eded ev rûh ji min ta bê cuda

(74/7)

8) Me li jora helbestan, di nava kevaneka çargoşe de teşe û cureya nezmê ya helbestê nivîsî [Qesîde – Medhiye].

9) Hemû helbest li gorî kêşa erûzê hatine xwendin û qalib, behr û teqîtkirina kêşa erûzê li jora helbestê hatin nivîsîn.

10) Helbestvan, di 37 helbestan de di misrayekê de li du cîyan di du helbestan de jî li çar cîyan serwaya navekî çêkiriye. Çawa ku di malika jêrîn de tê dîtin me helbestên ku serwaya navekî di wan de hebûn bi îşareta slaşê (/) nîşan da.

Rû dêm gula / pir qabila / xweş kamila / dağ da dila

Şêrê xedeng / ev şewt û deng / hem herb û ceng / lem'anî tû

(79/7)

11) Di hin cihan de pêwîst bû îzaheta helbestê di jêrenotan de bi giştî bê dayîn. Di rewşên wiha de me numreya jêrenotê li ber hejmara helbestê danî û îzahet di jêrenotê de kir.

12) Ayet û hedîsên di metnê de derbas dibûn, me wan di metnê de bi awayê îtalîk nivîsî û di jêrenotan de vegotina wan kir.

13) Di dîwanê de carinan, îzafe û terkîbên zimanên; Erebi, Farisî û Tirkî tenê hatibûn nivîsandin û carinan jî tevahîya malik an jî bendan bi van zimanan bû. Me ev terkîbanan di nava metna xwe de bi nivîsa îtalîk nîşan kir û di jêrenotan de Kurdîya wan da.

14) Hinek bêje ji bo kêşa helbestê xera nebe kurt hatine nivîsîn. Me jî ev kurtkirina peyvên bi apostrofsê (') nîşan da. Bo nimûne: “Ya Ilahî me şiyar kî j’ cehl û tem’ û gefletê” (72/9), “Hingî ku hat û zêde kir l’ halê feqîra mêze kir” (33/1), “Murşid ji me r’ lazim e ku dil bi dewa bî” (82/4).

15) Di alfabeya Kurdî-Erebî ya klasîk de tîpa “و”ê hem dengê “û” hem jî dengê “o”yê dide. Me li gor konteksa peyvê yek jê hilbijart. Dîsa tîpa “ى”yê di cihinan de dengê “î”yê di cihinan de jî dengê “ê”yê dide. Me di vê herfê de jî li gorî konteksa ku hatiye bikaranîn yek jê hilbijart.

16) Çi di peyvên Erebi, çi di yên Kurdî de îşareta şeddeyê li ku hebû me ew bi dubarekirina heman tîpê nîşan da. Di hin nusxeyan de ev îşaret hebû di hin nusxeyan de pir kêmbûn. Me jî di peyvên Erebi de peyvên ku divê bi şedde bin, her çiqas di nusxeyan de nehatibûn nîşandan jî me li gorî pêwîstîya wezna helbestê ew peyv bi dengên dubare nîşan da. Tebeddul, sirr, şerr, heqqî, hubb, mutteqî, hummet û hwd.

17) Di dîwanê de; du helbestên bi Tirkî, sê helbestên bi Erebî û du mulemme' ku yek jê bi sê zimanan (Erebî, Tirkî, Kurdî) û yek jê jî bi çar zimanan (Erebî, Farisî, Tirkî, Kurdî) hene. Me helbestên mulemme' di nava metna xwe de, bi fonetîka ku şair nivîsîbû Latîniye kir û di jêrenotan de kurdîya wan da. Helbestên Tirkî û Erebî jî me li dawîya metnê yên Tirkî bi tîpên Kurdî-Latînî û yên Erebî jî bi tîpên Kurdî-Erebî da û di jêrenotan de jî Kurdîya wan da.

18) Ji ber ku di metnên Kurdî-Erebî de xalbendî nehatibûn bikaranîn, me jî di metna dîwanê de bi kar neanî.

19) Me serê her misrayê û serê her nav û nîşanên taybet bi tîpên mezin nîşan da: Xezna, Tilme'rûf, Mem û Zîn, Belqîs, Neqşebend, Eladîn û hwd.

20) Ji bo ku wezna helbestan, xera nebe me peyvên wek: rih, cihan, cîger, rû, şah û hwd. Li gorî îmlaya wan a metnê nivîsî. Wek: rûh, cihan, ciger/ceger, ru/ri, şeh û hwd.

21) Di terkîb, îzafe û sifetên Erebî de li şûna hemzeyê herfa te'rîf (` ) û di nava herfa te'rîfe û peyva duyem de jî xêzeka kurt (-) bi kar anî. Me di nava metnê de bi îtalîk da û di jêrenotan de jî maneya wan bi Kurdî da. Bo nimûne: *Eyni`l-heyat, Keşfi`l-kurûb, setri`l-`uyûb, meħwi`z-zunûb, fetħi`l-qulûb, îmami`l-mu`munîn* û hwd.

22) Di metnê de carinan ji bo ku wezn li hev bê, pi piranî jî di peyvên Farisî de hin peyv di nava xwe de hatine firehkirin. Me jî herfa "î"yê ya ku peyvan vedike, bi awayê îtalîk nîşan da. Dîsa "î"ya kurt, ku di eslê xwe de di bêjeyê de tune ye lê gava şair ji bo kêşa erûzê li hev bîne "î"ya kurt ya ferazî difikire yan jî ji xwe bi deng re derdikeve holê. Me jî ji bo tekûzkirina kêşeyê ev "î"ya ferazî, di cihên pêwîst de bi awayê îtalîkkiri bi kar anî: pirsî, keşfî, re'sî mal, billahî, mehrûmî, Derdimend, namîdar, derdiyâr, şehriyâr, tacîdar, şermîsar, çariyâr û hwd.

22) Di destxetên metnê dîwanê de hemze (` ) hem di bêjeyên Erebî û hem jî di yên Kurdî de hatine bikaranîn. Hemzeyên di bêjeyên Kurdî de bi armanca bê nava du dengdêran û erka herfên kelijandinê bi cih bîne, hatine bi karanîn. Me jî hemû hemzeyên di dîwanê de bi îşareta " ` " bi kar anî.

Mînak:

Ey dilbera dur-**cane'ê** / leb-şeker û **şîrane'ê**

Me' şûm heqîqet **zane'ê** / eşl û neseb **mîrane'ê**

Awir-xumar **şîrane'ê** / bo 'alemê **serkane'ê**

Xweş-'arifê **qelbane'ê** / meh-pare û **nûr-xane'ê**

(34/1)

22) Di metnê de li hin cihan pêwîst bû em mudaxeleyî metnê bikin ku hin dangan lê zêde bikin. Dengên ku ji alîyê me ve li metnê hatin zêdekirin me di nava kevaneka çargoşe ([]) de nivîsî.

Mînak:

Serrenî maqalehû Reb La teqnuţ min reḥmet[î]

Hilde perdê nûr ke derbê em bibînîn zehmet[î]

Töwbe qildim bendê her bîm hiç uzatmam qışşet[î]

Em feqîr in hem esîr in dil-kesîr in pîr keder

(41/5)

3.3. METNA REXNEYÎ YA DÎWANÊ

-1-

[Qit'e - Tewhîd]

fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilatun
Remel - + - - / - + - - / - + - - / - + - -

- 1 Ya Ilahî tû Hesîb î / Şemed û Heyy û Reqîb î
Tû Mu'în î û Mucîb î / ji te hêvî û rica ma
- 2 Ji te hêvî û umîd im / 'aşî yû keslan belîd im
La'iqê⁴²⁵ betşek şedîd im / rûreşê yewmî`l- qiyama⁴²⁶
- 3 Bî gunahê xwe dizanim / ji Te ve zahir 'eyan im
Tû⁴²⁷ 'efûkî ey Xudan im / me digel xaş û 'ewama
- 4 Bî gunahê şerr û xeşmê / tû li me zû nekî xeşmê
Kû li ummet bikî rehîmê / bide me 'efw û selama
- 5 Li 'uyûban tû Setarî / li zunûban tû Gefar î
Nekû cuz'ê ixtiyarî / bide me ah û nida ma
- 6 Ez li dunya'ê kesîr im / rûsiyah jar û feqîr im
Pir ze'îf im û heqîr im / xeste'ê dunya fena ma
- 7 Bî gem û derd û 'elîl im / bê dewa me dil-zelîl im⁴²⁸
Ya Ilahî tû delîl im / tûle û 'ebd û geda ma
- 8 Tûle û 'ebdek denî' im⁴²⁹ / Şani'ê fî'lê zemîm im
Rûreşê zenbê 'Ezîm im / sêfilê cewr û cefa ma
- 9 Sêfilê nefsa neyar im / dilkulê tîrê gedar im⁴³⁰
Dilbirîndar⁴³¹ û neçar im / dilxweşê 'efwa Xuda ma
- 10 Dilxweşêrehîma Rehîm e / padişahkî her qedîm e⁴³²
Rehîm û 'efwa wî 'Ezîm e / ji me ra qeşd û merama⁴³³

⁴²⁵ La'iqê] Layiqê NMDM.

⁴²⁶ Roja Qiyametê

⁴²⁷ Tu] Me HDM.

⁴²⁸ Bî gem û derd] Nexweş û jar / bê dewa me dil] dilbirîndar û MMEC.

⁴²⁹ denî'im] hezîn im MMEC.

⁴³⁰ dilkulê tîrê gedar im] ez bi vê nefse nikarim HDM.

⁴³¹ Dilbirîndar] Ez birîndar MMEC, Hem birîndar HDM.

⁴³² Dilxweşê] Hêviya HDM / her qedîm e] pir 'Ezîm e HDM, MMEC.

- 11 Ey Xuda tû b' Muştefa kî / bi rîza xwe tû me şa kî⁴³⁴
Heyderîzade dewa kî / hêviya 'efwa temama⁴³⁵

-2-

[Qesîde - Munacat]

mefa'îlun / mefa'îlun / mefa'îlun / mefa'îlun
Hezec + - - - / + - - - / + - - - / + - - -

- 1 Dilo rabe⁴³⁶ meke teqşîr / li min rehmê bike ya Reb
Li vî 'umrî bike tedbîr⁴³⁷ / li min rehmê bike ya Reb
- 2 'Umir hat û bi lez bûrî / bi nefsa xwe tû megrûr î
Ji ixlaşê gelek dûrî / li min rehmê bike ya Reb
- 3 Tû gelkî gafil î heyra / tû mehrûmê ji nav xêra
Ne pir maye ji qebrê ra / li min rehmê bike ya Reb
- 4 Heyat⁴³⁸ tev çû di dunya'ê / di bîra te mirin na'ê
Ecel tê şubhetê ba'ê / li min rehmê bike ya Reb
- 5 Ecel tê qet xwe kar nakî / hema rokê tu wê bar kî
Bi zarîn û bi nal nal kî / li min rehmê bike ya Reb
- 6 Bibînî zulmeta qebrê / 'ezab û agirê heşrê
Tu wê çawa bikî şebrê / li min rehmê bike ya Reb
- 7 Tu wê çawa cewaba xwe / bidî weqtê hisaba xwe
Muheyayer bî di de'wa xwe / li min rehmê bike ya Reb
- 8 Bes e heyra bike tewbê / xelaş kî xwe ji vê kerbê
Heya nakî ji vê 'eybê / li min rehmê bike ya Reb
- 9 Ji vê⁴³⁹ nefse birîndar im / çi 'aşîyê gunehkar im
Eman ez pir ricakar im / li min rehmê bike ya Reb
- 10 Ji te rehmek muyesser bî / feqîr carek muzeffar bî
Muhammed 'ewnê rehber bî / li min rehmê bike ya Reb

⁴³³ ji me ra qesd û meram a] ez di şubhê da nema ma HDM.

⁴³⁴ bi rîza xwe tû me şa kî] min û ummet tu şifa kî MMEC.

⁴³⁵ hêviya 'efwa temama] te şefî' yewmî'l-qiyama MMEC.

⁴³⁶ rabe] bêje NMDM.

⁴³⁷ Li vî 'umrî] Li 'umrê xwe NMDM.

⁴³⁸ Heyat] 'Umir NMDM.

⁴³⁹ Ji vê] Ji dest NMDM.

- 11 Şefa‘et bî ji me r’ mizgîn / ‘efû kî ummeta gemgîn
Digel Heyderiyê miskîn / li min rehmê bike ya Reb

-3-⁴⁴⁰

[Nezîre-Munacat]

fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilun
Remel - + - - / - + - - / - + - - / - + -

- 1 ‘Ebdek zelîl bê heyâ me pir le‘îm im ey Xuda
Ez dexîlê deryê Rebbê xwe yê Kerîm im ey Xuda
- 2 Pir gunahê min wekî behr û çiya ne ey Xuda
Poşîman im ez li ber ‘efwa Rehîm im ey Xuda
- 3 Min ji geyrî te nebîr secde j’ kesî ra ey Xuda
Hê j’ ewel da çav li îhsana qedîm im ey Xuda

-4-

[Qesîde – Ne‘t]

fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilun (fa‘ilatun)
Remel - + - - / - + - - / - + - - / - + -

- 1 Ya Ilahî her dibêjim / ya Resûlellah meded
Her şev û roja dibêjim / ya Resûlellah meded
- 2 Bêkes im ser wechê⁴⁴¹ ‘erdê / hatime ber deryê rewqê
Ez dexîl im min neberdê / ya Resûlellah meded
- 3 Ez dexîl⁴⁴² im bê mefer mam / nîne sewda lal û kerr mam
Dil tijî derd û keser mam / ya Resûlellah meded
- 4 Dil tijî derdê giran im / gafil im dûr im nezan im
Lê di zahir musliman im / ya Resûlellah meded
- 5 Ketme erda gurbetê da / mişlê hebşê⁴⁴³ mame tê da
Roj bi roj derdê me zêda / ya Resûlellah meded

⁴⁴⁰ Ev helbest Heyderî nezîre li ser munacata (dua) Îbrahîm Edhemê mutesewîf kiriye. Pêşî bi Erebi sê malik nezîre kiriye duvre jî ev her sê malik bi Kurdiya Kurmancî nivîsiye. Ev helbest tenê di nusxeya NMD1ê de heye. Weke sernav teşîr lê hatiye nivîsandin. Malbata wî ev nezîre li ser kevirê gora wî neqîşandine.

⁴⁴¹ Bêkes im ser wechê] Ez ji dor iqlîmê NMDM.

⁴⁴² dexîl] zelîl NMDM.

⁴⁴³ mişlê hebşê] ez j ite dûr NMDM.

- 6 'Eybê min pir bûne me'lûm / ê fedîkar ji we ez bûm⁴⁴⁴
Min nekî j' îmanê mehrûm / ya Resûlellah meded
- 7 Ez ji we mehrûm nemînîm / dil tijî derd û birîn im
Lê ji te pir hêvîdar im⁴⁴⁵ / ya Resûlellah meded
- 8 Pir gunehkar im dizar im / pir bi nalîn û hewar im
Her şev û roja hewar im / ya Resûlellah meded
- 9 Derdê min derdek gedar e⁴⁴⁶ / kerbê dil bûne hezar e⁴⁴⁷
Ez didim qîr û hewar e / ya Resûlellah meded
- 10 Ya Resûlellah tû zanî / min yeqînî bi te anî
Her tû dermanê dilanî / ya Resûlellah meded
- 11 Ez dexîlê rewde'ê me / nexweş im derman bidê me
Hêviya rehma Xwedê me / ya resûlellah meded
- 12 Tengezar im dîlkirî me / çav li rehma ber derî me⁴⁴⁸
Rûsiyah im **Heyderî** me / ya Resûlellah meded

-5-⁴⁴⁹

[Qesîde - Hîcwiye]

mustefî ilun / mustefî ilun / mustefî ilun / mustefî ilun
Recez - - + - / - - + - / - - + - / - - + -

- 1 Ey cîran û ehlê dunê /'ê kû li dîn guhdar bizan
Hûn guh bidin⁴⁵⁰ vê gotinê / dîn bû gerîb û bê guman
- 2 Dîn bû gerîb tergîb nema⁴⁵¹ / şerm û fedîbûn qet nema
Tîrsa ji Rebbê Heq nema / em ketne destê ê nezan⁴⁵²

⁴⁴⁴ ê fedîkar ji we ez bûm] ez dexîlê bavê Me'şûm NMDM.

⁴⁴⁵ Ez ji ber 'eyba hezîn im] Hem di dunya'ê hezîn im NMDM.

⁴⁴⁶ Derdê min derdek gedar e] Barê min barek giran e NMDM.

⁴⁴⁷ kerbê dil bûne hezar e] Geyrî te dergah nemane NMDM.

⁴⁴⁸ Tengezar im dîlkirî me / çav li rehma ber derî me] Çav li rehma ber derî me / ez dizanim pir genî me NMDM.

⁴⁴⁹ Ev helbest, di nusxeyên NMD1 û NMD3yê de ji 13 malikan û di NMD2 û NMDMyê de ji 11 malikan pêk tê. Ji ber ku nusxeya NMD2 nusxeya sererastkirina li ser a NMD1ê ye em ê metna NMD2yê esas bigirin û Her du beytên di NMD2 û NMDMê de tunene jî em ê li jêr nîşan bidin. Di NMD1 û NMD3yan de di raza malika 8 û 12em de ev her du malik hene:

8 Ez dê çi bêjim ey bira / dîn çû ji ber tem'a pera
Herkes didî we'z û sera / berdane zulm û ruşwetan

12 Ah û eman şahê zemîn / murşid sêxî şadiq emîn
Piştî me ye heqî'l-yeqîn / mewla û sêxê 'alî şan

⁴⁵⁰ Hûn bidin] Hûn bizanin NMDM.

⁴⁵¹ tergîb nema] te 'eyb nema NMD1.

- 3 Em ğafilê qebra reş in / li ser riya heq nameşin
Dil ‘aşiqê dunya geş in / dunya qebîh talî *yelan*⁴⁵³
- 4 Meyla li vê dunya xeyal / ev şeytan û nefis bûn heval
Me j’ destê wan nîne mecal / qet em xelaş nabin⁴⁵⁴ ji wan
- 5 Me j’ destê her sê dijmina / can û ciger dil şohtina
Ev şin‘et û karê mina / keslan û ğafil her zeman
- 6 Ev şin‘et û karê me ye / em ketne dest nefsa xwe ye
‘Umrê me çû bê fayde ye / dê em çikin tedbîr ji wan
- 7 Tedbîr ew e em seş bikin / tem‘a dunê em bes bikin
Xwe j’ destê nefse dûr bikin / bigrin riya van kamilan
- 8 Guh nadin we‘zê ‘alima / pirs ji ‘ilm û dîn nema
Her yek li dûv keyfa xwe ma / hem fitneya *axir-zeman*⁴⁵⁵
- 9 Fitna me insana geş e / serbestiya nefsa reş e
Tem‘a dunê pir pê xweş e / em man ji qismê ğafilan
- 10 Lê em ji dest vê şatîrê / bê murwetê dil kafirê
Êsirê van⁴⁵⁶ şûglê ne rê / heq ya Resûlellah eman
- 11 Şer‘ û heqî j’ nav me hilat / bê fayde çû ‘umr û xebat
Li **Heyderî** nîne tebat / ma haxirabê bargiran

-6-⁴⁵⁷

[Qesîde - Medhiye]

fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilun (fa‘ilatun)

Remel - + - - / - + - - / - + - - / - + -

- 1 Şuhbeta nav ins û cana / deng û firqa⁴⁵⁸ Xeznewî
Bû heyata qelb û cana / ‘eşq⁴⁵⁹ û zewqa Xeznewî
- 2 Herkesî⁴⁶⁰ jê dît hummet / ders û te‘lîm nûr û nisbet
Ev terîqa ‘ilm û şuhbet / tev bi nuşqa Xeznewî

⁴⁵² em ketne destê ê nezan] lew kente destê zaliman NMD1.

⁴⁵³ Derew, vir.

⁴⁵⁴ qet em xelaş nabin] daîm dikin zarîn NMD1.

⁴⁵⁵ Roja dinyê ya dawîn.

⁴⁵⁶ Êsirê van] Me daye dûv NMD2, NMDM.

⁴⁵⁷ Me di vê helbestê de nusxeya destnivîs ya Heyderî esas girt.

⁴⁵⁸ firqa] berqa MMEC.

⁴⁵⁹ ‘Eşq] ‘Îşq NMDM Şewq DCMŞB.

⁴⁶⁰ Herkesî] Pir kesa MMEC, DCMŞB.

- 3 'Eql û 'ilmê wî mukemmel / ders û adabê wî ekmel
Efdel û eqreb û eshel⁴⁶¹ / ev ٿerîqa Xeznewî
- 4 Ey bira wernê temaşa / serbilindê mîr û paşa
Xwedyê taca xwedyê şaşa / ketne gerqa Xeznewî
- 5 Xwedyê taca⁴⁶² çûn sulûka / ber derê şahê⁴⁶³ mulûka
Melhema⁴⁶⁴ qelbê çurûka / nûr û 'eşqa⁴⁶⁵ Xeznewî
- 6 Nûr û 'eşqa⁴⁶⁶ xwe bela kir / keşf û teftîşa dila kir
Bil-xuşûş fetha mela kir / 'ilm û şidqa Xeznewî
- 7 Şorgula şêx û mela yê / lew Xudê hummet didayê
Ins û cin anîne rayê / re'd û berqa Xeznewî
- 8 Xeznewî berqa buharî / çar ٿeref nisbet dibarî
Ruhnî daye qelbê ٿarî / şu'l û şewqa Xeznewî⁴⁶⁷
- 9 Serٿebîbê vî zemanî⁴⁶⁸ / lew bi êşa dil dizanî
Ê kû muhtacê îmanî / herne benqa Xeznewî
- 10 Ew kesê çû dît û dil da / wan rehet kir dil ji derda
Wan cih⁴⁶⁹ û warê xwe berda / çûne şewqa Xeznewî
- 11 **Heyderî** êsîrê⁴⁷⁰ wa ye / j' her hevala⁴⁷¹ kê mî dimaye
Lê ٿeta axir⁴⁷² wehaye / dil di xirqa Xeznewî

⁴⁶¹ eshel] ekmel NMD1, NMD2.

⁴⁶² taca] şaşa MMEC.

⁴⁶³ şahê] taca NMD1, NMD2, mîrê MMEC, DCMŞB.

⁴⁶⁴ Melhema] Merhema NMD1, NMD2, M.

⁴⁶⁵ 'eşqa] şewqa MMEC.

⁴⁶⁶ 'eşqa] şewqa MMEC.

⁴⁶⁷ şu'l û şewqa Xeznewî] Ğerb û şewqa Xiznewî MMEC.

⁴⁶⁸ vî zemanî] ins û canî M, DCMŞB.

⁴⁶⁹ cih] ciy NMDM, NMD3.

⁴⁷⁰ êsîrê] mecnûnê MMEC, yexsîrê DCMŞB.

⁴⁷¹ Ji her hevala] Her ji hevala NMD1, NMD2.

⁴⁷² axir] şag bî DCMŞB.

[Qesîde - Medhiye]

mefa'îlun / mefa'îlun / mefa'îlun / mefa'îlun
Hezec + - - - / + - - - / + - - - / + - - -

- 1 Gelo kê dî di iqlîma / muhebbet wek cihê Xezna
Bi adab û bi te'lîma / bi mişlê agehê Xezna
- 2 Qudûma wî mubarek bû / di irşadê de bê şek bû
Di vê qirnê de ew yek bû / bi 'ilmê efqehê Xezna
- 3 Di⁴⁷³ sirra me'newî her dem / munewwer kir benî adem
Wucûda vî şehê 'alem / di deryê dergehê Xezna⁴⁷⁴
- 4 Munewwer kir bi ixlaşê / xelaş bûn pê gelek 'aşî
Muzeyyen kir dilê qaşê / bi nûra bingehe Xezna
- 5 Ji 'eqla ra çi 'ibret ma⁴⁷⁵ / ji 'aşiq ra helawet ma
Ji xelqê ra çi hesret ma / sera û pêgehê Xezna
- 6 Mukemmeltir şerî'et bû / bi irşadê heqîqet bû
Yeqîn pîrê terîqet bû / kubar û rewde 'ê Xezna
- 7 Yeqîn⁴⁷⁶ ev Şahê Xezna'ê / Xudê himmet gelek dayê
Çi ni'met hate dunya'ê / diyar û dergehê Xezna
- 8 Çi ni'met bû di weqtê da / mucedded bû di 'eşrê da
Çi şêrîn bû di husnê da / bi qurbana Şehê Xezna
- 9 Bi qurbana te bim her dem / evê 'ebdal sekê ebkem⁴⁷⁷
Emînê Heyderî pir gem / yetîmê ber derê Xezna

⁴⁷³ Di] Bi NMD3, NMDM.

⁴⁷⁴ di deryê dergehê Xizna] helawet da rehê Xizna NMDM.

⁴⁷⁵ 'eqla ra çi] pir 'eqla re NMD1.

⁴⁷⁶ Yeqîn] Bizane NMD1.

⁴⁷⁷ Bi qurbana te bim] Heyata min tu wî / evê 'ebdal sekê] sekê miskîn evê ebkem NMD3, NMDM.

[Qesîde - Medhiye]

mustefî ilun / mustefî ilun / mustefî ilun / mustefî ilun
Recez - - + - / - - + - / - - + - / - - + -

- 1 Ellah nêgehdarê te bî / ey tacidarê Xeznewî
Perwerdiger yarê te bî / ey şehriyarê Xeznewî
- 2 Ey dilbera şu'la beşer / her dem şêrîn û durxeber
Ruh im fida le'le şeker / şehde bibarê Xeznewî
- 3 Rûh û heyata min fida / sîma'ê nûrîn Ehmêda
Xurşîd di warê şu'le da / dar û diyarê Xeznewî
- 4 Xurşîd e dêma enwerî⁴⁷⁹ / xala li dorê muşterî
Emlak û insan û perî / bûn tewbedarê Xeznewî
- 5 Xal-muşterî dêm-enwerî / meh-ţel'etê⁴⁸⁰ bûy 'enberî
Peyğam⁴⁸¹ ji durra rehberî / nûrîn 'izarê Xeznewî
- 6 'Enber fida'ê kakilan / xeddeyn ji rengê şorgulan
Dağa⁴⁸² di qelbê bulbulan / awîr-xumarê Xeznewî
- 7 Zanim tû⁴⁸³ quţbê es'edî / çeşman⁴⁸⁴ di iqlîman nedî
Ey can feyaqê sermedî / da şehsuwarê Xeznewî
- 8 Bû quţbê ğewşê cayegîr / berdan ji qewsan çende tîr
Bê dil kirin mîr û feqîr⁴⁸⁵ / ev renginekarê Xeznewî
- 9 Cûtek di direxşanê⁴⁸⁶ sefîd / şandin wekî pêt û perîd
Anîn ji eţrafa murîd / re'd û biharê Xeznewî
(Anîn ji Şengalê Yezîd / berqa buharê Xeznewî)⁴⁸⁷

⁴⁷⁸ Ev helbest, esil ya bavê Mihemed Emînê Heyderî, Mela Ehmedê Heyderî ye. Lê bavê wî nexistiye nava dîwana xwe. Lawê wî Mihemed Emînê Heyderî çar malik li helbestê zêde kiriye û xistiye dîwana xwe. Ev agahî di xebata teza lîsansa bilind a Önder Beyter de hatine dayîn. Me ev agahî bi malbata Heyderî re jî piştrast kir. Ev helbesta hevpar di NMD1, NMD2, NMD3, NMDM û MMECyê de heye. Em ê NMD2yê ji xwe re bingeh bigrin.

⁴⁷⁹ Xurşîd e dêma enwerî] Xurşîd di dêma enwerî NMDM.

⁴⁸⁰ Meh-ţel'etê] ev her du peyv di DCEHKyê de tune ye.

⁴⁸¹ Peyğam] Peyam NMD1.

⁴⁸² Dağa] Da'im DCEHK.

⁴⁸³ Zanim tû] Manendê NMD1, Ma şod DCEHK.

⁴⁸⁴ çeşman] çeşma 'NMDM.

⁴⁸⁵ feqîr] wezîr DCEHK.

⁴⁸⁶ direxşanê] di ruxsarê NMDM.

⁴⁸⁷ Ev misra di NMD1, NMD2, NMD3yê heye lê di NMDMyê de di jêrenotê de wiha hatiye nivîsandin: "Ev malik di nusxeyekê de wiha ye: (Anîn ji Şengalê Yezîd berqa buharê Xiznewî)".

- 10 Anîne rayê ins û can / murşid bi derbê şewlecan
Kamil kirin qismê nezan / şahê tebarê Xeznewî
- 11 Ev nav û dengê bê riya / ‘ilm û terîqa şofiya
Nuqtek ji Nûrşîna Zîya / daket کنارê Xeznewî
- 12 Ilahî hindî talibîn / mesrûr bike wan salimîn
Elhêmdulillah xasidîn / bûn şermisarê Xeznewî
- 13 Ez qenc dizanim serwerî / meqbûl û meqşûd dilberî
Kemter gulam e **Heyderî** / dil tar û marê Xeznewî
- 14 Dil tar û marê Ehmed im / bê şek ji herkes ez bed im
Tûlê li dora merqed im / min bê qerarê geydewî⁴⁸⁸
- 15 Tûlê⁴⁸⁹ li Hîzanê ez im / kelbê derê zanê ez im
Ê tim⁴⁹⁰ di zîndanê ez im / min hêvîdarê Xeznewî
- 16 Xwezyam’ bidîta⁴⁹¹ ey emîr / nûra te ya bedra munîr
Me’zûr bidêrin min feqîr / min bê qerarê Xeznewî
- 17 Zanim tû şeyxek rehberî / kubar û şêrîn esmerî
Ey rûh û canê **Heyderî** / ma dil di narê Xeznewî

-9-⁴⁹²

[Qesîde - Medhiye]

mefa ‘îlun / mefa ‘îlun / mefa ‘îlun / mefa ‘îlun
Hezec + - - - / + - - - / + - - - / + - - -

- 1 Hêbîbulah emîrê me / celîsê textê Xezna ye
Şêrîn û gemrevînê me / xelîfê neclê seyda ye
- 2 Gêwaz û qulzena şidqê / emîr û şahê Xezna’ê
Ji destê muhbet û ‘îşqê / me ne ‘eql û ne sewda ye
- 3 Selîmî b’ fi ‘l û eqwala / muğîş û destegîrê me
Di behşa keşf û ehwala⁴⁹³ / re’îsê ehlê erda ye

⁴⁸⁸ Ev misra di NMD1ê de de li binê malikê de di nava kevanekê de wiha hatiye nivîsandin: (Tûlê li dora merqed im gewsê kubarê geydewî), di DCEHKyê de jî wisa ye: Tûlê li dora merqed im gewsê kubarê Xiznewî.

⁴⁸⁹ Tûlê] Kolê DCEHK.

⁴⁹⁰ tim] rûh DCEHK.

⁴⁹¹ bidîta] bibînîm DCEHK.

⁴⁹² Ev helbest, di NMD1 û NMDMyê de heye. Ji ber hin malikên helbesta di NMD1ê de kêma bûn me NMDMyê ji xwe re bingeş girt.

⁴⁹³ keşf û ehwala] weşl û ehwalan NMD1.

- 4 Muferrehdarê miskîna / re'îsê cinn û insana
Tebîbê qelbê gëmgîna / hekîmek mişlê Luqma ye
- 5 Xezîna hikmet û 'ilmê / xelîfê Şahê Nûrşînê
Hilanî perdeya zûlmê / keşîfdarê murîda ye
- 6 Di behsa keşf û esrara / 'eca'îb û himet heybet
Gerîb e ey gelî yara / neşîbê me Xwedê daye
- 7 Neşîbê me Xwedê îcad / kirî der erda Xezna'ê
Heqîqî murşid û ustad / emîrê berr û behra ye
- 8 Bi rehîm û şewqet û ulfet / bi exlaqê hesen da'im
Bela kir çar teref nisbet / li Xezna'ê qedem daye
- 9 Bi wê husna xwe yî sade / li etrafa vebû şu'le
Fida bû **Heyderîzade** / çiqas bêjim tû hêja ye

-10-

[Qesîde - Medhiye]

fe'îlatun / fe'îlatun / fe'îlatun / fe'îlun
Remel + + - - / + + - - / + + - - / + + -

- 1 Hemdulillah ebedî her me ji wê xweş beşerê
Lazim e secde bibin xweş bikin derd û keserê
- 2 Ferehî yû şahiyê çûn Şehê Xezna'ê me dît
Me di dilda heye dîtin gerçi bu'da seferê
- 3 Gerçi em ne la'îqin bose bikin dest û piya
Keremkarê Rebê⁴⁹⁴ me dûr bin ji nar û seqerê
- 4 Ey Şehê Xezna meded qelbê me tev bûne birîn
Ka⁴⁹⁵ tebîbê mişlê te dêm sorgula leb şekerê
- 5 Ev leb û le'lê şeker wechê bi heybet û şerîn
Qamet û şiklê me dî zêde ji şewqa fenerê
- 6 Awirê heybet-esedê rûh û canê me bi qurban
Xişlet û teb'et melek lew tu bi şiklê beşerê
- 7 Edeb û hîlm û kerem û nezera merhema can
Rûhê şerîn me firot ah me ji re'na nezêrê

⁴⁹⁴ Keremkarê Rebê] Keremkar e Rebbê NMDM.

⁴⁹⁵ Ka] Kanî NMD1.

- 8 Lew me ji remz û nezer qet em ji xo bê xeber in
Kû cemala eniyê zêde ji husna qemerê
- 9 Şahê Xezna yeqîn⁴⁹⁶ ke'be ye ger hûn yeqîn in
Me li wî meylek heye geh bi şev û geh seherê
- 10 Me ji wê meyla wişalê dil tijî dag û keser in
Nefsa geddar dijmin e nadê me qet yek meferê⁴⁹⁷
- 11 Zari yû efganê dil tene ji ber dagê birîn
Hem dil fena bûme ez mame di fikr û xeterê
- 12 Ahi yû derd û geman ev dil ji xu kirne hedef
Me nema şebr û sukûn qet ta bi rojê heşerê
- 13 Hêvi yû telbe dikim nezerek bê ji şehê min
Heyderîzade Emîn bûye sekê axa derê

-11-

[Qesîde - Medhiye]

mefa'îlun / mefa'îlun / mefa'îlun / mefa'îlun
Hezec + - - - / + - - - / + - - - / + - - -

- 1 Bi roj û şev di fikra min di zîkrê da dibêm Ehemmed
Tu wî wens û hedana min bi qurbana te bim Ehemmed
- 2 Bi husna Yûsufê Ken'an di 'îşqê dilber û mehbûb
Bi himmet gewşê min her an bi qurbana te bim Ehemmed
- 3 Bi te fexrê dikim her dem di weşfê de muheyayer mam
Nekû carek her û şed car bi qurbana te bim Ehemmed
- 4 Ji ewwel da me dil da te heta bimrim bi vê 'ehdê
Neda dil min ji te pê ve bi qurbana te bim Ehemmed
- 5 Me 'ehd e kû nekin terka hebîb û çav-gezalê xo
Li dergahê te bim tûle bi qurbana te bim Ehemmed
- 6 Li dergahê te şed begler emîr û 'alim û zahid
Bi meqşûdî telebdar im bi qurbana te bim Ehemmed
- 7 Dixwazim kû bi gulzarî cemala te muşerref bim
Tû wî bagê heyata min bi qurbana te bim Ehemmed

⁴⁹⁶ Yeqîn] li qulûba] NMDM.

⁴⁹⁷ qet yek meferê] qet meferê NMD1.

- 8 Tu wî Seyda tu wî ustađ tu wî mewla tû pîrê me
Re'îsê şêx⁴⁹⁸ û ustada bi qurbana te bim Eħmed
- 9 Me zanî tû di 'eql û 'ilm û irşadê gelek kamil
Dî beħşa keşf û eħwala bi qurbana te bim Eħmed
- 10 Bi roj û şev heta şağ bim di 'işq û keyfê dersê da
Ev e dersa me bê çara bi qurbana te bim Eħmed
- 11 Tu wî ġewşê zemanê me tu wî rewşa cihan Eħmed
Te ruhî da gelek qelba bi qurbana te bim Eħmed
- 12 Belê ez bûm dexîlê merqedeynê Ĥezret û Seyda
Bi dîna te muşerref bim bi qurbana te bim Eħmed⁴⁹⁹
- 13 Li dergahê derê zana yesîrê **Ĥeyderî** bende
Dexîl û poşiman im ez bi qurbana te bim Eħmed

-12-

[Qesîde - Medhiye]

fa'îlatun /fa'îlatun /fa'îlatun / fa'îlun
Remel - + - - / - + - - / - + - - / - + -

- 1 Rewşena çeşmê emîra / la'iqê⁵⁰⁰ rutba 'ezîm
Melce'ê mîr û feqîra / padişahê pir helîm
- 2 Zîmeta her dû zemana / şahîbê feyzê Buxar
Ruhî da qelbê nezana⁵⁰¹ / heykîrî qelbê remîm
- 3 Kes bi merdî nabi wek wî / malîkê kenza xefî
Ĥilmê cûda Xeznewî / zêde ji heddê ey nedîm⁵⁰²
- 4 Murşidê me pir bi heybet kaşîfê esrarê dil
Dafî'ê fîsq û fucûrê za'ilê bid'a zemîm⁵⁰³
- 5 Himeta wî tê j' Medînê ta bi Nûrşîna Žiya
Nisbeta bavê 'Eladdîn şerq û ġerb girtî 'emîm

⁴⁹⁸ şêx] qutb NMDM.

⁴⁹⁹ Dî NMD3 û NMDMyê de ji bo vê risteyê di nava kevanekê de ev heye: Qebûl kir min 'Ela'eddîn bi qurbana te bim Eħmed.

⁵⁰⁰ la'iqê] layiqê NMDM.

⁵⁰¹ Ruhî da qelbê nezana] Rehberê zan û nezana NMDM.

⁵⁰² Ev malîk di NMD1ê de heye lê di NMDMyê de tune ye.

⁵⁰³ zemîm] 'emîm NMDM.

- 6 Bê hesab hemd û şenalillah me dî wechê kerîm
Pir şêrîn e gemrevîn e dilselîm û musteqîm
- 7 Kes nizanî⁵⁰⁴ qîmetê vî murşidê axir zeman
Heyderî tûlê li derê Xeznewî şêxê 'ezîm

-13-⁵⁰⁵

[Qeside - Medhiye]

fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilun (fa'ilatun)
Remel - + - - / - + - - / - + - - / - + -

- 1 El-meded⁵⁰⁶ quṭbê zemanî / rewşena bagê me ye
Rûzeqa rû wê cihanî⁵⁰⁷/ mesneda pişta me ye
- 2 Xeznewî⁵⁰⁸ teb'et helîm e / der terîqa musteqîm⁵⁰⁹ e
Bo qulûba⁵¹⁰ pir hekîm e / şafiyê derdê me ye
- 3 Şafiyê derd û birîna / 'afiyê medhûş û dîna
Melce'ê⁵¹¹ cumle hezîna / mehdîyê dewra me ye
- 4 Mehdiyê îhsan tamam e / esmerê şorgul gulam e
Hem 'efîf 'alî meqam e/ efḍelê weqta me ye⁵¹²
- 5 Pir 'efîf deryê murad e⁵¹³/ hem nefîs e nûr e şade
Şa'nê wî herbê cihad e/ hamîyê⁵¹⁴ dînê me ye
- 6 Şa'nê wî pir kûr û dûr e / luṭf û nisbet feyz û nûr e
Qedd û qamet bê quşûr e / her ji weşfan zêde ye
- 7 Medh û ewşafê kemalê / menbe'a⁵¹⁵ ḥusn û cemalê
Merhema qelba li balê / kirye Xezna xizne ye

⁵⁰⁴ Kes nizanî] Pir nizanin NMDM.

⁵⁰⁵ Ev helbest, di NMD1, NMD2 û NMDMyê de heye. Di NMD1 û NMD2yê de helbest di rêzên 39an de moda mod wek hev e. Lê di her du nusxeyan de jî helbesta bi rêza 40î de jî wersiyoneke din a vê helbestê heye. Lewra em ê helbesta 39an a NMD1ê ji xwe re bingeh bigirin û cudahîyên di NMD1 helbesta 40î, NMD2 helbesta 40î û NMDMyê de jî bi jêrenotan nîşan bidin.

⁵⁰⁶ El-meded] Îro hat NMDM, Şehsuwar quṭbê zemanî DCMŞB.

⁵⁰⁷ Rûzeqa ruwê cihanî] Xwendekarê şahê şanî NMD1 û NMD2 (helbesta 40î), DCMŞB.

⁵⁰⁸ Xiznewî] Xwendekar NMD, NMD2 (helbesta 39an).

⁵⁰⁹ der terîqa musteqîm] der terîqa muqîm NMD1 û NMD2 (helbesta 40î), xaliş e j' 'eyba selîm e DCMŞB.

⁵¹⁰ qulûba] mirîda NMD1 û NMD2 (helbesta 40î).

⁵¹¹ Melce'ê] Kafiyê NMD1 û NMD2 (helbesta 40î), DCMŞB.

⁵¹² Nazikê şêrîn meqam e efḍelê ekberê me ye NMD1 û NMD2 (helbesta 40î), Hem 'efîf 'alî meqam e ekberê weqta me ye DCMŞB.

⁵¹³ 'efîf e xanezad e] 'efîf deryê murad e NMD1 û NMD2 (helbesta 40î), NMDM.

⁵¹⁴ hamîyê] hafîzê NMD1 û NMD2 (helbesta 40î), DCMŞB.

⁵¹⁵ menbe'a] meğzena DCMŞB.

- 8 Rû⁵¹⁶ ji husna mişlê bedrê / afitab e ew di 'eşrê⁵¹⁷
Mahitab e roja heşrê/ nûr û çeşmeynê me ye
- 9 Zînet û nûra bilad î / murşidê qelbê 'ibad î⁵¹⁸
Muhibeta wî dil helandî / quṭb û ustaḍê me ye
- 10 Muhibeta⁵¹⁹ wî merhema dil / şuḥbeta⁵²⁰ wî rehîmê nazil
Dîtina wî quṭbê kamil⁵²¹ / bo me hecc û 'umre ye
- 11 Şahê Xezna hey hewar e / min sekê dil tar û mar e
Heyderî şubḥ û êvar e / çav li dergahê te ye⁵²²
- 12 Ez dibêjim⁵²³ hey hewar e / her zeman⁵²⁴ şubḥ û êvar e
Heyderî dil pêt û nar e⁵²⁵ / çav li ihsana⁵²⁶ te ye

-14-⁵²⁷

[Qeside - Medhiye]

fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilun
Remel - + - - / - + - - / - + - - / - + -

- 1 Şorgula bustan û baġan⁵²⁸ / reng û nîşan û wesîm
Melce'ê şah û feqîran / padişahê pir helîm
- 2 Zînetî dunya û 'uqba⁵²⁹ / şahibê feyza Buxar
Rewşena çeşmê nedîma / hey kirî⁵³⁰ qelbê remîm
- 3 Meġzena⁵³¹ 'ilm û 'edalet / muşbitê qewlê qewî
Me'dena 'izz⁵³² û keramet / qa'idê textê Selîm

⁵¹⁶ Rû] dêm NMDM, DCMŞB.

⁵¹⁷ afitab e ew di 'eşrê] serbilindê dîn di dewrê NMD1 NMD2 (helbesta 40î).

⁵¹⁸ Zînet û nûra bilad î / murşidê qelbê 'ibad î] Şah terîqek bêriya di sed mubarek bit şeha di DCMŞB.

⁵¹⁹ Muhibeta] Şuḥbeta NMDM.

⁵²⁰ şuḥbeta] muhibeta NMDM.

⁵²¹ Dîtina wî quṭbê kamil] Meclisa wî rehîm lê nazil NMD1 NMD2 (helbesta 40î).

⁵²² Ev malik di DCMŞByê de tune ye.

⁵²³ Ez dibêjim] Çi bibêjim DCMŞB.

⁵²⁴ Her zeman]şev û roj DCMŞB.

⁵²⁵ **Heyderî** dil pêt û nar e] Heyderî dil tar û mar a NMD1 NMD2 (helbesta 40î).

⁵²⁶ çav li ihsana] talibê lutfî DCMŞB.

⁵²⁷ Ev helbest di NMD1, NMD2 û NMDMyê de wek hev e. Lê di MMECyê hem cuda ye û hem jî bi pênc malikan ji yên din zêdetir e. Ji ber ku NMD2 di bin sererastkirina muellîf re derbas bûye Em ê NMD2yê ji xwe re bingeh bigirin û malikên helbesta MMECyê ku di nusxeyên din de tune jî em ê li jêrê bidin

⁵²⁸ bustan û baġan] bustanê Îran MMEC.

⁵²⁹ dunya û 'uqba] qelbê mirîdan MMEC.

⁵³⁰ hey kirî] hey dikî MMEC.

⁵³¹ Meġzena] Mûcidê MMEC.

⁵³² Me'dena 'izz] Şahibê keşf MMEC.

- 4 Kes bi merdî nabî wek wî/ malikê kenza xefî
Hîlm û cûda Xeznewî / zêde ji heddê ey nedîm
- 5 Pehlewanê pir bi heybet⁵³³ kaşifê eḫwalê dil
Qamî'ê⁵³⁴ fîsq û fucûrê za'îlê bid'a zemîm⁵³⁵
- 6 Himmeta şahê Medînê ta Ziya tê Xeznewî
Nisbeta bavê 'Eladdîn şerq û ğerb girtî 'emîm
- 7 Bê ḫisab hemd û şena Lillah me dî wechê Kerîm
Pir şîrîn e ğemrevîn e dilselîm e musteqîm
- 8 Kes nizanî qîmetê vî murşidê axir zeman
Heyderî tolê li Tekya Xeznewî şêxê 'ezîm



⁵³³ Pehlewanê pir bi heybet] Pêlewanê 'ilmê dîn î MMEC.

⁵³⁴ Qamî'ê] Manî'ê MMEC.

⁵³⁵ Ji vir û pê ve malikên di MMECyê de wiha ne:

6 Ez neşêm weşfan bibêjim şed hezar 'alim geḫa
Cinn û emlak perî tev 'aciz in ji weşfa cesîm

7 Kir nezer berdê li berriyêd ji beḫrê zêdetir
Durr û yaqût kû bi her bal Cenneta Xuldu'n-ne'îm

8 Himmeta Şahê Medînê Şehê Ziya ji ber hem
Nusbeta bavê 'Eladdîn heft tebeq girtî 'emîm

9 Şed hezar hemd û şenalillah me dî quṭbê 'ezîm
Pir şêrîn e ğemrevîn teb'et ḫelîm musteqîm

10 Şeh keremkarê li Xizna qeṭ ğema êdî nexwun
Min yeqîn e em nebînin qeṭ 'ezab narê ceḫîm

11 Fani fî Ellah mucedded quṭbê ferdanî meded
Me nema şebr û sukût can ceger bûne elîm

12 Me nema taqet ji derdê birîna ey hewar
Şed hewar ez feqîrê bê çare me kal 'edîm

13 Ey gelî ehlê terîq hûn du'a kin ecme'în
Tev Emînê Heyderîzade meded şahê kerîm

-15-
[Qesîde - Medhiye]

mustefî ilun / fe'ûlun / mustefî ilun / fe'ûlun
Munserih - - + - / + - - / - - + - / + - -

- 1 Ey qiblegahê 'amê / nazik le'îf û enwer
Bûn⁵³⁶ em ji dest gîramê / dilpare û mukedder
- 2 Ey şorgula li bağa⁵³⁷ / dil pare ma ji 'îşqê
Bê sekne me ji kerba⁵³⁸ / mecnûn û dîn û ebter⁵³⁹
- 3 Mecnûnê husna şah im lewma⁵⁴⁰ mekin ji 'îşqê
Dil peritû mi can da nalîn hezar û yekser
- 4 Min dil firot ji 'îşqa / me nîne şebr û taqet
Ez dûr ketim ji Xezna / ax û xwelî li min wer
- 5 Lewma nekin qe⁵⁴¹ yek car / leb kaniya heyatê
Şubh û mesa şekerbar / le' lê wî şehd û kewşer
- 6 Munkir çima tû na'ê⁵⁴² carek bi qelbê şadiq
Bose tû destê şah im bi îxlaş şidq û behwer
- 7 Ger te heye xilafek / qeşdê bike bibîne
*Kerren fêkeren carek / yerci' ileyke e'wer*⁵⁴³
- 8 Meyla wî her Xuda ye / şadiq emîn û murşid
Wellahi ev ne meyl e / lew me qebûl e rehber
- 9 Bê meyl û fexr û cidal nîne bi mişlê Ehmed
Îro tebîbê qelba ew e emîr û şerwer⁵⁴⁴
- 10 Îro li 'erda Xezna peyda bû yek mucedded⁵⁴⁵
'İlm û terîq beyan kir nûra Xuda beramber
- 11 Ey nûra her dû ça'van rûh û rewan fida bê⁵⁴⁶
Ez 'aşiqê cemalê wê beşera munewwer

⁵³⁶ Bûn] Lê MMEC.

⁵³⁷ bağa] bağan NMDM, MMEC.

⁵³⁸ kerba] kerban NMDM.

⁵³⁹ ebter] eħmer MMEC.

⁵⁴⁰ lewma] lewman NMDM.

⁵⁴¹ Lewma nekin qe] Lewman nekin qet NMDM.

⁵⁴² na'ê] nayê NMDM, MMEC.

⁵⁴³ Nerîna xwe tekrar bike. Kêmanî tu nabîne çawa wê bi poşmanî vegere.

⁵⁴⁴ şerwer] rehber NMDM.

⁵⁴⁵ yek mucedded] quṭbê emced

⁵⁴⁶ nûra] rûhê / rûh û rewan fida bê] yek nezerê dixwazî MMEC.

- 12 Dil ʔalibê cemaîê nefsa mekarê heyyal
Hiştîm di nav mirîda pîs û hezîn û kemter
- 13 Derdê li min bê lewme zecr û ‘ezab û zehmet
Îmdad û ah û hêvî bihnek ji misk û ‘enber
- 14 Bihnek ji enfas tahîr nadîm bi milkê ‘alem
Şed car bibî fidakar canê **Emînê Heyder**

-16-⁵⁴⁷

[Qesîde - Medhiye]

fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilun (fa‘ilatun)
Remel - + - - / - + - - / - + - - / - + -

- 1 Şêxê kamil mîrê ‘adil / canfida me canfida
Murşidê şêrîn û faḍil / canfida me canfida
- 2 Ba cemala roj mişal e / nav-şîrîn Me‘şûm delal e
Esmerê awîr-gezal e / canfida me canfida
- 3 Esmerê min dilberê min / quṭbê ‘alem rehberê min
Mal û mülk û şehperê⁵⁴⁸ min / canfida me canfida
- 4 Gulcihan î⁵⁴⁹ roj ‘iyan î / şahiya ehlê zeman î
El meded Me‘şûmê Şanî / can fida me can fida
- 5 Îro Me‘şûm bûye me‘lûm / kes nebin jê dîr û mehrûm
Ê kû rê wînda ye ez bûm / canfida me canfida
- 6 Canfida me nûr ‘ulam e / mîr û aḡa bûn ḡulam e
Ez tenê jê dîr dimame / canfida me canfida
- 7 Derdimend im payibend im / rê nîzanim pa⁵⁵⁰ di qeyd im
Ez dexîlê Neqşebend im / canfida me canfida
- 8 Pir hezîn im dil birîn im / ez divême Me‘şûm bibînîm
Şidqê teslîma xwe bînîm / canfida me canfida
- 9 Nûr ‘iyanî da cihanî / beyreqa dîn xweş⁵⁵¹ hilanî
Ê nedîtî pê nîzanî / canfida me canfida

⁵⁴⁷ Ev helbest di MMECyê de li dû her malîkê ev risteya dubare jî heye: “Hâl xerab im hâl xerab”.

⁵⁴⁸ şehperê] şahperê MMEC.

⁵⁴⁹ Gul cihan î] Gul dihan î NMDM.

⁵⁵⁰ rê nîzanim pa] çare nîne pê MMEC.

⁵⁵¹ xweş] wî MMEC.

- 10 Ew⁵⁵² çi ni‘met nûr û nuşbet / Heq Te‘ala kirye minet
Daye Me‘şûm şewq û himmet / canfida me canfida
- 11 Kemterî me dilkirî me / ez li Me‘şûm muşterî me
Kelbê dergahê derî me / canfida me canfida
- 12 Mest û gêj im xwîn dirêjim / dil birîndar im ji mêj im
Heyderîzade dibêjim / halexerab im halexerab

-17-

[Qesîde - Medhiye]

mef‘ûlu / fa‘ilatun / mef‘ûlu / fa‘ilatun
Muzarî - - + / - + - - / - - + / - - - -

- 1 Rewşa zemanê talî / şahê bi qedr û qîmet
Xwedyê meqamê ‘alî / Me‘şûmê pir bi heybet
- 2 Xwedyê meqam û keşfa / qet nayê⁵⁵³ beş û weşfa
Ez bûm ji ‘îşq û keyfa / muştqaqê wî bi hesret
- 3 Hûn⁵⁵⁴ jê nebin qet mehrûm / lewra kû bûye me‘lûm
Pîrê⁵⁵⁵ terîqê Me‘şûm / serdarê dîn û dewlet
- 4 Lewra kû bû ‘iyan î / yek mehdiyê zemanî
Ruknê terîqê danî / ya Reb çi zêde himmet⁵⁵⁶
- 5 Ya Reb çi zêde ihsan / hatî hekîmê qelban
Pê zêde bûye îman / hemd û şena û minnet
- 6 Çi nazik û şêrîn e / tebîbê⁵⁵⁷ ehlê dîn e
Xweş kamil û guzîn e / şikl û sîma bi heybet
- 7 Burhê wekî du heyva / dêmê ji rengê sêva
Min dî ji her du lêva / ya Reb çi şehd û şerbet
- 8 Min dî ji rengê şorgul / dağ dane qelbê bulbul
Derman dikî qelbê kul / melhem ji nûr û nisbet

⁵⁵² ew] ev MMEC.

⁵⁵³ nayê] na‘ê MMEC.

⁵⁵⁴ Hûn] Kes MMEC.

⁵⁵⁵ Pîrê] Ruknê MMEC.

⁵⁵⁶ himmet] ni‘met MMEC.

⁵⁵⁷ tebîbê] mehbûbê MMEC.

- 9 Ez mubtela 'elîl im / derman ke dil dexîl im⁵⁵⁸
Bê çare û zelîl im⁵⁵⁹ / ez mam bi êş û 'illet
- 10 'Illet li qelb û can e / Me'sûm didê derman e
Lê **Heyderî** nizane / kengî bibîne şîhhet

-18-⁵⁶⁰

[Qesîde - Medhiye]

fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilun
Remel - + - - / - + - - / - + -

- 1 Ey tecellaya li Sîna'ê meded
Xil'eta merhûmê Xezna'ê meded
- 2 Der sulûkê rahê heq çeşmê me ye
Lew tû Me'sûmê ji 'eyba'ê meded⁵⁶¹
- 3 Me ji ba Seyda û Hezret⁵⁶² Ehmedî
Heq Te'ala kir kerem dayê meded
- 4 Me ji ba Me'sûm heyata 'alemî
Feyz û nisbet hate dunya'ê meded
- 5 Merhema⁵⁶³ qelbê mirîda ez fida
Zîneta dunya û 'uqba'ê meded
- 6 Bejn û bala te şêrîn selwî-şîfet
Ez fida'ê bejn û bala'ê meded
- 7 Şerbeta nûra zelal behra te ye
Nuqteyek derket ji derya'ê meded⁵⁶⁴
- 8 Zîneta 'alî li bejna te xelat
Xweş xelat hate ji 'ulya'ê meded

⁵⁵⁸ derman ke dil dexîl im] bê çare û zelîl im MMEC.

⁵⁵⁹ Bê çare û zelîl im] Derman ke dil dexîl im MMEC.

⁵⁶⁰ Ev helbest di NMD1 û NMD2yê de 14, di NMDMyê de 13 û di MMECyê de jî 15 malik in. Em ê NMD2yê bingeh bigrin û cudahiyên nuxseyên din di jêrenotan de nîşan bidin.

⁵⁶¹ Ev malik di NMDMyê de tune ye.

⁵⁶² Seyda û Hezret] Seyda'ê Hezret NMD1, NMD2, MMEC.

⁵⁶³ Merhema] Melhema NMDM, MMEC.

⁵⁶⁴ Di MMECyê de malika 7an ku di nuxseyên din de tune ye bi vî awayî ye.

Pertewa şu'lê tu wek rojê hilat
Wek te nazik ne di tûgra'ê meded

- 9 Hukmê şer‘a te hidayet da dila⁵⁶⁵
Himmeta Rebbanî yekta’ê meded
- 10 Dil pezîrî ten⁵⁶⁶ herîrî pêk ve nûr
Leb-şeker nûra du çeşma’ê meded
- 11 Xweş se‘adet bo te hat tacê serîr
Tac û textê te j’ Buxara’ê meded
- 12 Medh û ewşafê te quṭb î pur hene
Serbilindê quṭbê ġewşa’ê meded
- 13 *Yehki ‘en bedrin munîrin bi`ş-şeqe*⁵⁶⁷
Xaş û ‘am werne temaşa’ê meded
- 14 Sed meded Me‘şûmê Sanî şêxê min
Heyderî kelbê⁵⁶⁸ li dergahê meded

-19-

[Qesîde - Medhiye]

fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilun (fa‘ilatun)
Remel - + - - / - + - - / - + - - / - + -

- 1 Her bi roj û her bi şev bit / nazîrê Me‘şûm Xudê
Himmeta quṭba digel bit / yadigarê merqedê
- 2 Himmeta ‘alî bila şek / rutbe nîşanê mûbarek
Hukmê ‘ilm û şer‘ê carek / bîn kenarê merqedê
- 3 Rutbe nîşanê Ilahî / bîne ser Me‘şûm penahî
Wî bike amir û nahî / hem wişalê merqedê
- 4 Wî bikî ma’ mûrê şer‘ê / dewr bikî j’ riya û bid‘ê
Hem ji zulm û new‘ê şen‘ê / cahi zarê merqedê
- 5 Dûr ji afat û bela bî / dilgeşê şêx û mela bî
Mesneda mîr û geda bî / gulbiharê merqedê
- 6 Tû bi cahê merqedê kî / hem bi wan ehlê Xudê kî
Nezera rehîmê tû lê kî / dost û yarê merqedê

⁵⁶⁵ da dila] kir ‘Ereb MMEC.

⁵⁶⁶ ten] tèn NMD1, NMD2.

⁵⁶⁷ Behsê dike ji heyvek munewwer û bi şewq.

⁵⁶⁸ kelbê] yexsîr NMDM.

- 7 Ey gelê dost û hevala / hûn nekin fikr û muṭala
Murşidê ebrû hilala / şaxedarê merqedê
- 8 Şed qesem şond û yemîn e⁵⁶⁹/ derbê Me‘şûm pir me dîne
Şekk û şubhe tê de nîne / lalezarê merqedê
- 9 Rojekê ger wî nebînim / yan hezar derdan hilînim
Ez ji hubbê lale dîn im / bendewarê merqedê
- 10 Her dema Me‘şûm dibêjim / hêstirê xwînê dirêjim
Hem ji hubbê har û gêj im / xwendekarê merqedê
- 11 Lê dema Me‘şûm dibînim⁵⁷⁰/ hesret û derda vejînim
Ayeta ‘îşqê dixwînim / dil siparê merqedê
- 12 Ez fida kim rûh di ḥalê / her dema min tê xeyalê
Kunbeta ḥusn û cemalê / derdiyarê merqedê
- 13 Şahê Me‘şûm xweş emîr e / la‘îqê tac û serîr e
Heyderîzade esîr e / kelbê warê merqedê⁵⁷¹

-20-

[Qesîde - Medhiye]

fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilun
Remel - + - - / - + - - / - + - - / - + -

- 1 Şerbeta ehlê widada kenzê ‘îrfana tu wî
Xaşedergahê murada şedrê dîwana tuwî
- 2 ‘Alim û şofi yû zahid tîn sulûk û xizmetê
Têne ber dergahê ‘alî murşidê wana tu wî
- 3 Himmeta Me‘şûm bilind e hûn bizanin qîmetê
Meqşeda te her Xuda ye quṭbê dewrana tu wî
- 4 Heq Te‘ala her zemankî hin kirin şêx û welî
Lew di vî weqtî re’îsê cinn û insana tu wî
- 5 Nav û dengê vê ẓerîqa bê riya çû her ẓeref
Silsila Neqşê te girtî tacê sultana tu wî
- 6 Tabî ‘ê şer‘a Muḥemmed canfida canê te bî
Weqtê ẓengî ‘ê d’ hewar û gazi yû hana tu wî

⁵⁶⁹ yemîn e] yeqîn e NMD1, NMD2.

⁵⁷⁰ dibînim] dibînim NMD1, NMD2.

⁵⁷¹ merqedê] Xiznewî NMDM.

- 7 Min di dunya'ê sened nîne ji Me'şûm pê ve kes
El meded Me'şûm dewa'ê qelb û hem cana tu wî
- 8 Vê birîna dil dewa kî ez dexîlê merqedê
Xweş ʔebîbê me'dena tû werdê zimana tu wî
- 9 Hêl û weqtê me xerab e me ne xêr û ne 'emel
Hêviya me ma Muḥemmed rehberê zana tu wî
- 10 'Erzeḥalê min tû zanî fayde nîne j'gotinê
Lew îşaret tête gotin ʔalî'ê me'na tu wî
- 11 Ez sekê dergahê Me'şûm serbilind in em bi te
Rûh û canê **Heyderîzade** bi qurbana 'ew î

-21-

[Qesîde - Medhiye]

mustef'îlun / mustef'îlun / mustef'îlun / mustef'îlun
Recez - - + - / - - + - / - - + - / - - + -

- 1 Îro li Tilme'rûf xuya / ḥusna ḥebîbê mu'teber
'İlm û ʔerîq da şofiya / Me'şûm genê kir beḥr û ber
- 2 'İlm û ʔerîqa Serhedî / xal û nîşanê es'edî
Nuqtek ji nûra Ehmedî / Me'şûm fikir zêr û zeber
- 3 Me'şûm fikir pak û temîz / daḡ dane cana *hem çu nîz*⁵⁷²
Kî dîtî ew şahê 'ezîz / heybet digirtî wa⁵⁷³ ji ber
- 4 Şahê sexî yû mutteqî / wî berneda şer' û heqî
Bû hadiyê qewmê şeqî / derman fikir qelb û ceger
- 5 Bû sêfilê qelbê nexweş / *her can resîde rehmetaş*⁵⁷⁴
Rûh im fida çêsmê di reş / wî murşidê cewher-xeber
- 6 Rûhim fidayê qametê / ya Reb çî şun'a qudretê
Esmer kubarê nisbetê / bê hedd û gayet pir huner
- 7 Bê hed û gayet cayegîr / ew bû li xelqê destegîr
Çûn ber derî mîr û feqîr / bûse digel wan xaki der
- 8 Bûse didan xakê weşîd / hey bûn li ber cumle mirîd
Berda nezer qutbê ferîd / ḥukmê ʔerîqê birye ser

⁵⁷² Dîsa wiha.

⁵⁷³ wa] wan NMDM.

⁵⁷⁴ Her can bi rehmeta xwe gihaye.

- 9 Hey kirye qelbê mubtela / zewqa heqîqî kir ceta
Hatin gelek qismê mela / teslîmê⁵⁷⁵ sultanê beşer
- 10 Meş-nazik û şêrîn-kelam / kuştin gelek mîr û ğulam
Wî şorgula bağê himam / berda dila tîrê beşer
- 11 Ê nas nekir ew cahil e / lewra ji 'îşqê ğafil e
Ev can û dil pêk ve kul e / *der în derûn em sed keser*⁵⁷⁶
- 12 Jê re keramet hatine / qeş na'ê weşf û gotine
'Îşqa hebîb dil şohtine / barîn ji wan le'lê şeker
- 13 Le'lê şeker dil kir du şeq / nûr jê veda 'eynê şefeq
Ez tûle'ê dergahê heq / ber **Heyderî** rehîm û nezer

-22-

[Qesîde - Medhiye]

fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilun
Remel - + - - / - + - - / - + - - / - + -

- 1 'Aşiqê bê dil tû rabe / ber bi Tilme'rûf tû her
Ser ji xew rake şiyar be / der cihan roj hate der
- 2 Lê dema dilber xuya bû / nazikê merd û şêrîn
Şahiya deşt û çiya bû / da dila 'eşq û nezer
- 3 Wî nezer daye cihanî/ tac bi nûra neqşebend
Payitextê nûrê danî / Hezretê Me'sûm li ser
- 4 Wî li Tilme'rûfê danî / payitextê heybetê
Şu'leya Me'sûmê Şanî / çar teref bû qûzeqer
- 5 Himmeta 'alî giran e / qa'idê textê Hemîd
Leb şeker pir 'eql û zane / pehlewane mu'teber
- 6 Dil helandî wî bi carek / wî cemala aniyê
Kî didî wechê mubarek / zû dibû teslîm li ber
- 7 Ey mirîd rabe bibîne / bejn û bala şêxê min
Tû bizan ew şêrê dîn e / pir şêrîn û dur xeber
- 8 Hem ji xwe wê nefse bavê / her bibe 'aşiq li wî
Xwe xelaş ke j' qeyd û davê / her li Me'sûm tû biger

⁵⁷⁵ teslîmê] teslîm in NMDM.

⁵⁷⁶ Di vî hundirê min de sed keser heye.

- 9 Her wekî Me'şûm bû zahir / zêde bû 'eşqa dila
Yek nezer da qirnê axir / têr kirin cinn û beşer
- 10 Rojê şed car dest û dawa / ez dibos im qedemê
Heyderî bîrê ji de'wa / tûle'ê ber xaki der

-23-

[Qesîde - Medhiye]

mefa'îlun / mefa'îlun / fe'ûlun
Hezec + - - - / + - - - / + - -

- 1 Gelo çawa bikim ya Rebb nihanî
Xuya bû himmeta Me'şûmê Şanî
- 2 Yeqîna min tû mehbûbê Xudanî
Di nav şêx⁵⁷⁷ û mela da tû 'iyanî
- 3 Ji ewwel ve dibêjim bê xilaf e
Tû wî serdefterê ehlê zemanî⁵⁷⁸
- 4 *Ferîdû-dehrî ji nûrê melî'î*
Wehîdu`l-`eşri esraru`l-me`anî
- 5 *Re`îsu`l-`ilmi li`n-nasi tecella*
Feehdahun ila nûri`l-îmanî
- 6 *Fe Lillahî duruhû min şulbi Ehmed*
Ku rêza wî terîqa wî deranî
- 7 *Fe egnahû bihî`emma siwahû*
Ĥemahû min dewahiyî`z-zemanî
- 8 *Te`alew etbi`ûhû eşdiqûhû*
Bi qelbin we bi`iqraru`l-lisanî⁵⁷⁹

⁵⁷⁷ şêx] şeyx NMDM.

⁵⁷⁸ zemanî] cihanî NMD1, NMD2.

⁵⁷⁹ Kurdîya malikên 4,5,6,7,8an ên bi Erebi:

4 Di weqtê de tu yek î tu ji nûrê tije yî
Di esrê de tu yek î tu sirra me'na yî

5 Reîsê 'ilmê ji insanen re tu derketî yî
Însan anî bi bal nûra îmanê

6 Ji Xweda re bî xeyra wî ji pişta Ehmed
Rêz û riya wî derxistiye (eşkere kiriye)

7 Bi sebeb îmanê ev muhtacî tiştekî din nekir
Ev ji afatê zeman muhafeze kir

- 9 Gelî yar û mirîda ev çi ni‘met
Xudê îhsan kirî kes pê nizanî
- 10 Terîqa Neqşebendî ‘ilmê kamil
Ji Me‘şûm ra bûye behr û bû kanî
- 11 Kerem kin hûn murada xwe bixwazin
Ji qelbê xaş bikin beş û beyanî
- 12 Bi qurban im bi qurban im bi heyran
Bi heyrana te bim quṭbê zemanî
- 13 ‘Ezîzê min hekîmê derd û qelba
Tebîbê min hebîbê qelb û can î
- 14 Ji ber va⁵⁸⁰ derd û êşa pir dinal im
Ji derdaran tû Luqmanê dilan î
- 15 **Emînê Heyderî** jar û ‘elîl e
Ji xêra re çi keslan û giranî

-24-

[Qesîde - Medhiye]

mefa‘îlun / mefa‘îlun / mefa‘îlun / mefa‘îlun
Hezec + - - - / + - - - / + - - - / + - - -

- 1 Dewa‘ê qelb û canê min / xudanê serwetê Me‘şûm
Fida bit xan û manê min / murada wuşletê Me‘şûm
- 2 Li Tilme‘rûf xuya bû ew / wekîlê Hezret û Seyda
Ji Eḥmed hem ziya bû ew / diwarê dewletê Me‘şûm
- 3 Xelîfê şahê Xezna‘ê / kû necla kamil û murşid
Tu wî ḥusna di dunya‘ê / xezîna reḥmetê Me‘şûm
- 4 Tu wî şewqa di qelban da / te ruhnî kir şeva tarî
Re‘îsê quṭb û ustada / çi bêjim qişsetê Me‘şûm
- 5 Hezar ḥemd û şena ya Reb / re‘îs e ew li Tilme‘rûf
Te daye himmetek ya Reb / di îmdada me tê Me‘şûm

8 Werin bidin dûv wî û tesdîq bikin
Bi qelbê xwe û bi qerara zimanê xwe
⁵⁸⁰ va] van NMDM.

- 6 Te daye himmetek ‘alî / bû şêrê dîn û dunya’ê
Demek kû qeṭ nebin xalî / jî feyẓ û nisbetê Me‘şûm
- 7 Gelî yar û mirîdê xaş / xwe teslîm kin jî qelbê şaf
Ji ‘eşqê ra nebin reqqaş / kû riknê şefqetê Me‘şûm
- 8 Ji ‘eşqê ra nebin mehrûm / eger hûn ‘eql û zana bin
Hêvî kin kû bibin me‘lûm / jî nûra cibhetê Me‘şûm
- 9 Feqîr û kemter û gêmgin / refîqê hesret û derda
Emînê Heyderî miskîn / dikêşe ezyetê Me‘şûm

-25-

[Qesîde - Medhiye]

mustefî ilun / mustefî ilun / mustefî ilun / mustefî ilun
Recez - - + - / - - + - / - - + - / - - + -

- 1 Ellah jî rehîma bê hisab / yek piştemîrê dîn şiyand
Teşbîhê hîva bê hicab / şewqê li qelban da heland
- 2 Roj bû di ‘ewran da hilat / mizgîn j’ we ra ehlê welat
Îro ‘Ela’eddîn dihat zulmet / jî qelban wî derand
- 3 Zulmet jî qelban anî der / ‘aşîq kirin cinn û beşer
Wî murşidî berda nezer / ‘alem jî eṭrafa civand
- 4 Hat yek kubarê Xeznewî / merd û delal û dîn qewî
Wî pehlewânê Xeznewî / dunya bi yek qîrê hejand
- 5 Wek dengê re‘dê qîr dida / berq û burûska jê veda
‘Aşîq kirin mîr û geda / perde jî ber qelba heland
- 6 Perde hilanî wê demê / ‘îşqek fikir nav ‘alemê
Nisbet bi şîklê merhemê⁵⁸¹ / avête qelba pê kewand
- 7 Qelbê bi êş merhem⁵⁸² fikir / şuhbet jî lêva nû vekir
‘Ilm û terîq teblîğ fikir / wî ‘am û xaş tev pê hisand
- 8 ‘Ilm û terîq dayê Xudê / îmdad jî şahê merqedê
Nûr tê jî alyê Serhedê / nuqtek li Tilme‘rûf reşand
- 9 Billah jî lûṭfa sermedî / da mîr ‘Eladdîn seyyedî
Me b’ ça‘va kes wek wî nedî / kû ev terîq saḡlem hemand

⁵⁸¹ merhemê] melhemê NMDM.

⁵⁸² merhemê] melhemê NMDM.

- 10 Ey dost bizan kû ew hene / gotinkirin bê fayde ne
Billah ji weşfa⁵⁸³ zêde ne / xaliq ji nûrê xemiland
- 11 Ey mîr 'Ela'eddîn meded / hesret kişandî bê 'eded
Me j'geyrî wî nîne sened / pir **Heyderî** ezyet kişand

-26-

[Qesîde - Medhiye]

mefa'îlun / mefa'îlun / mefa'îlun / mefa'îlun
Hezec + - - - / + - - - / + - - - / + - - -

- 1 Murada dîn di van weqta / di dewrana 'Ela'eddîn
Kû rûniştî li ser texta / çi sultana 'Ela'eddîn
- 2 Ji pişta Ehmedê nûrîn / xuya bû murşidê şêrîn
Bi serbestî hemandî dîn / bi gulzara 'Ela'eddîn
- 3 Li ser textê dil rûniştî / ji zeng û zulmetê şuştî
Ji me nefsa kubar kuştî / bi qîrîna 'Ela'eddîn
- 4 Teşerruf kir li qelbana / rehet kir dil bi dermana
Çi dergahê muradana / werin dana 'Ela'eddîn
- 5 Hukim kir wî bi mêranî / dikir şuhbet bi şêranî
Rehet kir qelbê insanî / bi dermana 'Ela'eddîn
- 6 Çi reng şêrîn û şorgul bû / li bejnê nûr muselsel bû
Ji xelwê ra mukemmel bû / ne erzan a 'Ela'eddîn
- 7 Ji xelwê hat çi xweş meş kir / li me çav ruhni yû geş kir
Kul û derdê me pê xweş kir / xeberdana 'Ela'eddîn
- 8 Xeberdan kir ji ayatan / hewar kir cumle sadatan
Hemandî dil ji afatan / çi mêrxan a 'Ela'eddîn
- 9 Li qelb û dil meke fîğan / li halê me bike îhsan
Perîşan im tu wî derman / çi luqman a 'Ela'eddîn
- 10 Perîşan im zelîl çehr im / birîndar im kû bê şebr im
Gelo ya Reb heyê behr im / ji vê dana 'Ela'eddîn
- 11 Ez im Xezna kul û derda / min wînda kir hiş û sewda
Ji dest xwe **Heyderî** berda / dil û can a 'Ela'eddîn

⁵⁸³ weşfa] weşfan NMDM.

[Qesîde - Medhiye]

fa‘ilatun /fa‘ilatun /fa‘ilatun / fa‘ilun
Remel - + - - / - + - - / - + - - / - + -

- 1 ‘Aşiqê bê dil tû rabe / ber bi Tilme‘rûf tû her
Ser ji xew rake şiyar be / der cihan roj hate der
- 2 Wî nezer daye cihanî/ qaymeqamê neqşebend
Payitextê nûrê danî / mîr ‘Ela’eddîn li ser
- 3 Wî li Tilme‘rûf vegirtî / payitextê nisbetê
Merqeda nûrîn digirtî / çar kenarê sor û zer
- 4 Himetek ‘alî meqam e / qa‘idê textê Hemîd
Merhema qelbê zulam e / pehlewane mu‘teber
- 5 *Ehşenillahî tebarek/ wî j’ cemala aniyê⁵⁸⁵*
Kî didî wechê mubarek / zû dibû teslîm li ber
- 6 Ey mirîd rabe xwe kar ke / j’ ‘eşq û dil teslîm bibe
Dil ji dunya’ê tû sar ke/ ha mirin hat bêxeber
- 7 Xap û hîlê xwe tû bavê / tû bike tewbe ji dil
Nefs û dunya ger tû navê / her li Tilme‘rûf biger
- 8 Her ‘Ela’eddîn bibîne / hem bike teftîşê hal
Min ji dil şîdî û yeqîn e/ kû Xudê daye huner
- 9 Şahê min gelkî huner dîn / nûr ji rewzê hate ser
Şewqê da wechê ‘Eladdîn / heyirîn cinn û beşer
- 10 Me j’ te hêvî û rica ye / yek mirîdî bernedî
Heyderî hal lê nema ye / ma ‘elîl û bê mefer

⁵⁸⁴ Ev helbest, tenê di NMD1ê de heye.

⁵⁸⁵ Xweda Te‘ala enya wî xweş çêkiriye.

mustef'îlun / fe'ûlun / mustef'îlun / fe'ûlun
Munserîh - - + - / + - - / - - + - / + - -

- 1 Taca serê mulûka / bağê cinan û gulzar
Bû şahiya sulûka / 'Ela'edîn 'ilimdar
- 2 Bû şahiya 'ewamê / nûr kir dewsa zulamê
Emîrê Mişr û Şamê / hem wali yû hukimdar
- 3 Emîrê goh û şehra / dur anî der ji behra
Gelî dosta ne fexra / eşl û neseb şerefdar
- 4 Çavê⁵⁸⁶ gezal û nûrîn / bejna delal û şêrîn
Teḥqîqe murşidê dîn / çi naşîh û wefadar
- 5 Teḥqîq di qirnê axir / ta'îfa heq bû zahir
Mû'înê dînê tahir / ez rûh bikim fidakar
- 6 Weqtê ewî nezer kir / hetta li dil eşer kir
Me j' vî dilî sefer kir / j' bîra me çûn egyar
- 7 Şewqa qulûb û nefsa / re'îsê cinn û insa
Min dî ji pişta gewşa / rewşa cihan bû izhar
- 8 Re'îsê dîn û dunya / geḥa meqamê 'ulya
Înşaf bikin kû ḥelya / d' berfa kesê gunehkar
- 9 Înşaf bikin kû vana / 'ilm û terîq didana
Te'lîm didan nezana / herkes kirin xeberdar
- 10 Herkes ji nav bilada / telbê kirin 'ibada
Eğleb geḥan murada / geyrî me 'ê gunehkar
- 11 Ez pir kula dikêşim / cerg û dila dibrêjim
Roj û şeva dibêjim / mame gerîb û gemdar
- 12 Bi ḥurmeta van şaha / xelaş kî me j' gunaha
Lê **Heyderî** ji aha / parçe kirî dilê sar

⁵⁸⁶ Çavê] Çavê NMDM.

[Qesîde - Medhiye]

mustefî ilun / mustefî ilun / mustefî ilun / mustefî ilun
Recez - - + - / - - + - / - - + - / - - + -

- 1 Ya Reb şukir dîsa me dî / piştî firaqê dehşetê
Ev reng û dengê Ehmedî / da'im di Xezna'ê de tê
- 2 Ev heqqû dengê şadiq e / 'alem tamam lê 'aşiq e
Karê tebîbê haziq e / derman didê ji şuhbetê
- 3 Ey 'Ebdulgenîyê⁵⁸⁸ teqî / bê şek hekîmê mutleqî
Ê munkure maye şeqî / herkes nizanê qışşetê
- 4 Ey rewşena bagê gula / hem ruhniya çavê dila
Wensa mirîd û fazîla / da'im bi te şebra me tê
- 5 Hukimê dîn hukmê we ye / muhtacê 'irfana we ye
Her dem ji bo we 'ewne ye / wellah ji dil kêfa me tê
- 6 Adabê rêza Neqşiya / teqwa û 'ilmê sofiya
Îro di bîraye xuya / feyza 'ulûm û hikmetê
- 7 Pir zêde ji feyza Xudê / ji Pêgember ta b' Serhedê
Tev tê dibarê merqedê / paytextê feyzê nisbetê
- 8 Dunya û dîn her bi we ye / tev cah û 'ilmê me j' we ye
Hêvî Xudê qeşda me ye / wê herne nava Cennetê
- 9 Hêvî Xudê sened tu wî / ev husnê şun'a çi qewî
'Ebdulgenîyê Xeznewî⁵⁸⁹ / bihna bira û bav j' te tê
- 10 Se'ya te ya bav û bira / tû j' bo me ra luks û çira
Lew meşreba te eşkera / himmet ji Rebbê 'izzetê
- 11 Ev **Heyderîyyê** 'eybidar / gemgîn e dil da'im dizar
Kêmtir ji herkes maye xwar / carek bikî lê şefqetê

⁵⁸⁷ Ev helbest, di NMD1ê navê Şêx 'Izeddîn lê di NMD2 û NMDMyê de li şûna navê Şêx 'Izeddîn navê Şêx 'Ebdulxxenî heye. Em ê NMD2yê ji xwe re bingeh bigirin û cudahiyê nusxeyan di jêrenotan de nîşan bidin.

⁵⁸⁸ Ey 'Ebdulgenî] Ey Şêx 'Izeddîn NMD1.

⁵⁸⁹ Ey 'Ebdulgenîyê Xiznewî] Ey 'Izeddînê Xiznewî NMD1.

-30-
[Qesîde - Medhiye]

mustefî ilun / mustefî ilun / mustefî ilun / mustefî ilun
Recez - - + - / - - + - / - - + - / - - + -

- 1 Ellah ji wê lûfa qedîm / nûr da derê 'Ebdulgenî
Nuqtek ji wê fedla 'emîm / berda derê 'Ebdulgenî
- 2 Wî çendi sal şebra xwe kir / b' her ezyetê hîlma xwe kir
Axir Xudê derge vekir / tac da serê 'Ebdulgenî
- 3 Da ser riya terîqetê / kir xizmeta şerî'etê
Ew jî giha heqîqetê / wek 'ê berê 'Ebdulgenî
- 4 Wek murşidê zana me dî / neclê kubarê Ehmedî
Rahê terîqa Serhedî / bû rehberê 'Ebdulgenî
- 5 Ya Rebbî ilhamek hebû / taze li Xezna'ê vebû
Ew jî ji îhsana te bû / bû muşterî 'Ebdulgenî
- 6 Ê kû divê *be 'del-wefat*⁵⁹⁰ / bighê ewan ê 'alî zât
Qesdê bikin ehlê welat / berya herê 'Ebdulgenî
- 7 Eşhab û Sadatê Kiram / wan me'newî lê kir selam
'Ê heqqî danî ez gûlam / bav û birê 'Ebdulgenî
- 8 'Ebdulgenî ey rehberî / gîret bike wek ê berî
Ev bû murada **Heyderî** / tûlê⁵⁹¹ derê 'Ebdulgenî

-31-⁵⁹²
[Qesîde - Medhiye]

fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilun (fa'ilatun)
Remel - + - - / - + - - / - + - - / - + -

- 1 Ey Xuda erda mubarek / her dibin hîfza te bî
Hukmê Xezna'ê⁵⁹³ bi carek / daxilê rehma te bî
- 2 Behra rehîmê bête xwarê / çar teref şubh û êvarê
Her li Xezna'ê⁵⁹⁴ bibarê / menbe'a feyza te bî

⁵⁹⁰ Piştî mirina mirovekî.

⁵⁹¹ tûlê] kûlê NMDM.

⁵⁹² Ev helbest, di NMD1ê de navê Şêx 'Izeddîn û Tilme'rûf, lê di NMD2 û NMDMyê de li şûna navê Şêx 'Izeddîn û Tilme'rûf navê Şêx 'Ebdulxênî û Xizna heye. Em ê NMD2yê ji xwe re bingeh bigirin û cudahiyên nusxeyan di jêrenotan de nîşan bidin.

⁵⁹³ Xizna'ê] Tilme'rûf NMD1.

- 3 Erda Xezna'ê⁵⁹⁵ 'ula bî / dûr ji afat û bela bî
Melce'ê şêx û mela bî / merkeza nûra te bî
- 4 Milletê Îslamê bê hed / bêne ber dergahê es'ed
Ber derê ewladê Ehmed / mexzena sirra te bî
- 5 Ey 'Ebdulgenîyê Ehmed⁵⁹⁶/ hamîyê adabê Serhed
Lami'a berqa Muhemmed / da'ima fexra te bî
- 6 Lami'a feyza Xuda bî / nisbet û feyza Ziya bî
Çar teref mişlê çema bî / mecme'a behra te bî
- 7 Mûnisê rewşa mela bî / zînetê erd û sema bî
Da'ima teqwa Xuda bî / mezher û şebra te bî
- 8 Hem tû roj û hem tû mahî / hem tû murşid hem tû şahî
Hîfz û tewfîqa Ilahî / da'ima sirra te bî
- 9 Hem 'Ebdulgenîyê hâkim⁵⁹⁷/ nuşreta heq jê re da'im
Wî bihêle bo me qa'im / waşilê fedla te bî
- 10 Ew ji bo 'amê imam bî / ruhniya qelbê zulam bî
Deryê Xezna'ê⁵⁹⁸ dewam bî / meqdesa nûra te bî
- 11 Ey gula der bagê Xezna / nêrgîza nazik û re'na
Em feqîr der ah û huzna / can bi qurbana te bî
- 12 **Heyderî** dil bi birîne / ma di zîndan û evîn e
Vî sekê gemgîn û dîn e / ew berê⁵⁹⁹ xeyra te bî

⁵⁹⁴ Xizna'ê] Tilme'rûf NMD1.

⁵⁹⁵ Xizna'ê] Tilme'rûf NMD1.

⁵⁹⁶ 'Ebdulgenîyyê] 'Izeddînê NMD1.

⁵⁹⁷ 'Ebdulgenîyyê] bi 'Izeddînê NMD1.

⁵⁹⁸ Deryê Xizna'ê] Deryê Tilme'rûf NMD1.

⁵⁹⁹ berê] bera NMD1, NMD2.

-32-
[Qesîde - Mersiye]

mefa'îlun / mefa'îlun / mefa'îlun / mefa'îlun
Hezec + - - - / + - - - / + - - - / + - - -

- 1 Mela îro 'Ela'eddîn / çi Luqman bû di dewrê da
Fidakar bû ji bona dîn / çi ni'man bû di 'ilmê da
- 2 Bi 'ilmê kes ne hember bû / di 'îşqê de çi dilber bû
Umîda wî pêgember bû / wekî min dî di rewzê da
- 3 Mela ew bû şehê durnas / ewî nû kir gelek asas
Di axir çû gerîb û nas / mela hiştin di huznê da
- 4 Dikir şuhbet wekî bulbul / muhibbê dîn kirin dîkul
Bi çûna xwe wî ehlê dil / yeqîn hiştin di huznê da
- 5 Bi wê 'îşqê bi wê şîdqê / bi wê şewtê bi wê nutqê
Ewî hey kir dilê xelqê / mela ew bû di 'îşqê da
- 6 Ewî kir xizmeta 'ilmê / defî' kir şiddeta zulmê
Bi exlaqê xweş û hilmê / çi şêrîn bû di dewrê da
- 7 Ne wek wî Rustem û 'Enter / ne Kisra Xatem û Qeyşer
Ne şed Zîn û hezar dilber / nebû wek wî di husnê da
- 8 Dibakir ya Resûlellah / digo *la tehzênû wellah*⁶⁰⁰
Fida kim rûh û can billah / ewî ser da di vê rê da
- 9 Mela dunya weha fanî / ewan mehbûbê dil kanî
Çewa şebra te tê yanî / kû gotin maye bê fêda⁶⁰¹
- 10 Mela kanî delalê min / şêrîn û rû-hilalê min
'Eladdîn çav-gezalê min / kû em hiştin di kerbê da
- 11 Di piştî wan tebîbê dil / şêrîn û wan hebîbê dil
Emînê Heyderî bê dil / wekî dîna bi çolê da

⁶⁰⁰ Wexta Hz. Mûhemmed ji Mekkeyê ber bi Medîneyê hîcret dikir ji rêhevalê xwe Ebûbekrê Sidîq r.e. wiha gotibû: "La tehzên, innallahe meana" (Netirse, xwedê bi me re ye).

⁶⁰¹ fêda] fayda NMD3, NMDM.

mustefî ilun / mustefî ilun / mustefî ilun / mustefî ilun
Recez - - + - / - - + - / - - + - / - - + -

- 1 Xelqno bikin hemd û şukir / lewra Xudê dana xwe kir
Kû Xeznewî dergah vekir / hukmê 'Eladdîn taze kir
Hingî kû hat û zêde kir / l' halê feqîra mêze kir

Kî imtişal kir fayde kir / mehrûm nema ji nisbetê
Dînê mubîn eşkere kir / yek neqş û bid'e neketê

- 2 Yek neqş û bid'e tune ye / eqwa' û ewla her heye
'İlm û tebî'et zêde ye / qeşdê bikin pir fayde ye
J' ehlê dila ra yeğme ye / xweş qiblegah û melce ye

Ev mesleka dînê me ye / herne wişal û muhbetê
Emrê Muhammed pê heye / kir quwweta vê ummetê

- 3 Lew nûr bû erzan vê demê / werne îlac û merhemê
Dermanê qelbê elemê / irşad dida nav 'alemê
Meħwa gunaha vê demê / teb'et melek reng ademê

Tirk û 'Ereb û 'Ecemî / mehrûm nebin j' bereketê
Meqşûd Xuda her an hebî / herne serayê Cennetê

- 4 Qeşdê bikin dost û bira / nefsa kubarî ji çira
Teslîm bibin zû çêtira / fetwe nemaye ji me ra
Şêrîn 'ezîzê hazîra / eşl û neseb pir tahîra

Dilê wî j' beħra zaxira / ev bû re'îsê hey'etê
Mujde û mizgîn ji we ra / serbestî dan şerî'etê

- 5 Serbestî dan eħbabê dîn / weqtê dibînîm şaneşîn
Xem û muţalê min revîn / şed hesret û 'işq û evîn
Kî dîtine dewra zemîn / çend şêr di vê malê civîn

Qurban bibê rûhê **Emîn** / kî wê bikî vê himmetê
'İlm û edeb ħubba şêrîn / da wan Xudanê 'izzetê

- 6 Werne mela xorîte delal / teslîm bibin bê qîl û qal
Ger we di vê dergahê 'al / bavê ji wê fikra beţal
Qet hûn nekin şek û qiyal / bid' û riya nîne li bal

Ğeyrî riya heq pir kemal / nûr kirye dewsa zulmetê
Lê **Heyderiyê** kerr û lal / qet ew nizanê qişşetê

[Tercî' bend - Mersiye]

mustef' ilun / mustef' ilun / mustef' ilun / mustef' ilun
Recez - - + - / - - + - / - - + - / - - + -

fa' ilatun / fa' ilatun / fa' ilatun / fa' ilun
Remel - + - - / - + - - / - + - - / - + -

- 1 Ey dilbera dur cane'ê⁶⁰³ / leb-şeker û şîrane'ê
Me' şûm heqîqet zane'ê / eşl û neseb mîrane'ê
Awir-xumar şîrane'ê / bo 'alemê serkane'ê
Xweş- 'arifê qelbane'ê / meh-pare û nûr-xane'ê

Ger dipirsî ez hezîn im dilkesîr û nale nal
Bulbulê dilpare xwîn im şorgula min rûh li bal
Pirs bike carek li halê **Heyderî** goyîn mişal

- 2 Ey nazikê qenc û delal / wech û enî tev şewqe xal
Meş-ħakim û şêrîn-feşal / lew menbe' a ħusn û cemal
Çav-qemerî awir gezal / yek car ħelandî qelb û bal
Me' şûm tebî' et pîr kemal / nefes merhem ebrû hila⁶⁰⁴
Taze gul û reyħane'ê

Ger dipirsî ez hezîn im dilkesîr û nale nal
Bulbulê dilpare xwîn im şorgula min rûh li bal
Pirs bike carek li halê **Heyderî** goyîn mişal

- 3 Ev şewt û dengê Ehmedî / teqrîr û nezmê Serhedî
Rojek ji rojê es'edî / şorgul ji wechê te⁶⁰⁵ fedî
Tali' bilindî es'edî / neclê ferîd û ewhedî
Ĥusna li⁶⁰⁶ wechê te me dî / zerrek ji nûra Ehmedî
Ya ĥusne'ê Ken'ane'ê

Ger dipirsî ez hezîn im dilkesîr û nale nal
Bulbulê dilpare xwîn im şorgula min rûh li bal
Pirs bike carek li halê **Heyderî** goyîn mişal

⁶⁰² Ev helbest pênc bend e. Benda ewil 4 riste û bendên din çar û nîv riste ne. Di nusxeyan de ev nîv riste, li dawîya risteya çaran hatiye nivîsandin. Ji ber ku di rûpelê de hîlnedihat, me ev nîv riste xiste binê risteya çaran.

⁶⁰³ dur cane'ê] der cane'ê NMDM.

⁶⁰⁴ nefes merhem] melhem nefes MMEC.

⁶⁰⁵ Wechê te] rû dînê MMEC.

⁶⁰⁶ Ĥusna li] Nûrek di MMEC.

- 4 Şorgul di bağan da tu wî / şewqa di qelban da tu wî
Xêra di wechan da tu wî / min rûh bi heyran da tu wî
Serdarê ustađa tu wî / perçek ji nûr⁶⁰⁷ peyda tu wî
'Ê ez kirim sewda tu wî / nisbet bi derman da tu wî
Tû ji me ra⁶⁰⁸ Luqmane'ê

Ger dipirsî ez hezîn im dilkesîr û nale nal
Bulbulê dilpare xwîn im şorgula min rûh li bal
Pirs bike carek li halê **Heyderî** goyîn mişal

- 5 Me'şûm hewar bê çare dil / êşa li min dijar e dil
Pir nal e nal e zar e dil / jar û 'elîl û har e dil
'Îşqê kirî şed-pare dil / ez bûm dexîl bê 'ar e dil
Derman bike yek care dil / ev **Heyderî** mekkare dil
Derdê⁶⁰⁹ me dil dermane'ê

Ger dipirsî ez hezîn im dilkesîr û nale nal
Bulbulê dil-pare xwîn im şorgula min rûh li bal
Pirs bike carek li halê **Heyderî** goyîn mişal

-35-⁶¹⁰

[Texmîs - Munacat]

fe'ilatun / fe'ilatun / fe'ilatun / fe'ilun
Remel ++ -- / ++ -- / ++ -- / ++ -

- 1 Dilo canê me ji tîrê⁶¹¹ te gihane 'elemê
Dem û dewranê me çûne tîk bi nalîn û gemê
Kul û derdê me civane ji firaqa te hemê
(Hêvî û tewqe dikin em ji Xudana heşemê)
(Wê nigar û şenemê padişehê muhteşemê)
- 2 Ji xwe bê hal bûme ez jar û 'elîl im bi gemîr
Pê û destê me girêdane bi zulfê xwe herîr
Tu bi husna xwe kî carek me bi dorê xwe negîr
(Carinan bende'ê dil şuhtiyê mehcûrê venîr)
(Bi leb û le'lê şekerbar û ji 'eynê keremê)

⁶⁰⁷ perçek ji nûr] nûra ji rû MMEC.

⁶⁰⁸ tu ji me ra] melhem tu wî MMEC.

⁶⁰⁹ Derdê] De'wa MMEC.

⁶¹⁰ Ev helbest, di NMD1ê de du perçe ne; 8 bendên helbestê yên serî di rêza helbesta 67an û 8 bendên dawî jî di rêza 29an de ye. Di NMD2yê de tenê 8 beşên helbestê yên dawîn hene ew jî di rêza helbesta 29an de ye. Di NMDMyê û NMD3yê de hemû beşên helbestê di rêza helbestan a 4an de cih girtiye. Ev teşaya nezmê ya texmîs, li ser helbesta Melayê Cizîrî hatiye nivîsandin. Di her bendeke de du risteyên di nava kevanekê de yên Melayê Cizîrî û her sê risteyên lêzêdekirî jî yên Mihemed Emînê Heyderî ne. Risteyên Melayê Cizîrî, bi awayê ku di nusxeyên me de hatine dayîn hatine latînîzekirin.

⁶¹¹ tîrê] tîrê NMDM.

- 3 Ji cemala leb û le‘lan⁶¹² hiş û sewda qe⁶¹³ nema min
 Ji te pê ve kî ye carek were rehmê li gema min
 Ger ji destê te yî nazik qedeşa şaf bigiha min
 (Pirsiyarê bike⁶¹⁴ carek bike şêrîn-dehena min)
 (Kû perihîne fîraqa te li ser derd û gemê)
- 4 Kû fîraqa te li hicr û gurbeta min bi te ba
 Meh û salê me bihurtîn qe⁶¹⁵ nema pirsu nema
 Kî ye mizgîn ji sera pê bo me bîn wa tereba
 (Er ne hudhud ji şeba⁶¹⁶ bit û wekî *badê şeba*⁶¹⁷)
 (Dê kû her wî bigihî destê ve pêkê heremê)
- 5 Xem û derd û elem û zarî û efgan me neşîb
 Cerg û navê me ji kerba te hemî pê û lehîb
 Tev li min dağ û birîn in me ne çare ne tebîb
 (Pirsiyarê li me bit werne xwe mehcûr û gerîb)
 (Dê li kê ‘erze bikim vê gem û derd û elemê)
- 6 Ji dema ‘îşqa te hatî li me sergeşte’ê gerdan
 Ji du burhê xwe hilalî weke tîra li me berdan
 Çep û rastê me ji xwînê neqîşand⁶¹⁸ dil me bi derdan
 (Hâşelillah kû bikim eşkere van gûşse’ê derdan)
 (Werne bişojim ji gemê ‘îşqa tû ser ta qedemê)
- 7 Ji gema çû ruh û canim ji wê husna ji qedê ra
 Dilê nazik ji fîraqê bûye mesken ji gemê ra
 Ji du çavê xwe belek bes bi nişaba tû bidêra
 (Me bi Şehra’ê wişala xwe derîn tû ji Xudê ra)
 (Werne weqtê kû bibîn gerqê di behra ‘edemê)
- 8 Wî li bejna te zirav toq û benî nayê⁶¹⁹ quşûrê
 Xalê zulfên⁶²⁰ te bela kir li dunê şu‘le’ê nûrê
 Ji cemala te tû weşfa qe⁶²¹ nizanîm tû geyûrê
 (Ji gulistanê cemala te gelek bête zuhûrê)
 (Ji dunê dê biçitin navê buhuşta Iremê)

⁶¹² le‘lan] le‘la NMD3.

⁶¹³ qe] qet NMDM, NMD3.

⁶¹⁴ bike] li me NMDM, NMD3.

⁶¹⁵ qe] qet NMDM, NMD3.

⁶¹⁶ şeba] seba NMDM.

⁶¹⁷ bayê sibê

⁶¹⁸ neqîşand] neqîşan NMD3.

⁶¹⁹ nayê] na’ê NMDM, NMD3.

⁶²⁰ Xalê zulfên] Xal ji zulfê NMDM.

⁶²¹ qe] qet NMDM, NMD3.

- 9 Li cemala te muḥeyyer ‘Ereb û Tirk û Furûs in
Ger ji nûra te nebit em hemî zengar û xesîs⁶²² in
Kî ji weşfê te xebîr e gelo em jê bibihîsin
(Şerh û ḥalê gemê ‘işqa te ji kû têtê nivîsin)
(Medḥ û ewşaf û cemala te kû çak û reqemê)
- 10 Ji wê ‘işqa te di nava me de kûra agir î
Medḥ û ewşafê cemala te dil û can kir kerî
Were canim tû bi ḥusna xwe gelek zêdetir î
(Wî mecalê kû cemala xwe tecella dikirî)
(Lazim e secde bibin ber te di wê gav û demê)
- 11 Leb û le‘lê te şekerbar tû wî sertacê Şîrîna
Tû wî perda xwe hilîne me rehet ke ji birîna
Da bibin ber te sucûdê kû te carek me bidîna
(Secde bin ber te riwayet di hemî mezheb û dîna)
(Kî dibit⁶²³ muşrik û kafir ji wî şîrînê femê)
- 12 Kî ye kafir ger ji bo te poşe zennar û sucûdê
Firqetek dûr û dirêj bo me neşîb hate wucûdê
Te di fikra xwe dibînim di qiyam û di qu‘ûdê
(Ger bibin ber te sucûdê di dema keşf û şuhûdê)
(Me di dilda bidirit pertewî nûra qedemê)
- 13 *Inne cismî zabe fî qelbî hewakum celesa*
Ḥablî min ḥubbike zewqen la teridnî eyesa
Inne fikre`l-Ḥeyderî la yexlu ‘enke nefesa
*(Qibletî wechuke fî kullî sebaḥin we mesa)*⁶²⁴
(Bi du ebrû yî te cana bixwirim ez qesemê)
- 14 Dixwirim ez bi du zulfê te xelek şond û yemînan⁶²⁵
Bi du çeşmên⁶²⁶ te belek şifa ji bo derd û birînan⁶²⁷
Bi du lêvê şekerînî gemrevînê me hezînan⁶²⁸
(Mûyekî ez ji te nadim bi duşed Zîn û Şîrînan⁶²⁹)
(Çi dibit ger tû hesêbkî me bi Firhad û Memê)

⁶²² xesîs] ḥesîs NMDM, NMD3.

⁶²³ dibit] dibê NMDM.

⁶²⁴ Cismê min heliya di qelbê min de hubba we rûniştiye
Hezkirîna xwe bi min bide tamkirin min bi bêhêvîti nezîvîrîne
Fikra Ḥeyderî yek nefesê ji te xalî nabe
Sibeh û êvarî wechê te qibleh a min e.

⁶²⁵ yemînan] yemîna NMDM, NMD3.

⁶²⁶ çeşmên] çeşmê NMDM, NMD3.

⁶²⁷ birînan] birîna NMDM), NMD3.

⁶²⁸ hezînan] hezîna NMDM, NMD3.

⁶²⁹ Şîrînan] Şîrîna NMDM.

- 15 Te bi pencî esedî tîk dil û canim herişandin
 Te li beşl û mîrekan top û tifengê direşandin
 Te bi gurzê 'Ecemî gewde ji xwînê neqîşandin
 (Te Fireng û 'Erebistan Mecerê tîkê sitandin)
 (Celewî xweş vegerîn hatiye nû ba 'Ecemê)
- 16 Dilkulê jar û 'elîl e ketye⁶³⁰ ber êş û bela'ê
Heyderîzade dikêşe elem û cewr û cefa'ê
 Me bi keyfê bibuhêre bigerîn zewq û şefa'ê
 (Me ji dîwana se'adet seh kirî şubhê **Mela'ê**)
 (Tû bi navê me geda'ê bikişîne qelemê)

-36-⁶³¹

[Teşîr - Munacat]

mef'ûlu / mefa'îlu / mefa'îlu / fe'ûlun
 Hezec - - + / + - - + / + - - + / + - -

- 1 (Xeşmê li feqîran meke zû padişehê min)
 Curmê meke wacib li geda'ê şubehê min
 Rehmê li yesîrê xwe ke ey naz û mehê min
 Qeşda te hebî keşfê bikî rah û rehê min
 (Pîrê bike carek li xeta û gunehê min)
- 2 (Teftîşê bi mûm û bike er em bi xeta'în)
 Tehqîqê bi şahid bike kû em bi wefa'în⁶³²
 Ger geyrî kewî te di derûnê me de ma'în⁶³³
 Ger sûcê me pîr bûn me nema şerm û heya'în
 (Vê car bike pêt tû li welat û wecehê min)
- 3 (Cewra te behêt in û cefaya te perêtin)
 Tîrê te reşandin li me tev agir û pêt in
 Dil pare'ê husna te me her xwîn diwerêtin
 Pîrsek qe⁶³⁴ nekîr em ji xwe mehcûr biderêtin
 (Qurbana te bim guh bide carek gilehê min)

⁶³⁰ Dilkulê jar û 'elîl e ketye] Dilkul û zar û 'elîl im ket me NMDM.

⁶³¹ Ev helbest, di NMD1ê de di rêza 66an, NMD3 û NMDMyê de jî di rêza helbesta 3yan de cih girtiye. Di her sê nusxeyan de jî hemû beşên helbestê hene. Ev teşaya nezmê ya teşîr; li ser helbesta Melayê Cizîrî hatiye nivîsandin. Di her bendekê de du risteyên di nava kevanekê de yên Melayê Cizîrî û her sê risteyên di nava her du risteyan de lêzêdekirî jî yên Mihemed Emînê Heyderî ne. Risteyên Melayê Cizîrî bi awayê ku di nusxeyên me de ne hatine latînîzekirin.

⁶³² wefa'în] wefayîn NMDM.

⁶³³ ma'în] mayîn NMDM.

⁶³⁴ qe] qet NMDM.

- 4 (Zanin kû ji derbê we cefa'ê elemên dil)
 Ahî û fîğan çûne sema eşkê di wan bil
 Bê çare me min daye di bin barê giran mil
 Çend sal e dikêşim elema cerg û dilê kul
 (Rehmê li geda'ê xwe ke sultân û şehê min)
- 5 (Sih sal e ji derd û ji bela'ê te hilak in)
 Ser ta bi qedem şubhetê bulbul nebû sakîn
 Yek lehze ji derdan me du çeşmên xewê nakîn
 Dê kengî rehet bî dilê mehcûr em ê rakîn
 (Hetta bi felek her deritin ah û ahê min)
- 6 (Ma yek nefesek min dibitin şebr û qerarek)
 Her şam û seher werdê min e ahî yû zarek
 Perwane-şifet hesretê pir şuhtine carek
 Şebrek qe⁶³⁵ nemaye me ji hûsna te mubarek
 (Qed bê te û bê te dibitin mişlê sihê min)
- 7 (Ger şubhetê perwane di bezmê tû çu hed ke⁶³⁶)
 Ger şubhetê berqa ney û çengê li me hed ke
 Derbendê semager tû bi awazê bi med ke
 Çend reng e bi teqrîr û fîğanê li me red ke
 (Şed nale û hezar rengê wekî çengê jehê min)
- 8 (Nûrîn qedeşa xemr û heyata me li ser wan)
 Minnet kû telef bit ser û çeşmê me di ber wan
 Meqşed ji me ra ger hebitin le'le şekerwan
 Min daye rehîne ruhê te **Heyderî** ger wan
 (Ger wê bîdîtin destê bi dest muşterihê min)
- 9 (Yek 'îşqê **Mela yî** bê buha bête ji le'lan)
 Nuşîn bikîtin wê qedeşa şubhetê lalan
 Zewqeq li heyata me werîtin mehê salan
 Şu'lek ji wê hûsnê⁶³⁷ kû **Emîn** bid ya ji dalan
 (Şed can me hebin hîşek û meqşer di behê min)

⁶³⁵ qe] qet NMDM.

⁶³⁶ hed ke] şed ke NMDM.

⁶³⁷ hûsnê] hûsna NMDM.

mefa'îlun / mefa'îlun / mefa'îlun / mefa'îlun
Hezec + - - - / + - - - / + - - - / + - - -

- 1 Şukurlillah me dî zahir / terîqa Xeznewî şewq da
Ji nesla kamil û tahir / 'Ela'eddîn dibû peyda
Di vî qirnê me 'ê axir / di Islamê 'ilam hilda
- 2 Di vî qirnê me 'ê talî / 'ilam hilda ji tewbê ra
Dikim hêvî kû bên alî / Muḥemmed çariyar pê ra
Mu'înê wî Xuda 'alî / ji qaf û qaf tamam jê ra
- 3 Xuda jê ra heme yar bî / ji qaf û qaf kû bên tewbê
Di emrê wî da her kar bî / ji şerqê ta herî gerbê
Kesê l' dînê xwe guhdar bî / werin heyra bikin tēlbê
- 4 Bikin tēlbê werin heyra / nebin meḥrûm ji en'amê
Dixwazî ni'met û xeyra / werin ber dergêhê 'amê
Vebû dergah ji tewbê ra / di vê iqlîmê Islamê
- 5 'Ela'eddîn nezer berda / di 'ilmê da gelek meşhûr
Çi durra şafi yû ferda / mirîd pê dilgeş û mesrûr
Hilanî şedre û perda / reşandî misk û feyz û nûr
- 6 Ji vî dînî ra ew piştin / hilanî perdeya zulmê
Qulûbê reş gelek şuştin / ji min qet kes nekin lewmê
Gelek nefse kubar kuştin / bi ders û şuhbet û 'ilmê
- 7 Di 'ilmê beḥra 'Umman e / şukur em pê dîkin fexrê
Ji derda re çî Luqman e / ew in piştî me vê dewrê
Li şûna Xeznewî mane / ji lew em pê dîkin şebrê
- 8 Li şûna quṭb û ustada / me dî ev murşidê dîn e
Celîsê textê irşada / çî meḥbûb û çî şerîn e
Qebûl kir **Heyderîzada** / ji şêxa Şêx 'Eladdîn e
- 9 Qebûl kir em çî bê xêr in / hezar wek min gulamê te
Yesîrê qeyd û zencîr in / dibos im dest û dawê te
Li dergahê te qîtmîr in / **Emîn** bû xaki payê te

[Murebbe‘ - Pendname]

mustef‘ilun / fe‘ûlun
Munserih - - + - / + - -

1 Dilo dunya be‘al e
Tev de xewn û xeyal e
Jê ra nebin heval e
Pir dujmin⁶³⁹ û neyar e

2 Dilo dunya şîrîn e
Xelqê bi rûh kirîne
Wê pir serî birîne
Weke pîra se‘ar e

3 Dilo dunya fena ye
Cihê kul û derda ye
Çîqa⁶⁴⁰ hebe bela ye
Bê fayde ye zerar e

4 Zahir weke⁶⁴¹ buhuştê
Çend rojekî bi xweş tê
Ji gafil da bi reş tê
Wek e cinê gedar e

5 Dunya pîs û melaq e
Tijî derd û meraq e
Axir neql û firaq e
Tijî jehr e wek mar e

6 Dilo dunya derwîn e
Çiqas ji me r’ bimîne
Tû guh nedê xa’în e
Jina pîs e bi yar e⁶⁴²

7 Dunya otêl e xan e⁶⁴³
Tû çend roja mêvan e
Tû b’ ‘aqilî⁶⁴⁴ bizane
Dunya ne mal e bar e

⁶³⁸ Ev helbest, di nusxeyên NMD1 û NMD2Yê de tune ye. Lê di nusxeyên NMD3 û NMDMyê de heye. Dîsa ev helbest bi destxeta Mihemed Emînê Heyderî jî li ber destê me heye. Em ê jî destxeta Mihemed Emînê Heyderî ji xwe re bingeh bigrin.

⁶³⁹ dujmin] duşmin NMD3.

⁶⁴⁰ çîqa] çiqas NMD3.

⁶⁴¹ Zahir weke] Dunya wekî NMD3.

⁶⁴² bi yar e] xerab e NMD3.

⁶⁴³ otêl e xan e] otêl û xan e NMD3.

⁶⁴⁴ Tu b’ aqilî] Tu bi ‘aqil NMD3.

- 8 Dilo dunya seqîh e
Di zahir de melîh e
Baîin tehl û qebîh e
Cambaz⁶⁴⁵ e hîlekar e
- 9 Çiq⁶⁴⁶ kû bête dest e
Înan nebe⁶⁴⁷ bêbext e
Karê wê tev de sext e
Bê fayde ye xesar e
- 10 Tû guh⁶⁴⁸ nedê cambaz î
Tû wê qet nakî razî
Çiq⁶⁴⁹ xêrê bixwazî
Axir j' te ra neyar e
- 11 Dilo tû xwe nespêrê
Kes jê nabînî⁶⁵⁰ xêrê
Talî bi qazm⁶⁵¹ û bêrê
Te dikşînî⁶⁵² mezar e
- 12 Dilo tû baş bi kar be
Ji xêrê⁶⁵³ ra şiyar be
Li dînê xwe guhdar be
Li pêş e qebr û nar e
- 13 Kesê j' Xudê re mêr e
Karê wî tev de xêr e
Cennet helal e jê re
Dilê wî her behar⁶⁵⁴ e
- 14 Kesê kû dil bi hîle
Tû guh⁶⁵⁵ nedê 'elîl e
Ji xêrê⁶⁵⁶ ra bexîl e
Ji ya Xudê re sar e

⁶⁴⁵ cambaz] canbaz NMD3.

⁶⁴⁶ Çiq⁶⁴⁶] Çiqas NMDM.

⁶⁴⁷ Bawer neke.

⁶⁴⁸ guh] goh NMDM.

⁶⁴⁹ çiq⁶⁴⁹] çiqas NMDM.

⁶⁵⁰ nabînî] nabînê NMDM.

⁶⁵¹ qazm] tev NMD3.

⁶⁵² Te dikşînî] Te dikşînê NMDM, Te kaş dikî NMD3.

⁶⁵³ xêrê] xeyrê NMDM, NMD3.

⁶⁵⁴ bihar] behar NMDM, NMD3.

⁶⁵⁵ guh] goh NMDM.

⁶⁵⁶ xêrê] xeyrê NMDM, NMD3.

- 15 Tû axretê ava ke
Derdê xwe pê dewa ke
Ew ê xeyrê eda ke
Ew e ji bo te kar e
- 16 Dilo dunya weha ye
Cihê derd û bela ye
Ewê ğafil nezan e
Dunya jê ra zerar e
- 17 Ev **Heyderî** nezane
Pir ‘eybê wî xuya ne
Ji xêrê⁶⁵⁷ ra keslan e
Mirovekî⁶⁵⁸ bê‘ar e

-39-

[Murebbe‘ - Medhiye]

mefa‘îlun / mefa‘îlun
Hezec + - - - / + - - -

- 1 Hêbîba min kemer zêrîn
Şêrîna nazik û nûrîn
Ji lêva şerbeta şêrîn
Bi fincana sipî mey da
- 2 Ew ê mey da bi fincanê
Kirim yexsîr⁶⁵⁹ di zindanê
Gelek serxweş li meydanê
Emîr û zahid û seyda
- 3 Ji ‘îşqê tev ketin cezbê
Li meydanê wekî herbê
Birîndar im ji wê derbê
Yesîr hiştim di nav qeyda⁶⁶⁰
- 4 Şehê şêrîn hebîb Eħmed
Ji alî dil tebîb Eħmed
Çi zana û lebîb Eħmed
Ev e karê hunermerda

⁶⁵⁷ xêrê] xeyrê NMDM, NMD3.

⁶⁵⁸ mirovekî] murovekî NMDM, NMD3.

⁶⁵⁹ yexsîr] bêhiş NMDM.

⁶⁶⁰ qeyda] benda NMD1, NMD2.

- 5 Ev e karê şêrîna min
Delal û nazenîna min
Delal⁶⁶¹ û gemrevîna min
Dema tê der ji bin perda
- 6 Ji bin perdê kû ew tê der
Bi husna xalê şor û zer
Dilê ‘aşîq kirî şed ker
Bi ah û hesret û derda
- 7 Ji ‘îşqa wî gelek cara
Dibûm serxweş gelî yara
Werin halê birîndara
Ji bêhna şorgul û werda
- 8 Bi bêhna wî ez im dilgeş
Ez im ‘aşîq û dil pir geş
Dimînî **Heyderî** serxweş
Ji ‘îşqê⁶⁶² ruh û can tev da

⁶⁶¹ Delal] Şêrîn NMDM.

⁶⁶² ‘îşqê] hubbê NMDM.

[Murebbe‘a Mulemme‘ - Medhiye]

fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilun

Remel - + - - / - + - - / - + - - / - + -

- 1 *El-firaqu halenî min be‘di hubbin qed weced
Kemterîn dilxwahê in şod⁶⁶⁴ ber muradeş ne resed
Ger bu yolda ben ölürsem çare yoq sizden sened
Merhema derd û birîna wê li cem Me‘şûm weced*
- 2 *Ya hebîbê hel teqûlû keyfe haluk fi‘l-hewa
Der hewa bit men yekû‘ derdê li men bû şed newa
Murwetinle qil kerem Me‘şûm bûyûr sizden dewa
Tû li qelbê min nezer kî şed hewar û şed meded*

⁶⁶³ Di risteyên Erebi, Farişi, û Kurdî de em bi fonetîka ku helbestvan bi kar anîye re sadiq man.

- 1 Piştî hezkirina min ku hebû firaq hate ser min
(Ez ê) herî bi kêmasî û qusûran bûm dilxwazê vê rîyê û negihaşt(im) miradê xwe
Ger di vê rîyê de bimir ez çare ji we nîne sened
Merhema derd û birîna wê li cem Me‘şûm weced
- 2 Ey hebîbê min ma tê bibêje halê te di eşq û muhebbetê da çawa ye
(Ev riste tu wateyekê nade. Muhtemelen çewt hatiye îstînsaxkirin.)
Bi comerdiya xwe kerem ke rehmê Me‘şûm ji we dewa
Tu li qelbê min nezer kî sed hewar û sed meded
- 3 Li vî birîndarî ku xwîna wî diherike rehmê bike
Ev çend salê min e (li pey wî) tû û lêvzuwa dilxwazê zulfa me (di vê rîyê de) bûme ax
Bi firqeta we pir xemgîn im ka li van deran çi bikim
Nale nalê qelbê xemgîn tene der heta ebed
- 4 Tu di xweşîkbûnê de wekî heyvê ye
Ez pesnê te bidim, eger tu min bibexşîn î
Li ber çavan tu rûniştî ka çi bikim bi fenera
Tu dîzanî me ji xeyrê te nexwestî tu meded
- 5 Ey eşq û muhebbeta min bi tu bi edeb nav û dengê min bigîhîne cih
Dil zêde birîndar bû û şev û roj bi ax û zar e
Ger tu min azad bikî ji derdê min re bû sebeb
Ya li min îro nepirsî mam êsîr û bê sened
- 6 Me‘şûm bûye Ke‘beya daxwaziyan ji însanan re melce û dergah e
Sed şêx û mela nikarin wesfê wî bidin
Mizgînî li me be ew hat wê here ji me her bela
Me rîya ‘eşqê nizani ku bela bûne du sed
- 7 Li ber çavan tu dûrî emma tu di qelbê min de rûniştiye
Ji wê pê ve tu rêyek tune ye bona Emîn dilê vê nefse
Piştî Ehmedê min Me‘şûm bû eşkere ew reîs
Kelbê dergahê murada **Heyderî** miskîn e bed

⁶⁶⁴ şod] nesîd NMD1, NMD2.

- 3 *Kun rehîmen lî cerîhin yecrî min hu seylu dem
Çend salem teşne leb dilxwahê zulfan xaki şodem
Firqatinden çoq üzüldüm bû cihetde ne idem
Nale nalê qelbê gemgîn tene der hetta ebed*
- 4 *Ente fi`l-ḥusnî kema tûşef we tuḥka qemmera
Men konem ber to sitayeş ger bibexşê bi me ra
Göz önünde otûrûrsun ne idem ben fenera⁶⁶⁵
Tû dizanî me ji geyrê te nexwestî tû meded*
- 5 *Belligi`l-`inwane `ennî ya hewaye bi`l-edeb
Kî bû seyarê zexmê şod dil bazarê rûz û şeb
Ger benî azad idersen derdime oldû sebab
Ya li min îro nepirsî mam esîr⁶⁶⁶ û bê sened*
- 6 *Ke`betu`l-amali Me`şûm melce`u`n-nasi cela
Natuwanîd hedd û weşfê ew şedê şex û mela
Müjdeler olsûn bize geldî o gîtsin her bela
Me riya `eşqê nizanî kû bela bûne du şed*
- 7 *Kunte fi`z-zahir be`iden ente fi`l-qelbi celîs
Der xeyal⁶⁶⁷ cuz an gozer nîst bû **Emîn** dil î n nefîs
Aḥmedim arinde Me`şûm eşkere oldû re`îs
Ma li dergahê⁶⁶⁸ murada **Heyderî** miskîn e bed*

⁶⁶⁵ fenera] qemera NMDM.

⁶⁶⁶ esîr] yesîr NMDM.

⁶⁶⁷ Peyva xeyal di NMDM yê de tune ye.

⁶⁶⁸ Ma li] Kelbê NMD1, NMD2.

[Murebbe‘a Mulemme‘ - Mersiye]

fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilun
Remel - + - - / - + - - / - + - - / - + -

- 1 *El-firaqu i ‘teranî hakeza kane`l-qeder*
El-meded Ğewşê zemanî dil li min bûye diger
Eyledim ettim fîganî ey felek yağtî ciger
Ey şehê min nav gelê min da dilê min şed keşer
- 2 *Ya ‘Ela’eddîn hebbîb[î] minke îmdadun tuzîd*
Kanî derman û neşîbî çav li wî ne ev murîd
Bekledim derdim tebîbîm kesmedim senden umîd
Şermisar im bêqerar im hem dinalim bê mefer
- 3 *Fate ‘umrî bi `l-gurûrî tehte eşqali`z-zunûb*
Nisbeta rengê difûrî şerq û ğerb quţbê cunûb
Kîmse çoq olsa qûşûrî têwbe etsin donmeyûb
Lew tû xaşî durşinasê hem ğewaşê behr û ber

⁶⁶⁹ Ev helbest di tu nusxeyan de tune ye. Agahiya malbata Heyderî jî ji vê helbestê tune bû. Di mecmû‘eya ku me ji ba feqeyê Şêx Mihemed Emînê Heyderî Mele Sîrac bi dest xist û bi lêkolînên li ser vê mecmû‘eyê me derxist holê.

- 1 Firaqê hat ser min qedera min ew bû
El meded xewsê zemanî dil li min bûye diger
Ey felek min kire gazî lewra biraştî ev ceger
Ey şehê m’ na veger lê min da dilê min sed keser
- 2 Ey ‘Ela’eddînê dost ji te zêde dibe îmdad
Kanî derman û neşîbê çav li wî ne ev murîd
Bendewarê tebîbê derdê min nebirrî ji te umîd
Şermisar im bêqerar im hem dizarim bê mefer
- 3 ‘Umrê min bi xurûrê xelas bû di bin gunehan de
Nusbeta rengê difûrî şerq û ğerb quţbê cunûb
Ew kesê bi qusûrê pir bin bila were bike tewbê
Lew tu xaşê durşinas î hem ğewaşê behr û ber
- 4 Hemd ji Xwedê re me dît ew tişt li warê Xeznewî
Û li Tilme‘rûf û l’ Xizna behlewanê uxrewî
Mexrûr nebin mirin heye kesek namîn dunyawî
Pir kubar in nazidar in namîdar in xweş sened
- 5 Gotina Xweda (ku di Qur’anê de gotiye) bêhêvî nebin ez kêf xweş kirim
Hilde perdê nûr ke derbê em bibîninê zehmet
Min êsîrî jî tobe kir qet dirêj nakim qisset
Em feqîr in hem esîr in dil kesîr in pir keder
- 6 Birayên wî ji hebûn emma Xweda bi ‘Ela’eddîn re alîkarî kir
Textê îrşadê tu dîne tewbeya ‘am tu bi der
Hal bi hal dihatin meydanê didan wî qîmet û qedr
Dîlkirî me **Heyderî** me muşterî me yek nezer

- 4 *Hemdu lillahî wecedna fî diyar`il-Xeznewî*
 Û li Tilme`rûf û Xezna behlewanê uxrewî
Ölmeyen megrûr çeken hiç kimse qalmaz dunyewî
 Pir kubar in nazidar in namidar in xweş sened
- 5 *Serrenî maqalehû Reb La teqnuţ min rehmet[î]*
 Hilde perdê nûr ke derbê em bibînin zehmet[î]
Töwbe qildim bendê herbim hiç uzatmam qışşet[î]
 Em feqîr in hem esîr in dil-kesîr in pir keder
- 6 *Ax lehû felleh `eleyna bil`Elal`î mus`îde*
 Textê irşadê tû deyne tewbeya `am tû bide
Gel gîden meydane oynatan ede
 Dîlgirî me **Heyderî** me muşterî me yek nezer

-42-

[Muxemmes – Medhiye]

fa`ilatun / fa`ilatun / fa`ilatun / fa`ilun
 Remel - + - - / - + - - / - + - - / - + -

- 1 Dilbera nazik nihalê / gul di bagê lezzetê⁶⁷⁰
 Qameta selwî fişalê / şikl û şun`a⁶⁷¹ qudretê
 Ser Şîrîna ba cemalê / têr ji feyz û nisbetê⁶⁷²
 Şox û şengê pir delalê / can fidayê qametê
 Mey⁶⁷³ ji destê te me xwestê / bûme mestê şerbetê
- 2 Mîm û dalê te mu`enber / kakulê zulfê siyah
 Gul di bagê te mudewwer / ey şehê dewlet-penah
 Xweş mukemmel hem mu`emmer / husnê nûrek⁶⁷⁴ şubhê mah
 Hesreta min ez muzeffer / bim bi zewqê ah û ah
 Dest û zenda kirme sewda pê di qeyda firqetê
- 3 Her dema kû tête bîra / min di ruxsarê gulav
 Çavreşê⁶⁷⁵ awir ji tîra / dağ dida cerg û hunav
 Min jî berda deng û qîra / wî nekir rehîm û silav
 Sêfilim wek rehîbê dêra / Şêxê Şen`anî bi nav
 Şa`e şî`rî fate `umrî za`e fikrî şuhbetê⁶⁷⁶

⁶⁷⁰ lezzetê] cennetê NMDM

⁶⁷¹ şun`a] şun`ê NMDM.

⁶⁷² têr ji] hem bi NMDM.

⁶⁷³ Mey] Lew NMD1.

⁶⁷⁴ husnê nûrek] wechê nûrîn NMDM.

⁶⁷⁵ çavreşê] Çavreşê NMDM.

⁶⁷⁶ Helbesta min belav bûn `umrê min xelas bû, fikra min suhbata min winda bû.

- 4 Mislê Mecnûn bê tebat im / tēm civata dilberê
Her⁶⁷⁷ wekî bulbul dihatim / nav gula der seherê
Bû li min hesret û ma'tem / mislê Ava Kewserê
Te ziyaret kim bibosim / bil-edeb ey beşerê
Wer tû şahê roj û mahê textegahê dewletê
- 5 Min ji destê⁶⁷⁸ te kişandî / keder û êş⁶⁷⁹ û elem
Te bi husna xwe helandî / cegerê min dem bi dem
Li dilê min neqışandî / şûretê xwe bi qelem
Hiş û 'eqlê min revandî / tû bike rehîm û kerem
Bi silava ji du çava⁶⁸⁰ wekî dava li me⁶⁸¹ tê
- 6 'Eksê husna te li dil da / ez dilê dîwane me⁶⁸²
Ew cemalek mûm û finda⁶⁸³ / ez li ber perwane me
Şerbeta lêva ji qenda⁶⁸⁴ / tûtiyê wîrane me
Wê cefa'ê bes bi min de / serxweş û sukrane me
Mest û gēj im xwîn dirêjim ez çî bêjim qışsetê
- 7 Mest û serxweş tême reqşê / ma gelo fetwe heye
Lew ji bê 'eql û ji neqşê / min vekir ev de'weye
Mam di nava heş û beyşê / dilketin⁶⁸⁵ bê lewme ye
Heyderîzade bi şexşê / can bi qurbana te ye
Lew **Emîn** bû dilbirîn carek bibîn der gurbetê

-43-⁶⁸⁶

[Muxemmes - Medhiye]

mef'ûlu / mefa'îlu / mefa'îlu / fe'ûlun (mefa'îlun)
Hezec - - + / + - - + / + - - + / + - -

- 1 Nûrşînê çî xweş bû bi wucûda Hezret û Seyda
Nisbet ji Semerqend û Buxara ta ji Geyda
'Îlm û 'edeb û zîkr û huşûr t êk bûne⁶⁸⁷ peyda
Kî b' rastî kirî qeşda wî ji xwe r'dîtî fayda
Ya Reb tû hîfizê⁶⁸⁸ bikî li ehlê Hezret û Seyda

⁶⁷⁷ Her] Hem NMD1.

⁶⁷⁸ destê] 'işqa NMDM.

⁶⁷⁹ êş] derd NMDM.

⁶⁸⁰ çava] çavan NMDM.

⁶⁸¹ dava li me] ava bi xwe NMD1.

⁶⁸² ez dilê dîwane me] dîn û sewda'ê te me NMDM.

⁶⁸³ Ew cemalek mûm û finda] Wê cemalê şu'le xweş da NMDM.

⁶⁸⁴ Şerbeta lêva ji qenda] Ez ji derda bûme winda

⁶⁸⁵ dilketin] dilkulê NMDM.

⁶⁸⁶ Ev helbest, tenê di nusxeyên NMD3 û NMDMyê de heye. Em ê nusxeya NMDMyê ji xwe re bingeh bigirin.

⁶⁸⁷ bûne] bû ye NMD3.

⁶⁸⁸ hîfizê] hîfza NMD3.

- 2 Nûrşînê çi şêrîn e bi wê merqeda palê
Ç' xweş nûr û ziya ye li muqabil ehlê malê
Ewladê mala teb'et melek in di mişalê
Ilahî tû perda xwe ji ber merqed bide alî
Wê xelq bizanin ka çi cemala Hezret û Seyda
- 3 Nûrşînê çi xweş war e wekî bagê gula ye
Paytextê terîqê merkeza şeyx û mela ye
Yek dîtina merqedê tehqîqî ke'ba dila ye
Her yek j' ewladê vê malê xweş ruþbe 'ula ye
Ya Rebbî dewamê bide mala Hezret û Seyda
- 4 Nûrşînê çi xweş bû merkeza şehr û ciha ye
Ev 'ilm û edeb zîkr û huzûr tê de gihaye
'İlmê⁶⁸⁹ Serheda pê bûye meşhûr ne neha ye
Feyza dirijê **Heyderî** Asî bavê Beha ye
Zanim bi yeqînî tev ji yumna Hezret û Seyda

-44-⁶⁹⁰

[Muxemmes - Medhiye]

mefa'îlun / mefa'îlun / mefa'îlun / mefa'îlun
Hezec + - - - / + - - - / + - - - / + - - -

- 1 Eya Seyda'ê Şêx 'Ebdurrezaq îro li ser 'erda
Cemala te xuya nakî te can û dil temam keyda
Dilê gemgîn berê kul bû te yek car agirek pê da
Te axaftin birînê dil hiş û 'eqlê me bûn sewda
Ji fikra min tû derna'ê heta şag bim eya Seyda
- 2 Eya Seyda şev û roja ji fikra min tû derna'ê
Çikû tev çû heyata te di hubba Şahê Xezna'ê
Ji fikra dûriya we ev hinavêm' ketine ta'ê
Di piştî we heyata me qe xweş nabê li dunya'ê
'Eceb carek heye em we bibînin wek berê Seyda
- 3 Eya Seyda bi rastî em li ser we dil bi birîn in
Xweş e kû em li Hewdê Kewşerê hev dû bibînin
Bi fezla heq ji yumna we kul û derda derînin
Emê heyfa ewan rojê bihurtî pê hilînin
Bi îhsana Xudê em jî li dûv fikrê we bin Seyda

⁶⁸⁹ 'İlmê] Ev 'ilmê NMD3.

⁶⁹⁰ Ev helbest, tenê di nusxeyên NMD1 û NMDMyê de heye. Di nusxeya NMD1ê de diyar e ku rûpelek ji nusxeyê kêr e ji ber vî hawî sê risteyên helbestê yê dawî tunene. Ji ber van sedeman em ê nusxeya NMDMyê ji xwe re bingeh bigirin.

- 4 Eya Seyda di baĝê hilm û şîdqê da tû reyhanî
Sexî yû serwerê kamil di 'ilmê heq tu wî fanî
Te agir da dilê dostan dibêjin ew cemal kanî
Kû meclîs tê gerandin⁶⁹¹ em te nabînin li dîwanê
Heqe ez dil li şîşa xim ji fîrqa şuhbeta Seyda
- 5 Eya Seyda te xizmet kir ji 'ilmê ra bi mêranî
Te kir şuhbet li dîwanê bi wechê xweş bi şêranî
Gelek hummet te da 'ilmê heqîqet şîklê şêranî
Tû bû sekna me yetîma hecî hatî bi mêvanî
Li etrafa bipirsîn ka heye îro wekî Seyda
- 6 Eya Seyda dikim hêvî ji *zâtê zulcelalî*⁶⁹²
Bi fezla xwe Xudê danî meqamê te gelek 'alî
Bi eşnafa Xudê rutbê bidê Seyda ne 'ê talî
*Bi tacû cewherû xuldunne 'îmî ehsenu 'l-ħalî*⁶⁹³
Keremkarê Xuda ye dîtina xwe her bidê Seyda
- 7 Eya Seyda çîqa bêjim tû hêja bû di wensê da
Bi rehîm û şefqet û merdî nebû wek te di weqtê da
Te şuhret da di nav xelqê di babê cûd û 'ilmê da
Yeqîn ke **Heyderî** dilxwîn ji herkes kêmtir e zêda
Di piştî te nema şebrek eman Seyda eman Seyda

-45-⁶⁹⁴

[Muxemmes - Medhiye]

mefa'îlun / mefa'îlun / mefa'îlun / mefa'îlun
Hezec + - - - / + - - - / + - - - / + - - -

- 1 Dilo merqed çî hêja ye / ewê tê da keremkar in
Kû her yek tê da paldaye / wekî şêra hunerdar in
Li ser textê xwe 'enqa ye / ji derda em birîndar in
Cihê şehzad û şaha ye / ji 'îşqa wan cegerpar in
Wekî mîran ji xelqê ra bi soz in hem bi rûhyar in
- 2 Dilo merqed çî gulzara / ji baĝê şorgula rengîn
Bi zewq û şuhbeta yara / bi wan lêvê şeker-bengîn
Hezar bulbul li ser dara / dîkin şed neĝme û dengîn
Bi roj û şev ji 'îşqa ra / bi hev re tene şed cengîn
Enîsê wan celîsê wan li ba wanê bi rûhyar in

⁶⁹¹ gerandin] gerîdan NMDM.

⁶⁹² Celal, Xwedayê ku xwediyê mezinahiyê.

⁶⁹³ Bi tac û cewher bi ni'metê daim bi halekî xweş û xweşik.

⁶⁹⁴ Ev helbest, di nusxeyên NMD1 û NMD2yê de tune ye. Lê di nusxeyên NMD3 û NMDMyê de heye. Em ê nusxeya NMDMyê ji xwe re bîngêh bigirin.

- 3 Dilo merqed tijî nûr e / ji wê şu'le dida banî
Wekî şewqa riya Tûr e / ji erdê çûye ezmanî
Di şerq û gerbê meşhûr e / gula min Ehmedê Sanî
Wekî şêrê di dest şûr e / dikir wî hukmê sultânî
Tebîbê min hebîbê min ewanê kû bi rûhyar in
- 4 Dilo merqed li Tilme'rûf / ne wek dewra berê mane
Ruhê wana li wan me'lûf / di yek gurfê de cih dane
Li ba hev rû bi rû mekşûf / ewan şuhbet girêdane
Hebîbê dilber û me'rûf / tû zanî pir çî hêja ne
Çî hêja ne çî hêja ne wefadar in bi rûhyar in
- 5 Dilo merqed ji xelqê ra / bûye hesret wekî Ke'bê
Hezar şeffê jin û mêra / ji etrafa bi her te'bê
Ji 'îşqê can û mal jê ra / kirin yeğme bi yek derbê
Şukurlillah ewan şêra / kû pir xweş kir dilê şe'bê
Wekî Luqman didin⁶⁹⁵ derman tû zanî kû bi rûhyar in
- 6 Dilo merqed bûye bustan / here dil pê mufferreh ke
Kû axa wî bûye derman / tû wan çeşman mukehhel ke
Li Tilme'rûf heye Luqman / tû van derdê xwe pê hel ke
Bike qeşdê bi rûh û can / heyata xwe mukemmel ke
Heyata min necata min li ba wanê bi rûhyar in
- 7 Dilo merqed heyata min / bi wan şebra me tê da'im
Eger carek necata min / hebe tehqîq ji wan zanim
Kû êşa wan bihata min / ew in wensa riş û canim
Kû na'ê qet tebata min / kuleybê ber derê wan im
Ruhê vî **Heyderî** laşey li ba wanê bi rûhyar in

-46-

[Muxemmes - Medhiye]

fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilun
Remel - + - - / - + - - / - + - - / - + -

- 1 Ke'beya husn û cemalê der kenarê Xeznewî
Hem buhuşta îremê berqa biharê Xeznewî
Feql û îhsana Xudê her dem bibarê Xeznewî
Hesreta xelqê bibînin mêrg û warê Xeznewî
Hemd ji Xudê ra textê şêra derdiyarê Xeznewî

⁶⁹⁵ didin] didan NMDM.

- 2 Hemd ji Xudê ra ketne dewra şahê Nûrşîn Şêx Zîya
Bûn⁶⁹⁶ mirîdê Şahê Xezna serbilindê ewliya
Yek ji sultanê ewel bû lê Xudê da taliya
Nefs û şeytanê me bimrin terkê nadin bê riya
Şahê Xezna na'ê weşfa⁶⁹⁷ tacidarê Xeznewî
- 3 Ger dixwazî tû ji dest nefsê xelaş bî ey beşil
Her bibîne murşidê kamil terîqa bê mişil
Guh bide adab û dersê wan rehet ke qelbê kul
Da bi wens û şuhbeta wan lezzetê xweş bîne dil
Min yeqîne we nedîne wek kubarê Xeznewî
- 4 Wer bi çavê min tu mêze ka te wek wî dîtine
Yan⁶⁹⁸ bi 'eyna dil binêre wek wî şêrîn hatine
Hem⁶⁹⁹ bi 'eqî û 'ilm û teqwa wek wî şuhbet gotine
Awirê şêrîn li xelqê can û dil tev sohtine
Hesreta min şuhbeta min çavxumarê Xeznewî
- 5 Hesreta xelqê⁷⁰⁰ bibînin rojê carek dilberê
Cenneta min lezzeta min weşl û dîna dêm durê
Şerbeta lêva bi min xweştir ji Ava Kewşerê
Bejn û bala şorgula min bêhn dida wek 'enberê
Dengê Ehmed çûye bê hed namidarê Xeznewî
- 6 Pir kesan çûn û gihîştin dîtina şahê hebîb
Bûne teslîm lew kû dîtî *fi'l-ḥeqîqet*⁷⁰¹ ser tebîb
Herkesî dil pê rehet kir ez tenê mam dil kebîb
Min bi zenna xwe d' go baş im mam j' hevala bê neşîb
Bê neşîb im ez gerîb im hêvîdarê Xeznewî
- 7 Vê terîqa Serheda xweş kir diyarê Xeznewî
Pir gunehkar çûne tewbê bûne barê Xeznewî
Pir⁷⁰² gihane meqsedê xwe dost û yarê Xeznewî
Bes **Emîn** maye perîşan bendewarê Xeznewî
Heyderî dîn maye gêmgin ustuxwarê Xeznewî

⁶⁹⁶ Bûn] Bûm DCEHK.

⁶⁹⁷ Şahê Xezna na'ê weşfa] Pîrê hikmet pir bi heybet DCEHK.

⁶⁹⁸ Yan] Hem DCEHK.

⁶⁹⁹ Hem] Yan DCEHK.

⁷⁰⁰ xelqê] min DCEHK.

⁷⁰¹ *fi'l-ḥeqîqet*] Şahê Xizna DCEHK.

⁷⁰² Pir] Hin DCEHK.

[Muxemmes - Medhiye]

mefa'îlun / mefa'îlun / mefa'îlun / mefa'îlun
Hezec + - - - / + - - - / + - - - / + - - -

- 1 Meded ya şahê Xeznayê tû gewş û şehperê weqtê
Bi te xweş bû heyata min bihar û 'enberê weqtê
Li ba te merhema⁷⁰³ qelba heyat û Kewşerê weqtê
Ğulamê bejn û bala te hezaran qeyşerê weqtê
Meded ya şahê Xeznayê xezîna cewherê weqtê
- 2 Ela ey Xeznewî gewşê zemanê zehmet û⁷⁰⁴ talî
Bi te 'alem⁷⁰⁵ ji xew rakir⁷⁰⁶ ji gafil da xwe da alî
Kû îro fitne pir çêbû dikir⁷⁰⁷ firyad ji vî halî
Kû dîn dabûn⁷⁰⁸ heram xwarin hewar a ey şehê 'alî
Meded ya Şahê Xeznayê tu wî ser defterê weqtê
- 3 Ji ber tem'ê ji vê⁷⁰⁹ zulmê nema wicdan di nav 'amê
Kirin terka riya heq rakirin fitne di Islamê
Kû hindik ma ji ber zulmê bikin hicret herin Şamê
Tenê hûn mane⁷¹⁰ wensa me ğulama⁷¹¹ wê qed⁷¹² û qamê
Meded ya şahê Xeznayê tû quṭb û serwerê weqtê
- 4 Ji ber tem' û heramê pir⁷¹³ dibêjin qet me dîn navê
Tebeddul kirne exlaq û 'eqîde tev didan⁷¹⁴ navê
Bi zahir ew misilman in⁷¹⁵ belê tişt nîne der navê
Nema kes karî bêjî wan xelaş kin xwe ji vê davê
Meded ya Şahê Xeznayê re'îs û enwerê⁷¹⁶ weqtê

⁷⁰³ merhema] melhema NMD3, MMEC, DCEHK, DCMŞB.

⁷⁰⁴ zehmet û] rehleta DCEHK.

⁷⁰⁵ Bi te 'alem] Te 'alem tev DCEHK, Te 'alem pur DCMŞB.

⁷⁰⁶ rakir] rabû NMD3, NMDM.

⁷⁰⁷ dikir] dikin DCEHK, dikim DCMŞB.

⁷⁰⁸ dabûn] berdan NMD3, NMDM, DCMŞB, dan DCEHK.

⁷⁰⁹ vê] ber NMD3, NMDM, MMEC.

⁷¹⁰ Tenê hûn mane] ev her sê peyv di DCEHKyê de tunene.

⁷¹¹ ğulama] ğulamê NMD3.

⁷¹² qed] bejn DCMŞB.

⁷¹³ heramê pir] heram pir bû NMD3.

⁷¹⁴ didan] didin NMD3, NMDM, dan DCEHK, dida DCMŞB.

⁷¹⁵ Bi zahir we musulman in] Di zahir de musulman in NMD3, NMDM, MMEC, DCMŞB, Di zahir de rîh û şaş in DCEHK.

⁷¹⁶ re'îs û enwerê] emîr û rehberê DCEHK, DCMŞB. Di DCEHKyê de helbest li vir bi dawî dibe. Di DCEHKyê de 4 bendên serî tenê hene.

- 5 Dixwazî tû ji vê werî⁷¹⁷ xelaş bî zû were carkî
Here ber derê Xezna⁷¹⁸ bi poşmanî sitû xwar kî
Ji ewladê Şehê Xezna bi şed hêvî tû zarzar kî
Bibêj terka we qeş nadim heta dunya ji min bar kî
Meded ya Şahê Xeznayê emîr û rehberê weqtê
- 6 Fida bim ez di ber ewladê Şahê Xeznewî dîsa
Bi teftêşa birîndara bi enfasa wekî 'Îsa
Nebû wek wan⁷¹⁹ bi hukmê xwe ne Kisra û ne Belqîsa
Belê çibkim kû îro ew ketin dewra me van pîsa
Meded ya Şahê Xeznayê şêrîn û dilberê weqtê
- 7 Were xorto bike⁷²⁰ terka riya Şeytan û dunyayê
Em ê poşman bibin rokê nebêje kû mirin nayê
Here ber deryê Xeznayê⁷²¹ tebîbê eş û derdayê
Tû jî wek **Heyderî** dilxwaz⁷²² hewar ke şahê Xeznayê
Meded ya Şahê Xeznayê delal û esmerê weqtê

-48-

[Muxemmes - Medhiye]

fa'îlatun / fa'îlatun / fa'îlatun / fa'îlun
Remel - + - - / - + - - / - + - - / - + -

- 1 Hemdulillah em musulman in ji zû de⁷²³ bê 'îtab
Eşkera dînê Muḥemmed şu'le da wek roj û tab
Lew me dî rewşa zemanî⁷²⁴ ez fida kim da' û bab
Nûr li ser qelba bela kir feyz û nisbet bê ḥisab
Warîşê 'ilm û terîqê îro Eḥmed⁷²⁵ rû gul ab
- 2 Ger dixwazin hûn bikin teşdîk herin teftîş bikin
Gotinê şer' û hedîsa yek bi yek teblîğ⁷²⁶ dîkin
Awirê şêrîn bibînin şuhbeta xweş seh bikin
Tewbeya xaş û 'ewamê⁷²⁷ ew ji bo Lillah dîkin
Zû herin teslîm bibin hê em nebûn ax û turab

⁷¹⁷ tu j' vê werti'ê] tu ji vê werî' NMD3, NMDM.

⁷¹⁸ Xezna'ê] Tilme'rûf NMD1.

⁷¹⁹ wan] wî NMD3, wa NMD1, NMD2.

⁷²⁰ Were xorto bike] Werin carkê bikin DCMŞB.

⁷²¹ Here ber deryê Xeznayê] Werin ber deryê Tilme'rûf DCMŞB.

⁷²² dilxwaz] gêmgin DCMŞB.

⁷²³ Hemdulillah em musulman in ji zû de] Hemdulillah hê ji zûde em misilman bê 'îtab NMD1.

⁷²⁴ Rewşa zemanî] qutbê nihanî NMD1.

⁷²⁵ Eḥmed] Me'sûm NMD1.

⁷²⁶ teblîğ] teḥqîq NMD1.

⁷²⁷ 'ewamê] gerîban NMD1.

- 3 Şed hezar mizgîn ji bona van mirîd û 'aşıqa
Lew⁷²⁸ Xwedê emrê me kirye bibne dostê şadiqa
Yek ji wan Eħmed⁷²⁹ yeqîn kin murşidek pir la'îqa⁷³⁰
Bidne dûv ustadê Xezna nebne dostê fasiqa
Belkî em pê ra⁷³¹ xelaş bin ji hilak û ji 'ezab
- 4 Murşidê kamil xuya bû şu'le da erd û sema
Nefs û Şeytan te'sîra wan qeş nemaye van dema
Kes nema karî bibêjî rehberê me qeş nema
Ey gelî ehlê îmanê hûn nexwun derd û ğema
Şêrê dîn Eħmedê⁷³² Şanî têr kirin şêx û şebab
- 5 Kî heye bê himmeta Eħmed⁷³³ çira zêdetira
Sirra Nûrşîn sirra Xezna⁷³⁴ tevî hev bûn ey bira
Tekyexane xelwexane medrese bûn wek sera
Heq Te'ala kir 'inayet rutbe dayê⁷³⁵ eşkera
Weşfê wî qeş na'ê gotin xaricê j' 'eqî û kitab
- 6 Kî heye bê vî zemanî⁷³⁶ min dî wek vî yek terîq
Ya wekî Eħmed⁷³⁷ me dîtin şeyx û murşid *fi'l-heqîq*⁷³⁸
Heq Te'ala daye himmet hem⁷³⁹ Muħemmed bû refîq
Yek bi yek sadat li piştî ta Ebû Bekrê Şidîq
Dê ji bo çi em bitirsîn qeş nema fikr û hisab
- 7 Ew ji bo me bûye rehber⁷⁴⁰ qeş nema fikr û xeyal
Bû re'îsê vî terîqê şahibê 'ilm û kemal
Her çi bey'et kir bi teşdîq wî j' xwe ra bir re'si mal⁷⁴¹
Yek nefes bo me feqîra⁷⁴² em nebin meħrûm ji ħal
Heyderîzade nemînî⁷⁴³ bê mecal û ħal xerab

⁷²⁸ Lew] Ku NMD1.

⁷²⁹ Eħmed] Me'sûm NMD1.

⁷³⁰ la'îqa] layîqa NMDM.

⁷³¹ pê ra] pê re NMD2.

⁷³² Eħmedê] Me'sûmê NMD1.

⁷³³ Eħmed] Me'sûm NMD1.

⁷³⁴ Sirra Nûrşîn sirra Xizna] Beħra Nûrşîn beħra Xizna NMD1

⁷³⁵ dayê] daye NMD2.

⁷³⁶ vî zemanî min dî] min li erdê dîtî MND1.

⁷³⁷ Eħmed] Me'sûm NMD1.

⁷³⁸ Bi rastî, heqîqî,

⁷³⁹ hem] lew NMD1.

⁷⁴⁰ Ew ji bo me bûye rehber] Ew ku şeyxê qirnê çarda NMD1.

⁷⁴¹ wî j' xwe ra bir re'si mal] 'aşiqê feyz û cemal NMD1.

⁷⁴² nefes bo me feqîra] nezer bo min yesîrî NMD1.

⁷⁴³ nemînî] gerîbe NMD1.

mef'ûlu / mefa'îlu / mefa'îlu / fe'ûlun
Hezec - - + / + - - + / + - - + / + - -

- 1 Xezna li vê dewrê kû bi Ehmed bûye meşhûr
Dunya bi wucûda Şehê Xezna bûye me'mûr
'Alem bi qudûma wî mubarek bûye mesrûr
Şewqa wî li qelba kû cilada hemî kir nûr
Ewşafê te qutbî li kesî qet me nedî
- 2 Der behra şerî'et tû giha heddê kemalê
Der 'eql û feraset kemilî bû di mişalê
Ew şiklê munewwer bes e bo me di xeyalê
Rûhê me di fidya enî ya husn û cemalê
Billahi tû rûhê me yî der in cesedî
- 3 Billahi tû rûhê me yî ey le'lê şekerbar
Lewra me jî geyrî te nedî kes jî xu ra yar
Der axretê ez te bibînim bes e yek car
Hêvya me ev e her jî Xudê ey şehê dildar⁷⁴⁴
Têhîqîqî dizanim tû jî nûra Ehmedî
- 4 Zanim beşerî tû kû bi şiklê xu Mela 'î
Der behra heqîqet tû gewaş î tû 'ula 'î
Luqmanê birîna bo me 'Îsa'ê dila 'î
Neqşê bi te çêbûn tû li wan bagê gula 'î
Keşşafê qulûban tû bi keşfa Şemedî
- 5 Bagê te mukemmel jî gulê taze ciwan in
'Eşqa wekî bulbul kû di nav bagê gulan in
Lê hin kêf dîkin hin bi te seyrane cinan in
Lê hin wekî min dîr û birîndarê dilan in
Der sağı yû wefatê tû heyata beledî
- 6 Ya Reb te çewa xwest kû me dî ew di heyatê
Mehda kerema xwe bi 'efwê der sekeratê
Dîna wî neşîbê me bike piştî wefatê
Lê **Heyderî** her an jî gema na'ê tebatê
Hetta mirinê ahîn û nalîn ebedî

⁷⁴⁴ dildar] dîndar NMDM.

fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilun

Remel - + - - / - + - - / - + - - / - + -

- 1 Textê irşadê li Xezna zatê efxem wê li ser
Rutbeya 'alî mubarek wê li bejna rû qemer
Şewqê daye rûwê dunya her wekî roj tête der
Wek Suleymanê hukumdar şed wekî aşef li ber
Nuşretullahi `t-te`aley⁷⁴⁵ j' bo te ra şam û seher
- 2 Menbe'a husn û cemalê wê li Xezna yeğme ye
Şahê Xezna *fi`l-ḥeqîqet* 'alî nîşan rutbe ye
Çar teref iqlîmê dunya her li Xezna telbe ye
Wê li cem dermanê qelba cumle 'alem hewce ye
Nav û dengê vê terîqê te bela kir behr û ber
- 3 Rewdêya misk û gul-abê wê li Xezna pir geş e
Nûr li bejnê tê reşandin husn û bêhna pir xweş e
Nûr û şewqê daye ber xwe Kurd û Tirk û Hebeş e
Bûye dermanê qulûba neşera şêrîn meş e
Nûr û 'enber tacê cewher textê qeyşer bo te her
- 4 Payetextê vê terîqê wê li Xezna ye neha
Neqş û bi satê ji 'îşqê geştê seyrana şeha
Qed û 'er' er wechê enwer şubhê hîva çardeha
Win bi lez werne sulûkê ev sera û dergeha
Ev terîqa bê riya ye nisbeta Seyda li ser
- 5 Dafi'ê zeng û zulamê wê li Xezna nûri zat
Saqiyê vê badeya sağer meya şêrîn şifat
Wernê cahil şofi 'alim **Heyderî** gemgîni zat
Himmat û feyza Buxara nisbeta Nûrşînê hat
Ba edeb xalî ji bid'ê bûye meşhûrê beşer
- 6 Beyt û Ke'be Se'y û 'Umre wê li Xezna xweş meqam
Ehlê Islam bikne qeşdê hem bi şîdî û ihtiram
Ey hebîbê qelb û cana ruhniya qelbê zulam
Em bi te bighên muradê ey imamê xaş û 'am
Lew tû şêxek Neqşebendî der terîqek mu'teber

⁷⁴⁵ Alîkarîya Xwedayê gewre.

- 7 Birc û dîwan xelwexane wê li Xezna xweş feşal
Helqeya zîkr û tewecuh silsila tahîr delal
Keşf û teftîşek li qelba Hezretî Îsa mişal
Yek nezer bo min feqîrî esmerê awirgezal
Cewherê xaliş li Xezna dê çi jêkim mulk û der
- 8 Ruhniya ça'vê⁷⁴⁶ me îro wê li Xezna aşîkar
Şed celeb tîn bir bi bir ba mewc e mewc Xezna kubar
Wê ji ber feyzê hicab rakir li qelba kir bihar
Yek nezer berda li xelqê man teheyyur weşfedar
Nav û cergê min helandî fehm û 'eqlê m' bê xeber
- 9 Gem li canê min dibarin wê li Xezna gemrevîn
Pir elem çêbûn li canê min bi jan û av û xwîn
Yek 'ilet çêbû li qelbê **Heyderîzade Emîn**
Nîne derman ger ji qebran rabe Luqman *bi'l-yeqîn*⁷⁴⁷
Geyri Ehmed qutbi Ehmed min bes e jê yek nezer

-51-⁷⁴⁸

[Muxemmes - Medhiye]

fa'îlatun / fa'îlatun / fa'îlatun / fa'îlun
Remel - + - - / - + - - / - + - - / - + -

- 1 *Hemdu lillaî*⁷⁴⁹ dewama bê qiyas û bê 'eded
Hatî dewra me muceded her li me ferzê seced
Şerq û gerba 'alema qet ma hene wek wî sened
Cinn û insan û perî tîne tewafê bê 'eded
Şuhbeta wî em helandin şuht li me can û cesed
- 2 Ey gula şêxê cihanê şubhê Luqmanê yeqîn
Cismê nazik enwerî ne zîneta dunya û dîn
Me' dena husn û cimalê naşirê dînê mubîn
Şahê irşada qulûban hem *imami'l-mu'munîn*⁷⁵⁰
*Bareke'l-barî heyatek 'ewnuke'l-Allahu's-Şemed*⁷⁵¹

⁷⁴⁶ ça'vê] çavê NMDM.

⁷⁴⁷ Bi rastî.

⁷⁴⁸ Ev helbest di NMDMyê de çar bend in. Di NMD1 û NMD2yê de pênc bend in lê di NMD2yê de ser benda duyemîn hatiye xêzkirin, yanî ji metnê hatiye derxistin. Bi piştraskirina Mela Diyaddîn, ev guhertin ji aliyê Mihemed Emînê Heyderî ve çêbû ye. Lewra em ê jî helbesta di NMD2yê de bingeh bigirin û benda ku jê hatiye derxistin li vir nîşan bidin:

2 Şuhbeta wî bûye hesret tê tewafê ins û cin
Yek ji wan remzê te bûn Kurd û 'Ereb bêhiş kirin
Ez nizamim wê çera em bê sebeb bê dil kirin
'Aşîqan 'eql û xeyalê xwe li dûv winda kirin
Hêvîdar in em ji barê hummeta wî her ebed

⁷⁴⁹ Hemd ji Xwedê re.

⁷⁵⁰ Îmamê muminan, xelîfe, serekê muslimanan.

⁷⁵¹ Xweda heyata te mubarek bike. Rebbê Semed (ne muhtac) alîkarê te be.

- 3 Şahê Xezna Ehmedê me bû 'ilaca dilkulan
Ez ji dest nefsê dinalim ey şahê min el-eman
Dil birînim nale nal im bê qerar im hîn û an
Yek nezer bo min feqîrî ey şehê ehlê zeman
*Kunte gewşen qeddesellahû derîhek ta ebed*⁷⁵²
- 4 Tû ji bo ehlê zemanî nazenîn û serwerî
Tû li qelbê 'aşiqan 'eyni 'l-heyat⁷⁵³ û Kewşerî
Hem ji bona van mirîdan xweş emîr û rehberî
Rehmkê bo vî sekê kemter **Emînê Heyderî**
Pişt û 'ewn û melce'ê te *Qulhuwellahû Ehêd*⁷⁵⁴

-52-

[Muxemmes - Medhiye]

fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilun
Remel - + - - / - + - - / - + - - / - + -

- 1 Ey 'ezîza şox û şengê / mey şêrîna leb şerab
Şahebazê nazerengê / melce û kehf û meab
Tû di nav 'alem bi dengê / şuhbet û qewl û cewab
Hem di weqtê halê tengê / murşidê qadir cewab
Neclê tahîr deryê faxîr behrê zaxîr mahê tab
- 2 Pur bi gayet hukmê rebban / î li ser Me'sûm bida
Nûr û feyza ehlê 'îrfan / î li bejnê şu'le da
'Erşê bi satê Suleyman / î li Tilme'rûf veda
Ev hedîya Ehmedê Şan / î qebûl kir min geda
Sûk û bazar nûr û îsrar bûye îzhar bê hisab
- 3 Nûr û Feyza rehberê min / pê şiyar bûn xaş û 'am
Muhibeta vî serwerê min / melhema qelbê zulam
Dengê husna esmerê min / çûye Tirk û Hind û Şam
Nûr û şewqa dilberê min / heyv û rojan 'ê gulam
Na'ê mektûm şahê Me'sûm bûye me'lûm bê niqab
- 4 Şahîbê feyz û cemal e / me'dena nûra Zîya
Murşidê deşt û çiya ye / rêçenasê sofiya
Roj û şev min tê xeyal e / pêşewarê Neqşîya
Lê ji ber şewqa cemal e / min serî da ber piya
Rûh fida bim hal xerab im dil kebab im dil kebab

⁷⁵² Tu xewsî û gaziya me ji Xweda her û her qebra te mubarek bike.

⁷⁵³ Kaniya jiyanê, ava heyatê.

⁷⁵⁴ Bibêje: Xwedê her yek e. Qur'an: 112/1.

- 5 Rûh fîda bim pir şêrîn e / kehniya 'ilm û şefa
Himmetek da ehlê dîn e / 'eynê şer'a Muştefa
Mislê Me'sûm min nedîne / bû terîqa ba wefa
Hem di 'ilmê heq rezîne / hem bi husnek eşîfa
Bejn û bal e pir delal e rû-hîlal e bê 'itab
- 6 Ce'deya xaş û 'ewam e / wek berê dîsa vebû
Murşidê 'alî meqam e / bo murîda berze bû
Lew Xudê 'işqek dida me / dil bi ah û cezbe bû
Şerbeta şafî di cam e / leb û le'lê şehde bû
Şehd û Kewşer burhê enwer wechê esmer şor-gulab
- 7 Hukmê şerqê ta bi ğerbê / daye Me'sûm sermedî
Himmeta 'alî li ser bê / necl û ferxê Ehmedî
Nisbeta rengîn li cem bê / nav û dengê Serhedî
Heyderîzade ji kerbê / bû dexîlê merqedî
Ez kuleyb im pur bi 'eyb im tê ji qelbê m' xwîn û ab

-53-⁷⁵⁵

[Muxemmes - Medhiye]

fa'îlatun / fa'îlatun / fa'îlatun / fa'îlun
Remel - + - - / - + - - / - + - - / - + -

- 1 Textê irşadê cihanî / her kesî lê kir teşeb
Wî li ser Me'sûmê Şanî / hukmê qelba daye Reb
Mehdiyê ehlê zemanî / murşidê şêrîn e leb
Beyreqa nûrê hîlanî / şu'le da Şam û Heleb⁷⁵⁶
Hem bi xêra wî me zanî / rêz û te'lîm û edeb
- 2 Rêz û adabê terîqet/ te bi cih kirye beyan⁷⁵⁷
Rukn û esasê şerî'et / ji dila ra bû 'iyan⁷⁵⁸
Me ji we dîtî neşîhet / me nema şek û guman
Kû vebû rahê heqîqet / bi te ey şahê zeman⁷⁵⁹
Ji me ra nefsek xedî'et / tû nekî qehr û ğezeb⁷⁶⁰

⁷⁵⁵ Ev helbest, di nusxeyên NMD1, NMD2, NMDM û MMECyê de heye. Di NMD2 û NMDMyê de di her sê bendên serî de misrayek zêde cih girtibû ku wek misrayeke din a di bendê de heye. Me jî helbesta di MMECyê de ku li gorî muxemmesan a herî meqbûltir bû, me ji aliyê rêzkirina misrayan ve esas girt. Em ê her sê misrayên ku me nexist helbestê em ê li jêr bidin.

⁷⁵⁶ Di NMD1 û NMD2yê de piştî vê misrayê misrayek wiha heye: Rewneqa ruwê cihanî şu'le da Şam û Heleb.

⁷⁵⁷ terîqet] terîqet / kirye beyan] kir ne 'iyan MMEC.

⁷⁵⁸ ji dila ra bû 'iyan] te mukemmel kir beyan MMEC.

⁷⁵⁹ Kû vebû rahê heqîqet / bi te ey şahê zeman] Me divê rahê heqîqet / ji te ey şahê zeman MMEC.

⁷⁶⁰ Piştî vê misrayê di NMD1, NMD2 û NMDMyê de misrayek wiha heye: Ku ji 'işqa te tebî'et 'edillî lê tu sebeb.

- 3 Şafiyê êşa qulûban / zulf û xalê 'enberî
Melce'ê nas û gerîban / wech û taca enwerî⁷⁶¹
Şerbeta cama hebîban / 'aşiqan lê muşterî
Cism û canê me reqîban / her li ber te bê serî⁷⁶²
Serwerê cumle tebîban / ya tû Luqmanî 'eceb
- 4 Bejn û bala te şêrîn e / murşidê me 'aşiya
Melhema derd û birîn e / sekn û wensa şofiya⁷⁶³
Mehdiyê ehlê zemîn e / 'ilm û şuhret bê riya
Zîneta⁷⁶⁴ dunya û dîn e / qaymeqamê Neqşiya
Li cemalê muşterî ne⁷⁶⁵ / Tirk û Kurmanc û 'Ereb
- 5 Neqşebendî Neqşebendî / qeyşer û xaqan gulam
Heybet û sîma⁷⁶⁶ bilindî / esmerê şêrîn-kelam
Şerbeta le'lê ji qend î / nûr dibarê şubh û şam
Yek ilaca dil bi min dî / ruhniya qelbê zulam
Ma'e wertî yan tû werdî / ey şehê 'alî neseb⁷⁶⁷
- 6 *Ente liddînî mu 'înun / we leke şe'nun 'ecîb*
Ente fî'l-'eqî rezînun / fîke esrarun gerîb
Welena kehfun emînun / ni 'metellahi 'l-mucîb
Inenî şexşun hezînun / hel lena minke 'n-neşîb
*Lî enîsun we qerînun / hubbuke fî sedrî şeb*⁷⁶⁸
- 7 Ev çi nûra kevn û nû ye / wî li ba te behr û şet
Zîneta husna te rû ye / şahebazî neqşê xet
Ê li dûv rêza te çûye / ev nebû carek gelet
Kehniya 'işqa te bûye / ê vexwar tî nabî qet
Heyderîzade bikûye / men şereb keyfî şereb⁷⁶⁹

⁷⁶¹ Piştî vê misrayê di NMD1, NMD2yê de misrayek wiha heye: Melce'ê nas û gerîban dev û lêvê şekerî.

⁷⁶² Piştî vê misrayê NMD1, NMD2 û NMDMyê de misrayek wiha heye: Ma tu serdestê tebîban ya tu Luqman î 'eceb.

⁷⁶³ Melhema derd û birîn e / sekn û wensa şofiya] Şafiyê derd û birîna şeneda va şofiya MMEC.

⁷⁶⁴ Zîneta] Rehberê MMEC.

⁷⁶⁵ Li cemalê muşterî ne] Ku hukmê te didîne MMEC.

⁷⁶⁶ Heybet û sîma] Serwer û awaz MMEC.

⁷⁶⁷ Derdimend im derdimend im / ey şehê 'alî neseb MMEC.

⁷⁶⁸ Tu ji dîn ra alîkarî halê te gelekî xerîb û 'ecîb e

Tu mêzêna aqilî sirra xerîb li ba te hene

Tu ji me ra şikeft e cihekî emîn î ev jî nîmeta Xweda ye

Ez merivekî mehzûn im ma gelo para me li ba te heye

Heval û hogir û wensa min heye hubba te rijiyaye qelbê min.

⁷⁶⁹ Heyderîzade nizane kaniya ava te kî vexwar çawa vexwar.

mef'ûlu / mefa'îlu / mefa'îlu / felun
Hezec - - + / + - - + / + - - + / + -

- 1 Ey 'er'era şengê tu wî xweş mu'teberî
Nazik bedena tahir û kamil beşerî
Insan di muqabil kû li bejnê fikirî
Qet kes li hişê xwe nedima û heyirî
Mizgîni bi hev dan kû ew e şah û perî
- 2 Mizgîni bi hev dan wekî Me'sûm bû xuya
Dunya kû ji wechê wî dibû şewq û ziya
Nisbet kû bela kir geriqî çol û çiya
Gengîn bi tenê mame di nav dest û piya
Rehmê li yesîrê xwe bike ey tacA serî
- 3 Îman kû di dil da heye zanim ne cewaz
Defter ji gunaha me tijî kir çi bi lez
Meşgûli bi dunya me mirin wa tê bi lez
Mehrûmi ji xêra me ne tedbîr û ne hez
Ger rehmê bikî bo me bidê yek nezerî
- 4 Derman ke dilê reş bi wê îhsana Xudê
Himmet ke kû nisbet were zêde ji Xudê
Da xweş bibitin derd û kulê vê kebedê
Me'sûm di vî weqtî tu wî hana mededê
Qelb xeste ye dunya qe nema ji biderî⁷⁷⁰
- 5 Herkes ji welata wekî baranê dihat
Mehrûm nedima kes ji wî dergahê şebat
Geyrî me feqîra me ne tedbîr û xebat
Carek bike şefqet li me ey şahê welat
Şewqa te li qelba bûye şiklê fenerî
- 6 Zâtê te mubarek bi wê bejna xwe yî şeng
'Alem bi wê nûrê xemilandî te bi reng
Her qelbê te merhem kirî şafî bû ji zeng
'Eşqa te li kê da vedida zarî yû deng
Ev **Heyderîzade** sekê⁷⁷¹ der axa derî

⁷⁷⁰ Qelb xeste ye dunya qe nema ji biderî] Qelbê me xestye ye qe nema ji bederê NMDM.

⁷⁷¹ Sekê] maye NMDM.

fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilun

Remel - + - - / - + - - / - + - - / - + -

- 1 Gundê Bizgûr bûye tekya 'eşq û keyf û lezzetê
Bûye wensa ehlê gunda mêr û jin tèn xizmetê
Şêwr û tedbîr lê girêdan kirne textê şuhbetê
Tê de avayî xuya kir mişlê qeşra Cennetê
Ya Reb zêde dewam kî lê bibarî rehetmetê
- 2 Ev mirîd tev çûn û hatin j' 'eşq û dil ew şugulîn
Cinn û insan û perî hûrî ji kêfa xemilîn
Nûr dibarî ser mirîda dîn û dunya kemilîn
Wek pezê kû tèn ser avê herikîn ew gulgulîn
Wey li wî 'ê kû telef kî can û mal vê sa'etê
- 3 Guh bidin tedbîrê Me'sûm dîsa nisbet kir zuhûr
Çewra qeşrê nû xuya kir çar teref nêzîk û dûr
Kû ji qinyat ew ji bo na van mirîdê dil kesûr
Hem li dunya'ê nezer kir dîsa Bizgûr kirye nûr
Ya Ilahî tû bide Me'sûm dewama xizmetê
- 4 Şêx û sofî yû ağa ew mela hatine tamam
Ellah Ellah deng û qîr û j' 'eşq û can wa⁷⁷² kir kelam
Nûr dibarê rehîm dihatê dunya tev de bû gumam
Şêx û rûhanî yû sadat li hev dîkin şed selam
Bû tebberuk ev hediye kes nizanî qîmetê
- 5 Qîmetê wî win⁷⁷³ bizanin ev hedîya Xeznewî
Xan û malê xwe telef kin ber vê mala Xeznewî
Hûn du'a kin ya Ilahî dîn û dunya Xeznewî
Hem Muhemmed çariyar bî tim di hana Xeznewî
Pişt seneda dînê Islam padişahê nuşretê
- 6 Ya Ilahî tû efû kî xaş û 'amê ummetê
Tû bidê ehlê terîqê feyz û şewq û hummetê
Kes nebin mehrûm ji deryê vê kubarê nisbetê
Dunya tev da bûye kamil kes nebînî zehmetê
Heyderî miskîn dinalê j' tîrs û te'b û ezyetê

⁷⁷² wa] wan NMDM.

⁷⁷³ win] hûn NMDM.

[Muxemmes - Medhiye]

fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilun

Remel - + - - / - + - - / - + - - / - + -

- 1 Ey gelî ehlê îmanê hûn nekin⁷⁷⁵ derd û ğema
Nefs û şeytan qetî ti zora wan nemaye van dema
Murşidê kamil xuya bû şu'le da erd û sema
Kes nema karî bibêj⁷⁷⁶ rêzanê dînê me nema
Şêrê dîn Me'sûmê Şanî têr kirin şêx⁷⁷⁷ û şebab
- 2 Kî heye bê himmeta Me'sûm çira zêdetira
Behra Nûrşîn behra Xezna tevî hev bûn ey bira
Tekyexane xelwexane medrese bûn wek sera
Heq Te'ala kir 'inayet rutbe daye eşkera
Weşfê wî qetî na'ê gotin xaricê j' eql û kitab
- 3 Kî heye bê me li 'erdê dîtî wek vê yek terîq
Yan wekî Me'sûm dibîtin şêx⁷⁷⁸ û murşid fî'l-heqîq
Heq Te'ala daye himmet hem Muhemmed bû refîq
Yek bi yek sadat dihatin tev Ebû Bekrê Şidîq
Bûne mesned ew li piştê qetî nema fikr û hisab
- 4 Bûne dewran ew li piştê qetî nema fikr û xeyal
Bû re'îsê vê terîqê şahibê 'ilm û kemal
Her çi bey'et kir bi teşdîq wî birî feyż û cemal
Tû bi heqqê merqedê kî me nekî mehrûmê hâl
Heyderîzade feqîr e bê mecal û hâl-xerab

⁷⁷⁴ Ev helbest, tenê di NMD1 û NMDMyê de heye. Me NMD1 ji xwe re bingeh girt.

⁷⁷⁵ nekin] nexwun NMDM.

⁷⁷⁶ bibêj] bibê NMDM.

⁷⁷⁷ şêx] şeyx NMDM.

⁷⁷⁸ şêx] şeyx NMDM.

[Muxemmes - Medhiye]

mefa'îlun / mefa'îlun / mefa'îlun / mefa'îlun
Hezec + - - - / + - - - / + - - - / + - - -

- 1 Dilo rabe binêre ev çi ihsan e Xudê pir da
Wekî berq û işildaqa dibû şu'le li her 'erda⁷⁷⁹
Li eţrafa bela bû ev xeber çû şehr û her gunda
Li Tilme'rûf meqamê dilber û mehbûb û dil merda
Bikin qeşdê gelî yara çi dermanê kul û derda
- 2 Dilo bêje eya dilber bi qurbana te Şêrîn î
Dixwim şondê kû mûkî ez ji te nadim bi şed Zînî
Me dil da te me rûh da te di 'eyna dil tû me d' bînî
Were rehîmê kû îro dil ji zindanê tû derxînî
Ji 'işqa te dibûm serxweş ji dildara te bûm sewda⁷⁸⁰
- 3 Dilo rabe bi xef îro xwe bighîne tû eywanî
Bibêje wê perî-rengê birîndar im tû derman î
Bi xemra şerbeta lêva ez im serxweş tû pê zanî
Bike rehîmê li halê me nehêle min di zindanî
Kû derdek pir giran îro ji firqa te li min peyda
- 4 Dilo mehbûb û Şîrîna te 'enqa ye di dunyayê
Ji ber şewqa cemala te hezar begler ketin tayê
Eger perdê hilînî em bibînin bejn û balayê
Bidim rûh û bilerzim⁷⁸¹ ez bi yek dîna te Leylayê
Li bendê dîtina wê bejn û bala te her roj 'eyda
- 5 Dilo vê şewq û şu'la kû dibînî tû ji gafil da
Dizanî tû kû mehbûbê li xelqê perde bû hilda
Ji wan çava nezer berda bi camê şerbet û mey da
Rijandin⁷⁸² tîr ji wan burhê wekî heyva li nav dil da
Dilê miskîn û bê halan hezar dağ û hezar keyda
- 6 Dilo îro bizanî⁷⁸³ tû kû mehbûba te zêrîn e
Melek teb'e beşer nûr e xeber durre çi şêrîn e
Bi milyona ji deryê qiblegahê te bi hêvî ne
Ji îlaca birîndara wekî vê dilberê nîne
Me tecrîb kir bi her halî me dî dermanê her derda

⁷⁷⁹ 'erda] 'erda NMD3, MMEC.

⁷⁸⁰ sewda] şewda NMD1..

⁷⁸¹ bilerzim] telef bim MMEC.

⁷⁸² Rijandin] Rijandî NMD3, NMDM.

⁷⁸³ bizanî] dizanî NMDM.

- 7 Dilo mehbûb û şêrîna te hêjaye gelek mîra
 Ji derdê dil birîndara nexweş derman⁷⁸⁴ wekî tûra
 Revandî 'aqilê xorta xwe kir qible ji xelqê ra
 Di Tilme'rûf de meydana sulûk û xizmet û xêra⁷⁸⁵
 Heçî çû dît û dil da wa wedest û ling dikir qeyda
- 8 Dilo bêje eya dilber kû pir hubba te dijwar e⁷⁸⁶
 Ji 'işqa⁷⁸⁷ te di nava 'aşiqan dağ û key û nar e
 Tû zanî⁷⁸⁸ kû gelek wek min ji hubba⁷⁸⁹ te ceger pare
 Feqîrê **Heyderî** kêmi 'ebîdê te birîndar e
 Yetîmê dergehê Ehmed dexîlê Hezret û Seyda

-58-

[Muxemmes - Medhiye]

mef'ûlu / mefa'îlu / mefa'îlu / fe'ûlun
 Hezec - - + / + - - + / + - - + / + - -

- 1 Ellhemd ji Xudê ra li me zêde dibû ni'met
 Yek murşidê qelba wekî hêvî li me derket
 Pir şewq û cemalê husna Ilahî bi ser ket⁷⁹⁰
 Herkes ji wa dîtin adab û 'ilm û neşîhet
 Ellah bi vî şiklî xemiland edeb û himmet
- 2 Xweş dilberê husna te dinas û dihebîne
 Dermanê dila yî çî mehbûb û çî şêrîn e
 Sertacê gula şêx⁷⁹¹ û mela yî bi yeqîn e
 Lew bejna te zarîf⁷⁹² derd û gema dîrevîne
 Pir la'îq e lê qet kes nizanî bikî hürmet
- 3 Herkes bûye muştacê kalamê te yî zêrîn
 Sed mîr û mela dil ketin wan awirê şêrîn
 Hubba te li qelbê kê eser kir bûye nûrîn
 Pir bûne fidakar li wê bejna te yî nesrîn⁷⁹³
 Meydan ji kesî ra te nehişt ey şehê⁷⁹⁴ dewlet

⁷⁸⁴ nexweş derman] çî derman û MMEC.

⁷⁸⁵ xêra] xeyra NMD3, NMDM.

⁷⁸⁶ Dilo bêja eya şêxzad rica te çî dijwar e MMEC.

⁷⁸⁷ 'işqa] firaqa MMEC.

⁷⁸⁸ Tu zanî] Bizanî MMEC.

⁷⁸⁹ hubba] hubba fitna NMD1.

⁷⁹⁰ Ilah bi ser ket] Ilahî nûr bi ser ket NMD3, NMDM, Ilah ku bi ser ket MMEC.

⁷⁹¹ şêx] şeyx NMD3, NMDM.

⁷⁹² bejna te zarîf] nefesa te NMD3, NMDM, MMEC.

⁷⁹³ Pir mane fedîkar ji bejna gul û nesrîn MMEC.

⁷⁹⁴ şehê] şahê NMD1.

- 4 Minnet ji Xudê ra kû me dî wechê mubarek
 Mehbûbê dila yî ji me ra êdî nema şek
 Hûsna te hîlanî perde ser dila⁷⁹⁵ bi carek
 Em bûne feqîrê⁷⁹⁶ hemû sadata yeka yek
 Rehmê li yesîrê xwe ke carek bike minnet
- 5 Carek li yesîrê xwe nezer ke bike îhsan
 Çend rûhê me hebin tev ji te ra necl⁷⁹⁷ û qurban
 Weqtê te bivêtin kû telef kî bike ferman
 Yek hûsna te nadim bi du şed mulkê Suleyman
 Luqman î 'Eladdîn şahê sulţan ûd bi heybet
- 6 Luqmanê dilan î were derman ke birîn im
 Pir cewr û cefayê elemê dil dikişînim
 Ez kû ji te dîr im bi kul û derd û hezînim
 Lew bê te şebra me qet nemaye bi yeqîn im
 Mişqalek huba⁷⁹⁸ te ji dila ra bûye hesret
- 7 Lew hûsn û cemala te bû hesret ji dila ra
 Ev meclîs û⁷⁹⁹ şuhbet bû genîmet ji mela ra
 Lê ez tenê dîr im bûme meydan ji kula ra
 Wellah me ji geyrî te tû kes nadin hewara
 Ev **Heyderî** miskîn ça⁸⁰⁰ v⁸⁰⁰ li ber dergahê Ehmed

-59-

[Muxemmes - Medhiye]

mef'ûlu / mefa'îlu / mefa'îlu / felun
 Hezec - - + / + - - + / + - - + / + -

- 1 Ey nazikê re'na şeker û şehd û femê
 Der 'ilmê xwe kamil tû çi behr û çi cemê
 Ruhnî bike ça⁸⁰¹ v⁸⁰¹ û dilê însana hemê
 Da qeşdê bikin Tirk û 'Ereb⁸⁰² û 'Ecemê
 Derman bike dil ey şehê derman⁸⁰³ li cemê

⁷⁹⁵ perde ser dila] ser dila perde NMD3, NMDM.

⁷⁹⁶ feqîrê] dexîlê MMEC.

⁷⁹⁷ necl] nezre NMD3, NMDM, MMEC.

⁷⁹⁸ Mişqalek huba] Mişqalkî hubba NMD3, NMDM.

⁷⁹⁹ Ev meclîs û] Himmet ku çû NMD1.

⁸⁰⁰ ça⁸⁰¹ v⁸⁰¹] çav NMD3, NMDM, sekê MMEC.

⁸⁰¹ ça⁸⁰¹ v⁸⁰¹] çavê NMD3, NMDM.

⁸⁰² 'Ereb] 'Iraq NMD1, NMD2.

⁸⁰³ derman] melhem NMD3, NMDM.

- 2 Ev berq û burûskê ji we da'im vedidin
Feql û ihsana Xudê ji we ra bê'eded in
Pêgember û eşhab û melek tev meded in
Înan bikin⁸⁰⁴ sadat ji we ra her sened in
Qet nabine gafil ji we yek weqt û demê
- 3 Minnet ji Xudê re kû 'Eladdîn bû re'îs
Irşada 'ibada kirî ser textê celîs
Kamil kirî dîn wî di vî weqtê me yî pîs
'Alem gëriqî bû ji me ra pişt û enîs
Teslîmê te ne ey dostê Xudan keremê
- 4 Teslîmê te ne em ji dil û can û serî
Lewra Xudê emrê me di Qur'anê kirî
Da'im li welîyan û muhibban bigerî
Ez qenci dizanim tû li dûv pêgemberî
Billah qe nema êdî dixwim derd û gemê
- 5 Ey nazik û dilber şehê zêrîn kemerî
Meş-ħakim û dil-awiz û şêrîn-xeber î
Xweş rengê mubarek li te nûrîn nezerî
Sulţan û mulûkan ji we dîtin hunerî
Weşfê te bidim na'ê ħisab û qelemê
- 6 Hêvî ji cenabê te dikim ey şahê min
Miskîn û sek im ça'vê li dergahê mezin
Ĥeta bimirim axa li ber payê we bim
Ger nîne neşîb lê ji we bê hêvî nebim
Nefsê serî berda lê tû dezgîna gemê
- 7 Nefsê li me pir kir elem û derd û keder
Her dem vedidim qîr û fîgana ez ji ber
Pir xa'în e nîne me ji destê wê mefer
Yek çare ji geyrî we nema îro j' beşer
Carek bike tedbîr tû li derd û elemê
- 8 Carek bike tedbîr ji we tê ħimmeta pir
Xelqê ji we dî 'ilm û adab ħikmet û sir
Em ketne zemanê we hezar ħemd û şukir
Ĥeqqe kû ji geyrî we nekin beĥş û fikir
Ev **Ĥeyderîzade** ji kula çû 'edemê

⁸⁰⁴ Bawer bikin.

[Muxemmes - Medhiye]

fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilun

Remel - + - - / - + - - / - + - - / - + -

- 1 Şahê Xezna der terîqa bû imamê xaş û 'am
Hem ji pişta wî xuya bûn murşid û şêx û humam
Erda Tilme'rûf muqeddes bû bi *erwahê kiram*⁸⁰⁶
Merqeda tahir ji nûra her du⁸⁰⁷ şêra bû gumam
Dergehê wan bo me hetta ehlê Islamê tamam
- 2 Ger gunehkar û perîşan û birîndarê dil in
Ger ji derdê vê firaqê hûn bi huzn û dîkul in
Her bibîne gemrevîn e rêçenas û kamil in
Mîslê Luqman dilnewaz in şah û baz in rûgul in
Her bibîne Şêx 'Eladîn⁸⁰⁸ *el kerîm axu'l-kiram*⁸⁰⁹
- 3 Ger dipirsî Şêx 'Eladîn⁸¹⁰ *el kerîm îbnu'l-kerîm*⁸¹¹
Serbilindê ehlê şer'ê der terîqa musteqîm
Şahibê teqwa û 'ilmê feđl û îhsana 'emîm
Cami'ê adabê Eħmed murşidê heybet 'ezîm
Warîşê şer'a Muħemmed wî li Tilme'rûf meqam
- 4 Warîşê şer' û terîqê derdimendê Xeznewî
Ê nedîtî her bibîne wî delalê Xeznewî
Hûn bizanin pir şêrîn e çavgezalê Xeznewî
Şah û mîr in merd û şêr in tev 'iyalê Xeznewî
Murşid û sultânê dîn in mehdiyê şêrîn-kelam
- 5 Himmeta Eħmed bilind e xwendekarê muhteşem
Hem 'Eladîn⁸¹² xweş çira ye dafi'ê eş û elem
Ew li dûv bav û bira ye pir zekî yû muhterem
Deryê Tilme'rûf dewa ye Heq Te'ala kir kerem
Hem heta axir weha ye yek li dûv ê dî imam

⁸⁰⁵ Di vê helbestê de di NMD1ê navê Şêx 'Izeddîn lê di NMD2, NMD3 û NMDMyê de navê Şêx 'Ela'eddîn derbas dibe. Me jî nusxeya NMD2yê ji xwe re bîngeh girt û cudahiyên di nusxeyên din di jêrenotan de nîşan da.

⁸⁰⁶ Ruhên Kîram,

⁸⁰⁷ du] sê NMD1, NMD2.

⁸⁰⁸ 'Eladîn] 'Izeddîn NMD1.

⁸⁰⁹ Merdê birayê merda ye.

⁸¹⁰ 'Eladîn] 'Izeddîn NMD1.

⁸¹¹ Merdê kurê merda ye.

⁸¹² 'Ela'edîn] 'Izeddîn NMD1A.

- 6 Yek li dûv ê dî re'îs e tev bi ilhama Xudê
Ni' met û 'izz û keramet tê ji alyê Serhedê
Nişbet û feyza Ilahî her dibarî merqedê
Rebbî her da'im weha bî neqş û kêmanî nedê
Hifz û tewfîqa te jê ra hem bî adab û nîzam
- 7 Şed şukur dergahê Tilme'rûf ji bo me bû sebab
Hem hidayet bûn bi wana Tirk û Kurmanc û 'Ereb
Ruhniya ça'v⁸¹³ û dilan e ma hene wek wan 'eceb
Heyderî dil tar û mar e bê qerar e roj û şeb
Ya hebîb im dil nehîb im ez dexîl im *wesselam*⁸¹⁴

-61-

[Muxemmes - Medhiye]

fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilun
Remel - + - - / - + - - / - + - - / - + -

- 1 Da'ima hemd û şena bê j' bo Ilahê bê mişal
Naşirê Islamê rabî murşid û quţbê delal
Beyreqa dîn pê 'ula bî dîn û dewlet pir kemal
Ev terîqa Xeznewî hat tev ji nûra *Zul-Celal*
Hem li Tilme'rûf xuya bû⁸¹⁵ ya Ilahê bê zewal
- 2 Ya Ilahî tû bişînî ser 'Eladîn nusretê
Ça'v⁸¹⁶ li îhsana Xudê ne zêde bîdyê himmetê
Bendewarê merqedê ne durr û behra qudretê
Em mirîd tev ça'v⁸¹⁷ li rê ne xaş û 'am bîn şuhbetê
Talibê weşla gulîn e şorgula min rûh li bal
- 3 Şed şukir em qeş nemanê bê Xudan û bê sened
Zahir û batin xuya ne ev kubarê Neqşebend
Wî li Tilme'rûf beyan e payitextê 'alî qed
Şed hewar û şed fiğan e ya 'Ela'eddîn meded
Hêviya dana te mane ey wezîrê pir delal
- 4 Bê 'emel keslan dimînîm gafil û bê hal û genc⁸¹⁸
Ez li tewbê nameşînîm ez didim dûv ya ne qenc
Dil birîndar û hezîn im serxweş û sukra û penc
Dilreş û dil pare xwîn im bû li min sed êş û renc
Ez ji 'eşqê lal û dîn im bê hedan û bê mecal

⁸¹³ ça'v] çav NMDM.

⁸¹⁴ Silav û rêz, dawiya gotinê.

⁸¹⁵ bû] bûn NMD1, NMD2.

⁸¹⁶ Ça'v] Çav NMDM.

⁸¹⁷ çav] çav NMDM.

⁸¹⁸ genc] kenc NMDM.

- 5 Ez ji 'işqê pir dinalim tēm tewafa pa û dest
Canfida'ê bejn û bal im mame bê hiş gêj û mest
Dil ketim husn û cemalê lew me destûra xwe xwest
Fehm û 'eqlê min li balê şûşeya dil bû şikest
Kaniya ava zelalî menbe'a cûd û cemal
- 6 Kes nekin lewm û 'itaba ev ji me r' pir lazim e
Ev zemanek pir gerîb e nefis û Şeytan zalim e
Îro dunya bi hisab e lê mirin ferz e li me
'Efwe yan nar û 'ezab e wê çewabê halê me
Hêviya rehma Xuda me tewbe heq dunya betal
- 7 Ya 'Ela'eddînê Şanî nazedarê Xeznewî
Heybet û himmet giran î tacidarê Xeznewî
Emrê tewbê kir 'ilanî ev kubarê Xeznewî
Rustem û şêrê zeman î namidarê Xeznewî
Heyderî hem rûh û canî kir fida'ê Xeznewî
Murşid û pîrê me 'ê tîn kes nehin pîra mişal⁸¹⁹

-62-

[Muxemmes - Medhiye]

mef'ûlu / mefa'îlu / mefa'îlu / fe'ûlun
Hezec - - + / + - - + / + - - + / + - -

- 1 Ey şahem' tû hebîbî we di husnê de şehîr î
Der eşl û neşeb hakim û sultan û emîrî
Teb'et esedî şêrê li meydanê biqîrî
Xweş betlê di Islamê mugîş î we neşîr î
Îrhem bi kuleybin leke yanûre beşîrî⁸²⁰
- 2 Carek tû xuya be li mirîdê xwe ke ihsan
Perdê tû hilîne kû bibînin hemî insan
Teb'et melek e şah e li ser textê Suleyman
Ke'ba dil û canê min î ya sirre zemîrî
Îrhem bi kuleybin leke ya nûre beşîrî
- 3 Hûrî-şifetê dilberê şêrîn di dila da
'Alem bi te hey bû tu wî dergahê murada
Bo 'illet û emrazê qulûba te dewa da
Minnet ji Xudê ra tû bi ehwala xebîr î
Îrhem bi kuleybin leke ya nûre beşîrî

⁸¹⁹ Di vê bendê de ev misra zêde ye. Lê em sadiqî nusxeyan man û me nivîstî.

⁸²⁰ Rehmê li min (li kuleybê xwe) bike ye nûra çavê min.

- 4 Minnet ji Xudê ra kû 'Eladdîn bûye ustad
Yek hukm û nezer kir li qulûban kirî irşad
Bêşek tû hekîm î ji te şed hêvi yû imdad
Samiḥ zelelî ya senedî ente zehîrî⁸²¹
Îrhem bi kuleybin leke ya nûre beşîrî
- 5 Bê şek tû di husn û cemalê da şêrîn î
Meḥbûbê dila ehlê Xudanî bi yeqînî
Bilxaş tû ser û ça 'v⁸²² û dil û rûhê **Emînî**
L' ber dergahê te **Heyderî** maye bi feqîrî
Îrhem bi kuleybin leke ya nûre beşîrî

-63-⁸²³

[Muxemmes - Medhiye]

mustefî ilun / mustefî ilun / mustefî ilun / mustefî ilun
Recez - - + - / - - + - / - - + - / - - + -

- 1 'Ebdulḡenî dewra te hat / ey xwedyê karê Xeznewî
Da qeşd bikin ehlê welat / werne diyarê Xeznewî
Ew nisbeta çû dîsa hat / hatye diyarê Xeznewî
Wek rojekî nû lê hilat / xêr hat ciwarê Xeznewî
Ê kû divê war û heyat / Xezna bû warê Xeznewî
- 2 'Ebdulḡenî bawer bikin / ew xwedyê malê Neqşebend
Ê kû li Xezna bû rîkin / ew bûn 'eyalê Neqşebend
Ê can û dil derman dîkin / ew çav-gezalê Neqşebend
Ger hûn ji dil teslîm bikin / ew bûn hevalê Neqşebend
Nefsa gunehkar hey dîkin / ev rengekarê Xeznewî
- 3 Weqtê ḡela dînê me ye / em ketne dewra ḡefletê
Wan murşida ders da me ye / l' pêşya me çûne axretê
Şer' û terîq eşkere ye / kû hûn divên heqîqetê
J' dînê me ra pir fayde ye / wa ye li Xezna nisbetê
Pir hêviya me l' wî heye / ey dost û yarê Xeznewî
- 4 'Ebdulḡenîyê Ehmedî / da dûv riya bav û bira
Girtî terîqa Serhedî / ey dost here pir zû hera
Nûrek ji lutfâ sermedî / wa ye li Xezna eşkera
Qeṭ we yekî wek wî nedî / j' dînê me ra wek fenera
Wê muḥbeta Muḥemmedî / xweş kir biharê Xeznewî

⁸²¹ Xeta' ên min efû bike ey sened û piştâ min.

⁸²² ça 'v] çav NMDM.

⁸²³ Ev helbest, tenê di NMDMyê de heye.

- 5 ‘Ebdulġenî pir fažil e / pir qîmetê wî zanibin
 Ew şeyxekî pir kamil e / teslîm bibin jê dûr nebin
 Derman dike qelbê kul e / vê furşetê hay jê hebin
 Ew murşidê ehlê dil e / wek **Heyderî** ġafil nebin
 Ê nas nekir ew cahil e / ew tacidarê Xeznewî

-64-

[Muxemmes – Medhiye]

fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilatun / fa‘ilun

Remel - + - - / - + - - / - + - - / - + -

- 1 Çû zemanê ‘eks û cuhlê hatî dewra Neqşebend
 Şîn bû dara piştî hişk bû wa li Xezna Neqşebend
 Ê divê Eħmed bibînî herne Xezna Neqşebend
 Herne ‘alim herne şofî herne Xezna Neqşebend
 Sed xwezî b’ wî muslimanê bighê Xezna Neqşebend
- 2 Şahê Xezna go xwezî b’ ‘ê bighê ‘Ebdulġenîyê me
 Pê ġenê kî dîn û dunya rêz û ders û emrê me
 Sed şukir ‘Ebdulġenî bû xwedyê tac û textê me
 Wek zemanê min bi irşadê wî xweş bî deryê me
 Hêmd ji Xudê ra piştî huznê xweş bû Xezna Neqşebend
- 3 Hêmd ji Xudê ra kû me dî ‘Ebdulġenî va bûye şêx⁸²⁴
 Xwedyê tac û textê Eħmed ew li şûnê bûye şêx
 Kî divê xweş kî dilê Eħmed kurê wî bûye şêx
 Ew li dûv bav û bira ye wa li Xezna bûye şêx
 Kû bi feđla Ĥeq Te‘ala ketye Xezna Neqşebend
- 4 Xwedyê sirra neqşebenda eşkera ‘Ebdulġenî
 Beyreqa mehdî tû rake xweş bimeş ‘Ebdulġenî
 Hûn yeqîn kin weysiyê Eħmed bû şêx ‘Ebdulġenî
 Bernedîn vê furşetê hûn bidne dûv ‘Ebdulġenî
 Ger dipirsî ٲa’ ifa Ĥeq wa li Xezna Neqşebend
- 5 Neqşebendî pir dixwazin em li dûv rêzê herin
 Ger dixwazin hûn nebin meħrûm ji feyza wan herin
 Şêx ‘Eladdîn go werin ger hûn birîndar in werin
 Ger hûn ġunehkar in werin werin werin pir zû werin
 Me‘dena feyż û terîqê hatî Xezna Neqşebend

⁸²⁴ Di NMD3 û NMDMyê de hemû peyvên “şêx” bi şiklê “şeyx”e.

- 6 Hewce nîne ez bibêjim medh û weşfê Xeznewî
 Ğewşê qirnê çardeha bû mîr û şahê Xeznewî
 Rebi tewfîqê bide wan ê kû dan dûv Xeznewî
 'Ê nedîtî her bibîne 'Ebdulğenî yê Xeznewî
 Rebi tewfîqê bide 'Ebdulğenî yê Neqşebend
- 7 *Kun me 'Allahî yekullahû me 'ek 'Ebdulğenî*
Kun me 'el heqqi yekulheqqu me 'ek 'Ebdulğenî
Kun me 'el Qur'ani fîl xulqu`l-kerîm 'Ebdulğenî
*Ente mes'ûdun bi tacil Xeznewî 'Ebdulğenî*⁸²⁵
Heyderî kelbê we ye ey Xeznewîyê Neqşebend

-65-

[Muxemmes - Mersiye]

mefa'îlun / mefa'îlun / mefa'îlun / fe'ûlun (mefa'îlun)
 Hezec + - - - / + - - - / + - - - / + - -

- 1 Dilo rabe te xew na'ê ji kalînê me yek car
 Ji derdê firqeta Me'sûm xwe datînê di nav nar
 Keserkûr im belê hêstir ji axînê me tîn xwar
 Ji kerbê wî kû nabînim melûl bûye dilê sar
 Melûl im ez ji kerbê wî dinalînê dilê sar⁸²⁶
 Firaqa taca sulţana kirim dînê birîndar
- 2 Dilo dilber xuya nakî li min dunya dibû tarî
 Birîndar im ji derdê wî didim qîra dikim zarî
 Heta bimrim ji bîr nakim evê derba bi dijwarî
 Kû hîva çardeha îro diçû ava li 'êvarî
 Dihiştin em di zindanê di nav xwînê birîndar
- 3 Dilo rabe ji zindanê biderkev tû bibîn keysê
 Xwe bighîn ber derê yarê bibêje wê perî lubsê
 Çira îro li halê vî birîndarê xwe napirsê
 Ji ber ça'va⁸²⁷ xwe wenda kir li min dunya wekî hebsê
 Nema tê û diçî îro Sit û Zînê⁸²⁸ birîndar

⁸²⁵ Bi Xweda ra be wê Xweda jî bi te ra be
 Bi heqqîyê ra be wê heqqî jî bi te ra be
 Bi xulqê kerîm bi Qur'anê rabe 'Ebdulxenî
 Tu mesûd î bi taca Xeznewî 'Ebdulxenî.

⁸²⁶ Di benda ewil de ber eksê muxemmesê 6 riste tê de hene. Em di wê fikrê de ne ku her du risteyên dawîn weke hev in divê yek heba. Lê ji ber ku di nusxeyan da bi vî awayî ne me jî bi vî şiklî da.

⁸²⁷ ça'va] çava NDDM.

⁸²⁸ Sit û Zînê] Sitî û Zînê NMD1, NMD2.

- 4 Dilo rabe xwe pêk bîne bike tedbîr li vî halî
 Hebîbê min ji gafil de gelo çawa xwe da alî
 Sera û qeşr û eywan jê diman bê deng û hem xalî
 Li eîrafa bipirse ka çi mizgîna te tê talî
 Ji mer' bîne cewaba Çîn û Maçînê birîndar
- 5 *We qelbî rûh ilel Me 'şûm bi şîdîqin wetruki 'l-gille*
We bellig kamilen minnî selamen wezheri 'z-zille
*Bi ennel **Heyderî** kane xetayahû tecela sicille*
We qul inne 'l-kerîme men yeqûlu e 'fuwe 'l-kulle
We haza sa 'îlun bi 'l-bab yûnadînî birîndar⁸²⁹
- 6 Dilo dilber xuya nakî çewa îro te tê şebra
 Li min wenda bû hîva çardeha îro di nav⁸³⁰ 'ewra
 Dizanim ew nema tê der belê çibkim gelek zora
 Ji vê kerbê dinalim hem dizanim ezyet û cewra
 'Eceb wê xweş bibê carek dem û hînê birîndar
- 7 Gelo ka kêf⁸³¹ û 'eşqa te di weqtê wê şekerxayê
 Meşa şêrîn fikir wê çend hezar 'aşîq kirin tayê
 Di axir çû xwe wînda kir hezîn hiştin di dunyayê
 Dikim firyad û efgana belê çibkim mirin nayê
 Xeyala bejn û bala wî dinalînê birîndar
- 8 Dilo ka dilbera nazik çewa⁸³² şebra te tê miskîn
 Li halê xwe bipirse lê tû vî derdî nekî dengîn
 Çikû bextê mi reş bû hew dibînê şorgula rengîn
 Nizanim ez çi tedbîrê bidim îro dilo gêmîngîn
 Heval û dost muheyîyer man ji kalînê birîndar
- 9 Dilo rabe bikev çolê wekî dîna bike efgan
 Bipirse tû li derdê xwe bibîne ka çi ye derman
 Di piştî çavreşa nazik ji kû bînim ji xwe r' Luqman
 Li textê dil kû rûnî ew bi hukmê xwe bibî sultân
 Xwe pêk bînî bi mizgînê xwe bighînê birîndar

⁸²⁹ Ey qelbê min here ba Me 'sûm dev ji qirêjî û gemarê berde
 Selama min bigihîne û kêmanîya min jê re eşkere bike
 Bêje ku Heyderî xetayên wî zaf nivîsîne
 Bêje ê camêr ê go dibêje min tev efû kir
 Ew yekî feqîrê birîndar li devê derî gazî min dike

⁸³⁰ nav] va NMD1, NMD2.

⁸³¹ kêf] keyf NMDM.

⁸³² çewa] çawa NMDM.

- 10 Dilo rabe gelek dilber weha çûn yek ji wan ecla
Nebîyê me Muḥemmed al û eşḥab seyyed û mewla
Heçî axret bi dil girtî neqil bû *cennetu`l-e`la*⁸³³
Çikû dunya betal e fani ye kes lê neda meyla
Îlahî me bi wan qenca re derxînê birîndar
- 11 Dilo rabe tû zanî kû gelek derdê me pir bûne
Di vê qirnê da qenc kêman heçî baş ew li pêş çûne
Înanî yû `edalet `ilm û heqqî tev qelîl bûne
Ji lew ev **Heyderîzade** hinav û dil dibû xwîn e
Ji ça`va⁸³⁴ hêstirê xwînê dibarînê birîndar

-66-

[Muxemmes - Mersiye]

mef`ûlu / mefa`îlu / mefa`îlu / fe`ûlun
Hezec - - + / + - - + / + - - + / + - -

- 1 `Eşqa te li dil da tû şêrînê me `Eladdîn
Dunya bi te xweş bû gemrevînê me `Eladdîn
Zanîm tû wî dermanê birînê me `Eladdîn
Em man ji gema re tû dibînê me `Eladdîn
Hetta mirînê derd û evînê me Eladdîn
- 2 Rûhê me `Eladdîn dev û lêvê şekerî bû
Exlaq melekî bû lê bi şiklê beşerî bû
Xêrxwazê mirîda ji me ra pişt û serî bû
Mêrxasê terîqê riş û canê **Heyderî** bû
Hetta mirînê eş û evînê me `Eladdîn
- 3 Derdê li me peyda bûme bawî ez ji gava
Wechê wekî heyvê kû li çarda diçû ava
Hêstir wekî baranê dibarin ji du ça`va⁸³⁵
`Eşqa te biraştî nema tê der ji hinava
Halê me xerab e tu dibînê me `Eladdîn
- 4 Piştî te li ber ça`vê⁸³⁶ me dunya hemî reş tê
Navê te dibêjim wekî wa ye tû bi meş tê
Dermanê dila yî⁸³⁷ li birîna çîqa xweş tê
Xwezîya mi hebîbê xwe bidîta li buhuştê
Wê weqtê tû dermanê birînê me `Eladdîn

⁸³³ Ji nav dereceyên cennetê qatê herî bilind, cenneta heştemîn

⁸³⁴ ça`va] çava NMDM.

⁸³⁵ ça`va] çava NMDM, DCMŞB.

⁸³⁶ Ça`vê] çavê NMDM, DCMŞB.

⁸³⁷ Dila yî] dilan î NMDM, DCMŞB.

- 5 Wellah ji te têr nabim ez navê te dibêjim
Weqtê te nebînim li heyatê ker û gêj im
Heqqê min e piştî te dilê xwe bibirêjim
Hêstir kû nemînin heqe xwînê ez birêjim
Ez kuştîyê 'eşqa te şêrînê me 'Eladdîn
- 6 Ez kuştîyê 'eşqa te me hetta mirinê ax
Dunya kû li ber şewqa te bû ey gula ser şax
Xweş nabe heyata me di piştî tû nema şax
Xwezîya te bibînim bi wî şîklê heye ew çax
Ez dînê te me ey Sit û Zînê me 'Eladdîn
- 7 Qurbana te bim Zîn û Sitê taca serê min
Bê şubhe tu wî wens û heyata cegerê min
Axir temirandî hemî şewq û fenerê min
Em man ji kûla re ji xwe pir bûn kederê min
Dunya hemî ker bûn ji qîrînê me 'Eladdîn
- 8 Billahi 'Eladdîn tû bû şorgul ji dila ra
Ma wek te hebûn şêrîn û dilxwaz ji mela ra
Tû j' kîsê me çû yî te em hiştin ji kula ra
Piştî te heyata me dimaye ji gema ra
Imdad û hewar e kul û şînê me 'Eladdîn
- 9 Ya Reb bide şêrê kû 'Eladdîn çû wefatê
Xwezîya me bidîta di wê weqtê sekeratê
Agir digirtî dil ji kula na'ê tebatê
Şed heyfa me wîndî kirî ser taca welatê
Lê **Heyderî** zanî tû **Emînê** me 'Eladdîn

-67-

[Muxemmes - Mersiye]

fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilun
Remel - + - - / - + - - / - + - - / - + -

- 1 Ey dilo ka dilbera te ma heye wek vê zerar
Kû ji ber ça'vê⁸³⁸ me wîndî bû 'Eladdînê kubar
Vê firaqê em helandin nav û dil tev hate xwar
Têr nebûm ji şorgula xwe ne bi xewn û ne şîyar
Her wekî bulbul dixwînim ya 'Ela'eddîn hewar

⁸³⁸ ça'vê] çavê NMDM.

- 2 Ey dilo zanî te winda kir gula şêx û mela
 Şorgula bagê biharê ruhniya ça‘v⁸³⁹ û dila
 Dîtina te çi şêrîn e me dî carek bû gela
 ‘Îşq û keyfa me fikir tev bûye derd û hem bela
 Heye carek te bibînim ya ‘Ela’eddîn hewar
- 3 Hêstirê ça‘van⁸⁴⁰ dibarin mişlê baran û çema
 Vê wefatê em biraştin kirne nav derd û gema
 Roj bi roj êşê dikêşim zer dibûme wek şima
 Ya bira lewma nekin qet kes nebêjin ka çima
 Hew gula şêxa dibînim ya ‘Ela’eddîn hewar
- 4 Çi qiyamet li me rabû li vî derdî heyirîne
 Her wekî kû me nedît û em li dûv wî nemeşîne
 Ne li Nûrşîn û Hicazê ne li Rewdê sekinîne
 Me ne ders û ne tewecuh ne kenîne ne girîne
 Ez ji van derda hezîn im ya ‘Ela’eddîn hewar
- 5 Kanî ew deng û feşahet kanî ew nuçqa delal
 Kanî ew ‘îşqa Muhemmed kû li balê ka cernal
 Wekî berqê te hejandî dilê xelqê ça‘v gèzal
 Heqqe piştî vê firaqê xwe hisab kin ker û lal
 Vê firaqê dikişînim ya ‘Ela’eddîn hewar
- 6 Diwazde sala terîqa xwe bi mêranî hemand
 Bi hezarî va⁸⁴¹ mirîda te li dora xwe civand
 Te dilê xelqê bi ders û şuhbet û ‘ilmê heland
 Lê ji gafil xwe hilanî hiş û ‘eqlê me revand
 Ez li ser te dil birîn im ya ‘Ela’eddîn hewar
- 7 Vê firaqa te ji bîr nabê heta roja ebed
 Agirê ‘îşqê helandî ceger û can û cesed
 Ah û zarîn ji me çûn qîrîn û dengê bê ‘eded
 Heta sağ bim ez ê bakim ya ‘Ela’eddîn meded
Heyderî gemgîn û dîn e ya ‘Ela’eddîn hewar

⁸³⁹ ça‘v] çav NMDM.

⁸⁴⁰ ça‘van] çava NMDM.

⁸⁴¹ va] van NMDM.

[Museddés - Medhiye]

fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilun
Remel - + - - / - + - - / - + - - / - + -

- 1 Da'ima⁸⁴³ elhemdulillah min dî şahê Xeznewî
Min dî Me'sûm û 'Eladdîn roj û mahê Xeznewî
Bi 'Ebdulğeni⁸⁴⁴ şiyar bin hem bi cahê Xeznewî
Tev du'a kin bo dewama rêz û rahê Xeznewî
Ya Ilahî hîfz û şebrê bid 'eyalê Xeznewî
Şed şukur em ketne weqta çav-gezalê Xeznewî
- 2 Gerçi Eḥmed danî asasê terîqê nisbetê⁸⁴⁵
Gerçi Me'sûm zêde 'işqek da dila der xizmetê
Ger 'Eladdîn canfida'ê dîn û 'ilm û şuhbetê
Bi 'Ebdulğeni⁸⁴⁶ bikin şebrê bizanin qîmetê
Ya Ilahî hîfz û şebrê bid 'eyalê Xeznewî
Şed şukur em ketne weqta çav-gezalê Xeznewî
- 3 Gerçi Eḥmed bûye pîrê vê Terîqa Neqşebend
Gerçi Me'sûm pehlewane serbilind e bû sened
Ger 'Eladdîn pir şêrîn e mutteqî û derdimend
'Ebdulğeni⁸⁴⁷ şaxedara Eḥmedê heybet bilind
Ya Ilahî hîfz û şebrê bid 'eyalê Xeznewî
Şed şukur em bûn mirîdê çav-gezalê Xeznewî
- 4 Şahê Xezna tecdîda dîn kir di weqtê dîn gela
Hem bi Me'sûm zêde xizmet çêbû hem 'işqa dila
Şêx 'Eladdîn xweş teşerruf kir xuşûşen der mela
Lê dikim hêvî bi 'Ebdulğeni⁸⁴⁸ herin derd û bela
Ya Ilahî hîfz û şebrê bid 'eyalê Xeznewî
Şed şukur em ketne weqta çav-gezalê Xeznewî

⁸⁴² Ev helbest di nusxeya NMD1ê de di her bendê de navê 'Izeddîn derbas dibe lê di nusxeya NMD2yê de di her bendê de ev peyv hatiye sererastkirin û navê 'Ebdulxenî lê hatiye dayîn. Li gor agahiyên mustensixê nusxeyan; Mele Diyaddîn daye me , ev sererastkirin, ji aliyê muelîf Mihemed Emînê Heyderî ve çêbûye. Lewra me jî nusxeya NMD2 ji xwe re bingeh girt.

⁸⁴³ Da'ima] Da'imen NMDM.

⁸⁴⁴ Bi 'Ebdulğeni] Hem bi 'Izeddîn NMD1.

⁸⁴⁵ terîqê nusbetê] terîq û nusbetê NMDM.

⁸⁴⁶ Bi 'Ebdulğeni] Lê bi 'Izeddîn NMD1.

⁸⁴⁷ 'Ebdulğeni] Hem 'Izeddîn NMD1.

⁸⁴⁸ b' 'Ebdulğeni] bi 'Izeddîn NMD1.

- 5 Pir bi Eḥmed bûn hîdayet Tirk û Kurmanc û 'Ereb
 Pir bi Me'sûm 'eşqê da dil mişlê berqê roj û şeb
 Lê 'Eladdîn murşidê heq şu'le da Şam û Heleb
 Bi 'Ebdulḡeni⁸⁴⁹ dewam bê 'ilm û irşad û edeb
 Ya Ilahî hîfz û şebrê bid 'eyalê Xeznewî
 Şed şukur em ketne weqta çav-gezalê Xeznewî
- 6 Xeznewî bû ruhniya çav û dila der zûlmetê
 Şahê Me'sûm û 'Eladdîn bû muzîlê ḡefletê
 Hem dikim hêvî bi 'Ebdulḡeni⁸⁵⁰ bibînin lezzetê
 Agirê 'eşqê helandî **Heyderî** der ḡurbetê
 Ya Ilahî hîfz û şebrê bid 'eyalê Xeznewî
 Şed şukur em ketne weqta çav-gezalê Xeznewî

-69-⁸⁵¹

[Museddes - Medhiye]

mustef'îlun / mustef'îlun / mustef'îlun / mustef'îlun
 Recez - - + - / - - + - / - - + - / - - + -

- 1 Ey dil celîsê weşetê / da'im mekêşe zehmetê
 Rake tû navê ḡîretê / carek bibêje qîşetê⁸⁵²
 Derxe birîna hîrretê / meṭlûbê roj û sa'etê⁸⁵³
 Eḥmed melazê ummetê / şahê beşer xweş teb'etê
 Xezna mefaza rehmetê / şahê m' xudanê şewketê⁸⁵⁴
 Imdat re'îsê hey'etê / tew me negêrê⁸⁵⁵ ḡefletê
- 2 Şahê li Xezna'ê 'emîr / ew padişahê bê nezîr
 Ḥusn û cemal tac û serîr / şorgul 'izar⁸⁵⁶ wechê munîr
 Şed ḥakim û şah û wezîr / pabeste'ê rengê esîr⁸⁵⁷
 Meqbûl û zanê dil-pezîr / *hem kaşîfêma fî'd-ḡemîr*⁸⁵⁸
 Zatê 'ezîz qutbê kebîr / fexr û kibarê nisbetê
 Paytextê li Xezna'ê şehîr / teşbîhê rewḡa Cennetê

⁸⁴⁹ Bi 'Ebdulḡeni] Hem bi 'Izeddîn NMD1.

⁸⁵⁰ b' 'Ebdulḡeni] bi 'Izeddîn NMD1.

⁸⁵¹ Ev helbest di nusxeyên NMD1, NMDM û MMECyê de heye. Di NMDMyê de benda 5an tune ye. Helbest di NMD1 û MMECyê de heman şikl in. Em ê NMD1ê ji xwe re bingeh bigrin.

⁸⁵² carek bibêje qîşetê] rabe bibîne furşetê NMDM.

⁸⁵³ meṭlûbê roj û sa'etê] carek bibêje qîşetê NMDM.

⁸⁵⁴ şahem Xudayê şewketê] feyza Xudê li bejna te tê NMDM.

⁸⁵⁵ tew me negîrê] em ketne dewra NMDM.

⁸⁵⁶ şorgul 'izar] esmer şerîn NMDM.

⁸⁵⁷ pabeste'ê rengê esîr] dest dane ser hev 'ê feqîr NMDM.

⁸⁵⁸ Tu bi qelban dizanî (tu keşîf dikî).

- 3 Ew şahê cumle ewliya / rûhim fida xakê piya
Nisbet ji Nûrşîna Zîya / daket⁸⁵⁹ li Xezna bû xuya
Bû mesleka wan şofiya / hem meskenê van cindiya
Ev nav û 'ilmê⁸⁶⁰ bê riya / feyzek reşand çol⁸⁶¹ û çiya
Resmek li şeklê⁸⁶² mehdiya / dunya gîriqî ni' metê
Ev resm û rêza 'alima / dayî Xudayê⁸⁶³ 'izzetê
- 4 Ev murşidê serwer⁸⁶⁴ qeda / wek Rustemê yek ne 'erda
Bêhiş kirin şah û geda / şewqê li dunya'ê veda
Kun û mekan jê şu'le da / awir-esed şêrîn-şeda⁸⁶⁵
Tîrek li etrafa veda / bêhiş li min dil yeğme da⁸⁶⁶
Şahê terîqa Serheda / hiştîm di narê firqetê
Rûh û rewanê min fida / mizgîn li wanê dil ketê⁸⁶⁷
- 5 Serwerê feşal le'î şekir / nisbet li Xezna pir dikir
Nûra zulam perwane kir / bêhn li miskê zêde kir
Qelb diqasî yeğme kir / perda li ser dil pare kir
E'rab û şerh û me'ne kir / teftîşa li qelba sar nekir
Şewtek ji berqê peyde kir / erd û sema nalîn ketê
Meydan li xelqê zêde kir / Şed ah ji destê muhbetê
- 6 Ey şahê Xezna serwer î / le'lê şeker leb-kewşerî
Çendî tû şahê beşer î / cemal⁸⁶⁸ mubarek 'esmerî
Canan emîrê şeh-perî / feyzek ji Xezna'ê⁸⁶⁹ derî
Teşbîhê misk û 'enber î / da'im dibim lê muşterî
Can peritî dil bû gerî⁸⁷⁰ / her dem dikêşim zehmetê
Derdê **Emînê Heyderî** / şewqa li dora merqedê⁸⁷¹

⁸⁵⁹ daket] hatî NMDM.

⁸⁶⁰ 'ilmê] dengê NMDM.

⁸⁶¹ Çol] deşt NMDM.

⁸⁶² Resmek li şeklê] Ev ders û rêza NMDM.

⁸⁶³ dayî Xudayê] hedya Xudanê NMDM.

⁸⁶⁴ serwer] selwî NMDM.

⁸⁶⁵ Kun û mekan jê şu'le da / awir-esed şêrîn-şeda] Erd û sema jê şu'le da awir şêrîn 'alî şeda NMDM

⁸⁶⁶ Tîrek li etrafa veda / bêhiş li min dil yeğme da] Nûrê li etrafa veda dilxweş kirin ehlê Xuda NMDM

⁸⁶⁷ mizgîn li wanê dil ketê] Me j' bîr neke yek sa'etê NMD1.

⁸⁶⁸ cemal] cumle NMDM.

⁸⁶⁹ Xizna'ê] Xizna tê NMDM.

⁸⁷⁰ Can peritî dil bû gerî] Dil peritî can bû gerî] NMDM.

⁸⁷¹ merqedê] cibhetê NMDM.

[Museddés - Medhiye]

fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilun

Remel - + - - / - + - - / - + - - / - + -

- 1 Nêrgiza bagê cinana gewşê 'alem e' zem e
Ez ji ber le'lê şeker taca teber sermeste me
Me'dena 'ilm û terîqê ez feqîr im hewce me
Pir gunehkar im zelîl im ez geda şermende me
Ez dexîl im bavê Me'sûm sa'il im bê çare me
Şed meded şêxê⁸⁷³ terîqê kelbê dergahê te me⁸⁷⁴
- 2 Der sulûka Neqşebendî⁸⁷⁵ tû re'îsê ewliya
Kaniya cûd û sexa'ê ke'begahê şofiya⁸⁷⁶
Muşfiyê qelbê xerab e lutfekarê 'aşıya
Şehsiwarê⁸⁷⁷ dîn û dewlet lew li Xezna bû xuya
Ez dexîl im bavê Me'sûm sa'il im bê çare me
Şed meded pîrê terîqê⁸⁷⁸ kelbê dergahê te me
- 3 Ruhniya erd û sema'ê melce'ê şah⁸⁷⁹ û geda
Hêj diber qal û bela'ê çûye rêza emceda
Serbilindê her du dunya şox û şengê es'eda
Qulzena şer' û hedîşa ez fida bim Ehmeda
Ez dexîl im bavê Me'sûm sa'il im bê çare me
Şed meded pîrê⁸⁸⁰ terîqê kelbê dergahê te me
- 4 Cami'ê 'ilm û se'adet resm û nîşanê tamam
Malikê kenzi'l-hidayet⁸⁸¹ kamilê b' 'ilm û meqam⁸⁸²
Sertebîbê qelb û cana **Heyderî** bûye ğulam⁸⁸³
Şed şukur çavê me ruhnî tû li ser me bû imam
Ez tenê mehrûm û miskîn halikê nefsa xwe me
El-eman şêxê terîqê kelbê dergahê te me⁸⁸⁴

⁸⁷² Ev helbest di NMDMyê de çar bend in. Di NMD1 û NMD2, NMD3 û DCMŞByê de şeş bend in lê di NMD2yê de ser du bendên dawî hatine xêzkirin, yanî jê hatine derxistin. Bi piştraskirina Mela Diyaddîn ev guherîn ji aliyê Mihemed Emînê Heyderî ve çêbû ye. Lewra em ê jî helbesta NMD2yê bingeh bigrin û bendên ku jê hatine derxistin li jêrê nîşan bidin. bnr. (**Pêvek 19: Helbesta Rêza 78an a Vê Xebatê, ji Nusxeya NMD2yê**).

⁸⁷³ şexê] pîrê DCMŞB.

⁸⁷⁴ Helbesta di DCEHKyê de di vir de diqede. Tenê benda ewwîl heye.

⁸⁷⁵ Neqşebendî] Neqşebendan DCMŞB.

⁸⁷⁶ Kaniya cûd û sexa'ê ke'begahê şofiya] me'dena cûd û sexa'ê qiblegahê şofiya DCMŞB.

⁸⁷⁷ Şehsiwarê] 'Izz û fexra NMD1, NMD2.

⁸⁷⁸ Şed meded pîrê terîqê] El-eman qutbê terîqê NMD1, NMD2.

⁸⁷⁹ şah] nas NMD1, NMD2.

⁸⁸⁰ pîrê] qutbê NMD1, NMD2.

⁸⁸¹ Xezîna hidayetê yanî xelasiya ji nebaşîyan ber bi riya Xwedê ve.

⁸⁸² kamilê b' 'ilm û meqam] rehberê şah û ğulam DCMŞB.

⁸⁸³ **Heyderî** bûye ğulam] ruhniya qelbê zûlam NMD1, NMD3. Rewneqa qelbê zûlam DCMŞB.

fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilun

Remel - + - - / - + - - / - + - - / - + -

- 1 Şed şukur em ketne weqta⁸⁸⁵ van kubarê pir delal
Ruhniya ça've⁸⁸⁶ mirîda dilbera awir-gezal
Ev diyarê Xeznewî şewq da ji nûra *Zu'l-Celal*
Bûn⁸⁸⁷ xuya ewlad ji piştê Ehmedê şahib cemal
Yek bi yek girtin terîqê şêrê dîn in durrê 'al
Wan li دنیا'ê bela kir çar teref 'ilm û kemal
- 2 Ev zemanê talî hat û tim li Tilme'rûf bihar
Payitextê Neqşebendî lê vegirtî şehriyar
Xeznewî 'ilm û terîq da xaş û 'am merdê kubar
Piştêmîrê wan Muhemmed nîne tîrsa wan tû car
'ilm û adabê terîqê zêde kirne sal bi sal
Kes nebêjin em nizanin pê hisandin kerr û lal
- 3 Kes nebêjin em nizanin ev çi nav û deng û qîr
Me bi wan nas kirye îman bûn li ser me sayegîr
Hukmê şer'ê kirne teblîg nefs û şeytan man yesîr
Kî bi wan girt û xelaş bû şêx û ağa û feqîr
Lê çi bêjim nîne inşaf em didin dûv ya beşal
Qîmetê wan em nizanin geyrê qeşr û milk û mal

⁸⁸⁴ Ji dawîya helbestê 2 bend bi qontrolkirina Şêx Muhemmed Emînê Heyderî hatine derxistin. Di NMD2yê de ev her 2 bend hatine xêzkirin. Ji xwe di NMDMyê jî de tunene. Ev her du bend wiha ne:

5 Şed şukir min dî Şehê Xizna imamê vê demê
Ger bipirsî ber û behr û şerq û gerba 'alemê
Nîne wek vê şorgula bagê buhuştê Iremê
Tabî'ê rîya Zîya ye hem bi resma qedemê
Ez dexîl im bavê Me'sûm sa'il im bê çare me
El eman şexê terîqê kelbê dergahê te me

6 Warîgê şer'a Muhemmed vê Terîqa Neqşebend
'Alima Tirk û 'Ecem Kurd û 'Ereb deşt û beled
Hêvîdar im ya Ilahî dewlet û tekya ebed
Heyderîzade bibexşî Şahê Xizna el-meded
Ez dexîl im bavê Me'sûm sa'il im bê çare me
El-eman şexê mezin ez kelbê dergahê te me

⁸⁸⁵ weqta] weqtê NMD1, NMD2.

⁸⁸⁶ ça've] çavê NMDM.

⁸⁸⁷ Bûn] Bû NMD1, NMD2.

- 4 Milk û mal û qeşr û eywan wê li xelqê bûn bela
 Guh nadin emrê Xuda heTta li me dîn bû gela
 Zû xwe bighînin 'Eladîn şofî û xorî û mela
 Bibne teslîm pê dewa kin dîsa qelbê mubtela
 Ez tenê dîr im hezîn im mame der fikra beşal
 Ev heyat çû tev di lehwê kanî tedbîr kanî hal
- 5 Şed şukur weqta 'Eladdîn ev hediye peyde kir
 'İlm û teqwa bê rîya bû wî li xelqê zêde kir
 Perde hilda hem nezer da qelbê miskîn yeğme kir
 Kî jî 'işqa dil bi wan girt *fi'l-heqîqet* fayde kir
 Kel di nava min difûrî min ne keys û ne feşal
 Dilreş im derman dixwazim lê çikim nîne mecal
- 6 Lê çî kim nefsa me xa'în ew li ya qenc nagerî
 Kû herî ber dergehê wan xwe zelîl kî ber derî
 Belkî carek em teberruk bibne bihna 'enberî
 Ez ditirsim ni'meta xweş kû jî destê me⁸⁸⁸ herî
 Tali'ê min baş e lê qeş li min na'ê reml û fal
 'Eşq û muhbet kû jî dil bî ber mirin bî bê wişal
- 7 Pêl û mewcê nisbeta heq wa li Tilme'rûf xuya
 Ê nezan e kirne kamil wêTerîqa Neqşîya
 Merhem û feyza 'Eladdîn daye ser çol û çîya
 Ruhniya ça'vê⁸⁸⁹ me îro bû dewa'ê 'asiya
 'Ê wekî wî kû re'îs bin qeş jî me r' nîne xeyal
 Wa hekîmê **Heyderî** hat ey **Emîn** bes tû binal

-72-

[Museddes - Mersiye]

fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilun
 Remel - + - - / - + - - / - + - - / - + -

- 1 Ey dilê bê çare rabe bes ke êşa kebedê
 Çû wefatê qutbê kamil hate ser emrê Xwedê
 Firqeta wî dil biraştî⁸⁹⁰ can gulamê wê qedê
 Deng û qîrîn ah û nalîn çûne Şam û Serhedê
 Ya Ilahî ba selamê hem cemala wuşletê
 Rehmet û nûr û kerem her dem bibarê merqedê

⁸⁸⁸ me] min NMD1, NMD2.

⁸⁸⁹ ça'vê] çavê NMDM.

⁸⁹⁰ biraştî] biraştin NMD1, NMD2.

- 2 Firqetek pir şe‘b û zor e hate ser me gefleten
 Mislê êsîrê di hepsan⁸⁹¹ bê tebat im hesreten
 Em liqa‘a wî dîkin hêvî⁸⁹² Ilahî lehzetên
 Da li dûv wî me xelaş kî bê meşeqqet rehmeten
 Ya Ilahî cahê ‘alî wens û zewqa ru‘yetê
 Rehmet û nûr û kerem her dem bibarê merqedê
- 3 Ez ji kerbê vê firaqê bê hiş û lal û kerr im
 Pê di qeydê vê dunê da bê dewa‘ û mefer im
 Dûr û mehrûm û gerîb im⁸⁹³ dil bi ah û keser⁸⁹⁴ im
 Şani‘ê fî‘lê zemîm im⁸⁹⁵ qelb û rûreş kemter im
 Ya Ilahî tû bi cahê piştewarê ummetê⁸⁹⁶
 Rehmet û nûr û kerem her dem bibarê merqedê
- 4 Ehedê min çû ji desta⁸⁹⁷ ta bi ‘uqba ne xuya
 Ta bi roja heşr û neşrê bû hisaba ‘aşiya
 Hêviya me ma Muhammed serbilindê enbiya
 Ğem nexwun mehzûn⁸⁹⁸ nemînî dîr ji ‘eybê şermiya⁸⁹⁹
 Ya Ilahî serfirazek padişahê dewletê
 Rehmet û nûr û kerem her dem bibarê merqedê
- 5 Yek bela hatî ji gafil Ehedê min bû wefat⁹⁰⁰
 Qeşr û dîwan xelwexane bûne zindan hem welat⁹⁰¹
 Hêstirê ça‘va⁹⁰² bi xwîn tîn ne hedan û ne tebat
 Piştî Ehedê gewşê ‘alem⁹⁰³ ez nemînîm li heyat
 Ya Ilahî ehlê cennet⁹⁰⁴ bîn temaşa qametê
 Rehmet û nûr û kerem her dem bibarê merqedê

⁸⁹¹ hepsan] hebsan NMDM, hebsê MMEC.

⁸⁹² dîkin hêvî] dixwazin ya MMEC.

⁸⁹³ gerîb im] gunehkar im MMEC.

⁸⁹⁴ keser] keder MMEC.

⁸⁹⁵ zemîm im] qebîlî im MMEC.

⁸⁹⁶ Ya Ilahî tû bi cahê piştewarê ummetê] Ya Ilahî tu bi fedla xwe li me bik minnetê NMD1, NMD2.

⁸⁹⁷ Ehedê min çû ji desta] Serwerê min ez firaqa MMEC.

⁸⁹⁸ Ğem nexwun mehzûn] Rûreş û mehrûm MMEC.

⁸⁹⁹ ‘eybê şermiya] ‘eyb û şermiya NMDM.

⁹⁰⁰ Yek bela hatî ji gafil Ehedê min bû wefat] Yek bela na‘ê ji vê meştir go şahê çû wefat MMEC.

⁹⁰¹ Qeşr û dîwan xelwexane bûne zindan hem welat] Birc û dîwan bûne zindan ev musîbet j’ bo me hat MMEC.

⁹⁰² ça‘va] çava NMDM.

⁹⁰³ Ehedê gewşê ‘alem] şahê qutbê kamil MMEC.

⁹⁰⁴ ehlê cennet] cin û emlak MMEC.

- 6 Ev muşîbet qeṭ ne mestir bû ji ya pêgembera
Lê feqet ev warişê wan bû li Xezna eşkera
Her dema ew tê xeyalê dil bi ah û kesera
Wî di ber dîn da kirî xizmet bi rastî ey bira⁹⁰⁵
Ya Ilahî hesreta wî selsebîla Cennetê
Rehmet û nûr û kerem her dem bibarê merqedê
- 7 Ey gelî dost û hevala hûn binalin⁹⁰⁶ bê ‘eded
Çûye⁹⁰⁷ pişta me feqîra hate ser emrê Ehed
Kû bi zahir çû wefatê lê di baṭin xweş sened
Hem ji ewlada xuya yî ev wilayet ta ebed
Ya Ilahî tû keremkarê Xudanê rehmetê
Rehmet û nûr û kerem her dem bibarê merqedê
- 8 Kaniya ‘ilm û terîqê menbe‘a cûd û cemal
Cami‘ê feyza ‘ulûma nisbeta nûra zelal
Çû neqil bû darê heq ba Meşheda nûra Celal
Hem⁹⁰⁸ sened sertacê zî tac xweş mubarek ba Cemal
Ya Rebî tû bi cahê fexrê ‘alem bik minnetê
Rehmet û nûr û kerem her dem bibarê merqedê
- 9 Weqtekî pir pîs e em ketne zemanek fitne ye
Tem‘ û geflet zulm û ruşwet roj bi rojê zêde ye
Wek pezê⁹⁰⁹ kû bê şivan bê ketne dest nefsa xwe ye
Nefs û şeytan em temam wek hev kirin yek ce‘de⁹¹⁰ ye
Ya Ilahî me şiyar kî j’ cehl û tem‘ û gefletê
Rehmet û nûr û kerem her dem bibarê merqedê
- 10 Hûn bi dunya‘ê nebin megrûr û ‘aşîq muşterî
Hay ji îmanê hebin ummet ze‘îf ket bê serî
Hin dibin êsîrê nefse hin⁹¹¹ bi dunya fenkerî
Bi`l-xuşûş nefse biraşt canê⁹¹² **Emînê Heyderî**
Ya Ilahî heb li Me‘şûm hîfz û şewq û himmetê
Sê Qulhûwellah Ehed el-fatihe⁹¹³ bo merqedê

⁹⁰⁵ Wî di ber dîn da kirî xizmet bi rastî ey bira] Serwerê min rehberê min meyl muhebet kewşer e MMEC.

⁹⁰⁶ hevala hûn binalin] mirîda hûn bibêjin MMEC.

⁹⁰⁷ Çûye] Nîne MMEC.

⁹⁰⁸ Hem] Hel NMD1, NMD2.

⁹⁰⁹ pezê] sewalê MMEC.

⁹¹⁰ ce‘de] ca‘de NMDM.

⁹¹¹ Hin dibin êsîrê nefse hin] Tevda bûn êsîrê nefse hem MMEC.

⁹¹² biraşt canê] biraştî cergêMMEC.

⁹¹³ Qulhûwellah Ehed û el-fatihe; du sûreyên Qur’ana Pîroz in. Sûreya Fatihe’yê di rûpela serî û sûreya yekemîn e. Sûreya Qulhuwellahû Ehed jî di rûpela dawî û sûreya 112an e. Yanî ser û binê Quranê ye. Lê di nava gel de gotina “sê Qulhuwellahû Ehed û el Fatihe” pir berbelav e. Lewra fazîletên van her du sûreyan hene ku ew jî fezla xwe ji hedîsên Pêxember digre. “Xwendina Qulhûwellahû Ehed bi qasî xwendina ji sê parê Qur’anê yek e.” [Buxarî]. “Kesê Qulhuwellahû Ehed bixwîne biqasî ji sê parên Qur’anê parekê bixwîne.” [Tirmizî]. û hwd. Di nava gel de kesê sê caran Qulhuwellahû Ehed û Fatiheyekê bixwîne biqasî ku Qur’anê xitim bike xêrê digre.

mefa'îlun / mefa'îlun / mefa'îlun / mefa'îlun
Hezec + - - - / + - - - / + - - - / + - - -

- 1 Eya saqî dikim hêvî şeraba 'eşqê zû bînê
Kû hişyar bî dilê gêmîgîn bike rehîmê xwe bighînê
Bî beşsa dilbera şêrîn dilê min zû bike şînê
Bî dengê **Heyderî** bakim eya dilber tû Şêrînê
Te pir 'aşîq kirin mecnûn şev û roja dinalînê
Belê mûkî ji te nadim bi şed Leyla û şed Zînê
- 2 Li çend sala me dilber dî wekî xewnê li dunya'ê
Bî zewq û şuhbeta 'ilmê bi wan enfasê hêja'ê
Dî piştî lezzet û keyfê fîraq hatî wekî ba'ê
Ji derdê Şêx⁹¹⁴ 'Ela'eddîn hezar 'aşîq ketin ta'ê
Dixwim şondê xeyala min ji te vala qe⁹¹⁵ namînê
Te agir da dil û can im heye carek tû derxînê
- 3 Felek hatî hebîbê min şehîdê da'ira Şamê
Tebîbê 'alîma kanî gula şêxa⁹¹⁶ çîra 'amê
Fidakarê Muhemmed bû eda kir heqqê Islamê
Heye carek bibînim ez hebîbê xwe şêrîn qamê
Fidayê⁹¹⁷ wê cemalê ez fîda kim rûh bi yek dînê
Fîraqa wî dihiştîm ez di nav huzn û kul û şînê
- 4 Ji Şamê yek xeber hatî wekî tîrê bi neyarî
Birînê dil ji nû kul bûn ji lew da'im dikim zarî
Heta sağ bim ji bîr nakim hebîbê xwe qe yek carî
Dî fikr û hem di xewnê da dibînim şubh û êvarî
Eya qelbo bike 'ibret kû hêstir bîn wekî xwînê
Belê şebrê bide çava kû yek nuqtê nebarînê
- 5 Hebîbê min wekî rojê şefeq da erd û ezmana
Munewwer kir dilê xelqê wekî Luqman bi dermana
Çi zû ya Reb te bir ba xwe kû îro em hezîn mana
Hezar wek min yetîm hiştin li deryê taca sultana
Nema ruhnî li ber çava 'Ela'eddîn kû nabînê
Tû cara kes nebin dil xweş li vê dunyê li xa'înê

⁹¹⁴ Şêx] Seyx NMD3, NMDM.

⁹¹⁵ vala qe] qet valan DCMŞB.

⁹¹⁶ Şêxa] Seyxa NMD3, NMDM.

⁹¹⁷ Fidayê] Fida'ê NMD3, NMDM, DCMŞB.

- 6 Ez û yarê m' li vê dunyê ji hev em têr nebûn ya Reb
Neşîbê me bi dîna wî bikî der Cennetê ya Reb
Ji nûra bejn û bala wî bibînin lezzetê ya Reb
Bi fedla xwe xelaş kî me ji derdê firqetê ya Reb
Felek xa'în û bêbext e hema kû fursetê tûnê
Ji hev winda dikî dosta li wan zahir dikê kînê⁹¹⁸
- 7 Eya Ehmed bi qurbana te û necla te bim şed car
Tû zanî kû evê gemgîn ji 'işqa te gelek gemxwar
Bike rehîmê li miskîna nehêle me di kûra nar
Heye carek cemala te bibîni 'aşîqê dil sar
Ela ey **Heyderî** zanim di 'işqê da tû derwînê
Di piştî Şêx⁹¹⁹ 'Ela'eddîn çira da'im ne gemgînê

-74-

[Xezel – Xezala Tekyayê]

mustefîlun / mustefîlun / mustefîlun / mustefîlun
Recez - - + - / - - + - / - - + - / - - + -

- 1 Îro şemala Xeznewî⁹²⁰ / e'rafê 'alem şu'le da
Berq û burûska Xeznewî / dunya li ber pêta veda
- 2 Berq û burûskanê hebîb / hiştîm di nav kerbek 'ecîb
Rengzer kirim dil kir nehîb / xweş kir dilê şah û geda
- 3 Dîsa ji nû rakir hicab / nisbet reşandî bê hisab
Can û ciger têk bûn kebab / rûh û cesed cumle feda
- 4 Rûh im fida'ê xaki pa / bejna le'îf nûrîn qeba
*Ehlen we sehlen*⁹²¹ merheba / rewşa terîqa Serhedda
- 5 Behra terîqa bê xelet / şahîb-cemal 'ilm û 'emel
Dêm-şorgul e nûrek digel / roj tel'eta 'er'er-qeda
- 6 Hûsna li wechê şêxê ma / lê heyîrîn erd û sema
Xweş murşid e bê şubhe ma / leb-şeker û şêrîn-şeda
- 7 Leb-şeker û awir-esed / suhtî li min cerg û cesed
Şed ah û nalîn bê 'eded / ev rûh ji min ta bê cuda
- 8 Ey talîbê weşla hebîb / bê hub û ixlaşek 'ecîb
Nîne ji weşlê ra neşîb / şed cehd û se'yê kî eda

⁹¹⁸ kînê] şînê DCMŞB.

⁹¹⁹ Şêx] Şeyx NMD3, NMDM.

⁹²⁰ Îro şemala Xiznewî] dîsa cemala Xiznewî NMDM.

⁹²¹ Ser sera û ser çavan.

- 9 Ey **Heyderîzade Emîn** / ev derd û ah û huzn û şîn
Jê ra heye derman yeqîn / va ye li Xezna Ehmeda

-75-

[Xezel - Xezala Tekyayê]

fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilun
Remel - + - - / - + - - / - + - - / - + -

- 1 Ya Reb an gul ez gulistanê Irem bû yadigar
Zatê pak Me'sûm hebîbê min 'ezîzê şehriyar
- 2 Yan ji gulzarê cemalê hat li Tilme'rûf me dî
Ba cemalek bê buha ji hikmetê heq hate xwar
- 3 Muftiyê l' şer'a Resûl ya murşîdê cewher-kelam
Ya melek şade ji nûrê der beşer bû aşîkar
- 4 Ke'beya qelba ye ya⁹²² sekna feqîra her zeman⁹²³
Deryê tewba me gunehkara ye ev şahê kubar
- 5 Qutb e ya ustad e ya ew ser tebîb Luqman e ya
Bi'l-yeqîn⁹²⁴ Me'sûm e ya reng⁹²⁵ esmerê awur-xumar
- 6 Necm e ya xurşîd e ya heyva li çarda bû xuya
Şu'le⁹²⁶ ya yaqût e ya elmas e ya *durru'l-bihar*⁹²⁷
- 7 Der şeva tarî çira ye ya cemala nûra heq
Ruhniya ça'va⁹²⁸ ye ya rehma Xudanê gerdîkar
- 8 Nûr e ya 'eynu'l-heyat⁹²⁹ ya selsebîla Cennetê
Kewşer e ya şerbeta le'la ye ya nûrîn 'izar
- 9 Feyz[e] ya miskê xeten⁹³⁰ ya merhema⁹³¹ derd û birîn
Nisbet û himmet ji Ehmed kenz e ya 'ummanîdar⁹³²

⁹²² yan] ya NMDM.

⁹²³ sekna feqîra her zeman] hecca feqîra yek tewaf MMEC.

⁹²⁴ Bi rastî.

⁹²⁵ reng] renk NMDM.

⁹²⁶ Şu'le] Durre MMEC.

⁹²⁷ *durru'l-bihar*] Şahê Buxar MMEC.

⁹²⁸ ça'va] çava NMDM, MMEC.

⁹²⁹ Rastiya jiyanê.

⁹³⁰ miskê xeten] misk û xeten NMDM.

⁹³¹ merhema] melhema MMEC.

⁹³² 'ummanîdar] 'ummanedar NMDM, M.

- 10 Ya bi ilhama Xudê j' bona mirîda bû re'îs
Ya Muḥemmed yek îşaret der herem kir ixtiyar
- 11 Erḍa Tilme' rûf nema xalî ji⁹³³ *Sadatê Kîram*⁹³⁴
Qeṭ nema xalî ji bêhna Cenneta *Daru`l-qerar*⁹³⁵
- 12 Rehberê dunya û dîn ya raḥeta rûhê **Emîn**
*Hem çunîn şod*⁹³⁶ **Heyderîzade** dikî şed ah û zar

-76-⁹³⁷

[Xezel - Xezala Tekyayê]

fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilun
Remel - + - - / - + - - / - + - - / - + -

- 1 Ey gelî dostan 'Eladîn gulşena bostanê dil
*Qurretu`l-`eyn*⁹³⁸ ya tebîb û kaşif û luqmanê dil
- 2 Nûrê can ya canê canan ya hebîbê dil pezîr
Rûh û can tev da cemal ya humayûnê şanê dil
- 3 Dilbera şehla 'uyûn ya esmerê gul renga in
Zîniya hûrî-şifet ya pir şêrînê canê dil
- 4 Nûriya 'eynu`l-*heyatê*⁹³⁹ ya Zemzem ya selsebîl
Neyşeker barî ji dev ya şorgula rewḍanê dil
- 5 Nêrgîza bagê Irem mêrg û çîmem yan Neqşê Çîn
Xal û zulfê 'enberînî heyv e ya peymanê dil
- 6 Badeya ḥusna hebîbê melhema derd û birîn
Xemriya noşîn helal ya şerbet û dermanê dil
- 7 Derya heyva mudewer ya şefeqa *Şemsu`d-ḍuḥa*⁹⁴⁰
'Eynî selwa ya elîf ya qameta reyḥanê dil

⁹³³ Erḍa Tilme' rûf nema xalî ji] Erḍê Tilme' rûf ji wan erwahê bi MMEC.

⁹³⁴ raḥeta] ḥesreta MMEC.

⁹³⁵ Mezinên bi şeref.

⁹³⁶ Weha bûye, wisa çêbû.

⁹³⁷ Ev helbest di hemû nusxeyan de tune ye. Me ji ba lawê Şêx Mihemed Emînê Heyderî, Mela Diyaddîn Çelîk bi dest xist. Ev helbesta li ber destê me destxet e û ji du rûpelan pêk tê.

⁹³⁸ Sebra çavan, nûra çavan.

⁹³⁹ Rastiya jiyanê.

⁹⁴⁰ Tava danê sibê. Di Qu'ana pîroz de du sûre li ser ronahiya danê sibehê hene. Sûreya Eş-Şems sûreya 91ê ye û sure bi "Weşemsî wedûhaha" dest pê dike ku tê wateya "Sond bi rojê û ronahiyê...". Sûreya Ed-Dûha jî sûreya 93yan e û bi "Wedûha" dest pê dike ku tê wateya "Sond bi danê sibehê...". Qur'an 91/1, 93/1.

- 8 Ya melek teb'et şêrînê mîrzad ya şehzade în
Ya 'Eladdînê 'alî şan şod ya Suleyman xanê dil
- 9 Beyreqa dîn ya 'ilimdarê terîqa musteqîm
Ya huner şêr quṭbê ferd ya murşidê zozanê dil
- 10 Weşfê ew Kisrê gulam şed Xatemê Nûşîrewan
Nazîrê iqlîmê dunya der cihan sultânê dil
- 11 El-eman ber asitanê tû yetîmê tûleyim
Yek nezer ber în 'elîlê xeste'ê tûfanê dil
- 12 Dil birîndar hêvya rehîma te me şerwê el-eman
Heyderî miskîn gerîb bêçare û wêranê dil
- 13 Qible'ê Ke'ba dila yî yan Şefa Merwa feqîr
Bi'l-xuşûş zîkrê lîsan meclûb şeker şîranê dil

-77-

[Mustezad - Medhiye]

mef'ûlu / mefa'îlu / mefa'îlu / fe'ûlun
mef'ûlu / fe'ûlun
Hezec - - + / + - - + / + - - + / + - -
- - + / + - -

- 1 Ey serwerê Xezna tu wî fexra me dizanim
Ey rûh û rewan im
Me ji husn û cemala⁹⁴¹ te hinav dağ û keban im
Bê 'eqlê zeman⁹⁴² im
- 2 Bê şek tû 'ezîz î tû bi husnê⁹⁴³ ez bi qurban
Dil nale ji kerban
Ev rûhê şêrîn can û cesed cumle fida bim⁹⁴⁴
Mulk û der û xan im
- 3 Her lehze dibêjim ji dilê şaf û 'iyanî
Mehbûbê dilan î
Mişlê te xuya nabin di iqlîmê cihan î
Kelbê derê zanim

⁹⁴¹ husn û cemala] husna cemala NMDM.

⁹⁴² zeman im] zeban im MMEC.

⁹⁴³ 'ezîz î tu bi husnê] 'ezîzê serfîraza MMEC.

⁹⁴⁴ fida bim] fida kim MMEC.

- 4 Ev hilm û sexawet ji te ra firdews û nûr e
Bê hedd û quşûr e⁹⁴⁵
Cahil kû ji 'îşqa te hinek bûn wekî 'alim⁹⁴⁶
Xurşîd û mehan im
- 5 Kî zanî meqamê Ehmedê Sanî mu'ezzem
Ev zatê mufexxem
Exlaqê husnê 'izz û şeref jê re ne da'im
Sultânê cihan im
- 6 Şahê me çi teb'et melek e qend û şeker-leb
Zîb û zuqen û gebgeb
Pişta me feqîra ye çi bê şebr û qerar im
Mecnûnê zeman im
- 7 Ev zatê munewwer me'dena misk û gulabê
Yarê te Xuda bê
Refref ji te ra şef mela'îket bûne qa'im
Der emirê rihan im
- 8 Weşfê te çi bêjim ser tebîbê şubhetê Luqman
Sertextê Suleyman
Der emrê te insan û melek û cinn û beha'im
Medhê te çi zanim
- 9 Ya Reb Şehê Xezna bike der e'la meratib
Fî hubbike rağib⁹⁴⁷
We'da te ji Ehmed ra herî ser ey Xudan im
Der behrê rican im
- 10 Rutba *zul-cenaheyn* Neqşebendbazî Geylanî
Îmamê Rebbanî
Ta bête Ziya jê re muyesser bî dixwazim
Ya Rebbê Xudan im
- 11 Şahê 'Erebî her bi te ra şîdî û penahet
Hem bo me şefa'et
Ser wî şelewata kû bidim her weqt û da'im
Der 'eqî û zeban im⁹⁴⁸
- 12 Ev himmeta Ehmed kû li Xezna bûye zahir
Ya Reb tu wî Qadir
Qelbê kû şed ah girtî mucella kir eman im
Lê ez bi gewxan⁹⁴⁹ im

⁹⁴⁵ Bê hedd û quşûr e] Qet nîn quşûr e MMEC.

⁹⁴⁶ Cahil kû ji 'îşqa te hinek bûn wekî 'alim] Şewqat li her çar terefa rakir zula'im MMEC.

⁹⁴⁷ Hezkirinê dixwaze (çavên wî li muhebbetê ye).

⁹⁴⁸ zeban im] zeman in MMEC.

- 13 'Işqa te li dil da kû ebed ma di gema de⁹⁵⁰
 Ev **Heyderîzade**
 Carek bike şefqet⁹⁵¹ li **Emîn** behrê xeşan im
 Imdad û eman im⁹⁵²

-78-

[Xezel - Xezala Tekyayê]

fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilatun / fa'ilun
 Remel - + - - / - + - - / - + - - / - + - -

- 1 Ke'beya husn û cemaî zîneta xopan î tû
 Dilberê gerden gezalê murşidê insan î tû
- 2 Can bi eş û dil bi hesret rûreşê 'eyba me ez
 Şahê bazî neqş û nîşan şawusê bağan î tû
- 3 Hişkedar im çol beyar im bê sih û sîwame ez
 Taze reng û bağê gulzar cennet û bustan î tû
- 4 Hênzel û tehlîyû dara sihr û bê meywa me ez
 Çîçek û nesrîn û 'enber şorgul û reyhan î tû
- 5 Pir ze'îf im tengezar im 'Enqesê 'ebda me ez
 Qeyşer û Rustem⁹⁵³ gulam in Kisre yû xaqan î tû
- 6 Dil birîndar û 'elîl im bê kes û bê çare ez
 Lê tû yî çara gerîba⁹⁵⁴ der cihan sultan î tû
- 7 Jar û miskîn û gerîb im xaç û rê wînda me ez
 Sekn û wensa me feqîra⁹⁵⁵ ruhniya çavan î tû
- 8 Ez tû û birçî zuwa me lew ji we dûr mame ez
 Şerbet û şehd û heyat û kewşer û fincan⁹⁵⁶ î tû
- 9 Paxir û zengar û xwar im hem çurûk berda me ez
 Cewher û yaqût û elmas Xeznewî hêja yî tû
- 10 'Eql û sewda nîne meydana kul û derda me ez
 Ke'be û deryê murada merhem⁹⁵⁷ û Luqma nî tû

⁹⁴⁹ gewxan] gewğan NMDM, fiğan im NMDM.

⁹⁵⁰ 'Işqa te li dil da kû ebed ma di gema de] Ev ah û fiğan tenê 'umir borî bê fayde MMEC.

⁹⁵¹ şefqet] rehîm MMEC.

⁹⁵² Imdad û eman im] Medhûşê geman im MMEC.

⁹⁵³ Qeyşer û Rustem] Rustem û Qeyser NMDM.

⁹⁵⁴ Lê tu yî çara gerîba] Lê tu dermanê birîna NMDM.

⁹⁵⁵ wensa me feqîra] wensa gerîba NMDM.

⁹⁵⁶ fincan] qutban NMD1.

- 11 Rûh û can û dil me da we kuştîyê le'la me ez
Lew bi te xweş bû heyat im qaşidê 'Îsan î tû
- 12 Kes di dunyayê me navê her bi te dil şa me⁹⁵⁸ ez
Mulk û mal û ehl û eḥbab bav û ecdad xan î tû
- 13 Ez yesîr im bê xwedî me tûlê ber derga me ez
Tû ji derdê **Heyderî** ra çare û derman î tû

-79-

[Xezel - Xezala Tekyayê]

mustef' ilun / mustef' ilun / mustef' ilun / mustef' ilun
Recez - - + - / - - + - / - - + - / - - + -

- 1 Şahê zemîn / *şeyyahu`d-dîn*⁹⁵⁹ / suḥbet-şêrîn / durcanî tû
Ey şêx û şeng⁹⁶⁰ / 'enqaye deng / şed neqş û reng / reyḥanî tû
- 2 Şêx û şepal / naz û delal / ebrû-hilal / awir-gezal
Ey serwerî / ser-defterî / reng esmerî / insanî tû
- 3 Bûy-'enber e⁹⁶¹ / qam-'er'ere e / leb-şeker e / xweş-dilber e
Ken'ane'û / mîrxane'û / nûrane'û / 'Uşmanî tû
- 4 Ey nav giran / teslîm eman / min rûh û can / hem mulk û xan
Min kir fida / yan murşida / *nûru`l-huda*⁹⁶² / iḥsanî tû
- 5 *Keşfi`l-kurûb* / *setri`l-`uyûb* / *meḥwi`z-zunûb* / *fetḥi`l-qulûb*⁹⁶³
Hem daye te / pir hummet e / mizgîn li te / xaqanî tû
- 6 Şahê helîm / teb'et-selîm / dil-musteqîm / Eḥmed⁹⁶⁴ ḥekîm
Dil nale me / pir ḥewce me / ez tûle me / dermanî tû
- 7 Rû dêm gula / pir qabila / xweş kamila / dağ da dila
Şêrê xedeng / ev şewṭ û deng / hem ḥerb û ceng / lem'anî tû
- 8 Roj bû hilat / hedyê xelat / Eḥmed⁹⁶⁵ dihat / merwanî tû⁹⁶⁶
Nûr hatî ser / dil kir dûger / le'lê şeker / dehan î tû

⁹⁵⁷ merhem] melhem NMDM.

⁹⁵⁸ dilşa me] dil kamil NMD1.

⁹⁵⁹ Yê ji bo na dîn gazî dike yan digere.

⁹⁶⁰ Ey şêx û şeng] Şeyx û şenk NMDM.

⁹⁶¹ Bûy] Bû NMD1, NMD2.

⁹⁶² Nura Xweda.

⁹⁶³ Bi derdan dizane / eyban vedişêre / gunehan paqij dike / qelban fetih dike.

⁹⁶⁴ Eḥmed] Me'sûm MMEC.

⁹⁶⁵ Eḥmed] Me'sûm MMEC.

⁹⁶⁶ Merwan î tu] mîrê welat M.

- 9 Wan şeh bikin / teşdîq bikin / Eḥmed⁹⁶⁷ rikin / wan nas bikin
Xaş û xulaş / merdê ğewaş / ser ‘am û xaş / sulṭanî tû
- 10 Şahê kubar / Eḥmed⁹⁶⁸ hewar / dil tar û mar / şed ah û zar
Muḥtace dil / bê ḥal e dil / derman ke dil / Luqmanî tû
- 11 Reḥm bê ‘eded / qelb û cesed / nalîn dû şed / Eḥmed⁹⁶⁹ meded
Ey muşterî / dil bû gerî / ey **Heyderî** / pir canî tû

-80-

[Xezel - Xezala Tekyayê]

mustef‘ilun / mustef‘ilun / mustef‘ilun / mustef‘ilun
Recez - - + - / - - + - / - - + - / - - + -

- 1 Şahê ğeyûr / *durru’l-buḥûr* / taca bi nûr / ev Xeznewî
Ê kû me dî / kesî⁹⁷⁰ nedî / bav û xwedî / wek Xeznewî
- 2 Şems û qemer / zêr û zeber / *nûru’l-beşer* / cewher-xeber⁹⁷¹
Nîne ‘iyan / axir-zeman / li çar⁹⁷² cihan / wek Xeznewî
- 3 Sox û şepal / qutbê delal / cama zelal / gerdên-gezal
‘Eynê piling / awir-xedeng / şêrê bi deng / ev Xeznewî
- 4 Eşlek şerîf / nazik-leṭîf / cismê ‘efîf⁹⁷³ / bê hed zerîf⁹⁷⁴
Sulṭan û mîr / şah û wezîr / tèn wek feqîr / ba Xeznewî
- 5 Her dem şêrîn / wek hingivîn / xweş kir birîn / ğem pê revîn
Nefsa neyar / pê bûme har / şed car hewar / ya Xeznewî
- 6 Luṭf û kemal / ḥusn û cemal / nisbet wişal / tev de libal
Rûḥ im fida / ez bûm geda / ax û cida / rê Xeznewî
- 7 Bedra munîr / *kehfu’l-feqîr* / ez mam esîr / ey şah û mîr
Rûḥ im fida / şêrîn qeda / ḥifza Xuda / ser Xeznewî
- 8 Dexîl im ah / Me‘şûm e şah / se‘îd û mah / ey qiblegah⁹⁷⁵
‘Ela’edîn / bi ‘Izzeddîn / bi Ğenyê dîn / ba Xeznewî

⁹⁶⁷ Eḥmed] Me‘şûm MMEC.

⁹⁶⁸ Eḥmed] Me‘şûm MMEC.

⁹⁶⁹ Eḥmed] Me‘şûm MMEC.

⁹⁷⁰ kesî] qet kes NMD1, MMEC.

⁹⁷¹ Nûr`ul-beşer / cewher-xeber] dur`l-beşer / şêrîn-xeber NMD1, şahê beşer qet ev xeber MMEC.

⁹⁷² li çar] der in NMD1, MMEC.

⁹⁷³ nazik-leṭîf / cismê ‘efîf] nazik-zerîf / cismê leṭîf NMD1.

⁹⁷⁴ zerîf] leṭîf NMD1.

⁹⁷⁵ ey qiblegah] ey ke‘begah NMDM.

- 9 Ey şêrê dîn / ھusna zemîn / qelbê **Emîn** / tev bû birîn
Ez bedter im / can kemter im / her **Heyder** im / ba Xeznewî

-81-

[Mustezad - Medhiye]

mef'ûlu / mefa'îlu / mefa'îlu / fe'ûlun
mef'ûlu / fe'ûlun
Hezec - - + / + - - + / + - - + / + - -
- - + / + - -

- 1 Ismê te mubarek Muھemed Me'sûmê Şanî
Renk taze riھan î
Her ھerfekî şed me'ne ji navê te tê zanî
Ey rewşa cihanî
- 2 Mîm mani'ê bid'ê te meھû kir kederê⁹⁷⁶ me
Hem derd û ھemê me
Meşhûrtirî hem ji Rustem hem Nûşîrewanî
Meھbûbê zemanî
- 3 Hê ھamid⁹⁷⁷ û ھakim ھesenu'l-xulqê ھelîm
Haziq⁹⁷⁸ tû ھekîm
Hukmê te ھeqîqet ھeqî zulmet bû hilanî
Heqî ji nû danî
- 4 Dal daye te destûr te dewa kir dilê mehcûr
Dunya bi te meşhûr
Dîndara te şêrîn e tû wî dilber di zemanî
Dermanê dilanî
- 5 'Eyn 'ilm û 'edalet ji te ra rukn û 'esas e
Bê ھedd û qiyas e
'Alem bi te ھeyy bû tû wî fexra 'alimanî
Beھrekî⁹⁷⁹ 'ummanî
- 6 Şad şadiqê şafî şedefa şefa şefîya⁹⁸⁰
Sêfilê şemediya⁹⁸¹
Şed şofi⁹⁸² yû mela hatine şef şef bose danî
Şadiq şemedanî⁹⁸³

⁹⁷⁶ kederê] gunehê MMEC.

⁹⁷⁷ ھamid] ھam e MMEC.

⁹⁷⁸ Haziq] Luqman MMEC.

⁹⁷⁹ Beھrekî] 'Eyneki NMD1, NMD2.

⁹⁸⁰ Şad şadiqê şafî şedefa şefa şefîya] Şed şadiq tu wî xaliş ji ھeyûban MMEC.

⁹⁸¹ Sêfilê şemediya] Keşafê qulûban MMEC.

⁹⁸² şofi] şex MMEC.

⁹⁸³ Şadiq şemedanî] Teslîmê emanî MMEC.

- 7 Waw warişê 'ilmê me nedî wek te wefadar
Walî û hûkimdar⁹⁸⁴
Walî tû wî weqtê we ye ey werdê zemanî⁹⁸⁵
Wek weşfê me zanî⁹⁸⁶
- 8 Mîm maye tam mecdê meqamê te mu'ella
Me'lûm û mucella
Medhê te çi zanin em feqîr bikne beyanî
Meqşûd û me'anî
- 9 Ya Reb tû meqama bidê Me'sûm bo me'alî
Di nûrê cemalî⁹⁸⁷
Ya Reb tû bikî wî ji me ra pîrê zemanî
Xortê nûciwanî⁹⁸⁸
- 10 Miskîn ji xetê xwe nema karî tû fehwa
Qet bikî de'wa
Husna te li dil daye fida bit rûh û canî
Mulk û der û xanî
- 11 Halê me xerab e ji me hêvî ji te îmdad
Şed nalîn û feryad
Qet na'ê tebatê **Heyderîzade** ji figanî⁹⁸⁹
Ey Me'sûmê Şanî

⁹⁸⁴ Walî û hûkimdar] Qet şahê hûkimdar MMEC.

⁹⁸⁵ Walî tû wî weqtê we ye ey werdê zemanî] Walî tu wî hûkim te kirî emrê Xudan î MMEC.

⁹⁸⁶ Wek weşfê me zanî] Himmetê Şemedan î MMEC.

⁹⁸⁷ Di nûrê cemal î] Der nûra cemal î NMDM.

⁹⁸⁸ Xortê nûciwan î] Xortê pir ciwan î MMEC.

⁹⁸⁹ figan î] efgan î NMD1, NMD2.

[Mustezad - Medhiye]

mef'ûlu / mefa'îlu / mefa'îlu / fe'ûlun
 mef'ûlu / fe'ûlun
 Hezec - - + / + - - + / + - - + / + - -
 - - + / + - -

- 1 Ey taca serî hafîz û yarê te Xuda bî
 Qedrê te 'ula bî
 Nisbet birje ser te wekî misk û gula bî
 Wek behr û çema bî
- 2 Mehbûbê dil rake ji wechê xwe tû perdê
 Yek nezer berdê
 'Alem kû di hev wer bî ser dest û sera bî
 Navê te ji nû rabî
- 3 Nuqtek ji meya şêrîn 'amî bikî ecla
 Ey seyda û mewla
 Da keşfê bikin halê xwe egrab ji xwe bî
 Xweş bikin xîtabî
- 4 Halê me ji dest nefsê nîne hey hewar e
 Qet nabê idare
 Murşid ji me ra lazim e kû dil bi dewa bî
 Hem şewq û ziya bî
- 5 Ya Reb te çi reng daye 'Eladdîn di cemalet
 Hem 'ilmê li balê
 Şiklê wî heqîqî ji me ra kengî xuya bî
 Rûhê me fida bî
- 6 Ez kelbê derê Ehmed û Me'sûm dexîl im
 Bê hal û zelîl im
 Dermanke dilê min berî kû yek car xera bî
 Şeytan li me rabî
- 7 Mexlûq di heqê wî de bikin beş û tebî'et
 Hem 'ilm û terîqet
 Weşfê wî bidim hetta qiyamet li me rabî
 Qet na'ê hisabî

⁹⁹⁰ Ev helbest tenê di NMDMyê de heye.

- 8 Ey dost û bira qet hûn nekin derd û muṭala
Hem fikr û xeyala
Ev dergehê wan wê ji me ra deryê rica bî
Dermanê dila bî
- 9 Herkes ġeriqî ez bi tenê mame gunehkar
Bê dost û kes û yar
Qelbê me di baṭin de mesix bûye çawa bî
Der weqtê cewab î
- 10 Bê şek ‘Ela’ eddîn ji terîqê re tamam e
Hildaye ‘ilam e
Ya Reb tû wî ḥifza xwe li ser ke her weha bî
Sulṭanê cewabî
- 11 Mizgîn ji we ra îro ‘Eladîn wekî quṭb e
I‘lan kirî tewbe
Xwezîya min bi ‘ebdê kû ji dil teslîmê wan bî
Der emrê Xuda bî
- 12 Ya Reb tû ‘efû kî heçî eṭba‘ê Muḥemmed
Hem ‘ê li dûv Eḥmed
Tev **Heyderîyêzade** xelaş kî ji ‘iqabî
Hem zecr û ‘ezabî

HELBESTÊN TIRKÎ Û EREBÎ

-83-⁹⁹¹

[Qesîde - Medhiye]

fa'ilatûn / fa'ilatûn / fa'ilatûn / fa'ilun

Remel - + - - / - + - - / - + - - / - + -

- 1 Ey gönül gel söyle barî dilberin aḥwalinî
Belki bûlsem bu şûretde derdimin çaresinî
- 2 Ben bû yolda yaralandim ne olur şû ḥalimî
Canlarında 'eşq-i yaran artirir ateşinî
- 3 Saniyorum bîr beladir 'aqibet yaqtî benî
Ah ne hoşdur ger var dersem bîr ḥikaye soninî
- 4 Bû xeyalin ibtidasî yan cefadir yan şefa
'Aqibet ya bîr fîraq ya weşl-i yarin ḡatinî

⁹⁹¹ Ev helbest me wek a muelîf yanî li gorî fonetîka Kurdî çêkir. Me Kurdîya wê jî li jêr da:

- 1 Ey dilo ka were bêje rewş û halê dilberê
Da ku bibînim çareya derdê xwe bi vê bonê
- 2 Agirê te yarê işqê li cism u cana gur dike
Ka binêre li halê min ez birîndarê li vê rê
- 3 Ez dibêm qey belayeke aqibet min şewitand
Ax çi xweş e ku ez bêjim va heye dawîya çîrokê
- 4 Destpêka vî xeyalî yan cefa ye yan şefa
Aqibet jî yan fîraq e yan gihaştina dilberê
- 5 Eman ke Me'sûm ev derdê min roj bi roj zêde dibe
Wer tu kerem ke min xelas ke ji te çareya wê
- 6 Ger ku derdê kê hebe bila were ber derî
Kes bi destvala venager wê bibe zengînê jê
- 7 Aqibeta murada min her tu yî min te hemand
Xweş dibe agirê can bi wesf û methê dilberê
- 8 Tu dizanî yê aşîq tim di nav agir de ne
Axîn û kovanê dil de tim dikin gazî hewarê
- 9 Ey eman di nav pêlên behrekê ez xerq dibûm
Ez nikarim tu yî ji vî derdî re dermanê
- 10 Ey meded Me'sûm murada min ji te tu merhemet
Ya Îlahî tu dizanî niyeta vî **Heyderî**
- 11 Heq Teala di van weqtan Me'sûm kire ser textî
Ez jî hatim vê serayê ka bide **Emîn** efwê

- 5 El-eman Me‘şûm bû derdim gün be gün qat qat olur
Sen buyûr qûrtar benî ya sendedir çaresinî
- 6 Her kîmin bîr derdinî ger varsa gelsin qapiya
Boş eliyle kîmse dönmez hem bûlûr dewletinî
- 7 ‘Aqibet sensin muradım hem saqındım ben senî
Weşf-i dilber söylemekle hoş olur can yanginî
- 8 Çün bilirsın ‘aşiqanlar da’ima ateştedir
İçlerinde ah sedasi heyqirir feryadinî
- 9 Bîr deniz dalgalarında ğarq[i] oldûm el-eman
Ben dexîlim sen buyûr şû derdimin îlacinî
- 10 El meded Me‘şûm mûradım sendedir qıl merhemet
Ya İlahî sen bilirsın **Heyderî** niyetinî
- 11 Hâq Te‘ala verdi Me‘şûm bû zemanda taxteğah
Ben de geldim ol saraye wîr **Emîn**in ‘afwinî

[Qeside - Medhiye]

fa‘ilatûn / fa‘ilatûn / fa‘ilun
Remel - + - - / - + - - / - + -

- 1 Ey şedeflerden⁹⁹³ büyük dürdanesin
Bîr güneş benzer ema nûranesin
- 2 Güllerin enwa‘lerinden en güzel
Gül dûdağın merhem û dermanesin
- 3 Ellah Ellah kî ne tûhaf werdî bize
Hezret-i Me‘şûm himet sulţanesin⁹⁹⁴
- 4 Tewbenin bîr qapîsî sen de olûr
‘Eşq û şewqî himmetin Rebbanesin

⁹⁹² Ev helbest me wek a muelîf, yanî li gorî fonetîka Kurdî çêkir. Me Kurdîya wê jî li jêr da:

- 1 Ey durdaneya jî sedefan mezintir tu yî
Teşbihê tavê lê tu nûrane yî
- 2 Ji nav cureyê gulan a herî xweşik
Lêvên gulîn merhem û dermane yî
- 3 Ellah Ellah çî xweş kir ku ew da me
Hezretê Me‘şûm himet sultane yî
- 4 Derîkî jî tewbeyê li ba te ye
Himeta eşq û şewqê tu Rebbane yî
- 5 Ev lutf û kerem li ku be ji we ye
Ji nisbetê behrekî îrfane yî
- 6 Serwerê terîqa Neqşebendiyan
Şahê Me‘şûm ji mirîdan tu cane yî
- 7 Ey gelî murîdan hûn werin tesdîq bikin
Ka bibêjin meqseda dawîn tu yabane yî
- 8 Pir gunehkar im eman Me‘şûm eman
Tim bi hesret û derd im tu dermane yî
- 9 Ey şahê min bi lutf xwe tu îhsan ke
Ji Xweda ve tu îhsana pêxemberî
- 10 Ez perîşan im dil bi min têne sotin
Perperîşan im tu qebûl yek xane yî
- 11 Çareya **Heyderî** hey li ba we ye
El meded Me‘şûm tu j’ **Emîn** re xane yî

⁹⁹³ şedeflerden] sedeflerden NMDM.

⁹⁹⁴ himmet sulţanesin] himmet nûranesin NMDM.

- 5 Şû kerem nerde olûrsa sizdedir
Nisbetinden bîr deniz ‘irfanêsîn
- 6 Neqşibendînin terîq-i serwerî
Şah-i Me‘şûm sen murîdler canêsîn
- 7 Ey murîdler siz gelin teşdîq edîn
Söyleyin son meqşedin yabanêsîn
- 8 Çoq gunahkarim eman Me‘şûm eman
Hesretim hem derdimin dermanêsîn
- 9 Ey şahim lûtfünle ihsan eyleye
Ellahden peygemberim ihsanêsîn
- 10 Ben perîşanim yûrekler dağlenir
Çoq perîşanim qebûl bîr hanêsîn
- 11 **Heyderî**nin çaresî sizde olûr
El-meded Me‘şûm **Emîn**in xanêsîn

-85-⁹⁹⁵

[Qesîde-Munacat]

mefa‘îlun / mefa‘îlun / mefa‘îlun / fe‘ûlun
Remel + - - - / + - - - / + - - - / + - -

اتيناك الهنا بالمفلس اللئيم
عاريا عن الحسنات و القلب السليم

ذنوبه الكبائر كثيرة و لكن
اذا قوبل بالعفو تكون كالعديم

⁹⁹⁵ Du helbestên (helbestên 3 û 85an) Heyderî îlhama xwe ji bendeke munacata (dua) Îbrahîm Edhemê mutesewif girtiye û nivîsîne. Pêşî helbesteke Erebi (helbesta 85an) bi sê malikan nivîsiye. Piştê jî helbesteke Kurdî (helbesta 3yan) ku ji alîyê naverok û peyamê nêzî wê ye bi sê malikan nivîsiye. Ev her du helbest tenê di nusxeya NMD1ê de hene. Weke sernav teş‘îr lê hatiye nivîsîn. Malbata wî ev her du helbest jî li ser kevirê gora wî neqîşandine.

- 1 Ya Rebbî me feqîrekî belengaz anî ji te re
Qencyê wî qelbekî wî yê paqij tune
- 2 Gunehên wî yên mezin zahf in emma
Wexta bi ‘efwê te bên qebûlkin wek ku tunebin
- 3 Feqet ji te pê ve ji kesî re secde nekiriye
Mizgînê bidyê bi mexfîretî û xêrek bi camêrî

⁹⁹⁶ Ev helbesta Erebi, di nusxeyên NMD3 û NMDMyê de hene. Me NMDM ji xwe re bingeh girt. Me li jêrê Kurdîya wê da.

1 Ey erda Tilme'rûf mala hezkirina muhebbetê
Ey ê ku xêrê tîne ji ehlê dîn ra

2 Ey erda rehetîya ruhê min
Di wextê 'acizîya me de sebra me bi behsa te tê

3 Ey erda Tilme'rûf tu Ke'ba dilê me yî
Ey kanîya 'ilmê ey keleha muhafezeyê

4 Ey paytexta Neqşebendan
Axa te axek bêhn xweş e û qedrê te mezin e

5 Li cem te terbîye û 'ilm û edeb û hikmet heye
Mezinayî û qencî û nûra hidayetê li ba te heye

6 Te hinek mezin li ba xwe berhev kirine
Xera nabin ê ku li ba wan rûnên bi fedla Xweda

7 Te hinek mezin li ba xwe berhev kirine hubba wan di dilê min de ye
Însanan hînî mejîyê îbadetê dikin

8 Hinek mezin li nik te ne tevekê wan nûr e
Tu dubêjî belkî stêrka Sureyya daketiye nav xelqê

9 Ma gelo murîd û sadiq digihêjin xêr û şerefa te
Ma gelo yê bi kê roja hidayetê nas dikin

10 Te minareya 'ilm û dîn û teqwayê hildaye
Te bînaya zulmê xera kiriye (mala tarîbûnê)

11 Wesfê te ji însanan ne veşartiye
Text û kursiyê neqşebendan li nik te ye

12 Belê tu konekî wisa ye ku başê Xatema li ba te ye
Ji Nûşîrewanê adil bêhtir bi edalet e

13 Belê ji murîdan tu keleh û Mekke yî
Tu meydana pêşbazî û pehlewantîyê ye

14 Belê tu li ba her xebatkarî naskirî ye
Navê te Tilme'rûf e tu qesra seadetê ye

15 Belê li nik te heye xewsê xelqê û pîrê terîqetê
Ey mala diyanetê te bi wî şuhret stendiyê

16 Belê îrşada dînê Pêxember li nik te heye
Muceddidê me Ehmed xizna ticaretê

17 Ji her tereffî salam li ser te bin
Tu her bimîne dibin sîya qencîya Xwedê

[Qeside - Medhiye]

fe'ûlun / fe'ûlun / fe'ûlun / fe'ûl
Muteqarib + - - / + - - / + - - / + -

أيا أرض تلمعروف دار المحبة
ويا جالب الخير لأهل الديانة

أيا أرض تلمعروف ياراحة الروح
تسلانا ذكراك في أن السامة

أيا أرض تلمعروف ياكعبة القلب
ويا منبع العلم وسور الحماية

أيا أرض تلمعروف عاصمة النفش
ويا طيبة الترب وعر الشهامة

تضمك آداب وعلم وحكمة
وفضل وإحسان ونور الهداية

تضمنت أسياد هم القوم لايشقى
جليسهم فضلا من الله فاقة

تضمنت أسيادا وفي قلبي حبهم
يعلمون القوم بمخ العبادة

تضمنت أسيادا وكلهم نور
كان سر يا الكون في الخلق حلت

أهل يدركجاهك مريد وصادق
وهل يدري ذو عقل شمس الهداية

أقمت منار العلم والدين والتقى
هدمت بناء الظلم دار الظلامة

فليس علي الخلق خفي خصالك
وفيك سرير النفش بند السيادة

18 Qelbekî **Heyderî** hebû ew jî li ba çû hilakê
Rehmê bikin li wî qelbê jî hesreta dihille

19 Tu min dibînî ku dilê min bi hubba we birîndar e
Ruhê min sedaqetê dixwaze

نعم أنت خيم فيك أجودحاتم
وأعدل من نوشيروان العدالة

نعم أنت كهف للمريد وملجئي
وأنتك ميدان لسبق المهارة

نعم أنت معروف لكل مجاهد
واسمك تلمعروف برج السعادة

نعم فيك غوث الخلق پير الطريقة
أخذت به شهرة دار الديانة

نعم فيك إرشاد لدين محمد
مجددنا أحمد خزين التجارة

عليك سلام الله من كل جانب
بقيت وأنت تحت ظل الكرامة

فللحيدري قلب وفيك اضاعه
ألا فارحمي قلبا يذوب بحسرة

تروني مجروح الفؤاد بحبكم
وروحي مشتاق لتلك الصداقة

-87-⁹⁹⁷

⁹⁹⁷ Ev helbesta Erebi, di nusxeyên NMD1, NMD2 û NMDMyê de hene. Me NMDM ji xwe re bingeh girt. Me li jêrê Kurdîya wê da.

1 Ey mezinê me ka xelasîya ji vî zemanî
Di nava însanan de min tu bi şêxîfî zatê te qebûl kir emana min tu yî

2 Ew kesê ji dil were tasek ava te vexwe
Bêşek wê eşqê bibîne wê bi cezbê bikeve

3 Kî bi te re xiyanetê bike wê mehrûm be tiştê ku lê kiribe wê bihedime
Piştî wê xiyanetê wê poşman bibe ey seyîdî Me'sûm eman

4 Gelo 'emelê ji me tê xwestin ji me tê qebûl kirin
Min jî bixe navê ku te qebûl kir

5 Min têxe nav paqijan ey Mekkeyê min tu ji ehlê teqwayê ye
Ne hûn bin em gunehkar in ya seyîdî Me'sûm eman

6 Tu zana yî tu îrşada me jî dikî tu bi 'aqilî tu alîkarîya me jî dikî
Di ser qehra munkirê te ya seyîdî Me'sûm eman

[Qeside - Medhiye]

mustef'îlun / mustef'îlun / mutef'îlun / mustef'îlun
Recez - - + - / - - + - / - - + - / - - + -

ياسيدي أين المفر من فتنة هذا الزمان
قبلت من بين البشر شيخا لي ذاتك الأمان

من جاك حبا يطلب كأسا يريد يشرب
لاشك يجد ويطرب ياسيدي معصوم أمان

من خان عهدك يحرم وما بناه يهدم
من بعد ذاك يندم ياسيدي معصوم أمان

يا عجباً هل يؤمل منا العمل أو يقبل
أدخلني مع من يدخل ياسيدي معصوم أمان

أدخلني في سلك النقي ياملجني أنت التقي
لولاكموا نحن الشقي ياسيدي معصوم أمان

أنت الرشيد المرشد أنت السعيد المسعد
رغما على من يلحد ياسيدي معصوم أمان

أنت الذي نلت العلى بفيضك القلب جلى
إني بدرد مبتلى ياسيدي معصوم أمان

يا ضيعة العمر العدي واخيبة الأمل الردي
في الأبعد أنت سندي ياسيدي معصوم أمان

مقصودنا الله الأحد كيف الوصول بلاسند
ياروحنا منك المدد ياسيدي معصوم أمان

-
- 7 Tu gîhaye tebeqeya jorîn bi bereketa te dil paqij bûye
Ez mubtelayê bi derda me ya seyîdî Me'sûm eman
- 8 Umrê min beyhûde çû 'emelê min vala çûn
Tu seneda min î dûr û kûr î ya seyîdî Me'sûm eman
- 9 Qesda me razîbûna Xweda ye emma bê sened em ê çawa bigîhêjinê
Ey ruhê me gazîya me tu yî ya seyîdî Me'sûm eman
- 10 Ne hûn bin em ê çawa bigîhêjin meqseda xwe wê ev dûrketin heta kengî dirêj bibe
Hezkirina te di dilê me de eşkere ye ya seyîdî Me'sûm eman
- 11 Ne ji we be em ê çawa sebatê bikin hûn ji me re baş parêzvanan e
Heyderî xelasiya xwe dixwaze ya seyîdî Me'sûm eman

لولاكموا كيف الوصول إلي متى البين يطول
والحب في القلب يجول ياسيدي معصوم أمان

لولاكموا كيف الثبات أنتم لنا نعم الحمات
ألحيري يرجالنجات ياسيدي معصوم أمان



ENCAM

Edebiyata Kurdî ya klasîk her wekî di serdema mîrektîyan de li seray û medreseyan şax dabû, piştî ku mîrektîyên Kurdan ji alîyê dewleta Osmanî ve ji holê hatin rakirin, di sedsala XXan de jî di hucre, medrese û tekyayên Neqşebendî/Xalidîyan de berdewam kir. Her çiqas bi vê guherîna siyasî û civakî, naveroka berhem û dîwanan guherî be û bêtir bûbe dînî/tesewifî jî ji alîyê ruxsar û kevneşopîyê ve bi awayê klasîzma berê berdewam kiriye. Piştî Komara Tirkîyeyê ava bû (1923) û modernîzm bi pêş ket, reng û dengê edebiyatê jî her wekî qadên hunerî yên din guherî. Lê edebiyata Kurdî ya klasîk di vê serdemê de kêmkirî be jî berdewam kiriye. Şêx Mihemed Emîn jî kesayetîyek ji vê serdemê ye. Heyderî, her wekî di medreyê de bi ilmê re û di dergaha Xeznewîyan (ku ew jî şaxeke Neqşebendî/Xalidîyan e) de bi seyr û silûkê kemilî be û bûbe xelîfeyê terîqeta Neqşebendî/Xalidî jî di heman wextê de hêz û qeweta pênuşa xwe di warê edebiyatê de jî emilandiye û bûye helbestvanekî girîng ê serdema xwe.

Heyderîyê ku di navbera salên 1927 û 2003yan de li deverên wek, Mêrdîn, Amed û Binxet/Rojava jîyaye. Di nava gel de bêtir bi navê “Heyderî” hatiye naskirin. Her çiqas di dîwana xwe de heft mexles bi kar anîbe jî di hemû berhemên xwe de û di dîwanê de jî bi rêjeya 57% an mexlesa “Heyderî” bi kar anîye. Heyderî li dû xwe şeş berhem hiştine ku hemû jî ji bo edebiyata Kurdî ya klasîk di warê xwe de girîng in. Heyderî di rîya edebiyatê de bi taybetî helbestvanên klasîk Melayê Cizîrî (sedsala XVI-XVII) û Mela Ehmedê Heyderî (k.d. 1938) şopandibe jî tesîra Îbrahîm Edhem, Ehmedê Xanî (k.d. 1709), Melayê Bateyî (sedsala XVII-XVIII), Şêx Evdîrehmanê Aqtepe (k.d. 1910) û Şêx Eladînê Xeznewî (k.d. 1969) jî li ser wî û berhemên wî çêbûne.

Dîwan ji alîyê muelîf ve nehatiye tertûbkirin. Helbestên wî piştî ji alîyê lawê wî Mela Diyadîn ve hatine komkirin. Me jî ji bilî wan helbestên komkirî çar helbest peyda kirin. Di vê xebata xwe de hemû helbestên ku me û malbata Heyderî xwe gîhandinê anîn ser hev û dîwan li gorî tertîba dîwanên kategorîk ji nû ve tertûb kir. Daxwaz û armanca me ew bû ku em hemû helbestan bînin ser hev û dîwaneke bi

qaîdeya tradîsyona tertîba dîwanan saz bikin û pêşkêşî xwendevan, lêkoler, zimanzan û edebiyatzanan bikin.

Heyderî, dîwana xwe di bin fikra dînî/tesewîfî de nivîsîye. Helbestên di dîwana wî de bêtir li ser eşqa Ilahî, evîna Pêxember, medhiyeyên li ser terîqeta Neqşebendîtiyê bi taybetî jî li ser tekyaya Xeznewîyan û şêxên wê ne. Em dikarin bibêjin ku dîwana xwe di şaxê edebiyata tekyaya/tesewîfî de nivîsîye. Her çiqas dîwana xwe di warê edebiyata tekyayê de nivîsîbe jî ji hunerê tawîz nedaye. Dîwan ji aliyê huner, vegotin û şêwazê ve dewlemend û di asta zewqa edebî de ye. Lewra me di dîwana Şêx Mihemed Emîn Heyderî de 37 hunerên edebî tesbît kirin.

Ji aliyê şêwaz û ziman jî dîwan dewlemend e û vegotina helbestan bi peyv û ravekên girîft nehatine fetisandin. Bereksê wê vegotina helbestan bi zimanekî sade û fêambar e û bi biwêj û cotepeyvên cur bi cur jî xemilandiye. Helbestvanê me bi Kurdî, Erebi, Farisî, Tirkî dizanîbû û unsûrên van zimanan di helbestên wî de tên dîtin. Me bi tevahî 87 helbestên wî tesbît kir û di vê xebatê de pêşkêş kir. Di nav van helbestan de 82 heb bi Kurdî, sê heb bi Erebi û didu jê jî bi Tirkî ne. Di nav yên Kurdî de jî du heb jê mulemme' in ku bi zimanên Erebi, Farisî, Kurdî û Tirkî ne. Di dîwanê de devokên Kurmancî yên wek; devokên Mêrdînê (devoka Torê û Berrîyê), devoka Serhedê, devoka Botan, devoka Hekkarî û devoka Binxetê/Rojava bi unsûrên cur bi cur li ser dîwanê reng vedane. Bi taybetî jî bandora devokên Mêrdînê (devoka Torê û Berrîyê) û devoka Botan li ser dîwanê pir hene. Her çiqas devokên Serhedê, Hekkarî û Binxetê/Rojava tê de hebin jî kêr in.

Dîwan ji aliyê teşeyên nezmê û cureyên edebî ve dewlemend e. Di dîwanê de helbest bi 12 teşeyên nezmê hatine nivîsîn. Teşeyên nezmê yên dîwanê û hejmara bikaranîna wan bi rêzê wiha ne: 36 qesîde, 26 muxemmes, şeş xezel, şeş museddes, çar murebbe', sê mustezad û ji qit'e, muselles, texmîs, teşîr, terkîbbend û tercî'bendê jî nimûneyek hatine dayîn. Di dîwanê de ji cureyên nezmê; 63 medhiye, 8 mersiye, 6 xezelên tekyayê, çar munacat ji tewhîd, ne't, hîcwiye û pendnameyê jî nimûneyek hene. Dîwan ji 76% an bi cureya medhiyeyê ne. Ji aliyê cureyên edebî ve mirov dikare bibêje dîwana medhiyeyan e. Hemû medhiye û mersiyyên di dîwanê de li ser terîqeta Neqşebendî û li ser şêx û tekyaya Xeznewîyan in.

Hemû helbestên di dîwanê de bi kêşa erûzê hatine nivîsîn. Şeş behrên erûzê ku bi rêzê remel (48%), hezec (31%), recez (16%), munserîh (3%), muzarî (1%) û muteqarib (1%) in. Bi 17 qalibên cur bi cur ji van behran li ser helbestan hatine tetbîqkirin. Taybetîyeke helbestên Heyderî ji alîyê mûsîqîya helbestê ve ew e ku di 39 helbestan de serwaya navekî (tesmît) çêkiriye. Bi vî awayî rîtm û mûsîqîya helbestên xwe derxistiye asteke bilindtir.

Em dikin hêvî ku xebata me ji qada edebiyata Kurdî ya klasîk re bibe xizmetek û ji bo xebatên nû yên bi vî rengî re jî bibe wesîleyeke bi fêde.



ÇAVKANÎ

- ACAR, Hayrullah, “Di Edebiyat Kurdî Ya Klasîk De Farisînûsî: Nimûneya Weda’î”, **e-Şarkiyat Ilmi Araştırmalar Dergisi**, c. 8, j. 1, n.r. 297-326.
- ACAR, Hayrullah, “Jiyan û Berhemên Mele Nûrîyê hêsarî”, **Dil Bilimleri Klasik Sorunlar – Güncel Tartışmalar**, Mardin Artûklu Üniversitesi Yayınları, Mardin 2018, n.r. 313-324.
- ACAR, Hayrullah, Dîwana Şêx Ehmedê Feqîr Metn û Lêkolîn, Weş. Nûbihar, Stenbol 2016.
- AÇAR, Zafer, “**Devoka Devera Filistanê**”, (Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Bîngolê, Enstîtûya Zimanên Jîndar), Çewlîg 2015.
- ADAK, Abdurrahman, “Aheng û Mûsîqî di Helbestên Melayê Cizirî de”, **Mukaddime**, j.8 (3), r. 41-76.
- ADAK, Abdurrahman, “Analîzeke Kodîkolojîk Li Ser Leyla û Mecnûnên Sewadî, Bazîdî û Fûzûlî Di Koleksiyona A. Jaba Ya Destnivîsên Kurdî de” **e-Şarkiyat Ilmi Araştırmalar Dergisi**, c.10, j. 3, n.r. 1197-1222.
- ADAK, Abdurrahman, “Ekola Aqtepeyê ya Edebiyatê û Hizra Kurdîtî-Elewîtî-Neqşebendîtîyê”, **Nûbihar**, j. 131, n.r. 10-15.
- ADAK, Abdurrahman, “Helbestvanê Muhbet û Xurbetê: Mela Ehmedê Heyderî”, **Nûbihar**, j. 5, n.r. 36-50.
- ADAK, Abdurrahman, “Rûhî: Helbestvanekî Dahêner Ê Serdema Piştî Mîrektiyan û Bandora Wî”, **Sûryani Arap ve Kürt Klasikleri (Uluslar arası Klasikler Çalıştayı Bildirileri)**, Mardin, Mardin Artûklu Üniversitesi Yayınları, Aralık 2017, n.r. 491-509.
- ADAK, Abdurrahman, “Serdema Xalidîtiyê di Tarîxa Edebiyata Kurdî ya Klasîk de”, **Kürt Tarihi**, J. 30, r. 59-64.
- ADAK, Abdurrahman, “Şewqîyê Xanî li Pey Şopa Ehmedê Xanî: Berawirdkirinek li Ser Mulemmê‘ên Wan ên Çarzimanî”, **Nûbihar Akademî**, c.15, j. 116, n.r. 17-20.
- ADAK, Abdurrahman, **Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk**, Çapa 2., Weşanên Nûbihar, Stenbol 2014.
- ADAK, Abdurrahman, **Teşeyên Nezmê Di edebiyata kurdî ya klasîk de**, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2019.
- AKÇAY, Halil, “Son Dönem Tasavvuf Alimlerinden Şeyh Muhammed Emin el-Hayderi (Hayatı ve Eserleri)”, **Kimlik, Kültür ve Değişim Sürecinde**

Osmanlı'dan Günümüze Kürtler Uluslar arası Zempozyumu, Bingöl, 6-8 Eylül 2017, Bingöl Üniversitesi Yayınları 2013, n.r. 391-404.

AKŞİN, Sina, Cemil KOÇAK, Hikmet ÖZDEMİR, Korkut BORATAV, Selahattin HİLAV, Murat KATOĞLU, Ayla ÖDEKAN, **Türkiye Tarihi 4 Çağdaş Türkiye Tarihi 1908-1980**, Cem Yayınları, İstanbul 2000.

AKYÜZ, Kutbeddin, “**Ahmed El-Haznevi (ö. 1949) Ve Hazneviyye Tarikatı**”, (Yüksek Lisans Tezi, Yalova Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü), Yalova 2015.

ALTÜĞ, Seda, “Suriye Arap Milliyetçiliğinde Vatan ve Suriyelilik (1919-1939)”, **İstanbul Üniversitesi Siyasal Bilgiler Fakültesi Dergisi**, 2008, c. 39, n.r. 71-94.

AQTEPÎ, Şêx ‘Ebdurrehman, **Dîwan**, amd. Mehmed Emîn HÊVÎDAR, weş. Dara, Stenbol 2019.

ARTÛN, Erman, **Dinî-Tasavvufî Halk Edebiyatı**, 4. Baskı Karahan Kitabevi, Adana 2011.

ASLANOĞLU, Osman, “Di Mem û Zînê De Hunerên Meczazî”, **e-şarkiyat Ilmi Araştırmalar Dergisi**, c.11, j. 1, n.r. 137-149.

ASLANOĞLU, Osman, “Gîya Di Dîwana Şêx Ebdurrehman Aqtepî Da” **The Journal of Mesopotamian Stûdies**, c.5, j. 1, n.r. 23-46.

AXTEPÎ, Şêx Evdirehman, **Dîwana Ruhî**, amd. Rênas JİYAN, weş. Belkî, Stenbol 2013.

AXTEPÎ, Şêx Hesîb, **Dîwana Hesbî**, wer. Zeynelabidîn ZINAR, weş. Doz, İstanbul 2009.

AYDIN, Nurettin, “**Nakışbendilik’in Halidiye Kolu Hazneviler üzerine Sosyolojik Bir Araştırma Mardin İli Örneği**” (Yüksek Lisans Tezi, Süleyman Demirel Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü), Isparta 2016.

AYDOĞAN, Mistefa, **Rêbera Rastnivîsînê**, weş. Rûpel, Stenbol 2012.

AYKAÇ, Yakup, “**Dîwana Hezîn (Metn, Lêkolîn û Ferheng)**”, (Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Bîngolê, Enstîtûya Zimanên Jîndar), Çewlîg 2015.

BARAN, Bahoz, **Rêzimana Kurmancî**, weş. Belkî, Stenbol 2012.

BAYRAK, Mehmet, “Kürdlere Vurulan Kelepçe Şark Islahat Planı”, **Kürt Tarihi**, J. 10, n.r. 26-35.

BEDEWÎ, Mela Beşîr, **Gaziya Belengazan Dîwana Bêxew**, amd. Tehsîn Îbrahîm DOSKÎ, weş. Nûbihar, Stenbol 2013.

- BEDEWÎ, Mela Nezâr, **Dîwana Dahî**, amd. Tehsîn İbrahim DOSKÎ, weş. Nûbihar, Stenbol 2012.
- BEYTER, Önder, “**Dîwana Mela Ehmedê Heyderî (Metn û Lêkolîn)**”, (Teza Lisansa bilind, Zanîngeha Artûkluyê, Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê), Mêrdîn 2013.
- BİÇER, Bekir, **Kürt Tarihinin Kaynakları ve Kürdoloji Çalışmaları**, Çizgi Kitabevi, İstanbul 2017.
- BİTLİSÎ, Şerefhan, **Şerfname Kürt Tarihi (1. Cild)**, çev. Abdullah YEĞİN, weş. Avesta, Stenbol 2016.
- BOTÎ, Mihemed Şêxmûs, **Dîwana Camî’a (Lî be’dî Qesaîdî Ehli’l-Muhebbet)**, (agahiya weşanê û cihê çapê nedîyare), 2014.
- BOZKURT, Serhat, “Haydaranlı Aşireti tedibi (1909)”, **Kürt Tarihi**, j. 31, n.r. 12-15.
- BÜLBÜL, Mikail, “Peyvrêzî Di Frazên Navdêrî De (Devoka Mêrdînê)”, **The Journal Of Mesopotamian Stûdies**, c. 2, j. 1, n.r. 89-117.
- CELALÎ, Murad, “Kurmanciya Serhedê û Devoka Gundê Taxilka”, **Nûbihar**, c. 22, j. 145, n.r. 40-46.
- CIZÎRÎ, Melayê, **Dîwan**, çapa 2., amd. Selman, DILOVAN, weş. Nûbihar, Stenbol 2012.
- ÇAĞLAYAN, Ercan, “(1923-1950) CHP ve Kürtler”, **Kürt Tarihi**, j. 6, n.r. 37-41.
- ÇAKIR, Mehmet Saki, “Şeyh Abdurrahman-ı Tağî Ve Norşin Tekkesi’nden Yayılan Kollar”, **İhya Uluslar arası İslam Araştırmaları Dergisi**, 2017, c.3, n.r. 26-53.
- ÇELİK, Mehmet, “**Tasawwuf ve İlmî Birleştiren Bir Kurum Olarak Medreseler (19. ve 20. Yüzyıllarda Norşin Medresesi Örneği)**”, (Yüksek Lisans Tezi, Mardin Artûklü Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü), Mardin 2017.
- ÇİÇEK, Cuma, “Kürt Bölgesinde Devletin Üç Tarzı Siyaseti (1925-1935): Güvenlik, Türkleştirme ve Kalkınma”, **Kürt Tarihi**, j. 10, n.r. 36-43.
- ÇİÇEK, Mehmet, “Seyda Molla Hüsyin Küçük’ün Hayatı ve İlmî Kişiliği”, **Şarkiyat İlmî Araştırmalar Dergisi**, j. 2, n.r. 124-139
- ÇİÇEK, Zeynelabidin, **Diyarbakır’ın Fethi, Tarihi ve Kültürü**, Söz Matbaa, Diyarbakır 2007.
- ÇÖLEMERİKLİ, İhsan, Hakkari Sûretleri, weş. Lîs, Amed 2006.

- DEMİR, Yunus, “**Dîwana Namî/ Fehmî Begê Pêçarî: ‘Mexmûru’ d-dewawîn**” (Teza Lîsansa Bilind, Mêrdîn Zanîngeha Artûkluyê, Enstîtûya Zimanên Zindî Li Tirkîyeyê), Mêrdîn 2018.
- DEMİREL, Ali, “Ortadoğu’da Fransız Emperyalizmi: Fransız Manda Yönetimi Döneminde Suriye (1920-1946)”, **Hatay Mustafa Kemal Üniversitesi, Fen-Edebiyat Fakültesi Tarih Bölümü Dergisi**, 2019, c. 1, n.r. 69-89.
- DÊREŞÎ, Seîd, **Dîwan Feqiyê Teyran**, Weşanên Lîs, Amed 2011.
- DEVELİOĞLU, Ferit, **Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Lûgat**, 24. Baskı, Aydın Kitabevi Yayınları, Ankara 2007.
- DİLÇİN, **Örneklerle Türk Şiir Bilgisi**, 8. Baskı, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara 2005.
- DİLİPAK, Abdurrahman, **İhtilaller Dönemi**, Beyan Yayınları, İstanbul 1991.
- DURRE, Abdurrahman, **Şerha Dîwana Ehmedê Xanî, Felsefe û Jiyana Wî**, weş. Avesta, Stenbol 2002.
- EPÖZDEMİR, Şakir, **Medresên Kurdistanê Di Dewra Mîran û Neqşebendiyan**, weş. Nûbihar, Stenbol 2015.
- ERAYDIN, Selçuk, **Tasavvuf ve Tarikatler**, IFAW Yayınları, İstanbul 2014.
- ERMIŞ, Metin, “**Halidi Medrese Geleneği ve Norşin Medresesi**”, (Yüksek Lisans Tezi, Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü), Van 2019.
- ERTAŞ, Mustafa, “**Mewlûda Heyderî (Şêx Mihemed Emînê Heyderî) û Berawirdkirina Wê Bi Mewlûda Bateyî Re**”, (Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardîn Artûkluyê, Enstîtûya Zimanên Zindî Li Tirkîyeyê), Mêrdîn 2020.
- ÊSÎ, Mele Huseyn, Mele Seîd GIRDARÎ, Mele Muhemmed BÊRKEVANÎ, **Qur’ana Pîroz Bi Zimanê Kurdî, Çapa duyem, weş. Nûbihar**, Stenbol 2011.
- ESMAN, Milton, J. Hamar, RABİNOVİCH, **Orta Doğu’da Etnisite, Çoğulculuk ve Devlet**, weş. Avesta, Stenbol 2004.
- GÜL, Halime, “**İbrahim Bin Edhem ve Tasavvuf Tarihindeki Yeri**”, (Yüksek Lisans Tezi, Selçuk Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü), Konya 2008.
- GÜLMEZ, GÜLBEDDİN, “**Dengên Devoka Torê (Gundê Xerabê Bena Wekî Nimûne)**”, (Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Bîngolê, Enstîtûya Zimanên Zindî), Bîngol 2019.
- GÜMÜŞ, Nezir, “**DîwanaMela Sîraceddînê Xelîlî (Gulcivîn)-Metn û Lêkolîn**”, (Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardîn Artûkluyê, Enstîtûya Zimanên Zindî Li Tirkîyeyê), Mêrdîn 2019.

GÜTEKİN, Sinan, “**Hevokên Temamker ên Berkarî yê Kurmancî yê Devoka Torê**”, (Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardîn Artûkluyê, Enstîtûya Zimanên Zindî Li Tirkîyeyê), Mêrdîn 2019.

HEKKARÎ, Perto Beg, **Dîwan**, amd. Tehsîn Îbrahî Doskî, weş. Nûbihar, Stenbol 2011.

HEYDERÎ, Şêx Mihemed Emîn, Mela Ehmed HEYDERÎ, **Dîwana Heyderî**, amd. M. Diyaeddîn ÇELİK, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2012.

HEYDERÎ, Şêx Mihemed Emîn, **Mewlîd-i Nebî**, Ayfa Basım Yayın, Stenbol (b.d).

HEYDERÎ, Şêx Mihemed Emîn, **Mewlûda Nebî**, Weşanên Lîs, Stenbol 2007.

HEYDERÎ, Şêx Mihemed Emîn, **Tûhfetû'l-Heyderî**, amd. Mihemed Hadî ŞEMREXÎ, weş. Mekteba Seyda, çap 2., Ankara 2015.

HÎSÊNÎ, Selîm, Ş. M., “Mela Ehmed”, **Hawar**, j. 54, 15 Gulan, 1943, r. 4. Weşanên Belkî, Stenbol, Gulan 2012, r. 833.

IŞIK, İbrahim S., **A'dan Z'ye Kürtler**, Beşinci Baskı, weş. Nûbihar, Stenbol 2017.

IŞIK, İhsan, **Geçmişten Günümüze Diyarbakırlı İlim Adamları Yazarlar ve Sanatçılar**, Diyarbakır Valiliği, Diyarbakır 2014.

İBA, Şaban, **1925 Kürt İsyanı ve Kemalist İktidar**, weş. Aram, Stenbol 2013.

İLHAN, Ziver, “**Mewlûda Huseynê Bateyî, Metn û Lêkolîn**”, (Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardîn Artûkluyê, Enstîtûya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê), Mêrdîn 2013

İPEKTEN, Haluk, **Eski Türk Edebiyatı Nazım Şekilleri Ve Aruz**, 15. Baskı, Dergah Yayınları, İstanbul 2012.

ÎZOLÎ, Delîlo, **Ferheng Kurdî-Tirkî, Türkçe-Kürtçe**, Çapa Pêncemîn, weş. Deng, Amed 2007.

JÎYAN, Çeko, **Alfabeya Kurdî Bi Tîpên Erebî**, weş. Dara, Diyarbakır 2017.

KALAN, Lokman, “**Dem Di Devoka Torê Da (Bi Mînaka Gundê Xerabê Bena)**”, (Teza Lîsansa Bilind, Mêrdîn Zanîngeha Artûkluyê, Enstîtûya Zimanên Zindî Li Tirkîyeyê), Mêrdîn 2019.

KALAN, Lokman, “Rêjeya Dengan di Devoka Torê/Tûr Abdîn de”, **Nûbihar**, c. 23, j. 147, n.r. 56-60.

KANAR, Mehmet, **Kanar Farsça-Türkçe Sözlük**, 3. Baskı, Say Yayınları, Ankara 2013.

- KANBAR, Mohamad Said, “**XX. Yüzyılda Suriye’de Kürt Ulemanın Fikirleri: Bûtî ve Haznevî Karşılaştırması**”, (Yüksek Lisans Tezi, Marmara Üniversitesi, Ortadoğu Ve İslam Ülkeleri Araştırmaları Enstitüsü), İstanbul 2019.
- KAPLAN, Üstüner, **Divan Şiirinde Tasavvuf**, Birleşik Yayınları, Ankara 2007.
- KARAK, M. Zana, “**Dîwançeya Şêx Îsmetûllahê Karazî (Metn û Lêkolîn)**”, (Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardîn Artûkluyê, Ensîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê), Mêrdîn 2020
- KARAMAN, Cevdet, “**Ehmed Hîlmî El Koxî Ve Rehberê Sanî Şerha Eqîda Ehmedê Xanî Isimli Eseri**”, (Yüksek Lisans Tezi, Muş Alparslan Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü), Muş 2017.
- KERBELAYÎ, Şêx Mihemed, **Dîwana Kerbelayî**, amd. Osman Akdağ-Kenan Soylu, weş. Enstîtûya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2012.
- KILIÇASLAN, Hemîd, “Devoka Berriya Mêrdînê”, **Kurmancî (Rojnameya Taybetî ya Enstîrûya Kurdî ya Parîsê)**, j. 33, Bihar 2003.
- KIZIL, Hayreddin, “Diyarbakır Ve Çevresinde Yazılmış Mevlitlerin Konularına Göre Tasnifi Denemesi” **e-Şarkiyat İlmî Araştırmalar Dergisi**, j. 7, r.116-150.
- KOCAKAPLAN, İsa, **Açıklamalı Edebi Sanatlar**, 7. Baskı, Türk Edebiyatı Vakfı Yayınları, İstanbul 2011.
- KORKUSUZ, M. Şefik, **Nehri’den Hazne’ye Meşayîhi Nakşibendi** Kilim Matbacılık, İstanbul 2010.
- KORKUT, Ramazan, “Halidî Tasavvuf Geleneğinde Fıkıh ve Tasavvuf İlişkisi (Seyda Muhammed Emin El-Hayderî Medresesi Örneği)”, **The Journal of Academic Social Science**, j. 53, n.r. 372-396.
- KOXÎ, Ehmed Hilmî, **Dîwana Camî**, İhsan Yayınları, Diyarbakır 2004.
- KÜLEKÇİ, Numan, **Açıklamalar ve Örneklerle Edebi Sanatlar**, 6. Baskı, Akçağ Yayınları, Ankara 2013.
- MAKAL, Ahmet, **Türkiye’de Tek Partili Dönemde Çalışma İlişkileri: 1920-1946**, İmge Kitabevi Yayınları, Ankara 1999.
- MALMÎSANIJ, M. (amadekarê Weşanê), **Ji Bo Rastnivîsînê Ferhenga Kurdî (Kurmancî)-Tirkî**, weş. Rûpel, Stenbol 2012.
- MEVLEVÎ, Tahir, **Edebiyat Lügatı**, Enderun Kitabevi, İstanbul 1994.
- MİNORSKY, Viladimir, Thomas BOİS, D.N. Mac KENZİE, **Kürtler ve Kürdistan**, 2. Baskı, weş. Doz, Stenbol, 2004.

- MUMCU, Uğur, **Kürt İslam Ayaklanması 1919-1925**, 11. Basım, Tekin Yayınevi, İstanbul 1993.
- ORTAYLI, İlber, İsmail KÜÇÜKKAYA, **Cumhuriyetin İlk Yüzyılı (1923-2023)**, Timaş Yayınları, İstanbul 2012.
- ÖZAYDIN, Murat, “**Şeyh Abdurrahman Aktepe Hayatı, Eserleri ve Tassavvuf Görüşleri**”, (Doktora Tezi, Ankara Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü), Ankara 2008.
- ÖZBEY, Sait, **Kürtler ve İslamî Kurtuluş**, Dua Yayıncılık, İstanbul 2009.
- ÖZTOPRAK, Sadreddin, **Şark Medreselerinde Bir Ömür**, Beyan Yayınevi, İstanbul, 2003.
- PALA, İskender, **Ansiklopedik Divan Edebiyatı Sözlüğü**, 9. Baskı, L&M Yayınları, İstanbul 2002.
- PEKTAŞ, Şerafettin, **Milli Şef Döneminde(1938-1950) Cumhuriyet Gazetesi**, Fırat Yayınları, İstanbul 2003.
- SADINÎ, Xalid, Mela Huseynê Bateyî Jiyan Berhem û Helbestên Wî, Çapa 2. weş. Nûbihar, Stenbol 2011.
- SAĞNIÇ, **Feqî Huseyn, Dîroka Wêjeya Kurdî, Weşanên Enstîtûya Kurdî** ya Stenbolê, Stenbol 2002.
- SAMÎ, Şemsettin, **Kâmûs-ı Türkî**, Kapı Yayınları, İstanbul 2004.
- SARAÇ, M. Yekta, **Klasik Edebiyat Bilgisi Belagat**, 2. Baskı, Bilimevi Yayınları, İstanbul 2001.
- SARAÇ, M. Yekta, **Klasik Edebiyat Bilgisi Biçim-Ölçü-Kafiye**, 6. Baskı, Gökkube Yayınları, İstanbul 2012.
- SÖNMEZ, Nesim, **Dîwana Şêx Muşerrefê Xunûkî-Metn û Lêkolîn**, Seyda Yayınları, Diyarbakır 2018.
- ŞEMREXÎ, Farûq, **Ji Gulzarê Neqşebend Şahê Neqşebend**, weş. Lorya, Wan 2020.
- ŞEMZÎNÎ, Miradxan, “Devoka Devera Şemzînan di nav Zaravayê Kurmancî de”, **Nûbihar**, c. 21, j. 144, n.r. 85-92.
- TAN I, Altan, **Kürt Sorunu**, Timaş Yayınları, İstanbul 2010.
- TAN, Altan, **Tûrabidin'den Berriyê'ye Aşiretler, Dinler, Diller, Kùltürler** Beşinci Baskı, weş. Nûbihar, Stenbol 2015.
- TAN, Samî, **Rêzimana Kurmancî** Çapa Duyemîn, Weşanên Enstîtûya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2011.

- TAŞ, Çetîn, “**Dengsaziya Devoka Çaldiranê**”, (Teza Lîsansa Bilind, Mêrdîn Zanîngeha Artûkluyê, Enstîtûya Zimanên Zindî Li Tirkîyeyê), Mêrdîn 2015.
- TAŞÇI, Sadullah, “**Halidîliğın Haznevî Kolu Abdurrezzak Halîfî Ve Halifeleri**”(Yüksek Lisans Tezi, Harran Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü), Şanlıurfa 2018.
- TAVAKKOLÎ, Muhammed Rauf, **Kürdistan Tasavvuf Tarihi**, çev. Mehmet POLAT, weş. Hîvda, Stenbol 2010.
- TDK, **Türkçe Sözlük**, 10. Baskı, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara 2005.
- TEK, Ayhan, Cizîr Wek Merkezeke Kanona Edeba Kurdî û Rengvedana Wê ên di Şiira Kurdî de”, **Uluslar arası Sosyal Bilimler Kongresi**, Diyarbakır, 14-17 Eylül 2017, n.r. 359-361.
- TENİK, Ali, **Tarihsel Süreçte Kürt Coğrafyasında Tasavvuf Ve Tarikatlar**, Weş. Nûbihar, Stenbol 2015.
- TIRAŞÇI, Mehmet, “Güneydoğu ve Doğu Anadolu Çevresinde Arapça, Kürtçe, Zazaca Mevlidler ve Müzikal Olarak İcra Ediliş Tarzları”, **Cumhuriyet Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi**, 2013, c. 17, n.r. 210-236.
- TOSUN, Necdet, “Osmanlı’dan Cumhuriyet’e Nakşibendilik ve Siyaset”, **Derin Tarih**, Özel Sayı J. 7, n.r. 60-65.
- TÛRAN, Abdalbaki, **Melayê Cizîrî Divani ve Şerhi**, çapa duyem, weş. Nûbihar, Stenbol 2012.
- ULUÇ, A.Vahap, “Suriye Kürtleri: Türkiye Kürtleri’nin Devamı”, **Sosyoloji Araştırmaları Dergisi**, 2016, c.19, n.r.191-223.
- ULUGANA, Sedat, “Kurteçîroka Xelîfeyên Neqşebendiyên Xalidî Sedsala 19. û 20an”, **Nûbihar**, c. 17, r. 10-15.
- ULUGANA, Sedat, **Ağrı Kürt Direnişi ve Zilan Katliamı (1926-1931)**, Pêri Yayınları, İstanbul 2012.
- UZUN, Mehmed, **Antolojiya Edebiyata Kurdî 1**, Tûmzamanlar Yayıncılık, İstanbul 1995.
- UZUN, Mehmed, **Kürt Edebiyatına Giriş**, 5. Basım, İthaki Yayınları, İstanbul 2007.
- VAN BRUÏNESSEN, Martin, **Ağa Şeyh Devlet**, çev. Banu YALKUT, İletişim Yayınları, İstanbul 2015.
- YAPICI, Ünal, “**Cumhuriyet Döneminde Nakşibendilik ve Siyaset**”, (Yüksek Lisans Tezi, Hitit Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü), Çorum 2019.

- YILDIRIM, Kadri, **‘Eqîdeya Îmanê**, Weşanên Avesta, Stenbol 2008.
- YILDIRIM, Kadri, **Ehmedê Xanî Mem û Zîn**, Weşanên Avesta, Stenbol 2010.
- YILDIRIM, Kadri, **Ehmedê Xanî Nûbehara Biçûkan**, Weşanên Avesta, Stenbol 2008.
- YILDIRIM, Kadri, **Kürt Medreseleri ve Alimleri: Camiler ve Hücreler**, Cilt 3, Weşanên Avesta, Stenbol 2018.
- YILDIRIM, Kadri, **Kürt Medreseleri ve Alimleri: Tekkelere bağlı Medereseler**, Cilt 2, Weşanên Avesta, Stenbol 2018.
- YILDIRIM, Kadri, **Kürt Medreseleri ve Alimleri: Teorî ve Müfredat Beylik ve Medreseleri**, Cilt 1, Weşanên Avesta, Stenbol 2018.
- YILDIRIM, Kadri, **Rojava Kürt Tarihi ve Coğrafyası-1**, weş. Şemal, Stenbol 2015.
- YILDIRIM, Nimet, **İran Kültürü Zerdüş’ten Firdevsî’ye Sadî’den Şamlu’ya İran’ın Sözlü ve Yazılı Kaynakları**, Pinhan Yayıncılık, İstanbul 2016.
- YILDIZ, Ayhan, “Cîyê ‘Eqîdenameyan Di Edebiyata Kurdî û Perwerdehiya Medreseyan de”, **Nûbihar Akademî**, j. 9, n.r. 59-96.
- YILDIZ, Mehmet, “Mewlûda Şêx Mihemed Emînê Heyderî”, **Çend Nirxandinên Edebî Li Ser Mewlûda Şêx Mihemed Emînê Heyderî**, Mêrdîn Zanîngeha Artûkluyê, Enstîtûya Zimanên Zindî Li Tirkîyeyê, (21.05.2018), n.r. 1-80.
- YUSIF, Helîm, “Wêjeya Kurdî Li Rojavayê Kurdistanê (I) –Çanda Kurdên Sûriyê–“ **Nivîs (Kovara Malpera Amûdê)**, j. 7. 2001.
- ZEKÎ BEG, Mihemed Emîn, **Dîroka Kurd û Kurdistanê**, weş. Avesta, Stenbol 2012.
- ZINAR, Zeynelabidîn, “Di Medreseya Kurdî de Şaxên Zanistiyê”. **Nûbihar**, c. 1, n.r. 58-60.
- ZINAREXÎ, Mela Ehmed, **Dîwan**, Amd: Taha NAS, Tahirhan AYDIN, Abdurrahman ADAK, Zülküf ERGÜN, Weşanên Nûbihar, Stenbol, 2018.
- ZIVINGÎ, Necat, **Stêrkên Edebiyata Kurdî**, weş. Bangaheq, Stenbol 2014.
- ZÜLKÜF, Ergün, **Bajar-Edebiyat û Cizîra Botan**, weş. Nûbihar, Stenbol 2014.

ÇAVKANÎYÊN DÎJÎTAL

<https://tr.m.wikipedia.org/wiki/Kalecik/Nusaybin> (Gîhandina Dawî: 10.06.2020).

<https://kerboran.wordpress.com/2009/05/23/seydaye-sex-muhammed-emin-el-heyderi-k-s/> (Gîhandina dawî: 30.04.2018)

<http://www.biyografya.com/biyografi/14749> (Gîhandina Dawî: 30.04.2018)

<https://ridwanxelil.wordpress.com/tag/seyh-muhammed-emin-> (Gîhandina Dawî: 30.04.2018)

<https://www.facebook.com21hayderi> (Gîhandina dawî: 06.09.2020)

Bernameya “Medreseyên Berê”, TRT6, **Youtûbe**, Medreseyên Berê-Heyderî.wmv,(Gîhandina dawî: 10.06.2020).

Bernameya “Keşkûl”, TRT Kurdî, **Youtûbe**, Keşkûl-heyderî.wmv, (Gîhandina dawî: 10.06.2020).

Berhemên Destnivîs:

Helbestên Destxet yê Şêx Mihemed Emînê Heyderî-1 (Destxetên Şêx Mihemed Emînê Heyderî).

Dîwana Şêx Mihemed Emînê Heyderî-1 (Destxeta Mela Diyaînê Heyderî- 1).

Dîwana Şêx Mihemed Emînê Heyderî-2 (Destxeta Mela Diyaînê Heyderî- 2).

Dîwana Şêx Mihemed Emînê Heyderî-3 (Destxeta Mela Diyaînê Heyderî- 3).

Mecmûeya Mela Evdilwehabê Cibilgrawî (Destxet-Mecmûe).

Hevpeyvîn


-Mela Diyaîn Çelik, Navend / Amed (22.07. 2019)

-Mela Sirac Tarhan, Qoser / Mêrdîn (22. 09. 2019.)

PÊVEK



Pêvek 1: Wêneyê Şêx Mihemed Emîn




Pêvek 2: Şêx Mihemed Emîn û Feqeyên Xwe



Pêvek 3: Wêneyekî Şêx Mihemed Emîn ji Înşêta Medreseyê



Pêvek 4: *Wêneyekî Şêx Mihemed Emîn (Heyderî)*



Pêvek 5: Heyderî û Alimên Neqşebendî




Pêvek 6: Heyderî û Seydayên Wî⁹⁹⁸




⁹⁹⁸ Ji Alîyê rastê ve Mela Hadî, Şêx Mihemed Emîn, Şêx Evdirezaqê Helêlî û Şêx Eladînê Xeznewî.

Pêvek 7: Wêneyek ji Jîyana Şêx Mihemed Emîn ya Rojane.



Pêvek 8: Şêx Mihemed Emîn li Pêşîya Cemaetê Nimêjê Dike.



Pêvek 9: Kêlên Gora Şêx Mihemed Emînê Heyderî



Pêvek 10: Kêla Ber Serê Heyderî (Helbestên Wî yên Rêza 3 û 85em)



بِسْمِ اللَّهِ الرَّحْمَنِ الرَّحِيمِ (1)
 يَا إِلَهِي تَوْحْسِيْبِي صَدُو حَتِّي رَقِيْبِي
 تَوْمُغِيْتِي وَصُجِيْبِي ثَرْتَه هِيْغِيْتِي رِجَامَه
 ثَرْتَه هِيْغِيْتِي أَهِيْدِيْم عَاَصِي كِسْلَان بِلِيْدِيْم
 لَا يَتَّقِي بَطْنُكَ شَدِيْدِيْم رَوِشِيْ قِيَوْمِ الْقِيَامَه
 يَكْنَاهُ خُوْدِي زَانِيْم ثَرْتَه ظَاهِر عِبَالِيْم
 مَه عَفُو كِي آيِي خَدَانِيْم مَه دَكَل خَا صِرْ عَوَامَه
 يَكْنَاهُ شَرُو خَفِيْم لِمَه زَو تَوَلِي خَشِيْم
 كَو لَامَه بِلِي رَحِيْم بِدَه مَه عَفُو سَلَامَه
 لَحْيُو بَا تَوْسَتَارِي لَدُنُو بَا تَوْغَفَارِي
 نَكُو جَزِي لَحْيَارِي بِدَه مَه آه نَدَامَه
 اَز لَدُنْيَا فَقِيْرِيْم رَوِشِيْم تَرَاو حَقِيْرِيْم
 يَرْ ضَعِيْفِيْم وَآسِيْرِيْم خَشْتِي دُنْيَا فَنَامَه
 بَغِيْم دَرْدُو عَلِيْمِيْم بِدَوَامَه دِل دِلِيْم
 يَا إِلَهِي تَوَدِلِيْم تَوَلَاهُ عَبْدُو كَدَامَه
 تَوَلَاهُ يَسِيْرِيْم دِلِيْم صَارِي فَعَلِي دِهِيْم
 رَوِشِي ذَنْب عَظِيْمِيْم سِيْفِي جَوْرُو جَفَامَه

{ ۱ }

یا الهی تو حسیبی صد و حی و قیبی
 تو معینی و یحیی ز ته هیفی و رحاما
 ز ته هیفی و امیدم عاصی و کسلای یلیدم
 لایق بطنای شدیدم رورشی یوم ایقاما
 بگناه خوه دزانم ز ته فه ظاهر عیانم
 تو عفوکی ای خدانم مه دگل خاض و عواما
 بگناه سرو خصم بگناه زونکی خصم
 کولامه بکی رحم بدهمه عفو و سلاما
 لعبوبان تو ستاری لذنوبان تو غفاری
 نه کو جزئی اختیار بدهمه آه و نداما
 از لدنیای کسیرم روسیاه زار و فقیرم
 پر ضعیفم و حقیرم خستنی دنیا فناما
 بغم و درد و علیم ب دوامه دل ذلیل
 یا اله تو دلیم تولو عبد و گداما
 تولو عبد لا دنیام صانع فعلی ذمیم
 رورشی زنب عظیم سیفل جور و جفاما
 سیفل نفسانیارم دل گولی طیری غدارم
 دل پر بندار و بچارم دل خوشی عفو خداما
 دل خوشی رحا رحیمه پادشاه کی هر قدیمه
 رحم و عفوای عظیمه ز مرا قصد و مراما
 ای خدانو بصفی کی برضا خو تو مه شاکی
 حیدری زاده دواکی هیفیا رحمانه ماما

— — — — —

۱۷۵-

{ ۱۲ }

تعالی کر عناية ربّه رايه اشکرا
وصفوی قطنائی گوئن خارج ز عقل کتاب
یه بی مه لعرض دین و کف طریق
کی معصوم د بیتن شیخ و مرشد فی الحقیق
تعالی رایی همه هم محمد بور فیک
بیک سادات دهاتن تقی ابوبکر صدیق
بونه مسند او لیستی قط نما فکر و حساب
دورا او لیستی قط نما فکر و خیال
رئسی فی طریق صاحب علم و کمال
چه بیعة کر بتصدیق وی بری فیض جمال
بحق مرقدی کی مه نکی محروم حال
حیدر کی زاده فقیر بی مجال خراب

— — — تم — — —

﴿ بخط ملا محمد صبا الدین ﴾

- { ٧٧ } - ٨

عاشق بی‌دل تورابه . بریتلمعروف توهر
 سر زخوراکه شیاریه در جهان روز هاته در
 وی نظر دایه جهرانی قایمقامی نقشبند
 یای تختی نوری دانی میر علا الدین لیسر
 وی لئلمعروف فگرنی پای تختی نسبتی
 مرقدانورین دگرنی چارکناری سوروزر
 ههنگه عالی مقامه قاعدی تختی حمید
 مرهه قلوبی ظلامه بهلولانی معتبر

احسن الله تبارک ز جمالا آنی
 کی ددی وجه مبارک زود بو تسلیم لیسر
 ای میرید رابه خوکارکه روعشق و دل تسلیم ببه
 دل ز دنیا ئی تو سارکه ههمن هات بی خبر
 خاپو جیلی خو تو باقی تو بکه تو بی ز دل
 نفس و دنیا گر تو نا فی هر لئلمعروف بگر
 هر علا الدین بیینه ههمن بکه تفتیشی حال
 من ز دل صدق و یقینه کو خدی رابه هنر
 شاه من گلکی هنردی نور زروضی هاته سر
 شوق دا وجه علا الدین حیرین جن و بشر
 مه ز ته هیقی و رجایه یکه میریدی برندی
 حیدری حال لی نجایه ما علیل و بی سفر
 - - - - -

بِسْمِ اللَّهِ الرَّحْمَنِ الرَّحِيمِ

{ ۱ }

یا الہی تو حسیبی حمد و حی و رفیقی
تو معینی و یجیبی رتہ ہیئی ورجاما
رتہ ہیئی و امیدم عاصی و کسلان بلیدم
لائق بپشائی شدیدم رورشی بوم یقیاما
بگناہ خوہ دزائمه رتہ فہ ظاہر عیانم
تو عفو کی ای خدانم مہ دگل خاض و عواما
بگناہ شرو خصم قولہ زونکی خشم
کولامہ بکی رحم بدہ مہ عفو و سلاما
لعیوبان تو ستاری لذنوبان تو غفاری
نہ کوچرئی اختیار ی بدہ مہ آہ و نداما
از لدنیائی کسیرم روسیاه ژار و فقیرم
پرضعیفم و حقیرم خستئی دنیا فناما
بغم و درد و عایلم بی دوامہ دل ذلیلم
یا الہ تو دلایلم تولوئ عبد و گداما
تولوئ عبد ک دنیام صانع فعلی زمیہ
رورشی ذنب عظیمم سیفل جور و جفام
سیفل نفسا نیارم دل گولی طہری غدارم
دل بریندار و بچارم دل خوشی عفو خداما
دل خوشی رحمار حیمہ پادشاه کی ہر قدیمہ
رحم و عفوای عظیمہ ژمارا قصد و مراما
ای خدا تو بھشتی کی برضا خو تو مہ شاکی
حیدری زادہ دوکی ہیقبیار حما تہ ماما
تہ

-87-

معینی وی خدا عالی رزق و قاف تمام ژیرا
 خدا ژیرا همه یار بی رزق و قاف کو پین توب
 دامری ویدا هر کار بی رزق و قاف تاهری غریب
 کسی لدینی خو گوهدار بی ورن حیرا بکن طلبی
 بکن طلبی ورن حیرا نین محروم ژانعام
 دخوازی نعمة و خیرا ورن بردر گهی عام
 قبول درگاه ژتوبیرا دئی یا قلیم اسلام
 علا الدین نظر بردا دعلم را گلاک مشهور
 چه ضری صافی و فزا مریدی دل گش و مسرور
 هلالی صدر و پردا رشاندی مسکو فیض نور
 رزق دینی را او بیستن هلالی پردیا ظلم
 قلوب ریش گلاک شوشتن ژمن قط کس نکن لوم
 گلاک نفس کبار کوشتن بدر و صحبة و علم
 دعلم بجا عمانه شکر ام بی دکن فخری
 زرد راه چه لقمانه اون پشته مه فی دوری
 شونا خزنوی مانه ژلوان پی دکن صبری
 شونا قطب و استاد مه دی افی مرشدی دینه
 جلیس تختی ارستاد چه محبوب و چه شیرینه
 قبول کر حیدری زارا ژشیخا شیخ علا الدینه
 قبول کر ام چه بی خیرن هزار وک ص غلام ته
 یسیری قید و زنجیرن دبو سم دستوداوی ته
 لدرگاه ته قطمرن امین بو خالک پای ته
 - تم -

-52-

گر علا الدین جان فدای دین و علم و صحبتی
 بکن صبری بز آن قیمتی
 بعد الغنی یا اله حفظ و صبری بد عیال خزنوی
 صد شکر ام کشته وقتا چاق غزال خزنوی
 گرچه احمد بویه پیری و طریقانقشبند
 گرچه معصوم پهلوانک سربلنده بو سندن
 گر علا الدین پر شیرینه متقی و درد مند
 بعد الغنی هم شاخ دارا احمدی هیبه بلند
 یا اله حفظ و صبری بد عیال خزنوی
 صد شکر ام بون مریدی چاق غزال خزنوی
 شاه خرنابجدید دین کرد و وقتی دین غلا
 هم بمعصوم زیده خزمت جیو هم عشقادلا
 شیخ علا الدین خوش تصرف کر خصوصاً در ملا
 لی دکم هیفی هرن درد و بلا
 بعد الغنی یا اله حفظ و صبری بد عیال خزنوی
 صد شکر ام کشته وقتا چاق غزال خزنوی
 پریا احمد بون هدایه ترک و کرمانج و عرب
 بر بمعصوم عشق دادل مثل برق رو و شب
 لی علا الدین مریدی حق شعلدا شام و حلب
 بعد الغنی هم دوام بی علم و ارشاد و ادب
 یا اله حفظ و صبری بد عیال خزنوی
 صد شکر ام کشته وقتا چاق غزال خزنوی

-55-

نینه وک فی صور کلا باغ بهشتا ارم
 تابع ریز اضیایه هم بر سعا قدم
 از دخیلی باق معصوم سائلم بی چاره مه
 الامان شیخ طریق کلب درگاه ته مه
 وارث شرعا محمد ﷺ فی طریقانقشید
 عالم ترک و عجم کرد و عرب دشت و بلد
 هبفید ارم یا الهی دولة و تکیا ابد
 حیدری زاده بخشنی شاه خرنا المدد
 از دخیلم باق معصوم سائلم بی چاره مه
 الامان شیخ مزن از کلب درگاه ته مه



ساه زمین صیاح الدین صحبه شیرین درجانی تو
 ای شیخ و شنگ عنقا بهدنگ صد نقش رنگارنجانی تو
 شیخ و شپال ناز و دلال ابرو و هلال آور غزال
 ای سروری سردختی رنگ اسیری انسانی تو
 بوغبیره قام عرعره لب شکره خوش دلبره
 کنعانئو میرخانئو نورانئو عثمانی تو
 ای ناف گران تسلیم امان مزروح و جان هم ملک و خان
 من کرفدا باز مرشدا نور و الهدا احسانی تو
 کشتا الکروب ستر العیوب محو الذنوب فتح القلوب
 هم دایه ته برهنه مزگین ته خاقانی تو


بِسْمِ اللَّهِ الرَّحْمَنِ الرَّحِيمِ


قصیده: ۱


يَا إِلَهِي تَوْحْسِي بِي صَدُّوحِي وَرَقِيبِي
تَوْعِينِي وَجُيِّبِي رَتَه هَيْقِي وَرَجَامَا
رَتَه هَيْقِي وَأُمِيدِمُ عَاصِي وَكَسْلَان بِلِيدِمُ
لَأَيُّ بَطْشَك شَدِيدِمُ رُورَشِي يَوْمَ الْقِيَامَا
يَكْنَاهُ خَوْه دِرَانِمُ رَتَقَه ظَاهِر عِيَانِمُ
تَوْعَفُوكِي أَيُّ خَدَانِمُ مَه دِ كُلِّ خَاصِرْ وَعَوَامَا
يَكْنَاهُ شَرُّ وَخَصِمُ تَوْلَه زُونَكِي خَشِمُ
كَوْلَامَتَه بَكِي رَحِمُ يَدَه مَه عَفْوُ وَسَلَامَا
لَعِيُونَانِ تَوْسَتَارِي لَدُنُونَانِ تَوْعَقَارِي
مَه كَوُجَزِي إِخْتِيَارِي يَدَه مَه أَهْوِنْدَامَا
أَزَلْدَنِيَايِ كَسِيرِمُ رُوسِيَاهُ زَارُ وَفَقِيرِمُ
يَرْضَعِيمُ وَحَقِيرِمُ خَشْتِي دُنْيَا فَنَامَا
يَغْمُ وَدَرْدُو عَلِيمُ بِي دَوَامَه دَلْ دَلِيلِمُ
يَا إِلَهِي تَوْ دَلِيلِمُ تَوْلُو عَبْدُ وَكَدَامَا
تَوْلُو عَبْدُكَ دَنِيَمُ صَانِعِ فَعْلِي دَمِيمُ
رُورَشِي دَنْبِ عَظِيمُ سَيْفِلِ جُورُ وَجَفَامَا

قصیده ۲۷
 نورشینی چه خوشبو بوجود حضرت و سید
 سُبَّة ز سَرَقْد و بخارا قی ناز عید
 علم و ادب و ذکر و حضور نیک بویه پید
 کی راستی کوی قصدی وی تر خور اینی واید
 یارب حفظا خوبکی لاهل حضرت و سید
 نورشینی چه شیرینه بوی مرقدا پالی
 چه خوش نور و ضیایه بقابل اهل مالی
 اولاد مالا طبعه ملکن دینا لی
 الهی تو بردار خور مرقدیده آلی
 وی خلق بر این کاجیه جمال حضرت و سید
 نورشینی چه خوش واره وکی باغ گلایه
 پای تحق طریق مرکز استیغ و ملایه
 یکن دینا مرقدی تحقیق کعبه دلایه
 هر یک ز اولاد فی مال خوش رطبه علایه
 یارب دوام یدده مالا حضرت و سید
 نورشینی چه خوشبو مرکز اشهر و جهایه
 اق علم و ادب ذکر و حضور نیده گهایه

اق علم سرحدا بی بویه مشهور نه ای نهایه
 فیضادرزی چنگا حیدری آسیوی باق نهایه
 زانم یقینی تو تر زینا حضرت و سید
 تمت








عینی سلوایا العودا قامتا ریحان دل
یا مدد طریقه شریین میرزا دشت هزاده این
یا علامه الدین عالی شان لید با سلیمان خان دل
یا عالی اری طریقه ماستقیم
بیرقا دین دلی
یا هنر شیر فطریه دیا شری روزان دل
وصفا او کلام صمد صانع خوشش روان
ناظر اقلیم دنیا در جهان سلطان دل
الامان بر آستان تو بیتیم تولیم
دلا نظر بر این علیر حستنی طوفان دل
دل بر بندار هیئتیار همان نه صمد الامان
صدری مسکین غریبی چار و ویران دل
عبدی کعباد الی بیان صفای و افتخار
بالخصوص ذکر لسان مجلوس شکر شیران دل

۱
 الحمد لله رب العالمين والصلوة والسلام على خير خلقه
 سيدنا محمد وعاله وصحبه واجباء ائمه
 اَمَّ بَدِينِ مُحَمَّدٍ خَدَّ اَيُّ مُسْلِمَانِ
 اَوْ خَدَّ اَيُّ كَوْهَدَايَةِ دَايِهِ مَه
 نَعْتَا زَهْرٍ نَعْتِ خَوْشَنَرِ أَقَه
 كَوْمَه اِسْمَانِ اَنِيه رَبِّ عَظِيمِ
 اَيُّ خَدَّ اَيُّ خَالِقِ اَرْضُ سَمَا
 اَمَّ كَنْهَكَارِ جَانِ اِغْفَرْنَا نَنَه
 اَمَّ بِلَوِيْمَانِ بِيْنَه اَرْضَا مَحْشَرِ
 اَمَّ كَنْهَكَارِ ضَعِيفِ بِيْ عَمَلِ
 اَمَّ بِنَضْلَانَه عَفْوَانِ بِيْ جَفَا
 هَوَزِ عَشَقَا دِلِ بِيْرِيْنِ بَرَوَامِ
 اَوْ كَسِيْ كَوْطَا اَبِ خَيْرِيْ يَرَه
 حَا خَلِيفِ نُوْرٍ مُحَمَّدٍ اَوَّلِيْ
 خَوْشَنَرِ دَوَانِ وَصْفِ عَمَدِ اَيُّ اَبِ
 هَرَوَهَا اَشِيْمِ وَلِيَانِ يَكْ بِيْلَكِ
 بِيْرِ سَقَطِ فَاخِرِ رَايِ هَمَّ جَمِيْدِ
 كَوْنَه كَو اَوْ مَرُوْقِ خَيْرِ كَرَامِ
 وَرَكِيْ لِبِيْرِ مَنَاسِبِ بَرَهْ خَوْشِ
 وَيْ هَمَّ حَشَرِ وَكَلِّ صَفَا بَرَهْ


(١) إِنْ أَلِهَ وَمَلَائِكَتُهُ يَطُوعُونَ عَلَى النَّبِيِّ يَا أَيُّهَا الَّذِينَ
آمَنُوا صَلُّوا عَلَيْهِ وَسَلِّمُوا تَسْلِيمًا
بِسْمِ اللَّهِ الرَّحْمَنِ الرَّحِيمِ


الْحَمْدُ لِلَّهِ لَا يَجْرِي فِي مُلْكِهِ إِلَّا مَا شَاءَ وَخَلَقَ سَيِّدَنَا مُحَمَّدًا
مِنْ نُورِهِ فَكَانَ كَمَا شَاءَ وَأَرْسَلَهُ رَحْمَةً لِلْعَالَمِينَ
وَنَحْنُ بِدِينِهِ كُلِّ دِينٍ صَلَّوْا اللَّهُ عَلَيْهِ وَعَلَى آلِهِ وَاتَّبَاعِهِ
وَرِثَتِهِ أَجْمَعِينَ وَبَعْدُ يُرِيدُ الْمُؤَلِّفُ ذِكْرَ مَوْلَى النَّبِيِّ مُحَمَّدٍ
وَبَعْضَ خَصَائِصِهِ وَفَضَائِلِهِ بِالْأَدَلَّةِ الْمُنْفَرِدَةِ وَالْإِشْرَافِ
الْمُشْهُورَةِ مُسْتَعِينًا بِاللَّهِ وَالْأَحْزَانِ وَالْأَقْوَامِ وَاللَّيْلِ وَالنَّهَارِ
لَمَّا أَرَادَ اللَّهُ خَلْقَ الْعَالَمِ لِيَعْرِفُوهُ وَيُسَبِّحُوهُ خَلَقَ سَيِّدَنَا
أَوَّلًا مِنْ نُورِهِ وَقَالَ لَهُ مَنْ أَنَا قَالَ أَنْتَ اللَّهُ لَا إِلَهَ إِلَّا أَنْتَ وَقَدْ
قَالَ لَكَ خَلَقْتُكَ وَسَمَّيْتُكَ مُحَمَّدًا أَنْتَ حَبِيبِي مِنْكَ أَبَدُ الْخَلْقِ
وَبَدَأَ أَخْتَمَ الرِّسَالَ فَعَرَفَ حَيَاءً وَقَطَعَ أَلْفَ الْقَطْعَاتِ خَلَقَ مِنْهُ
الْبُكْرَةَ وَعَلَّمَ اسْمَ كُلِّ شَيْءٍ وَعَلَّقَهُ بِالْعَرْشِ وَبِأَمْرِ اللَّهِ اخْتَصَرَ
الْبُرْجَ مِنْ أَرْضِ الْأَرْضِ وَنَجَّاهُ مِنَ السَّنَنِ وَصَوَّرَهُ عَلَى شَكْلِ
بَدِيهِ وَفِي أَحْسَنِ تَقْوِيمٍ وَقَالَ اللَّهُ لِلْمَلَائِكَةِ اسْكُدُوا
لَارْمِ فَسَجَدَ كُلُّهُمْ إِلَّا ابْلِيسَ تَكَبَّرَ وَمَنَعَ خَلْقَهُ
اللَّهُ

Pêvek 27: Rûpela Serî ya “Rîsaleya Exlaq û Tesewîfê” ya Heyderî



Pêvek 28: Rûpelên ji Nav “Rîsaleya Exlaq û Tesewîfê” ya Heyderî







⁹⁹⁹ Halime Gül, “İbrahim Bin Edhem ve Tasavvuf Tarihindeki Yeri”, (Yüksek Lisans Tezi, Selçuk Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü). Konya 2008.

Pêvek 31: Cih û Rêza Helbestan di Nusxeyan de

Rêz	HDM	NMD1	NMD2	NMD3	NMDM	MMEC	DCEHK	DCMŞB
1	+	1	1	1	1	+	-	-
2	-	6	6	2	2	-	-	-
3	-	+	-	-	-	-	-	-
4	-	11	11	5	5	-	-	-
5	-	35	35	6	6	-	-	-
6	+	44	44	12	15	+	-	+
7	-	75	-	9	10	-	-	-
8	-	46	46	14	16	+	+	-
9	-	79	-	-	19	-	-	-
10	-	50	50	-	24	-	-	-
11	-	12	12	11	13	-	-	-
12	-	78	-	-	20	-	-	-
13	-	39/40	39/40	-	30	-	+	+
14	-	30	30	-	32	+	-	-
15	-	17	17	-	34	+	-	-
16	-	4	4	-	39	+	-	-
17	-	10	10	-	42	+	-	-
18	-	15	15	-	44	+	-	-
19	-	58	58	-	45	-	-	-
20	-	-	57	-	46	-	-	-
21	-	21	21	-	50	-	-	-
22	-	22	22	-	51	-	-	-
23	-	55	55	-	52	-	-	-
24	-	32	32	-	57	-	-	-
25	-	16	16	-	67	-	-	-
26	-	38	38	23	63	-	-	-
27	-	77	-	-	-	-	-	-
28	-	23	23	-	73	-	-	-
29	-	62	62	-	77	-	-	-
30	-	73	-	26	78	-	-	-
31	-	64	64	-	79	-	-	-
32	-	5	5	24	64	-	-	-
33	-	63	63	-	74	-	-	+
34	-	26	26	-	55	+	-	-
35	-	29/67	29	4	4	-	-	-
36	-	66	-	3	3	-	-	-
37	-	65	65	-	68	+	-	-
38	+	-	-	7	7	-	-	-
39	-	3	3	-	11	-	-	-
40	-	14	14	-	38	-	-	-
41	-	-	-	-	-	+	-	-

42	-	49	49	-	25	+	-	-
43	-	-	-	27	83	-	-	-
44	-	70	-	-	82	-	-	-
45	-	-	-	17	9	-	-	-
46	+	52	52	16	23	-	+	-
47	-	45	45	13	27	+	+	+
48	-	7	7	-	18	-	-	-
49	-	47	47	-	26	-	-	-
50	-	18	18	-	33	-	-	-
51	-	13	13	-	35	+	-	-
52	-	8	8	-	40	-	-	-
53	-	9	9	-	41	+	-	-
54	-	56	56	-	47	-	-	-
55	-	53	53	-	56	-	-	-
56	-	81	-	-	58	-	-	-
57	-	74	-	20	60	+	-	-
58	-	76	-	18	65	+	-	-
59	-	33	33	21	66	-	-	-
60	-	34	34	19	69	-	-	-
61	-	28	28	-	72	-	-	-
62	-	61	61	-	75	-	-	-
63	-	-	-	-	80	-	-	-
64	-	72	-	25	81	-	-	-
65	-	20	20	-	49	-	-	-
66	-	37	37	-	62	-	-	+
67	-	25	25	-	70	-	-	-
68	-	43	43	-	28	-	-	-
69	-	80	-	-	21	+	-	-
70	-	41	41	5	36	-	+	+
71	-	27	27	-	71	-	-	-
72	-	48	48	-	37	+	-	-
73	-	60	60	-	32	+	-	-
74	-	2	2	-	12	-	-	-
75	-	19	19	-	48	+	-	-
76	-	-	-	-	-	-	-	-
77	-	31	31	-	31	+	-	-
78	-	68	-	-	17	-	-	-
79	-	42	42	-	29	+	-	-
80	-	51	51	-	22	+	-	-
81	-	59	59	-	43	+	-	-
82	-	-	-	-	76	-	-	-
83	-	54	54	-	53	-	-	-
84	-	36	36	-	54	-	-	-
85	-	+	-	-	-	-	-	-
86	-	-	-	8	8	-	-	-
87	-	24	24	-	59	-	-	-

T.C.
MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ
TÜRKİYEDE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

Dok. No: MAU-FRM-
04-ENSTİTÜ/24

İlk Düz.
Tar.:02/01/2020

Rev. No/Tar.:
00/...

Sayfa: 1/1

İNTİHAL RAPORU FORMU



Tez Başlığı: DÎWANA HEYDERÎ (ŞÊX MIHEMED EMÎNÊ HEYDERÎ) - METN Û VEKOLÎN

Yukarıda başlığı gösterilen tez çalışmamın kapak sayfası, giriş, ana bölümler ve sonuç kısımlarında oluşan toplam 400 sayfalık kısmına ilişkin 09/01/2021 tarihinde Türkiyede Yaşayan Diller Enstitüsü Müdürlüğü tarafından “Turnitin” adlı intihal tespit programından aşağıda belirtilen filtrelemeler uygulanarak alınmış olan orjinallik raporuna göre, projemin benzerlik oranı % 7’dir.

Uygulanan Filtrelemeler:

Kaynakça Dahil

Alıntılar Hariç

Açıklamalar:

Mardin Artuklu Üniversitesi “Turnitin” adlı intihal tespit programı sonucunda; azami benzerlik oranlarına göre tez çalışmamın herhangi bir intihal içermediğini; aksinin tespit edileceği muhtemel durumda doğabilecek her türlü hukuki sorumluluğu kabul ettiğimi ve yukarıda vermiş olduğum bilgilerin doğru olduğunu beyan ederim.

Adı Soyadı: Mehmet YILDIZ

Öğrenci No: 16711003

Programı : Kürt Dili ve Kültürü

Statüsü :

Tarih ve İmza
09/01/2021

Enstitü Sekreteri

İmza

Hazırlayan:
Birim Kalite Komisyonu

Kontrol Eden:
Üniversite Kalite Komisyonu

Onaylayan:
Üniversite Kalite Komisyon Başkanı



T.C.

Mardin Artûklu Üniversitesi

Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

HEYDERÎ’NİN
(ŞÊX MIHEMED EMÎNÊ HEYDERÎ)
DÎVANI
(METİN ve İNCELEME)

Mehmet YILDIZ

16711003

Danışman

Prof. Dr. Abdurrahman ADAK

Mardin-2020